

# **Pênc k'itêbêd Mûsa**



**Pênc k'itêbêd  
Mûsa  
(T'awret)**

**Destpêbûn  
Derk'etin  
Qanûna K'ahîntîyê  
Jimar  
Qanûna Ducarî**



**Înstîtûta welger'andina K'itêba Pîroz  
Moskva  
2010**

**Pênc k'itêbêd Mûsa**  
**Destpêbûn, Derk'etin, Qanûna K'ahîntîyê,**  
**Jimar, Qanûna Ducarî**

*Bona welger'andina k'urdîya kurmancî*

Bi vê navnîşê binivîsin bişînin:  
[ibt\\_inform@ibt.org.ru](mailto:ibt_inform@ibt.org.ru)

Horace Knowles © The British & Foreign Bible Society, 1954, 1967, 1972  
ISBN 978-5-93943-156-9

© Институт перевода Библии, Москва, 2010

## Serecem

Pêşgotin .....	7
Destpêbûn.....	9
Derk'etin .....	114
Qanûna K'ahîntîyê .....	197
Jimar .....	257
Qanûna Ducarî .....	338
Ferhengok .....	417



## Pêşgotina her pênc k'itêbêd Mûsa

Xwendevanêd delal! Cara e'wlin e ku ev her pênc k'itêbêd Mûsa destê weda ye, k'îjan ku dik'evine nava p'arêd Bîblîyayê. Ev k'itêb bi zaravê kurmancîya k'urdî hatîye welger'andinê. Bîblîya k'itêba k'itêba ye, k'itêba here hêja ye û gelek tê xwendinê. Cihû, musulman û mesîhî van her pênc k'itêbêd Mûsa qebûl dikin çawa k'itêbêd pîroz.

Her merivê li ser t'opa dinîyayê, k'îjan qulbîda ku dimîne, çi miletî yan xweyê çi h'ebandinê be, wî dik'eve ku vê k'itêbê bi zimanê xwe bixûne. Bîblîya caba wan pirsê dide, k'îjana ku t'imê serê cime'tê êşandine, mesele: em ji ku bûne, em çima dijîn, çima dinyayêda haqas xirabî heye, pey mirinêr'a çi tê serê mêriv.

Bîblîya t'evayîya xweva şêst şeş k'itêb in, k'îjan ku bi destê gele nivîsk'ara navbera gelek salada hatine nivîsarê. Ev k'itêbana derheqa serhatîyêd ji destpêbûna dinyayêda girtî h'eta qurna yekêye pey bûyîna Îsar'a dibêje. Bîblîya li ser du p'ara p'arevedibe. Peymana Nû, k'îjan ku derheqa bûyîn, kirêd Îsa û peyçûyêd wî, usa jî derheqa pêşdaçûyîna civîna e'wlin berbiç'ev dike.

Peymana Kevin nav xweda dite'milîne her pênc k'itêbêd Mûsa, usa jî k'itêbêd p'êxembera û hilbesta. Her pênc k'itêbêd Mûsa ne t'enê yêd e'wlin in, lê usa jî yêd e'sasî ne, bona t'emamîya K'itêba Pîroz. Ew bona pêşdahatîna dinê, însên, pêşdahatîna gunah, heleqetîya Xwedê û însên dibêje.

Her pênc k'itêbêd Mûsa ji t êkista îbranîye kevin, awa gotî ji t êkista Masorêtî bi zimanê k'urdî hatîye welger'andinê.

Cî-cîya tiştê ji têkistê dûrk'etî şirovekirinêda tê e'yankirinê.  
Xilazîya k'itêbê: ferhengok û xerîte heye.

Înstîtûta welger'andina bîblîyayê r'azîbûna xwe dide:  
welger'a, serr'astkîra usa jî h'emûyêd ku t'evî k'arê hazirkirin  
û xebata çapkirina her pênc k'itêba bûne.

*Înstîtûta welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva*

# Destpêbûn

## Pêşgotin

Peymanaf Kevin, k'itêba Destpêbûnêda destpêdike. Eva k'itêba pêşin e, ji her pênc k'itêbêd Mûsa, (bi îbranîf «Torah» tê gotinê, awa gotî «Şîret» yan «Qanûn»). Navê k'itêba Destpêbûnê bi îbranî «Bêrêşît» e, awa gotî «Destpêbûn», yan «Sêrîda», lê bi yûnanî «Gênêsîs» e, «Pêşdahatin» yan «Çêbûn». Vê k'itêbêda bona pêşdahatina t'opa dinê, e'rdê, mêriv û cime'ta Îsraêlf tê gotinê. Vê k'itêba Destpêbûnêda, Xwedê ye serê sera. Destpêbûna k'itêbêda serê 1-11-a bona wê yekê tê gotinê, wekî çawa bi xebera Xwedê t'emamîya dinyayê tê e'firandinê. Mezinayîya Xwedê ne t'enê vêda ye, lê Xwedê wan merivêd xweye xuliqandî jî pey wê yekê'a nahêle, gava ew dûrî Xwedê dik'evin, gune dikin, Xwedê dîsa bona wan xem dike. T'emamîya serhatîya dinyayêye mayîne vê k'itêbêda ew heleqetî ye, ya ku nava Xwedê û merivayêda diqewime. Peyr'a ji serê 12-50-î bona wan meriva dibêje, k'îjana ku Xwedê bona xwe dibijêre, wekî zur'etêd wan bibine cime'ta wî. Li nava serhatîya Birahîm, Îshaq, Aqûb û her donzdeh kur'êd Aqûbda, Xwedê wanr'a soz dide, wekî zur'etêd wanê bê h'esab bin û li e'rdê war bin, k'îjanar'a ku Xwedê soz da. Pê wan h'emû milletê bêne bimbarekkirinê. R'aste, ew ne merivne k'amil bûne, em Destpêbûnêda bona kêmasîyêd wan û kirinêd wane ne qenc dixûnin. Lê dîsa Xwedê gazî wan dikir ku guhdarîya wî bikin. Nexş û stîla k'itêba Destpêbûnê cûr'e-cûr'e ye, hew dinihêr'î deng-be'sê bona şayê ye, hew dinihêr'î

serhatîya saxleme li ber guh e, hew dinihêr'î nişkêva r'eqema millet û qebîla tê navkirinê, yan jî dua bi forma hilbestê tê gotinê. Ev yek bona me tiherekî ye, wekî t'emamîya têk'stê bi lîstika gotinava dagirtî ye. Mesele, xuliqandina mêr (bi îbranî Adam), Xwedê ew ji axê (bi îbranî adama, 2:7) xuliqand. Alîyê dinva jî mêriv gerekê ev e'rd bêcer kira (2:5; 3:23), alîkî dinva jî r'ojekê ew dîsa gerekê vege'ere di wê xwelîyê (3:19). Ev yeka lîstika gotina ye û ev yek ne t'enê serhatîya dixemilîne, lê usa jî alîk'arîyê dide ku baş bê fe'mkirinê, ku xudanê serhatîyê çî dixwaze mer'a bêje. Gele cara lîstika gotina, me'nîya pêşdahatina nava şirovedike, yan jî navê cîwara dide k'ifşê. Mesele, navê Babîlonê (bi îbranî Babêl) e, ew fêla balal (t'evîhevkirin) şirovedike, «Çimkî li wir Xudan f zimanêd h'emû dinyayê t'evîhev kirin û ji wir Xudan ew li ser t'emamîya dinyayê bela kirin» (11:9). Lê h'eyf, wekî li nava welger'andinêda, lîstika gotina, t'am nayê welger'andinê. Vê welger'andinêda, şirovekirin, ji tiştêd bûyîye here berbiç'e'v nîşan dikin.

### Serhatîya destpêbûna e'rd û e'zmên

**1** Destpêbûnêda Xwedê e'rd û e'zman e'firandin. <sup>2</sup>E'rdî bêcûr'e û vikî-vala bû, te'rîstanîyê li ser r'ûyê ava bêbinî girtibû û R'uhê\* Xwedê li ser r'ûyê avê diger'îya. <sup>3</sup>Hingê Xwedê got: «Bira bibe r'onayî». Û bû r'onayî. <sup>4</sup>Xwedê dîna xwe dayê ku r'onayî qenc e, Xwedê r'onayî ji te'rîstanîyê qetand. <sup>5</sup>Û Xwedê navê r'onayê danî R'oj, navê te'rîstanîyê jî Şev. Û bû êvar û sibeh, bû r'oja e'wlin.

<sup>6</sup>Hingê Xwedê got: «Bira navbera avêda sînorê qedîmîyê pêşda bê û bira navbir'îyê bidê, avê ji avê biqetîne». <sup>7</sup>Û

---

\* 1:2 Eva xebera bi fe'mîna îbranîf tê fe'mkirinê çawa «r'uh» yan «ba».

Xwedê sînorê qedîmîyê çêkir û ava li bin sînorê qedîmîyêda û ava li ser sînorê qedîmîyê ji hev qetandin. Û usa jî bû. <sup>8</sup>Û Xwedê navê sînorê qedîmîyê danî E'zman. Û bû êvar û sibeh, bû r'oja duda.

<sup>9</sup>Hingê Xwedê got: «Bira avêd bin e'zmênda cîkî gol bin, zihayî k'ifş be». Û usa jî bû. <sup>10</sup>Xwedê navê zihayê danî E'rd û navê ava golbûyî jî danî Be'r. Û Xwedê dîna xwe dayê ku qenc e. <sup>11</sup>Hingê Xwedê got: «Bira E'rd şînayîyê, p'incar'a ku t'oximê xwe bide û dara xweyîbere ku mîna cûr'ê xwe ber bide, t'oximê wê jî nava wêda be, li ser e'rdê bigihîne». Û usa jî bû. <sup>12</sup>E'rdê şînayî, p'incar'a ku mîna cûr'ê xwe t'oxim bide û dara xweyîbere ku t'oximê mîna cûr'ê wê navda be derxistin. Û Xwedê dîna xwe dayê ku qenc e. <sup>13</sup>Û bû êvar û sibeh, bû r'oja sisîya.

<sup>14</sup>Hingê Xwedê got: «Bira sînorê qedîmîya e'zmênda r'onayîdar derên, wekî r'ojê ji şevê biqetînin û we'da, r'oj û sala nîşan kin <sup>15</sup>û bira evana sînorê qedîmîya e'zmênda r'onayîdar bin, wekî e'rdê r'onayî kin». Û usa jî bû. <sup>16</sup>Xwedê du r'onayîdarêd mezin çêkirin: R'onaya mezin wekî serwêrîyê li r'ojê bike, r'onaya biç'ûk wekî serwêrîyê li şevê bike û usa jî steyrk çêkirin. <sup>17</sup>Xwedê evana li sînorê qedîmîya e'zmênda danîn, ku r'onayê bidine e'rdê, <sup>18</sup>serwêrîyê li r'ojê û şevê bikin, r'onayê ji te'rîyê biqetînin. Û Xwedê dîna xwe dayê ku qenc e. <sup>19</sup>Û bû êvar û sibeh, bû r'oja çara.

<sup>20</sup>Hingê Xwedê got: «Bira av h'eywanêd bînberva bik'imk'ime û teyrede jî li ser e'rdê û sînorê qedîmîya e'zmênda bifir'in». <sup>21</sup>Û Xwedê h'ûtêd mezin xuliqandin û her h'eywanêd bînbera ku avêda dişûlikin, ku av ji cûr'êd wanda k'im-k'imî, usa jî teyredêd xweyîp'er'e bi cûr'êd wanda. Û Xwedê dîna xwe dayê ku qenc e. <sup>22</sup>Xwedê dua li wan kir û got: «Şîn bin û li hev zêde bin, avêd be'ra t'ijî kin, teyrede jî li ser e'rdê zêde bin». <sup>23</sup>Û bû êvar û sibeh, bû r'oja pênc.

<sup>24</sup>Hingê Xwedê got: «Bira e'rd h'eywanêd bînber cûr'êd wanda, h'eywanêd k'edî, şûlikî û terewilêd e'rdê cûr'êd

wanda pêşda bîne». Û usa jî bû. <sup>25</sup>Û Xwedê terewilêd e'rdê cûr'êd wanda, h'eywanêd k'edîye cûr'êd wanda, usa jî h'emû cûr'e şûlikîyêd li ser e'rdê cûr'êd wanda çêkirin. Û Xwedê dîna xwe dayê ku qenc e.

### Xuliqandina mêr

<sup>26</sup>Xwedê got: «Em merî dilqê xweda û mîna xwe bixuliqînin, wekî h'ukumî li ser me'sîyêd be'rê, teyredêd e'zmên, h'eywanêd k'edî û t'emamîya e'rdê, usa jî h'emû cûr'e şûlikîyêd li ser e'rdê bike».

<sup>27</sup>Xwedê merî dilqê xweda xuliqand,  
dilqê Xwedêda ew xuliqand,  
qisimê nêr û mê xuliqandin.

<sup>28</sup>Xwedê dua li wan kir û Xwedê wan'a got: «Şîn bin û li hev zêde bin, e'rdê t'ijî kin û xweyîtiyê lê bikin, h'ukumî li ser me'sîyêd be'rê, teyredêd e'zmên û h'emû h'eywanêd li ser e'rdêye ku dih'ejin bikin». <sup>29</sup>Xwedê got: «Va ye ez h'emû p'incar'êd li ser e'rdêye t'oximêd wanva didime we û her dara xweyîbere ku t'oximê wê nava wêda ye, wer'a wê bibe xurek». <sup>30</sup>Lê bona h'emû terewilêd e'rdê, h'emû teyredêd e'zmên û h'emû h'eywanêd bînbere ku li ser e'rdê dişûlikin, gîhayê şîn bibe xurek. Û usa jî bû. <sup>31</sup>Xwedê dîna xwe da h'emû kirina xwe ku va yê ew gelekî qenc bûn. Û bû êvar û sibeh, bû r'oja şeşa.

**2** E'rd û e'zman t'emamîya nexşêd xweva li ser hevda hatin. <sup>2</sup>Û Xwedê berî r'oja h'efta şixulêd xwe xilaz kirin û r'oja h'efta ji wan h'emû şixulêd xweye kirî r'ih'et bû. <sup>3</sup>Û Xwedê dua r'oja h'efta kir û ew pîroz kir, çimkî wê r'ojêda Xwedê ji wan h'emû kirinêd xwe, k'îjan ku e'firandibûn û kiribûn r'ih'et bû.

<sup>4</sup>Eve serhatîya pêşda hatina e'rd û e'zmên gava hatine e'firandinê.

### Serhatîya baxçê Êdênê

Wê r'ojê gava ku Xudan<sup>f</sup> Xwedê e'rd û e'zman çêkirin, <sup>5</sup>t'u k'oleke çolê hê t'unebûye, t'u gîhakî çolê hê şîn nebûye, çimkî Xudan Xwedê hela hê baran li ser e'rdêda nebarandibûye û merî jî t'unebûye ku e'rdê bêcer ke, <sup>6</sup>hingê hulm-gulm ji e'rdê derk'etîye t'emamîya r'ûyê e'rdê şil kirîye. <sup>7</sup>Xudan Xwedê ji axa e'rdê qalibê mêr çêkir, bîna jîyînê hulmî poza kir û mêr bû bînberekî sax.

<sup>8</sup>Xudan Xwedê li alîyê r'ohilatê Êdênêda baxçek daç'ikand û mêrê ku çêkiribû danî li wir. <sup>9</sup>Xudan Xwedê ji e'rdê her dar şîn kirin, dîtînê'a h'ewask'ar û xwarinê'a xweş, nava baxçeda jî dara jîyînê, usa jî dara qencî û xirabî naskirinê.

<sup>10</sup>Û bona avdana baxçe, ji Êdênê ç'emek derdik'et û paşê belayî çar ç'e'va dibe. <sup>11</sup>Navê ç'emê e'wlin Pîşon e, eva t'emamîya e'rdê H'awîlayêva dik'işe, wir ku zêrê wê heye. <sup>12</sup>Zêrê wî e'rdî jî safî ye, bidolax<sup>f</sup> û kevirêd qîmete onîks<sup>f</sup> hene. <sup>13</sup>Navê ç'emê duda Gîh'on e, eva t'emamîya e'rdê K'ûşêva dik'işe. <sup>14</sup>Navê ç'emê sisîya Dîcle\* ye, eva r'ohilata Aşûryayêva dik'işe û navê ç'emê çara jî Firat e.

<sup>15</sup>Xudan Xwedê ew mêr hilda danî baxçê Êdênê, wekî wê bêcer ke û xweyîtîyê lê bike. <sup>16</sup>Û Xudan Xwedê t'emî da mêr û gotê: «Ji her darêd baxçeda, dilê te dik'işîne k'îjanê bixwe, <sup>17</sup>lê ji dara qencî û xirabî naskirinê nexwe, çimkî wê r'oja gava tu ji wê bixwî, tê e'se bimirî».

<sup>18</sup>Xudan Xwedê got: «Ne baş e ku mêr t'enê bimîne, k'omekdarek ku layîqî wî be çêkim». <sup>19</sup>Hingê Xudan

---

\* 2:14 Awa gotî «Tîgrîs».

Xwedê h'emû terewilêd çolê û h'emû teyredêd e'zmên ji axê çêkirin û anîne cem mêr, wekî bibîne k'a ewê çi navî li wan ke û mêr çi nav danî li ser h'eywanê bînber, ew jî bû navê wan. <sup>20</sup>Mêr nav li h'emû h'eywanêd k'edî, teyredêd e'zmên û terewilêd çolê kirin, lê merr'a k'omekdarek ku layîqî wî bûya dest nek'et. <sup>21</sup>Hingê Xudan Xwedê xeweke k'ûr kire ç'e'vê mêr, gava ew xewr'a çû, Xudan p'arxaneke wî hilda û dewesê goşt t'ijî kir. <sup>22</sup>Û Xudan Xwedê ji wê p'arxana ku ji mêr hildabû k'ulfetek çêkir, anî cem mêr. <sup>23</sup>Hingê mêr got: «Niha eva hestûyê ji hestûyê min e û goştê ji goştê min e, evayê jin\* bê gotinê, çimkî ji mêr\* hate hildanê». <sup>24</sup>Lema mêrê dê û bavê xwe bihêle, xwe li jina xwe bigire û bibine bedenek. <sup>25</sup>Mêr û jina xweva her du jî te'zî bûn û şerm nedikirin.

### Meriv ji gur'a Xwedê dertê

**3** Ji nava wan h'emû terewilêd çolêye ku Xudan Xwedê e'firandibûn, yê herî h'ilek'ar me'r\* bû. Ewî gote jinê: «R'astî Xwedê gotîye wekî ji h'emû darêd baxçe gerekê nexwin?» <sup>2</sup>K'ulfetê gote me'r: «Ji berêd darêd baxçe em dikarin bixwin. <sup>3</sup>Lê ji berê wê dara ku nava baxçeda ye, Xwedê got nexwin û dest nedinê, wekî hûn nemirin». <sup>4</sup>Me'r gote k'ulfetê: «Na, hûn t'u car namirin, <sup>5</sup>lê Xwedê zane, wê r'oja gava hûn ji wê bixwin, ç'e'vêd weyê vebin û bibine mîna Xwedê, qencî û xirabîyê ji hev derxin». <sup>6</sup>Û k'ulfetê dîna xwe dayê wekî berê darê baş bû bona xwarinê, berbiç'e've h'ewask'ar û dilhavijî bû bona zanebûnê, dest avîte berê wê xwar û da mêrê t'evî xwe, ewî jî xwar. <sup>7</sup>Hingê ç'e'vêd wan vebûn, xwe derxistin ku ewe te'zî ne, belgêd hêjîrê dirûtin û pê xwe sit'ar kirin.

\* 2:23 Bi zimanê îbranî sewtêd mêr û jin nêzîkî hev in: îş û îşa.

\* 3:1 E'yantî 20:2.

<sup>8</sup>Hênikaya r'ojêda, gava wan dengê Xudan Xwedê baxçeda ku diger'îya bihîstin, mêr û jinêva xwe ji ber ç'e'vê Xudan Xwedê, nava darêd baxçeda veşartin. <sup>9</sup>Xudan Xwedê deng da mêr û got: «Tu k'u yî?» <sup>10</sup>Ewî got: «Min dengê te baxçeda bihîst tirsîyam û xwe veşart, çimkî ez te'zî bûm». <sup>11</sup>Hingê Xwedê gotê: «K'ê derheqa te'zîbûna teda ter'a got? Gelo te ji wê darê xwar, ya ku min t'emî dabû te ku nexwî?» <sup>12</sup>Mêr got: «Ew jina ku te da min, ewê ji wê darê da min, min jî xwar». <sup>13</sup>Xudan Xwedê gote k'ulfetê: «Te çima ev yek kirîye?» K'ulfetê got: «Me'r ez xapandim û min xwar».

<sup>14</sup>Hingê Xudan Xwedê gote me'r:

«Bona vê kirina ku te kir,  
ji nava h'emû h'eywanêd k'edî  
û h'emû terewilêd çolê  
nifir' li ser te be,  
li ser zikê xwe bik'îşî  
û t'emamîya e'mirê xweda  
xurê te ax-xwelî be.

<sup>15</sup>Ezê nava te û k'ulfetê,  
nava zur'eta te û zur'eta wêda  
dijminatîyê daynim,  
ewê\* serê te bih'incir'îne  
û tê jî pe'nîya wê\* bigezî».

<sup>16</sup>K'ulfetêr'a jî got:

«Ezê êşa h'emlebûna te  
gelekî li te zêde kim,  
bi êşê zar'a bînî,  
ç'e'vê te li destê mêmê te be  
û ew jî h'ukumê li ser te bike».

<sup>17</sup>Paşê Xwedê gote mêmê:

---

\* 3:15 Zur'et.

«Te ku gur'a jina xwe kir,  
 ji wê dara ku min t'emî dabû,  
 ku te nexwî, xwar,  
 r'ûyê teda nifir' li e'rdê biqebile,  
 t'emamîya r'ojêd e'mirê xweda  
 bi te'lî-tengîyê nanê xwe bixwî».

18 E'rd jî ter'a stirîya  
 û dir'îya bigihîne  
 û p'incar'a çolê bixwî,

19 bi xûdana e'nîya xwe  
 nanê xwe bixwî,  
 h'eta ku tu vege'î li wî e'rdî  
 ji k'u hatî hildanê,  
 çimkî tu ax î  
 û tê dîsa bibî ax.

20 Mêr, awa gotî Adem\*, navê jina xwe danî Hêwa\*\*, çimkî ewa bû dîya h'emû bînberî. 21 Û Xudan Xwedê Adem û jinêr'a k'incêd ç'ermîn çêkirin û li wan kirin. 22 Hingê Xudan Xwedê got: «Va ye, meriv bû mîna ji me yekî, qencî û xirabîyê ji hev derdixe. Lê niha nebe ku ew destê xwe dirêjî dara jîyînê ke jî û h'eta-h'etayê bijî». 23 Pey vê yekêr'a Xudan Xwedê ew ji baxçê Êdênê derxist, wekî wî e'rdî bêcer ke, ji k'îjanî ku hatibû hildanê. 24 Berî meriv da derxist û ji alîyê r'ohilata baxçê Êdênêva, xêrûbî û şûrê agirîyî ku her alîyava divir'virî danîn, wekî r'îya dara jîyînê xwey kin.

### Habîl û Qayîn

**4** Pey vê yekêr'a meriv nêzîkî jina xwe Hêwayê bû, ew h'emle derk'et û Qayîn\* jêr'a bû, hingê wê got: «Min merî ji Xudan stand». 2 Paşê birê wî Habîl bû. Habîl bû şivanê pêz,

\* 3:20 Bi zimanê îbranî «Mêr».

\*\* 3:20 Bi zimanê îbranî «E'mir, Jîyîn».

\* 4:1 Bi zimanê îbranî «Standin».

lê Qayîn xwe dabû e'rdêcerkirinê. <sup>3</sup>Û xêlekê şûnda, Qayîn ji berêd e'rdê Xudan'a h'edî anî. <sup>4</sup>Habîl xwexa jî çend h'eb ji nixurîyêd kerîyê pezê xwe, bezêd wanva h'edî anîn. Xudan berê xwe da Habîl û h'edîya wî, <sup>5</sup>lê dîna xwe neda Qayîn û h'edîya wî. Qayîn gelekî hêrs k'et û mir'ûzê xwe kir. <sup>6</sup>Hingê Xudan Qayîn'r'a got: «Tu çima hêrs k'etîyî? Û te çima serê xwe berjêr kirîye? <sup>7</sup>Heger tu r'astîyê bikî, gelo tê serê xwe bilind nekî? Lê wekî tu r'astîyê nekî va ye gune li ber dêrî k'etîye û xwexa jî h'eyra teda ye, lê bike ku tu h'ukumî li ser bikî».

### Gunê mêrkuştinêyî e'wlin

<sup>8</sup>Pey vê yekêr'a Qayîn birê xwe Habîl'r'a got: «Em her'ine k'ewşên»\* û gava ew gihîştine k'ewşên, Qayîn r'abû gihîşte birê xwe Habîl û ew kuşt. <sup>9</sup>Hingê Xudan ji Qayîn pirsî got: «K'anê ye birê te Habîl?» Ewî got: «Ez nizanîm, çima ez nobedarê birê xwe me?» <sup>10</sup>Xudan gotê: «Te çi kirîye? Dengê xûna birê te ji e'rdê şikîyatê xwe li min dike». <sup>11</sup>Niha nifir' ji wî e'rdî li te be, k'îjanî ku devê xwe vekir xûna birê te ji destê te fir' kir. <sup>12</sup>Gava tu e'rdê bêcer kî, ew îro şûnda îdî k'arê nede te, tu li ser e'rdê r'ih'etîyê nebînî û dero-der bî. <sup>13</sup>Hingê Qayîn gote Xudan: «Ev cezayê min ji qewata min der e. <sup>14</sup>Awa îro ku tu ji r'ûyê e'rdê berî min didî, ezê xwe ji te veşêrim ku r'ûyê te nebînim û li ser e'rdê jî ku zêrîyayî û dero-der bim, hingê k'ê ku min bibîne wê min bikuje». <sup>15</sup>Xudan gotê: «K'ê ku Qayîn bikuje h'eft qet h'eyf jê bê hildanê». Û Xudan nîşanek Qayînva danî, wekî k'î ku r'astî wî bê, wî nekuje.

### R'ik'inyata Qayîn

<sup>16</sup>Qayîn ji ber ç'e'vê Xudan r'abû çû welatê Nodê\*, li alîyê r'ohilata Êdênê û li wir r'ik'inê xwe avîtê û li wir ma.

\* 4:8 «Em her'ine k'ewşên» eva têk'sta îbranîda t'une, lê welger'andina yûnanîye kevinda heye.

\* 4:16 Bi zimanê îbranî «R'ih'etîyê nebînî û dero-der bî».

<sup>17</sup>Pey vê yekêr'a Qayîn nêzîkî jina xwe bû û ew h'emle derk'et, Henox jêr'a bû. Hingê ewî bajarek çê dikir û navê kur'ê xwe Henox danî li ser bajêr. <sup>18</sup>Paşê Henoxr'a Îrad bû, Îradr'a Mih'ûyaêl bû, Mih'ûyaêlr'a Mitûşayêl bû, Mitûşayêlr'a jî Lamex bû. <sup>19</sup>Lamex du jin standin, navê yekê E'dah bû û navê ya din jî Sîlah bû. <sup>20</sup>E'dahê Yaval anî. Eva bavê wan bû, yêd konada diman û şivan-gavantî dikirin. <sup>21</sup>Navê birê wî Yûval bû. Eva jî bavê wan h'emûya bû, yêd ku çeng û bilûrê dixistin. <sup>22</sup>Sîlahê jî Tûval-Qayîn anî, eva h'edadê her cûr'e hacetêd sifir û h'esin bû. Xûşka Tûval-Qayîn jî Nahama bû.

<sup>23</sup>Lamex jinêd xwer'a got:

«E'dah û Sîlah bibihên dengê min!

Jinêd Lamex guhêd xwe bidine vê gotina min.

Merivekî ez birîndar kirim, min lêxist kuşt,  
bona lêdana cahilekî min h'eyf hilda.

<sup>24</sup>Heger h'eyfa Qayîn h'eft qet bê hildanê,

h'eyfa Lamex h'eftê h'eft cara wê bê hildanê».

### Bûyîna Sêt' û Enoş

<sup>25</sup>Adem dîsa nêzîkî jina xwe bû, ewê kur'ek anî û navê wî danî Sêt'\*. Çimkî ewê got: «Xwedê dewsa Habîl ku Qayîn kuşt, zur'eteke din da min». <sup>26</sup>Sêt'r'a jî kur'ek bû û navê wî danî Enoş. Hingêda destpêbû ku gazî navê Xudan kin.

### R'eqema r'ik'inyata Adem

**5** Ev e r'eqema r'ik'inyata Adem, wê r'oje gava Xwedê merî xuliqand, dilqê Xwedêda ew çêkir, <sup>2</sup>ew qisimê mêr û jinêda xuliqandin û dua li wan kir, r'oja xuliqandina wanda navê wan danî Merî. <sup>3</sup>Gava Adem bû sed sî salî, kur'ekî dilqê wîda û mîna wî jêr'a bû ewî navê wî danî Sêt'. <sup>4</sup>Pey bûyîna Sêt'r'a, Adem h'eysid salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a

\* 4:25 Bi zimanê îbranî «P'êşk'êşa Xwedê».

bûn. <sup>5</sup>Û t'emamîya r'ojêd e'mirê xweda, Adem nesid sî salî e'mir kir û mir.

<sup>6</sup>Sêt' jî ku bû sed pênc salî, Enoş jêr'a bû. <sup>7</sup>Pey bûyîna Enoşr'a, Sêt' h'eysid h'eft salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>8</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Sêt' nesid donzdeh salî e'mir kir û mir.

<sup>9</sup>Gava Enoş bû nod salî, Qênan jêr'a bû. <sup>10</sup>Pey bûyîna Qênanr'a, Enoş h'eysid panzdeh salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>11</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Enoş nesid pênc salî e'mir kir û mir.

<sup>12</sup>Gava Qênan bû h'eftê salî, Mahalalêl jêr'a bû. <sup>13</sup>Pey bûyîna Mahalalêlr'a Qênan h'eysid çil salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>14</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Qênan nesid dehe salî e'mir kir û mir.

<sup>15</sup>Gava Mahalalêl bû şêst pênc salî, Yarêd jêr'a bû. <sup>16</sup>Pey bûyîna Yarêdr'a Mahalalêl h'eysid sî salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>17</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Mahalalêl h'eysid nod pênc salî e'mir kir û mir.

<sup>18</sup>Gava Yarêd bû sed şêst du salî, Henox jêr'a bû. <sup>19</sup>Pey bûyîna Henoxr'a Yarêd h'eysid salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>20</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Yarêd nesid şêst du salî e'mir kir û mir.

<sup>21</sup>Gava Henox bû şêst pênc salî, Metûşela jêr'a bû. <sup>22</sup>Pey bûyîna Metûşelar'a Henox sêsid salî r'îya Xwedêda diçû û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>23</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Henox sêsid şêst pênc salî e'mir kir. <sup>24</sup>Henox r'îya Xwedêda diçû û nişkêva bû qatî, çimkî Xwedê ew hildabû.

<sup>25</sup>Gava Metûşela bû sed h'eyştê h'eft salî, Lamex jêr'a bû. <sup>26</sup>Pey bûyîna Lamexr'a, Metûşela h'efsid h'eyştê du salî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>27</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda Metûşela nesid şêst nehe salî e'mir kir û mir.

<sup>28</sup>Gava Lamex bû sed h'eyştê du salî, kur'ek jêr'a bû, <sup>29</sup>ewî navê wî danî Nuh\* û got: «Evê me ji kirêd me û ji cefêd meye

---

\* 5:29 Bi zimanê îbranî «R'ih'etî».

giran li ser vî e'rdî r'ih'et ke, k'îjan ku Xudan nifir' lê kiribû»  
<sup>30</sup>Pey bûyîna Nuhr'a, Lamex pênsid nod pênc salî e'mir kir  
 û gelek kur' û qîz jêr'a bûn. <sup>31</sup>Û t'emamîya r'ojêd xweda La-  
 mex h'efsid h'eftê h'eft salî e'mir kir û mir.

<sup>32</sup>Gava Nuh bû pênsid salî, Nuhr'a Sam, Ham û Yefet bûn.

### Neheqîya zar'êd Xwedê û qîzêd merivayê

**6** Gava destpêbû meriv li ser dinê zêde bûn û qîz wanr'a  
 bûn, <sup>2</sup>zar'êd\* Xwedê dîtin ku qîzêd merivayê bedew in,  
 ji wan k'ê k'îjan begem dikir xwer'a jin distandin. <sup>3</sup>Hingê  
 Xudan got: «Gerekê r'uh'ê min h'eta-h'etayê li ser mêriv  
 nemîne, çimkî ew xûn û goşt e, lê r'ojê e'mirê wan sed bîst  
 sal bin». <sup>4</sup>Wê hingê li ser e'rdê e'save hebûn, usa jî wî çaxî  
 gava zar'êd Xwedê dest davîtine qîzêd merivayê, ewana  
 wanr'a zar' danîn. Evana ew mêrxas bûn, ku berêda bi nav  
 û deng bûn.

### Serhatîya Nuh

<sup>5</sup>Xudan dît ku xirabîya meriva li ser e'rdê zêde dibe û nêt û  
 fikirêd dilê wan jî her r'oj xirabî ye. <sup>6</sup>Hingê Xudan ber xwe  
 k'et ku li ser e'rdê merî xuliqandîye û gelekî dilteng bû. <sup>7</sup>Û  
 Xudan got: «Ez ji ser r'ûyê e'rdê merivêd ku min xuliqandine  
 bidime hildanê, ji merivada girtî h'eta h'eywên, ji şûlikîya  
 h'eta teyredêd e'zmên, çimkî ez p'oşman im li xuliqandina  
 wan». <sup>8</sup>Lê Nuh ber ç'e'vê Xudan k'erem dît.

<sup>9</sup>Ev e serhatîya r'ik'inyata Nuh. Nuh nava merivêd wî  
 zemanîda merivekî r'ast û k'amil bû. Nuh r'îya Xwedêda  
 diçû. <sup>10</sup>Nuhr'a sê kur' bûn Sam, Ham, Yefet.

<sup>11</sup>E'rd li ber ç'e'vê Xwedê h'er'imî wêran bibû û xirabîyava  
 e'rd t'ijî bibû. <sup>12</sup>Xwedê dîna xwe da dinyayê, ku va ye ew  
 h'er'imîye wêran bûye, çimkî her bedeneke li ser dinê r'îya

\* 6:2 Îbo 1:6; 2:1; Zebûra 82:6; Cihûda 1:6.

xwe h'er'imanđiye. <sup>13</sup>Hingê Xwedê gote Nuh: «Qir'a h'emûyêd xweyîbeden hatîye li ber ç'e'vê min, çimkî r'ûyê vanda e'rd xirabîyava t'ijî bûye û va ezê wan t'evî e'rdê wêran kim».

### T'emîya Xwedê

<sup>14</sup>Lê tu xwer'a ji darê gofêr\* gemîkê çêke, hindur'ê gemîyê bi goza çêkî û der û hindur'va tu wê qîr kî. <sup>15</sup>Tu gerekê wê aha çêkî. Dirêjaya gemîyê sêsid zend, berayî pêncî zend û bilindayî jî sî zend be. <sup>16</sup>Û jorva weke zendekê k'ulekê gemîyêr'a çêkî, derê gemîyê jî k'êlekêva vekî û qatê jor jêr û binî çêkî. <sup>17</sup>Va ezê ava tofanê li ser dinê r'akim, wekî her bedena ku bîn li ber heye bin p'er'ê e'zmênda qir' be û li ser r'ûyê e'rdê jî çî ku heye unda be. <sup>18</sup>Lê ezê peymanaf xwe t'evî te girêdim, tu t'evî kur'êd xwe û t'evî jina xwe û bûkêd xwe bik'evî gemîyê. <sup>19</sup>Usa jî ji her bînberî, ji her bedenê cot-cot nêr û mê bikî gemîyê, ku t'evî te sax bimînin. <sup>20</sup>Ji her cûr'e teyrede, ji her cûr'e h'eywan, ji her cûr'e şûlikî wê cot-cot bêne li cem te ku sax bimînin. <sup>21</sup>Tu jî ji h'emû xurekê ku tê xwarinê t'evî xwe hildî, li cem xwe bidî ser hev, ku bibe xurekê te û wan. <sup>22</sup>Û Nuh her tişt kir, Xwedê çawa t'emî dabû wî, ewî usa jî kir.

**7** Xudan gote Nuh: «R'abe t'evî neferêd xwe bik'eve gemîyê, çimkî nava merivêd vî zemanîda min tu li ber xwe r'ast dîtî. <sup>2</sup>Ji her h'eywanêd h'elal h'eft cota nêr û mê t'evî xwe hildî, lê ji h'eywanêd h'eram cot-cot hildî nêr û mê, <sup>3</sup>ji teyredêd e'zmên jî h'eft cot nêr û mê, wekî t'ûr'a\* wan li ser r'ûyê e'rdê bê xweykirinê. <sup>4</sup>Çimkî h'eft r'oja şûnda, ezê çil r'oji û çil şevî baranê bibarînim û her heyînêd ku min çêkirine ji r'ûyê e'rdê bidime hildanê». <sup>5</sup>Û Nuh her tişt kir, Xudan çawa t'emî dabû wî.

\* 6:14 Dareke bînxweþe sorê vekirîyî r'ûnî ye.

\* 7:3 Cisinê wan.

**Tofan**

<sup>6</sup>Hingê Nuh şesid salî bû, gava ava tofanê li ser e'rdê r'abû. <sup>7</sup>Û ji ber ava tofanê Nuh t'evî kur'êd xwe û t'evî jina xwe û bûkêd xwe k'ete gemîyê. <sup>8</sup>Usa jî ji h'eywanêd h'elal û ne h'elal, ji teyreda û ji her şûlikîyêd li ser e'rdê, <sup>9</sup>cot-cot nêr û mê hatine cem Nuh k'etine gemîyê, çawa ku Xwedê t'emî Nuh kiribû. <sup>10</sup>Û h'eft r'oja şûnda ava tofanê li e'rdê r'abû.

<sup>11</sup>Şesid salîya e'mirê Nuhda, r'oja h'ivdehê meha duda, hema wê r'ojêda h'emû kanîyêd tevekêd bêbinîyê der bûn û k'ulekêd e'zmana vebûn, <sup>12</sup>çil r'ojî û çil şevî li ser e'rdê baran barî. <sup>13</sup>Xût wê r'ojêda Nuh kur'êd xweva Sam, Ham, Yefet û jina Nuh her sê bûkava t'evî wan k'etine gemîyê. <sup>14</sup>Ewana û her terewilêd cûr'êd xweda, her h'eywanêd k'edîye cûr'êd xweda, her şûlikîyêd li ser e'rdêye cûr'êd xweda, her teyredêd cûr'êd xweda û her teyredêd xweyîbask, <sup>15</sup>ji h'emû h'eywanêd bînber cot-cot k'etine gemîyê li cem Nuh. <sup>16</sup>Ewêd ku k'etine gemîyê, yê nêr û mê k'etinê ji her bînberî, çawa ku Xwedê t'emî wî kiribû. Û pey wîr'a Xudan derî girt.

<sup>17</sup>Tofanê li ser e'rdê çil r'ojî k'işand, av qayîm bû gemî bilind kir û ew ji e'rdê qetîya. <sup>18</sup>Çiqas diçû av qayîm dibû, li ser e'rdê bilind bû û gemî li ser r'ûyê avê k'et. <sup>19</sup>Av li ser e'rdê usa gelekî bilind bû, wekî h'emû ç'îyayêd bilinde bin p'er'ê e'zmênda nixamtin. <sup>20</sup>Av ji panzdeh zenda jortir ser wan k'et û ç'îya-banî hatine nixamtinê. <sup>21</sup>Û h'emûyêd xweyîbedene ku li ser e'rdê dilivîyan, teyrede bûn, h'eywanêd k'edî bûn, terewil bûn, h'emû şûlikîyêd li ser e'rdê ku dişûlikîn, meriv jî pêr'a qir' bûn çûn. <sup>22</sup>Yêd li ser bejêye ku bîna jîyînê li ber hebûn, h'emû jî xeniqîn. <sup>23</sup>Û her heyînê li r'ûbarî e'rdê hate hildanê, ji mêriv h'eta h'eywanêd k'edî, ji şûlikîya h'eta teyredêd e'zmana, evana ji e'rdê hatine

hildanê, t'enê Nuh ma û yêd t'evî wî gemîyêda. <sup>24</sup>Sed pêncî r'ojî li ser e'rdê av wê bilindayîyê ma.

### Xilazîya tofanê

**8** Xwedê Nuh bîr anî, usa jî h'emû terewil û h'emû h'eywanêd t'evî wî gemîyêda, hingê Xwedê bak\* li e'rdê r'akir û av sekinî. <sup>2</sup>Kanîyêd tevekêd bêbinîyê û k'ulekêd e'zmana hatine girtinê û barana e'zmên hate bir'înê. <sup>3</sup>Bere-bere av ji e'rdê dik'işîya, pey sed pêncî r'ojî'r'a av kêmbû. <sup>4</sup>R'oja h'ivdehê meha h'efta gemî li ser çîyayêd Araratê r'ûnişt. <sup>5</sup>H'eta meha deha çiqas diçû av kêmbû û yekê meha deha serêd çîya hatine k'ifîsê.

<sup>6</sup>Û çil r'ojî şûnda Nuh k'uleka gemîya xweye çêkirî vekir, <sup>7</sup>û qar'qar' ber'da, lê ew virda-wêda xwer'a fir'î h'eta ava li ser e'rdê ziha bû. <sup>8</sup>Peyr'a kevotk ji cem xwe ber'da, ku bibîne k'a ava li r'ûyê e'rdê kêmbûye. <sup>9</sup>Lê kevotk cîyê ku nigêd xwe lê danîya nedît, ber bi gemîyê li ser wîda vege'riya, çimkî t'emamîya r'ûyê e'rdê hê av bû, Nuh jî dest avîte wê girt, anî cem xwe kire gemîyê. <sup>10</sup>H'eft r'oja jî sebir kir, peyr'a dîsa kevotk ji gemîyê ber'da. <sup>11</sup>Berê êvarê kevotk li ser wîda vege'riya, wê belgekî zeyt'ûnêyî nû nikulkirî dêvda, hingê Nuh pê h'esîya ku ava li ser r'ûyê e'rdê kêmbûye. <sup>12</sup>H'eft r'ojêd din jî sebir kir, dîsa kevotk ber'da, lê ew îdî li ser wîda venegerîya.

### Derk'etina ji gemîyê

<sup>13</sup>Û şesid yek salîya Nuha, yekê meha sersalê ava li ser r'ûyê e'rdê ç'ikîya. Nuh ar'îka gemîyê vekir û dîna xwe dayê, ku va ye ava li ser r'ûyê e'rdê ç'ikîya ye. <sup>14</sup>Bîst h'eftê meha duda e'rd ziha bû.

<sup>15</sup>Hingê Xwedê Nuhr'a xeberda û got: <sup>16</sup>«Tu t'evî jina xwe, kur'êd xwe û jinêd wanva ji gemîyê derê. <sup>17</sup>Usa jî h'emû bînberêd li cem te, ji h'emûyêd xweyîbeden: Teyrede,

---

\* 8:1 Eva xebera bi fe'mîna îbranî tê fe'mkirinê çawa «ba» yan «r'uh».

h'eywanêd k'edî û h'emû şûlikîyêd ku li ser e'rdê dişûlikin, t'evî xwe derxe, wekî ew li ser e'rdê bela bin, k'oka wan şîn be û li hev zêde bin». <sup>18</sup>Hingê Nuh t'evî kur'êd xwe, jina xwe û jinêd kur'êd xwe ji gemîyê derk'et, <sup>19</sup>her h'eywan, her şûlikî, her teyrede, her çi ku li ser e'rdê dilivin cisinêd xweda ji gemîyê derk'etin.

### Çêkirina gorîgehaf selê kevirî

<sup>20</sup>Nuh gorîgehek Xudanr'a çêkir û ji her h'eywanêd h'elal û ji her teyredêd h'elal hildan li ser gorîgehê, dîyarîyaf t'evayîşewatê dan. <sup>21</sup>Hingê Xudan bîneke xweş ji wê hilda û dilê xweda got: «Îro şûnda r'ûyê mêrivda ez îdî nifir'a li e'rdê nakim, çimkî sitqê dilê mêriv ji zar'otîyêda xirab e û îdî ez t'u car t'u bînberî naxim çawa min kir.

<sup>22</sup>Îro şûnda h'eta ku e'rd hebe,  
 çandin û dirûn,  
 serma û germayî,  
 havîn û zivistan,  
 şev û r'oj  
 gerekê t'u car nesekinin».

### Peymana t'evî Nuh

**9** Xwedê dua Nuh û kur'êd wî kir got: «Şîn bin, zêde bin û e'rdê t'ijî kin. <sup>2</sup>Saw û tirsaw we jî li ser h'emû terewilêd e'rdê û h'emû teyredêd e'zmên be. Evana bi t'evî wan h'emûyêd li ser e'rdêye dişûlikin û h'emû me'sîyêd be'rêva dane destê we. <sup>3</sup>Her h'eywanêd ku dih'ejin xurekê we be, mîna p'in-car'a şîn gişkî didime we. <sup>4</sup>T'enê goşt saxîyêda, awa gotî xûnêva nexwin. <sup>5</sup>Lê ezê e'se de'wa xûna jîyîna we bikim, ji her terewilî bixwazim. Ezê jîyîna mêriv, ji destê mêriv û ji destê birê wî bixwazim.

<sup>6</sup>K'î ku xûna mêriv bir'êje,  
 xûna wî jî bi destê mêriv bir'ije,  
 çimkî meriv dilqê Xwedêda xuliqandîyê ye.

<sup>7</sup>Hûn şîn bin, zêde bin, li ser e'rdê bela bin û li ser wê li hev zêde bin».

<sup>8</sup>Xwedê gote Nuh û kur'êd wîye ku t'evî wî bûn: <sup>9</sup>«Va ezê t'evî we û pey wer'a jî t'evî zur'eta we peymanaxwe girêdim, <sup>10</sup>usa jî t'evî wan h'emû h'eywanêd bînbere t'evî we: T'evî teyreda, h'eywanêd k'edî û h'emû terewilêd e'rdêye t'evî we, t'evî h'emûyêd ji gemîyê derk'etî û h'emû h'eywanêd e'rdê. <sup>11</sup>Ezê peymanaxwe t'evî we girêdim, wekî îdî t'u beden bi ava tofanê neyê hilatinê û ne jî îdî tofan r'abe ku e'rdê wêran ke». <sup>12</sup>Xwedê got: «Nîşana peymanaxwe Min û weda û nava h'emû h'eywanêd bînbere t'evî we, bona h'emû dewra girêdayî, wê ev be. <sup>13</sup>Ezê k'eskesora xwe e'wrava derxim û evê bibe nîşana peymanaxwe Min û dinyayêda. <sup>14</sup>Gava ez li ser dinyayê e'wrayî kim, k'eskesor e'wrava xuya be, <sup>15</sup>hingê ezê wê peymanaxweye nava min û weda û nava h'emû h'eywanêd bînbere ji her bedenîda bîr bînim û avê îdî nebine tofan û her bedenî unda nekin. <sup>16</sup>Ew k'eskesorê nava e'wrada be, ezê wê bibînim û bîr bînim wê peymanaxwedêye h'eta-h'etayêye, nava her h'eywanêd bînbere ji her bedenî ku li ser e'rdê ye». <sup>17</sup>Xudan Xwedê Nuhr'a got: «Ev e nîşana wê peymanê, ya ku min nava xwe û her bedenî li ser e'rdê girêda».

### Guneyê Ham

<sup>18</sup>Kur'êd Nuhe ku ji gemîyê derk'etin ev bûn: Sam, Ham, Yefet. Û Ham bavê Kenan bû. <sup>19</sup>Ev her sê kur'êd Nuh bûn û ji van li ser t'emamîya r'ûyê e'rdê t'ijî bûn.

<sup>20</sup>Nuh ku e'rdê cerkir bû, ew yê e'wlin bû ku r'ezê tirîya avît. <sup>21</sup>Û paşê şeraba wê vexwar, xwe unda kir û konê xweda xwe te'zî kir. <sup>22</sup>Hamê bavê Kenan, ku bavê xwe te'zî dît, derk'ete derva û gote her du birayêd xwe. <sup>23</sup>Hingê Sam û Yefet k'inc hildan avîtime li ser milê xwe û paşopê çûn te'zîtîya bavê xwe nixamtin. Piştaxwan ku bavê wanda bû, wan te'zîtîya bavê xwe nedît.

<sup>24</sup>Gava Nuh ji bin xewa şeravê derk'et, pê h'esîya ku kur'ê wîyî biç'ûk çî li serê wî kiribû, <sup>25</sup>hingê got:

«Nifir' li Kenan be,  
ew bibe xulamê xulamêd birê xwe».

<sup>26</sup>Dîsa got:

«Şikir ji Xudan, Xwedêyê Sam,  
Kenan jêr'a bibe xulam.

<sup>27</sup>Bira Xwedê t'ûr'a Yefet dirêj ke,  
konêd Samda bimîne  
û Kenan jî jêr'a bibe xulam».

<sup>28</sup>Pey tofanêr'a Nuh sêsid pêncî salî e'mir kir.

<sup>29</sup>T'emamîya e'mirê Nuh bû nesid pêncî salî û mir.

### R'ik'inyata kur'êd Nuh

**10** Ev e serecema r'ik'inyata kur'êd Nuh: Sam, Ham û Yefet. Pey tofanêr'a zar'êd pey wan k'etin.

<sup>2</sup>Kur'êd Yefet: Gomer, Magog, Madayî, Yavan, Tûval, Meşex û Tîras bûn. <sup>3</sup>Kur'êd Gomer: Aşk'enaz, R'îfat' û Togarmah bûn. <sup>4</sup>Kur'êd Yavan: Elîşah, T'arşîş, k'îtîya û r'odanîya bûn. <sup>5</sup>Cime'têd devê be'ra welatêd xweda, ji van cihê bûne, her kes li gora ziman, berek û milletêd xwe.

<sup>6</sup>Kur'êd Ham: K'ûş, Misir, Pût û Kenan bûn. <sup>7</sup>Kur'êd K'ûş: Şiba, H'awîla, Sabt'a, R'amah û Sabt'ixa bûn. Kur'êd R'amah: Şêva û Dêdan bûn. <sup>8</sup>K'ûşr'a usa jî Nemrûd bû. Nemrûd li ser r'ûyê e'rdê p'elehwanê\* pêşin bû. <sup>9</sup>Eva li ber Xudan nêç'îrvanekî p'elehwan bû. Lema jî tê gotinê: «Filan kes mîna Nemrûd nêç'îrvanekî p'elehwan e li ber ç'e'vê Xudan». <sup>10</sup>P'adşatîya Nemrûd welatê Şînarêda, ji Babîlonê, Êrêxê, Ak'adê û K'alnêhda destpêbû. <sup>11</sup>Nemrûd ji wî welatî destê xwe avîte Aşûrya, Nînewa, R'eh'obot-

\* 10:8,9 Zor, serxwe.

Îr û Kalah çêkirin. <sup>12</sup>R'esenê jî navbera Nînewayê û Kalahêda çêkir. Eva bajarekî mezin bû. <sup>13</sup>Ji Misir pêşda hatin lûdî, e'namî, lihabî, naft'ûhî, <sup>14</sup>patrûsî, k'aslûhî (ji van filistinîf pêşda hatin) û k'apt'orî. <sup>15</sup>Kenanr'a nixurîyê wî Sayda û H'ît bûn, <sup>16</sup>usa jî yebûsî, emorîf, gîrgaşî, <sup>17</sup>h'îwî, erqî, sînî, <sup>18</sup>arvadî, simarî û hamatî. Pey vanr'a jî berekêd kenanîya<sup>f</sup> bela bûn. <sup>19</sup>Sînorê kenanî ji Saydayêda destpêdikir, digihîşte Gêrarê h'eta Gazzayê, derbazî Sodomê, Gomorayê, Admayê, Siboyîmê h'eta Leşayê dibû. <sup>20</sup>Ev in Kur'êd Ham li gora berek, ziman, welat û miletêd xweva.

<sup>21</sup>Birayê Yefetî mezin Samr'a jî, ku bavê t'emamîya zur'eta Eber bû, wîr'a jî zar' bûn. <sup>22</sup>Kur'êd Sam: Elam, Aşûr, Arpexşad, Lûd û Aram bûn. <sup>23</sup>Kur'êd Aram: Ês, H'ûl, Get'er û Maş bûn. <sup>24</sup>Arpexşadr'a Şelah bû. Şelahr'a Eber bû. <sup>25</sup>Eberr'a du kur' bûn. Navê yekî Pêlêg\* bû (çimkî r'ojêd wîda r'ûyê e'rdê cihêbûn k'etê). Navê birayê wî jî Yoqtan bû. <sup>26</sup>Yoqtanr'a Almodad, Şelef, H'esermawet', Yarah', <sup>27</sup>Hadoram, Êzal, Dîqla, <sup>28</sup>Obal, Abîmaêl, Şîba, <sup>29</sup>Ofîr, H'awîla û Yovav bûn. Ev h'emû kur'êd Yoqtan bûn. <sup>30</sup>Evana ji Mêşayêda girtî, h'eta Sifarê li ç'îyayêd r'ohilatêda cî-war bûn. <sup>31</sup>Ev in kur'êd Sam li gora berek û zimanêd xwe, welatêd xwe û miletêd xweva.

<sup>32</sup>Ev in berekêd kur'êd Nuh, li gora r'ik'inyatêd xwe û miletêd xweva. Ji van pey tofanêr'a, li ser r'ûyê e'rdê, milet bela bûn.

### Bilindcîya Babîlonê\*

**11** Zimanê t'emamîya dinyayê yek bû û xeberdan jî yek bû. <sup>2</sup>Gava ku k'oç' dikirin ji r'ohilatê diçûn, e'rdê Şînarêda deştekan dîtin û li wir cî-war bûn. <sup>3</sup>Paşê

\* 10:25 Bi zimanê îbranî «Cihêbûn, başqebûn».

\* 11:1 Kela Nemrûd.

hevdu'r'a gotin: «Werin, em k'elpîç'a çêkin û em wan agirda biqelînin». Û bona wan k'elpîç' dewsa kevira bûn û qîr jî dewsa h'er'îyê bû. <sup>4</sup>Hingê gotin: «Werin em bona xwe bajarekî û bilindcîkê çêkin, ku serî bigihîje e'zmên û em xwer'a navekî qazinc kin, ku nebe em li ser t'emamîya t'opa dinê bela bin». <sup>5</sup>Û Xudan peya bû, ku dîna xwe bide wî bajarî û bilindcîyê, k'îjan ku zar'êd merivayê çêdikirin. <sup>6</sup>Hingê Xudan got: «Va ye, evana miletek in û zimanê h'emûya jî yek e. Evana destpêkirine çêdikin û bona van neçetin e çi ku şêwirîne bikin. <sup>7</sup>Werin em peya bin û zimanê wan li wir t'evîhev kin, ku yek zimanê yekî fe'm neke». <sup>8</sup>Û Xudan ew ji wir li ser t'emamîya t'opa dinê bela kirin. Wana dest ji bajêr çêkirinê k'işandin. <sup>9</sup>Lema jî wî cîyîr'a gotin «Babîlon\*» çimkî li wir Xudan zimanê t'emamîya t'opa dinê t'evîhev kir. Û Xudan ew ji wir li ser t'emamîya t'opa dinê bela kirin.

### R'ik'inyata Sam

<sup>10</sup>Ev e serecema r'ik'inyata Sam. Du sala pey tofanêr'a, Sam sedsalî bû, ku Arpexşad jêr'a bû. <sup>11</sup>Sam pey bûyîna Arpexşadr'a, pênsid salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>12</sup>Arpexşad bû sî pênc salî Şelah jêr'a bû. <sup>13</sup>Arpexşad pey bûyîna Şelahr'a, çarsid sê salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>14</sup>Şelah bû sî salî, Eber jêr'a bû. <sup>15</sup>Şelah pey bûyîna Eberr'a, çarsid sê salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>16</sup>Eber bû sî û çar salî, Pêlêg jêr'a bû. <sup>17</sup>Eber Pey bûyîna Pêlêgr'a, çarsid sî salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

\* 11:9 Bi zimanê îbranî «T'evîhevbûn».

<sup>18</sup>Pêlêg bû sî salî, R'êwo jêr'a bû. <sup>19</sup>Pêlêg pey bûyîna R'êwor'a, dusid nehe salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>20</sup>R'êwo bû sî û du salî, Serûx jêr'a bû. <sup>21</sup>R'êwo pey bûyîna Serûxr'a, dusid h'eftê salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>22</sup>Serûx bû sî salî, Nehor jêr'a bû. <sup>23</sup>Serûx pey bûyîna Nehorr'a, dusid salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>24</sup>Nehor bû bîst nehe salî, Têrah jêr'a bû. <sup>25</sup>Nehor pey bûyîna Têrah'r'a, sed nozdeh salî jî e'mir kir û gelek kur' û qîz jêr'a bûn.

<sup>26</sup>Têrah bû h'eftê salî, Abram, Nehor û Haran jêr'a bûn.

### R'ik'inyata Têrah

<sup>27</sup>Ev e serecema r'ik'inyata Têrah. Têrah'r'a Abram, Nehor û Haran bûn. Haran'r'a jî Lût bû. <sup>28</sup>Haran li welatê ku ji dîya xwe bibû, bajarê Ûra k'ildanîyada, berî bavê xwe Têrah mir. <sup>29</sup>Abram û Nehor zewicîn jin standin. Navê jina Abram Sarayî bû û navê jina Nehor Mîlk'a bû. Mîlka û Îsk'a qîzêd Haran bûn. <sup>30</sup>Sarayî bêber bû û zar' nedanîn.

<sup>31</sup>Têrah kur'ê xwe Abram, nevîyê xwe Lûtê kur'ê Haran û bûka xwe Sarayîya jina kur'ê xwe Abram hildan, r'abûn ji bajarê Ûra k'ildanîya çûne berbi welatê kenanîya, ew gihîştine H'aranê û li wir cî-war bûn.

<sup>32</sup>Têrah dusid pênc salî e'mir kir û Têrah H'aranêda mir.

### Abram diçe Kenanêf

**12** Xudan Abram'r'a got: «Ji welatê xwe, ji pismamêd xwe û ji mala bavê xwe biqete r'abe her'e wî e'rdê ku ezê nîşanî te kim. <sup>2</sup>Ezê te bikime miletekî mezin, dua li te bikim, navê te mezin kim û tê bimbarekkirî bî. <sup>3</sup>Yêd ku dua li te bikin, ezê dua li wan bikim û yekî ku te bêhurmet ke, ezê nifir'a li wî bikim. Bi te duayê li h'emû berekêd dinyayê bibe».

<sup>4</sup>Çawa ku Xudan gote Abram ew r'abû r'êk'et, Lût jî t'evî wî r'abû çû. Gava Abram ji H'aranê derk'et, ew h'eftê pênc salî bû. <sup>5</sup>Abram r'abû jina xwe Sarayî, birazîyê xwe Lût,

h'emû hebûka xweye qazinckirî û h'emû nefşê\* xweye H'aranêda hildan ku her'e welatê Kenanêf. Û ew çûne welatê Kenanê. <sup>6</sup>Abram wî welatîr'a derbaz bû, çû h'eta Şixemê, h'eta dara me'zêye\* Moreh. Hingê kenanî li wî welatîda diman. <sup>7</sup>Lê hingê Xudan Abramva xuya bû û gotê: «Ezê vî welatî bidime zur'eta te». Hingê Abram, li wî cîyê ku Xudan wîva xuya bû, gorîgehek çêkir. <sup>8</sup>Abram ji wir çû ç'îyayê alîyê r'ohilata Bêt'-Êlê, konê xwe usa lêxist, ku Bêt'-Êl k'ete r'oavayê, lê E'y k'etibû r'ohilatê. Û li wir Xudanr'a gorîgehek çêkir û gazî navê Xudan kir. <sup>9</sup>Abram bere-bere xwe li Necefêf digirt diçû.

### Abram diçe Misirê

<sup>10</sup>Û li wî welatîda bû xelayî, Abram berjêrî Misirê bû, ku li wir firarî bimîne, çimkî li wî welatîda xelayîke zor bû. <sup>11</sup>Gava ew nêzîkî Misirê bû, jina xwe Sarayîr'a got: «Va ye, ez zanim ku tu jineke berbiç'e've bedew î, <sup>12</sup>gava misirî te bibînin, wê bêjin: «Eva jina wî ye», wê min bikujin û te sax bihêlin. <sup>13</sup>Were vê qencîyê bike, bêje ku tu xûşka min î, wekî bona xatirê te minr'a qencî jê bê û pê te ez sax bimînim». <sup>14</sup>Gava Abram k'ete Misirê, misirîya dîtin ku ew k'ulfeta çiqasê bedew bû. <sup>15</sup>Wezîr-wek'îlêd Firewin jî ew dîtin û pesinê wê ber Firewin dan û Sarayî birine mala Firewin. <sup>16</sup>Ewî bona xatirê Serayîyê qencî li Abram kir û Abram bû xweyê pêz, dêwêr, k'er, xulam, carî, k'erêd mê û deva. <sup>17</sup>Lê bona jina Abram Sarayê, Xudan qezîêd giran anîne serê Firewin û mala wî. <sup>18</sup>Hingê Firewin gazî Abram kir û gotê: «Ev te çi anî li serê min? Te çima minr'a negot, ku eva k'ulfeta te ye? <sup>19</sup>Te bona çi got: «Eva xûşka min e?» Min îdî ew xwer'a çawa jin distand. Lê niha r'abe jina xwe hilde û her'e!» <sup>20</sup>Hingê Firewin t'emîya wî da merivêd xwe, wana Abram û jina wî, hebûka wanva ver'êkirin.

\* 12:5 Xulam.

\* 12:6 Dara xirnûfê.

**Abram û Lût ji hev diqetin**

**13** Abram, t'evî jina xwe û t'emamîya hebûka xweva, Lût jî pêr'a, ji Misirê hevraz çû berbi Necefê. <sup>2</sup>Abram h'eywên, zêr' û zîvava gelekî dewletî bû. <sup>3</sup>Û ew bi firarîyê ji Necefê çû h'eta Bêt'-Êlê, wî cîyê ku berê wî konê xwe li navbera Bêt'-Êlê û E'yêda lê danî bû. <sup>4</sup>K'îderê ku pêşda gorîgeh çêkiribû, Abram li wir gazî navê Xudan kir. <sup>5</sup>Lûtê ku t'evî Abram çûbû, pez, dewar û konêd wî jî hebûn. <sup>6</sup>Lê wî e'rdî t'êra wan nedikir, ku t'evî hev bimana, çimkî hebûka wan usa gelek bû, ku nikaribûn t'evî hev bimana. <sup>7</sup>We hingê şivanêd h'eywanêd Abram û şivanêd h'eywanêd Lût qir'ka hev girtin (wê hingê kenanî û pirîzzî wî welatîda diman).

<sup>8</sup>Abram gote Lût: «T'ewaqa min li te heye, bira li nava min û teda û li nava şivanêd min û şivanêd teda dilmayîn nek'evê, çimkî em bira ne. <sup>9</sup>Va ye, t'emamîya welat li ber te ye. Ez hîvî dikim ji min biqete. Heger tu her'î alîyê ç'epê, ezê her'ime alîyê r'astê, heger tu her'î alîyê r'astê, ezê her'ime alîyê ç'epê». <sup>10</sup>Lût serê xwe bilind kir û dîna xwe dayê t'emamîya deşta Êrdunê ku dihate avdanê, wê hingê hê Xudan Sodom û Gomora wêran ne kiribû, h'eta Soharê ew mîna baxçê Xudan bû û mîna welatê Misirê. <sup>11</sup>Lût t'emamîya deşta Êrdunê xwer'a bijart û k'oç' kir çû alîyê r'ohilatê. Ew aha ji hevdu qetîyan. <sup>12</sup>Abram welatê Kenanêda ma, lê Lût li bajarêd deştêda cîwar bû û konêd xwe h'eta Sodomê lêxistin. <sup>13</sup>Lê binelîyêd Sodomê gelekî xirab û gunek'ar bûn li ber Xudan.

**Çûyîna Abrame Hêbronê**

<sup>14</sup>Gava Lût ji Abram qetîya, Xudan Abramr'a got: «Niha serê xwe bilind ke û ji vî cîyê ku tu lê sekinîyî, li bakur, başûrê û li r'ohilat, r'oavayê binihêr'e, <sup>15</sup>çimkî wî welatê ku tu dibînî, ezê h'eta-h'etayê bidime te û zur'eta te. <sup>16</sup>Ezê zur'eta te bikime weke t'oza e'rdê. Heger yek bikaribe ku

t'ozâ e'rdê bijmire, wê zur'eta te jî bikaribe bijmire. <sup>17</sup>R'abe li ser û binê wî welatî li hev de. Çimkî ezê wî bidime te». <sup>18</sup>Hingê Abram konê xwe hilda çû Hêbronê, nava me'zêd\* Mamrêda cî-war bû û li wir Xudanr'a gorîgehek çêkir.

### Abram Lût ji dîltîyê aza dîke

**14** Hêna Amrafel p'adşê Şînarê, Aryok' p'adşê Elasarê, K'idorlahomer p'adşê Elamê û T'îde'l p'adşê Goîmê, <sup>2</sup>çûne li ber pênc p'adşa, Bera p'adşê Sodomê, Bîrşa p'adşê Gomorayê, Şînav p'adşê Admayê, Şemêver p'adşê Siboyîmê û p'adşê Belayê, awa gotî Soharê'a kirine şer'. <sup>3</sup>Ev her pênc p'adşa li deşta Sîddîmêda civîyan, wî cîyê niha Be'ra Mirî\* lê ye. <sup>4</sup>Evana donzdeh sala bindestê K'idorlahomerda bûn, lê sala sêzdehada serî hildan.

<sup>5</sup>Sala çardehada K'idorlahomer û h'emû p'adşayêd ku t'evî wî hatin E'şterot'-Qarnayîmêda li r'ifayîya, Xamêda li zûzîya, Şavê-Qîryatayîmêda li êmîya xistin, <sup>6</sup>û li serê ç'îyayê wan Sêhîrê li h'orîya xistin, h'eta Êl-Parana devê ber'îyê xistin. <sup>7</sup>Paşê evana vege'îyan hatine E'yn-Mîşpatê, awa gotî Qadêşê, li t'emamîya qeza amalêkîyaf xistin, usa jî li emorîyêd H'asson-T'amarêda diman xistin.

<sup>8</sup>Hingê p'adşê Sodomê, p'adşê Gomorayê, p'adşê Admayê, p'adşê Siboyîmê û p'adşê Belayê, awa gotî Soharê li deşta Sîddîmêda ji van her çar p'adşar'a derk'etine şêr', <sup>9</sup>awa gotî K'idorlahomerê p'adşê Elamê'a, T'îde'l p'adşê Goîmê'a, Amrafelê p'adşê Şînarê'a û Aryokê p'adşê Elasarê'a, çar p'adşatî miqabilî pêncâ. <sup>10</sup>Deşta Sîddîmê bi ç'e'lêd qîrêva t'îjî bûn. Hingê gava r'ev k'ete p'adşêd Sodomê û Gomorayê ew k'etine wan ç'e'la, lê yêd mayîn r'evîne ç'îya. <sup>11</sup>Van her çar p'adşa h'emû hebûk û xurekê Sodom û Gomorayê t'alan kirin

\* 13:18 Darêd xirnûfê.

\* 14:3 Bi zimanê îbranî «Be'ra Xwê» ye.

birin. <sup>12</sup>Usa jî Lûtê birazîyê Birahîm, ku Sodomêda dima, hebûkêva hildan birin.

<sup>13</sup>Hingê yekî r'evîyî xilazbûyî hat û ev caw da Birahîmê îbranî. Birahîm nava me'zêd Mamrêyê emorîda dima (Mamrêyê birayê Eşk'ol û E'nêr). Heleqetîya van û Birahîm hevr'a hebû. <sup>14</sup>Gava Birahîm bihîst ku birazîyê wî dîl hatiye birinê, r'abû sêsîd h'îjdeh xulamêd xweye hînkirî, ku mala wîda li hev zêde bibûn, ç'ek kirin û h'eta Danê p'ê-p'ê pey wan k'etin, <sup>15</sup>ew û xulamêd xweva k'om-k'om bela bûn, şev h'icûmî li ser wan kirin, li wan xistin û h'eta H'obayê li bak'ûra Şamê ew r'aqetandin <sup>16</sup>û h'emû t'alanê birî, birazîyê xwe Lût, hebûka wîva t'evî jin û cime'tê, paşda anîn.

### Melk'î-Sadiq dua li Abram dike

<sup>17</sup>Gava Abram li K'idorlahomer û p'adşêd pêr'a xistin û vege'îya, p'adşê Sodomê li deşta Şavê, awa gotî Deşta P'adşêda, pêşîya wîda çû. <sup>18</sup>Hingê p'adşê Şelîmê Melk'î-Sadiq, nan û şerab dirêj kirê, ew k'ahînê Xwedêyê Jorin bû. <sup>19</sup>Ewî dua li Abram kir û got:

«Bira bimbarek be Abram  
ji alîyê Xwedêyê Jorin,  
xweyê e'rd û e'zmênda,

<sup>20</sup>û şikir ji Xwedêyê Jorinr'a,  
ku dijminêd te dane destê te».

Û Abram ji her tiştî dehek<sup>f</sup> da Melk'î-Sadiq. <sup>21</sup>P'adşê Sodomê gote Abram: «Meriva bide min, lê t'alanê paşda anî ji xwer'a bibe». <sup>22</sup>Abram gote p'adşê Sodomê: «Ez destê xwe ber bi Xudan Xwedêyê Jorin, xweyê e'rd û e'zmên bilind dikim, <sup>23</sup>ku ez ji malê te, ji t'êl h'eta benê çarixekê jî dest navêjimê hîlnadim, ku paşê tu nebêjî: «Min Abram dewlemend kir» <sup>24</sup>pêştirî ji xwarina cahila û p'ara wan merivêd ku t'evî min hatibûn, awa gotî p'ara E'nêr, Eşk'ol û Mamrê, bira ew p'ara xwe jê hildin».

**Peymana Xwedêye t'evî Abram**

**15** Pey van yekar'a, xebera Xudan dîtinokêda Abramr'a hat û got: «Netirse, Abram, ez ji ter'a mert'al im, xelata teyê gelekî mezin be». <sup>2</sup>Hingê Abram got: «Ya Xwey Xudan! Tê çi bidî min? Ezî va bê zur'et mame, serwêrê mala min Êlîyazêrê Şamê ye». <sup>3</sup>Abram dîsa got: «Te ku zur'et neda min, va ye xulamê mala minda bûyî wê dewsa warê min bigire». <sup>4</sup>Û awa xebera Xudan hate wî û got: «Ew dewsa warê te nagire, lê yê ku wê ji bedena te bibe, ewê bibe warê te». <sup>5</sup>Hingê Xudan ew derxiste derva û gotê: «Niha dîna xwe bide e'zmên û steyrka bijmire, heger dikarî bijmirî. Û gotê: «Zur'eta teyê jî wê haqasa be». <sup>6</sup>Abram bawerîya xwe Xudan anî û wî ew yek jêr'a r'astî h'esab kir.

<sup>7</sup>Xudan dîsa gotê: «Ez im ew Xudanê ku tu ji Ûra k'ildanîya derxistî, ku vî welatî çawa cî-war bidime te». <sup>8</sup>Abram got: «Ya Xwey Xudan! Ezê çawa zanibim, ku ezê vî welatî çawa cî-war bistînim?» <sup>9</sup>Xudan gotê: «Bona min nogineke sê salî, bizineke sê salî, beranekî sê salî, fatimokekê û kevotkeke fir'ak'etî bîne». <sup>10</sup>Abram ev h'emû jêr'a anîn û ew nivîda kirine du qetî û her kerîkî wan dane li ber kerîyê wan, lê teyreda qet nekirin. <sup>11</sup>P'er'anîya teyreda xwe dida li ser wan cendeka, lê Abram berî wan dida.

<sup>12</sup>Gava r'o çû awa, xeweke k'ûr k'ete ç'e'vê Abram û awa saweke şever'eşaye te'rî k'ete ser wî. <sup>13</sup>Hingê Xudan gote Abram: «Tu r'ind zanibe, ku zur'eta teyê welatekîda bik'eve xerîbîyê û wê xulamtîyê wanr'a bikin, çarsid salî ewê wan bidine cefê, <sup>14</sup>lê dîwana wî miletê ku wê wan bikine xulam ezê bikim û pey wê yekêr'a ewê bi xêr-xiznê ji wir derên, <sup>15</sup>tê jî bi xêr-xweşî her'î cem kal-bavêd xwe û kalekî r'û-r'eman bêtî defin kirinê. <sup>16</sup>Lê zur'eta teye qur'na çarada wê vege'r'e vir, çimkî k'asa guneyêd emorîya hê t'ijî nebûye».

<sup>17</sup>Û gava r'o çû awa û te'rî k'ete e'rdê, awa dûkî fir'nê û alaveke êgir nava qetêd cendekar'a derbaz bû. <sup>18</sup>Wê r'o jê

Xudan Abram'a peyman girêda û got: «Va ez e'rdê ji ç'emê Misirê h'eta ç'emê mezin, awa gotî Firatê, didime zur'eta te: <sup>19</sup>Welatê qênîya, qînîziya, qadmonîya, <sup>20</sup>h'îtîya, pirîzzîya, r'ifayîya, <sup>21</sup>emoriya, kenanîya, gêrgaşîya û yebûsîya».

### Hacer û Îsmayîl

**16** Lê k'ulfeta Abram, Sarayê, wîr'a zar' ne danîn. Û carîyeke Sarayê misirî hebû, navê wê Hacer bû. <sup>2</sup>Sarayê gote Abram: «Va ye Xudan zar'anîn p'ara min nedaye, awa r'abe her'e cem carîya min, belkî ji wê zar'ê p'ara min bik'evin». Abram gur'a Serayîyê kir. <sup>3</sup>K'ulfeta Abram Sarayê, pey dehe salar'a ku Abram e'mirê xwe li welatê Kenanêda derbaz kir, carîya xweye misirî, Hacer anî kire jina mêrê xwe Abram. <sup>4</sup>Abram serê xwe Hacerêr'a danî û ew pê ma. Ewê ku dît ew pê maye, xanima wê li ber ç'e'va r'eş bû. <sup>5</sup>Hingê Sarayê gote Abram: «Ev qara min gunek'arîya te ye, min carîya xwe kire p'aşila te, lê ewê dît ku ew pê maye, ez li ber ç'e'vê wê r'eş bûm, bira Xudan li ser min û teda binihêr'e». <sup>6</sup>Hingê Abram gote Sarayê: «Va ye carîya te destê teda ye, dilê te çawa dixwaze usa jî bike». Hingê Sarayê îdî r'û neda wê û ew ji Sarayê r'evî çû.

<sup>7</sup>Milyak'etêf Xudan ew çolê li ser kanîkê dît. Kanîya li ser r'îya Şûrê. <sup>8</sup>Û gotê: «Hacer! Carîya Sarayê, tu ji k'u têtî! Tê k'uda her'î?» Ewê got: «Ji xanima xwe Sarayê ez dir'evim». <sup>9</sup>Hingê Milyak'etê Xudan gote wê: «Veger'e cem xanima xwe û xwe li ber wê bişkêne». <sup>10</sup>Û Milyak'etê Xudan dîsa gotê: «Ezê zur'eta te usa gelekî zêde kim, ku ji dest gelekên wê neyê jimarê».

<sup>11</sup>Milyak'etê Xudan gotê:

«Va ye tu duh'ala yî, tê kur'ekî bînî,  
tê navê wî Îsmayîl\* daynî,

\* 16:11 Bi zimanê îbranî «Xwedê dibihê».

çimkî Xudan zelûlîya te bihîst.

<sup>12</sup> Ewê bibe merivekî avî.

Destê wîyê li ber h'emûya r'abe

û destê h'emûya jî li ber wî r'abe.

Û ewê li ber ç'e'vê h'emû birayêd xwe bijî wan aciz ke».

<sup>13</sup> Hingê Hacerê navê wî Xudanî, k'îjanî ku t'evî wê xeber dabû danî: «Tu yî Xwedêyê ku min dibînî», çimkî ewê got: «Min r'ast ew li vir dît û ez dîsa sax mame?» <sup>14</sup> Lema jî wê bîrêr'a Bîr-Lahay-Roî\* tê gotinê. Ew bîr navbera Qadêşê û Beredda ye.

<sup>15</sup> Pey vê yekêr'a Hacerê Abramr'a kur'ek anî û Abram navê wî kur'ê ku ji Hacerê wîr'a bibû danî Îsmayîl. <sup>16</sup> Wî çaxî ku Hacerê Abramr'a Îsmayîl anî, Abram h'eyştê şeş salî bû.

### Sinetî çawa nîşana peymanê<sup>f</sup>

**17** Çaxê Abram nod nehe salî bû, Xudan Abramva xuya bû û gotê: «Ez Xwedêyê Herî Zor\*im, r'îya minda her'e û bêlek'e be. <sup>2</sup> Ezê peyman a xwe nava xwe û teda daynim û gelekî bêh'esab te li hev zêde kim». <sup>3</sup> Abram dever'ûya çû. Xwedê xeberda û got: <sup>4</sup> «Va ye peyman min t'evî te ye: Tê bibî bavê gelek mileta. <sup>5</sup> Îro şûnda navê te ne Abram\* be, lê Birahîm\*\*, çimkî ez te dikime bavê gelek mileta. <sup>6</sup> Ezê te gelekî li hev zêde kim û ji te mileta pêşda bînim, ji nava teda jî p'adşayê derên. <sup>7</sup> Û Ezê peyman a xwe nava xwe û teda û pey ter'a jî nava zur'eta te û qur'nêd wanda daynim, çawa peyman a h'eta-h'etayê, ezê Xwedêyê te bim û pey ter'a jî Xwedêyê zur'eta te bim. <sup>8</sup> ezê vî welatê ku tu têda xerîbîyêda

\* 16:14 Bi zimanê îbranî: «Bîra Yê Sax ku Min Dibîne».

\* 17:1 «Herî Zor» bi zimanê îbranî «Şaddayî» ku car-cara welger'andina yûnanîye kevinda aha hatîye t'ercimekirinê.

\* 17:5 Bi zimanê îbranî «Bavê mezin».

\*\* 17:5 Bi zimanê îbranî «Bavê mixulqeta mileta».

yî bidime te û pey ter'a jî bidime zur'eta te, t'emamîya welatê Kenanê çawa milkê h'eta-h'etayê û bibime Xwedêyê wan».

<sup>9</sup>Û Xwedê gote Bira hîm: «Lê tu peymanana min xwey ke, tu û zur'eta teye li pey ter'a jî qur'nêd xweda peymanana min xwey kin. <sup>10</sup>Ev e ew peymanana Min, k'îjanê ku hûn gerekê nava min û xweda û pey ter'a jî nava zur'eta teda bê xweykirinê: Her zar'ê weyî nêrîn bê sinetkirinê. <sup>11</sup>Hûn ji qalibê xweyî bêsinet werine sinetkirinê, evê bibe nîşana peymanana nava min û weda. <sup>12</sup>Bira her zar'ê nêrîn nava weda qur'nêd xweda, h'eystr'ojîyêda bê sinetkirinê, heger ew ji xulamê mala te bûyî be, yan ji h'emû miletêd xerîbe ne ji zur'eta te bi p'era k'ir'î be. <sup>13</sup>Ewê ji xulamê mala te bûyî û yê ku te bi p'erê xwe k'ir'î, e'se gerekê bêne sinetkirinê û li ser qalibê we ev peymanana min bibe peymanana h'eta-h'etayê. <sup>14</sup>Her zar'ê nêrîn bêsinet, k'îjan ku neyê sinetkirinê, gerekê ew ji nava cime'ta xwe bê hilatinê, çimkî ewî peymanana min t'er'iband».

### Sozdayîna bona bûyîna Îshaq

<sup>15</sup>Pey vê gotinêr'a Xwedê gote Bira hîm: «K'ulfeta xwe Sarayêr'a nebêjî Saray, lê navê wê Serayî\* be. <sup>16</sup>Ezê dua li wê bikim û ji wê jî kur'ekî bidime te, duayê minê li wê be û miletê ji wê pêşda bîn û p'adşêd mileta jî wê jê derên». <sup>17</sup>Bira hîm dever'ûya çû e'rdê, k'enîya û dilê xweda got: «Gelo zar'ê pey mêrê sed salî k'eve? Û Serayê nod salîyêda zar'a bîne?» <sup>18</sup>Hingê Bira hîm gote Xwedê: «Ax xwezî hema Îsmayîl li ber ç'e'vê te e'mir kira!» <sup>19</sup>Û Xwedê gotê: «Belê! Hema xût jina te Serayê kur'ekî ter'a bîne û tê navê wî Îshaq\* daynî, ezê t'evî wî û pey wîr'a jî t'evî zur'eta wî peymanê girêdim, peymanana h'eta-h'etayê. <sup>20</sup>Bona Îsmayîl jî min dengê te bihîst. Va ez dua wî jî dikim û ezê wî şîn kim û gelekî li hev zêde

\* 17:15 Bi zimanê îbranî «Xanim, Xatûn, Stî».

\* 17:19 Bi zimanê îbranî «Ew dik'ene».

kim. Wê donzdeh mîrê ji wî derên û ezê wî bikime miletekî mezin. <sup>21</sup>Lê peyman a xwe ezê t'evî Îshaqê ku Serayê ter'a bîne girêdim saleke din vî çaxî». <sup>22</sup>Xwedê ku xeberdana xweye t'evî Birahîm xilaz kir, ji cem wî hilate jor.

<sup>23</sup>Birahîm hilda kur'ê xwe Îsmayîl û h'emûyêd ku mala wîda dinê k'etibûn û yêd ku p'eretî hatibûne k'ir'înê, hema wê r'ojê, çawa ku Xwedê gotibûyê, h'emû qîsimê nêrînî mala xweda ye bêsinet, sinet kirin. <sup>24</sup>Gava Birahîm ji nesinetîya xwe hate sinetkirinê, ew hingê nod nehe salî bû. <sup>25</sup>Îsmayîlê kur'ê wî sêzdeh salî bû, gava ew ji nesinetîya xwe hate sinetkirinê. <sup>26</sup>Birahîm û kur'ê xwe Îsmayîlva hema wê r'ojê hatine sinetkirinê. <sup>27</sup>H'emû qîsimêd nêrînî mala wîda, yêd ku mala wîda dinê k'etibûn û yêd ku p'eretî ji xerîba hatibûne k'ir'înê, t'evî wî hatine sinetkirinê.

### Sê mêvanê Birahîm

**18** Xudan nava darêd Mamrêye me'zêda wîva xuya bû, gava ew germaya r'ojêda li ber derê kon r'ûniştibû. <sup>2</sup>Ewî serê xwe bilind kir, dîna xwe dayê, va ye sê mêr pêşberî wî sekinîne. Gava ew dîtîn, ji ber derê kon bi r'ev çû pêşîya wan û h'eta e'rdê li ber wan dever'ûya çû, <sup>3</sup>û got: «Xweyê min! Heger min li ber ç'e'vêd te k'erem dît, hîvî dikim li ser mala xulamê xwer'a derbaz nebe, <sup>4</sup>bira hinek av bînin, nigêd xwe bişon û bin darêda r'ih'et bin, <sup>5</sup>ez pe'rî nan bînim hûn qinyatekê bikin, paşê r'îya xweda her'in, çîmkî hûn ku hatine cem xulamê xwe». Hingê wan got: «Te çawa got, usa jî bike». <sup>6</sup>Birahîm lezande berbi kon, xwe Serayêr'a gîhand û gotê: «Zû bike sê warbêj arê xas bistirê, nan lêxe». <sup>7</sup>Birahîm xwexa jî lez berbi h'eywên çû, golikeke h'ilîye r'ind girt da xulamekî, ewî jî ew zû hazir kir. <sup>8</sup>Û Birahîm r'ûnê nivîşkî, şîr û goştê golika h'ilîye hazirkirî da ber wan û wan xwar, ew xwexa jî bin darêda cem wan ma.

<sup>9</sup>Hingê gotine Birahîm: «K'anêye Seraya jina te?» Ewî got: «Ew va ye konda ye». <sup>10</sup>Û yekî ji wan got: «Saleke din vî çaxî

ezê dîsa li ser teda bêm û kur'ekî Seraya jina te wê hebe». Lê Serayê li ber derê kon, pişt wîva dibihîst. <sup>11</sup>Birahîm û Serayî kal pîr bibûn û r'ojêd xwe derbaz kiribûn, Serayî jî îdî ji kirasa hatibû bir'înê. <sup>12</sup>Hingê Serayî li ber xweda k'enîya û got: «Vê mezinaya xweda ezê çî xwe şa bim, ku xweyê min jî îdî yekî kal e?» <sup>13</sup>Xudan gote Birahîm: «Çima Serayî k'enîya û got: «Gelo r'astî ezê vê mezinaya xweda zar'a bînim, ku ez îdî pîr bûme?» <sup>14</sup>Gelo tiştêkî çetin bona Xudan heye? Vî we'deyê k'ifşkirîda, saleke din vî çaxî ezê li ser teda bêm û kur'ekî Serayê wê hebe». <sup>15</sup>Hingê Serayê ji tirsîna înk'ar kir û got: «Na, ez ne k'enîyame». Lê Xudan gotê: «Na, tu k'enîyayî».

### **Birahîm bona Sodomê dik'eve bin e'nena û lava dike**

<sup>16</sup>Ew merî ji wir r'abûn, wana berê xwe da Sodomê, Birahîm jî t'evî wan r'êk'et, ku wan ver'êke. <sup>17</sup>Hingê Xudan got: «Gelo ezê wî tiştê ku ezê bikim ji Birahîm veşêrim? <sup>18</sup>Ne belê Birahîmê e'se bibe miletêkî mezin û zor. Û bi wî dua wê t'emamîya miletê li ser dinyayê bibe. <sup>19</sup>Çimkî min ew bona wê yekê bijart, wekî ew t'emîyê bide kur'êd xwe û pey xwer'a jî mala xwe, ku ew r'îya Xudanda her'in, r'astîyê û heqîyê bikin, wekî Xudan çî ku Birahîmr'a soz daye bîne sêrî». <sup>20</sup>Xudan got: «Çimkî qar'e-qar'a Sodom û Gomorayê zêde bûne û gunêd wan gelekî giran bûne, <sup>21</sup>ezê niha peya bim dîna xwe bidimê, k'a ew r'ast weke wê qar'e-qar'a xirabîyêd wane ku gihîştine min dikin, heger na, ku ez zanibim».

<sup>22</sup>Ew merivana ji wir vege'îyan, çûne berbi Sodomê. Lê Birahîm hê li ber Xudan sekinî mabû. <sup>23</sup>Paşê Birahîm nêzîk bû û got: «Gelo t'evî neqenca tê r'asta jî unda kî? <sup>24</sup>Belkî wî bajarîda pêncî kesêd r'ast hebin? Gelo tê wî cîyî unda kî û nedî xatirê wan pêncî kesêd r'aste ku wê derê ne? <sup>25</sup>Haşa ji te ku tu vê yekê bikî, wekî tu r'asta t'evî neqenca unda kî, yan jî usa bîni serê r'asta, çawa serê neqenca, haşa ji te! Ev yek nabe ku h'akimê t'emamîya dinyayê dîwana r'ast

neke?» <sup>26</sup>Xudan gotê: «Heger ez Sodomêda pêncî kesêd r'ast bibînim, ezê t'emamîya wî cîyî bidime xatirê wan». <sup>27</sup>Birahîm lê vege'and û got: «Ez ku t'oz û k'ozî me, min turuş kir Xweyîr'a xeberda: <sup>28</sup>Belkî ji pêncî kesêd r'ast pênc kêmbin, hingê tê t'emamîya bajêr wêran kî, bona pênc?» Xudan got: «Heger li wê derê çil pênc kes hebin, ez wêran nekim». <sup>29</sup>Birahîm careke din pirsî û got: «Belkî li wê derê çil kes hebin?» Xudan got: «Bona çilî jî ez wê yekê nekim». <sup>30</sup>Birahîm got: «Lê belê bira Xweyê min li ser xeberdana min hêrs nek'eve: Belkî li wê derê sî kes hebin?» Xudan gotê: «Heger li wê derê sî kes hebin, ez wê yekê nekim». <sup>31</sup>Birahîm got: «Va ye min turuş kir Xweyîr'a xeberda: Belkî li wê derê bîst kes hebin?» Xudan gotê: «Bona xatirê bîst kesî jî ez wêran nekim». <sup>32</sup>Hingê Birahîm dîsa got: «Lê belê bira Xweyê min hêrs nek'eve ezê vê carê jî bipirsim: Belkî li wê derê dehe kes hebin?» Xudan gotê: «Bona xatirê dehe kesî jî ezê wêran nekim». <sup>33</sup>Û Xudan li pey xeberdana t'evî Birahîmr'a çû, Birahîm jî vege'îya cîyê xwe.

### Bela Sodomê

**19** Ew her du milyak'et<sup>f</sup> berê êvarê çûne Sodomê. Lût li ber dergehê Sodomê r'ûniştibû. Lût ku ç'e'v wan k'et, r'abû çû pêşîya wan û h'eta e'rdê dever'ûya çû <sup>2</sup>got: «Belê xweyêd min! K'erem kine li mala xulamê xwe, şeva xwe derbaz kin, nigêd xwe bişon û sibehê zû r'abin r'îya xweda her'in». Lê wan got: «Na, emê şeva xwe li derva derbaz kin». <sup>3</sup>Lût bi lava-dîleka zor li wan kir, ew li ser wîda vege'îyan çûne mala wî. Ewî sifire wanr'a danî, nanê şkeva lêxist û xwarin. <sup>4</sup>Lê hê nek'etibûne nava cî-nivîna, mêmêd bajêr, awa gotî mêmêd sodomîya ji ç'ûka h'eta mezina, t'emamîya cime'tê her alîyava dora malê girtin. <sup>5</sup>Gazî Lût kirin û gotinê: «K'anêne ew mêmêd ku vê êvarê hatine mala te? Wan derxe bide me, ku em dest bavêjine doxîna wan». <sup>6</sup>Lût dêrîva derk'et û derî li pey xwe girt, <sup>7</sup>wanr'a got: «Gelî bira, hîvî

dikim, neheqîyê nekin. <sup>8</sup>Vane du qîzêd mine bik'ir hene, ez wan derxim bidime we, dilê we çawa dixwaze usa t'evî wan derbaz kin, lê t'enê dest nedine van meriva, çimkî van xwe dane li bin sîya banê min». <sup>9</sup>Lê wana got: «Bice'me!» Û gotin: «Hela vî xerîbî ku dixwaze dîwanê jî bike? Emê niha ji serê van xirabtir li serê te bikin». Û hevr'a-hevr'a hatine vî merivî, awa gotî Lût. Û kirin ku dêrî bişkênin. <sup>10</sup>Lê wan merivêd mêvan dest avîtine Lût k'aşî malê li cem xwe kirin û derî girtin. <sup>11</sup>Wana lêxist ew merivêd li ber dêrî sekinî, ji ç'ûka h'eta mezina kor kirin, usa ku ewana haqasî derî ger'îyan westîyan.

<sup>12</sup>Hingê wan meriva gotine Lût: «Îdî k'î te li vir heye? Ze'vêd te bin, kur'êd te bin, qîzêd te bin û bajêrda k'î te hebe, h'emûya jî ji vî cîyî derxe. <sup>13</sup>Emê vî cîyî wêran kin, çimkî qar'e-qar'a xirabîyêd wan li ser Xudan giran bûne û Xudan em şandine ku em vê wêran kin». <sup>14</sup>Lût derk'et çû ze'vêd xwer'a, awa gotî dergîstîyêd qîzêd xwer'a got: «R'abin ji vî cîyî derên, çimkî Xudanê vî bajarî wêran ke». Lê ze'vêd wî t'irê ew h'eneka dike.

<sup>15</sup>Gava sibeh zelal bû, milyak'eta Lût lez xistin û gotinê: «R'abe bilezîne, jina xwe û her du qîzêd li cem xwe hilde, wekî t'evî neheqîya bajêr unda nebî». <sup>16</sup>Lût ku nigêd xwe paşda davît, wan meriva destê Lût, jinê, qîzava girtin, bi r'e'ma Xudane ku li wan kir, ew ji bajêr derxistine der û hiştin. <sup>17</sup>Û gava ew derxistine der, yekî ji wan got: «Bir'eve xwe xilaz ke, li pey xwe nenihêr'î û vê deştêda jî t'u cîyî nesekinî. Bir'eve serê ç'îya, nebe ku unda bî!» <sup>18</sup>Hingê Lût gote wan: «Na, xweyê min! K'ereme bike! <sup>19</sup>Awa ku xulamê te li ber ç'e'vêd te k'erem dîtîye û te ew qencîya xweye mezin hindava minda da k'ifşê, e'mirê min xilaz kir. Lê ez nikarim bir'evime ç'îya, ku ew bela negihîje min û nemirim. <sup>20</sup>Va ye ev gundê han nêzîk û biç'ûk e. Bi îzina te ez bir'evime wir ku e'mirê min xilaz be, çimkî

ew gundekî biç'ûk e». <sup>21</sup>Û Ewî gote wî: «Awa ezê vê xwestina te jî bikim, ew gundê bona k'îjanî te got, serobinêhev nakim. <sup>22</sup>De bilezîne bir'eve wir, çimkî h'eta ku tu negihîjî wir, ez nikarim tişteki bikim». Lema jî navê wî gundî Sohar\* hate danîne.

<sup>23</sup>Te'vê li ser e'rdê p'enc dida, Lût xwe Soharê'a gîhand. <sup>24</sup>Hingê Xudan li ser Sodom û Gomorayêda k'irk'ûtf û agir jorda ji Xudanda barand, <sup>25</sup>û ew bajar û t'emamîya dor-berêd wan, h'emû binelîyêd wan bajara û tiştêd li ser e'rdê şînbûyî qir' kir û serobinêhev kir. <sup>26</sup>Lê jina Lût piştêva li pey xwe nihêr'î û bû h'eykelekî xwê.

<sup>27</sup>Birahîm sibehê zû r'abû çû wî cîyê ku li ber Xudan sekinîbû. <sup>28</sup>Ewî dîna xwe da li alîyê Sodom û Gomorayê û li t'emamîya dor-berêd wan nihêr'î, dît ku wê ji wî e'rdî dûkî mîna dûyê k'ûra êgir derdik'et. <sup>29</sup>Û çaxê ku Xwedê bajarêd wê deştê wê wêran kirana, Birahîm hate bîra Xwedê. Gava wê ew bajarêd ku Lût têda dima wêran kira, Lût ji wê xezebê xilaz kir.

### Lût û qîzêd wî

<sup>30</sup>Lût tirsîya ku Zoarê bimîne, ew t'evî her du qîzêd xwe ji Soharê derk'etin, r'abûne ç'îyê û li şkeftekêda hêwirîn. <sup>31</sup>R'ojekê qîza mezin gote ya biç'ûk: «Bavê me kal bûye û li vî e'rdî jî mêr t'unene ku mîna e'detê dinê nêzîkî me bin. <sup>32</sup>Were em bavê xwe şerabê bidine vexwarinê û serê xwe wîr'a daynin, ji bavê xwe bedena xwe şîn kin». <sup>33</sup>Wê şevê bavê xwe şerab dane vexwarinê, ya mezin çû serê xwe bavê xwer'a danî, lê bav p'aldan-r'abûna wê pê neh'esîya. <sup>34</sup>R'oja din qîza mezin gote ya biç'ûk: «Va ye min duhu serê xwe bavê xwer'a

\* 19:22 Bi zimanê îbranî «Biç'ûk».

danîye, were vê şevê jî em şeravê wî bidine vexwarinê, tu her'e serê xwe wîr'a dayne û em ji bavê xwe bedena xwe şîn kin». <sup>35</sup>Wê şevê jî bavê xwe şerab dane vexwarinê û qîza biç'ûk r'abû serê xwe wîr'a danî, lê bav p'aldan-r'abûna wê pê neh'esîya. <sup>36</sup>Bi vî awayî her du qîzêd Lût ji bavê xwe pê man. <sup>37</sup>Qîza mezin kur'ek anî û navê wî Mowab\* danî. Eva h'eta îro jî bavê mowabîya ye. <sup>38</sup>Qîza biç'ûk jî kur'ek anî û navê wî Ben-E'mmî\* danî. Eva h'eta îro jî bavê amonîyaf ye.

### Birahîm û Abîmelex

**20** Birahîm ji wê derê k'oç' kir çû ber bi Necefêf, li navbera Qadêşê û Şûrêda ma û Gêrarêda firarî derbaz kir <sup>2</sup>Li wê derê Birahîm bona jina xwe Serayê got: «Eva xûşka min e». P'adşê Gêrarê Abîmelex şand Serayî ji xwer'a anî. <sup>3</sup>Lê Xwedê şev hate xewna Abîmelex û gotê: «Va tê bona wê k'ulfeta ku te anî, tê bimirî, çimkî mêrê wê heye». <sup>4</sup>Abîmelex hê dest nedabûyê û got: «Ya Xweyê min, gelo tê k'oka miletê bêşûc bînî? <sup>5</sup>Evî ne got: «Eva xûşka min e?» Û evê jî got: «Eva birayê min e». Ev yek min bi dilê sax û destê paqij kir». <sup>6</sup>Û Xwedê xewnêda wîr'a got: «Minva e'yan e, ku te ev yek bi dilê xweyî sax kir, lema jî min tu ji wî guneyê ku teyê li ber ç'e'vê min bikira xweyî kirî û nehişt ku tu dest bidî wê. <sup>7</sup>Niha jinê veger'îne bide mêrê wê, çimkî ew p'êxember<sup>f</sup> e û ewê bona te dua bike, tê bijîyî. Lê heger tu wê veneger'înî, zanibe ku tu û h'emûyêd teyê e'se bimirin». <sup>8</sup>Abîmelex sibehê zû r'abû, gazî h'emû berdestîyêd xwe kirin û her tişt wan'r'a gilî kir, ev merivana gelekî tirsîyan. <sup>9</sup>Hingê Abîmelex gazî Birahîm kir û gotê: «Ev te çi anî li serê me? Min hindava teda çi neheqî kiribû, ku te gunekî

\* 19:37 Bi zimanê îbranî «Ji bavê».

\* 19:38 Bi zimanê îbranî «Kur'ê miletê min» (Kur'ê ji olk'a mala bavê min).

mezin li ser min û p'adşatîya minda anî? Te hindava minda tiştê nebûyî kir». <sup>10</sup>Û Abîmelex gote Birahîm: «Te çi r'ê têt'a dît, ku te ev tişt kir?» <sup>11</sup>Birahîm got: «Çi r'ast e, ez fikirîm min got: «Li vê derê xofa Xwedê t'une, wê r'ûyê jina minda min bikujin». <sup>12</sup>Ya duda jî eva r'astî xûşka min e, em ji bavê ne lê ne ji dêne, min ew standîye. <sup>13</sup>Çaxê Xwedê ez ji mala bavê xwe derxistime xerîbîyê, min gote wê: «Vê qencîyê minr'a bike, her cîyê ku emê her'inê, bona min bêje, ku eva birayê min e»».

<sup>14</sup>Hingê Abîmelex r'abû, pez û dewar, xulam û carî anîn dane Birahîm û jina wî Serayî jî lê vege'and. <sup>15</sup>Usa jî Abîmelex gote Birahîm: «Va ye welatê min li ber te ye, k'îderê dixwazî li wir jî bimîne». <sup>16</sup>Serayê'r'a jî got: «Va ez h'ezar zîvî didime birayê te, ku ev yek li ber ç'e'vê h'emûyêd t'evî te bibe xêlîya nav-namûsîyê û r'ûspîtîya li ber h'emûya». <sup>17</sup>Hingê Birahîm li ber Xwedê dua kir û Xwedê Abîmelex, jina wî û carîyêd wî qenc kirin û zar'ok anîn. <sup>18</sup>Çimkî Xudan r'ûyê jina Birahîm Serayêda, bet'inê h'emû k'ulfetêd mala Abîmelexda dada bû.

### Bûyîna Îshaq

**21** Xudan serîk li Serayê xist, çawa ku gotibû û sozê bona Serayê dabû anî sêrî. <sup>2</sup>Serayî h'emle derk'et, Birahîmr'a wê mezinaya wîda kur'ek anî, wî we'deyîda ku Xwedê jê'r'a gotibû. <sup>3</sup>Birahîm navê wî kur'ê xweyî ku Serayê jê'r'a anî, Îshaq\* danî. <sup>4</sup>Û Birahîm çawa ku Xwedê t'emî wî kiribû, kur'ê xwe Îshaq r'oja h'eysta sinet kir. <sup>5</sup>Birahîm sed salî bû, gava kur'ê wî Îshaq jê'r'a bû. <sup>6</sup>Hingê Serayê got: «Xwedê ez dame k'enandinê, k'îjanêd ku bona min bibihên, ewê jî t'evî min bik'enin». <sup>7</sup>Usa

\* 21:3 Bi zimanê îbranîf «Ew dik'ene».

jî got: «Qet k'ê wê bigota Birahîm: «Serayî wê dergûşêd kur'în bimêjîne?» Çimkî min mezinaya wîda wîr'a kur'anî». <sup>8</sup>Kur'ik mezin bû, ji şîr hate bir'înê, Birahîm wê r'oja ku Îshaq ji şîr hate bir'înê, mesrefeke mezin danî.

### Derxistina Hacerê û Îsmayîl

<sup>9</sup>Serayê dîna xwe dayê, wekî ew kur'ê Hacera misirî, yê ku wê Birahîmr'a anîbû, qerfê xwe Îshaq dike, <sup>10</sup>gote Birahîm: «Berî vê carîyê û kur'ê wê de, çimkî kur'ê vê carîyê gerekê t'evî kur'ê min Îshaq war nestîne». <sup>11</sup>Ev gotina hindava kur'ê wî Îsmayîlda, gelekî giran li ser Birahîm r'ûnişt. <sup>12</sup>Lê Xwedê gote Birahîm: «Bira ew gotina bona kur'ikê te û carîya te li ser te giran r'ûnenî, çi ku Serayê ter'a gotîye guhdarîya gotina wê bike, çimkî zur'eta teyê Îshaqda bê navkirinê. <sup>13</sup>Ezê kur'ê carîyê jî bikime miletekî, çimkî ew jî zur'eta te ye». <sup>14</sup>Birahîm sibehê zû r'abû, nan û meşke av hilda da Hacerê, da li ser milê wê, kur'ik jî pêr'a derxist. Hacer çû gihîşte çol-besta Bîr-Şêva, r'ê-dirb unda kirin.

<sup>15</sup>Ava meşkada xilaz bû, ewê kur'ik binê çalûkêda hişt <sup>16</sup>û çû weke dûraya tîravîtinekê, pêşberî wî dûr r'ûnişt û got: «Ez mirina kur'ik nebînim». Û ewa pêşberî wî r'ûnişt, zarîn kir û girîya. <sup>17</sup>Hingê Xwedê dengê kur'ik bihîst, milyak'etê Xwedê ji e'zmên deng da Hacerê û got: «Çi bûye Hacer? Netirse! Xwedê dengê kur'ik ji wî cîyî bihîst. <sup>18</sup>Niha r'abe, destê kur'ik bigire r'ake, çimkî ezê wî bikime miletekî mezin». <sup>19</sup>Hingê Xwedê ç'e'vê Hacerê vekirin, ewê bîreke avê dît û çû meşk av dagirt, kur'ik da vexwarinê.

<sup>20</sup>Xwedê t'evî kur'ik bû, ew mezin bû, çol-bestada ma û bû tîrkevan. <sup>21</sup>Ber'îya Paranêda ma û dîya wî qîzeke ji Misirê jêr'a xwest.

### Ad-qirara Birahîm û Abîmelex

<sup>22</sup>Û wê hingê Abîmelex û serekeskerêd wî Pîxol, Birahîmr'a gotin: «Xwedê her tiştîda t'evî te ye, çi

ku tu dikî. <sup>23</sup>Niha li vê derê destê minda pê Xwedê sond bixwe, wekî tê bêbextîyê li min, kur'ê min û zur'eta min nekî, lê bidî xatirê wê aminîya mine hindava xweda, tu min û vî welatîr'a bikî, k'îjanîda ku tu xerîbî dimînî». <sup>24</sup>Birahîm got: «Ez sond dixwim». <sup>25</sup>Lê Birahîm bona bîrekê da r'ûyê Abîmelex, ya ku xulamêd wî bi zorbetîyê zeft kiribûn. <sup>26</sup>Abîmelex got: «Ez haş pê t'unebûnê k'ê ew yek kirîye, te jî t'u tişt minr'a negotîye û h'eta r'oja îro jî min nebihîstibû». <sup>27</sup>Birahîm pez û dewar anîn dane Abîmelex û her duya jî hevr'a peyman girêdan. <sup>28</sup>Birahîm ji kerê pêz h'eft berxêd mê veqetand başqe kirin. <sup>29</sup>Abîmelex ji Birahîm pirsî: «Ev her h'eft berxêd mêye ku te veqetand başqe kirin, çi tê h'esabê?» <sup>30</sup>Birahîm gotê: «Gerekê tu van her h'eft berxêd mê ji destê min bigirî, wekî bibine şe'dêd min, ku min ev bîr k'ola ye». <sup>31</sup>Lema jî navê wî cîyî danî Bîr-Şêva\*, çimkî her duya jî li wir sond xwarin. <sup>32</sup>Wana Bîr-Şêvayêda ad-qîrar kirin. Abîmelex û serekeskerêd wî Pîxol r'abûn veger'îyan welatê Filistînê. <sup>33</sup>Birahîm li ber bîra Bîr-Şêvayê dareke kenarê daç'ikand û li wê derê gazî navê Xudan, Xwedêyê H'eta-h'etayê kir. <sup>34</sup>Birahîm wextekî dirêj li welatê filistînîyêda xerîbîyêda ma.

### Cêr'ibandina Birahîm

**22** Pey van yekar'a, Xwedê Birahîm cêr'iband û got: «Birahîmo!» Birahîm got: «Lebê, ezî va me». <sup>2</sup>Xwedê gotê: «Niha r'abe kur'ê xweyî tayê t'enêyî delal Îshaq hilde û her'e welatê Morîyayê, li wê derê li serê ç'îyakî, k'îjanî ezê ter'a bêjim, bike dîyarîyaf t'evayîşewatê». <sup>3</sup>Birahîm sibehê zû r'abû, bona dîyarîya

\* 21:31 Bi zimanê îbranî «Bîra sondê» yan «Bîra her h'efta».

t'evayîşewatê dar şkênandin, t'êr'a k'erê xwe girêda, t'evî xwe du xulam û kur'ê xwe Îshaq hildan, r'abû çû wî cîyê ku Xwedê gotibûyê. <sup>4</sup>R'oja sisîya Birahîm serê xwe bilind kir, dûrva ew cî dît. <sup>5</sup>Û hingê Birahîm gote xulamêd xwe: «Hûn k'erêva li vir bimînin, ez û kur'ikva h'eta dera han her'in, h'ebandina xwe bikin û dîsa li ser weda vege'rin». <sup>6</sup>Birahîm qirşê dîyarîya t'evayîşewatê hilda, da pişt kur'ê xwe Îshaq û xwexa jî agir û k'êr girtine destê xwe û her du hevr'a çûn. <sup>7</sup>R'êda Îshaq bavê xwe Birahîmr'a got: «Bavo!» Ewî got: «Lebê, ezî va me, kur'ê min». Îshaq got: «Va ne qirş û agir, lê berxa bona dîyarîya t'evayîşewatê k'anê ye?» <sup>8</sup>Hingê Birahîm gotê: «Xwedê wê xwexa berxa dîyarîya t'evayîşewatê bona xwe r'ê têt'a bibîne, kur'ê min» Û her du hevr'a r'îya xweda çûn.

<sup>9</sup>Gava gihîştine wî cîyê ku Xwedê gotibûyê, Birahîm li wir gorîgeh<sup>f</sup> çêkir, qirş li ser wê cî kirin û kur'ê xwe Îshaq girêda, hilda danî li ser qirşêd gorîgehê. <sup>10</sup>Û Birahîm dest avîte k'êrê, ku kur'ê xwe serjêke <sup>11</sup>lê milyak'etê Xudan ji e'zmên deng dayê û gotê: «Birahîm! Birahîm!» Ewî got: «Lebê, ezî va me». <sup>12</sup>Milyak'et gotê: «Dest nede kur'ik û tişteki li wî neke, niha ez zanim ku tu ji Xwedê ditirsî, çimkî te bona min kur'ê xweyî tayê t'enê na-na nekir». <sup>13</sup>Birahîm serê xwe bilind kir, dîna xwe dayê wê pişt wîva, va ye beranek stirûyêd wî k'etibûne dir'iyêd six mabû. Birahîm çû ew beran anî û dewsa kur'ê xwe gorîşewitandî kir. <sup>14</sup>Birahîm navê wî cîyî danî: «Xudanê wê r'ê têt'a bibîne». Çawa h'eta niha tê gotinê: Li serê ç'iyayê Xudan, wê r'ê têt'a bê dîtinê.

<sup>15</sup>Milyak'etê Xudan cara dua ji e'zmên deng da Birahîm <sup>16</sup>û got: «Ez bi nefsa xwe sond dixwim, Xudan dibêje, çimkî te ku ev tişt kir û kur'ê xweyî tayê t'enê bona min na-na nekir, <sup>17</sup>ezê jî duayê li ser dua li te bikim, zur'eta te mîna steyrkêd e'zmên û mîna qûma devê be'rê gelekî zêde kim û zur'eta teyê bajarêd neyarêd xwe zeftî xwe kin <sup>18</sup>û bi zur'eta

te wê dua li h'emû miletêd dinyayê bibe, çimkî te guhdarîya min kir». <sup>19</sup> Û Birahîm vege'îya cem xulamêd xwe û r'abûn hevr'a çûne Bîr-Şêvayê, Birahîm Bîr-Şêvayêda ma.

### Zur'eta Nehor

<sup>20</sup> Pey van yekar'a cab dane Birahîm û gotinê: «Mîlk'ayê birê te Nehorr'a zar' anîne, <sup>21</sup> Nixurîyê wî Ûs û birê wî Bûz, Qimûlêlê bave'sîrê Aram, <sup>22</sup> K'esed, H'azo, Pîldaş, Îdlaf û Bet'ûêl». <sup>23</sup> Bet'ûêl'r'a R'êvêka bû. Ev her h'eyşt kur' Mîlk'ayê Nehorê birê Birahîmr'a anîn. <sup>24</sup> Carîya wî R'êûmayê jî, Tevah', Gaxam, T'axaş û Mahaxa anîn.

### Mirina Serayê

**23** Serayê sed bîst h'eft salî e'mir kir, e'mirê Serayê haqas sal bûn. <sup>2</sup> Sera li welatê Kenanê, Qîryat-Arbayêda, awa gotî li Hêbronê, mir. Birahîm hat ser Serayê girîya û şîna wê kir. <sup>3</sup> Birahîm ji mirîya xwe dûr k'et, t'evî zar'êd h'îtîya xeberda û got: <sup>4</sup> «Ez nava weda yekî r'êwî û xerîb im, niha milk'ekî bona mexber bidine min, wekî ez mirîya xwe ji ber ç'e'vê xwe defin kim». <sup>5</sup> Hingê zar'êd h'îtîya li Birahîm vege'andî û gotinê: <sup>6</sup> «Xweyê me, guh bide me, tu mîrekî Xwedêyî nava meda, tu dikarî mirîya xwe nava mexberêd meda, cîyê herî qencda defin kî. Bona definkirina mirîya xwe, ji me t'u kesê mexberê xwe na-na nake». <sup>7</sup> Birahîm r'abû xwe li ber cime'ta wî welatî, zar'êd h'îtîya ta kir <sup>8</sup> û wanr'a got: «Heger hûn dixwazin, ku ez mirîya xwe ji ber ç'e'vê xwe defin kim, ku usa ye bibihên û bona min Efronê kur'ê Soxarr'a xeberdin bêjinê, <sup>9</sup> wekî ew şkefta Maxpêlayêye serê e'rdê xwe, çawa milk' li ber we çi hêja be, bona mexber bifiroşe min». <sup>10</sup> Efron jî ku nava zar'êd h'îtîya r'ûniştibû. Hingê Efronê h'îtî bi deng li ber zar'êd h'îtîya, awa gotî li ber h'emûyêd ku dergehva\* dik'etine hindur', li Birahîm vege'and û got: <sup>11</sup> «Na, xweyê min, bibihê ez

\* 23:10 Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretîyê, dîwanê û qirara bû.

çi dibêjim: Ezê e'rdê jî bidime te, şkefta fêza wêda jî. Ezê li ber ç'e'vê zar'êd miletê xwe bidime te, mirîya xwe li wê derê defin ke». <sup>12</sup>Dîsa Birahîm xwe li ber cime'ta wî welatî ta kir <sup>13</sup>û bi deng li ber cime'ta wî welatî, Efronr'a xeberda û gotê: «Heger tê t'evî min qayl bî, ez heqê e'rdê te bidime te, tu ji destê min bigire, ku ez mirîya xwe li wir defin kim». <sup>14</sup>Efron li Birahîm vege'and û got: <sup>15</sup>«Xweyê min! K'erema xwe bibihê: Ew e'rd bi xwe hêjayî çarsid şêkil\* zîvî ye, nava min û teda met'a wê çî ye? Mirîya xwe defin ke». <sup>16</sup>Birahîm gotina Efron qebûl kir û Birahîm haqas zîv k'işand da Efron, çiqas ku wî li ber zar'êd h'îtîya gotibû, çarsid şêkil\* zîv, ku ev bû qîmetê nava t'ucaretîyêda.

<sup>17</sup>Bi vî awayî e'rdê Efronî, Maxpêlada, pêşberî Mamrê, ew e'rd, şkefta têda û h'emû darêd nava wî e'rdîda, <sup>18</sup>li ber ç'e'vê zar'êd h'îtîya û li ber h'emûyêd ku dergehva dik'etine hindur'ê bajêr, bû milk'ê Birahîm. <sup>19</sup>Pey vê yekêr'a Birahîm jina xwe Serayî şkefta e'rdê Maxpêlayêda defin kir. Eva e'rda li welatê Kenanêdaf pêşberî Mamrê bû (awa gotî li Hêbronê). <sup>20</sup>Ji zar'êd h'îtîya ev e'rd û şkefta têda, çawa milk'ê bona gor'istan, aha gihişte Birahîm.

### Zewaca Îshaq

**24** Birahîm îdî kal bibû û r'ojêd xwe derbaz kiribûn. Xudan<sup>f</sup> her alîyada ser Birahîmda barandibû. <sup>2</sup>Hingê Birahîm gote xulamê mala xwedayî mezin, ku wek'îlê h'emû hebûka wî bû: «Hîvî dikim, destê xwe bike li bin r'e'nê hêta min\*, <sup>3</sup>ez te bi Xudan didime sondê, ku Xwedêyê e'rdê û Xwedêyê e'zmen e, wekî tê kur'ê minr'a ji qîzêd kenanîya nexwezî, nava k'îjanada ez dimînim. <sup>4</sup>Lê her'î welatê min, ji nava pismamtîya min qîzekê kur'ê min Îshaqr'a bînî». <sup>5</sup>Xulam

\* 23:15, 16 Awa gotî nêzîkî 4 kîlogram û nîv (giranîya şêkilekî 12 giram bû).

\* 24:2 Nîşana bi r'ik'inyata xwe sondxwarinê ye.

gotê: «Belkî qîzik naxwaze li pey min bê vî welatî, tu dixwazî ku ez kur'ê te veger'înime wî welatê ku tu jê derketî?» <sup>6</sup>Birahîm gote wî: «H'evza xwe bikî ku kur'ê min veneger'înî wir. <sup>7</sup>Xudan, Xwedêyê e'zmên, yê ku ez ji mala bavê min û ji wî welatê ez têda bibûm derxist im û t'evî min xeberda û minr'a sond xwar got: «Ezê vî welatî bidime zur'eta te», ewê milyak'etê xwe pêşîya teva bişîne û tê ji wir qîzê kur'ê minr'a bînî. <sup>8</sup>Lê heger qîzik naxwaze ku li pey te bê, tu ji vê sonda min aza yî, t'enê kur'ê min veneger'înî wir». <sup>9</sup>Hingê xulam destê xwe kire bin r'e'nê hêta axayê xwe Birahîm û ji ber wê yekêva sond xwar.

<sup>10</sup>Xulêm ji deveyêd axê xwe dehe deve bar kirin. Çimkî h'emû xêr-xizna axayê wî destê wîda bû. Ew r'abû çû Aram-Naharaîmê\*, wî bajarê ku Nehor dima. <sup>11</sup>Ewî berê êvarê, wî wextê ku qîz û bûk derdik'etin av dik'işandin, deve ji bajêr der ber bîrekê dane mexelê, <sup>12</sup>û got: «Ya Xudan, Xwedêyê axayê min Birahîm! Ez r'eca dikim, tê îro r'îya min r'ast kî, axayê min Birahîmr'a h'uba xweye amin bide k'ifşê. <sup>13</sup>Ezê va li ser kanîya avê bisekinim û qîz-bûkêd binelîyêd vî bajarî wê bêne avê, <sup>14</sup>ez k'îjan qîzêr'a bêjim: «K'erema xwe, cêr'ê xwe dayne ez avê vexwim» û gava ew bêje: «K'erem ke ve-xwe û ez deveyêd te jî avdim», bira hema ew jî bibe ew qîza ku te bona xulamê xwe Îshaq k'ifşkirî ye. Û bi vê yekê ez bizanibim, ku te axayê minr'a h'uba xweye amin da k'ifşê».

<sup>15</sup>Ewî hela hê xeberdana xwe k'uta nekiribû, R'êvêka qîza Bet'ûêlê kur'ê Mîlk'a jina Nehorê birayê Birahîm cêr' li ser mila hat. <sup>16</sup>Qîzik yeke gelekî bedew û bik'ir bû, destê mêra hê lê nek'etibû. Ewa berjêrî ser kanîyê

---

\* 24:10 P'areke Mesopotamyayê.

bû, cêr'ê xwe dagirt û hevraz hilk'işîya. <sup>17</sup>Xulam bi lez çû pêşîya wê û gotê: «K'erema xwe, avekê ji cêr'ê xwe nadî ez vexwim?» <sup>18</sup>Ewê got: «Vexwe, xweyê min». Û leze-lez cêr' ji ser milê xwe danî û dayê ku vexwe. <sup>19</sup>Gava ewî av t'êr vexwar, keç'ikê gotê: «Ez avê deveyêd ter'a jî bik'işînim, wan jî t'êr avdim». <sup>20</sup>Û pêr'a-pêr'a ava cêr'da valayî k'ur'n kir, dîsa bezî çû ji bîrê avê bik'işîne, ewê bona h'emû deveyêd wî av k'işand. <sup>21</sup>Ev meriva li ser wê e'cêbmayî mabû, qet deng nedikir, difikirî digot: gelo r'ast Xudan r'îya wî r'ast kirîye, yan na.

<sup>22</sup>Û gava h'emû deva ava xwe vexwarin, hingê wî merivî qerefîleke zêr'îne giranîya nîv şêkilî\* û du bazinêd zêr'îne giranîya dehe şêkilî\* bona zendê wê dane wê <sup>23</sup>û jê pirsî: «Bi k'erema xwe beje, tu qîza k'ê yî? Gelo mala bavê teda cî heye, ku em şeva xwe derbaz kin?» <sup>24</sup>Ewê gote wî: «Ez qîza Bet'ûêlê kur'ê Mîlk'aya jina Nehor im». <sup>25</sup>Usa jî gotê: «Şikir ka û gîhayê me gelek e û cîyê şevmayîna we jî heye». <sup>26</sup>Hingê ew meriva dever'ûya çû û şikirî da Xudan <sup>27</sup>û got: «Şikir ji Xudan, Xwedêyê Birahîmê axayê min, ku ewî t'êla axayê min ji h'ub û aminîya xwe nebîr'î! Gava ezî r'êda bûm, Xudan berê min da mala birayêd axayê min». <sup>28</sup>Qîzik r'evî çû û ev yeka mala dîya xweda gilî kir.

<sup>29</sup>Birakî R'êvêkayê hebû navê wî Laban. Laban xwe li kanîyê girt, bezî çû cem wî merivî, <sup>30</sup>çimkî ewî qerefîl û ew bazinêd destêd xûşka xweda dîtibûn, usa jî ew gilîkirina xûşka xwe R'êvêkayê bihîstibû ku gotibû: «Ewî merivî t'evî min aha xeber daye», xwe wî merivîr'a gîhand. Dîna xwe dayê va ye ew deveyêd xweva wê hê li ser kanîyê ye. <sup>31</sup>Û gote wî: «K'erem

\* 24:22 Giranîya şêkilekî 12 giram bû.

ke were, bimbarekê Xudan! Tu çima li derva sekinî yî? Min bona te mal hazir kirîye û cî jî bona deveyêd te». <sup>32</sup>Ew meriva çû hindur', Laban barê deva danîn, ka û gîha kire ber wan, av jî da ku nigêd wî û yêd t'evî wî bêne şûştin. <sup>33</sup>Paşê nan danîn li ber wî, lê ewî got: «H'eta ez nêt-meremê xwe gilî nekim, ez nên naxwim». Gotinê: «K'erem ke bêje».

<sup>34</sup>Hingê ewî got: «Ez xulamê Birahîm im. <sup>35</sup>Xudan gelekî li ser axayê minda barandî ye, ew bûye yekî dewlemend, Xudan gelek pez û dewar, zêr' û zîv, xulam û carî, deve û k'er dane wî. <sup>36</sup>Seraya jina axayê min, pîrtîya xweda axayê minr'a kur'ek anî, ewî h'emû hebûka xwe da wî kur'î. <sup>37</sup>Axayê min ez dame sondê got: «Nebî-nebî ku tu ji qîzêd kenanîya, welatê k'îjanada ez dimînim kur'ê minr'a bixwazî. <sup>38</sup>Lê her'î nava olk'a mala bavê min û pismamêd min, qîzê kur'ê minr'a bixwazî. <sup>39</sup>Hingê min gote axayê xwe: «Belkî qîzik nexwaze t'evî min bê» <sup>40</sup>Ewî gote min: «Ew Xudanê li ber ç'e'vê k'îjanî ku ez r'îya wîda r'ast diçim, wê milyak'etêf xwe t'evî te r'ê dayne û ewê r'îya te r'ast ke, tê kur'ê minr'a ji nava pismamtîya min û olk'a mala bavê min qîzê bixwazî, <sup>41</sup>wî çaxî tê ji wî sondê ku min tu dayî sondê aza bî, lê gava tu her'î nava pismamtîya min û ew qîzê nedine te, tu îdî ji wî sondê xwe aza yî».

<sup>42</sup>Ez îro hatime li ser kanîyê û min got: «Ya Xudan, Xwedêyê axayê min Birahîmê! Heger ev r'îya ku ez niha têda diçim tu r'ast dikî, <sup>43</sup>ezê va li ser kanîya avê bisekinim û gava qîzek bê avê bik'işîne û ez wêr'a bêjim: «K'erema xwe, ji wî cêr'ê xwe hinek av bide ez vexwim», <sup>44</sup>û k'îjan ku bêje: «Tu vexwe û ez avê deveyêd ter'a jî bik'işînim», bira hema ew jî bibe ew qîza ku Xudan bona kur'ê axayê min k'ifş kirîye».

<sup>45</sup>Xeberdan hê devê minda bû, nişkêva R'êvêka cêr' li ser mila hat, berjêr çû kanîyê av k'işand, hingê min gotê: «K'erema xwe avekê nadî min?» <sup>46</sup>Ewê leze-lez

cêr' ji ser milê xwe danî û got: «Vexwe û ez deveyê te jî avdim», awa min vexwar û ewê deveyêd min jî avdan. <sup>47</sup>Hingê min jê pirsî: «Tu qîza k'ê yî?» Ewê got: «Ez qîza Bet'ûêlê kur'ê Mîlk'a jina Nehor im», min derxist qerefîl kire poza û bazin jî kirine desta. <sup>48</sup>Wî çaxî ez ta bûm û dever'ûya çûm ber Xudan, şikirî da Xudan Xwedêyê axayê xwe Birahîm, wekî r'îya min r'ast kir, ku ez nebîya\* birayê axayê xwe kur'ê wîr'a bixwazim. <sup>49</sup>Niha minr'a bêjin: «Temê we heye ku hûn h'ub û aminîyê axayê minr'a bidine k'ifşê, yan na?» Heger na, minr'a bêjin ku ez yan r'ast her'im, yan jî ç'ep».

<sup>50</sup>Laban û Bet'ûêl lê veger'andin û gotinê: «Ev yek ji Xudan e, em ne qenc dikarin bêjin, ne xirab. <sup>51</sup>Va ye R'êvêka li ber te ye, r'abe hilde û her'e, bira weke gotina Xudan, ew bibe jina kur'ê axayê te». <sup>52</sup>Gava xulamê Birahîm xeberdana wan bihîst, h'eta e'rdê dever'ûya çû, serê xwe li ber Xudan danî. <sup>53</sup>Paşê xulêm xişîrêd zêr', zîv û k'inc derxistin dane R'êvêkayê, xelatêd qîmete biha jî dane birê û dîya wê. <sup>54</sup>Hingê xulêm t'evî wan merivêd ku pêr'a hatibûn, xwarin vexwarin û şeva xwe li wir derbaz kirin. Sibehê zû r'abûn, xulêm got: «Min ver'êkine cem axayê min». <sup>55</sup>Birê û dîya keç'ikê gotinê: «Bira keç'ik çendekî, hema dehe r'oja li cem me bimîne, paşê her'in». <sup>56</sup>Lê xulêm gote wan: «Min derengî neêxin, Xudan ku r'îya min r'ast kirîye, bihêlin ez her'im bigihîjime axayê xwe». <sup>57</sup>Wana got: «Em gazî keç'ikê kin û xebera devê wê bizanibin». <sup>58</sup>Hingê gazî R'êvêkayê kirin û gotinê: «Tê t'evî vî merivî her'î?» Ewê got: «Belê». <sup>59</sup>Evana xûşka xwe R'êvêka, xweykirîya

\* 24:48 Xeber bi xeber «qîz».

wê, xulamê Birahîm û merivêd wî ver'êkirin. <sup>60</sup>Dua li R'êvêkayê kirin û gotinê:

«Xûşka me, tu bibî dîya h'ezar-h'ezara  
û zur'eta te bajarêd neyarêd xwe  
zeftî xwe kin».

<sup>61</sup>R'êvêka û carîyêd wê r'abûn, li deva sîyar bûn û li pey wî merivî çûn. Xulêm R'êvêka hilda û çû.

<sup>62</sup>Îshaq ji Bîr-Lahay-Roî vege'îyabû dihat, çimkî ew li Necefêf dima. <sup>63</sup>Îshaq berê êvarê derk'etibû çolê k'etibû nava mitala, serê xwe bilind kir, dîna xwe dayê, va ye deve tên.

<sup>64</sup>R'êvêkayê ku serê xwe bilind kir Îshaq dît, ji devê peya bû.

<sup>65</sup>Û ji xulêm pirsî: «Ew merivê deştêdayî ku ber bi me tê, ew k'î ye?» Xulêm gotê: «Axayê min e». Û ewê xêlîya xwe hilda avîte li ser xwe.

<sup>66</sup>Xulêm her tiştêd ku wî kiribûn Îshaq'r'a gilî kirin. <sup>67</sup>Îshaq R'êvêka bire konê dîya xwe Serayê, ew stand û ew bû kevanîya wî. Ewî ew h'iz kir. Û baristanî k'ete dila, li pey mirina dîya wî'r'a.

### Zur'eta Birahîme mayîn

**25** Birahîm jinek jî stand, navê wê Qitûra. <sup>2</sup>Evê ev kur' Zîmran, Yoqşan, Midan, Midyan, Îşbaq û Şûax jê'r'a anîn. <sup>3</sup>Yoqşan'r'a Şîba û Dêdan bûn. Dêdan'r'a aşûrî, litûşî û liûmî bûn. <sup>4</sup>Midyan'r'a Eyfa, Efer, Henox, Abîda û Eldaha bûn. Ev h'emû jî zar'êd Qitûrayê bûn.

<sup>5</sup>Birahîm h'emû hebûka xwe da Îshaq. <sup>6</sup>Lê p'êşk'êş dane kur'êd carîyaye ji wî û saxîya xweda ew ji kur'ê xwe Îshaq dûr xistin, berê wanda r'ohilatê, ew şandine alîyê welatêd r'ohilatê.

### Mirin û definkirina Birahîm

<sup>7</sup>R'ojêd e'mirê Birahîme ku wî derbaz kirin, sed h'eftê pênc sal bûn. <sup>8</sup>Birahîm bû kalekî extyar, ji e'mirê xwe t'êrbûyî, r'uh'ê xwe da û mir, çû gihîşte cime'ta xwe. <sup>9</sup>Kur'êd wî Îshaq û Îsmayîl, bavê xwe, şkefta Maxpêlayêye e'rdê Efronê kur'ê Soxarê h'îfîda defin kirin, ya ku pêşberî Mamrê bû, <sup>10</sup>wî

e'rdîda, k'îjan ku Birahîm ji zar'êd h'îtîya k'ir'î bû. Li wir Birahîm û jina wî Serayî hatine defin kirinê.

<sup>11</sup>Li pey mirina Birahîmr'a, Xwedê dua kur'ê wî Îshaq kir. Îshaq nêzîkî Bîr-Lahay-Roîyê cî-war bû, ma.

### R'ik'inyata Îsmayîl

<sup>12</sup>Ev e serecema r'ik'inyata Îsmayîlê kur'ê Birahîm, ku carîya Serayîye Hacera misirî Birahîmr'a anî. <sup>13</sup>Navê kur'êd Îsmayîl ev in, bi navêd xwe û r'ik'inyata xweva. Nixurîyê Îsmayîl Nêbayot bû, peyr'a Qêdar, Adbêl, Mîbsam, <sup>14</sup>Mîşma, Dûma, Massa, <sup>15</sup>Xadad, Têma, Yetûr, Nafîş û Qêdima bûn. <sup>16</sup>Ev in kur'êd Îsmayîl û navêd wan, cî-warêd xwe û konêd xweva. Evana li gora êl-e'şîrêd xweva donzdeh mîr bûn. <sup>17</sup>Salêd e'mirê Îsmayîl sed sî û h'eft sal bûn û r'uh'ê xwe da mir, t'evî cime'ta xwe bû. <sup>18</sup>Îsmayîlîya ji H'awîlayê girtî h'eta Şûrê cî-war bûn, ku pêşberî Misirê, li ser r'îya ku diçe Aşûrya. Evana li ber ç'e'vê h'emû birayêd xwe cî-war bûn, ew aciz kirin.

### Bûyîna Esaw û Aqûb

<sup>19</sup>Ev e serhatîya r'ik'inyata ku pey Îshaqê Birahîm k'et. Birahîmr'a Îshaq bû. <sup>20</sup>Îshaq ku bû çîl salî, qîza Bet'ûêlê aramîf, ji Paddan-Aramê\* R'êvêka stand, xûşka Labanê aramî. <sup>21</sup>Îshaq bona jina xwe lava-dîlek ji Xudan kirin, çimkî ewê zar' nedanîn. Xudan dengê wî bihîst, jina wî R'êvêka h'emle derk'et. <sup>22</sup>Kur'e hê bet'inê wêda bûn hevdur'a şer' dikirin, hingê ewê got: «Ev çi hate serê min?» Û çû ku ji Xudan bipirse.

<sup>23</sup>Xudan gote wê:

«Bet'inê teda du millet hene,

û ji bedena te, du cime'tê ji hev cihê bin,

\* 25:20 P'areke Mesopotamyaye.

cime'tekê ji cime'ta din qewattir be.

Û yê mezin wê xulamtîyê yê biç'ûk bike».

<sup>24</sup>Û gava r'oja bûyîna wan pêr'a gihîşt, va ye ew cêwî bûn bet'inê wêda. <sup>25</sup>Yê pêşin ku bû, yekî sorî pir'ç' bû mîna k'urk, navê wî Esaw\* danîn. <sup>26</sup>Pey wîr'a, birê wî bû, dest avîtî pe'nîya Esaw girtî, û navê wî danîn Aqûb\*. Hingê Îshaq şêst salî bû, gava R'êvêka ew anîn.

<sup>27</sup>Ew zar' mezin bûn, Esaw bû merivekî çolê, nêç'îrvanîyêda yekî jîrî serxwe. Lê Aqûb merivekî dûreşer' û ji kona qet dernedik'et. <sup>28</sup>Îshaq Esaw h'iz dikir, çimkî ewî nêç'îrêd wî dixwarin, lê R'êvêkayê Aqûb h'iz dikir.

### Esaw nixurtîya xwe difiroşe

<sup>29</sup>Carekê Aqûb şorbe çêdikir, Esaw ji çolê k'esirî hat. <sup>30</sup>Ewî gote Aqûb: «Bike qencî, ji wê şorba berk'elêye sor, minr'a dagire ez bixwim, dilê min xava diçe». Lema jî wîr'a gotin: «Edom\*». <sup>31</sup>Lê Aqûb gote wî: «K'a niha nixurtîya xwe bifiroşe min». <sup>32</sup>Hingê Esaw got: «Ez va dimirim, k'ara min çi nixurtîyêda heye?» <sup>33</sup>Aqûb gotê: «De niha destê minda sond bixwe». Ewî destê wîda sond xwar û nixurtîya xwe firote Aqûb. <sup>34</sup>Hingê Aqûb nan û şorba nîsika da Esaw, ewî xwar û vexwar, r'abû çû. Bi vî awayî Esaw nixurtîya xwe bêhurmet kir.

### Îshaq Gêrarêda dimîne

**26** Li welêtda, li ser wê xelaya ku hêna Birahîmda bibû, xelayîke din bû, Îshaq çû Gêrarê cem p'adşê filistînîya Abîmelex. <sup>2</sup>Xudan wîva xuya bû û

\* 25:25 Bi zimanê îbranî mîna sewta xebera «Pir'ç'».

\* 25:26 Bi zimanê îbranî «Pe'nîgirtî» yan «H'ilek'ar».

\* 25:30 Bi zimanê îbranî «Sor».

gotê: «Berjêrî Misirê nebe, wî welatîda bimîne, k'îjanî ezê nîşanî te kim. <sup>3</sup>Vî welatîda xerîbîyêda bimîne, ezê t'evî te bim û dua li te bikim. Çimkî ezê t'emamîya van welata bidime te û zur'eta te û wê sonda xwe, ya ku min bavê te Birahîmr'a sond xwarîye, bînime sêrî. <sup>4</sup>Ezê zur'eta te weke steyrkêd e'zmên zêde kim û t'emamîya van welata bidime zur'eta te û bi zur'eta te wê dua li h'emû milletêd dinyayê bibe. <sup>5</sup>Çimkî Birahîm guhdarîya dengê min kir, fermanêd min, t'emîyêd min, e'rf-e'detêd min û hînkinêd min qedandin».

<sup>6</sup>Îshaq Gêrarêda cî-war bû. <sup>7</sup>Binêlîyêd wî cîyî ku pirsra jina wî R'êvêkayê jê kirin, ewî got: «Xûşka min e». Çimkî ew tirsîya ku wî bigota: «Jina min e», digot: «Nebe r'ûyê R'êvêkayê da min bikujin, çimkî R'êvêka berbiç'e've bedew bû». <sup>8</sup>Û gava ew we'dekî dirêj li wir ma, p'adşê filistînîya Abîmelex r'ojekê p'encerêr'a dîna xwe dayê, wê Îshaq t'evî jina xwe R'êvêkayê k'êf-h'enek dikirin. <sup>9</sup>Hingê Abîmelex gazî Îshaq kir û gotê: «K'ifş e, ku eva jina te ye, te çima got: «Eva xûşka min e?»» Îshaq lê vege'and û gotê: «Min got, ku nebe r'ûyê wêda ez bême kuştinê». <sup>10</sup>Hingê Abîmelex gotê: «Ev te çi danî li serê me? Hindik mabû ku ji nava cime'tê yekî dest bavîta jina te û gune bik'eta stûyê me». <sup>11</sup>Abîmelex t'emî da t'emamîya cime'ta xwe û got: «K'ê qedirê vî merivî, yan jina wî k'eve, wê e'se bê kuştinê».

<sup>12</sup>Îshaq wî welatîda e'rdê xwe r'eşand, Xudan serda barand, ewî wê salê sed car ber hilda. <sup>13</sup>Ewî xwe r'ind girt, çiqas diçû xwe digirt û usa pêşda diçû, ku ewî gotina te xwe girt. <sup>14</sup>Bû xweyê kerî û gar'anêd pêz-dêwêr û gelek xulamêd wî hebûn, filistînîya<sup>f</sup> h'evsûdîya wî kirin. <sup>15</sup>H'emû ew bîrêd ku hêna bavê wîda, xulamêd bavê wî Birahîm vedabûn, filistînîya xitimandin, t'ijî xwelî kirin. <sup>16</sup>Abîmelex gote Îshaq: «Bihêle ji me dûr k'eve her'e, çimkî tu ji me derbazzir bûyî». <sup>17</sup>Îshaq ji wir k'oç' kir çû, konêd xwe deşta Gêrarêda danîn û li wir ma.

<sup>18</sup>Îshaq dîsa ew bîr vedan, yêd ku hêna bavê wî Birahîmda hatibûne vedanê, k'îjan ku pey mirina Birahîmr'a filistinîya t'îjî kiribûn, ewî dîsa ew navêd bavê xwe danîne li ser wan. <sup>19</sup>Xulamêd Îshaq wê deştêda vedan, r'astî ava kanîyê hatin. <sup>20</sup>Şivanêd Gêrarê t'evî şivanêd Îshaq şer' dikirin, digotin: «Eva ava me ye». Lema navê wê bîrê danî E'sêq\*, çimkî bona wê bîrê şer' kirin. <sup>21</sup>Bîreke din vedan, li ser wê jî şer' kirin, navê wê danî Sîtna\*. <sup>22</sup>Ew ji wir çû, bîreke din veda, li ser wê şer' nekirin, hingê ewî navê wê danî R'eh'obot\* û got: «Çimkî Xudan em derxistine firêqetîyê û emê li ser vî e'rdî zêde bin».

<sup>23</sup>Ji wir jî Îshaq hevraz çû Bîr-Şêvayê. <sup>24</sup>Wê şevê Xudan wîva xuya bû û gote wî: «Ez Xwedêyê bavê te Birahîm im, netirse, çimkî ez t'evî te me, bona xatirê xulamê xwe Birahîm, ezê dua li te bikim û zur'eta ta zêde kim». <sup>25</sup>Îshaq li wir gorîgehek çêkir, gazî navê Xudan kir. Konê xwe li wir vegirt, xulamêd wî li wir jî bîrek k'olan.

### Peymanaf Îshaq û Abîmelex

<sup>26</sup>Wî çaxî, Abîmelex bi t'evî şîretk'arê xwe Ahûzat' û sereskerê xwe Pîxol ji Gêrarê çûne cem Îshaq. <sup>27</sup>Îshaq gote wan: «Hûn bona çi hatine cem min, ne we jenande min û berî min da, ez ji xwe dûr xistim?» <sup>28</sup>Wana got: «Em baş dibînin ku Xudan t'evî te ye, lema me got: «Em û tu destê hevda sond bixwî û t'evî te peymanê girêdin, <sup>29</sup>wekî tu xirabîyê li me nekî, çawa ku me dest nedaye te, pêştirî qencîyê, usa jî me tu sax-silamet ver'êkir î, ji îro şûnda tu bimbarekê Xudan î». <sup>30</sup>Hingê Îshaq wan'a mesrefek danî, wana xwar-vexwar. <sup>31</sup>Sîbehê zû r'abûn, destê hevda sond xwarin, Îshaq ew ver'êkirin. Ewana bi dilê r'ih'et ji cem wî çûn. <sup>32</sup>Hema wê

\* 26:20 Bi zimanê îbranî «Şer'».

\* 26:21 Bi zimanê îbranî «Neyartî».

\* 26:22 Bi zimanê îbranî «Firêqetî».

r'ojê jî, xulamêd Îshaq hatin bona wê bîra ku vedidan cab danê û gotinê: «Me av dît». <sup>33</sup>Ewî navê wê Şîva\* danî. Bona vê yek jî navê wî bajarî h'eta niha Bîr-Şêva\*\* ye.

### Jinêd Esawe ne ji miletê wî

<sup>34</sup>Esaw çil salî bû, gava wî Yêhûdîta qîza Bêrîyê h'îtî û Basmet'a Êylonê h'îtî standin. <sup>35</sup>Evana bûne kula dilê Îshaq û R'êvêkayê.

### Aqûb duayê p'ara Esaw ji Îshaq distîne

**27** Gava Îshaq kal bû û r'onaya ç'e'vada me'rim bû, ewî gazî kur'ê xweyî mezin Esaw kir û gotê: «Lawo!» Ewî got: «Ez va me, bavo!» <sup>2</sup>Îshaq gotê: «Ezî va kal bûme, nizanîm k'îjan r'ojê ezê bimirim. <sup>3</sup>Niha ç'ekê xwe, tîr û kevanê xwe hilde derê çolê, nêç'îrekê bona min bike û <sup>4</sup>xwarina xweşe ku ez jê h'iz dikim, bona min çêke bîne ez bixwim, ku berî mirina xwe ez dua li te bikim». <sup>5</sup>R'êvêkayê dibihîst, gava Îshaq ev yek kur'ê xwe Esawr'a digot. Gava Esaw çû çolê nêç'îrê bike bîne,

<sup>6</sup>R'êvêkayê gote kur'ê xwe Aqûb: «Min hêja bihîst, ku bavê te çawa t'evî birê te Esaw xeberda û got: <sup>7</sup>«Nêç'îrekê minr'a bîne, pê xwarineke xweş çêke, ku ez bixwim û berî mirina xwe, li ber Xudan dua li te bikim», <sup>8</sup>Niha bibihê lawo, guhê xwe bide ser min, ez çî ter'a dibêjim bike. <sup>9</sup>R'abe her'e nava kêrî, minr'a du karêd bizinaye r'ind bîne û ez pê wan bavê ter'a wê xwarina xweşe ku ew jê h'iz dike çêkim, <sup>10</sup>tu jî bibe bide bavê xwe, ku ew bixwe û berî mirina xwe dua li te bike». <sup>11</sup>Aqûb gote dîya xwe R'êvêkayê: «Esawê birê min yekî pir'ç' e, ezî r'ûtî nepir'ç' im, <sup>12</sup>belkî bavê min bi desta min bip'elîne, ez ber ç'e'vê wî derew derêm, hingê ezê li ser xweda nifir'ê bînim ne ku duayê».

\* 26:33 Bi zimanê îbranî «Sond» yan «H'eft».

\*\* 26:33 Bi zimanê îbranî «Bîra Sondê» yan «Bîra H'efta».

<sup>13</sup>Dê gotê: «Lawo! Ew nifir'a bira li ser minda bê, t'enê tu gur'a min bike, her'e kara bîne». <sup>14</sup>Aqûb çû kar anîn dane dîya xwe. Dê pê wan ew xwarina xweşe ku bavê wî jê h'iz fikir çêkir. <sup>15</sup>R'êvêkayê k'inca Esawê r'ind, ya kur'ê xweyî mezin, ku malda li cem wê bû, hilda li kur'ê xweyî biç'ûk Aqûb kir, <sup>16</sup>û p'ostê kara jî avîte li ser desta û stukura wîye r'ûte nepir'ç', <sup>17</sup>xwarina xweşe çêkirî, nanê ku lêxistibû da destê kur'ê xwe Aqûb.

<sup>18</sup>Aqûb çû cem bavê xwe û got: «Bavo!» Ewî got: «Ez va me, tu k'î yî lawo?» <sup>19</sup>Aqûb gote bavê xwe: «Ez nixurîyê te Esaw im, te çawa minr'a got, min usa jî kir, k'erem ke, r'abe r'ûnî nêç'îra min bixwe û dua li min bike». <sup>20</sup>Îshaq gote kur'ê xwe: «Te çawa usa zû nêç'îr dît, lawo?» Aqûb gotê: «Xudan, Xwedêyê te nêç'îr r'astî min anî». <sup>21</sup>Îshaq gote Aqûb: «Nêzîk were, ez bi desta te bip'elînim, lawo, hela k'a tu kur'ê min Esaw î, yan na?» <sup>22</sup>Aqûb nêzîkî bavê xwe bû, bavê bi desta ew p'eland û gotê: «Deng dengê Aqûb e, lê dest destêd Esaw in». <sup>23</sup>Ewî tê dernexist k'îjan e, çimkî destêd wî jî mîna destêd birê wî Esaw pir'ç' bûn, hingê dua li wî kir <sup>24</sup>û gotê: «Tu r'ast kur'ê min Esaw î?» ewî got: «Ez im». <sup>25</sup>Bavê gotê: «K'a bide nêç'îra kur'ê xwe ez bixwim, wekî dua li te bikim». Aqûb dayê, ewî xwar, şerab jî anî dayê ewî vexwar. <sup>26</sup>Bavê wî Îshaq gotê: «Niha were nêzîk û min r'amûse, lawo». <sup>27</sup>Aqûb çû nêzîk, bav r'amûsa. Îshaq k'incê wî bîn kir, dua li wî kir û got:

«Va ye bîna kur'ê min,  
mîna bîna mêrga Xudan dua lê kirî ye.

<sup>28</sup>Bira Xwedê ji qir'avîya e'zmên,  
û ji qinyata e'rdê,  
genim û şerabêda te xinê ke.

<sup>29</sup>Bira millet ter'a xulamtîyê bikin,  
cime't jî li ber te dever'ûya her'in.  
Tu bibî axê biratîya xwe,

zar'êd dîya te jî li ber te dever'ûya her'in.  
 Yê nifir'a li te bike, nifir' li wî be,  
 yê dua li te bike, dua li wî be».

<sup>30</sup>Gava Îshaq dua Aqûb kir xilaz kir û ew gavek bû ku ew ji bavê xwe Îshaq dûr k'etibû, birê wî Esaw ji nêç'îrê hat. <sup>31</sup>Ewî jî xwarina xweş çêkir, anî da bavê xwe û got: «De bira bavê min r'abe û ji nêç'îra kur'ê xwe bixwe, wekî dua li min bike». <sup>32</sup>Bavê wî Îshaq gote wî: «Tu k'î yî?» Ewî got: «Ez kur'ê te, nixurîyê te, Esaw im». <sup>33</sup>Îshaq bi xofeke mezin li ser hevda lerizî û got: «Ewê ku nêç'îr kir û anî da min ew k'î bû? Min berî hatina te, ji wan h'emûya xwar û dua li wî kir. Ewê jî duakirî be». <sup>34</sup>Gava Esaw ev gotinêd bavê xwe bihîstin, kûr'în k'etê, k'eser-k'eser girîya û gote bavê xwe: «Min jî bavo! Dua li min jî bike!» <sup>35</sup>Bavê gotê: «Birê te hat bi h'ilek'arîyê duayê p'ara te hildane li ser xwe». <sup>36</sup>Esaw got: «Lema navê wî danenîne Aqûb!\* Eva du care ew nig dide ber min heqê nixurtîya min ji min stand û niha jî duayê p'ara min ji min stand». Ê digot: «Te qet bona min dua nehiştîye?» <sup>37</sup>Hingê Îshaq li Esaw vege'and û gotê: «Va ye min ew kire axayê te, û h'emû biratîya wî jî wîr'a kirine xulam, genim û şerabêva jî ew xinê kirin. Îdî niha ez te çawa bikim lawo». <sup>38</sup>Esaw gote bavê xwe: «Bavo! Gelo hema duakî te t'enê hebû? Min jî bavo! Dua li min jî bike!» Esaw kûr'e-kûr' danî girîya.

<sup>39</sup>Hingê Îshaqê bavê wî li wî vege'and û gotê:  
 «Awa tê îdara xwe ji qinyata e'rdê  
 û qir'avîya e'zmên bikî.

<sup>40</sup>Îdara te bi şûrê te be,  
 xulamtîyê birê xwer'a bikî,  
 û wext jî ku bê, gava tu ji vê yekêda serî hildî,  
 nîrê wî ji stûyê xwe bavêjî».

\* 27:36 Binihêr'e Destpêbûn 25:26.

<sup>41</sup>Û bona vî duayê ku bavê dua birê wî kiribû, Aqûb ji ber ç'e'vê Esaw k'etibû û dilê xweda digot: «R'ojêd şîna bavê min nêzîk bûne, ezê peyr'a birê xwe Aqûb bikujim». <sup>42</sup>Ev gotinêd Esawe kur'ê R'êvêkayêyî mezin, gîhandine wê. Evê jî şand gazî kur'ê xweyî biç'ûk Aqûb kir û gotê: «Va ye Esawê birê te, gef li te xwarîye, wekî te bikuje. <sup>43</sup>Niha bibihê lawo ez çî ter'a dibêjim, r'abe bir'eve her'e H'aranê, bigihîje birê min Laban, <sup>44</sup>we'dekî li cem wî bimîne, h'eta hêrsa birê te datîne. <sup>45</sup>Gava hêrsa birê te dayne û ew kirina ku te li serê wî kirîye bîr bike, paşê ezê hingê bişînime pey te, te ji wir bînim, çima nava r'ojekêda ez we her duya unda kim?»

### Îshaq Aqûb dişîne cem xalê wî Laban

<sup>46</sup>Paşê R'êvêkayê gote Îshaq: «R'ûyê van qîzêd h'îtîada, ez ji e'mirê xwe t'êr bûme, heger Aqûb jî qîzêd h'îtîyaye mîna vane vî welatî bistîne, îdî ez çima dijîm?»

**28** Hingê Îshaq gazî Aqûb kir, dua li wî kir, t'emî da wî û got: «Qîzêd kenanî<sup>f</sup> nestînî. <sup>2</sup>Lê r'abe her'e Paddan-Aramê, mala bavê dîya xwe Bet'ûêl û ji wir ji qîzêd xalê xwe Laban, qîzê xwer'a bixwaze. <sup>3</sup>Û bira Xwedêyê Herî Zor te berek'et ke, te şîn ke û li hev zêde ke, ji te mixulqet pêşda bèn. <sup>4</sup>De bira ew xêr-berek'eta ser Birahîm li ser te û zur'eta teda bibarîne, wekî ew welatê ku te têda xerîbî der-baz kirîye, bibe milk'ê te, k'îjan ku Xwedê dabû Birahîm». <sup>5</sup>Îshaq Aqûb şand, ew çû Paddan-Aramê cem xalê xwe Labanê kur'ê Bet'ûêlê aramî\*.

### Esaw qîza Îsmayîl distîne

<sup>6</sup>Esaw dît ku Îshaq dua Aqûb kir û ew şande Paddan-Aramê, ku ji wir xwer'a qîzê bixwaze, dema ku dua wî dikir, t'emî

\* 28:5 Îbranî xeber bi xeber: «Cem Labanê kur'ê Bet'ûêlê aramî, birê R'êvêka dîya Aqûb û Esaw».

da wî û got: «Ji qîzêd kenanîya xwer'a nexwazî», <sup>7</sup>Aqûb jî gur'a dê û bavê xwe kir, çû Paddan-Aramê. <sup>8</sup>Esaw k'ifş kir, ku Îshaqê bavê wî qîzêd kenanîya begem nake, <sup>9</sup>hingê Esaw çû cem Îsmayîl û qîza Îsmayîlê kur'ê Birahîm, Mah'alata xûşka Nêbayot xwer'a xwest, anî ser jinêd xwe.

### Xewna Aqûb

<sup>10</sup>Aqûb ji Bîr-Şêvayê derk'et, çû ber bi H'aranê. <sup>11</sup>Ew gihîşte cîkî, r'o lê çû ava, ewî kevirekî wan dera hilda danî ber serê xwe û li wî cîyî p'alda r'aza, şeva xwe li wir derbaz kir. <sup>12</sup>Ewî xewnek dît, dîna xwe dayê wê p'êpelîngek ser e'rdê danîye û serê wê gihîştîye e'zmên. Û va ye milyak'etêd Xwedê ser wêr'a hildik'işîyan û peya dibûn. <sup>13</sup>Û awa Xudan ser wîr'a sekinîbû û digot: «Ez Xudan Xwedêyê kal-bavê te Birahîm û Xwedêyê Îshaq im. Ezê wî e'rdê ku te li ser p'aldaye bidime te û zur'eta te. <sup>14</sup>Zur'eta teyê weke t'oza e'rdê zêde be, wê berbi r'ohilat û r'oavayê, bakur û başûrê bela be. Bi te û zur'eta te wê dua li h'emû berekêd dinyayê bibe. <sup>15</sup>Awa ez t'evî te me, tu k'uda jî her'î ezê te xweyî kim û te dîsa vege'rnime vî welatî. Çimkî ez ji te dûr nak'evim, h'eta ku ew tiştê min ter'a gotîye neynime sêrî». <sup>16</sup>Aqûb ji xewa xwe h'işyar bû û got: «R'astî Xudan li vir e, lê min nizanibû!» <sup>17</sup>Hingê ew tirsîya û got: «Ev der çiqasî saw e! Ev tiştêkî din nîne, lê mala Xwedê ye û dergehê e'zmana ye».

<sup>18</sup>Aqûb sibehê zû r'abû, ew kevîrê ber serê xwe hilda h'eykel da sekinandinê bi r'ûn kêlik r'ûn kir. <sup>19</sup>Navê wî cîyî danî «Bêt'-Êl\*», lê berê navê wî bajarî Lûz bû. <sup>20</sup>Hingê Aqûb ad-qîrar kir û got: «Heger Xwedê t'evî min be û vê r'êyêda min xwey ke, ya ku ez têda diçim, usa jî nanê xwarina min û k'inca li xwekirina min

\* 28:19 Bi zimanê îbranî «Mala Xwedê».

bide, <sup>21</sup>û sax-silamet vejer'ime mala bavê xwe, bira Xudan bibe Xwedê min, <sup>22</sup>û ev kevirê ku min çawa h'eykel da sekinandinê jî bibe mala Xwedê. Û ji her tiştêd ku tu bidî min, ezê r'ast ji deha\* yekî bidim te».

### Aqûb r'astî R'ahêlê tê

**29** Aqûb r'abû çû welatê cime'têd li r'ohilatê. <sup>2</sup>Deştêda ew r'astî bîrekê hat, dîna xwe dayê va ye sê kerî pez dorê mexel in, çimkî ji wê bîrê pez dihate avdanê. Kevirekî mezin jî li ser devê bîrê bû. <sup>3</sup>Çaxê her kerîyêd pêz li wir t'op dibûn, hingê kevirê devê bîrê hol dikirin, pezê xwe av didan, kevir dîsa didane li ser devê bîrê.

<sup>4</sup>Aqûb gote wan: «Gelî bira hûn ji k'u ne?» Wana lê vejer'and: «Em ji H'aranê ne». <sup>5</sup>Ewî dîsa gote wan: «Hûn Labanê kur'ê Nehor nas dikin?» Ewana got: «Em nas dikin». <sup>6</sup>Ewî gote wan: «Ew sax-silamet e?» Û wana got: «Saxî-silamet e, va ye R'ahêla qîza wî t'evî pêz tê». <sup>7</sup>Hingê wî got: «Hê r'oj gelek maye, ne wext e ku kerî t'op bin, pezê xwe avdin, bibin biç'êrînin». <sup>8</sup>Lê wana got: «Em nikarin, h'eta h'emû kerîyêd pêz t'op nebin, em hingê bi hevr'a kevirê li ser devê bîrê hol dikin, pêz av didin».

<sup>9</sup>Ewî hê t'evî wan xeber dida, R'ahêl bi t'evî pezê bavê xwe hat, çimkî ewê şivantî dikir. <sup>10</sup>Gava Aqûb ç'e'v R'ahêla qîzxaî û pezê xalê xwe Laban k'et, çû kevir ji devê bîrê hol kir û pezê xalê xwe Laban avda. <sup>11</sup>Hingê Aqûb çû r'ûyê R'ahêlê, kûr'în k'etê girîya. <sup>12</sup>Paşê Aqûb gote R'ahêlê ku ew pismamê bavê wê ye, kur'ê R'êvêkayê ye. Ewa jî r'evî çû bavê xwer'a gilî kir.

<sup>13</sup>Gava Laban ev mizgînîya hatina kur'ê xûşka xwe Aqûb bihîst, r'evî çû pêşîya wî. Ew h'emêz kir, çû r'ûyê wî û ew

\* 28:22 Binihêr'e Qanûna Ducarî 14.22-29; 26.12-15.

bire mala xwe. Aqûb jî ev yek gişk Labanr'a gilî kir. <sup>14</sup>Laban gote wî: «Tu r'ast ji xûn û qinêta min î!» Aqûb t'emamîya mehekê cem wî ma.

### Xulamtîya Aqûbe bona Lêayê û R'ahêlê

<sup>15</sup>Pey van yekara, Laban gote Aqûb: «Ze'f jî tu pismamê min î, gerekê bêheq minr'a xulamtîyê bikî? Minr'a bêje, heqê te çi ye?» <sup>16</sup>Du qîzêd Laban hebûn. Navê ya mezin Lêa û navê ya biç'ûk R'ahêl bû. <sup>17</sup>Lêa ç'e'vada nazik\* bû, lê R'ahêl bejin-balê û sifetda xas û bedew bû. <sup>18</sup>Dilê Aqûb k'ete R'ahêlê û got: «Ez bona qîza teye biç'ûk R'ahêlê h'eft sala ter'a xulamtîyê bikim». <sup>19</sup>Laban got: «Ya p'ake ez wê bidime te, ne ku bidime merivekî din. Cem min bimîne». <sup>20</sup>Aqûb h'eft sala bona R'ahêlê xulamtî kir. Ber ç'e'vê wî mîna çend r'oja derbaz bûn, haqasî jê h'iz dikir. <sup>21</sup>Hingê Aqûb gote Laban: «K'a dergîstîya min bide min, çimkî r'ojêd min t'emam bûne, ku ez her'ime cem wê». <sup>22</sup>Laban mesrefek danî, h'emû merivêd wê derê civandin. <sup>23</sup>Lê gava bû êvar qîza xwe Lêa bir da Aqûb, ewî serê xwe wêr'a danî. <sup>24</sup>Laban carîya xwe Zîlpa jî çawa carî da qîza xwe Lêayê. <sup>25</sup>Sibehê zû, va ye: eva Lêa ye. Hingê Aqûb gote Laban: «Te ev çi serê min kir? Min bona R'ahêlê ter'a xulamtî nekir? Te çima ez xapandim?» <sup>26</sup>Laban got: «Li cem me ev ne e'det e, ku ya biç'ûk berî ya mezin bidine mêr. <sup>27</sup>H'eftîyê t'emam ke, ezê ya din jî bidime te, li ber h'eft salêd dinva ku tu minr'a xulamtîyê bikî». <sup>28</sup>Aqûb usa jî kir, ewî h'eftê t'emam kir, Laban qîza xwe R'ahêl jî çawa jin da wî. <sup>29</sup>Laban carîya xwe Bîlha jî çawa carî da qîza xwe R'ahêlê. <sup>30</sup>Aqûb serê xwe R'ahêlêr'a danî û R'ahêl ji Lêayê ze'ftir h'iz kir. Û Aqûb h'eft salêd din jî xulamtî Labanr'a kir.

\* <sup>29:17</sup> Aha jî tê fe'mkirinê: «Ç'e'vada me'rim».

## Zar'êd Aqûb

<sup>31</sup>Xudan dît ku Lêa ber ç'e'va r'eş e, bet'inê wê vekir. Lê R'ahêl bêber bû. <sup>32</sup>Lêa pê ma kur'ek anî û navê wî danî R'ûbên\*, çimkî wê got: «Xudan zelûlîya min dît, îdî niha mêrê minê min h'iz ke». <sup>33</sup>Dîsa pê ma, kur'ekî din anî û got: «Çimkî Xudan bihîst ku ez nayême h'izkirinê, lema ev kur' jî da min». Û navê wî danî Şimh'ûn\*. <sup>34</sup>Dîsa pê ma kur'ekî din jî anî û wê got: «Niha îdî mêrê minê t'evî min yek be, çimkî min sê kur' jêr'a anîn» bona vê yekê navê Lêwî\* hate danîn. <sup>35</sup>Dîsa pê ma kur'ekî din anî û got: «Niha ezê pesinê Xudan bidim». Lema navê wî danî Cihûda\*. Û ji zar'anîne hate bir'inê.

**30** R'ahêlê dîna xwe dayê ku ew Aqûbr'a zar'a nayne, h'evsûdî xûşka xwe kir û gote Aqûb: «K'a zar'a bide min, yan na ezê candim». <sup>2</sup>Hêrsa Aqûb li R'ahêlê r'abû û gotê: «Çima stexula ez dewsa Xwedê digirim, ku berê zika ji ser te bir'îye?» <sup>3</sup>Ewê got: «Va ye carîya min Bîlha, her'e cem wê, bira ew li ser çokê min biwelide, ku zar'ê min ji wê hebin». <sup>4</sup>Û wê carîya xwe Bîlha çawa jin da wî. Aqûb serê xwe wêr'a danî. <sup>5</sup>Bîlha pê ma û Aqûbr'a kur'ek anî. <sup>6</sup>Hingê R'ahêlê got: «Xwedê li ser heqî û neheqîda nihêr'î, dengê min jî bihîst û kur'ek da min». Lema navê wî danî Dan\*. <sup>7</sup>Carîya R'ahêlê Bîlha dîsa pê ma kur'ê duda Aqûbr'a anî. <sup>8</sup>R'ahêlê got: «Ez xûşka xwer'a k'etime h'ucetê û min zora wê bir». Û Navê wî danî Neftelî\*.

\* 29:32 Bi zimanê îbranî navê R'ûbên tê fe'mkirinê: «Dîna xwe bidinê kur' e» û dengê xebera R'ûbên nêzîkî «(Xudan) zelûlîya min dît».

\* 29:33 Bi zimanê îbranî «Bihîstin».

\* 29:34 Bi zimanê îbranî «Yektî».

\* 29:35 Dengê wê mîna: «Pesindar».

\* 30:6 Bi zimanê îbranî dengê wê mîna «Dîwankirin» e.

\* 30:8 Bi zimanê îbranî «H'uceta min».

<sup>9</sup>Lêayê gava dît ku ji zar'a hate bir'inê, carîya xwe Zîlpa çawa jin girt da Aqûb. <sup>10</sup>Carîya Lêayê Zîlpayê Aqûbr'a kur'ek anî. <sup>11</sup>Lêayê got: «Ez bextewar im!» Û navê wî danî Gad\*. <sup>12</sup>Carîya Lêayê Zîlpayê kur'ê duda Aqûbr'a anî. <sup>13</sup>Lêayê got: «Ez xwezilî me! K'ulfetê xwezîya xwe li min bînin». Û Navê wî danî Aşê\*.

<sup>14</sup>R'ojêd nandirûnê R'ûbên çû nava zevîya, ewî gizêrêd beyanî\* dîtî û anî da dîya xwe Lêayê. Hingê R'ahêlê gote Lêayê: «K'erema xwe, hinek ji wan gizêrêd beyanîye kur'ê xwe bide min jî». <sup>15</sup>Lê Lêayê got: «Te mêrê min ji min standîye bes nîne, gizêrêd kur'ê mine beyanî jî dixwazî?» R'ahêlê gotê: «Bira îşev ew t'evî te r'azê, ji ber gizêrêd kur'ê teye beyanîva». <sup>16</sup>Êvarê Aqûb ji k'ewşên dihat, Lêa pêşîya wîda çû û gotê: «Tu gerekê t'evî min r'azêyî, çimkî min tu bi gizêrêd kur'ê xweye beyanî k'irêkirî yî». Û ew wê şevê t'evî wê r'aza. <sup>17</sup>Xwedê dengê Lêayê bihîst û Lêa pê ma kur'ê pênca Aqûbr'a anî. <sup>18</sup>Hingê Lêayê got: «Xwedê heqê min da min, çimkî min carîya xwe da mêrê xwe». Û navê wî danî Îsaxar\*. <sup>19</sup>Lêa dîsa pê ma û Aqûbr'a kur'ê şeşa anî. <sup>20</sup>Hingê Lêayê got: «Xwedê p'êşk'êşeke baş da min, mêrê minê îdî cem min bimîne, çimkî min wîr'a şeş kur' anîne». Û navê wî danî Zebûlon\*. <sup>21</sup>Xilazîyê qîzek anî û navê wê danî Dîna.

<sup>22</sup>Xwedê R'ahêl bîr anî û Xwedê dengê wê bihîst bet'inê wê vekir. <sup>23</sup>Ew pê ma kur'ek anî û got: «Xwedê qara min da hildanê». <sup>24</sup>Navê wî danî Ûsiv\* û got: «De bira Xudan kur'ekî din jî li min zêde ke».

\* 30:11 Bi zimanê îbranî «Bextewarî».

\* 30:13 Bi zimanê îbranî «Xwezilî».

\* 30:14 Awa gotî «Mandragor» ku k'o'okeke bin e'rd e, dixwarin ku ji jintî û mêrtîyê nek'evin.

\* 30:18 Bi zimanê îbranî dengê wê mîna «Heq» e.

\* 30:20 Bi zimanê îbranî «Cemmayîn» yan «Qedir».

\* 30:24 Bi zimanê îbranî «Bira ew zêde be».

**Peymana nava Laban û Aqûbda**

<sup>25</sup>Pey vê yekêr'a, gava R'ahêlê Ûsiv anî, Aqûb gote Laban: «Îzina te hebe, ku ez her'ime cî û wat'anê xwe. <sup>26</sup>Jin û zar'êd min bide min, bona k'îjana min ter'a xulamtî kir û ez her'im, çimkî xulamtîya min teva e'yan e, min çî xulamtî ter'a kirîye». <sup>27</sup>Laban gotê: «Heger min ber ç'e'vê te k'erem dît, hîvî dikim! Min tê derxistîye ku Xudan bona xatirê te li ser minda barandîye». <sup>28</sup>Û got: «Heqê xwe bêje ez bidim». <sup>29</sup>Hingê Aqûb gotê: «Tu zanî min çawa ter'a xulamtî kirîye û h'eywanêd teye li ber min çawa bûne. <sup>30</sup>Çimkî berî hatina min, malê te hindik bû, lê li hev zêde bû, Xudan bi hatina min li ser teda barand. Îdî ezê k'engê bona mala xwe bixebitim?» <sup>31</sup>Laban pirsî: «Ez çî bidime te?» Aqûb gotê: «Tu tişteki nede min. Heger tu vê gotina min bikî, ezê dîsa kerîyê pezê te xwey kim û biç'êrînim. <sup>32</sup>Ez îro bik'evime nava t'emamîya kerê te, çiqas pezê deq-deqî û belek hene, usa jî nava berxa çiqas qer hene û nava bizinada jî çiqasî belek û deq-deqî hene, ez veqetînim. Bira evana bibine heqê min. <sup>33</sup>Îro şûnda r'astîya minê li ber te k'îfş be, gava tu bêyî dîna xwe bidî heqê min. Heger nava kerîyê li ber minda, bizinek ne deq-deqî û ne belek be û berx ne qer be, ew li cem min çawa yêd dizîyê bin». <sup>34</sup>Laban gotê: «Baş e! Bira weke gotina te be». <sup>35</sup>Lê wê r'oje Laban\* çiqas nêrîyêd şiv-şivî û belek û çiqas bizinêd deq-deqî û belek, awa gotî çiqas yêd deq-deqîye sipî û bexêd qer hebûn, veqetandin dane kur'êd xwe, <sup>36</sup>û ew r'îya sê r'oja dûrê Aqûb xistin. Aqûb kerîyê pezê Labanî mayîn xwey kir.

<sup>37</sup>Aqûb xwer'a ji dara sipindarê, behîvê\* û çînarê şivdarêd ter' çêkirin, ewî qalikêd wan cî-cîya dat'er'aştin sipî nexş

\* 30:35 Bi zimanê îbranî «Sipî».

\* 30:37 Dareke ku dik'eve li nava k'oma darêd gûzê, dendikêd wê mîna dendikêd zerdela ne.

kirin, usa ku li ser şivdara sipîkayî k'ifş dibû. <sup>38</sup>Hingê ewî şivdarêd xweye dat'er'eşandî, danîne nava h'ewzêd avvexwarinê, ku gava kerî bên avê vexwin, ew li ber pêz bin, dema avvexwarinê pez bê fe'la. <sup>39</sup>Pez li ber şivdara dihatine fe'la û dizan berxêd şiv-şivî, deq-deqî û belek danîn. <sup>40</sup>Aqûb berx vediqetandin û berê pêz didane alîyê yêd şiv-şivî û qere ku nava kerê Labanda hebûn. Aqûb kerê xwe veqetand, t'evî pezê Laban nekir. <sup>41</sup>Û gava wextê fe'lê pezê k'oke-r'ind dihat, Aqûb ew şivdar dadanîne nava h'ewzê avê li ber ç'e'vê pêz, wekî ew li ber şivdara fe'lê xwe bistînin. <sup>42</sup>Lê li ber pezê jare-hûr danedanîn û yêd xirabe bi kêmasî p'ara Laban k'etin, yêd k'oke-r'ind p'ara Aqûb. <sup>43</sup>Usa eva meriva gelekî pêşda çû. Bû xweyê kerîyêd pêze mezin, carîya, xulama, deva û k'era.

### Aqûb ji xalê xwe dir'eva

**31** Aqûb xeberdana kur'êd Laban bihîstin ku digotin: «Aqûb h'emû hebûka bavê me bir û ji hebûka bavê me haqas hebûk t'op kir». <sup>2</sup>Û Aqûb ç'e'v Laban k'et, dîna xwe dayê ku Labanî hindava wîda ne yê berê ye. <sup>3</sup>Hingê Xudan gote Aqûb: «Veger'e welatê kal-bavêd xwe, li cî-misk'enê xwe, ezê t'evî te bim». <sup>4</sup>Aqûb çolê li ber pêz bû, ewî şand gazî R'ahêlê û Lêayê kir <sup>5</sup>û gote wan: «Ez dîna xwe didime mir'ûzê bavê we, ew hindava minda ne yê berê ye. Lê Xwedêyê bavê min, t'evî min bûye. <sup>6</sup>Weva jî e'yan e, ku min bi t'emamîya qewata xwe bavê wer'a xulamtî kirîye. <sup>7</sup>Lê bavê we ez dixapandim, dehe cara heqê min guhast, lê Xwedê nehişt ku ew zîyanekê bide min. <sup>8</sup>Gava wî digot: «Bira yêd deq-deqî ber heqê teva bin», hingê t'emamîya pêz, diza deq-deqî danîn. Lê gava wî digot: «Bira yêd şiv-şivî ber heqê teva bin», hingê t'emamîya pêz, diza şiv-şivî danîn. <sup>9</sup>Bi vî awayî Xwedê h'eywanêd bavê we ji wî standin û dane min. <sup>10</sup>Carekê wextê pêz fe'la bû, min serê xwe bilind kir û xewnêda dîna xwe dayê, va ye kerî bi nêrîyêd şiv-şivî,

deq-deqî û belek dihatine fe'la. <sup>11</sup>Hingê milyak'etê Xwedê xewnêda minr'a got: «Aqûb!» Û min got: «Lebê, ezî va me». <sup>12</sup>Ewî got: «K'erema xwe, serê xwe bilind ke û dîna xwe bidê, vane h'emû nêrîyêd ku pez bi wan têne fe'la, şiv-şivî, deq-deqî û belek in, çimkî min dît her tiştêd ku Laban serê te kirin. <sup>13</sup>Ez Xwedêyê Bêt'-Êlê me, wê dera ku te h'eykel r'ûn kir û li wir minr'a ad-qîrar kir, niha r'abe ji vî welatî derê û vege're li cî-misk'enê xwe». <sup>14</sup>Hingê R'ahêlê û Lêayê lê vege'r'andin û gotinê: «Gelo îdî mala bavê meda, p'ar û wartîya me heye? <sup>15</sup>Gelo bona wî em h'esab nabin mîna xerîba? Çimkî ewî em firotin û p'erê me jî xwarin. <sup>16</sup>Lema jî ew h'emû hebûka ku Xwedê ji bavê me stand, ya me û zar'okêd me ye, niha her tiştêd ku Xwedê gotîye, bike».

<sup>17</sup>Aqûb r'abû, jin û zar'êd xwe li deva sîyar kirin. <sup>18</sup>Ewî h'emû h'eywanêd xwe, h'emû hebûka xweye ku qazinc kiribû û h'eywanêd xweyê ku li Paddan-Aramêda qazinc kiribû, hildan r'êk'et, ku her'e cem bavê xwe Îshaq, welatê Kenanê. <sup>19</sup>Laban çûbû ku pezê xwe bibir'e, R'ahêl p'ûtêd mala bavê xwe dizîn. <sup>20</sup>Aqûb ji Labanê aramîf xwe vedizî r'evî, çimkî wîva e'yan nekiribû, ku wê her'e. <sup>21</sup>Û bi vî awayî ew bi h'emû hebûka xweva r'evî û r'abû ji ç'emê Firatê derbaz bû û berê xwe da alîyê ç'îyayê Gîle'dê.

### Laban pey Aqûb dik'eve

<sup>22</sup>R'oja sisîya cab dane Laban, ku Aqûb r'evîye. <sup>23</sup>Laban biratîya xwe jî t'evî xwe hilda û h'eft r'oja li pey wî k'et. Li alîyê ç'îyayê Gîle'dê xwe wîr'a gîhand. <sup>24</sup>Xwedê şev hate xewna Labanê aramî û gote wî: «Miqatî xwe bî, ku tiştêkî qenc yan xirab Aqûbr'a nebêjî».

<sup>25</sup>Laban xwe Aqûbr'a gîhand. Aqûb konê xwe li ç'îyê vegirtibû. Laban û biratîya xwe jî konêd xwe li ç'îyayê Gîle'dê vegirtin. <sup>26</sup>Û Laban gote Aqûb: «Ev te çi kir? Çima te xwe ji min vedizî r'evîyî û te qîzêd min çawa hêsîrêd bin şûr birin? <sup>27</sup>Te çima ji min veşart, dizîva r'evîyî û minr'a ne got? Minê tu bi

dilê şa ver'êkirayî, pê stirana, defa û çengê zîs. <sup>28</sup>Te nehişt ku ez bihatama r'ûyê qîzêd xwe û nebîyêd xwe. Te bê aqilî kir. <sup>29</sup>Destê minda qewat heye, ku xirabîyê li we bikim. Lê Xwedêyê bavê we şeva derbazbûyî t'evî min xeberda û got: «Miqatî xwe bî, ku tiştêkî qenc yan xirab Aqûbr'a nebêjî». <sup>30</sup>Lê belê tu diçî-diçî, fe'mdarîye wekî te gelekî bîra mala bavê xwe kirîye, lê çima xwedêyêd min dizîn?» <sup>31</sup>Aqûb li Laban vege'and û got: «Çimkî ez tirsîyam, min got belkî tê qîzêd xwe ji min bistî. <sup>32</sup>Lê xwedêyêd xwe li cem k'ê bibînî, bira ew neji. Niha li ber biratîya me biger'e û çî te li cem min hebe hilde xwer'a». Çimkî Aqûb nizanibû ku R'ahêlê ew dizîne. <sup>33</sup>Laban k'ete konê Aqûb, konê Lêayê û konê her du carîya, lê ew nedîtin. Ji konê Lêayê derk'et, k'ete konê R'ahêlê. <sup>34</sup>R'ahêlê ew p'ût hildan kirine t'êr'a devê û li ser wan r'ûnişt. Laban t'emamîya kon li hev xist ger'îya, lê ew nedîtin. <sup>35</sup>R'ahêlê gote bavê xwe: «Bira xweyê min hêrsa xwe li min r'aneke, wekî ez nikarim li ber r'abim, çimkî ez nexweşîya k'ulfetada me». Laban ger'îya lê p'ût nedîtin. <sup>36</sup>Hingê Aqûb hêrs k'et û bezî Laban. Aqûb li Laban vege'and û gotê: «Sûcê min çî ye, gunê min çî ye, wekî tu pey min k'et yî? <sup>37</sup>Tu li nav t'emamîya hûr-mûrêd minda ger'îyayî, te tiştêkî ji mala xwe dît? Derxe dayne li ber biratîya min û biratîya xwe, bira ew vê pîrsê nava me her duyada safî kin. <sup>38</sup>Eva bîst sal e, ku ez li cem te dimam, mî û bizinêd te berneavîtine û min beranêd kerîyê te jî nexwarine. <sup>39</sup>Yêd de'va digirtin, min nedanî li cem te, zirara wê min dik'işand, r'ojê bihata dizîn, şevê bihata dizîn te ji min dixwest. <sup>40</sup>R'ojê ji germê, şevê jî ji sermê dih'elîyam-dimaşîyam. Xew ji ç'e'vê min dit'eqisî. <sup>41</sup>Bîst salî h'alê min mala teda aha bûye. Min çardeh sala bona her du qîzêd te ter'a xulamtî kir, şeş sala jî bona pezê te. Lê te dehe cara heqê min guhast. <sup>42</sup>Heger Xwedêyê bavê min, Xwedêyê Birahîm û Xofa Îshaq ne t'evî min bûya, teyê niha ez r'ast destvala ver'êkirama. Xwedê zelûlîya min û xebat destê min dît û şeva derbazbûyî li te hilat».

**Peymana Laban û Aqûb**

<sup>43</sup>Laban li Aqûb vegeer'and û gotê: «Ev qîz qîzêd min in, ev zar' zar'êd min in, ev kerî kerîyêd min in û her tiştêd ku tu dibînî, ev t'ev yêd min in. Ez îro çî dikarim li qîzêd xwe bikim, yan jî li zar'êd ku ji wan bûne? <sup>44</sup>Niha were ez û tu peymanê girêdin û bira nava min û teda bibe şe'detî». <sup>45</sup>Aqûb kevirek hilda û ew h'eykel da sekinandinê. <sup>46</sup>Aqûb gote biratîya xwe: «Kevira t'op kin». Wan kevîr anîn qûç' kirin û li wir cem qûç'ê nan xwarin. <sup>47</sup>Laban navê wê qûç'ê danî Yigar-Sahadût'a\*. Aqûb navê wê danî Galêd\*\*. <sup>48</sup>Hingê Laban got: «Eva qûç'a îro nava min û teda şe'de ye». Lema navê wê Galêd hate danînê, <sup>49</sup>usa jî Mîspah\* çîmkî wî got: «Xudan li ser min û teda binihêr'e, gava r'ûyê me hev du nek'eve. <sup>50</sup>Heger tu dilê qîzê min bêşînî, yan jî jinêd başqe ser qîzêd minr'a bistînî, kes nava meda t'une, lê Xwedê nava min û teda şe'de ye». <sup>51</sup>Laban serda zêde kir û gote Aqûb: «Va ye ev qûç'a û ev h'eykelê ku min nava xwe û teda da sekinandinê. <sup>52</sup>Eva qûç'a şe'de ye, eva h'eykela şe'de ye, ku ez ji vê qûç'ê derbaz nebim, tu jî ji vê qûç'ê û h'eykelî derbaz nebî bona xirabîyê. <sup>53</sup>Bira Xwedêyê Birahîm û xwedêyê Nehor (xwedêyê bavê wan) nava meda h'akim bin\*». Aqûb pê Xofa bavê xwe Îshaq ad-qirar kir. <sup>54</sup>Aqûb li serê wî ç'îyayî qurban da û gazî biratîya xwe li ser nan kir. Nan xwarin û wê şevê mane li ç'îyê. <sup>55</sup>Laban sibehê zû r'abû, çû r'ûyêd neviyêd xwe û qîzêd xwe û dua li wan kir, Laban vegeer'îya çû cîyê xwe.

---

\* 31:47 Bi zimanê aramî «Qûç'a şe'detîyê».

\*\* 31:47 Bi zimanê îbranî «Qûç'a şe'detîyê».

\* 31:49 Bi zimanê îbranî «Serda binihêr'î».

\* 31:53 Eva fikira Laban bû, çîmkî nava wanda gelexwedêtî bû.

Aqûb r'êva r'astî milyak'eta tê,  
paşê jî r'astî Esaw

**32** Aqûb r'îya xweda çû. Milyak'etêd Xwedê r'astî wî hatin. <sup>2</sup>Gava Aqûb ew dîtîn, got: «Eva zoma ordîya Xwedê ye». Navê wê derê danî Mah'anayîm\*.

<sup>3</sup>Aqûb pêşîya xwe qasid şandine welatê Sêhîrê, t'opraxê Edomêf, cem birê xwe Esaw. <sup>4</sup>Û t'emî da wan û got: «Aha bêjine xweyê min Esaw, ku xulamê te Aqûb aha dibêje: «Ez li cem Laban bûme, h'eta niha jî cem wî xerîbîyêda mame. <sup>5</sup>Ga, k'er, kerîyêd pêz, xulam û carî min qazinc kirine. Niha ez dişnim, xwe xweyê xweva didime h'esandinê, ku ez ber ç'e'vêd te k'eremê bibînim»».

<sup>6</sup>Qasid li ser Aqûbda vege'îyan û gotinê: «Em çûne cem birê te Esaw, va ye ew çarsid merivîva pêşîya teda tê». <sup>7</sup>Aqûb gelekî tirsîya û t'evîhev bû û r'abû merivêd t'evî xwe, pez û dewar, deve kirine du p'ara. <sup>8</sup>Digot: «Heger Esaw li ser p'arekêda bigire û lêxe, hema p'ara din jê xilaz be».

<sup>9</sup>Hingê Aqûb got: «Ya Xwedêyê bavê min Birahîm û Xwedêyê bavê min Îshaq, Xudano! Ku te minr'a got: «Veger'e welatê xwe, li wat'anê xwe, ezê qencîyê li te bikim!» <sup>10</sup>Ez ne hêjayî t'emamîya h'ub û aminîya teyê qedîm im, k'îjan ku te qûlê xwer'a kirine, çimkî ez bi şivdara destê xwe ji vê Êrdunê derbaz bûm û niha bûme xweyê du p'ara. <sup>11</sup>K'erema xwe, min ji destê birê min Esaw xilaz ke, çimkî ez jê ditirsim, nebe ku ew bê, min, dê û zar'okava xe. <sup>12</sup>Ne te gotîye: «Ezê e'seyî qencîyê li te bikim û zur'eta te bikime weke qûma be'rê, ku ji gelek bûnê wê neyê jimarê»».

\* 32:2 Bi zimanê îbranî «Du zomêd ordîya».

<sup>13</sup>Aqûb şeva xwe li wê derê derbaz kir, r'abû ji her tiştê xwe, birê xwe Esawr'a p'êşk'êş hazir kirin. <sup>14</sup>Dusid bizin, bîst nêrî, dusid mî, bîst beran, <sup>15</sup>sî devêd zayî ce'şikêd wanva, çil ç'êlek, dehe boxe, bîst k'erê mê û dehe yê nêr veqetandin. <sup>16</sup>Her kerî, başqe-başqe, dane destê xulamêd xwe û gote xulama: «Pêşîya min her'in, bira her kerî dûrî hev, li pey hev her'in». <sup>17</sup>E'mir li yê pêşîyê kir û gotê: «Gava birê min Esaw r'astî te bê û ji te bipirse: «Tu k'ê yî û tê k'uda her'î? Û evêd li pêşîya te yêd k'ê ne?» <sup>18</sup>Hingê tu bêje: «Ev yêd xulamê te Aqûb in, evana p'êşk'êş xweyê xwe Esawr'a şandine, va ye ew xwexa jî li pey me tê». <sup>19</sup>Aha jî t'emî da yê duda, yê sisîya û h'emûyêd ku li pey kerîya diçûn û got: «Aha bêjinê gava hûn r'astî Esaw bèn <sup>20</sup>û bêjinê: «Va ye xulamê te Aqûb jî li pey me tê». Çimkî ewî xwexa xwer'a digot: «Bi van p'êşk'êşêd ku ez berî xwe dişînim, ezê dilê wî bik'ir'im, paşê r'ûyê wî bibînim, belkî ew min qebûl ke». <sup>21</sup>P'êşk'êş pêşîya wî çûn, lê Aqûb şeva xwe zomêda derbaz kir.

### Destegulaşa Aqûb

<sup>22</sup>Aqûb wê şevê r'abû, her du jinêd xwe, her du carîyêd xwe û her yanzdeh kur'êd xwe hildan û tenikayîya Yaboqr'a derbaz bû <sup>23</sup>û ew hildan avê xistin derbaz kirin, her tiştêd xwe, çî wî hebû derbaz kirin. <sup>24</sup>Aqûb t'enê ma. Merivek h'eta sarê sibehê jêr'a k'ete destegulaşê. <sup>25</sup>Ewî dît ku li Aqûb nikare, ew li sêvika qarç'ika wî k'et û dema destegulaşê Aqûb qarç'ikêda sist bû. <sup>26</sup>Hingê ewî gote Aqûb: «Min ber'de ez her'im, çimkî va ye sibeh zelal dibe». Aqûb got: «H'eta tu dua li min nekî ez te ber'nadim». <sup>27</sup>Ewî gote wî: «Navê te çî ye?» Aqûb got: «Aqûb e». <sup>28</sup>Ewî got: «Îdî navê te Aqûb neyê gotin, lê Îsraêl\*, çimkî tu Xwedê û merivar'a k'etî h'ucetê û

\* 32:28 Bi zimanê îbranî «T'evî Xwedê k'etîyî h'ucetê».

tu ser k'etî». <sup>29</sup>Hingê Aqûb pirsî û got: «Hîvî dikim, navê xwe bêje». Ewî got: «Tu çima navê min dipirsî?» Û li wî cîyî dua li wî kir. <sup>30</sup>Aqûb navê wî cîyî danî Pinîyêl\* û got: «Çimkî min Xwedê r'û bi r'û dît û ez sax mam».

<sup>31</sup>Û gava ew ji Pinuêlê derbaz bû, r'o derk'et û Aqûb qarç'ikêda dikulîya. <sup>32</sup>Lema jî h'eta r'oja îro, zar'êd Îsraêlêf ç'îlê ser sêvika qarç'ikê naxwin. Çimkî li ç'îlê sêvika qarç'ika Aqûb k'et.

### Lihevhatina Aqûb û Esaw

**33** Aqûb serê xwe bilind kir, dîna xwe dayê wê Esaw tê, çarsid mêr jî pêr'a. Hingê ewî zar' belayî li ser Lêayê, R'ahêlê û her du carîya kirin. <sup>2</sup>Carî zar'êd wanva avîtine pêşîyê, Lêa zar'êd wêva avîtine pey wan, R'ahêl û Ûsiv jî avîtine paşîyê. <sup>3</sup>Aqûb da pêşîya wan û h'eta gihîşte birê xwe, h'eft cara h'eta e'rdê dever'ûya çû. <sup>4</sup>Hingê Esaw bezî çû pêşîya wî, ew h'emêz kir, destê xwe stukura wîr'a bir, ew r'amûsa û li ser hevda girîyan. <sup>5</sup>Esaw serê xwe ku bilind kir, ç'e'v k'ulfeta û zar'a k'et, got: «Ev çî te ne?» Aqûb got: «Evana zar'êd ku Xwedê bi r'e'ma xwe dane xulamê te ew in». <sup>6</sup>Hingê carî zar'êd xweva nêzîk bûnê û dever'ûya çûn. <sup>7</sup>Lêa zar'êd xweva jî nêzîk bûnê û dever'ûya çûn. Paşê jî R'ahêl û Ûsiv nêzîk bûnê û dever'ûya çûn. <sup>8</sup>Esaw pirsî: «Meremê wan k'omêd ku ez r'êva r'astî wan hatim çî ye?» Aqûb got: «Bona li ber ç'e'vê xweyê xwe k'erem dîtîneye». <sup>9</sup>Esaw got: «Hebûka min geleke birê min, ya te bira ter'a be». <sup>10</sup>Aqûb got: «Na, hîvî dikim, heger min li ber ç'e'vê te k'erem dîtîye, p'êşk'êşa min ji destê min bigire. Çimkî min r'ûyê te usa dît, tê bêjî yek r'ûyê Xwedê bibîne û tu ji min r'azî yî. <sup>11</sup>Hîvî dikim, vê bimbarekîyê, ya ku min ter'a anîye qebûl ke, eva dayîna ji r'e'ma Xwedê ye, her tiştê min hene».

\* 32:30 Çawa navê Aqûb hate guhastinê usa jî navê vî cîyî hate guhastinê. Navê kevin «Pinuêl» bû lê navê nû «Pinîyêl» fe'mîna wê «R'ûyê Xwedê».

Û zor lê kir ewî jî hilda. <sup>12</sup>Esaw got: «Em r'abin r'êk'evin, ezê li pêşîya te her'im». <sup>13</sup>Aqûb gote wî: «Xweyê minva e'yan e, ku zar'ok nazik in û pez dewar jî zayî ye, heger r'ojekê zû-zû bajon, h'emû kerîyê qir' bin. <sup>14</sup>Hîvî dikim, bira xweyê min pêşîya xulamê xwe her'e, ezê xwer'a hêdî-hêdî nigê h'eywanêd li ber xwe û nigê zar'ar'a bêm, h'eta bigihîjime Sêhîrê cem xweyê xwe».

<sup>15</sup>Esaw got: «Wekî usa ye, ez çend merivêd t'evî xwe, li cem te bihêlim». Aqûb got: «Bona çi? T'enê bira ez ber ç'e'vê xweyê xwe k'eremê bibînim». <sup>16</sup>Wê r'ojê Esaw r'îya xweda vege'îya Sêhîrê. <sup>17</sup>Aqûb k'oç' kir çû Sûkotê û xwer'a mal çêkir, h'eywanêd xwer'a h'olik\* çêkirin. Bona vê yekê navê wî cîyî danî Sûkot\*\*.

<sup>18</sup>Gava Aqûb ji Paddan-Aramê hat û sax-silamet gihîşte welatê Kenanê, bajarê Şixemê, li ber bajêr kon vegirtin. <sup>19</sup>Ew e'rdê ku kon lê vegirtibû, ew ji destê zar'êd Hamorê bavê Şixem, bi sed nalê p'era k'ir'î. <sup>20</sup>Li wir gorîgehek çêkir û navê wê danî Êl-Elohê-Îsraêl\*.

### Dîna û Şixem

**34** Dîna, qîza Lêayê bû, ku Aqûbr'a anî bû, ew derk'et ku qîzêd wî welatî bibîne. <sup>2</sup>Şixemê kur'ê Hamorê h'îwî, axê wî welatî ew dît, dest avîte wê û bi destê zorê ew r'ûr'eş kir. <sup>3</sup>Dilê wî k'ete qîza Aqûb Dînayê, bi dil û can ew begem kir û dilê wêr'a xeberda. <sup>4</sup>Şixem gote Hamorê bavê xwe: «Vê qîzikê minr'a bixwaze». <sup>5</sup>Aqûb bihîst ku ewî qîza wî Dîna r'ûr'eş kirîye, lê çimkî kur'êd wî çolê li ber kerîya bûn, qet deng nekir h'eta ku ew hatin. <sup>6</sup>Hamorê bavê Şixem, çû Aqûbr'a ku xeber de. <sup>7</sup>Kur'êd Aqûb gava bihîstin ew jî ji çolê hatin, bîna xwe teng kirin û gelekî hêrs k'etin. Çimkî evî namûsa Îsraêlêr'a lîst, wekî dest avîte qîza Aqûb. Ewî tişteki nebûyî kir. <sup>8</sup>Hamor wanar'a

\* 33:17 Axil, e'rzêl.

\*\* 33:17 Bi zimanê îbranî «H'olika».

\* 33:20 Bi zimanê îbranî «Êl, Xwedêyê Îsraêl». «Êl» navekî Xwedê ye.

k'ete xeberdanê û got: «Dilê kur'ê min Şixem k'etîye qîza we, hîvî dikim, ewê bidine wî. <sup>9</sup>Bibine xizimê me. Qîzêd xwe bidine me, qîzêd me jî xwer'a bibin. <sup>10</sup>T'evî me bimînin, ev welatê ber we be, navda bimînin, t'ucaretîyê bikin, navda xwer'a xiznê qazinc kin». <sup>11</sup>Şixem gote bav û birayêd keç'ikê: «Bira ez li ber ç'e'vê we k'eremê bibînim, hûn çi ji min bixwazin, ezê bidim. <sup>12</sup>Qelen û xelatêd giran bikine ser stûyê min, devê we çi bixwaze jî ezê bidim, t'enê wê qîzê bidine min». <sup>13</sup>Ewî ku xûşka wan Dîna r'ûr'eş kiribû, kur'êd Aqûb bi h'ilek'arî caba Şixem û bavê wî Hamor dan <sup>14</sup>û gotine wan: «Em nikarin vê yekê bikin, ku xûşka xwe bidine yekî nesinet. Eva mer'a qareke giran e. <sup>15</sup>Lê belê emê t'enê bi vî şertî t'evî we qayl bin, heger hûn bibine mîna me, ji we her qisimê mêr bê sinetkirinê, <sup>16</sup>hingê emê qîzêd xwe bidine we û qîzêd we jî xwer'a bînin, emê t'evî we bimînin û bibine cime'tek. <sup>17</sup>Lê heger hûn guhdarîya me nekin, neyêne sinetkirinê, emê qîza xwe hildin û her'in». <sup>18</sup>Ev gotina wan li Hamor û kur'ê wî Şixem xweş hat. <sup>19</sup>Ewî xortî ev yek derengî neêxist, çimkî ewî gelekî qîza Aqûb begem kiribû. Ew mala bavê xweda, yê herî xweyîqedir bû. <sup>20</sup>Hamor, kur'ê xwe Şixemva hatine li ber dergehê\* bajarê xwe, t'evî mêrêd bajêr xeberdan û gotin: <sup>21</sup>«Ev merivana mer'a dostîyê dikin, awa bira welêtda bimînin, t'ucaretîyê têda bikin, va ye welatî li ber wan mezin e. Werin em qîzêd wan xwer'a bînin, qîzêd xwe jî bidine wan. <sup>22</sup>Lê t'enê ew vî şertîda t'evî me qayl in bimînin û bibine cime'tek, heger ji me her qisimê mêr bê sinetkirinê, çawa ku ew têne sinetkirinê. <sup>23</sup>Gelo kerîyêd wan, hebûka wan, h'emû h'eywanêd wan wê nebine yêd me? T'enê dimîne ku em wanr'a qayl bin, ewê t'evî me bimînin». <sup>24</sup>H'emûyêd ku ji dergehê bajarê wîva derdik'etin, guhdarîya Hamor û kur'ê wî Şixem kirin û h'emû zar'êd nêrîn ku ji dergehê bajarê wîva derdik'etin, hatine sinetkirinê.

\* 34:20 Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretîyê, dîwanê û qirara bû.

<sup>25</sup>R'oja sisîya, gava ewe hê êşêda bûn, du kur'êd Aqûb, birêd Dînayê, Şimh'ûn û Lêwî, her yekî şûrê xwe hilda û k'etine bajêr, t'u kes dernek'ete pêşîya wan, h'emû zar'êd nêrîn kuştin. <sup>26</sup>Hamor û kur'ê wî Şixem avîtine li ber devê şûra kuştin, ji mala Şixem Dîna hildan û derk'etin. <sup>27</sup>Kur'êd Aqûb ser kuştîyada vege'îyan, bajar t'alan kirin, bona ku xûşka wan r'ûr'eş kiribûn. <sup>28</sup>R'ahiştine pez û dewarêd wan, k'er û her tiştêd wane ku li bajêr û zevîyada hebû birin. <sup>29</sup>H'emû hebûka wan, zar' û jinêd wan hêsîr hildan û her tiştêd malada t'alan kirin. <sup>30</sup>Aqûb Şimh'ûn û Lêwî r'a got: «We ez li ber ç'e'vê binelîyêd kenanîya û pirîzî ya avîtim, ev bela anî serê min. Merivêd min hindik in, wê t'opî ser min bin û min xin, ezê mala xweva dest û p'îya her'im». <sup>31</sup>Wana got: «Lê cayîz bû ku mîna qavekê anîne serê xûşka me?»

### Aqûb diçe Bêt'-Êlê

**35** Xwedê gote Aqûb: «R'abe hilkişe her'e Bêt'-Êlê, li wir bimîne û gorîgehekêf çêke bona Xwedêyê ku teva xuya bû, gava tu ji ber birayê xwe Esaw r'evîyî». <sup>2</sup>Aqûb gote neferêd xwe û h'emûyêd t'evî xwe: «Xwedêyêd xerîbe nava xweda bigirin bavêjin, paqij bin û k'incê xwe biguhêzin. <sup>3</sup>Û em r'abin berbi jor her'ine Bêt'-Êlê, li wir gorîgehekê wî Xwedêyîr'a çêkim, yê ku r'oja tengasîya minda dengê min bihîst û wê r'îya ku ez têda çûm t'evî min bû». <sup>4</sup>Hingê wan h'emû xwedêyêd xerîb, çî destêd wanda hebûn û guharêd guhêd xweda dane Aqûb. Aqûb ew li bin dara me'zêye\* nêzîkî Şixemê ç'e'l kir. <sup>5</sup>Û ew r'êk'etin, sawa Xwedê k'ete li ser bajarêd der-dorêd wan û pey kur'êd Aqûb nek'etin. <sup>6</sup>Aqûb xwexa û h'emû cime'ta pêr'a hate Lûzê, awa gotî Bêt'-Êlê, e'rdê Kenanê. <sup>7</sup>Li wir gorîgehek çêkir û navê wê danî

\* 35:4 Dara xirnûfê.

Êl-Bêt'-Êl\*. Çimkî li wir Xwedê wîva xuya bibû, gava ew ji ber birayê xwe r'evî bû.

<sup>8</sup>Xweykirîya R'êvêkayê, Divora mir, ew binîya Bêt'-Êlê, bin me'zêda hate definkirinê û navê wir hate danîn Alon-Baqût\*.

<sup>9</sup>Gava Aqûb ji Paddan-Aramê dihat, Xwedê dîsa wîva xuya bû û dua li wî kir. <sup>10</sup>Û Xwedê gotê: «Navê te Aqûb e! Lê îro şûnda ter'a Aqûb nebêjin, lê navê te Îsraêlf be». Û navê wî danî Îsraêl. <sup>11</sup>Û Xwedê gote wî:

«Ez Xwedêyê Herî Zor im,  
şîn be û li hev zêde be.

Wê ji te miletek û mixulqetêd mileta derên.

Û ji bedena te p'adşayê derên.

<sup>12</sup>Ew welatê ku min dabû Birahîm û Îshaq,

ezê bidime te,

pey ter'a jî wî welatî ezê bidime zur'eta te».

<sup>13</sup>Û Xwedê ji wî cîyê ku pê'r'a xeber dida, jorva hate hilatinê. <sup>14</sup>Aqûb li wî cîyê ku Xwedê pê'r'a xeberda h'eykelek da sekinandinê, h'eykelekî kevirî. Ser kêlikêda dîyarîya serdakirinê û r'ûn r'ête ser. <sup>15</sup>Aqûb navê wî cîyê ku Xwedê pê'r'a xeber dabû danî Bêt'-Êl.

### Mirina R'ahêlê

<sup>16</sup>Ji Bêt'-Êlê k'oç' kirin, hindik mabû ku bigihîştana Efrat'ê, R'ahêl k'ete li ber zar'ê û gelekî cefa k'işand. <sup>17</sup>Gava gelekî cefa dik'işand, pîredergûşê gote wê: «Netirse eva jî ter'a kur' e». <sup>18</sup>Gava ewê r'uh'ê xwe dida, li ber mirinê navê wî danî «Ben-Onî\*». Lê bavê navê wî danî Binyamîn\*\*. <sup>19</sup>Û R'ahêl mir, ew li ser r'îya Efrat'ê, awa gotî Beytleh'mê hate definkirinê. <sup>20</sup>Aqûb li ser t'irba wê kevierek da sekinandinê,

\* 35:7 Bi zimanê îbranî «Xwedêyê Bêt'-Êlê».

\* 35:8 Bi zimanê îbranî «Me'za Şînê».

\* 35:18 Bi zimanê îbranî «Kur'ê k'edera min» yan «Kur'ê qewata min».

\*\* 35:18 Bi zimanê îbranî «Kur'ê destê r'astê».

ku h'eta îro jî kevirê t'irba R'ahêlê ye. <sup>21</sup>Îsraêl k'oç' kir çû, konê xwe li pişta Mîgdal-E'der vegirt. <sup>22</sup>Gava Îsraêl li wî welatî dima, R'ûbên çû dest avîte carîya bavê xwe Bîlhayê. Îsraêl ev yek bihîst\*.

### Kur'êd Aqûb

Donzdeh kur'êd Aqûb hebûn. <sup>23</sup>Kur'êd Lêayê: Nixurîyê Aqûb R'ûbên, Şimh'ûn, Lêwî, Cihûda, Îsaxar û Zebûlon bûn. <sup>24</sup>Kur'êd R'ahêlê: Êsiv û Binyamîn bûn. <sup>25</sup>Kur'êd carîya R'ahêlê, Bîlhayê: Dan û Neftelî bûn. <sup>26</sup>Kur'êd carîya Lêayê, Zîlpayê: Gad û Aşêr bûn. Evana bûn kur'êd Aqûbe ku Paddan-Aramda jêr'a bibûn.

### Mirina Îshaq

<sup>27</sup>Aqûb hate Mamrê, Qîryat-Arbayê, awa gotî Hêbronê li cem bavê xwe Îshaq, wî cîyê ku Birahîm û Îshaq xerîbî derbaz kiribûn.

<sup>28</sup>R'ojêd e'mirê Îshaq sed h'eyştê sal bûn. <sup>29</sup>Îshaq kal bibû, ji e'mirê xwe t'êrbûyî, r'uhê xwe da û mir. Ew t'evî cime'ta xwe bû, kur'êd wî Esaw û Aqûb ew defin kirin.

### Serecema r'ik'inyata Esaw

**36** Ev e serecema r'ik'inyata Esaw, awa gotî Edom. <sup>2</sup>Esaw qîzêd kenanîya xwer'a xwestin: E'daha qîza Êylonê h'îtî û Oholîvamaya qîza E'nayê kur'ê Sîvonê h'îwî. <sup>3</sup>û qîza Îsmayîl, xûşka Nêbayot, Basmet'. <sup>4</sup>E'dahê Esawr'a Elîfaz anî. Basmet'ê R'ihûêl anî, <sup>5</sup>Oholîvamayê Yehûş, Yalam û Qorax anîn. Ev in kur'êd Esaw, yêd ku welatê Kenanêda jêr'a bûn.

<sup>6</sup>Esaw r'abû jinêd xwe, kur' û qîzêd xwe û h'emû merivêd mala xwe, kerî û gar'anêd xwe, h'emû h'eywanêd xwe û h'emû hebûka xweye ku welatê Kenanêda qazinc kiribû hildan, ji r'ûyê birê xwe Aqûbda çû welatekî din. <sup>7</sup>Çimkî hebûka wan

\* 35:22 Binihêr'e Destpêbûn 49:3-4.

gelek bû, nikaribûn hevr'a bimana, welatê ku ew têda çawa xerîb diman, t'êra wan nedikir ji dest kerî û gar'anêd wan. <sup>8</sup>Esaw, awa gotî Edom, li ç'îyayê Sêhîrê cî-war bû.

<sup>9</sup>Ev e serecema r'ik'inyata Esawê bavê edomîya, li serê ç'îyayê Sêhîrê. <sup>10</sup>Navê kur'êd Esaw ev in: Elîfaz, kur'ê Esawî ji E'dahê. R'ihûêl, kur'ê Esawî ji Basmet'ê. <sup>11</sup>Kur'êd Elîfaz, Têman, Omar, Sipo, Get'am û Qinaz bûn. <sup>12</sup>T'îmna, carîya Elîfazê kur'ê Esaw bû, ewê jî Elîfazr'a Amalêk anî. Ev bûn kur'êd E'daha jina Esaw. <sup>13</sup>Kur'êd R'ihûêl ev in: Nah'at, Zerah, Şamma û Mîsah, ev bûn kur'êd Basmet'a jina Esaw. <sup>14</sup>Kur'êd Esaw, yêd ku Oholîvamaya qîza E'nayê kur'ê Sîvonê Esawr'a anîn, ev in: Yehûş, Yalam û Qorax.

<sup>15</sup>Ev in bavê berekêd zar'êd Esaw. Bavêd berekêd zar'êd Elîfazê kur'ê Esawî nixurî, ev bûn: Bavê bereka xwe Têman, bavê bereka xwe Omar, bavê bereka xwe Sipo, bavê bereka xwe Qinaz, <sup>16</sup>bavê bereka xwe Qorax, bavê bereka xwe Get'am, bavê bereka xwe Amalêk. Evana li welatê Edomêda bavêd berekêd Elîfaz bûn, kur'êd E'dahê bûn. <sup>17</sup>Ev in zar'êd R'ihûêl kur'ê Esaw: Bavê bereka xwe Nah'at, bavê bereka xwe Zerah, bavê bereka xwe Şamma, bavê bereka xwe Mîsah. Evana li welatê Edomêda bavêd berekêd R'ihûêl bûn, kur'êd Basmet'a jina Esaw bûn. <sup>18</sup>Ev in kur'êd Oholîvamaya jina Esaw: Bavê bereka xwe Yehûş, bavê bereka xwe Yalam, bavê bereka xwe Qorax. Evana bûn bavê berekêd zar'êd Oholîvamaya jina Esaw, qîza E'nayê. <sup>19</sup>Ev in kur'êd Esaw, awa gotî Edom û ev in mîrêd wan.

### Kur'êd Sêhîr

<sup>20</sup>Ev in kur'êd Sêhîrê h'orî, ku li wî welatîda diman: Lotan, Şoval, Sîvon, E'na, <sup>21</sup>Dîşon, Eser û Dîşan. Ev in kur'êd Sêhîr, bavê berekêd h'orîya welatê Edomêda. <sup>22</sup>Kur'êd Lotan H'orî û Hêymam bûn, xûşka Lotan T'îmna bû. <sup>23</sup>Kur'êd Şoval ev bûn: E'lwan, Manah'at', Eybal, Şifo û Onam. <sup>24</sup>Kur'êd Sîvon ev bûn: Aya û E'na. Eva ew E'na bû, yê ku li çolê kanîyêd avêd germ dîtibûn,

gava k'erêd bavê xwe Sîvon diç'êrandin. <sup>25</sup>Ev in zar'êd E'na, Dîşon û Oholîvama qîza E'na. <sup>26</sup>Ev in kur'êd Dîşon: H'emdan, Eşban, Ît'ran û K'iran. <sup>27</sup>Ev in kur'êd Eser: Bîlhan, Zahavan û Ekan. <sup>28</sup>Ev in kur'êd Dîşan: Ûs û Aran. <sup>29</sup>Ev in bavê berekêd h'orîya: Bavê bereka xwe Lotan, bavê bereka xwe Şoval, bavê bereka xwe Sîvon, bavê bereka xwe E'na, <sup>30</sup>bavê bereka xwe Dîşon, bavê bereka xwe Eser, bavê bereka xwe Dîşan. Ev in bavê berekêd h'orîya, li welatê Sêhîrêda, li gora baveşîrêd berekêd xwe.

### P'adşayêd Edomê

<sup>31</sup>Ev in ew p'adşayêd ku welatê Edomêda, berî p'adşayê îsraêliyayî e'wlin, p'adşatî kirin. <sup>32</sup>Belayê kur'ê Beûr li ser Edomê p'adşatî kir. Navê bajarê wî Dînhava bû. <sup>33</sup>Bela mir, dewsa wî Yovavê kur'ê Zerahê Bozrayî p'adşatî kir. <sup>34</sup>Yovav mir, dewsa wî H'ûşamê ji welatê temanîya p'adşatî kir. <sup>35</sup>H'ûşam mir, dewsa wî Hadadê kur'ê Bedad p'adşatî kir, yê ku li t'opraxa Mowabêda qîr'a Midyana anî. Navê bajarê wî E'wît' bû. <sup>36</sup>Hadad mir, dewsa wî Samlayê ji Masrêqaye p'adşatî kir. <sup>37</sup>Samla mir, dewsa wî Şawûlê ji R'eh'obot'a devê ç'em p'adşatî kir. <sup>38</sup>Şawûl mir, dewsa wî Bae'l-Henanê kur'ê Ek'bor p'adşatî kir. <sup>39</sup>Bae'l-Henanê kur'ê Ek'bor mir, dewsa wî Hadar p'adşatî kir. Navê bajarê wî Pahû bû. Navê jina wî Mihêtabêl bû, eva qîza Matrêd, nebîyê Mê-Zahavê bû.

<sup>40</sup>Ev in navê bavêd berekêd ku ji Esaw bûne, li gora berek û cîyêd xwe navêd xweva: Bavê bereka xwe T'îmna, bavê bereka xwe E'l-wah, bavê bereka xwe Yet'êt, <sup>41</sup>bavê bereka xwe Oholîvama, bavê bereka xwe Êlah, bavê bereka xwe Pînon, <sup>42</sup>bavê bereka xwe Qinzaz, bavê bereka xwe Têman, bavê bereka xwe Mîbsar, <sup>43</sup>bavê bereka xwe Magdîyêl, bavê bereka xwe Îram. Ev in bavê berekêd Edomê li gora cî-warêd xwe û welatê milk'ê xweda. Esaw bavê edomîya ye.

### Ûsiv û biratîya wî

**37** Aqûb li welatê xerîbîya bavê xwe, welatê Kenanêda cî-war bû. <sup>2</sup>Ev e serhatîya r'ik'inyata Aqûb: Ûsiv h'ivdeh salî bû, t'evî birayêd xwe li ber pêz bû. Ew sivikê

nava kur'êd jinbavêd xwe Bîlhayê û Zîlpayêda bû. Ûsiv cab-sawêd wane xirab bavê xwer'a danîn. <sup>3</sup>Îsraêl ji nava kur'êd xweda, ji h'emûya ze'ftir Ûsiv h'iz dikir, çimkî ew kur', mezinaya wîda bibû û ewî k'inceke r'eng-r'engî û dirêj jêr'a çêkir. <sup>4</sup>Bira dîna xwe danê, ku bavê wan, wî ji h'emû bira ze'ftir h'iz dike, ew li ber ç'e'vê wan r'eş bû û nikaribûn zarê xweş pêr'a xebardana.

<sup>5</sup>Ûsiv xewnek dît, r'abû birêd xwer'a gilî kir, hingê ew hê li ber ç'e'vê wan k'et. <sup>6</sup>Ewî gote wan: «Hîvî dikim guh bidine vê xewna ku min dîtîye. <sup>7</sup>Awa eme zevîyêda me gur'z girê didan, min dîna xwe dayê wê gur'zê min r'abû t'îk sekinî, lê awa gur'zêd we dora wî girtin û li ber gur'zê min ta bûn». <sup>8</sup>Birayêd wî gotinê: «Ku usa ye tê li ser me bibî p'adşa? Yan li ser me bibî h'akim?» Û bona xewn û xeberêd wî hê gelekî jenandine wî. <sup>9</sup>Xewneke din jî dîsa dît, r'abû ew birayêd xwer'a gilî kir û got: «Awa min xewneke din jî dît: min dîna xwe dayê wê hîv û r'o û yanzdeh steyrkava li ber min ta dibûn». <sup>10</sup>Gava ewî bav û birayêd xwer'a gilî kir, bavê wî lê hilat û gote wî: «Ev çi xewn e, ku te dîtîye? Çima ez û dîya te û birayêd teva, emê bèn li ber te h'eta e'rdê ta bin?» <sup>11</sup>Birayêd wî h'evsûdîya wî kirin, lê bavê ev yek dilê xweda xwey kirin.

<sup>12</sup>Birayêd wî çûne Şixemê li ber kerêd pezê bavê xwe. <sup>13</sup>Îsraêl gote Ûsiv: «Ne birayêd te li Şixemê li ber pêz in? Were ez te bişînime cem wan». Ûsiv got: «Ez hazir im». <sup>14</sup>Aqûb gote wî: «Hela her'e bizanibe k'a birayêd te silamet in û pezî çawa ne. Xeberekê minr'a bîne». Ew şande deşta Hêbronê. Gava ew çû Şixemê, <sup>15</sup>mêrek r'astî wî hat, ku ew li deştê ber'îyêda diger'îya û wî merivî jê pirsî: «Tu li çi diger'î?» <sup>16</sup>Ewî gotê: «Ez li birayêd xwe diger'im, hîvî dikim bêje min, ew li k'îderê pêz diç'êrînin?» <sup>17</sup>Wî merivî got: «Wan ji vir bar kir çûn. Min bihîst ku wan digotin: «Em her'ine Dot'anê». Ûsiv pey birayêd xwe k'et û ew li Dot'anê dît. <sup>18</sup>Gava ew dûrva dît, hê nêzîkî wan ne bibû, xeyba wî kirin ku wî

bikujin. <sup>19</sup>Û hevr'a gotin: «Va ye, yê xweyê xewna tê! <sup>20</sup>De werin em vî bikujin û bavêjine nava ji van ç'e'la ç'e'lekê. Emê bêjin ku r'e'wirekî beyanî ew xwarîye. Emê t'eselîya xewnêd wî kin, k'a wê çawa bin!» <sup>21</sup>R'ûbên bihîst û ew ji destê wan xilaz kir û got: «Em vî nekujin». <sup>22</sup>R'ûbên gote wan: «Xûnê ner'êjin, ewî bavêjine vê ç'e'la çolê, destê xwe hilnedine li ser wî». Ewî ev yek got, wekî ew ji destê wan xilaz kira û li bavê vege'anda. <sup>23</sup>Û gava Ûsiv hat gihîşte birayêd xwe, k'inca Ûsiv jê êxistin, awa gotî ew k'inca wîye r'eng-r'engîye dirêj ku li wî bû. <sup>24</sup>Û ew girtin avîtine ç'e'lekê, ew ç'e'l vala bû av têda t'unebû. <sup>25</sup>R'ûniştin nanê xwe bixwin.

Wana dîna xwe danê wê k'arvanê îsmayîlîya ji Gîle'd tê. Deveyêd wan bi biharetaf, melh'emê û zimirf barkirî bûn, berjêr dibirine Misirê. <sup>26</sup>Hingê Cihûda gote birayêd xwe: «Emê çi k'arê bibînin, heger em birê xwe bikujin û xûna wî veşêrin? <sup>27</sup>Werin em wî bifiroşine îsmayîlîya û bira destê me li wî nek'evin. Çimkî ew birayê me ye, ji xûn û qinêta me ye». Birayêd wî gur'a wî kirin. <sup>28</sup>Midyanîyêd\* bazirgan ku derbaz dibûn, Ûsiv ji ç'e'lê k'işandin derxistin û Ûsiv bi bîst zîvî firotine îsmayîlîya\*. Wana jî Ûsiv birine Misirê.

<sup>29</sup>R'ûbên ser ç'e'lêda vege'îya, dîna xwe dayê ku Ûsiv ç'e'lêda nîne. Hingê ewî k'incê xwe qelaştin, <sup>30</sup>li ser birayêd xweda vege'îya û got: «Kur'ik t'une! Û ez, ez k'uda her'im?»

<sup>31</sup>Nêrîk serjêkirin û k'inca Ûsiv hildan xûnêda kirin. <sup>32</sup>Ew k'inca r'eng-r'engîye dirêj şandin, anîn dane bavê xwe û gotin: «Me ev dîtîye, hîvî dikim, dîna xwe bidê, eva k'inca kur'ê te ye, tê nas kî, yan na?» <sup>33</sup>Ewî k'inc nas kir û got: «Eva k'inca kur'ê min e! R'e'wirekî beyanî ew xwarîye, Ûsiv hatîye dir'andinê!» <sup>34</sup>Aqûb k'incêd xwe qelaştin, k'urx li navk'êlka xwe girêda û gelek r'oja şîna kur'ê xwe kir. <sup>35</sup>H'emû kur'êd wî û h'emû qîzêd wî r'abûn ku dil bidine li ber wî, lê ewî qebûl

\* 37:28 Midyanîya û îsmayîlîya miletek bûn. Binihêr'e H'akimîf 8:22-24.

ne dikir û digot: «Ezê bi dilekî kul her'ime Dîyarê Mirîya, li cem kur'ê xwe». Û bavê wî girîya bona wî. <sup>36</sup>Midyanîya ew Misirêda firotine Potîfarê wezîrê Firewinî serwêrê nobedara.

### Cihûda û T'amara

**38** Û usa qewimî, ku wî çaxî Cihûda ji cem birayêd xwe berjêr bû, çû cem merivekî e'dûllamî, navê wî H'îra. <sup>2</sup>Li wê derê Cihûda qîza Şûa merivekî kenanî dît, ew stand serê xwe wêr'a danî. <sup>3</sup>Ewa pê ma kur'ek anî, Cihûda navê wî danî Er. <sup>4</sup>Ew dîsa pê ma kur'ek anî, navê wî danî Onan. <sup>5</sup>Ewê dîsa kur'ek anî, navê wî danî Şêlah. Gava ewê ew zar' anî, Cihûda li K'izîbê bû.

<sup>6</sup>Cihûda kur'ê xweyî nixurî Err'a qîzek anî, navê wê T'amara. <sup>7</sup>Kur'ê Cihûdayî nixurî Er, li ber ç'e'vê Xudan yekî xirab bû û Xudan ew kuşt. <sup>8</sup>Cihûda gote Onan: «Borcê t'îyîtîyê biqedîne: t'evî jina birê xwe r'azê, wê bistîne û zur'etê pey birê xwe xe». <sup>9</sup>Onan fe'm kir, ku ew zur'eta wî nayê h'esabê, gava t'evî jinbira xwe r'adiza, ewî meya xwe dir'ête e'rdê, ku zur'etê li pey birê xwe nexe. <sup>10</sup>Ev kirina wî li ber ç'e'vê Xudan xirab k'ifş kir, ew jî kuşt. <sup>11</sup>Cihûda gote bûka xwe T'amarayê: «Jinebî mala bavê xweda r'ûnî, h'eta kur'ê min Şêlah mezin be». Çimkî digot: «Belkî ew jî mîna birayêd xwe bimire». T'amara çû li mala bavê xwe r'ûnişt.

<sup>12</sup>Gelek wext derbaz bû, qîza Şûayê jina Cihûda mir. Cihûda baristan bibû, r'abû xwexa bi t'evî dostê xwe H'îrayê e'dûllamî hevraz çû T'îmnahe, cem pezbir'êd kerê pezêd xwe. <sup>13</sup>Hingê cab dane T'amarayê gotin: «Va ye xezûrê te hevraz tê T'îmnahe pezê xwe bibir'e». <sup>14</sup>Evê k'inca jinebîtîya xwe ji xwe êxist, xwe xêlî kir û xwe p'êç'a û ber dergehê Eynayîmê, li ser r'îya T'îmnahe r'ûnişt. Çimkî ewê dît ku Şêlah mezin bûye û ew nedane wî. <sup>15</sup>Gava Cihûda ç'e'v wê k'et, wî t'irê ew qavek e, çimkî ewê r'ûyê xwe nixamtibû. <sup>16</sup>Ji r'ê dager'îya berbi wê çû û gotê: «Tê qayl bî ku serê xwe minr'a daynî?» Çimkî wî nizanibû ku ew bûka wî ye. Ewê got: «Tê çi bidî min ku tu serê xwe minr'a daynî?» <sup>17</sup>Ewî got: «Ezê ji nava kêrî karekê ter'a bişînim». Ewê got: «Tê çi k'efîlf

bihêlî h'eta ku tu bişînî?»<sup>18</sup> Ewî got: «Ez çî k'efîl bihêlim?» Ewê got: «K'a mora xwe, benpişta xwe û darê destê xwe». Ewî jî ew tişt dane wê û serê xwe pêr'a danî. Û ew ji wî h'emle derk'et.<sup>19</sup> T'amara r'abû çû, xêlîya li ser xwe hilda û k'inca jinebîtîya xwe li xwe kir.

<sup>20</sup> Cihûda bi destê dostê xwe e'dûllamî kar şand, wekî k'efîl ji destê wê k'ulfetê bistîne, lê ewî ew nedît. <sup>21</sup> Ji merivêd wir pîrsî û got: «Ewa xwefroş\* li serê r'îya Eynayîmê k'u ye?» Lê wana got: «Li vir xwefroş\* t'une bûye». <sup>22</sup> Ew vege'îya cem Cihûda û gotê: «Min ew nedît, merivêd li wir jî gotin: «Li vir xwefroş t'une bûye»». <sup>23</sup> Cihûda got: «Bira hema jêr'a be, t'enê em nebine r'obet. Va ye min ev kara şand, lê te ew nedît».

<sup>24</sup> Pey sê mehar'a, gotine Cihûda: «Bûka te T'amara qavî kirîye û niha ji wê qavîyê giran e». Cihûda got: «Wê derxin û bira ew bê şewitandinê». <sup>25</sup> Gava ew derdixistine derva, ewê cab ser xezûrê xweda şand û got: «Ez ji ewî xweyê van tiştê giran im» û got: «Hîvî dikim bira bizanibe vê morê, benpiştê û dar nas dikî?» <sup>26</sup> Hingê Cihûda naskirin û got: «Ew ji min r'asttir e, çimkî min ew neda kur'ê xwe Şêlah». Û îdî neçû cem wê.

<sup>27</sup> Û gava k'ete li ber r'azanê, xuya bû ku va ye zikada cêwî ne. <sup>28</sup> Çaxê zar' dibûn, destek xuya bû, pîredergûşê benekî sor li destê wîva girêda û got: «Eva yê e'wlin e». <sup>29</sup> Ewê ku destê xwe çawa paşda k'işand, birayê wîyî din bû. Hingê ewê got: «Te çî qeliştok bona xwe vekir!» Hingê navê wî Pêrês\* hate danînê. <sup>30</sup> Peyr'a birê wîyî ku benê sor li destê wîva girêdayî bû. Hingê navê wî Zerah\* hate danînê.

---

\* 38:21 Ev e'dûllamî qesta xebera «qav» ne got çimkî e'yîb bû. «Xwefroş» maşoqa p'ût e, ewê heqê xwe danî dîyarî ocaxa p'ût dikir, bi vê kirina xwe ocaxa p'ûtada h'elal dihate h'esabê, çimkî bi qavîya xwe k'ar dida ocaxa p'ûta. Qedirê yêd aha ocaxêd p'ûtada gelekî bilind bû.

\* 38:29 Bi zimanê îbranî «Qeliştok».

\* 38:30 Bi zimanê îbranî «Sorê mîna nûra berbangê».

### Ûsiv Misirêda

**39** Ûsiv berjêrî Misirê kirin. Wezîrê Firewin, Potîfarê misirîyî serwêrê nobedara, ew ji destê îsmayîlîyêd ku ew berjêr biribûne wir k'ir'î. <sup>2</sup>Xudan<sup>f</sup> t'evî Ûsiv bû, ew yekî xêrî jêhatî bû û mala axayê xweyî misirîda dima. <sup>3</sup>Axayê wî dît ku Xudan pêr'a bû û her tiştê ku ew dike, Xudan bi destê wî li hev tîne. <sup>4</sup>Ûsiv li ber ç'e'vê wî k'erem dît û ew bû berdestîyê wî. Ewî ew kire berpirsîyarê mala xwe û h'emû hebûka xwe da destê wî. <sup>5</sup>Wî çaxîda gava ewî ew kire berpirsîyarê mala xwe, Xudan bona xatirê Ûsiv, dua h'emû hebûka mala misirî kir, çawa ku ya malda, usa jî ya e'rdê. <sup>6</sup>Û çî wî hebû h'emû destê Ûsivda hişt û ew haş tiştêkî mala xwe t'une bû, pêştirî wî nanê ku dixwar.

Ûsiv bejin û balêda yekî berbiç'e'v û bedew bû. <sup>7</sup>Pey van yekar'a, usa bû ku jina axayê wî ç'e'v berda Ûsiv û gotê: «Serê xwe minr'a dayne». <sup>8</sup>Lê ewî t'exsîr kir û gote jina axayê xwe: «Axayê min haş ji pê t'une mala wîda çî wî cem min heye û h'emû hebûka xwe daye destê min. <sup>9</sup>Vê malêda jî ji min mezintir kes t'une û tiştêk jî ewî ji min na-na nekiriye pêştirî te, çimkî tu jina wî yî, ezê çawa vê xirabîya mezin bikim û li ber Xwedê gune bikim?» <sup>10</sup>Evê ku her r'o aha digote Ûsiv, lê ewî gur'a wê nedikir, ku ew t'evî wê r'azê yan t'evî wê be.

<sup>11</sup>Û r'ojekê, gava ew k'ete malê, ku şixulê xwe bike û ji merivêd wê malê jî kesek ne malda bû, <sup>12</sup>hingê xanimê dest avîte k'inca wî girt û got: «Serê xwe minr'a dayne». Lê ewî k'inca xwe destê wêva berda û r'evî derk'ete derva. <sup>13</sup>Çaxê ewê dîna xwe dayê, ku ewî k'inca xwe dêstva berda û r'evî derva, <sup>14</sup>ewê gazî merivêd mala xwe kirin, wanr'a gilî kir û got: «Hela dîna xwe bidinê, evî çû îbranîk anî ku namûsa mer'a bilîze. Eva hate cem min, ku dest bavêje min, lê min bi dengê bilind kire qar'în. <sup>15</sup>Evî ku bihîst min dengê xwe bilind kir û kire qar'în, k'inca xwe li cem min hişt û r'evî derk'ete derva».

<sup>16</sup>Û ewê k'inca wî li cem xwe xwey kir, h'eta ku xweyê wê hate malê. <sup>17</sup>Dîsa ev gotina xwe wek'iland gote wî: «Ew xulamê îbranîyîf ku te mer'a anîye, hate cem min, ku namûsa minr'a bilîze. <sup>18</sup>Lê gava min dengê xwe bilind kir û kire qar'în, ewî k'inca xwe hişt û r'evî derva».

<sup>19</sup>Û gava axayê wî ev xeber ji jina xwe bihîstin, ku jêr'a gilî kir got: «Xulamê te ev yek anî serê min». Hêrsa wî r'abû. <sup>20</sup>Axayê Ûsiv ew girt avîte kelê, wî cîyê ku girtîyêd p'adşê girêdayî bûn. Û ew li wir kelêda ma. <sup>21</sup>Lê Xudan t'evî Ûsiv bû û h'uba xweye amin da k'ifşê, usa ku ewî ber ç'e'vê serwêrê kelê k'erem dît. <sup>22</sup>Serwêrê kelê h'emû girtîyêd kelê dane destê Ûsiv. Û çî ku li wir dihate kirinê, ewî dida kirinê. <sup>23</sup>Serwêrê kelê dîna xwe nedida wan tiştêd destê wîda, çimkî Xudan t'evî wî bû û h'emû şixulê wî Xudan jêr'a li hev danî.

### Ûsiv kelêda du xewna şirovedike

**40** Û usa qewimî, ku pey van yekar'a, şeravdar û nanpêjê p'adşê Misirê, hindava xweyê xwe, p'adşê Misirêda neheqî kirin. <sup>2</sup>Hêrsa Firewin li ser du wezîrêd wî, awa gotî li serwêrê şeravdar û serwêrê nanpêjê wî r'abû <sup>3</sup>û ew avîtine girtîxana kela mala serwêrê nobedara, wî cîyê ku Ûsiv têda girtî bû. <sup>4</sup>Serwêrê nobedara Ûsiv kire wek'ilê wan û ewî xizmetk'arîya wan dikir. Û evana hinek wext girtîxanêda man.

<sup>5</sup>Û şevêkêda van her duya, şeravdar û nanpêjê p'adşê Misirê, yêd ku kelêda girtî bûn, her yekî ligora fe'mîna xewna, xewnê xwe dîtin. <sup>6</sup>Sibehê zû Ûsiv hate cem wan, dîna xwe dayê ku ewe va me'dekirî ne. <sup>7</sup>Û ewî ji wan wezîrêd Firewin, yêd ku mala xweyê wîda t'evî wî girtîxanêda bûn pirsî: «Hûn çima îro mir'ûz kirî ne?» <sup>8</sup>Wana gote wî: «Me xewn dîtine û kesek t'une ku şiroveke». Ûsiv wanr'a got: «Şirovekirin ji Xwedê ye! K'erem kin, minr'a bêjin».

<sup>9</sup>Serwêrê şeravdara xewna xwe Ûsivr'a gilî kir û got: «Xewna minda va ye k'oleke tirîyê ber min bû, <sup>10</sup>li ser wê k'olê sê ç'iql hebûn, ewê gupik da, gulêd wê vebûn û gûşîyêd tirîya

gihîştin. <sup>11</sup>K'asa Firewin jî destê minda bû, min tirî hildan, k'asa Firewinda guhaştin û k'as da destê Firewin». <sup>12</sup>Ûsiv gote wî: «Şirovekirina wê ev e: sê ç'iqil, ew sê r'oj in. <sup>13</sup>Sê r'oja şûnda Firewinê te bilind ke û dîsa wê te dayne li ser qulixa te û çawa tu cem wî şeravdar bûyî, tê dîsa mîna e'detê berê, k'asa Firewin bidî destê wî. <sup>14</sup>Lê gava dergehê xêrê li ser te vebe, min bînî bîra xwe, qencîkê jî minr'a bikî û li ber Firewin min bîr bînî, min ji vê malê derxî. <sup>15</sup>Çimkî r'ast ez ji welatê îbranîya hatime dizînê, usa jî vira min tiştêkî usa nekiribû, ku bik'etama vê zindanê».

<sup>16</sup>Serwêrê nanpêja dît, ku şirovekirina wî li wî xweş hat, gote Ûsiv: «Xewna minda va ne sê sele nanê sipî li ser serê min bûn, <sup>17</sup>sela lape jorinda her cûr'e xwarinêd Firewin hebûn, yêd ku nanpêj çêdike û teyreda ji sela li ser serê min nikul dikirin dixwarin». <sup>18</sup>Ûsiv lê vege'and û gotê: «Şirovekirina wê ev e: sê sele, ew sê r'oj in. <sup>19</sup>Sê r'oja şûnda Firewinê te bilind ke û te dar xe, teyredeyê jî te nikul kin goştê te bixwin».

<sup>20</sup>R'oja sisîya, ku r'oja bûyîna Firewin bû, ewî mesrefek bona h'emû xulamêd xwe danî û ji nava xulamêd xwe, serwêrê şeravdara û serwêrê nanpêja bilind kirin\*. <sup>21</sup>Serwêrê şeravdara danî li ser qulixa wî û ewî k'as da destê Firewin, <sup>22</sup>lê serwêrê nanpêja dar xist, çawa Ûsiv şirovekiribû. <sup>23</sup>Îdî Ûsiv ne k'ete bîra serwêrê şeravdara û ewî ew bîr kir.

### Ûsiv xewnêd Firewin şirovedike

**41** Û usa qewimî, ku du sala şûnda Firewin xewnek dît, va ye ew li devê ç'emê Nîlê sekinî bû <sup>2</sup>û va ne h'eft noginêd bedewe k'ok ji Nîlê derk'etin û nava qamîşada çêrîyan. <sup>3</sup>Pey wanr'a, dîna xwe dayê, va ne h'eft noginêd din jî, h'işkolekîye qav-qavkî ji

\* 40:20 Ji kelê derxistin.

Nîlê derk'etin, cem wan nogina li devê Nîlê sekinîn, <sup>4</sup>û wan noginêd h'işkolekîye qav-qavkî, ew her h'eft noginêd bedewe k'ok xwarin, hingê Firewin h'işyar bû.

<sup>5</sup>Û ç'e'vê wî dîsa çûne li ser hev, ewî cara duda xewn dît, va ye li ser sapekê, h'eft simbilêd t'ijî û r'ind derdik'etin. <sup>6</sup>Pey wanr'a va ye h'eft simbilêd valaye ji bayê r'ohilatê\* şewitî şîn bûn, <sup>7</sup>û wan simbilêd vala, ew her h'eft simbilêd t'ijîye r'ind h'ûfî xwe kirin. Firewin h'işyar bû, va ye xewn bû.

<sup>8</sup>Wê sibehê dilê Firewin ku ne r'ih'et bû, ewî şand gazî h'emû k'oç'eka û zaneyêd Misirê kirin û xewnêd xwe wanr'a gilî kirin, lê kesek t'unebû ku ew xewn Firewinr'a şirovekirana.

<sup>9</sup>Hingê serwêrê şeravdara Firewinr'a xeberda û gotê: «Îro gunek'arîya min hate bîra min. <sup>10</sup>Wê hingê gava Firewin hêrsa xwe li ser xulamêd xwe r'akir, ez avîtîme girtîxana mala serwêrê nobedara, t'evî serwêrê nanpêja. <sup>11</sup>Min û wî şevêkêda xewn dîtî, me her yekî li gora fe'mîna xewna xwe, xewn dîtî. <sup>12</sup>Li wir xortekî îbranî t'evî me hebû, ew xulamê serwêrê nobedara bû, me xewnêd xwe wîr'a gilî kirin, ewî mer'a şirovekirin, xewnêd me her yekî ewî r'ast mer'a şirovekirin. <sup>13</sup>Ewî çawa mer'a şirovekirin, usa jî bû, ez vege'îyame li ser qulixê xwe, lê ewê din hate darxistinê».

<sup>14</sup>Hingê Firewin şande pey Ûsiv. Ew bi lez ji zindanê derxistin, r'ûyê xwe kur' kir, k'incêd xwe guhastin û hate cem Firewin. <sup>15</sup>Firewin gote Ûsiv: «Min xewn dîtîye, lê kesek t'une ku bikaribe minr'a şiroveke, min bihîstîye ku dibêjin: tu xewna dibihêyî û şirovedikî». <sup>16</sup>Ûsiv li Firewin vege'and û gotê: «Ev h'unirê min nîne, lê Xwedêyê cabeke xêr bide Firewin». <sup>17</sup>Firewin

\* 41:6 Bayê ku ji ber'îya germ dihat.

Ûsivr'a got: «Min xewn dît: va ye ez li devê Nîlê sekinî bûm, <sup>18</sup>va ne h'eft noginêd bedewe k'ok ji Nîlê derk'etin û nava qamişada ç'êrîyan. <sup>19</sup>Pey wanr'a, min dîna xwe dayê, va ne h'eft noginêd din jî, jar, h'işkolekî û qav-qavkî, ku min t'emamîya welatê Misirêda yêd mîna wan usa h'işkolekî nedîtine, <sup>20</sup>û wan noginêd h'işkolekîye qav-qavkî, ew her h'eft noginêd pêşîyêye k'ok xwarin. <sup>21</sup>Ew çûne zikêd wan û qet k'ifş jî nedibû ku ew çûne zikêd wan, ew usa jî h'işkolekî man mîna berê. Û ez h'işyar bûm. <sup>22</sup>Û dîsa xewn dît, va ye li ser sapekê h'eft simbilêd t'ijî û r'ind derdik'etin. <sup>23</sup>Pey wanr'a h'eft simbilêd h'işk û valaye ji bayê r'ohilatê şewitî şîn bûn, <sup>24</sup>û wan simbilêd vala, ew her h'eft simbilêd t'ijîye r'ind h'ûfî xwe kirin. Min k'oç'ekar'a gilî kir, lê kesekî minr'a şirovenekir».

<sup>25</sup>Hingê Ûsiv gote Firewin: «Xewnêd Firewin yek in. Tiştê ku Xwedêyê bike, ew e'lamî Firewin kirîye. <sup>26</sup>Ew her h'eft noginêd r'ind, ew h'eft sal in, usa jî ew her h'eft simbilêd r'ind, h'eft sal in, ev xewn yek in. <sup>27</sup>Ew her h'eft noginêd h'işkolekîye û qav-qavkî, ku pey wanr'a derk'etin, ew h'eft sal in û ew her h'eft simbilêd valaye ji bayê r'ohilatê şewitî, ew her h'eft salêd xelayê ne. <sup>28</sup>Ez vê yekê dibêjime Firewin, wekî Xwedê tiştê ku wê bike, nîşanî Firewin kirîye. <sup>29</sup>Va ye, h'eft salê bên, ku t'emamîya welatê Misirê wê t'êr û t'ijî be. <sup>30</sup>Lê pey wan salar'a, wê h'eft sala bibe xelayî û h'emû t'êr û t'ijîbûna welatê Misirê wê bê bîrkinê. Xelayê welêt daqurtîne. <sup>31</sup>Û wê usa be, ku ji dest wê xelaya ku wê peyr'a bê, ew t'êr û t'ijîbûna welêt îdî neyê bîranînê. Çimkî xelayê gelekî giran be. <sup>32</sup>Lê xewna ku Firewinr'a du cara hatîye wek'ilandinê, tê h'esabê, ku ev yek alîyê Xwedêda e'seyîkirî ye û Xwedê wê zûtirekê bike. <sup>33</sup>Bira niha Firewin merivekî bîlan û serwaxt bibîne û wî dayne

li ser t'emamîya welatê Misirê. <sup>34</sup>Bira Firewin vê yekê bike, berpîrsîyar dayne li ser welêt û nava van h'eft salêd t'êr û t'ijîda, ji h'emû deremetêd welatê Misirê ji pêncê yekî bistînine. <sup>35</sup>Û bira h'emû xurekêd nava van salêd qencda ku wê bèn t'op kin, û bin destê Firewinda genim bidine serhev û bajarada xurek xwey kin, <sup>36</sup>wekî xurek k'îsê welêtda hebe, bona wan h'eft salêd xelayêye ku wê welatê Misirêda bibe, ku welat ji xelayê qir' nebe».

<sup>37</sup>Ev yek li Firewin û h'emû xulamêd wî xweş hat. <sup>38</sup>Firewin gote xulamêd xwe: «Hûn dikarin merivekî mîna vî bibînin, ku R'uh'ê Xwedê\* têda be?» <sup>39</sup>Hingê Firewin gote Ûsiv: «Xwedê ku ev yek li ber te vekirîye, bîlan û serwaxtê mîna te t'unene. <sup>40</sup>Tu li ser mala minr'a be, t'emamîya cime'ta min jî guhdarîya gotinêd devê te bike, ez t'enê t'extê xweda ji te mestir bim». <sup>41</sup>Û Firewin serda zêde kir û gote Ûsiv: «Va ez te datînime li ser t'emamîya welatê Misirê». <sup>42</sup>Hingê Firewin gustîla mora xwe ji t'ilîya xwe derxist, kire t'ilîya Ûsiv, k'incêd k'itanî zirav lêkirin û zincîreke zêr'în avîte stûyê wî. <sup>43</sup>Ew li e'reba xweye duda da sîyarkirinê û pêşîa wî bi dengê bilind dikirine gazî: «Çok bidin!» Û ew danî li ser t'emamîya welatê Misirê. <sup>44</sup>Firewin gote Ûsiv: «Ez Firewin im, bêyî te t'u kes, t'emamîya welatê Misirêda nikaribe destê xwe yan nigê xwe bilind ke». <sup>45</sup>Firewin navê Ûsiv danî Safinat'-Panêa û Asnat'a qîza Potî-Perayê t'erêqê bajarê Onê da wî. Ûsiv r'abû li welatê Misirê biger'e. <sup>46</sup>Ûsiv sî salî bû, gava ew li ber Firewin p'adşê Misirê sekinî. Ûsiv ji cem Firewin derk'et, li t'emamîya welatê Misirê ger'îya.

\* 41:38 Aha jî tê fe'mkirinê: «r'uh'ê xwedêya».

<sup>47</sup>Wan h'eft salêd t'êr û t'ijîtîyêda, e'rdê gelek deremet da. <sup>48</sup>Ewê h'emû xurekêd wan h'eft salêd ku e'rdê Misirê dida, da ser hev, û ew xurek bajarada cî-war kirin, her xurekêd ji e'rdê dor û berêd bajara, nava wanda cî-war kirin. <sup>49</sup>Ûsiv mîna qûma be'rê, haqasî gelek genim lod kir, usa ku îdî h'esab nekirin, çimkî nedihate h'esabê.

<sup>50</sup>Berî hatina salêd xelayê, Ûsivr'a du kur' bûn. Evana Asnat'a qîza Potî-Perayê t'erêqê bajarê Onê jêr'a anîn. <sup>51</sup>Ûsiv navê kur'ê xweyî nixurî danî Minaşe\* û got: «Çimkî Xwedê h'emû derd-kulê min û mala bavê min ji bîra min derxistin». <sup>52</sup>Navê yê duda danî Efrayîm\* û got: «Çimkî Xwedê wî welatê zelûlîya minda, bedena min şîn kir».

<sup>53</sup>Ew her h'eft salêd welatê Misirêdaye t'êr û t'ijîyê derbaz bûn, <sup>54</sup>û ew her h'eft salêd xelayê destpêkirin, çawa ku Ûsiv gotibû. H'emû welatada bû xelayî, lê t'emamîya welatê Misirêda nan hebû. <sup>55</sup>Gava bir'çîbûn k'ete t'emamîya welatê Misirê, cime'tê bona nan hewara xwe Firewin danî. Firewin gote h'emû misirîya: «Her'ine cem Ûsiv, çi wer'a bêje bikin». <sup>56</sup>T'emamîya r'ûyê e'rdê bû xelayî, Ûsiv h'emû e'mbar vekirin û firote misirîya. Xelayî welatê Misirêda giran bû. <sup>57</sup>Û ji t'emamîya t'opa dinê dihatine Misirê, ji Ûsiv genim dik'ir'in, çimkî li ser t'emamîya r'ûyê e'rdê xelayî giran bibû.

### Aqûb kur'êd xwe dişîne Misirê

**42** Aqûb bihîst ku li Misirê genim heye û Aqûb gote kur'êd xwe: «Hûn çi ç'e'vê hev dinihêr'in?» <sup>2</sup>Gote wan: «Awa min bihîstîye ku li Misirê genim heye, berjêrî li wir bin û ji wir mer'a bik'ir'in, ku em bijîn nemirin». <sup>3</sup>Dehe birayêd Ûsiv berjêr çûne Misirê, ku genim bik'ir'in. <sup>4</sup>Lê Aqûb birayê Ûsiv Binyamîn, t'evî birayêd wî ne şand, digot: «Belkî qezîk bê serê wî». <sup>5</sup>Kur'êd Îsraêlf hatibûn genim bik'ir'in, t'evî yêd mayîne hatî, çimkî li welatê Kenanêda xelayî bû.

\* 41:51 Dengê wê mîna: «Da bîrkin».

\* 41:52 Bi zimanê îbranî «Xweyîber».

<sup>6</sup>Ûsiv xwexa serwêrê wî welatî bû. Ewî xwexa jî xurek difirote t'emamiya cime'ta welêt. Birayêd Ûsiv hatin û li ber wî dever'ûya çûne erdê. <sup>7</sup>Ûsiv birayêd xwe ku dîtin ewî ew nas kirin. Lê xwe usa da k'ifşê yanê ew wan nas nake, t'evî wan hêrs xeberda û gote wan: «Hûn ji k'u hatine?» Wana got: «Em ji welatê Kenanê bona xurek k'ir'înê hatine». <sup>8</sup>Ûsiv birayêd xwe nas kirin, lê wana ew nas nekirin. <sup>9</sup>Hingê Ûsiv ew xewnêd ku li ser wan dîtibûn bîr anîn û gote wan: «Hûn ce'sûs in, hûn hatine ku cîkî sistîya vî welatî bibînin». <sup>10</sup>Wana gote wî: «Na xweyê me, xulamêd te hatine ku xurek bik'i-r'in». <sup>11</sup>Em h'emû kur'êd bavekî ne, em merivne şîrh'elal in, xulamêd te ne ce'sûs in. <sup>12</sup>Ewî gote wan: «Na, hûn hatine ku cîkî sistîya welêt bibînin». <sup>13</sup>Wana got: «Em xulamêd te, donzdeh bira ne, welatê Kenanêda kur'êd bavekî ne, yê biç'ûk niha li cem bavê me ye, lê yek jî îdî t'une». <sup>14</sup>Ûsiv gote wan: «Hema ev e ku min gote we: «Hûn ce'sûs in!» <sup>15</sup>Hûnê bi vê yekê bêne cêr'ibandin: Ez serê Firewin kim, hûn ji vir dernak'evin h'eta ku birayê weyî biç'ûk neyê vê derê. <sup>16</sup>Ji nav xweda yekî bişînin, bira her'e birayê we bîne, lê hûnê girtî bin, ku aha gotinêd we bêne cêr'ibandinê, wanda r'astî heye yan na. Lê heger na. Ez serê Firewin kim: «Hûn ce'sûs in!»» <sup>17</sup>Sê r'oja ew avîtine girtîxana kelê.

<sup>18</sup>R'oja sisîya Ûsiv gote wan: «Aha bikin ku hûn sax bimînin, çimkî ez ji Xwedê ditirsim. <sup>19</sup>Heger hûn merivne şîrh'elal in, bira ji birayêd we yek vê mala ku hûn têda girtî ne, bimîne, lê yêd mayîn genim xelaya mala xwer'a bigihînin, <sup>20</sup>birayê xweyî biç'ûk jî minr'a bînin, wekî gotina we r'ast derê û hûn nemirin». Wana usa jî kir. <sup>21</sup>Û hingê hevr'a gotin: «Bi r'astî em hindava birayê xweda gunek'ar in, çimkî me te'lî-tengîya wî dît, gava li ber me lava-dîlek fikir, lê me guh nedayê, lema jî ev te'lî-tengî tê serê me». <sup>22</sup>R'ûbên li wan vege'and û got: «Min wer'a nedigot: «Hindava kur'ikda guna nekin?» Lê we gur'a min nekir, niha xûna wî ji me tê xwestinê». <sup>23</sup>Wana nizanebûn, ku Ûsiv wan fe'm dike,

çimkî pê t'ercimekir wanr'a xeber dida. <sup>24</sup>Ûsiv ji wan dûr k'et, girîya. Dîsa li ser wanda vege'rîya, t'evî wan xeberda û ji nava wanda Şimh'ûn girt, li ber ç'e'vê wan ew girêda. <sup>25</sup>Ûsiv ferman kir, ku barêd wan genim dagirin, û p'erê wan her kesî têkine t'êr'êd wan, nanê r'ê jî wanr'a daynin. Usa jî hate kirinê. <sup>26</sup>Wana genimê xwe li k'erêd xwe bar kirin û ji wir çûn. <sup>27</sup>K'arvanserêda yekî ji wan t'êr'a xwe vekir, ku kayê bide k'erê xwe, dîna xwe dayê va ye p'erê wî li ser devê t'êr'ê ye. <sup>28</sup>Û ewî gote birayêd xwe: «P'erê min li min vege'r'andine, va ye ew vir t'êr'a min daye». Hingê dilê wan nava wanda r'icifî û bi tirs hevr'a gotin: «Xwedê ev çi anî li serê me?»

<sup>29</sup>Ew hatine welatê Kenanê, cem bavê xwe Aqûb û her tiştê ku hatibû li serê wan, t'ev gilîkirin û gotinê: <sup>30</sup>«Meriv ku xweyê wî welatî ye mer'a h'işk xeberda, em danîne dewsa ce'sûsêd welêt. <sup>31</sup>Me wîr'a got: «Em merivne şîrh'elal in, em ne ce'sûs in. <sup>32</sup>Em donzdeh birane, kur'êd bavekî ne, lê yek jî îdî t'une, lê yê biç'ûk niha li welatê Kenanê cem bavê me ye». <sup>33</sup>Wî merivê xweyê wî welatî mer'a got: «Ezê bi vê yekê bizanibim ku hûn merivne şîrh'elal in, birakî xwe cem min bihêlin, lê hûn bona xelaya mala xwe, xurek hildin her'in. <sup>34</sup>Lê birayê xweyî biç'ûk minr'a bînin, wekî ez bizanibim, ku hûn ne ce'sûs in, lê merivne şîrh'elal in, ezê birayê we bidime we, hûnê jî bikaribin vî welatîda t'ucaretîyê bikin».

<sup>35</sup>Gava wana t'êr'êd xwe vala dikirin, dîna xwe danê wê k'îsikê p'erê wan her kesî jî t'êr'êd wanda ne. Wan û bavêd xweva, gava ew k'îsikêd p'erêd xwe dîtin, tirsîyan. <sup>36</sup>Hingê bavê wan, Aqûb gote wan: «We destê min ji kur'êd min kirin, Ûsiv t'une, Şimh'ûn t'une û Binyamîn jî dixwazin ji min bistînin, ev h'emû tê serê min!» <sup>37</sup>R'ûbên bavê xwer'a xeberda û got: «Heger ez wî neynim nedime te, tu van her du kur'êd min bikuje, k'a ewî bide destê min û ezê wî paşda bînim bidime te». <sup>38</sup>Lê Aqûb got: «Kur'ê minê t'evî we berjêr

nayê, çimkî birayê wî mirîye û ew t'enê maye, heger wê r'îya ku hûn têda diçin qezîk bê serê wî, hingê hûnê p'orê minî sipî, bi k'eder bikine Dîyarê Mirîya».

### Bira Binyamîn t'evî xwe dibine Misirê

**43** Xelayê zor li welêt kir. <sup>2</sup>Gava genimê ji Misirê anîbûn, xwarin xilaz kirin, bavê wan gote wan: «Dîsa vege-  
r'in bona me hinek xurek bik'ir'in». <sup>3</sup>Lê Cihûda lê vege-  
r'and û gotê: «Ewî merivî gilîyê t'am da destê me û got: «Heger  
birayê we t'evî we nîbe, r'ûyê we li r'ûyê min nek'eve». <sup>4</sup>Heger  
tê birayê me t'evî me bişînî, emê berjêr bin ter'a xurek bik'i-  
r'in, <sup>5</sup>lê heger tu neşînî, em berjêr naçin. Çimkî ewî merivî  
mer'a got: «Heger birayê we t'evî we nîbe, r'ûyê we li r'ûyê  
min nek'eve». <sup>6</sup>Îsraêl got: «Çima we ev neheqî minr'a kir:  
gote wî merivî ku birakî weyî din jî heye?» <sup>7</sup>Wana got: «Ewî  
merivî h'alê me, h'alê pismamêd me bi hûr-gilî pirsî got: «Bavê  
we hê sax e? Birayê we dîsa hene?» Me jî caba van pirsî da  
wî. Me çî zanibû ku ewê bêje: «Birayê xwe berjêr bînin?»  
<sup>8</sup>Cihûda bavê xwe Îsraêl'r'a got: «Kur'ik t'evî min bişîne, em  
r'abin her'in, wekî em sax bimînin, ne em bimirin ne tu, ne jî  
zar'okêd me. <sup>9</sup>Ez cabdarîya bona wî hildidime li ser xwe, tu  
wî ji destê min bixwaze, heger ez wî neynim nedime te û li  
ber te nedime sekinandinê, t'emamîya e'mirê xweda ez li ber  
te gunek'ar bim. <sup>10</sup>Heger me derengî nexista, em niha cara  
duda lê vege-  
r'îya bûn». <sup>11</sup>Bavê wan Îsraêl wanr'a got: «Heger  
usa ye, niha aha bikin, t'evî xwe r'ezêd başe vî welatî xwer'a  
hildin û wî merivî'r'a p'êşk'êş berjêr bibin, hinek melh'em,  
hingiv, biharet<sup>f</sup>, zimir, fisteq û behîv. <sup>12</sup>T'evî xwe jî dubare  
p'era hildin, wan p'erêd ku li ser devêd t'êr'êd we danî paşda  
hatine, bi destêd xwe paşda bibin, dibe ku şaş kiribin, <sup>13</sup>r'abin  
birê xwe hildin û dîsa vege-  
r'in cem wî merivî. <sup>14</sup>Bira Xwedêyê  
Herî Zor, bide we ku hûn li ber wî k'eremê bibînin, wekî ew  
birê weyî din û Binyamîn li we vege-  
r'îne. Lê heger ez destê  
xwe ji wan kur'êd xwe bikim jî, bira bêkur' bim».

<sup>15</sup>Û vana ev p'êşk'êş û destê xweda jî dubare p'ere, usa jî Binyamîn hildan r'abûn berjêrî Misirê bûn û li ber Ûsiv sekinîn. <sup>16</sup>Gava Ûsiv Binyamîn t'evî wan dît, gote wek'îlê mala xwe: «Van meriva bibe malê, goştî serjêke û hazir ke, çimkî ewê firavînê t'evî min bixwin». <sup>17</sup>Û wî merivî, Ûsiv çawa gotibûyê, usa jî kir, ew meriv birine mala Ûsiv. <sup>18</sup>Ev merivana tirsîyan, ku ew birine mala Ûsiv hingê gotin: «Berê pêşin em bona wan p'erêd t'êr'êd xweda têne birinê, ku h'icûmî li ser me bike, li ser meda bigire me bike xulam, usa jî k'erêd me». <sup>19</sup>Hingê ew nêzîkî wî merivê wek'îlê mala Ûsiv bûn û ber derê malê wîr'a xebardan, <sup>20</sup>û gotinê: «Xweyê me, cara pêşin em berjêr hatin ku xurek bik'ir'in, <sup>21</sup>gava em gihîştine k'arvanserekê, me t'êr'êd xwe vekirin, me dîna xwe dayê, va ye p'erê me her kesî, weke k'aşêd xwe, li ser devê t'êr'êd me bûn. Me bi destê xwe ew paşda anîne. <sup>22</sup>Û serda jî me t'evî xwe dîsa p'ere berjêr anîne, bona xurek bik'ir'in. Em nizanin k'ê p'erêd me kiribûne t'êr'êd me». <sup>23</sup>Ewî got: «E'dil bin, netirsîn, Xwedêyê we û Xwedêyê bavê we xizne t'êr'êd weda da we, we p'erêd xwe dane min» hingê Şimh'ûn derxist anî cem wan. <sup>24</sup>Wek'îl ew merivana birine mala Ûsiv û av da wan nigêd xwe şûstin, k'erêd wan alifkirin. <sup>25</sup>Wana jî p'êşk'êşêd xwe bona hatina Ûsive nîvro hazir kirin, çimkî ew pê h'esîya bûn, ku ewê li wir nên bixwin. <sup>26</sup>Gava Ûsiv hate malê, wana p'êşk'êşêd destê xweda anîne malê dane wî û h'eta e'rdê li ber wî dever'ûya çûn. <sup>27</sup>Ûsiv h'al-wextê wan pirsî û got: «Sih'eta kalemêrê bavê we, bona ewî ku we minr'a gilî kir, çawa ye? Ewî hê sax e?» <sup>28</sup>Wana got: «Xulamê te, bavê me hê sax e, ewî hê li ser sih'et û qewata xwe ye». Û li ber wî dever'ûya çûn, qedir kirin. <sup>29</sup>Hingê Ûsiv serê xwe bilind kir, kur'ê dîya xwe, birê xwe Binyamîn dît û got: «Ev e birê weyî biç'ûk, bona k'îjanî we minr'a gilî kir?» Û got: «Bira Xwedê te xwey ke, lawo!» <sup>30</sup>Ûsiv bi lez derk'ete derva, çimkî bona birê agir dila k'etibû û k'ete oda hindur' û li wir girîya. <sup>31</sup>R'ûyê xwe şûst û derk'ete derva,

xwe girt û got: «Nan daynin». <sup>32</sup> Wîr'a başqe, wanr'a başqe û wan misirîyar'a jî, yêd ku t'evî wan dixwarin başqe danîn. misirîya t'evî îbranîya nan ne dixwar, çimkî bona misirîya ev yek h'eramî bû. <sup>33</sup> Ê bira ber wî r'ûniştin, yê nixurî ligora nixurtîya xwe, yê biç'ûk li gora biç'ûktîya xwe, van meriva hevdu dinihêr'în û e'cêbmayî mabûn. <sup>34</sup> Êsiv ji xwarina li ber xwe dişand dikire li ber wan, lê p'ara Binyamîn ji p'ara yêd din pênc cara zêdetir bû. Vana gotina te vexwarin û t'evî Êsiv k'êfxweş bûn.

**44** Êsiv e'mir li wek'îlê mala xwe kir û got: «T'êr'êd van meriva çiqasî ku ew dikarin bibin xurekva dagire û p'erê her kesî jî dayne li ser devê t'êr'êd wan, <sup>2</sup> lê k'asa min, k'asa zîvîn, t'evî p'erê xurek dayne li ser devê t'êr'a yê herî biç'ûk». Ewî weke gotina Êsiv kir. <sup>3</sup> Sibeh ku zelal bû, ew merivana hatine ver'êkirinê, ew û k'erêd wan. <sup>4</sup> Ewana ji bajêr çûn, lê hê dûr nek'etibûn, gava Êsiv gote wek'îlê mala xwe: «R'abe par'a pey wan meriva k'eve, xwe wanr'a bigihîne û wanr'a bêje: «We çima ji ber qencîyêva xirabî kir? <sup>5</sup> Çima k'asa mine zîvîn dizî\*? Eva ne ew e, ya ku xweyê min pê vedixwe û pê wê jî dinihêr'î? We ev yek kire xirabî». <sup>6</sup> Wek'îl xwe li wanr'a gîhand û ev xeberêd Êsiv wanr'a gotin. <sup>7</sup> Wana wîr'a got: «Çima xweyê min tiştêd ha dibêje? Haşa ji xulamêd te, ku ew tiştê usa bikin! <sup>8</sup> Awa me ku ew p'erêd li ser devê t'êr'êd xwe dîtin, ji welatê Kenan anîn dane te, îdî wê çawa be, ku em ji mala xweyê te zîv yan zêr' bidizin? <sup>9</sup> Cem k'îjan xulamêd te ew derk'eve, bira ew bê kuştinê û em jî bibine xulamêd xweyê xwe». <sup>10</sup> Ewî got: «P'ak, we çawa got bira usa be, cem k'îjanî ew derê bira ew minr'a bibe xulam, lê hûn bêşûc bin». <sup>11</sup> Awa her yekî zû-zû t'êr'a xwe danî e'rdê û her yekî t'êr'a xwe vekir. <sup>12</sup> Wek'îl ji

\* 44:5 «Çima k'asa mine zîvîn dizî?» eva têt'êsta îbranîda t'une, lê welger'andina yûnanîye kevinda heye.

t'êr'a yê mezinda destpêkir ger'îya h'eta yê biç'ûkda xilaz kir, k'as t'êr'a Binyamînda dît. <sup>13</sup>Hingê wana k'incê xwe qelaştin, her yekî k'erê xwe bar kir û vege'îyane bajêr.

<sup>14</sup>Cihûda birayêd xweva hatine mala Êsiv, ewî hê li wir bû û dever'ûya li ber wî çûne e'rdê. <sup>15</sup>Êsiv gote wan: «We ev çi kir? We nizanibû ku merivekî mîna min r'e'mildarîyê wê bike?» <sup>16</sup>Cihûda got: «Em çi bêjine xweyê xwe? Em çi bêjin? Yan em çawa xwe r'ûspî kin? Xwedê neheqîya xulamêd te e'yan kir, va ye em xulamêd xweyê xwe ne, hin em, hin jî ewî ku k'as ji cem wî derk'et». <sup>17</sup>Êsiv got: «Haşa ji min ku ez vê yekê bikim! Ewî ku k'as ji cem wî derk'et, bira ew t'enê minr'a bibe xulam, lê hûn bi xêr û silamet hevraz ser bavê xweda her'in».

### Cihûda bona Binyamîn lava dike

<sup>18</sup>Hingê Cihûda çû nêzîk û gotê: «Xweyê min, îzina te hebe, bira xulamê te gilîkî bêje xeberekê bigihîne guhê xweyê xwe û hêrsa te li ser xulamê te r'anebe, çimkî tu yekî mîna Firewin î. <sup>19</sup>Xweyê min ji xulamêd xwe pirsîbû gotibû: «Bav yan birê we hene?» <sup>20</sup>Hingê me xweyê xwer'a got: «Bavekî meyî kalemêr heye û kur'ekî wîyî biç'ûkî kaltîya wîda bûyî heye, birê wîyî dêda mirîye, t'enê ew ji dîya xwe maye û bavê wî, wî h'iz dike». <sup>21</sup>Te xulamêd xwer'a got: «Ewî berjêr bînine cem min, ku ez wî bi ç'e'va bibînim». <sup>22</sup>Me hingê xweyê xwer'a got: «Ew kur'ik nikare ji bavê xwe biqete, gava ew ji bavê xwe biqete, bavê cande». <sup>23</sup>Lê te xulamêd xwer'a got: «Heger hûn birayê xweyî biç'ûk t'evî xwe berjêr neynin, careke din r'ûyê we r'ûyê min nek'eve». <sup>24</sup>Û gava em hevraz çûne cem xulamê te, bavê min, ew gotinêd xweyê xwe, me wîr'a gilî kirin. <sup>25</sup>Gava bavê me got: «R'abin dîsa vege'rin bona me hinek xurek bik'ir'in». <sup>26</sup>Hingê me got: «Em nikarin berjêr her'in. Lê heger birayê meyî biç'ûk t'evî me bê, emê hingê berjêr her'in, çimkî em nikarin r'ûyê wî merivî bibînin, h'eta birayê meyî biç'ûk t'evî me neyê».

<sup>27</sup>Xulamê te, bavê min gote me: «Hûn zanin jina min du kur' minr'a anîn, <sup>28</sup>yek ji destê min çû û min got: «R'astî ew hatîye dir'andinê» û h'eta niha min ew nedîtîye. <sup>29</sup>Lê wekî hûn evî jî, ji ber ç'e'vê min derxin bibin û qezîk bê serê wî, hûnê p'or'ê minî sipî, derd-kulava bikine Dîyarê Mirîya. <sup>30</sup>Heger niha ez her'ime cem xulamê te, bavê xwe, kur'ikê wî ne t'evî me be, e'mirê wî ku e'mirê wîva girêdayî ye, <sup>31</sup>gava bibîne ku kur'ikê wî t'une, wê cande û xulamêd te, wê bavê xweyî xulamê te, wî p'or'êd sipî bi k'eder bikine Dîyarê Mirîya. <sup>32</sup>Çimkî ez, xulamê te cem bavê xwe bûme cabdarê kur'ikê wî û min gotîyê: «Heger ez wî neynim nedi-me te, ez t'emamîya e'mirê xweda li ber bavê xwe gunek'ar bim». <sup>33</sup>Awa ez niha t'ewaçe ji te dikim, bira ez, xulamê te dewsa wî kur'ikî xweyê xwer'a bibe xulam, kur'ik bira t'evî birayêd xwe hevraz her'e. <sup>34</sup>Çimkî, ezê çawa r'abim hevraz her'ime cem bavê xwe, heger kur'ik ne t'evî me be? Nebe ku ez wê qezîya ku bê serê bavê min bibînim».

### Ûsiv xwe dida e'yankirinê

**45** Hingê Ûsiv nikaribû xwe zeft kira, li ber h'emûyêd ku cem wî sekinîbûn kire qîr'în: «H'emû meriva ji cem min derxin!» Kesekî xerîb cem wî nema, gava Ûsiv xwe birayêd xweva da naskirinê. <sup>2</sup>Kûr'în k'etê girîya, misirîya bihîst, ev deng gihîşte mala Firewin jî. <sup>3</sup>Ûsiv gote birayêd xwe: «Ez Ûsiv im. Bavê min hê sax e?» Lê birayêd wî nikaribûn caba wî bidana, çimkî li ber wî bibûne kevir mabûn. <sup>4</sup>Ûsiv gote birayêd xwe: «K'erem kin, werine nêzîk», ew jî çûne cem û wî got: «Ez birayê we Ûsiv im, yê ku we firote Misirê. <sup>5</sup>Lê niha ber xwe nek'evin û li we çetin neyê, ku we ez firotim vira, çimkî Xwedê ez berî we şandime vira, bona xweykirina jîyîna we. <sup>6</sup>Çimkî eva du salêd xelayîne li ser dinê, lê hê pênc sal jî hene, ku wê vedan û dirûnê nebe. <sup>7</sup>Xwedê ez berî we şandim, wekî li ser dinê k'oka we bihêle û jîyîna we bi azayîke mezin xwey ke. <sup>8</sup>Awa, yê ku ez şandime vira hûn nîbûn, lê

Xwedê bû, ewî ez kirime bavê Firewin û xweyê t'emamîya mala wî, usa jî serwêrê t'emamîya welatê Misirê. <sup>9</sup>Niha r'abin zû hevraz her'ine cem bavê min û jêr'a bêjin: «Kur'ê te Ûsiv aha dibêje: «Xwedê ez kirime xweyê t'emamîya Misirê, nesekine zû berjêr were cem min. <sup>10</sup>Tê t'opraxê Goşenêda nêzîkî min bimînî, t'evî kur'êd xwe, kur'êd kur'êd xwe, pez û dewarêd xwe û h'emû hebûka xweva». <sup>11</sup>Ezê wir te t'êr kim, çimkî hê pênc salêd xelayê hene, wekî tu, mala xwe û hebûka xweva t'unebûnê nebînî. <sup>12</sup>Va ye, ç'e'vê we û ç'e'vê birayê min Binyamîn dibînin, ku devê min van tiştê wer'a dibêjin. <sup>13</sup>Derheqa t'emamîya r'ûmeta mine Misirêda û her tiştê ku we dît bavê minr'a gilîkin û zû bavê min berjêr bînine vir». <sup>14</sup>Xwe avîte stukura Binyamîn û girîya. Binyamîn jî ser stukura wîda girîya. <sup>15</sup>Çû r'ûyê h'emû birayêd xwe û ser wanda digirîya. Pey vê yekêr'a birayêd wî pêr'a xeberdan.

<sup>16</sup>Deng gihîşte mala Firewin, ku birayêd Ûsiv hatine. Ev yeka li Firewin û xulamêd wî xweş hat. <sup>17</sup>Firewin gote Ûsiv: «Bêje birayêd xwe: «Bira aha bikin: H'eywanêd xwe bar kin û her'ine welatê Kenanê, <sup>18</sup>û bavê xwe, neferêd xwe hildin û werine cem min. Ezê welatê Misirêda cîyê herî qenc bidime we û hûnê ji xêr-berek'eta welêt bixwin». <sup>19</sup>Ez e'mir li te dikim ku wanr'a bê gotinê: «Bira aha bikin: Ji welatê Misirê bona zar'okêd xwe û jinêd xwe e'reba xwer'a hildin û her'in bavê xwe hildin û bèn. <sup>20</sup>Bira ç'e'vê we hûr-mûrêd weda nemîne, çimkî h'emû xêr-xizna welatê Misirê ya weye».

<sup>21</sup>Kur'êd Îsraêl usa jî kirin. Ûsiv li gora e'mirê Firewin e'rebe dane wan û nanê r'îya wan da wan. <sup>22</sup>Her yekî ji wan destê k'inc da wan, lê sêsîd zîv û pênc dest k'inc dane Binyamîn. <sup>23</sup>Bavê xwer'a jî, dehe k'erêd xêr-xizna Misirêva barkirî û dehe k'erêd mê jî genim, nan û xurekva barkirî bona r'îya bavê xwe şand. <sup>24</sup>Gava birayêd xwe şandin, ew r'êk'etin, ewî got: «R'êva şer' nekin».

<sup>25</sup>Ew ji Misirê hevraz çûn û hatine welatê Kenanê, cem bavê xwe Aqûb. <sup>26</sup>Û wîr'a gilî kirin gotin: «Ûsivî hê sax e!

Belê! Ew serwêrê t'emamîya welatê Misirê ye». Dest û p'îyêd wî lê sar bûn, çimkî ewî nikaribû gotina wan bawer bikira. <sup>27</sup>Gava ew h'emû gotinêd Êsiv ku wan'r'a gotibû wî'r'a gilî kirin û e'rebêd Êsiv bona wî şandibûn ku ew pê her'e dîtin, r'uh' li ber bîna bavê wan Aqûbda hat. <sup>28</sup>Îsraêl got: «Bes e! Kur'ê min Êsiv hê saxe! Ez her'im ku berî mirina xwe wî bibînim».

### Aqûb mala xweva diçe Misirê

**46** Îsraêl h'emû hebûka xwe hilda û hate Bîr-Şêvayê. Li wir gorî Xwedêyê bavê xwe Îshaqr'a dan. <sup>2</sup>Xwedê şev dîtinokêda Îsraêl'r'a xeberda û got: «Aqûbo! Aqûbo!» Ewî got: «Ezî va me». <sup>3</sup>Xwedê got: «Ez Xwedê me, Xwedêyê bavê te me, ji berjêrçûyîna Misirê netirse. Çimkî ezê te li wê derê bikime miletekî mezin. <sup>4</sup>Ezê xwexa t'evî te berjêrî Misirê bim û ezê xwexa te dîsa hevraz bînim, Êsivê destêd xwe dayne li ser ç'e'vêd te». <sup>5</sup>Aqûb ji Bîr-Şêvayê r'êk'et, kur'êd Îsraêl bavê xwe Aqûb, jin û zar'okêd xwe li wan e'rebêd ku Firewin wan'r'a şandibûn ku pê her'in, hildan birin. <sup>6</sup>Aqûb t'evî t'emamîya zur'eta xwe, h'eywanêd xwe û ew hebûka xwe, ya ku li welatê Kenanêda t'op kiribûn hildan hatine Misirê. <sup>7</sup>Ewî t'evî xwe kur' û qîzêd xwe nebîyêd xwe, t'emamîya zur'eta xwe xwer'a anîne Misirê.

<sup>8</sup>Ev in navê wan kur'êd Îsraêl, yêd ku hatine Misirê. Aqûb û kur'êd xweva. Nixurîyê Aqûb R'ûbên bû. <sup>9</sup>Kur'êd R'ûbên: Henox, Pallû, Hesrûn û K'armî bûn. <sup>10</sup>Kur'êd Şimh'ûn: Yemûêl, Yamîn, Ohad, Yaxîn, Soxar bûn û kur'ê jina kenanîf Şawûl bû. <sup>11</sup>Kur'êd Lêwî: Gêrşon, Qohat' û Mêrarî bûn. <sup>12</sup>Kur'êd Cihûda: Er, Onan, Şêlah, Pêrês û Zerah bûn (lê E'r û Onan welatê Kenanêda mirin\*) û kur'êd Pêrês: Hesrûn û Hamûl bûn. <sup>13</sup>Kur'êd Îsaxar: T'ola, Pûa, Yaşûv û Şimron bûn. <sup>14</sup>Kur'êd Zebûlon: Serêd û Êlon û Yalyêl bûn. <sup>15</sup>Ev bûn kur'êd Lêayê,

\* 46:12 Binihêr'in Destpêbûn 38:7, 10.

ya ku ewê Paddan-Aramda Aqûbr'a anîn, usa jî qîza wî Dîna. T'emamiya kur' û qîzava sî û sê nefş bûn.

<sup>16</sup>Kur'êd Gad: Sîfyon, Haggî, Şûnî, Esbon, E'rî, Arodî û Arêlî bûn. <sup>17</sup>Kur'êd Aşêr: Îmna, Îşwa, Îşwî, Birîha û xûşka wan Serax bûn. Kur'êd Birîha: H'eber û Malk'iyêl bûn. <sup>18</sup>Ev bûn kur'êd Zîlpayê, ya ku Laban da qîza xwe Lêayê û ewê şanzdeh nefş Aqûbr'a anîn.

<sup>19</sup>Kur'êd R'ahêla jine Aqûb: Ûsiv û Binyamîn bûn. <sup>20</sup>Ûsivr'a jî li welatê Misirê, ji Asnat'a qîza Potî-Perayê t'erêqê bajarê Onê Minaşe û Efrayîm bûn. <sup>21</sup>Kur'êd Binyamîn: Bela, Bek'ir, Aşbêl, Gêra, Ne'man, Êhî, R'oş, Mûpîm, H'ûpîm û Ard bûn. <sup>22</sup>Ev bûn kur'êd R'ahêlê, yêd ku Aqûbr'a bûn, h'emû li serhev çardeh nefş bûn.

<sup>23</sup>Kur'ê Dan: H'ûşîm bû. <sup>24</sup>Kur'êd Neftelî: Yasyêl, Gûnî, Yêser û Şîllêm bûn. <sup>25</sup>Ev bûn kur'êd Bîlhayê, ya ku Laban dabû qîza xwe R'ahêlê. Ewê gişk li serhev h'eft nefş Aqûbr'a anîn. <sup>26</sup>H'emû nefşêd ku ji bedena Aqûb bibûn hatine Misirê, pêştirî jinêd kur'a şêst û şeş nefş bûn. <sup>27</sup>Ûsivr'a jî du kur' Misirêda bibûn, gava Aqûb neferêd xweva çû Misirê, ew h'eftê\* nefş bûn.

<sup>28</sup>Aqûb Cihûda pêşîyê şande cem Ûsiv, ku ew r'îya Goşenê nîşanî wî ke. Û ew hatine t'opraxê Goşenê. <sup>29</sup>Ûsiv e'reba xwe hazir kir, r'abû çû Goşenê pêşîya bavê xwe Îsraêl, gava ç'e'v wî k'et, xwe avîte stukura wî û êp'êce wext stukura wîda girîya. <sup>30</sup>Hingê Îsraêl gote Ûsiv: «Niha ez mirina xwe r'azî me, çimkî ç'e'vê min li ç'e'vê te k'et, ku tu hê sax-silamet î». <sup>31</sup>Ûsiv birayêd xwe û malbavanêd xwer'a got: «Ez r'abim hevraz her'im, Firewin'r'a gilî kim û bêjimê: «Birayêd min û malbavanêd min, ku Kenanêda diman, hatine cem min. <sup>32</sup>Ew merivana şivan in, çimkî r'êncber in, pez û dewarêd xwe û h'emû hebûka xwe xwer'a anîne». <sup>33</sup>Lê gava Firewin

\* 46:27 Welger'andina Yûnanîye kevinda «h'eftê pênc». Dîna xwe bidine şirovekirina jêrê Derk'etin 1:5.

gazî we ke û ji we bipirse: «Hûn xweyê çi p'êşeyî ne?» <sup>34</sup>Hûn wîr'a bêjin: «Em, xulamêd te, ji zar'otîya xweda h'eta niha, em jî kal-bavêd me jî, r'êncber bûne», wekî hûn t'opraxêd Goşenêda bimînin. Çimkî li cem misirîya şivantî h'eramî ye».

**47** Ûsiv hat Firewin'a gilî kir û got: «Bav û birayêd min, pez û dewarêd xwe û h'emû hebûka xweva ji welatê Kenanê<sup>f</sup> hatine, ewe niha li t'opraxêd Goşenê ne». <sup>2</sup>Ewî ji nav birayêd xweda, pênc merî birin derxistine dîwana Firewin. <sup>3</sup>Firewin ji birayêd wî pirsî: «Hûn xweyê çi p'êşeyî ne?» Wana gote Firewin: «Em, xulamêd te şivan in, em jî kal-bavêd me jî». <sup>4</sup>Û gotine Firewin: «Em hatine ku vî welatîda firarî bimînin, çimkî ç'êre bona h'eywanêd xulamêd te t'une, ji dest xelaya girane welatê Kenanêda, îzina te hebe xulamêd te t'opraxêd Goşenêda bimînin». <sup>5</sup>Hingê Firewin gote Ûsiv: «Bav û birayêd te hatine cem te, <sup>6</sup>welatê Misirê li ber te ye, bav û birayêd xwe welatda cîyê herî qencda cîwar ke, bira ew t'opraxêd Goşenêda bimînin, lê heger tu zanî nava wanda yêd serxwe hene, wan bike serwêrêd h'eywanêd min».

<sup>7</sup>Ûsiv bavê xwe Aqûb anî derxiste dîwana Firewin û Aqûb dua li Firewin kir. <sup>8</sup>Firewin ji Aqûb pirsî: «Tu çend salî yî?» <sup>9</sup>Aqûb li Firewin vege'and û got: «Salêd mine firarî sed sî sal in. Salêd e'mrê min hindik û bêxêr bûn û negihîştine salêd e'mrê kal-bavêd mine nava r'ojêd firarîya wanda». <sup>10</sup>Aqûb dua li Firewin kir û ji dîwana Firewin derket. <sup>11</sup>Ûsiv çawa Firewin ferman kiribû, bav û birayêd xwe welatê Misirêda, cîyê herî qencda, ji t'opraxê R'amsêsê, milk'ek da wan û ew cîwar kirin. <sup>12</sup>Ûsiv bavê xwe, birayêd xwe û t'emamîya mala bavê xwe, neferêd wanva nan dikirin.

### Kirina Ûsiv we'dê xelayê

<sup>13</sup>T'emamîya welêda nan t'unebû, çimkî xelayê gelekî zor dida û ji dest bir'çîbûnê h'alê welatê Misirê û Kenanê t'unebû. <sup>14</sup>Ûsiv ji yêd ku genim dik'ir'în, h'emû p'erêd ku li

welatê Misirê û Kenanêda hebûn t'op kir. Ûsiv p'ere anîne mala Firewin. <sup>15</sup>Gava p'erê welatê Misirê û Kenanê xilaz bûn, h'emû misirî hatine cem Ûsiv û gotinê: «Nan bide me! Çima em li ber ç'e'vê te bimirin, wekî p'erê me xilaz bûne?» <sup>16</sup>Hingê Ûsiv got: «Heger p'ere xilaz bûne, h'eywanêd xwe bînin, ezê ber h'eywanêd weva xurek bidime we». <sup>17</sup>Û wana h'eywanêd xwe anîne cem Ûsiv, Ûsiv ber hespêd wanva, pezêd wanva, dewarêd wanva, k'erêd wanva nan da wan, û wê salê ewî ber h'emû h'eywanêd wanva nan da wan. <sup>18</sup>Ew sal derbaz bû, sala din hatine cem wî û gotinê: «Em ji xweyê xwe venaşêrin ku h'emû p'erê me xilaz bûne, û h'eywanêd me jî bûne yêd xweyê me, îdî tiştêkî me bona xweyê me nemaye pêştirî bedenêd me û e'rdêd me. <sup>19</sup>Çima em û e'rdêd xweva li ber te bimirin? Me û e'rdêd me jî bi nan bik'ir'e, em û e'rdêd xweva bibine xulamêd Firewin, û t'oxim bide me, ku em bijîn û nemirin, wekî e'rd vîkî-vala nebe».

<sup>20</sup>Hingê Ûsiv t'emamîya e'rdê Misirê Firewinr'a k'ir'î, çimkî xelayê zor dida wan, misirîya her yekî zevîyê xwe difiro. E'rdê Misirê bû yê Firewin. <sup>21</sup>Ewî ji serîkî Misirê h'eta serê din, t'emamîya cime'tê kire xulam\*. <sup>22</sup>T'enê e'rdê t'erêqa ne k'ir'î, çimkî ji alîyê Firewinda p'arek t'erêqar'a dik'et û wana ji wê p'ara ku Firewin dida wan dijît, lema jî e'rdêd xwe nefiro. <sup>23</sup>Hingê Ûsiv gote cime'tê: «Va ye min hûn û e'rdêd we Firewinr'a k'ir'în, hanê wer'a t'oxim û e'rdê biçînin. <sup>24</sup>Hûn gerekê nandirûnêda ji pênc p'ara p'arekê bidine Firewin, lê çar p'arê wer'a bimîne, bona e'rdê biçînin û xwarina xwe, yêd mala xweda û bona zar'okêd xwe». <sup>25</sup>Wana got: «Te em xilaz kirin! Bira em k'eremê li ber ç'e'vê xweyê xwe bibînin û em Firewinr'a bibine xulam». <sup>26</sup>Ûsiv ev yek Misirêda kire qanûn, h'eta r'oja îro jî ji pênc yek ya Firewin e, pêştirî e'rdê t'erêqa, ku nebû yê Firewin.

---

\* 47:21 Welger'andina yûnanîye kevin dibêje: «T'emamîya cime'tê kire xulam», lê têk'sta îbranîda nivîsar e: «T'emamîya cime't cîguhastî bajara kirin».

### T'emîya Aqûbe axirîyê

<sup>27</sup>Îsraêl li welatê Misirê, t'opraxêd Goşenêda dima, li wir bû xweyîmilk', şîn bûn û gelekî li hev zêde bûn. <sup>28</sup>Aqûb welatê Misirêda h'ivdeh sala sax ma. T'emamîya e'mirê xwe Aqûb sed çil û h'eft sal bûn. <sup>29</sup>Gava r'ojêd mirina Îsraêl nêzîk bûn, ewî gazî kur'ê xwe Êsiv kir û gote wî: «Heger min li ber ç'e'vê te k'erem dîtîye, hîvî dikim, destê xwe bike li bin r'enê hêta min\*». K'erema xwe, bidî xatirê h'ub û aminîyê, min Misirêda defin nekî. <sup>30</sup>Lê bira ez t'evî kal-bavêd xwe bihênijim, tu min ji Misirê hildî bibî nav t'irbêd wanda defin kî». Êsiv got: «Ezê weke gotina te bikim». <sup>31</sup>Û ewî got: «De minr'a sond bixwe». Êsiv wîr'a sond xwar. Hingê Îsraêl serê xwe li serpîya nivînê danî\*.

### Aqûb dua li Efrayîm û Minaşê dike

**48** Pey vê yekêr'a gotine Êsiv: «Bavê te nexweş e». Ewî her du kur'êd xwe Minaşê û Efrayîm t'evî xwe hildan çû. <sup>2</sup>Cab dane Aqûb û gotinê: «Va ye kur'ê te Êsiv ser teda tê». Îsraêl ser qudûmê xweda hat û li ser nivîna xwe r'ûnişt. <sup>3</sup>Aqûb gote Êsiv: «Xwedêyê Herî Zor li welatê Kenanê Lûzêda minva xuya bû, dua li min kir <sup>4</sup>û gote min: «Ezê te şîn kim û li hev zêde kim û ji te mixulqeta pêşda bînim, evî welatî jî pey ter'a ezê çawa milk'ê h'eta-h'etayê bidime zur'eta te». <sup>5</sup>Niha ew her du kur'êd teye ku Misirêda, berî hatina mine cem te Misirê, ku ter'a bûne, ew kur'êd min in, Efrayîm û Minaşê, wê mîna R'ûbên û Şimh'ûn bibine kur'êd min, <sup>6</sup>lê zar'êd pey vanr'a ku ji te bibin, ter'a bin, ewê wartîyêda ser navêd biratîya xwe bêne h'esabê. <sup>7</sup>Çimkî gava ez ji Paddanê dihatim, welatê Kenanêda, hindik mabû ku em bigihîştana Efratê, r'êda R'ahêla dîya te minr'a bû derd mir, min ew li wê derê, li serê r'îya Efratê, awa gotî Beytleh'mê defin kir».

\* 47:29 Binihêr'in Destpêbûn 24:2-3.

\* 47:31 Welger'andina yûnanîyê kevinda: «Xwe avîte ser şiva xwe».

<sup>8</sup>Îsraêl kur'êd Ûsiv dîtin û got: «Ev k'ê ne?» <sup>9</sup>Ûsiv gote bavê xwe: «Kur'êd min in, yêd ku Xwedê li vir dane min». Aqûb got: «K'erema xwe wan bîne cem min, ez dua li wan bikim». <sup>10</sup>Ç'e've Îsraêl ji mezinayê me'rim bibûn, ewî nikaribû zelal bidîta, Ûsiv ew nêzîkî bavê xwe kirin, ewî ew r'amûsan û h'emêz kirin. <sup>11</sup>Îsraêl gote Ûsiv: «Gumana min t'unekû ku min r'ûyê te jî bidîta, lê va ye Xwedê zur'eta te jî nîşanî min kir». <sup>12</sup>Ûsiv ew ji ser çoka wî r'akirin û xwexa h'eta e'rdê dever'ûya çû. <sup>13</sup>Ûsiv her du kur'êd xwe hildan, Efrayîm da destê xweyî r'astê, alîyê Îsraêlî ç'epê û Minaşe da destê xweyî ç'epê, alîyê Îsraêlî r'astê û nêzîkî wî kirin. <sup>14</sup>Îsraêl qesta destêd xwe cîguhastin û destê xweyî r'astê dirêj kir danî ser serê yê biç'ûk Efrayîm û destê ç'epê danî ser serê Minaşe. Lê belê Minaşe yê nixurî bû. <sup>15</sup>Û dua Ûsiv kir û got: «Ew Xwedêyê ku bavêd min Birahîm û Îshaq r'îya wîda çûne, ew Xwedêyê ku ji r'oja bûyîna minda h'eta îro şivantî li min kirîye, <sup>16</sup>ew milyak'etêf ku ez ji her xirabîyê azad kirime, bira dua van kur'a bike û bi navê min û navêd kal-bavêd min Birahîm û Îshaq bêne gazîkirinê, nava dinêda gelekî li hev zêde bin». <sup>17</sup>Gava Ûsiv dît ku bavê wî destê xweyî r'astê danîye ser serê Efrayîm, eva yeka li wî xweş nehat, ewî destê bavê xwe ji ser serê Efrayîm girt, wekî dayne li ser serê Minaşe. <sup>18</sup>Hingê Ûsiv gote bavê xwe: «Aha na Bavo, çimkî ev e yê nixurî. Destê xweyî r'astê, dayne ser serê vî!» <sup>19</sup>Lê bavê wî qayl nebû û got: «Ez zanim lawo, ez zanim. Evê jî bibe millet, evayê jî bibe mezin. Lê birayê wîyî biç'ûk, wê ji wî hê mestir be û zur'eta wî wê bibe mixulqeta mileta». <sup>20</sup>Wê r'ojê ewî dua wan kir û got: «Bira Îsraêl pê te bimbarrek bike û bêje: «Xwedê te bike mîna Efrayîm û Minaşe», ev yek got û Efrayîm danî fêza Minaşe. <sup>21</sup>Û hingê Îsraêl gote Ûsiv: «Va ye ezê bimirim. Lê Xwedê wê t'evî we be û wê we vege'îne wat'anê bavêd we. <sup>22</sup>Ez p'aleke ç'îya ser biratîya ter'a zêdetir didime te, k'îjan ku min ew ji destê emorîyaf bi şûr û tîr-kevanê xwe stand».

**Aqûbe dua kur'a dike**

**49** Aqûb gazî kur'êd xwe kirin û got: «T'op bin, ez wanr'a bêjim, ku r'ojê bên wê çi bê serê we.

<sup>2</sup> Werine serhev û guhdar bin, gelî kur'êd Aqûb û guhdarîya bavê xwe Îsraêl bikin.

<sup>3</sup> R'ûbêno, nixurîyê mino!

Sih'et û destpêbûna qewata min,  
xweyê qedirê mezin û xweyê qewata zor,

<sup>4</sup> mîna ava ser hevr'a çûyî,

lê tê nebî yê pêşin.  
Çimkî hatî cîyê bavê xwe,  
te h'er'imand nivîna min\*.

Ew k'ete nava wê!

<sup>5</sup> Şimh'ûn û Lêwî bira ne.

Şûrêd wan ç'ekêd neheqîya ne,

<sup>6</sup> bira canîya min nek'eve nav şêwirêd wan,

qedirê min t'evî civata wan nîbe,  
çimkî ji hêrsa xwe wan merî kuşt,  
ji temsistîyê xwe ç'ilê box bir'in.

<sup>7</sup> Bira nifir' li hêrsa wan be,

ku gelekî giran bû,  
û k'în-boxa wan be  
ku gelekî bêîsafî bû!

Ezê wan nav Aqûbda p'aravekim,  
û nav Îsraêlda bela-belayî kim.

<sup>8</sup> Cihûda! Birayêd teyê pesinê te bidin.

Destê te ser stukura dijminê te be,

---

\* 49:4 Binihêr'e Destpêbûn 35:22.

- zar'êd bavê te li ber te ta bin.  
<sup>9</sup> Cihûda cewrikê şêra ye.  
 Kur'ê min, tu ji nêç'îrkinê r'abûyî.  
 Wî xwe avît û p'alda mîna şêra  
 û makeşêr, k'î dikare wî r'ake.  
<sup>10</sup> Serwêrtîyê ji Cihûda kê mîna nebe,  
 ne jî şiva se'vîtyê ji bedena wî,  
 h'eta hatina xweyê wê\*,  
 û mîletê guhdarîya wî bikin.  
<sup>11</sup> Ce'şîkê xwe wê k'ola tirîyêva girêde,  
 ce'şîkê k'era xwe k'ola tirîyêve here qencva,  
 pê şerabê kirasê xwe wê bişo,  
 û pê xûna tirîyê k'incêd xwe,  
<sup>12</sup> ç'e'vêd wî ji şerabê sortir  
 û diranêd wî ji şîr sipîtir bin.  
<sup>13</sup> Zebûlonê devê be'rê bimîne,  
 û gemîwargeha gemîya be,  
 sînore bigihîje h'eta Saydayê.  
<sup>14</sup> Îsaxar, k'erekî qewat e,  
 bin t'êr'ada dimer'ixe,  
<sup>15</sup> dît r'ih'etî ku r'ind e,  
 û welat jî p'ir' xweşe,  
 mîl xwe tewand bin bare,  
 bû p'aleyê borcdare.  
<sup>16</sup> Danê dîwana mîletê xwe bike  
 mîna ji qebîleke Îsraêl,  
<sup>17</sup> Danê me'rekî serê r'îya be,  
 tîreme'rekî şiver'îya be,

---

\* <sup>49:10</sup> Aha jî tê fe'mkirinê: «H'eta hatina borcdayîn cem wî», têk'sta îbranîda ev yek ne e'yan e.

ku li sima hespê dixê,  
sîyarê wê serpiştê diçe.

18 Ya Xudan ez hîvîya xilazkirina te me.

19 Gad, mixulqetekê h'icûmî ser wî ke,  
lê ewê p'ê-p'ê h'icûm ke.

20 Aşêrê nanda t'êr-t'îjî be,  
te'me-tîskêd p'adşê bide.

21 Neftelî karê xezalêyî aza ye,  
xweyê gotinêd gul û nûre.

22 Ûsiv ç'iqilê xweyîbere,  
ç'iqilê xweyîberî ser kanîyê ye,  
p'enc avîtiye ser dîware.

23 Ew te'l kirin, gule avîtinê,  
tîrkevana k'în ajotinê,

24 lê kevanê wî ser zora xwe ma,  
zendêd desta ç'îl girtine,  
bi saya destê Zorê Aqûb,  
Şivan û Qeyayê Îsraêlê.

25 Ji bav Xwedê teyî ku alî te dike,  
ji Yê Herî-Zorî ku dua te dike,  
bi duayêd jore e'zmana,  
bi duayêd bêbinîyêye jêr p'aldayî,  
dua ser memik û bet'inê te.

26 Duayêd bavê te,  
ji duayêd ç'îyayêd berê zortir bûn,  
ji xweşîya girêd h'eta-h'etayê bilindtir bûn,  
bira li ser serê Ûsiv bin,  
û ser t'epa serê wî, ku ser birayêd xwer'a ye.

<sup>27</sup> Binyamîn gurekî devxûn e,  
sibehê zû nêç'îrê dixwe,  
lê êvarê t'alên bela dike».

<sup>28</sup> Ev bûn her donzdeh qebîlêd Îsraêl, ev bû çî ku bavê wan wanr'a got û dua wan kir, anegorî duayê wan her kesî, dua li wan kir. <sup>29</sup> T'emî da wan û gote wan: «Ezê t'evî cime'ta xwe bim, min t'evî kal-bavêd min, wê şkeftêda defin kin, ya ku li e'rdê Efronê h'îtîda ye. <sup>30</sup> Wê şkefta welatê Kenanêda, e'rdê Maxpêlayî pêşberî Mamrêda, ya ku Birahîm e'rdêva, çawa milk' bona gor'istên ji Efronê h'îtî k'ir'î bû. <sup>31</sup> Birahîm û Seraya jina wîva li wir definkirî ne, Îshaq û R'êvêka jina wîva li wir definkirî ne, û min Lêa jî li wir definkirî ye. <sup>32</sup> Ew e'rd û şkefta têda ji zar'êd h'îtîya hatiye k'ir'înê». <sup>33</sup> Aqûb t'emîyêd ku dane kur'êd xwe xilaz kirin, nigêd xwe k'aşî nava nivînê kir, r'uh'ê xwe da û t'evî cime'ta xwe bû.

### Şîna Aqûb

**50** <sup>1</sup> Ûsiv xwe avîte ser r'ûyê bavê xwe, girîya û r'amûsa. <sup>2</sup> Ûsiv e'mir li xulamêd xweye h'ekîm kirin, ku bavê wî zimir<sup>f</sup> kin\*, û h'ekîma Îsraêl zimir kirin. <sup>3</sup> Nava çil r'o'jîda ew hate zimir kirinê, çimkî bona vê yekê haqas wext lazim e. misirîya h'eftê r'o'jî şîna wî kirin.

<sup>4</sup> Gava r'o'jêd şîna wî derbaz bûn, Ûsiv t'evî mala Firewin xeberda û got: «Heger min li ber ç'e'vê we k'erem dîtîye, hîvî dikim aha bêjine Firewin: <sup>5</sup> «Bavê min ez dame sondê û got: «Va ezê bimirim, tu min wî mezelîda defin kî, k'îjan ku min xwexa bona xwe welatê Kenanêda k'ola ye». Niha îzina te hebe, ez her'im bavê xwe defin kim û vege'rim». <sup>6</sup> Firewin got: «R'abe bavê xwe defin ke, çawa ewî tu dayî sondê».

\* <sup>50:2</sup> Misirêda berî defin kirinê mirîyê bi nav û deng, dihatine zimir kirinê û paşê k'efen kirin, bona ku cinyaz zû xirab nebûya.

<sup>7</sup>Hingê Ûsiv r'abû çû bavê xwe defin ke. H'emû xulamêd Firewin, r'ûspîyêd mala wî û h'emû r'ûspîyêd Misirê t'evî wî hevraz çûn, <sup>8</sup>usa jî t'emamîya mala Ûsiv û birayêd wî û neferêd mala bavê wîda. T'enê zar'êd xwe, kerî û gar'anêd xwe Goşenêda hiştin. <sup>9</sup>T'evî wî e'rebe û sîyarî jî hevraz çûn, usa ku bûne k'omeke mezin. <sup>10</sup>Ew hatine wî alîyê Ûrdunê, Gorên-Atadê. Li wê derê gelekî girîyan, kirin qar'e-qar' û hêwerze û bona bavê xwe h'eft r'oja şîn kirin. <sup>11</sup>Gava kenanîyêd wî welatîda ku diman, şîna Gorên-Atadêda dîtin, gotin: «Ev şîna giran ya misirîya ye!». Lema jî navê wî cîyê wî alîyê Ûrdunê danîn: «Abêl-Mîsrayîm\*». <sup>12</sup>Kur'êd Aqûb usa jî kirin, çawa ku wî t'emî kiribû. <sup>13</sup>Kur'a ew birine welatê Kenanê û ew şkefta e'rdê Maxpêlaye pêşberî Mamrêda defin kirin, ya ku Birahîm e'rdêva, çawa milk' bona gor'istên ji Efronê h'îtî k'ir'î bû. <sup>14</sup>Ûsiv pey definkirina bavê xwer'a, bi t'evî birayêd xwe û h'emûyêd ku t'evî wî bona definkirina bavê wî hevraz hatibûn, veger'îya Misirê.

### Ûsiv dil dide li ber bira

<sup>15</sup>Birayêd Ûsiv dîna xwe danê ku bavê wan mir, nava xweda gotin: «Belkî Ûsiv bona wê xirabîya ku me serê wî kirîye k'înê mer'a bajo, ew jî serê me bike». <sup>16</sup>Hingê wana Ûsivr'a cab şand û got: «Bavê te berî mirina xwe t'emî da û got ku <sup>17</sup>aha bêjine Ûsiv: «Bi k'erema xwe neheqî û gunê birayêd xwe, bi k'erema xwe bibaxşîne, ku hindava teda xirabî kirine» niha hîvî dikim neheqîya xulamêd Xwedêyê bavê xwe bibaxşîne». Gava wan ev yek got, Ûsiv girîya. <sup>18</sup>Birayêd wî jî çûn xwe li ber devr'ûya avîtin û gotin: «Awa em

\* 50:11 Bi zimanê îbranî «Şîna misirîya».

xulamêd te ne». <sup>19</sup>Ûsiv gote wan: «Netirsin, çima ez dewsa Xwedê digirim? <sup>20</sup>R'ast e hûn hindava minda xirab fikirîn, lê Xwedê fikirî ku wê bike qencî, wekî mîna r'oja îroîn, e'mirê gelek merîya xwey ke. <sup>21</sup>Niha netirsin, ezê we û zar'êd we nan-av kim». Aha bi zarê şîrin xeberdanê, ber dilê wanda hat.

### Mirina Ûsiv

<sup>22</sup>Ûsiv Misirêda ma, ew û mala bavêd xweva. Ûsiv sed dehe sala jît. <sup>23</sup>Ûsiv ç'ir'-ç'ir'kêd xweye ji Efrayîm dîtîn, û zar'êd Maxîrê Minaşeyê jî Ûsiv ser çokêd xwe dîtîn\*. <sup>24</sup>Ûsiv gote birayêd xwe: «Ezê bimirim, lê e'se Xwedêyê ser weda bê û we ji vî welatî hevraz derxe. Wê we bibe wî welatî, bona k'îjanî ewî Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwar». <sup>25</sup>Ûsiv kur'êd Îsraêl da sondê û got: «E'se Xwedêyê ser weda bê, hestûyêd min jî ji vir derxin hevraz bibin». <sup>26</sup>Ûsiv sed dehe salîyêda mir. Ew zimir kirin û Misirêda ew kirine qavekê.

---

\* 50:23 Nîşanek bû, ku zar' dik'işandine p'êşîra xwe û zar'êd wan dihatine h'esabê. Binihêr'e Destpêbûn 30:3 û 48:12.

# Derk'etin

## Pêşgotin

Ji her pênc K'itêbêd Mûsa k'itêba duda bi van xebera destpêdibe: «Awa navêd...» û ji vir navê wêye îbranî<sup>f</sup> tê gotin: «Nav». Peyr'a welger'andinêd yûnanîda ev k'itêb navekî din distîne «Êksêdos» (Çûyîn). Vê k'itêbêda bona qewimandineke serê miletê cihûya hatî, tê gotinê, awa gotî azabûna ji xulamtîyê, k'îjanêda ku ew we'dekî dirêj bin destê welatê Misirêda bûn. Eva yeka nivê duh'ezarsalîya berî bûyîna Îsada qewimîye. P'ara k'itêbêye pêşin (s. 1-19) bona serhatîya e'mirê Mûsa dibêje, k'îjan ku Xwedê bijart, wekî îsraêlîya<sup>f</sup> ji bin nîrê misirîya xilaz ke. P'ara k'itêbêye duda, (s. 20-40) destpêbûna qanûnê ye, k'îjanêda peyman<sup>f</sup> t'evî miletê Îsraêl li ser ç'îyayê Sînayê girêdayî h'îmgirtî ye. Li vir usa jî dide k'ifşê, ku milet çawa peymana t'ev Xwedê girêdayî dit'er'ibîne û bi hûr gilî bona konê pîroz tê gotinê, k'îjanîda Xwedê nava miletê xweda dihêwirî. P'ara van qanûnaye here sereke, ew her dehe t'emî ne. Hema xût evana bûne h'îmê wan h'emû qanûnêd p'ergalîyê, bi k'îjana îro gele merî dinêda e'mirê xwe didine li ber hev, çawa bawermend usa jî nebawer. Çawa bi kirêd xweye mezin, usa jî bi qanûnêd xwe, Xwedê Mûsa û Îsraêl'r'a binyat'a xwe û navê xweyî r'ast e'yan dike. T'enê h'ukumê wî, ne ku h'ukumê xwedêyêd mayîn, li ser t'ebîyetê û meriva heye, bona vê yekê Xwedê dixwaze, wekî meriv t'enê wî bih'ebînin. T'enê ew e pîroz, meriv bona gunek'arîya xwe t'enê bi qirarêd Xwedê dikarin heleqetîya wan t'evî Xwedê hebe. Eva k'itêba guhê me

vedike, wekî bi h'izkirinê guhdarîya Xwedê bikin û hindava merivada ser nêta qencîyê bin, çawa hindava xweda. Paşê Îsa Mesîhê bêje, wekî van her du qanûnda veşartîye me'na Peyman Kevine sereke.

### Li hev zêdebûna zar'êd Îsraêl<sup>f</sup> û bêisafîya misirîya

**1** Navê kur'êd Îsraêl<sup>f</sup> ku her kes mala xweva t'evî Aqûb hatine Misirê, ev in. <sup>2</sup>R'ûbên, Şimh'ûn, Lêwî û Cihûda, <sup>3</sup>Îsaxar, Zebûlon û Binyamîn, <sup>4</sup>Dan û Neftelî, Gad û Aşêr. <sup>5</sup>H'emû nefşêd ku ji bedena Aqûb bibûn, h'eftê\* nefş bûn, Ûsiv jî li Misirê bû. <sup>6</sup>Ûsiv h'emû birayêd xweva û h'emûyêd wî nisilîda t'emam pêva mirin. <sup>7</sup>Zar'êd Îsraêl şîn bûn, bêh'esab li hev zêde bûn, gelekî qewat girtin û ew welat bi wanva t'ijî bû.

<sup>8</sup>Hingê ser Misirê yekî nû bû p'adşa, ku derheqa Ûsivda tiştêk nizanibû. <sup>9</sup>Ewî gote cime'ta xwe: «Va ye cime'ta zar'êd Îsraêl ji me gelectir û qewattir e. <sup>10</sup>Werin em hindava wanda h'ilek'arîyê bikin, ku nebe ew zêde bin û heger şer'ek biqewime, ew jî t'evî dijminêd me bibine yek û miqabilî me şer'kin û ji vî welatî derk'evin her'in». <sup>11</sup>Hingê serk'ar ser wan k'ifş kirin, wekî bi şixulêd giran wan biçerçirîn. Firewinr'a bajarêd e'mbara, Pît'om û R'amsês çêkirin. <sup>12</sup>Lê çiqas ew diçerçirandin, ew hê gelek dibûn û li hev zêde dibûn, usa ku misirî ji zar'êd Îsraêl ditirsîyan. <sup>13</sup>misirîya bêisafî zar'êd Îsraêl didane xebatê. <sup>14</sup>E'mirê wan bi şixulêd giran bi h'er'îyê û k'elpîç'a, usa jî bi her şixulêd çolêva te'l dikirin, her xebata ku bidana kirinê bêisafî didane kirinê.

<sup>15</sup>P'adşê Misirê t'evî pîredergûşêd îbranîya xeberda ku navê ji wan yekê Şîprah û navê yekê jî Pûhah bû. <sup>16</sup>Û got:

\* 1:5 Têk'sta îbranîf û Qanûna Ducarîda 10:22 nivîsar e «h'eftê», lê têk'sta yûnanî û K'arêd Şandîyada 7:14 nivîsar e «h'eftê pênc».

«Gava k'ulfetêd îbranîya ber zar'ada bin, hingê hûn li ser t'ext dîna xwe bidinê, heger kur' be bikujin, lê heger qîz be bira sax bimîne». <sup>17</sup>Lê pîredergûş ji Xwedê tirsîyan. Çawa p'adşê Misirê wanr'a gotibû nekirin, lê yêd kur'în jî sax dihiştin. <sup>18</sup>P'adşê Misirê gazî pîredergûşa kir û gote wan: «We çima ev yek aha kirîye, ku zar'ê kur'în jî sax hiştine?» <sup>19</sup>Hingê pîredergûşa gote Firewin: «Çimkî k'ulfetêd îbranîya ne mîna k'ulfetêd misirîya ne, ewe ser-xwe ne, pîredergûş h'eta xwe wanr'a digihînin ewana îdî jê xilaz dibin». <sup>20</sup>Lema Xwedê pîredergûşar'a kire qencî, cime't li hev zêde bû û gelekî qewat stand. <sup>21</sup>Pîredergûş ku ji Xwedê tirsîyan, ewî jî malêd wan ava kirin. <sup>22</sup>Hingê Firewin e'mirî ser t'emamîya cime'ta xwe kir û got: «Her zar'eke kur'înî ji dîya xwe bûyî bavêjine ç'emê Nîlê û her zar'a qîzîn sax bihêlin».

### Bûyîna Mûsa

**2** Merivekî ji mala Lêwî, çû qîzeke lêwîya xwer'a xwest. <sup>2</sup>Ew jin h'emle derk'et kur'ek anî, ewê dîna xwe dayê ku ew bedew bû, sê meha ew veşart. <sup>3</sup>Lê gava ewê îdî nikaribû ew veşarta, hingê sepeteke ji cûr'ekî qamîşa hilda, ew xîj û qîr kir, ew kur'ik kirê û danî nav qamîşêd devê Nîlê. <sup>4</sup>Xûşka zar'okê dûr sekinî, wekî bizanibe k'a wê çi biqewime serê wî.

<sup>5</sup>Û qîza Firewin berbi Nîlê çû ku avê xwe ke, carîyêd wê jî devê ç'em digerîyan. Ewê sepetek nav qamîşada dît û carîya xwe şand çû ew anî. <sup>6</sup>Gava vekir kur'ik dît. Kur'ik digirîya, dilê wê ser şewitî û got: «Eva ji zar'êd îbranîya ye». <sup>7</sup>Hingê xûşka wê zar'ê gote qîza Firewin: «Dixwazî ez her'im bona te gazî k'ulfeteke îbranîyaye berdergûş kim, ku bê bona te bistên bide evê zar'ê?» <sup>8</sup>Qîza Firewin gote wê: «Her'e». Qîzikê jî çû gazî dîya zar'okê kir. <sup>9</sup>Qîza Firewin gote wê k'ulfetê: «Hanê vî kur'î minr'a xwey ke, ezê heqê te bidim». K'ulfetê ew kur'ik hilda û xwey kir. <sup>10</sup>Gava kur'ik mezin bû, ewê anî

da qîza Firewin, ewê jî ew xwer'a kire kur' û navê wî danî Mûsa\*, got: «Çimkî min ew ji avê derxist».

### Mûsa ji Misirê dir'eve

<sup>11</sup> Êp'êce wext derbaz bû, gava Mûsa mezin bû\*, r'abû çû cem biratîya xwe, ewê dîna xwe da şixulêd wanî giran, dît wê yekî misirî birakî wîyî îbranî dik'ute, <sup>12</sup> dor xwe nihêr'î, dîna xwe dayê ku kes t'une, lêxist yê misirî kuşt û qûmêda veşart. <sup>13</sup> R'oja dinê r'abû çû, dîna xwe dayê wê du merivêd îbranî hevr'a şer' dikin, hingê gote yê neheq: «Çima tu li hevalê xwe dixî?» <sup>14</sup> Ewî jî lê veger'and: «K'ê tu ser me serwêr û h'akim k'ifş kirî? Dibe ku dixwazî min jî bikujî çawa te yê misirî kuşt?» Mûsa tirsîya û got: «R'ast ev tişt derk'etîye».

<sup>15</sup> Firewin ev tişt bihîst, xwest ku Mûsa bikuje, lê Mûsa ji ber Firewin r'evî çû welatê Midyanêda ma, li ser bîrekê r'ûnişt.

<sup>16</sup> H'eft qîzêd t'erêqê Midyanê hebûn. Evana hatin av k'işandin, k'ur'n t'ijî kirin ku pezê bavê xwe avdin. <sup>17</sup> Şivana hat berî wan dan. Hingê Mûsa r'abû piştê wan girt û pezê wan avda. <sup>18</sup> Evana çûne cem bavê xwe R'ihûêl\*, ewî pirsî: «Ev çawa bû ku hûn îro usa zû hatin?» <sup>19</sup> Wana got: «Merivekî misirî em ji destê şivana xilaz kirin, av jî bona me k'işand û pezê me avda». <sup>20</sup> Hingê ewî gote qîzêd xwe: «Lê ew k'anê ye? We çima ew merî usa ber'da? Gazî wî kin bira bê nan bixwe». <sup>21</sup> Li Mûsa xweş hat ku cem wî merivî bimîne û ewî qîza xwe Sîpporah da Mûsa. <sup>22</sup> Ewa h'emle derk'et, kur'ek anî û Mûsa navê wî danî Gêrşom\*, çimkî got: «Ez welatê xelqêda k'etime xerîbîyê».

\* 2:10 Bi zimanê misirî fe'mîna navê Mûsa «Kur'» e, lê zimanê îbranîda dengê navê Mûsa mîna «Derxistin» tê bihîstin.

\* 2:11 Li K'arêd Şandîyada 7:23 nivîsar e ku ew 40 salî bû.

\* 2:18 Li vir navê t'erêqê Midyanê «R'ihûêl» e ku tê t'ercimekirinê çawa «Hevalê Xwedê», lê ji vir şûnda navê wî «Ît'ro» tê gotinê.

\* 2:22 Bi zimanê îbranî dengê navê «Gêrşom» mîna dengê xebera «Xerîb» e.

<sup>23</sup>Pey gelek wextr'a p'adşê Misirê mir. Zar'êd Îsraêl ji dest xulamtîyê kirine zarîn. Û ew hewar-gazîya wane ji dest xulamtîyê gihîşte Xwedê. <sup>24</sup>Xwedê hêwerza wan bihîst û Xwedê ew peymanaf xwe bîr anî, ya ku t'evî Birahîm, Îshaq û Aqûb girêdabû. <sup>25</sup>Xwedê dîna xwe da zar'êd Îsraêl û h'alê wan pê h'esîya.

### Xwedê gazî Mûsa dike

**3** Mûsa pezê xezûrê xwe Ît'royê t'erêqê Midyanê diç'êrand. Ewî kerî ajot çû ber'îyê derk'et û gihîşte H'orêbê\*, ç'îyayê Xwedê. <sup>2</sup>Milyak'etê\* Xudan bi alava êgir nava dir'îyêda wîva xuya bû. Ewî dîna xwe dayê wê alav dir'îyê k'etîye dişixule, lê dir'î naşewite. <sup>3</sup>Hingê Mûsa got: «Hela vegeer'im vê dîtina e'cêb bibînim, k'a çîma dir'î naşewite?» <sup>4</sup>Xudan<sup>f</sup> dîna xwe dayê, wekî ew vegeer'îya ku bibîne, Xwedê ji nava dir'îyê gazî kirê û got: «Mûsa, Mûsa!» Ewî got: «Ez va me». <sup>5</sup>Xwedê gotê: «Nêzîkî vir nebe. Çarixêd nigêd xwe bêxe, çîmkî ew cîyê ku tu li ser sekinîyî e'rdê pîroz e». <sup>6</sup>Û got: «Ez Xwedêyê bavê te, Xwedêyê Birahîm, Xwedêyê Îshaq û Xwedêyê Aqûb im». Hingê Mûsa r'ûyê xwe nixamt, çîmkî tirsîya ku Xwedê binihêr'e. <sup>7</sup>Xudan got: «Belê min cefê cime'ta xweye Misirêda dît û qar'e-qar'a wan ji dest serk'arêd wan bihîst, çîmkî ez haş ji tengasîya wan heme. <sup>8</sup>Ez peya bûm wana ji destê misirîya aza kim û wan ji ewî welatî derxime welatekî r'ind û berfire, welatê ku şîr û hingiv jê dik'işe, wî cîyê kenanîyaf, h'îtîya, emorîyaf, pîrîzzîya, h'îwîya û yebûsîya. <sup>9</sup>Û niha va ye qar'e-qar'a zar'êd Îsraêl gihîştîye min û ew zordarîya ku misirî li wan dîkin min dît. <sup>10</sup>Niha were, ez te bişînim cem Firewin, ku tu cime'ta min, zar'êd Îsraêl ji Misirê derxî». <sup>11</sup>Hingê Mûsa gote Xwedê: «Ez k'î me ku her'ime cem Firewin û zar'êd Îsraêl ji Misirê derxim?» <sup>12</sup>Xwedê gotê: «Ezê t'evî te

\* 3:1 Awa gotî bi navekî din «Sînay».

\* 3:2 Eva cûr'ekî qedirgirtin yan e'yanbûna Xwedê ye.

bim. Evê ter'a bibe nîşana ku min tu şandîyî: gava tu cime'tê ji Misirê derxî, ser vî ç'îyayî hûnê Xwedêr'a xulamîyê bikin». <sup>13</sup>Mûsa gote Xwedê: «Va ez diçime cem zar'êd Îsraêl û bêjime wan: «Xwedêyê kal-bavêd we ez şandime cem we». Lê gava ew ji min bipirsin: «Navê wî çi ye?» Ez çi wanr'a bêjim?» <sup>14</sup>Xwedê gote Mûsa: «EZ YÊ HEME. Vê yekê bêje zar'êd Îsraêl, bêje ku: «EZ HEME ez şandime cem we»». <sup>15</sup>Dîsa Xwedê gote Mûsa: «Aha bêjî zar'êd Îsraêl: «Xudan\*, Xwedêyê kal-bavêd we, Xwedêyê Birahîm, Xwedêyê Îshaq û Xwedêyê Aqûb ez şandim cem we». H'eta-h'etayê navê min ev e û h'emû nisilada ezê aha bême bîranînê. <sup>16</sup>Her'e r'ûspîyêd Îsraêl t'op ke û bêje wan: «Xudan, Xwedêyê kal-bavêd we, Xwedêyê Birahîm, Îshaq û Aqûb minva xuya bû û got: Ez ser weda hatime û min dît ku Misirêda çi hatîye serê we». <sup>17</sup>Û got: «Ezê we ji cefê Misirê derxim û bibime welatê kenanîya, h'îtîya, emorîya, pirîzzîya, h'îwîya û yebûsîya, wî welatê ku şîr û hingiv jê dik'işe». <sup>18</sup>Ewê gur'a te bikin hingê tu t'evî r'ûspîyêd Îsraêl her'e cem p'adşê Misirê û jêr'a bêjin: «Xudan Xwedêyê îbranîya meva xuya bû, niha îzina te hebe, em r'îya sê r'oja berbi ber'îyê her'in, Xudan Xwedêyê xwer'a qurbanê bidin». <sup>19</sup>Belê ez zanim, ku p'adşê Misirê wê îzina we nede ku hûn her'in, heger ne bi destê zor be, <sup>20</sup>lê ezê destê xwe dirêj kim û bi wan h'emû k'eremetêd xwe Misirê xim, yêd ku ezê nav wêda bikim, paşî hingê ewê we ber'de. <sup>21</sup>Û ezê li ber ç'e'vê misirîya vê cime'tê şîrin kim, wekî gava ku hûn derk'evin, destvala dernek'evin. <sup>22</sup>Lê bira her k'ulfet ji cînara xwe û ji k'ulfeta ku mala wêda dimîne, xişirêd zîvîn û xişirêd zêr'în, usa jî k'inca jê bixwaze û wan li kur' û qîzêd xweva kin û misirîya t'alan kin».

---

\* 3:15 Bi zimanê îbranî xebere «Xudan» YHWH nivîsar e û tê xwendinê çawa «Yahweh». Dengê vê xeberê mîna dengê xebere «EZ HEME» ye.

### Xwedê nîşana dide Mûsa ku bike

**4** Mûsa lê veger'and û got: «Lê ewê min bawer nekin û ne jî wê dengê min bibihên, çimkî wê bêjin, Xwedê teva xuya nebû ye». <sup>2</sup>Hingê Xwedê gote Mûsa: «Ew çî ye destê teda?» Ewî got: «Şivdar e». <sup>3</sup>Xwedê gotê: «Wê bavêje e'rdê». Ewî avîte e'rdê, bû me'r û Mûsa jê r'evî. <sup>4</sup>Xudan gote Mûsa: «Destê xwe dirêj kê poçê bigire». Ewî jî destê xwe dirêj kirê ew girt û ew destê wîda bû şivdar. <sup>5</sup>«Bi vê yekê wê bawer bikin, wekî Xudan Xwedêyê kal-bavêd wan, Xwedêyê Birahîm, Xwedêyê Îshaq û Xwedêyê Aqûb teva xuya bûye».

<sup>6</sup>Xudan dîsa gote Mûsa: «Niha destê xwe têke p'aşila xwe». Ewî destê xwe kire p'aşila xwe derxist û va ye, destê wî bû mîna berfa k'unî-k'unî bûyî. <sup>7</sup>Xwedê gotê: «Destê xwe dîsa têke p'aşila xwe». Ewî dîsa destê xwe kire p'aşila xwe derxist û va ye, ew dîsa bû mîna qalibê wî. <sup>8</sup>«Heger te bawer nekin û guh nedine nîşana pêşin, wê bawerîya xwe nîşana duda bînin. <sup>9</sup>Lê heger van her du nîşana jî bawer nekin û guh nedine dengê te, hingê ji ç'emê Nîlê avê hilde û bir'êje ser e'rdê. Ew ava ku te ji Nîlê hilda wê ser e'rdê bibe xûn».

<sup>10</sup>Mûsa gote Xudan: «Xweyê min, hîvî dikim! Ezî xeberdanêda ne serxwe me, ne duhu ne jî pêr û ne jî pey vê xeberdanêr'a ku te t'ev xulamê xwe xeberda, lê ez yekî devqer'imî û zimênda giran im». <sup>11</sup>Hingê Xudan gote wî: «K'ê dev da mêriv, yan k'ê ker' û lal çêkirin, yan yê ku dibîne, yan yê kor? Ez Xudan nînim? <sup>12</sup>Awa niha tu her'e ezê t'evî devê te bim û te hîn kim, çî ku tu gerekê bêjî». <sup>13</sup>Ewî gotê: «Xweyê min, hîvî dikim! K'erema xwe yekî dinê bişîne». <sup>14</sup>Hingê hêrsa Xudan li Mûsa r'abû û gotê: «Harûnê lêwî ne birê te ye? Ez zanim ku ewî xeberdanêda serxwe ye, va ye ewê pêşîya teda bê û gava ew te bibîne wê gelekî şa be. <sup>15</sup>Tu t'evî wî xeber de û xebera bike devê wî, ezê devê te û devê wîr'a bim, ezê we hîn kim ku hûnê çî bikin. <sup>16</sup>Bira ew dewsa te cime'têr'a xeber de û ew ter'a bibe dewsa dev û tu jî wîr'a dewsa Xwedê. <sup>17</sup>Û wê şivdarê bigire destê xwe, wekî bi wê nîşana bikî».

### Mûsa vediger'e Misirê

<sup>18</sup>Mûsa vege'îya çû cem xezûrê xwe Ît'ro û jêr'a got: «Îzina te hebe ez vege'ime cem biratîya xweye Misirêda bibînîm, k'a ew hene yan t'unene». Ît'ro gote Mûsa: «Her'e ter'a oxir be». <sup>19</sup>Xudan Midyanêda Mûsar'a got: «Her'e vege'e Misirê, çimkî ew merivêd ku pey e'mirê te k'etibûn h'emû jî mirine». <sup>20</sup>Mûsa r'abû jina xwe, kur'êd xwe li k'erê sîyar kirin û vege'îya welatê Misirê. Mûsa şivdara Xwedê girte destê xwe. <sup>21</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Gava tu vege'î her'î Misirê, bikî ku tu wan h'emû nîşanêd ku min dane destê te, li ber Firewin bikî, lê ezê dilê wî bikime kevir û ewê cime'tê ber'nede. <sup>22</sup>Û bêje Firewin: «Xudan aha dibêje: Îsraêl kur'ê minî nixurî ye. <sup>23</sup>Ez ter'a dibêjim: Kur'ê min ber'de ku ew xulamtîya min bike, lê heger tu nexwazî wî ber'dî, va ye ezê kur'ê teyî nixurî bikujim».

<sup>24</sup>Û usa qewimî ku r'êva cîkî şevbêrî kirin, Xudan r'astî Mûsa hat û xwest ku wî bikuje. <sup>25</sup>Hingê Sîpporahê kevirêkî tûj hilda, kur'ê xweyî nesinetkirî sinet kir, p'îyêd Mûsa xist û gotê: «R'ast tu bona min mêrê xûnê yî». <sup>26</sup>Û bi vî awayî Xudan ew hişt. Wî çaxî bona sinetîyê ewê got: «Mêrê xûnê».

<sup>27</sup>Xudan gote Harûn: «Her'e ber'îyê pêşîya Mûsada». Ew jî çû ber ç'îyayê Xwedê r'astî wî hat û çû r'ûyê wî. <sup>28</sup>Mûsa h'emû gotinêd Xudan Harûnr'a gilî kirin ku ewî ew şandîye û t'emîya wan h'emû nîşana daye. <sup>29</sup>Mûsa û Harûn çûn h'emû r'ûsipîyêd zar'êd Îsraêl t'op kirin. <sup>30</sup>Û Harûn ew h'emû gotinêd Xudane ku Mûsar'a gotibû gilî kirin û li ber ç'e'vê cime'tê ew nîşan kirin. <sup>31</sup>Cime'tê bawer kir. Û gava bihîstin ku Xudan ser zar'êd Îsraêlda hatiye û dîna xwe daye ew zelûlîya wan, ta bûn û h'ebandin.

### Mûsa û Harûn li ber Firewin

**5** Pey haqas tiştr'a Mûsa û Harûn çûne cem Firewin û gotinê: «Xudan Xwedêyê Îsraêl aha dibêje: Îzina cime'ta min bide ku ber'îyêda minr'a cejinê bikin». <sup>2</sup>Firewin got:

«Xudan k'î ye ku ez gur'a gotina wî bikim û îzina Îsraêl bidim? Ez Xudan nas nakim û îzina Îsraêl jî nadim». <sup>3</sup>Wana gotê: «Xwedêyê îbranîya meva xuya bû. Îzina te hebe em r'îya sê r'oja her'ine ber'îyê û Xudan Xwedêyê xwer'a qurbanê bidin, ku nebe ew bi nexweşîya h'al yan şûr qir'a me bîne». <sup>4</sup>P'adşê Misirê gote wan: «Mûsa û Harûn, hûn çima cime'tê ji xebata wan paş dêxin? Her'ine ser borcê xwe». <sup>5</sup>Firewin got: «Va ye niha cime'ta welêt gelek e, lê hûn nahêlin ku ew borcê xwe biqedînin».

<sup>6</sup>Hema wê r'ojê Firewin kire ser serwêr û serk'arêd cime'tê, got: <sup>7</sup>«Mîna her gav bona k'elpîç' çêkirinê kayê nedine cime'tê, bira ewana xwexa her'in û xwer'a kayê t'op kin. <sup>8</sup>H'esabê k'elpîç'a ji ser wan kêr nekin, haqasî jî ji wan bixwazin, çiqas wan her gav çêdikirin, çimkî ewe xwer'anedîtî ne, lema dikine qar'în û dibêjin: «Em her'in qurbanê Xwedêyê xwer'a bidin». <sup>9</sup>Bira şixul li ser van meriva giran be, ku xebatêva gîro bin û pey gotinêd derew nek'evin».

<sup>10</sup>Serwêr û serk'arêd cime'tê derk'etin cime'têr'a xeberdan û gotin: «Firewin aha dibêje: «Ez kayê nadime we, <sup>11</sup>hûn xwexa her'in ji k'u dixwazin xwer'a kayê destxin, lê ji şixulêd we tiştek jê kêr nebe». <sup>12</sup>Hingê cime't li t'emamîya welatê Misirê bela bû, dewsa kayê xozan t'op kir. <sup>13</sup>Serwêra p'êyî li ser wan dikirin digotin: «Xebata xweye her r'oj usa biqedînin, çawa hingê ku kaya we hebû». <sup>14</sup>K'arkerêd Firewin serk'arêd ser zar'êd Îsraêl k'ifşkirî k'utan û gotin: «We çima duhu û îro h'esabê k'elpîç'a mîna her gav t'emam nekiriye?» <sup>15</sup>Serk'arêd zar'êd Îsraêl hatine cem Firewin gazine xwe kirin û gotinê: «Tu çima usa serê xulamêd xwe dikî? <sup>16</sup>Kayê nadine xulamêd te, lê mer'a dibêjin: «K'elpîç'a çêkin!» Va ye em hatine k'utanê, lê neheqî alîyê cime'ta teda ye». <sup>17</sup>Lê ewî got: «Hûn xwer'anedîtî ne! Xwer'anedîtî! Lema dibêjin: «Em her'in Xudanr'a qurbanê bidin». <sup>18</sup>De niha her'in û bixebitin, kayê wer'a neyê dayînê, lê h'esabê k'elpîç'a wê ji we bê xwestinê». <sup>19</sup>Hingê serk'arêd zar'êd Îsraêl xwe oxirmê

giranda dîtin gava hate gotinê: «H'esabê k'elpîç'aye ku her r'oj ji we tê xwestinê kê m'ekin». <sup>20</sup> Gava ew ji cem Firewin derk'etin, r'astî Mûsa û Harûn hatin ku ew hîvîya wan bûn <sup>21</sup> û gotine wan: «Bira Xwedê ser weda binihêr'e û dîwana we bike, wekî we em ber ç'e'vê Firewin û xulamêd wî r'eş kirin û şûr jî da destê wan ku me bikujin».

### Mûsa gazine xwe Xudan dike

<sup>22</sup> Hingê Mûsa vege'rya cem Xudan û got: «Ya Xweyê min! Te çima ev cime'ta avîte nava oxirmêd giran? Te bona çi ez şandim? <sup>23</sup> Çimkî wê hingêva, gava ez hatime cem Firewin û pê navê te xeber daye, ew xirabîyê vê cime'tê dike, lê belê te cime'ta xwe xilaz nekir».

**6** Xudan gote Mûsa: «Tê niha bibînî, ku ezê çi serê Firewin bikim. Wê wan bi destê zor ber'de û wê wan bi destê zor ji welatê xwe derxe».

### Caba Xudan

<sup>2</sup> Xwedê t'ev Mûsa xeber da û gote wî: «Ez Xudan im. <sup>3</sup> Ez çawa Xwedêyê Herî Zor, Birahîm, Îshaq û Aqûbva xuya bûme, lê bi navê xwe Xudan\* wanva xuya nebûme. <sup>4</sup> Min t'evî wan peymana xwe girêda, ku welatê Kenanêf bidime wan, welatê wanî xerîbîyê, wê dera ku firarî derbaz kirin. <sup>5</sup> Min zarînîya zar'êd Îsraêl bihîst ku misirîya ew kirine xulam û min peymana xwe bîr anî. <sup>6</sup> Awa bêje zar'êd Îsraêl: «Ez Xudan im! Ezê we ji bin barêd misirîyaye giran derxim û we ji xulamtîya wan aza kim, pê zenda berbir'î we dirêj kirî û dîwanêd giran xilaz kim. <sup>7</sup> Ê ezê we bikime cime'ta xwe û bibime Xwedêyê we. Ê hingê hûnê bizanibin ku Xudan Xwedêyê we ez im, yê ku hûn ji bin barêd misirîyaye giran derxistin. <sup>8</sup> Ê ezê we bibime wî welatî, bona k'îjanî min sond xwar ku bidime Birahîm, Îshaq,

\* 6:3 Binihêr'e şirovekirina Derk'etin 3:15.

Aqûb, ezê wî çawa war bidime we. Ez Xudan im»». <sup>9</sup>Mûsa ev yek zar'êd Îsraêl'r'a got, lê wan ji diltengîyê û ji dest şixulêd giran guhdarîya Mûsa nekirin. <sup>10</sup>Xudan t'ev Mûsa xeber da û gotê: <sup>11</sup>«Her'e cem Firewinê p'adşê Misirê bêje ku zar'êd Îsraêl ji welatê xwe ber'de». <sup>12</sup>Hingê Mûsa li ber Xudan xeber da û gotê: «Va ye, zar'êd Îsraêl guhdarîya min nakin, îdî k'u ma ku Firewin guhdarîya min bike? Ez jî zimênda giran im». <sup>13</sup>Û Xudan bona zar'êd Îsraêl û Firewinê p'adşê Misirê t'evî Mûsa û Harûn xeberda û e'mirî ser wan kir ku zar'êd Îsraêl ji Misirê derxin.

### Bereka Mûsa û Harûn

<sup>14</sup>Pêşîyêd malbetêd wan ev in. Kur'êd R'ûbên, nixurîyê Îsraêl, ev in: Henox, Pallû, Hesrûn û K'armî. Ev in malbetêd R'ûbên. <sup>15</sup>Kur'êd Şimh'ûn ev in: Yemûêl, Yamîn, Ohad, Yaxîn, Sohar û kur'ê k'ulfeta kenanî Şawûl. Ev in malbetêd Şimh'ûn. <sup>16</sup>Navêd kur'êd Lêwî, li gora serecema r'ik'inyatêd xweva, ev in: Gêrşon, Qohat' û Mêrarî. T'emamîya salêd e'mirê Lêwî sed sî û h'eft sal bûn. <sup>17</sup>Kur'êd Gêrşon, li gora malbetêd xwe, ev in: Lîbnî û Şîmî. <sup>18</sup>Kur'êd Qohat' ev in: E'mram, Îshar, Hêbron û Ûzîêl. T'emamîya salêd e'mirê Qohat' sed sî û sê sal bûn. <sup>19</sup>Kur'êd Mêrarî ev in: Mah'lî û Mûşî. Ev in malbetêd Lêwî li gora serecema r'ik'inyatêd xweva. <sup>20</sup>E'mram met'a xwe Yo-k'ebed stand û ewê wîr'a Harûn û Mûsa anîn. Salêd e'mirê E'mram sed sî û h'eft sal bûn. <sup>21</sup>Kur'êd Îshar ev in: Qorax, Nefeg û Zîk'rî. <sup>22</sup>Kur'êd Ûzîêl ev in: Mîşaêl, Elsafan û Sît'rî. <sup>23</sup>Harûn Elîşeba, qîza Amînadav xûşka Nehşon stand. Ewê wîr'a Nadab, Abîhû, Êlazar û Ît'amar anîn. <sup>24</sup>Kur'êd Qorax ev in: Assîr, Elqanah û Abîasaf. Ev in malbetêd qoraxî. <sup>25</sup>Êlazarê kur'ê Harûn ji nav qîzêd Pûtîêl yek xwer'a jin xwest, ewê jî wîr'a Pînhas anî. Pêşîyêd lêwîya li gora malbetêd xweva ev in. <sup>26</sup>Ev in ew Mûsa û Harûnê, k'îjanar'a ku Xudan got: «Zar'êd Îsraêl, r'efêd wanva ji welatê Misirê derxin». <sup>27</sup>Ewêd ku t'ev Firewin p'adşê Misirê xeber din û bona zar'êd Îsraêl ji Misirê derxin ev in: Mûsa û Harûn.

**Xwedê fermanê dide Mûsa ku her'e cem Firewin**

<sup>28</sup>Çaxê ku Xudan welatê Misirêda t'evî Mûsa xeber da, <sup>29</sup>wê hingê Xudan Mûsar'a xeber da û gotê: «Ez Xudan im! Her tiştê ku ez ter'a dibêjim, bêje Firewinê p'adşê Misirê». <sup>30</sup>Mûsa jî li ber Xudan got: «Va ye ez zimênda giran im, Firewinê çawa guhdarîya min bike?»

**7** Xudan gote Mûsa: «Hela binihêr'e, ez te dikime mîna Xwedê bona Firewin, birê te Harûn jî wê bibe p'êxemberêf te. <sup>2</sup>Her tiştî bêjî, çi ku ezê e'mirî li te bikim û birê te Harûn bira Firewin'a bêje, ku zar'êd Îsraêl ji welatê xwe ber'de. <sup>3</sup>Lê ezê dilê Firewin bikime kevir, nîşan û k'eremetêd xwe li nav welatê Misirêda zêde kim. <sup>4</sup>Firewinê guhdarîya we neke. Û ezê destê xwe daynime li ser Misirê û r'efêd xwe, cime'ta xwe, zar'êd Îsraêl pê dîwanêd mezin ji welatê Misirê derxim. <sup>5</sup>Û hingê misirîyê bizanibin ku ez Xudan im, gava ez destê xwe dirêjî li ser Misirê kim û zar'êd Îsraêl ji nav wan derxim». <sup>6</sup>Mûsa û Harûn usa kirin, çawa ku Xudan e'mirî li wan kir usa jî kirin. <sup>7</sup>Mûsa h'eyştê salî bû, lê Harûn h'eyştê sê salî bû, gava t'ev Firewin xeberdan.

**Şivdara Harûn dibe me'r**

<sup>8</sup>Xudan t'evî Mûsa û Harûn xeber da û got: <sup>9</sup>«Gava Firewin t'ev we xeber de û bêje: «Hela nîşanekê bikin», wî çaxî bêje Harûn: «Şivdara xwe hilde bavêje ber Firewin». Ewê bibe me'r». <sup>10</sup>Mûsa û Harûn k'etine cem Firewin û çawa ku Xudan e'mirî li wan kiribû usa jî kirin. Harûn şivdara xwe avîte ber Firewin û ber xulamêd wî û ew bû me'r. <sup>11</sup>Firewin jî gazî serwaxt û k'oçeka kir û van sêrbazêd Misirê jî bi sêrbazîya xwe usa kirin. <sup>12</sup>Her yekî şivdara xwe davît û ew dibûne me'r, lê şivdara Harûn şivdarêd wan daqurtandin. <sup>13</sup>Û dilê Firewin bû kevir gur'a wan nekir, çawa ku Xudan gotibû.

**Ceza e'wlin: Av dibe xûn**

<sup>14</sup>Xudan gote Mûsa: «Dilê Firewin bû kevir, ew naxwaze cime'tê ber'de. <sup>15</sup>Serê sibehê her'e cem Firewin. Va ye ewê her'e berbi avê û tu ber devê ç'emê Nîlê li ber wî bisekine û ew şivdara ku bibû me'r bigire destê xwe. <sup>16</sup>Wîr'a bêje: «Xudan Xwedêyê îbranîya ez şandime cem te û dibêje: Cime'ta min ber'de ku ber'îyêda xulamtîya min bike, lê va ye h'eta niha te guhdarî nekirîye. <sup>17</sup>Xudan aha dibêje: «Bi vê bizanibî ku ez Xudan im». Awa ezê şivdara destê xwe ava ç'emê Nîlê xim û wê bibe xûn. <sup>18</sup>Me'sîyêd ç'emda wê h'işk bin û bînê bik'eve ç'em, misirîyê zivêr bin ku ava Nîlê vexwin». <sup>19</sup>Xudan gote Mûsa: «Bêje Harûn: «Şivdara xwe hilde û destê xwe dirêjî ser avêd Misirê, ser ç'emêd wan, ser cewêd wan, ser golêd wan û ser h'emû avêd wane t'opbûyî ke û wê bibine xûn. Wê t'emamîya welatê Misirêda, ava derdanêd dar û kevirîda jî bibe xûn». <sup>20</sup>Û çawa ku Xudan e'mirî li wan kiribû, Mûsa û Harûn usa jî kirin. Harûn\* şivdara xwe bilind kir ber ç'e'vê Firewin û ber ç'e'vê xulamêd wî ava Nîlê xist, t'emamîya ava ç'em bû xûn. <sup>21</sup>Me'sîyêd ç'emda h'işk bûn û bîn k'ete ç'em, misirîya nikaribûn ji ç'em av vexwarana. Û t'emamîya welatê Misirêda xûn hebû. <sup>22</sup>Lê sêrbazêd Misirê jî bi sêrbazîyêd xwe usa kirin. Dilê Firewin bû kevir, guh neda wan, çawa ku Xudan gotibû. <sup>23</sup>Firewin vege'îya çû mala xwe, ev yek ser dilê wî giran r'ûnenişt. <sup>24</sup>Û h'emû misirî r'abûn bona av vexwarinê dor-berê ç'em k'olan, çimkî ava Nîlê nikaribûn vexwarana. <sup>25</sup>Pey ç'em xistina Xudan'a, h'eft r'oj derbazbûn.

**Ceza duda: Beq**

**8** Xudan gote Mûsa: «Her'e cem Firewin û bêje wî: «Xudan aha dibêje: Cime'ta min ber'de ku xulamtîya

\* 7:20 Têk'sta îbranîda nivîsar e «Ewî».

min bike. <sup>2</sup>Lê heger tu nexwezî ber'dî, va ye ezê pê beqa t'emamîya t'opraxêd te xim. <sup>3</sup>Ç'emê beqava bik'imk'ime û ewê r'abin bik'evine mala te, oda teye r'azanê, nivîna te, malêd xulamêd te, nava cime'ta te, tendûrêd te û şkeva teye hevîr. <sup>4</sup>Û beqê r'abine li ser te, li ser cime'ta te û li ser h'emû xulamêd te». <sup>5</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Bêje Harûn: «Destê xwe şivdarêva dirêjî li ser ç'ema, cewa û gola ke û li ser welatê Misirê, beqa derxe». <sup>6</sup>Û Harûn destê xwe dirêjî li ser avêd Misirê kir. Beq derk'etin û welatê Misirê nixamtin. <sup>7</sup>Sêrbaza jî bi sêrbazîya xwe usa kirin û li ser welatê Misirê beq derxistin. <sup>8</sup>Firewin gazî Mûsa û Harûn kir û got: «R'eca ji Xudan bikin, ku beqa ji min û ji cime'ta min dût xe û ezê cime'tê ber'dim ku Xudanr'a qurbanê bidin». <sup>9</sup>Hingê Mûsa gote Firewin: «Tu xwexa minr'a we'de k'ifş ke, ez k'engê bona te, bona xulamêd te û bona cime'ta te r'eca bikim, ku beq ji te û ji malêd te unda bin, t'enê ewê ç'êmda bimînin». <sup>10</sup>Û ewî got: «Sibê». Mûsa got: «Bira weke gotina te be! Ku tu bizanibî, yekî mîna Xudan Xwedêyê me t'une. <sup>11</sup>Beqê ji te, ji malêd te, ji xulamêd te û ji cime'ta te wê dût k'evin, t'enê ç'êmda wê bimînin». <sup>12</sup>Mûsa û Harûn ji cem Firewin derk'etin û Mûsa bona wan beqa, k'îjan ku Xudan anîbûne ser Firewin gazî Xudan kir. <sup>13</sup>Xudan weke gotina Mûsa kir, û beqêd malada, h'ewşada û k'ewşenada h'işk bûn. <sup>14</sup>Ew k'om-k'om t'op kirin û bîn k'ete welêt. <sup>15</sup>Lê gava Firewin dîna xwe dayê ku r'ih'etî k'etê, dilê xwe kire kevir û gur'a wan nekir, çawa ku Xudan gotibû.

### Ceza sisîya: K'ermêş

<sup>16</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Bêje Harûn: «Bira şivdara xwe dirêj ke t'oza e'rdê xe, ku ew li ser t'emamîya welatê Misirê bibe k'ermêş». <sup>17</sup>Û usa kirin. Harûn destê xwe şivdara xweva dirêj kir, t'oza e'rdê xist û k'ermêş li ser meriva û h'eywên r'abûn. Li ser t'emamîya welatê Misirê h'emû t'oza e'rdê bû k'ermêş. <sup>18</sup>Sêrbaza jî bi sêrbazîyêd xwe kirin ku k'ermêşa

derxin, lê nikaribûn. Û awa li ser merîva û h'eywên k'ermêş bûn. <sup>19</sup>Sêrbaza gote Firewin: «Eva t'ilîya\* Xwedê ye». Lê dilê Firewin bû kevir û gur'a wan nekîr, çawa ku Xudan gotibû.

### Ceza çara: P'er'anîya mêş-moza

<sup>20</sup>Xudan gote Mûsa: «Serê sibehê zû r'abe her'e li ber Firewin bisekine. Va ye ewê berbi avê her'e û bêje wî: «Xudan aha dibêje: Cime'ta min ber'de ku xulamtîya min bike. <sup>21</sup>Lê heger tu cime'ta min ber'nedî, awa ezê li ser te, li ser xulamêd te, li ser cime'ta te û li ser malêd te p'er'anîya mêş-moza bişînim û malêd misirîya bi p'er'anîya mêş-mozava wê t'ijî bin, usa jî ser wî e'rdê ku ew dimînin. <sup>22</sup>Lê wê r'oje t'opraxa Goşenêye k'u cime'ta min lê dimîne, ezê başqe kim û wê derê p'er'anîya mêş-moza wê t'une be, ku tu bizanibî welêtda ez Xudan im. <sup>23</sup>Û ezê li nav cime'ta xwe û cime'ta teda firqiyê daynim. Sibê ev nîşanê biqewime». <sup>24</sup>Xudan usa jî kir. P'er'anîya mêş-mozaye mezin hate li ser mala Firewin, malêd xulamêd wî û li ser t'emamîya welatê Misirê, ji dest p'er'anîya mêş-moza welat wêran bû.

<sup>25</sup>Firewin gazî Mûsa û Harûn kir, got: «Her'in vî welatîda Xwedêyê xwer'a qurbanê bidin». <sup>26</sup>Lê Mûsa gotê: «Ne cayîz e ku em vê yekê bikin, çimkî ew qurbana ku emê Xudan Xwedêyê xwer'a bidin, ev yek misirîyar'a h'eramî ye. Heger em bi wê qurbandayîna ku bona misirîya h'eram e, r'abin li ber ç'e'vê wan bidin, gelo ewê me nedine li ber kevira? <sup>27</sup>Emê r'îya sê r'oja her'ine ber'îyê û Xudan Xwedê xwer'a qurbanê bidin, çawa ku ew mer'a bêje». <sup>28</sup>Û Firewin got: «Ezê we ber'dim ku hûn her'ine ber'îyê Xudan Xwedêyê xwer'a qurbanê bidin, lê t'enê dîr neçin. Bona min r'eca bikin». <sup>29</sup>Mûsa gotê: «Va ye ezê ji cem te derk'evim û r'eca ji Xudan bikim, ku sibê p'er'anîya mêş-moza ji Firewin, ji xulamêd

\* 8:19 Binihêr'e Lûqa 11:20.

wî û ji cime'ta wî dûr k'leve, lê t'enê bira Firewin îdî cime'tê nexapîne û negire ku qurbanê bidine Xudan». <sup>30</sup>Mûsa ji cem Firewin derk'et û r'eca ji Xudan kir. <sup>31</sup>Xudan weke gotina Mûsa kir. P'er'anîya mêş-moza ji Firewin, ji xulamêd wî û ji cime'ta wî dûr xist, qet yek jî nema. <sup>32</sup>Firewin vê carê jî dilê xwe kire kevir û cime't ber'neda.

### **Ceza pêncâ: Nexweşîya h'al ser h'eywên**

**9** Xudan gote Mûsa: «Her'e cem Firewin û bêje wî: «Xudan Xwedêyê îbranîya aha dibêje: «Cime'ta min ber'de ku xulamtîya min bike», <sup>2</sup>lê heger tu wana hê bigirî û nexwazî ber'dî, <sup>3</sup>awa destê Xudan wê li ser h'eywanêd teye çolê: Hespa, k'era, deva, pêz û dêwêr be û bi nexweşîya h'ale mezin qir'a wanê bê. <sup>4</sup>Lê Xudan wê h'eywanêd Îsraêl' ji h'eywanêd Misirê başqe ke û ji h'eywanêd zar'êd Îsraêl, qet yekê h'işk nebe». <sup>5</sup>Xudan we'de k'ifş kir û got: «Sibê Xudanê vê yekê ser welêt bike». <sup>6</sup>R'oja din Xudan ev yek kir û h'emû h'eywanêd misirîya h'işk bûn, lê ji h'eywanêd zar'êd Îsraêl qet yek h'işk nebû. <sup>7</sup>Hingê Firewin şand û pê h'esîya va ye ji h'eywanêd Îsraêl qet yek jî h'işk nebûye. Dilê Firewin hê bû kevir û cime't ber'neda.

### **Ceza şeşa: Nexweşîya p'izika**

<sup>8</sup>Xudan gote Mûsa û Harûn: «K'ulmêd xwe t'ijî k'oziya fir'nê kin. Û bira Mûsa wê li ber ç'e'vê Firewin bir'eşîne berbi e'zmên. <sup>9</sup>Ewê li ser t'emamîya welatê Misirê bibe t'oz, li ser h'emû merivî û h'eywanêd welatê Misirêda kulêd p'izika p'îsê derên». <sup>10</sup>Wana k'oziya fir'nê hilda û li ber Firewin sekinîn. Mûsa ew berbi e'zmên r'eşand. Li ser mêriv û h'eywên kulêd p'izika p'îs derk'etin. <sup>11</sup>Hingê sêrbaza nikaribû ji dest p'izika li ber Mûsa bisekinîyana, çimkî p'izik li ser sêrbaz û h'emû misirîya jî derk'etibûn. <sup>12</sup>Xudan dilê Firewin kire kevir û ewê gur'a wan nekir, çawa ku Xudan Mûsar'a gotibû.

### Ceza h'efta: Teyrok

<sup>13</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Serê sibehê zû r'abe her'e li ber Firewin bisekine û wîr'a bêje: «Xudan Xwedêyê îbranîya aha dibêje: Cime'ta min ber'de ku xulamtîya min bike, <sup>14</sup>çimkî vê carê, ezê h'emû cezayêd xwe bidime ser'a dilê te, serê xulamêd te û cime'ta te, ku bizanibî, li ser t'emamîya dinyayê yekî mîna min t'une. <sup>15</sup>Heger min destê xwe dirêj kira û bi nexweşîya h'al li te û cime'ta te xista, tê ser dinê bihatayî undakirinê. <sup>16</sup>Lê bona vê yekê min tu xweykirî, wekî qewata xwe nîşanî te bikim û li ser t'emamîya dinyayê navê min bê gotinê. <sup>17</sup>Tu hê miqabilî cime'ta min disekinî ku wê ber'nedî? <sup>18</sup>Awa ezê sibê vî çaxî, teyrokeke usa qayîm bibarînim ku mîna wê, r'oja çêbûna Misirêda h'eta niha, tiştê usa neqewimîye. <sup>19</sup>Niha bişîne h'eywanêd xwe t'op ke çî te ku çolê heye bibine hindur'. Çimkî her meriv, yan h'eywanêd ku çolê be, heger nek'evine hindur' teyrokê ser wanda bibare û wê qir'a wan bê». <sup>20</sup>Ji xulamêd Firewin, k'îjan ku ji gotina Xudan ditirsîya, xulamêd xwe û h'eywanêd xwe birine hindur', <sup>21</sup>lê k'ê guhdarîya gotina Xudan nekîr, xulamêd xwe û h'eywanêd xwe çolê hiştin.

<sup>22</sup>Xudan gote Mûsa: «Destê xwe dirêjî berbi e'zmên ke û wê t'emamîya welatê Misirêda, li ser mêriv û h'eywên, li ser t'emamîya şînyaya e'rdê Misirêda teyrokê bibare». <sup>23</sup>Mûsa şivdara xwe dirêjî berbi e'zmên kir, Xudan qir'ç'înî û teyrok şand û birûskê\* birq vedida li ser e'rdê. Xudan teyrok li ser welatê Misirêda barand. <sup>24</sup>Teyrok barî û t'ev teyrokê jî birûskê\* birq dida, usa qayîm bû, ku t'emamîya welatê Misirêda, ji r'oja pêşda hatina wî miletîda tiştê usa neqewimî bû. <sup>25</sup>Teyrokê t'emamîya welatê Misirê xist, h'emû tiştêd çî

\* 9:23-24 Îbranî xeber bi xeber: «Agir».

ku çolê bû, ji mêriv girtî h'eta h'eywên. Teyrokê t'emamîya şînayîya çolê xist û h'emû darêd deştê hûrdexweşî kirin. <sup>26</sup>T'enê t'opraxa Goşenêda teyrok nebarî, k'îderê zar'êd Îsraêl diman. <sup>27</sup>Firewin şand gazî Mûsa û Harûn kir û wanr'a got: «Vê carê min gune kir, Xudan r'ast e, lê ez cime'ta xweva em neheq in. <sup>28</sup>R'eca ji Xudan bikin, bira qirç'în û teyroka Xwedê bêne bir'înê û ezê we ber'dim, hûnê îdî vira nemînin». <sup>29</sup>Mûsa gote wî: «Çawa ku ez ji bajêr derk'evim, ezê destêd xwe berbi Xudan dirêj kim û qir'ç'înîyê biseqir'in, teyrokê îdî nebare ku tu bizanibî, e'rd e'rdê Xudan e. <sup>30</sup>Lê ez zanim, wekî tu û xulamêd xwe hela hê ji Xudan Xwedê natirsin». <sup>31</sup>K'itan û cehe hatine lêdanê, çimkî cehe simbil dabû, k'itanê jî gupik dabû. <sup>32</sup>Lê genim û ç'adî\* nehatine lêdanê, çimkî ew dereng digihîştin. <sup>33</sup>Û Mûsa ji cem Firewin ji bajêr derk'et û destêd xwe berbi Xudan bilind kir, qirç'în û teyrok seqir'în û baran li ser e'rdê îdî ne barî. <sup>34</sup>Lê gava Firewin dît ku baran, teyrok û qir'ç'înî seqir'în, dîsa gune kir û dilê xwe kire kevir, ewî jî xulamêd wî jî. <sup>35</sup>Dilê Firewin bû kevir û zar'êd Îsraêl ber'nedan, çawa ku Xudan Mûsar'a gotibû.

### Ceza h'eyşta: Kulî

**10** Hingê Xudan gote Mûsa: «Her'e cem Firewin, çimkî min dilê wî û dilê xulamêd wî kire kevir, wekî van nîşanêd xwe nav wanda bikim <sup>2</sup>û wekî tu zar'ê xwer'a û zar'êd zar'ê xwer'a gilî kî, ku min pê kirêd xwe misirî çawa kirin pêk'enî û çî nîşan min kirin, ku hûn bizanibin ez Xudan im». <sup>3</sup>Mûsa û Harûn çûne cem Firewin û gotine wî: «Xudan Xwedêyê îbranîya aha dibêje: «H'eta k'engê tê nexwazî ber min xwe bişkênî? Cime'ta min ber'de ku xulamtîya min bike. <sup>4</sup>Lê heger tu nexwezî cime'ta min ber'dî, va ye ezê sibê kulîya bişînime li ser t'opraxa te, <sup>5</sup>ewê r'ûyê e'rdê usa

\* 9:32 «Ç'adî» cûr'e genim e.

bigirin, ku e'rdê îdî neyê k'ifşê çî jî pey teyrokêr'a bona we maye wê bixwin û usa jî h'emû darêd e'rdê weda ye şînbûyî wê bixwin. <sup>6</sup>Ewê malêd te, malê xulamêd te û malêd h'emû misirîya t'ijî bin, wekî ne bavêd te, ne jî bavê bavêd te ji r'oja r'ûbarî dinê k'etine h'eta niha tiştê usa nedîtine». Û piştî xwe dayê ji cem Firewin derk'et.

<sup>7</sup>Xulamêd Firewin gotine wî: «H'eta k'engê evê bibe bela serê me, van mêrêd wan ber'de bira Xudan Xwedêyê xwer'a xulamtîyê bikin. Gelo tu hê nabînî ku Misir wêran bû?».

<sup>8</sup>Mûsa û Harûn vejer'andine cem Firewin û ewî gote wan: «Her'in Xudan Xwedêyê xwer'a xulamtîyê bikin. Lê k'î û k'ê wê her'in?» <sup>9</sup>Mûsa gotê: «Emê bi biç'ûk û mezinêd xweva her'in, kur' û qîzêd xweva, pez û dewarêd xweva her'in, çimkî bona me cejina Xudan e». <sup>10</sup>Firewin gote wan: «Heger ez destûra we û jin-zar'êd we bidim bira Xudan t'evî we be. Lê vê yekê bizanibin ku dilê we qelp e. <sup>11</sup>Na, xêr! Hûn mêr t'enê her'in xulamtîyê Xudanr'a bikin, ne we ew yek dixwest?» Û berî wan dan ji cem Firewin derxistin.

<sup>12</sup>Xudan gote Mûsa: «Destê xwe dirêjî ser welatê Misirê ke, bira kulî r'abine li ser welatê Misirê û h'emû gîhayê e'rdê, çî ku pey teyrokêr'a maye bixwin». <sup>13</sup>Mûsa şivdara xwe dirêjî ser welatê Misirê kir û Xudan t'emamîya wê r'ojê û t'emamîya wê şevê, bayê r'ohilatê r'akir. Serê sibehê bayê r'ohilatê kulî anîn. <sup>14</sup>Û kulîya t'emamîya welatê Misirê girt û li ser t'emamîya t'opraxa Misirê bêh'esab danîn, usa ku ne berî vê yekê haqas kulî hebûne û ne jî pey vêr'a. <sup>15</sup>Kulîya t'emamîya r'ûyê e'rdê girt û welat bû te'rî, h'emû şînaya e'rdê û berêd daraye ku pey teyrokêr'a mabûn xwarin. T'emamîya welatê Misirêda t'u tiştê şîn li ser dara û k'ola ne ma. <sup>16</sup>Hingê Firewin lez gazî Mûsa û Harûn kir û got: «Min hindava Xudan Xwedêyê weda û hindava weda gune kir, <sup>17</sup>niha hîvî dikim, t'enê vê carê gunê min bibaxşîne û r'eca ji Xudan Xwedêyê xwe bikin, t'enê vê mirinê bira ji ser min hilde». <sup>18</sup>Ew ji cem Firewin derk'et û r'eca ji Xudan

kir. <sup>19</sup>Xudan ba vejer'and, bakî r'oavayêyî qayîm r'akir û bê ew kulî ajotin kirine Be'ra Sor. T'emamîya t'opraxa Misirêda kulîk ne ma. <sup>20</sup>Lê Xudan dilê Firewin kire kevir û ewî zar'êd Îsraêl ber'nedan.

### Ceza neha: Te'rîstanî

<sup>21</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Destê xwe berbi e'zmên dirêj ke, wekî li ser welatê Misirê bibe şever'eşeke destdayînê». <sup>22</sup>Mûsa destê xwe berbi e'zmên dirêj kir û sê r'oja li ser t'emamîya welatê Misirê bû şever'eşeke te'rî. <sup>23</sup>Kesekî hevdu nedidît û sê r'oja qet yek ji cîyê xwe r'anebû, lê cîyêd ku h'emû zar'êd Îsraêl diman r'onayî hebû. <sup>24</sup>Hingê Firewin gazî Mûsa kir û gotê: «Her'in Xudan bih'ebînin, lê t'enê bira pez û dewarêd we bimînin, jin-zar'êd we jî bira t'ev we bên». <sup>25</sup>Mûsa got: «Gerekê tu qurban û dîyarîyêd t'evayîşewatê jî bidî destê me, ku em bidine Xudan Xwedêyê xwe. <sup>26</sup>Emê h'eywanêd xwe jî t'ev xwe bibin, qet simek jî gere nemîne, çimkî bona Xudan Xwedêyê xwer'a xulamtî kirinê, em gerekê ji wan hildin. H'eta em neçine wir, em nizanin emê bi çi Xudanr'a xulamtîyê bikin». <sup>27</sup>Lê Xudan dilê Firewin kire kevir û wî nexwest ku wan ber'de. <sup>28</sup>Û Firewin gote Mûsa: «Ji cem min her'e! Haş xwe hebe ku careke din r'ûyê min r'ûyê te nek'eve, çimkî wê r'oja ku r'ûyê min r'ûyê te k'eve, tê bimirî». <sup>29</sup>Hingê Mûsa got: «Te r'ast got, îdî t'u car r'ûyê te r'ûyê min nak'eve».

### Gotina bona mirina nixurîya

**11** Xudan gote Mûsa: «Belakê jî ezê bînim ser Firewin û Misirê, paşê wê we ji vir ber'de, gava hûn ber'dan wê berî we de ji vir derxe. <sup>2</sup>Niha cime'têr'a bêje, bira her mêrek ji cînarê xwe û her k'ulfetek ji cînara xwe xişirêd zîv û zêr'în bixwaze». <sup>3</sup>Xudan li ber ç'e'vê misirîya, cime't şîrin kir. Mûsa jî welatê Misirêda ber xulamêd Firewin û ber cime'tê, merivekî gelekî xweyîqedir bû.

<sup>4</sup>Mûsa gote Firewin: «Xudan aha dibêje: «Nêzikîya nîvê şevê ezê nava Misirêr'a derbaz bim. <sup>5</sup>Welatê Misirêda her nixurîyê bimire, ji nixurîyê Firewinî ku ser t'ext r'ûniştîye, h'eta nixurîyê carîya ku ser destêr' e û usa jî her nixurîyê h'eywên. <sup>6</sup>Û wê zarînîke k'ûr bik'eve t'emamîya welatê Misirê, ku tiştê usa ne qewimîye û ne jî wê biqewime. <sup>7</sup>Lê hindava zar'êd Îsraêlda, ji meriva girtî h'eta h'eywên, sekê jî zimanê xwe nelipitîne. Hingê hûnê bizanibin, ku Xudan li nav Misirê û Îsraêlda firqîyê datîne. <sup>8</sup>Û ev h'emû xulamêd te wê berjêr bêne cem min, ber min tabin û bêjin: «Tu û t'emamîya cime'ta ku pey te tê derk'eve». Pey vê yekêr'a ezê derk'evim». Û Mûsa gelekî hêrs ji cem Firewin derk'et.

<sup>9</sup>Xudan gotibû Mûsa: «Firewinê gur'a we neke, wekî welatê Misirêda nîşanêd min bêne zêdekirinê». <sup>10</sup>Mûsa û Harûn ev h'emû nîşan li ber ç'e'vê Firewin kirin, lê Xudan dilê Firewin kire kevir û ewî zar'êd Îsraêl ji welatê xwe ber'nedan.

### Gotina bona Cejina<sup>f</sup> Derbazbûnê

**12** Xudan welatê Misirêda t'ev Mûsa û Harûn xeber da û got: <sup>2</sup>«Eva meha li nava mehada wer'a bibe ya pêşin<sup>\*</sup>, ew li nava mehêd salêda wer'a bibe ya pêşin. <sup>3</sup>H'emû civîna Îsraêlr'a xeber din û bêjin: «Dehê vê mehê, bira her merivek bona mala xwe berxekî hilde, serê her malê berxek. <sup>4</sup>Lê heger neferê malekê hindik bin, wê nika-ribin berxekî bixwin, bira t'evî wî cînarê nêzikî mala xwe bibe yek, wî berxî hilde bavêje ser h'esabê nefera, k'a her kesê çiqasî bikaribe bixwe. <sup>5</sup>Berxê we bira bêqusûr nêr û yeksalî be, ji pêz yan jî ji bizina hildin. <sup>6</sup>Wî xwey kin h'eta çardehê vê mehê, paşê t'emamîya civîna mixulqeta Îsraêl, çaxê r'o diçe ava wê serjêke. <sup>7</sup>Bira ji wê xûnê hildin, her

\* 12:2 Salne'ma îbranîya pê hîvê mehe ji hev derdixistin awa gotî yekr'o'jîya hîvê h'eta t'emambûna wê. R'oja meha ser salê dik'ete nîvê meha Adarê (Mart) h'eta nîvê meha Nîsanê (Aprêl).

du rexderîya û derezûnga\* derê wê malê xin, k'îderê wê wî bexî bixwin. <sup>8</sup>Bira wê şevê goştê wî bixwin, ewî ser êgir bipêjin, pê nanê şkeva û p'incar'a tel bixwin. <sup>9</sup>Ji wî goştî, xav yan avêda k'elandî nexwin, lê ser êgir pijandî be, t'evî ser pê û dil h'inava. <sup>10</sup>H'eta serê sibehê ji wî tiştêkî nehêlin, lê çi jî bimîne h'eta sibehê ser êgir bişewitînin. <sup>11</sup>Bi vî awayî wî bixwin, bira piştê we girêdayî bin çarixêd we nigêd weda bin û şiv jî destê weda bin, hûn wî zû bixwin. Ew Derbazbûna Xudan e. <sup>12</sup>Wê şevê ezê nava welatê Misirêr'a derbaz bim û her nixurîyê welatê Misirê xim, ji mêriv girtî h'eta h'eywên. Ezê dîwana h'emû xwedêyêd Misirê bikim. Ez Xudan im. <sup>13</sup>Xûnê bona we bibe nîşan li ser malêd k'îderê hûn dimînin. Gava ez welatê Misirê xim û wê xûnê bibînim, hingê ezê ser wer'a derbaz bim û belayê ser weda neyê ku we unda ke. <sup>14</sup>Bira ew wer'a bibe r'ojeke bîranînê, wê bona Xudan xwey kin, bira eva cejna nava nisilêd weda bibe e'rf-e'detê h'eta-h'etayê. <sup>15</sup>H'eft r'oja nanê şkeva bixwin. Hema r'oja pêşinda hevîrtir'şk ji mala xwe derxin, çimkî ji r'oja pêşinda h'eta r'oja h'efta k'ê ku tiştêd hevîrtir'şkkirî bixwe, wê ji nav Îsraêl bê r'aqetandinê. <sup>16</sup>Bira r'oja pêşin wer'a bibe civîna pîroz û r'oja h'efta jî civîna pîroz. Wan r'ojada t'u şixul neyê kirinê, pêştirî xwarinêd xwe ku her kes xwer'a dikare hazir ke. <sup>17</sup>Cejinaf Nanê Şkeva xweyî kin, çimkî hema wê r'ojêda min r'efêd we ji welatê Misirê derxistin, usa ku evê r'ojê li nav nisilêd xweda xweyî kin, çawa e'rf-e'detê h'eta-h'etayê. <sup>18</sup>Ji r'oja çardehê meha pêşin êvarêda, hûn gerekê nanê şkeva bixwin h'eta êvara r'oja bîst yekê wê mehê. <sup>19</sup>H'eft r'oja hevîrtir'şk malêd weda t'une be, çimkî kî ku tiştêd hevîrtir'şkkirî bixwe, wê ji nav civîna Îsraêl bê r'aqetandinê, heger xerîb be yan binelî be. <sup>20</sup>Tiştêkî hevîrtir'şkkirî nexwin. Wan h'emû cîyada k'îderê

---

\* 12:7 Şêmîka jorin.

ku hûn dimînin nanê şkeva bixwin». <sup>21</sup>Mûsa gazî h'emû r'ûspîyêd Îsraêl kir û gote wan: «Anegorî serê neferêd xwe xwer'a berxekî bibijêrin û Derbazbûnê serjêkin. <sup>22</sup>Paşê qevr'eke zoxa hûsopêf hildin xûna t'eştêda kin û ji wê xûna t'eştê derezûngê û her du r'exderîya xin. Bira ji we t'u kes h'eta serê sibehê ji derê mala xwe dernek'eve. <sup>23</sup>Wê Xudanê derbaz be ku misirîya xe, lê gava xûna derezûngê û her du r'exderîyava bibîne, hingê Xudanê ser wî derîyîr'a derbaz be û nehêle ku milyak'etêf beladar bik'eve mala we. <sup>24</sup>Û vê yekê çawa qanûn, bona xwe û zar'êd xwe h'eta-h'etayê xweykin. <sup>25</sup>Gava hûn her'ine wî welatê ku Xudanê bide we, çawa ku ewî wer'a soz daye, vê derecê bikin. <sup>26</sup>Lê gava zar'êd we ji we bipirsin: «Ev çi dereceye ku hûn derbaz dikin?» <sup>27</sup>hingê bêjin: «Eva qurbana Derbazbûna Xudan e ku Misirêda li ser malêd zar'êd Îsraêl'a derbaz bû, misirîya xist û malêd me xilaz kirin». Cime't dever'ûya çû û h'eband. <sup>28</sup>Û zar'êd Îsraêl çûn kirin, çawa ku Xudan e'mirî li Mûsa û Harûn kiribû, usa jî kirin.

### Ceza deha: Mirina nixurîya

<sup>29</sup>Û gava bû ku welatê Misirêda Xudan nîvê şevê her nixurîyî xist, ji nixurîyê Firewinî ku ser t'extê xwe r'ûniştî, h'eta nixurîyê girtîyê kelêda û usa jî her nixurîyê h'eywên. <sup>30</sup>Wê şevê Firewin, h'emû xulamêd wî û h'emû misirî r'abûn. Zarîneke k'ûr k'etibû Misirê, çimkî mal t'unebû ku mirî têda t'unebûya. <sup>31</sup>Şev gazî Mûsa û Harûn kir û got: «R'abin ji nav cime'ta min derk'evin her'in, hûn jî zar'êd Îsraêl jî, her'in Xudan'a xulamtîyê bikin çawa we got. <sup>32</sup>Pez û dewarêd xwe jî hildin her'in, çawa we got û dua min jî bikin».

<sup>33</sup>Misirîya p'êyî li ser cime'tê kir, wekî wan zû ji welêt derxin, çimkî digotin: «Emê h'emû bimirin». <sup>34</sup>Hevîr hê hilnehatî, cime'tê hevîr şkevava li nav destexanada pêç'an û dane li ser milê xwe. <sup>35</sup>Çawa Mûsa zar'êd Îsraêl'a gotibû usa jî kirin,

ji misirîya xişîrêd zîv, xişîrêd zêr' û k'inc xwestin. <sup>36</sup>Xudan cime't li ber ç'e'vê misirîya şîrin kir. Û çî ku xwestin misirîya dane wan. Û misirî t'alan kirin.

### Îsraêlî ji Misirê derdik'evin

<sup>37</sup>Zar'êd Îsraêl ji R'amsêsê k'oç'kirin çûne Sûkotê, pêştirî jin û zar'a şesid h'ezar mêrêd peya bûn. <sup>38</sup>T'evî wan e'laleteke giran ji gelek mileta jî hevraz çûn, pez û dewarêd wan, kerê h'eywana gelekî ze'f bûn. <sup>39</sup>Ji wî hevîrê ku t'evî xwe ji Misirê anîbûn, totikê şkeva pe'tin, çimkî hê hilnehatibû. Ji Misirê berî wan dabûn, wana nikarîbû xwe derengî xistana, h'eta ku nanê r'ê jî xwer'a hazir nekirin. <sup>40</sup>Zar'êd Îsraêl çarsid sî salî Misirêda man. <sup>41</sup>Hema wê r'oja xilazîya çarsid sî salîyê h'emû r'efêd Xudan ji Misirê derk'etin. <sup>42</sup>Eva şeveke Xudan xweyî dike ku wan ji Misirê derxe. Eva ew şevaye bona Xudan, k'îjan ku gerekê nava zar'êd Îsraêlda qur'ne-qur'ne bê xweyîkirinê.

### E'rf-e'detê Cejina Derbazbûnê

<sup>43</sup>Xudan gote Mûsa û Harûn: «Ev e e'rf-e'detê Cejinaf Derbazbûnê. T'u kesî xerîb gerekê ji wê nexwe. <sup>44</sup>Lê her xulamê ku p'eretî hatîye k'ir'înê, wî sinet\* kî, hingê dikare ji wê bixwe. <sup>45</sup>Yêd xerîb û k'irêkirî, gerekê ji wê nexwin. <sup>46</sup>Malekêda gerekê ew bê xwarinê, wî goştî ji mal dernexî û qet hestûkî wî jî neşkênin. <sup>47</sup>T'emamîya civîna Îsraêl bira vê yekê bike. <sup>48</sup>Lê gava merivekî xerîb cem te bimîne û bixwaze Derbazbûna Xudan bike, bira her qisimê wîyî nêrîn bê sinetkirinê, hingê dikare nêzîk be vê derecê bike û binelîyê welêt bê h'esabê, lê t'u merivê bêsinet gerekê ji wê nexwe. <sup>49</sup>Û bira bona binelî û xerîbê ku nav weda dimîne qanûnek be». <sup>50</sup>H'emû zar'êd Îsraêl usa kirin, çawa ku Xudan e'mirî

---

\* 12:44 Sinet nîşana peymanê nava Xwedê û cime'ta wîda bû, ku dida k'ifşê ew ji cime'ta Xwedê bû.

Mûsa û Harûn kiribû, wana usa jî kir. <sup>51</sup> Û usa bû ku hema wê r'ojê Xudan zar'êd Îsraêl r'efêd wanva ji welatê Misirê derxistin.

### Nixurîyêd k'ifş kirî bona Xudan

**13** Xudan t'ev Mûsa xeber da û got: <sup>2</sup> «Nav zar'êd Îsraêlda, ji her nixurîyê ku bet'inê vedike, heger merî be yan h'eywan, minr'a nedirf ke. Ew p'ara min e».

### Cejinaf Nanê Şkeva

<sup>3</sup> Mûsa gote cime'tê: «Bîr bînin vê r'ojê, gava ku hûn ji Misirê, wê mala xulamtîyê derk'etin, çimkî Xudan bi destê xweyî zor hûn ji wir derxistin. Nanê hilatî nexwin. <sup>4</sup> Hûn îro meha Abîbêda\* derdik'evin. <sup>5</sup> Û gava Xudan te bibe welatê kenanîya, h'îtîya, emorîya, h'îwîya û yebûsîya, çawa ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar ku wî welatî bide te, k'îderê şîr û hingiv jê dik'îşe, vê mehêda evê derecê derbaz kî. <sup>6</sup> H'eft r'oja nanê şkeva bixwî, r'oja h'efta bira cejina Xudan be. <sup>7</sup> Wan h'eft r'ojada, gerekê nanê şkeva bê xwarinê, tiştêd hevîrtir'şkkirî gerekê cem te t'une be, ne jî nava t'emamîya t'opraxa teda cem te hevîrtir'şk hebe. <sup>8</sup> Wê r'ojê gerekê zar'ê xwer'a gilî kî bêjî: «Ev bona wê yekê ye ku çi Xudan minr'a kir, gava ez ji Misirê derk'etim». <sup>9</sup> Bira ev li ser destê te çawa nîşan be û li ser e'nîya te jî bona bîranînê be, wekî hînkirina\* Xudan ser zarê te be, çimkî bi destê zor Xudan tu ji Misirê derxistî. <sup>10</sup> Vî e'rf-e'detî sal-sal we'deda derbaz kî.

### E'rf-e'det bona nixurîya

<sup>11</sup> Û gava Xudan te bibe welatê kenanîyaf, çawa te û kal-bavêd ter'a sond xwarîye ku wî bide te, <sup>12</sup> hingê her nixurîyê

\* 13:4 Abîb navê wêyî pêşin bû lê niha Nîsan e. Ev mehe salne'ma hîvê destpêdike ji nîvê meha Adarê (Mart) h'eta nîvê meha Nîsanê (Aprêl).

\* 13:9 Aha jî tê fe'mkirinê: «Qanûna».

ku bet'inê vedike, bide Xudan. Her nixurîyê nêrîn ji h'eywanêd te, p'ara Xudan be. <sup>13</sup>Lê ji ber her nixurîyê k'erêva berxekî bidî, lê heger berva nedî, stûyê wî bişkênî. Li nav zar'êd xweda ji ber her nixurîyê merivayêva bidî. <sup>14</sup>Û gava zar'a te sibê ji te bipirse û bêje: «Ev çi ye?» jêr'a bêjî: «Xudan bi destê zor em ji Misirê, ji mala xulamîyê derxistin. <sup>15</sup>Gava Firewin bû kevir û nexwest me ber'de, Xudan her nixurîyêd welatê Misirêda, ji nixurîyê mêrivda girtî h'eta nixurîyêd h'eywên kuştin, bona wê yekê jî ez her nixurîyê nêrînî ku bet'inê vedike Xudanr'a qurban dikim û ji ber nixurîyêd zar'êd xweva didim». <sup>16</sup>Bira ev yeka nîşanek be li ser destê te û bere'nîk be li ber ç'e'vê te, çimkî bi destê zor Xudan em ji Misirê derxistin».

### R'êwîtîya Îsraêl berbi Be'ra Sor

<sup>17</sup>Gava Firewin cime't ber'da, Xwedê ew li r'îya welatê filistînyar'af nebirin, lê belê ew hê nêzîk bû, Xwedê got: «Ku nebe cime't ç'e'v şêr' k'eve p'oşman be, paşda vege're Misirê». <sup>18</sup>Lê Xwedê cime't dora ber'îyêva zivir'and û bire alîyê Be'ra Sor\*, zar'êd Îsraêl sîlih'kirî ji welatê Misirê derk'etin. <sup>19</sup>Mûsa hestûyêd Ûsiv jî t'evî xwe hildan, çimkî Ûsiv zar'êd Îsraêl dabûne sondê û gotibû: «E'se Xwedê wê ser weda bê, hingê hestûyêd min jî t'evî xwe ji vir hevraz bibin». <sup>20</sup>Ewana ji Sûkotê r'êk'etin Êt'amêda, xilazîya ber'îyê konêd xwe vegirtin. <sup>21</sup>Û Xudan pêşîya wanva diçû, r'ojê pê stûneke e'wr r'ê nîşanî wan dikir, lê şevê jî pê stûneke agir r'onayî dikir, ku ew şev û r'oj r'ê her'in. <sup>22</sup>R'ojê stûna e'wr, şevê jî stûna agir ji ber ç'e'vê cime'tê dûr ne dik'etin.

### Derbazbûna Be'ra Sorva

**14** Xudan t'ev Mûsa xeber da û got: <sup>2</sup>«Bêje zar'êd Îsraêl ku vege'rîne pêşberî Pî-Hahîrotê, li navbera Mîgdolê

\* <sup>13:18</sup> Bi zimanê îbranî «Be'ra Qamîş» boxaza Be'ra Sor e, ku di-  
k'eve navbera Misirê û Sînayê.

û be'rê, pêşberî Bae'l-Siponê, nêzîkî be'rê zoma xwe lêxin. <sup>3</sup>Hingê Firewinê bona zar'êd Îsraêl bêje: «Ewana welêtda xalifîne û ber'îyê dora wan girtî ye». <sup>4</sup>Ezê dilê Firewin bikime kevir, wê pey wan k'evê û ezê ser Firewin û ser t'emamîya ordîya wî r'ûmeta xwe bidime k'ifşê, hingê misirîyê bizanîbin ku ez Xudan im». Wana usa jî kir.

<sup>5</sup>Cab dane p'adşê Misirê ku cime't r'evîye. Dilê Firewin û xulamêd wî hindava cime'têda hatine guhastinê û gotin: «Me çi kir? Çima îzina Îsraêl da ku ew ji xulamtîya me derk'etin?» <sup>6</sup>Firewin e'reba xwe hazir kir, cime'ta xwe jî t'evî xwe hilda. <sup>7</sup>Şesid e'rebêd şêr'e jîbare hildan û usa jî h'emû e'rebêd şêr'e Misirê, ser wan h'emûya jî seresker danîn. <sup>8</sup>Xudan dilê Firewin p'adşê Misirê kire kevir û ew pey zar'êd Îsraêl k'et. Lê zar'êd Îsraêl bi mêrk'îmî derk'etibûn. <sup>9</sup>misirî pey wan k'etin, h'emû hesp û e'rebêd Firewin, sîyarî û eskerêd wî xwe wanr'a gîhandin, Îsraêl jî pêşberî Bae'l-Siponê cem Pî-Hahîrot'ê nêzîkî be'rê zoma xwe lêxistibû.

<sup>10</sup>Firewin ku nêzîk bû zar'êd Îsraêl dîna xwe danê, va ye misirî pey wan k'etine, hingê zar'êd Îsraêl gelekî tirsîyan û gazî Xudan kirin. <sup>11</sup>Gotine Mûsa: «Gelo Misirêda t'îrb t'unebûn ku te em anîn ber'îyêda bimirin? Te ev çi anî serê me ku em ji Misirê derxistin? <sup>12</sup>Welatê Misirêda me ev yek ter'a nedigot: «Bihêle em xulamtîyê misirîyar'a bikin? Çimkî hê r'ind bû me Misirêda xulamtî bikira, ne ku ber'îyêda bimirin». <sup>13</sup>Hingê Mûsa gote cime'tê: «Netirsîn, bisekinin hûnê bibînîn xilazkirina Xudan, k'îjan ku bona we ewê îro bike! Çimkî wan misirîyêd ku hûn îro dibînîn, îdî hûnê t'u car nebînîn. <sup>14</sup>Xudanê dewsa we şer' ke, hûn ker' bin».

<sup>15</sup>Xudan gote Mûsa: «Tu çima gazî min dikî? Bêje zar'êd Îsraêl bira r'êk'evin. <sup>16</sup>Tu jî şivdara xwe hilde û destê xwe dirêjî ser be'rê ke û be'rê biqelêşe ku zar'êd Îsraêl li nava be'rê, ser zihayêr'a her'in. <sup>17</sup>Va ye ezê dilê misirîya bikime kevir û wê pey wan her'in û ezê ser Firewin, h'emû ordîya wî, e'rebêd wî, sîyarîyêd wî bême r'ûmetkirinê. <sup>18</sup>Hingê

misirîyê bizanibin ku ez Xudan im, gava ez ser Firewin, e'rebêd wî û sîyarêd wî bême r'ûmetkirinê».

<sup>19</sup>Milyak'etê\* Xwedê ku pêşîya zoma îsraêlîyava diçû, hate paşîya wan û stûna e'wrê pêşîya wan jî hate paşîya wan sekinî. <sup>20</sup>Û xwe da nava zoma misirîya û zoma îsraêlîya, hingê bona misirîya e'wrayî û şever'eş bû, lê bona îsraêlîya şev r'onayî dida û t'emamîya şevê ew nêzîkî hev nebûn.

<sup>21</sup>Mûsa destê xwe dirêjî ser be'rê kir, Xudan t'emamîya şevê bi bayê r'ohilatêyî qayîm be'r ajot û be'r ziha kir. Av hate qelaştinê <sup>22</sup>û zar'êd Îsraêl, li nava be'rê ser zihayêr'a çûn, av alîyê wanî ç'ep û r'astêva bû dîwar. <sup>23</sup>misirî pey wan k'etin û h'emû hespêd Firewin, e'rebêd wî, sîyarîyêd wî çûne nava be'rê. <sup>24</sup>Û destê berbangê, Xudan ji stûna agirî û e'wrî dîna xwe da ordîya misirîya û t'evîhevbûn kire li nav wan. <sup>25</sup>T'ekerekêd e'rebêd wan hatine derxistinê\* usa ku ew bi zorê pêşda diçûn, hingê misirîya got: «Em bir'evin ji îsraêlîya, çimkî Xudan dewsa wan misirîyar'a şer' dike».

<sup>26</sup>Xudan gote Mûsa: «Destê xwe dirêjî ser be'rê ke, wekî av li ser misirîya, e'rebêd wan û sîyarîyêd wanda vege'r'e». <sup>27</sup>Mûsa destê xwe dirêjî ser be'rê kir, serê sibehê be'r vege'r'îya ser qirara xwe, misirî dir'evîyan berbi wê û Xudan misirî kewkî be'rê kirin. <sup>28</sup>Av vege'r'îya û e'rebe, sîyarî û t'emamîya ordîya Firewin nixamt, ewêd ku pey wan k'etibûne be'rê qet yek ji wan nema.

<sup>29</sup>Lê zar'êd Îsraêl, be'rêda ser zihayêr'a çûbûn, av li alîyê wanî ç'ep û r'astêva wan'r'a bibû dîwar. <sup>30</sup>Û wê r'ojê Xudan îsraêlî ji destê misirîya xilaz kirin. Îsraêlîya devê be'rê misirî mirî dîtin. <sup>31</sup>Îsraêl qewata wî destî dît, k'îjan ku Xudan ser misirîya da k'ifşê. Cime't ji Xudan tirsîya û bawerîya xwe Xudan û xulamê wî Mûsa anîn.

\* 14:19 Eva cûr'ekî qedirgirtin yan e'yanbûna Xwedê ye.

\* 14:25 Welger'andina yûnanîye kevinda nivîsar e ku t'ek hatine girtinê.

## Stirana Mûsa

**15** Hingê ev stirana Mûsa û zar'êd Îsraêl Xudanr'a stiran û gotin:

«Xudanr'a distirê, çimkî ew xweyê r'ûmeta mezin e, hesp û sîyarî avîtine be'rê.

<sup>2</sup> Xudan e qewata min û r'ûspîtîya min.

Ew minr'a bû xilazbûn.

Ew e Xwedêyê min û ezê şikirîyê bidime wî.

Ew e Xwedêyê bavê min û ezê wî bilind kim.

<sup>3</sup> Xudan şer'k'ar e,

navê wî Xudan e.

<sup>4</sup> E'rebêd şêr' û ordîya Firewin avîtine be'rê,

sereskerêd wîye jibare nuqî Be'ra Sor bûn.

<sup>5</sup> Bêbinîya ew nixamtin,

mîna kevir k'etine k'ûrayê.

<sup>6</sup> Destê teyî r'astê, ya Xudan, qudretêva r'ûmetkirî ye,

destê teyî r'astê, ya Xudan, dijmin hûrdexweşî dike.

<sup>7</sup> Tu bi mezinayîya r'ûmeta xwe, miqabilêd xwe

dever'û dikî,

tu hêrsa xwe dişînî, mîna xozanê wan dişewitîne.

<sup>8</sup> Av ji hewa pozê te lod bûn,

lêyî mîna dîwêr sekinîn,

bêbinî dilê be'rêda mewicîn.

<sup>9</sup> Dijmin got: «Pey k'evim xwe pê'r'a bigihînim,

t'alên p'arevekim û nefsa minê pê wan t'êr be

ezê şûrê xwe k'aş kim û destê minê qir'a wan bîne».

<sup>10</sup> Lê te bayê xwe r'akir, be'rê ew nixamtin,

ava qewînda, mîna gulê k'etine binî.

<sup>11</sup> K'î ye mîna te nav xwedêyada, ya Xudan?

K'îjan e mîna te pîrozîyêda xweyîr'ûmet,

xweyîpesin-qudret û k'eremetkir?

<sup>12</sup> Destê xweyî r'astê te dirêj kir,

e'rdê ew daqurtandin.

- 13 Tu bi h'uba xweye amin r'êberîya vê cime'tê dikî, ya ku te xilaz kirîye.  
 Tu bi qewata xwe wan dibî xana xweye pîroz.
- 14 Mileta bihîst û dilerizin,  
 tirs k'ete ser binelîyêd Filesetê.
- 15 Hingê saw k'ete ser mîrêd Edomêf,  
 serwêrêd Mowabêf lerizîn  
 û t'emamiya binelîyêd Kenanêf h'elîyan.
- 16 Xof û tirs k'ete ser wan,  
 ji mezinayîya zenda te, wê mîna kevira sar bin,  
 h'eta ku derbaz be cime'ta te, ya Xudan,  
 h'eta ku derbaz be ev cime'ta, ya ku te stand.
- 17 Tê wan bînî li ç'îyayê milk'ê xwe daç'ikînî,  
 wî cîyî, ya Xudan, ku te bona mayîna xwe çêkir.  
 Wê pîrozgehêda, Xweyê min, ku destêd te çêkirin.
- 18 Xudanê h'eta-h'etayê p'adşatîyê bike».
- 19 Gava hespêd Firewin û e'rebêd wî sîyarîyava k'etine be'rê,  
 Xudan ava be'rê ser wanda vejer'and, lê zar'êd Îsraêl, li nav be'rê ser zihayêr'a çûn.

### Stirana Meryemê

- 20 Meryema xûşka Harûne p'êxemberf def girte destê xwe,  
 h'emû k'ulfet jî def destada bi r'eqasê li pey wê derk'etin.
- 21 Û Meryemê li wan vediger'and:  
 «Xudanr'a bistirên, çimkî ew xweyê r'ûmeta mezin e,  
 hesp û sîyarî avîtime be'rê».

### Ava te'l

- 22 Mûsa zar'êd Îsraêl ji Be'ra Sor birin, çûn gihîştine ber'îya Şûrê,  
 sê r'oja ber'îyêva çûn û r'astî avê nehatin. 23 Gava gihîştine Marahê,  
 nikaribûn ava Marahê vexwarana, çimkî te'l bû, lema navê wê Marah\*

\* 15:23 Bi zimanê îbranî «Te'layî».

hate danînê. <sup>24</sup>Hingê cime'tê bîna xwe li Mûsa teng kir û gotê: «Em çi vexwin?» <sup>25</sup>Hingê Mûsa gazî Xudan kir, Xudan jî darek nîşanî wî da, ewî avîte nava avê û av xweş bû.

Wê derê Xudan qanûn û t'emî dane wan, li wê derê ew cêr'ibandin <sup>26</sup>û got: «R'ast heger tu gur'a Xudan Xwedêyê xwe bikî û ew tiştê ku wî xweş tên bikî, guh bidî t'emîyêd wî û h'emû qanûnêd wî xwey kî, ezê ji wan nexweşîya qet yekê neynime serê te, çi ku min anî serê misirîya, çimkî ez Xudan im, h'ekîmê te».

<sup>27</sup>Pey van yekar'a ewana gihîştine Êlîmê, wê derê donzdeh kanîyêd ava û h'eftê darêd xurma hebûn, wê derê cem avê konêd xwe vegirtin.

### Qar'îtkf û mana

**16** T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl ji Êlîmê r'êk'etin, hatine ber'îya Sînê, ku li navbera Êlîmê û Sînayêda ye, panzdehê meha duda bû ku ji welatê Misirê derk'etibûn. <sup>2</sup>T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl ber'îyêda, hindava Mûsa û Harûnda bîna xwe teng kirin. <sup>3</sup>Zar'êd Îsraêl gotine wan: «Xwezî em bi destê Xudan li welatê Misirêda bimirana, gava em ber sîtilê goşt r'ûdiniştin û me t'êr nan dixwar, we em derxistine vê ber'îyê ku t'emamîya civînê bir'çîya bikujin».

<sup>4</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Va ye ezê wer'a ji e'zmên nan bibarînim, bira cime't her r'oj derk'eve, çiqas lazime t'êra wê r'ojê berev ke, wekî wan bicêr'ibînim k'a ewê anegorî t'emîya min bikin yan na. <sup>5</sup>Û r'oja şeşa çi ku bînin bira hazir kin, ew ser t'opkirina her r'ojîr'a dubare be». <sup>6</sup>Mûsa û Harûn gotine h'emû zar'êd Îsraêl: «Vê êvarê hûnê bizanibin ku Xudan hûn ji welatê Misirê derxistine. <sup>7</sup>Serê sibehê hûnê r'ûmeta Xudan bibînin, çimkî ewî bihîst ew bîntengîya weye hindava Xudanda. Em k'î ne ku hûn hindava meda bîntengîyê dikin?» <sup>8</sup>Mûsa got: «Xudanê êvarê bona xwarinê goşt bide we û serê sibehê jî nan bide h'eta ku hûn t'êr bixwin, çimkî Xudan bihîst ew bîntengîya we. Em k'î ne? Hûn bîna xwe li me teng nakin lê li Xudan».

<sup>9</sup>Mûsa gote Harûn: «Bêje t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl: «Li ber Xudan bisekinin, çimkî ewî bîntengîya we bihîst»».

<sup>10</sup>Gava Harûn t'emamîya civîna zar'êd Îsraêlr'a xeber dida, wana dûna xwe da ber'îyê, va ye r'ûmeta Xudan li nav e'wrda hate xanê. <sup>11</sup>Xudan t'ev Mûsa xeber da û gotê: <sup>12</sup>«Min bîntengîya zar'êd Îsraêl bihîst. T'evî wan xeber de û bêje wan: «Berê êvarê hûnê goşt bixwin û serê sibehê jî hûnê bi nan t'êr bin, hingê hûnê bizanibin ku ez Xudan Xwedêyê we me»».

<sup>13</sup>Usa qewimî ku êvarê qar'îtk<sup>f</sup> fir'în hatin û zome nixamtin, serê sibehê dor-berê zomê qir'avîyê danî. <sup>14</sup>Gava ew qir'avîya danî hilat, va ye ser r'ûyê ber'îyê tişteki mîna kapekê hûr, gilover', mîna qîşê li ser e'rdê hebû. <sup>15</sup>Gava zar'êd Îsraêl dîtin, gotine hev: «Ev çi ye?» Çimkî nizanibûn ew çi ye. Mûsa gote wan: «Ev ew nan e ku Xudan bona xwarina we da. <sup>16</sup>T'emîya Xudan ev e: «Bira her kesî we qasî xwarina xwe ji wî berev ke. Serê her neferê omêrekî\* berev ke, weke h'esabê wan nefsa, çiqas ku konê her kesîda hene»». <sup>17</sup>Zar'êd Îsraêl usa jî kirin. Berev kirin hineka gelek, hineka hindik. <sup>18</sup>Û gava çap kirin\*, k'ê gelek t'op kir, zêde nebû û k'ê hindik t'op kir, kêmbû. Her yekî qasî xwarina xwe berev kir. <sup>19</sup>Mûsa gote wan: «Bira t'u kes ji wî h'eta serê sibehê nehêle». <sup>20</sup>Wana gur'a Mûsa nekir, ji wan hineka h'eta serê sibehê ji wî hiştin. Bîn k'etê û kurmî bû. Mûsa ser wan hêrs k'et. <sup>21</sup>Her serê sibehê, her yekî t'êra xwarina xwe ji wî berev dikir û çaxê germayîya te'vê didayê ew dih'elîya.

<sup>22</sup>Lê r'oja şeşa ew nan dubare berev kirin, awa gotî serê her yekî du omêr. H'emû serwêrêd civînê hatin gîhandine Mûsa <sup>23</sup>û wî gote wan: «Ev gotina Xudan e: «Sibê r'ojaf r'ih'etîyê ye, şemîya Xudane pîroz e, çi ku hûnê bipêjin, bipêjin û çi ku hûnê bik'elînin, bik'elînin û her çi ku zêde be, bihêlin

\* 16:16 Awa gotî «kîlogramekê». Omêrek derdaneke çapê bû ku pê tişt dihatine çapkirinê.

\* 16:18 Îbrani<sup>f</sup> xeber bi xeber: «Pê omêrê çap kirin».

bona r'oja din»». <sup>24</sup>Ewê zêde bûyî h'eta serê sibehê hiştin, çawa ku Mûsa gotibû, ne bîn k'etê, ne jî kurmî bû. <sup>25</sup>Mûsa got: «Îro wî bixwin, çimkî îro r'oja r'ih'etîyêye bona Xudan e, hûnê îro ji wî çolêda nebînin. <sup>26</sup>Hûnê şeş r'oja ji wî berev kin, lê r'oja h'efta ku şemî ye, wê t'une be».

<sup>27</sup>Û usa qewimî ku r'oja h'efta ji cime'tê hinek derk'etin ku berev kin, lê nedîtin. <sup>28</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «H'eta k'engê hûnê nexwazin t'emî û hînkirinêd min xwey kin? <sup>29</sup>Binihêr'in, Xudan şemî da we, lema r'oja şeşa nanê du r'oja dide we, bira her kes cîyê xweda bimîne, r'oja h'efta, t'u kes ji cîyê xwe neleqe». <sup>30</sup>Cime't r'oja h'efta r'ih'et bû.

<sup>31</sup>Mala Îsraêl navê wî danîn mana\*, ew mîna ji k'oma t'oximê mêmikê, sipî û te'ma wê mîna k'atê pê hingiv bû. <sup>32</sup>Mûsa got: «Ev t'emîya Xudan e: «Ji wî omêrekî dagirin ku nava nisilêd weda bê xweykirinê, wekî ewana wî nanî bibînin k'îjan ku min hûn ber'îyêda dane xwarinê, gava min hûn ji welatê Misirê derxistin». <sup>33</sup>Mûsa gote Harûn: «Cêr'ekî hilde omêre mane t'ijî ke û dayne li ber Xudan, bona ku nav nisilêd weda bê xweyîkirinê». <sup>34</sup>Çawa Xudan t'emî da Mûsa, Harûn usa ew danî li ber Şe'detîyê\* ku bê xweyîkirinê. <sup>35-36</sup>\* Zar'êd Îsraêl çil salî mana xwarin, h'eta ku gihîştine welatê şên. Mana xwarin h'eta ku gihîştine sînorê welatê Kenanê.

### Av ji qeyayê

**17** T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl, li gora gotina Xudan ji firariya ber'îya Sînê çûn li R'ifîdîmê konêd xwe

\* 16:31 Fe'mîna xebera «mana» bi zimanê îbranî «Ev çi ye?» binihêr'e 16:15.

\* 16:34 Ev Şe'detî be'sa Sindoqêf Şe'detîyê dike ya ku wê paşê bê çêkirinê (binihêr'e Derk'etin 25:10-21). Aha em fe'm dikin ku çi vira nivîsar e wê paşê bê kirinê.

\* 16:35-36 Têk'sta îbranîda ev jî heye «Dehe p'arê omêrê weke êfakê ye». «Omêrek» derdaneke ku nêzîkî kîlogramek ar hildida.

vegirtin, li wir bona cime'tê ava vexwarinê t'une bû. <sup>2</sup>Hingê cime'tê qir'ka Mûsa girt û gotinê: «Avê bide me em vexwin». Mûsa gote wan: «Hûn çima qir'ka min digirin? Çima Xudan dicêr'ibînin?» <sup>3</sup>Cime't wê derê t'î bû, bîna xwe li Mûsa teng kirin û gotinê: «Çima te em ji Misirê derxistin, wekî me, zar'êd me û h'eywanêd me t'îbûna bikujî?» <sup>4</sup>Mûsa gazî Xudan kir û got: «Ez xwe li vê cime'tê çawa bikim? Hindik maye ku min bidine li ber kevira!» <sup>5</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Derbazî pêşîya cime'tê be, ji r'ûspîyêd Îsraêl t'evî xwe hilde û wê şivdara xwe, bi k'îjanê te ç'emê Nîlê xist, bigire destê xwe û her'e. <sup>6</sup>Va ye ezê li wir H'orêbêda ser qeyê, li ber te bisekinim û tu qeyê xe, wê ji wê avê derê cime'tê vexwe». Mûsa li ber ç'e'vê r'ûspîyêd Îsraêl usa kir. <sup>7</sup>Û navê wî cîyî danî Massah û Mêrîbah\*, çimkî zar'êd Îsraêl wir k'etine de'wê, Xudan cêr'ibandin û gotin: «Gelo Xudan nav meda ye yan na?»

### Şer'ê miqabilî Amalêkîf

<sup>8</sup>Amalêkî hatin li nav R'îfîdîmê t'ev Îsraêl şer' kirin. <sup>9</sup>Mûsa gote Yêşû: «Mer'a mêra bibijêre û her'e t'ev Amalêk şer' ke, sibê ezê li serê gir bisekinim û şivdara Xwedê jî destê minda». <sup>10</sup>Yêşû usa kir çawa ku Mûsa got, t'evî Amalêk şer' kir. Mûsa, Harûn û Hûr r'abûne serê gir. <sup>11</sup>Gava Mûsa destê xwe bilind dikir, îsraêlîya li ser dik'etin, lê gava destê xwe ber'dida, amalêkî li ser dik'etin. <sup>12</sup>Lê gava destêd Mûsa westîyan, hingê kevierek hildan danîne bin wî û ew li ser wî r'ûnişt. Harûn û Hûr jî yekî alîkîva yê din jî alîyê dinva destêd wî bilind xwey kirin, h'eta r'o çû ava destêd wî qewîn sekinîn. <sup>13</sup>Yêşû Amalêk cime'têva devê şûrr'a derbaz kir. <sup>14</sup>Hingê Xudan gote Mûsa: «Vê yekê bona bîranînê k'itêbêda binivîse û bigihîne guhê Yêşû ku ezê bîranîna Amalêk, bin p'er'ê e'zmanda lap

\* 17:7 «Massah û Mêrîbah» bi zimanê îbranî tê welger'andinê «Cêr'ibandin û De'w».

bidime hildanê». <sup>15</sup> Mûsa gorîgehek<sup>f</sup> çêkir û navê wê danî: Xudan ala min e. <sup>16</sup> Ê got: «Li ser t'extê Xudan dest bilind bû!» Xudanê t'ev Amalêk qur'ne-qur'ne şer' ke».

### Ît'ro pêşîya Mûsada tê

**18** Xezûrê Mûsa, Ît'royê t'erêqê Midyanê ev h'emû bihîstin, ku Xwedê bona Mûsa û cime'ta xwe Îsraêl çî kir û çawa Xudan Îsraêl ji Misirê derxist. <sup>2</sup> Hingê Ît'royê xezûrê Mûsa, jina Mûsa Sîpporah, pey paşdabirina wêr'a hilda, <sup>3</sup> t'evî her du kur'êd wê, navê yekî Gêrşom\* bû, çimkî ewî gotibû: «Welatê xerîbda firarî me» <sup>4</sup> û navê yê din Êlîyazêr\* bû, çimkî ewî gotibû: «Xwedêyê bavê min alîk'arê min bû û ez ji şûrê Firewin aza kirim». <sup>5</sup> Xezûrê Mûsa Ît'ro t'ev her du kur'êd wî û jina wî hate ber'îyê cem Mûsa, wê dera ku ewî ber ç'îyayê Xwedê zoma xwe lêxistibû. <sup>6</sup> Ewî cab da Mûsa û got: «Ez xezûrê te Ît'ro me, t'ev her du kur'êd te û jina te tême cem te». <sup>7</sup> Mûsa r'abû pêşîya xezûrê xweda çû, ber wî ta bû, ew r'amûsa, h'al-h'ewalê hev pirsîn û k'etine kon. <sup>8</sup> Mûsa ew h'emû xezûrê xwer'a gilîkirin, çî ku Xudan bona Îsraêl anîbûn serê Firewin û misirîya, ku r'êva çiqas cefa dîtibûn û Xudan çawa ew aza kirine. <sup>9</sup> Ît'ro şa bû bona wan kirêd qence ku Xudan Îsraêl'r'a kiribûn, gava ew ji destê misirîya aza kirine. <sup>10</sup> Ê Ît'ro got: «Bimbarek be Xudan ku hûn ji destê misirîya û ji destê Firewin aza kirin, yê ku cime'ta xwe ji bindestîya misirîya aza kir. <sup>11</sup> Niha ez zanim ku Xudan ji h'emû xwedêya mestir e, hema wê yekêda bi k'îjana ewana li ber îsraêlîya pê difir'în». <sup>12</sup> Ê Ît'royê xezûrê

\* 17:16 Eva nîşana sondxwarinê ye, lê aha jî tê welger'andinê «Çimkî destê xwe li ser t'extê Xudan bilind kir» û tê fe'mkirinê ku Amalêk destê xwe miqabilî Xudan r'akir.

\* 18:3 Bi zimanê îbranî dengê navê «Gêrşom» mîna «firarî» tê bihîstin.

\* 18:4 Bi zimanê îbranî «Xwedê min, alîk'ar e».

Mûsa dîyarîya t'evayîşewatê û qurban Xwedê'a anîn. Harûn û h'emû r'ûspîyêd Îsraêl t'ev xezûrê Mûsa hatin ber Xwedê nan bixwin.

### Şîreta Ît'ro

<sup>13</sup>R'ojtira dinê Mûsa r'ûnişt ku h'akimtîyê cime'tê bike, cime't serê sibehê h'eta êvarê cem Mûsa sekinî ma. <sup>14</sup>Gava xezûrê Mûsa ev h'emû dît ku ew çi li cime'tê dike, got: «Ev çi tişte ku tu li cime'tê dikî? Çima tu t'enê r'ûdinêyî û t'emamîya cime'tê serê sibehê h'eta êvarê cem te disekine?» <sup>15</sup>Mûsa gote xezûrê xwe: «Çimkî cime't tê cem min ku ji Xwedê bipirse. <sup>16</sup>Gava li nav wanda tişteq diqewime ew têne cem min û ez li nav her du merivada h'akimtîyê dikim û ez qanûn û hînkinêd Xwedê li ber wan vedikim». <sup>17</sup>Hingê xezûrê Mûsa gote wî: «Kirina te ne tişteqî qenc e, <sup>18</sup>bi vê yekê hin tê bih'elî-bimaşî, hin jî ev cime'ta ku t'evî teye, çimkî ev şixula bona te gelekî giran e, tu t'enê nikarî vê yekê bikî. <sup>19</sup>Niha guh bide gotina min, ezê şîretekê bidime te û Xwedêyê t'evî te be. Bona cime'tê tu her'e li ber Xwedê û pirsêd wan dayne li ber Xwedê. <sup>20</sup>Qanûn û hînkirina wan hîn bike û wê r'îya ku ew gerekê têda her'in ber wan veke, usa jî wan kirêd ku gerekê bikin. <sup>21</sup>Lê tu, ji nava h'emû cime'tê, merivêd jêhatî, Xwedêxof, merivêd amine ku k'ara xwe nager'in bibijêre û ji van, serh'ezara, serseda, serpêncîya û serdeha ser wan k'ifş ke. <sup>22</sup>Bira her gav evana h'akimtîyê li cime'tê bikin, her tiştêd çetin ter'a bêjin, lê yêd sivik, bira xwexa h'akimtîyê bikin, bi vî awayî wê ji ser te sivik be û wî barî t'evî te hildin. <sup>23</sup>Heger tu vê yekê bikî û Xwedê jî usa ter'a bêje, hingê tê bikaribî teyax kî û t'emamîya vê cime'tê jî wê xêr û silamet her'e bigihîje cîyê xwe».

<sup>24</sup>Mûsa gotina xezûrê xwe qebûl kir û ew her tiştê ku wî'r'a got kir. <sup>25</sup>Û Mûsa ji nava t'emamîya îsraêlîya merivêd jêhatî bijartin û ew ser cime'tê serwêr, awa gotî serh'ezar, sersed, serpêncî û serdehe k'ifş kirin. <sup>26</sup>Her gav wana h'akimtîya

cime'tê dikir, tiştêd çetin digîhandine Mûsa, lê yêd sivik xwexa h'akimti dikirin. <sup>27</sup>Mûsa xezûrê xwe ver'êkir û ew çû welatê xwe.

### Îsraêl li ber ç'îyayê Sînayê

**19** Meha sisîyada zar'êd Îsraêl pey derk'etina Misirêr'a, hema wê r'ojê gihîştine ber'îya Sînayê. <sup>2</sup>Ji R'ifîdîmê r'êk'etin çûne ber'îya Sînayê û ber'îyêda konêd xwe vegirtin. Îsraêl li wê derê ber ç'îyê konêd xwe vegirtin. <sup>3</sup>Mûsa hilk'işîya cem Xwedê û Xudan ji ç'îyê gazî wî kir û gotê: «Aha bêje mala Aqûb û zar'êd Îsraêlva bide e'yankirinê: <sup>4</sup>«We dît min çi anî serê misirîya û hûn çawa hildan li ser p'er'êd teyrê sîmir' anîne cem xwe. <sup>5</sup>Û niha heger hûn r'ast gur'a min bikin û peymanaf min xweyî kin, hingê hûnê ji nav h'emû miletada bibine milk'ê min, çimkî t'emamîya dinê ya min e. <sup>6</sup>Hûnê jî min'r'a bibine p'adşatîya k'ahînfa û miletêkî buhurtî». Ev in ew gotin ku tu gerekê zar'êd Îsraêlr'a bêjî».

<sup>7</sup>Mûsa hat gazî r'ûsipîyêd cime'tê kir û h'emû xeberêd ku Xudan t'emî dabû wî ber wan danî. <sup>8</sup>Û t'emamîya cime'tê hevr'a cab da û got: «H'emû gotinêd Xudan emê bikin!» Û Mûsa gotina cime'tê gîhande Xudan. <sup>9</sup>Xudan gote Mûsa: «Va ye ezê nav e'wrekî sixda bême cem te, wekî cime't bibihê ezê çawa t'evî te xeber dim û her gav te bawer bike».

Mûsa gotina cime'tê gîhande Xudan <sup>10</sup>û Xudan gote Mûsa: «Her'e cem cime'tê û wan îro û sibê paqij ke, bira k'incêd xwe bişon. <sup>11</sup>Bona r'oja sisîya hazir bin, çimkî r'oja sisîya li ber ç'e'vê t'emamîya cime'tê, Xudanê peyayî ser ç'îyayê Sînayê be. <sup>12</sup>Her alîyava, bona cime'tê sînor k'ifş ke û bêje: «Miqatî xwe bin, ku r'anebine ç'îyê yan jî p'êşê k'evin. Her kesê ku nêzîkî ç'îyê be, gerekê bimire. <sup>13</sup>Bira dest wî nek'eve, lê wî bidine ber kevira yan jî pê tîrê lêxin, heger h'eywan be yan merî be gerekê sax nemîne», çaxê dengê bor'îya ji stirûyê berên dirêj bê lêdanê, hingê ew dikarin hilk'işîne ç'îyê». <sup>14</sup>Mûsa ji serê ç'îyê peyayî cem cime'tê bû, cime't paqij kir

û wana k'incêd xwe şûştin. <sup>15</sup>Ewî gote cime'tê: «Bona r'oja sisîya hazir bin, nêzîkî k'ulfeta nebin». <sup>16</sup>R'oja sisîya, gava sibeh zelal dibû, bû qir'ç'în û birûskê birq vedida, e'wrekî six li ser ç'îyê bû û dengê bor'îya ji stirû gelekî qayîm hat, r'isasê li t'emamîya cime'ta zomê girt. <sup>17</sup>Mûsa cime't ji zomê derxiste li ber Xwedê û ew binat'ara ç'îyê sekinîn. <sup>18</sup>T'emamîya ç'îyayê Sînayê dû fikir, çimkî Xudan agirda peyayî ser wî bû, dûyê wî mîna dûyê fir'nê hildik'işîya û t'emamîya ç'îyê qayîm dih'ejîya. <sup>19</sup>Dengê bor'îya stirû çiqas diçû qayîm dibû, Mûsa xeber da û Xwedê bi deng caba wî da. <sup>20</sup>Xudan peyayî ser serê ç'îyayê Sînayê bû, Xudan gazî Mûsa li ser serê ç'îyê kir û Mûsa hilk'işîya. <sup>21</sup>Xudan gote Mûsa: «Peya be û t'emîyê bide cime'tê, ku nebe bona dîtina Xudan ji sînor derbaz bin û gelek ji wan unda bin. <sup>22</sup>K'ahînêd ku wê nêzîkî Xudan bin, gere ew jî xwe paqij kin, ku Xudan qir'a wan neyne». <sup>23</sup>Mûsa gote Xudan: «Cime't nikare r'abe ser ç'îyayê Sînayê, çimkî te t'emî da me û got: «Sînor dayne dor ç'îyê û wî pîroz ke». <sup>24</sup>Xudan gote wî: «Her'e peya be û t'evî Harûn hilk'işe, lê k'ahîn û cime't ji sînor derbaz nebin ku hilk'işine cem Xudan û ew qir'a wan bîne». <sup>25</sup>Mûsa peyayî cem cime'tê bû û ev yek wan'r'a got.

### Her dehe t'emîyêd Xwedê

**20** Xwedê ev h'emû xeber gotin: <sup>2</sup>«Ez Xudan<sup>f</sup> Xwedêyê te me, yê ku tu ji welatê Misirê, ji mala xulamtîyê derxistî. <sup>3</sup>Pêştirî min xwedêyêd teye mayîn t'une bin.

<sup>4</sup>T'u p'ûtî mîna dilqê tiştekiîda xwer'a çênekî, ne jor li e'zmên, ne jêr li ser e'rdê, ne jî nava avêd bin e'rdêda. <sup>5</sup>Ber t'u p'ûtî ta nebî û xulamtîya wan nekî, çimkî ez Xudan Xwedêyê te Xwedêkî k'umr'eş im, ku bona neheqîyêd bava tînime serê zar'a, h'eta nisilê sisîya û çara ku dijenine min, <sup>6</sup>lê ewêd ku min h'iz dikin û t'emîyêd min xwey dikin, ezê h'eta h'ezar nisilê hindava wanda h'uba xweye amin bidime k'ifşê.

<sup>7</sup>Navê Xudan Xwedêyê xwe badîhewa nedî ser zarê xwe, çimkî Xudan wê yê ku navê wî badîhewa dide ser zarê xwe, bê ceza nahêle.

<sup>8</sup>R'ojaf şemîyê bîne bîra xwe, wekî wê pîroz xwey kî. <sup>9</sup>Şeş r'oja bixebite û h'emû şixulêd xwe bike, <sup>10</sup>lê r'oja h'efta, şemîya r'ih'etîya bona Xudan Xwedêyê te ye, t'u şixulî nekî, ne tu, ne kur'ê te, ne qîza te, ne xulamê te, ne carîya te, ne h'eywanê te, ne jî xerîbê nava teda. <sup>11</sup>Çimkî Xudan şeş r'ojada e'rd û e'zman, be'r û h'emûyêd nav wanda çêkirin û r'oja h'efta r'ih'et bû, lema Xudan dua r'oja şemîyê kir û ew pîroz kir.

<sup>12</sup>Qedirê dê û bavê xwe bigirî, wekî e'mirê te li ser e'rdê ku Xudan Xwedêyê teyê bide te dirêj be.

<sup>13</sup>Nekujî.

<sup>14</sup>Zinîyê nekî.

<sup>15</sup>Nedizî.

<sup>16</sup>Miqabilî t'u kesî şe'detîya derew nedî.

<sup>17</sup>Dilhavijîya mala t'u kesî nekî. Ne dilhavijîya k'ulfeta t'u kesî, ne xulamê wî, ne carîya wî, ne gayê wî, ne k'era wî, usa jî t'u tiştê t'u kesî».

### Tirsa cime'tê

<sup>18</sup>T'emamîya cime'tê qir'ç'în û dengê bor'îya stirûyê bihîstin, birq vedana birûskê û dûyê ji ç'îyê derdik'et dîtin, r'isasê cime't girt û dûr sekinîn. <sup>19</sup>Hingê gotine Mûsa: «Tu t'evî me xeber de û emê guhdarîya te bikin, lê bira Xwedê t'evî me xeber nede, ku em nemirin». <sup>20</sup>Mûsa gote cime'tê: «Netirsîn, çimkî Xwedê hatîye we bicêr'ibîne, wekî xofa wî ser we be ku hûn guna nekin». <sup>21</sup>Cime't dûr sekinî, lê Mûsa çû nêzîkî wê te'rîya şever'eş bû, wê dera ku Xwedê lê bû.

### Gotinêd bona çêkirina gorîgehê

<sup>22</sup>Xudan gote Mûsa: «Aha bêje zar'êd Îsraêl: «We xwexa dît ku min ji e'zmên t'evî we xeberda. <sup>23</sup>Ser min'r'a xwedêyêd zîvîn çenekin, ne jî xwedêyêd zêr'în çekin bona xwe. <sup>24</sup>Ji

axê gorîgehekê minr'a çêke. Ser wê dîyarîyêd<sup>f</sup> xweye t'evayîşewatê û yêd heleqetîyê, pez û dewarêd xwe bide. Her cîyê ku ez navê xwe bidime bîranînê, ezê bême cem te û dua te bikim. <sup>25</sup>Heger tu minr'a pê kevira gorîgehê çêkî, ji kevirêd t'er'işandî çênekî, çimkî gava tu hacet kevira xî, tê wan biher'imînî. <sup>26</sup>Û pê p'êpelînga hilnek'işî ser gorîgeha min, wekî te'zîbûna te ser wê venebe».

### Qanûnêd bona xulama

**21** Ev in ew qanûnêd ku tu gerekê dayînî li ber zar'êd Îsraêl: <sup>2</sup>Gava tu xulamekî îbranî bik'ir'î, bira ew şeş sala ter'a xulamtiyê bike, lê sala h'efta bira bê heq derê azayê. <sup>3</sup>Heger ew t'enê hatibe, bira ew t'enê jî derê, lê heger ew zewicîbe, bira jin jî pêr'a derê. <sup>4</sup>Heger axayê wî ew zewicandibe û jinê kur' û qîz wîr'a anîbin, hingê bira jin û zar' axêr'a bimînin û ew t'enê derê. <sup>5</sup>Lê heger xulam aşkere bêje: «Ez axayê xwe, jin û zar'êd xwe h'iz dikim, naxwazim derême azayê» <sup>6</sup>hingê axayê wî, bira wî bibe cem h'akima\* û wî nêzîkî dêrî, yan rexderî ke, axayê wî bi dirêşê guhê wî qul ke û h'eta ew xweş be bira xulamê wî be.

### Qanûnêd bona carîya

<sup>7</sup>Gava yek qîza xwe çawa carî bifiroşe\*, gerekê ew usa derneyê çawa xulam dertê. <sup>8</sup>Heger ew axayê xwe xweş neyê ku wê xwer'a bixwaze, bira îzinê bide pismamê wêyî nêzîk ku wê bik'ir'in, lê îzina wî t'une ku wê bifiroşe malbeteke din, çimkî ewî ew xapandîye. <sup>9</sup>Heger wê kur'ê xwer'a bixwaze, gerekê ew weke dereca qîza xwe bona wê bike. <sup>10</sup>Heger axayê wê hêwîkê bîne ser wê, gerekê xwarina

\* 21:6 Bi zimanê îbranî aha jî tê fe'mkirinê: «Xwedê» aha jî tê fe'mkirinê: «Cîyê h'ebandina Xwedê».

\* 21:7 Wê hingê cihûyêd k'esîb qîzêd xwe difirotin çawa carî û k'ê ku ew bik'ir'îya soz dida ku wê bistîne.

wê, k'inca wê û t'ev r'azana wê ser nebir'e. <sup>11</sup>Heger ew van her sê tişta bona wê neyne sêrî, hingê ewa bira bê heq, bê k'ir'în her'e.

### **Qanûnêd li ber xirabîyêva**

<sup>12</sup>Yê ku mêriv bikuje, ew e'se gerekê bê kuştinê. <sup>13</sup>Lê heger ewî bi h'emdê xwe nekir, lê Xwedê ew da destê wî, ezê bona te cîkî k'ifş kim ku ew bir'eve wir. <sup>14</sup>Lê heger yek bi h'emdê xwe ji mixenetîyê yekî xe bikuje, ewî h'eta ji gorîgeha min hildî, ku bê kuştinê.

<sup>15</sup>Yê ku dê û bavê xwe xe, e'se gerekê bê kuştinê.

<sup>16</sup>Yê ku merîya bidize, heger ew firotî be yan cem wî be, e'se gerekê bê kuştinê.

<sup>17</sup>Yê ku dê û bavê xwe bêhurmet ke, e'se gerekê bê kuştinê.

### **Qanûna birîndarkirinê**

<sup>18</sup>Gava meriv hevr'a şer' kin û yek bi kevir yan k'ulmê yekî xe û ew nemire, lê ew bik'eve cî-nivînê, <sup>19</sup>paşê heger r'abe bi dar biger'e, yê lêxistî bêceza be, t'enê gerekê wê zirara bêxebatîya wî bik'işîne û wî bide qenckirinê.

<sup>20</sup>Heger yek bi şivdarê xulam yan carîya xwe xe û ew bin destê wîda bimire, e'se gerekê bê cezakinê. <sup>21</sup>Lê heger ew r'ojekê yan duda bijî, hingê bira wî ceza nekin, çimkî ew heqê wî ye.

<sup>22</sup>Gava meriv hevr'a şer' kin û derb jina duh'alî k'eve, zar'a wê we'de zûtir bibe û zirareke mayîn t'unebe, hingê bira mêrê wê çiqas ku ji wan bixwaze, bi qirara h'akimtîyê bê dayînê. <sup>23</sup>Lê heger zirarek bibe, hingê gerekê e'mir ji ber e'mirva be, <sup>24</sup>ç'e'v ji ber ç'e'vva, diran ji ber diranva, dest ji ber destva, nig ji ber nigva, <sup>25</sup>şewat ji ber şewatêva, birîn ji ber birînêva, derb ji ber derbêva be.

<sup>26</sup>Heger yek ç'e'vê xulamê xwe yan ç'e'vê carîya xwe xe kor ke, bira bona ç'e'vê wî, wî aza ke. <sup>27</sup>Û heger diranê xulamê xwe yan carîya xwe xe biwarîne, bira bona diranê wî, wî aza ke.

### Cabdarîya xweyê h'eywên

<sup>28</sup>Heger gayê merivekî mêrekî yan jinekê xe û ew bimire, gerekê e'se wî gayî bidine ber kevira û goştê wî neyê xwarinê, lê xweyê wî gayî bêceza be. <sup>29</sup>Lê heger bona lêxistina wî gayî zûva xweyê wî'r'a hatîye gotinê û xweyê wî xem ne kirîye, hingê ew ga mêr yan jinekê xe bikuje, bira wî gayî bidine ber kevira û xweyê wî jî bê kuştinê. <sup>30</sup>Heger bervadayîn bê qirarkirinê, hingê bira ji ber e'mirê xweva heq bidê, çiqas ku jê tê xwestinê. <sup>31</sup>Heger ga kur'ekî yan qîzekê xe xût pê vê qanûnê jî lê bê nihêr'andin. <sup>32</sup>Heger ga xulam yan carîyekê xe, hingê xweyê ga gerekê sî şêkil\* zîv bide xweyê wan û ga jî bidine ber kevira.

<sup>33</sup>Heger yek ser ç'e'lê veke yan ç'e'lekê bik'ole û ser negire, ga yan k'erek bik'evê, <sup>34</sup>hingê bira xweyê ç'e'lê cirmê bik'işîne, p'era bide xweyî û cendek jî xwer'a hilde.

<sup>35</sup>Gava gayê yekî, gayê yekî din xe û bikuje, bira gayê sax bifiroşin û p'erê wî p'arevekin, usa jî cendekê kuştî p'arevekin. <sup>36</sup>Lê heger bona lêxistina wî gayî zûva xweyê wî'r'a hatîye gotinê û wî xem nekirîye, bira li ber wî gayîva, gaki bidê û gayê kuştî jî wî'r'a bimîne.

### Qanûnêd li ser milk'

**22** Heger yek ga yan pezekê bidize, serjêke yan bifiroşe, bira ji ber gayekîva pênc ga û ji ber pezekêva jî çar peza bide.

<sup>2</sup>Heger diz ser dizîyê bê girtinê û lêxin bikujin, hingê bona wî xûn neyê r'êtinê. <sup>3</sup>Lê heger te'vê daye ser wî, bira xûna wî serê wî be.

Ji ber dizîyêva gerekê bê dayînê, lê heger tişteki wî t'une, hingê bira wî bifiroşin ji ber dizîya wîva. <sup>4</sup>Lê heger dizîya

\* 21:32 «Şêkil» ew p'erê îbranîya bû.

wî destê wîda sax bê girtinê, heger ga be, k'er be yan pez, gerekê dubare bide.

<sup>5</sup>Heger yek h'eywanêd xwe e'rdekî yan r'ezê tirîyada biç'êrîne paşê h'eywanêd wî bik'eve e'rdê xelqê, hingê bira ji deremeta e'rdê û r'ezê tirîyê xweyî here qenc ji berva bide.

<sup>6</sup>Heger agir stirîya k'eve û bavêje gur'zêd lodkirî yan zevîya neditûyî yan deştê bişewitîne, bira yê agir avîtîyê cirmê bik'işîne.

<sup>7</sup>Heger yek p'era yan tiştêkî qîmet bide yekî din ku xweyî ke û ji mala wî bê dizînê, heger diz bê girtinê bira dubare bide. <sup>8</sup>Heger diz neyê girtinê, bira xweyê malê bibine ber h'akima\*, gelo r'ast destê wî hebûka wî merivî ne k'etîye. <sup>9</sup>Bona her neheqîyê, bona ga, yan k'erê, yan pêz, yan k'inca û bona her tiştêd undabûyî, heger yek bêje: «Ew ya min e», şixulê her duya jî her'e ber h'akima\*, h'akim\* k'ê ku neheq bibîne, bira ew dubare bide wî merivî.

<sup>10</sup>Heger yek k'erê yan ga, yan pez, yan jî h'eywaneke din bide yekî din ku xweyî ke û ew h'işk be, yan zirarek lê bibe, yan bê dizînê û kesekî neditibe, <sup>11</sup>hingê bira li ber Xudan sond bixwe, ku destê wî hebûka wî merivî nek'etîye û xweyê hebûkê gerekê bawer bike û yêd din cirmê nede. <sup>12</sup>Lê heger ji cem wî hatîye dizînê, hingê bira heqê wê bide xweyê wî. <sup>13</sup>Lê heger hatîye dir'andinê bira beretê bîne û ji ber wêva nede.

<sup>14</sup>Heger yek ji yekî din h'eywên deynî hilde û zirarek lê bibe yan h'işk be, xweyê wê ne wir be, gerekê ew e'se cirmê bide. <sup>15</sup>Heger xweyê wî li wir bûye, hingê ew cirmê nade heger ew bi k'irê hildabû ewê bik'eve nava heqê k'irê.

### **Qanûnêd me'rîfet û e'rf-e'deta**

<sup>16</sup>Heger yek qîza bik'ir bixapîne û wê r'ûr'eş ke, gerekê e'se qelenê wê bidê û wê jî bistîne. <sup>17</sup>Heger bavê wê qet ne-xwaze qîza xwe bide wî, ew gerekê weke qelenê qîza bide.

---

\* 22:8 Bi zimanê îbranî aha jî tê fe'mkirinê: «Xwedê» aha jî tê fe'mkirinê: «Cîyê h'ebandina Xwedê».

\* 22:9 Bi zimanê îbranî aha tê fe'mkirinê: «Xwedê».

<sup>18</sup>K'oç'ekê sax nehêle.

<sup>19</sup>K'ê serê xwe h'eywên'r'a dayne, gerekê e'se bê kuştin.

<sup>20</sup>Pêştirî Xudan k'ê xwedêyêd mayînr'a qurbanê bide ew bê undakirinê.

<sup>21</sup>Xerîba neêşîne û wan nede cefê, çimkî hûn jî welatê Misirêda xerîbîyêda bûne. <sup>22</sup>Sêwî û jinebîyê t'u car nede cefê. <sup>23</sup>Heger wan bidî cefê û ew gazine xwe li min bikin, ezê zarîniya wan e'se bibihêm <sup>24</sup>û hêrsa xwe r'akim, bi şûr we bikujim, jinêd weyê bî bimînin û zar'êd we jî sêwî.

<sup>25</sup>Heger p'era deynî bidî k'esîbekî ji cime'ta mine cem xwe, mîna selefda wî nexeniqînî û selefda nedî li ser wî.

<sup>26</sup>Heger tu k'inca yekî din bihê hildî, h'eta r'oçûyîna ava lê vege'îni, <sup>27</sup>çimkî t'enê ew e sit'ara wî û k'inca canê wî, ewê çida r'azê? Nebe ku ew hewara xwe li min dayne û ez bibihêm, çimkî ez r'e'm im.

<sup>28</sup>H'akima\* bêhurmet neke û nifir'a serwêrê cime'ta xwe neke. <sup>29</sup>H'edîya bêderê û deremeta xweye h'incir'andinê derengî neyêxî.

Nixurîyê kur'êd xwe bide min. <sup>30</sup>Usa jî bona ga û pezê xwe bike. H'eft r'oja bira ber makê be û r'oja h'eyştâ wê bide min. <sup>31</sup>Hûnê bona min merivêd pîroz bin, goştê çolêyî ku hatîye dir'andinê nexwin, bavêjine ber sa.

### Qanûnêd heqîyê

**23** Deng-be'sêd derew bela neke. Bi şe'detîya derew alîyê neheqa neke. <sup>2</sup>Bona xirabîyê destê p'ir'anîyêva neçe. <sup>3</sup>Û dîwanêda piştâ p'ir'anîyê negire, heqîyê net'er'ibîne. <sup>4</sup>Dîwanêda piştâ yê k'esîb negire.

<sup>4</sup>Heger tu ga yan k'erê dijminê xweye undabûyî bibînî, e'se wan paşda bibe.

\* 22:28 Bi zimanê îbranî aha tê fe'mkirinê: «Xwedê».

<sup>5</sup>Heger tu bibînî ku k'erê xêrnexwazê te bin barê xweda k'etîye, pišta xwe nedê neçe, t'evî wî dest bavêjê r'ake.

<sup>6</sup>Dîwanêda heqîya k'esîbê xwe net'er'ibîne. <sup>7</sup>Ji derewîyê dûr be û yê bêsiûc û r'ast nekuje, çimkî ez yê neheq bêceza nahêlim. <sup>8</sup>Ne jî r'uşetê hilde, çimkî r'uşet ç'e'vê merivêd vekirî kor dike û xeberêd r'asta dever'û dike.

<sup>9</sup>Tengasîyê nede xerîba, hûn haş ji dilê xerîba hene. Çimkî hûn xwexa jî welatê Misirêda xerîbîyêda bûne.

### **Qanûnêd salaf h'efta û r'oja h'efta**

<sup>10</sup>Şeş sala e'rdê xwe bir'eşînî û deremeta wê t'op kî, <sup>11</sup>lê sala h'efta r'ih'et bihêlî û dest nedêyî, wekî k'esîbêd li nav cime'ta teda bixwin û çî ku bimîne jî h'eywanêd çolê bira bixwin. R'ezê tirîyê xwe û darêd zeyt'ûnê jî usa bikî.

<sup>12</sup>Şeş r'oja xebata xwe bikî û r'oja h'efta r'ih'et bî, wekî ga û k'erê te r'ih'et bin û kur'ê carîya te û xerîb bîna xwe bistînin. <sup>13</sup>Ev h'emûyêd ku min wer'a gotin xwey kin, navê xwedêyêd mayîn bîr neynin, bira ji devê we neyê bihîstinê.

### **Qanûnêd her sê cejinêd mezin**

<sup>14</sup>Salê sê cara minr'a cejinê bikî. <sup>15</sup>Cejinaf Nanê Şkeva xwey kî. Çawa ku min t'emî daye te û wî we'dê meha Abîbêdaye\* k'ifşkirî, h'eft r'oja nanê bê hevîrtir'şk bixwî, çimkî wê mehêda tu ji Misirê derk'etî.

Bira kesek destvala dernek'eve ber min.

<sup>16</sup>Cejinaf Nandîrûna berê pêşin bi k'eda xweye e'rdêda çandî xwey kî.

Usa jî Cejina Bert'opkirinêye xilazîya salê, gava ji e'rdê k'eda xwe t'op kî, xwey kî.

<sup>17</sup>Salê sê cara h'emû qisimê teye nêrîn bira li ber Xudan Xwedê bisekinin.

---

\* 23:15 Binihêr'e şirovekirina Derk'etin 13:4-da.

<sup>18</sup>Xûna qurbana min t'ev nanê hevîrtir'şk nedî û bezê cejina min bira h'eta sibehê nemîne, bişewitîne.

<sup>19</sup>Berêdf deremeta pêşine e'rdê xweda ye here qenc bînî mala Xudan Xwedêyê xwe.

Karê li nav şîrê makêda nek'elînî.

### Sozdayîn û hînkirin

<sup>20</sup>Va ye ezê milyak'etekîf pêşîya teva bişînim, wekî r'êda xweyîtîyê li te bike û te bibe wî cîyê ku min hazir kirîye. <sup>21</sup>Li ber wî haş ji xwe hebe û guh bide gotina wî, li ber wî serh'işkîyê nekî, ewê neheqîyêd we nebaxşîne, çimkî ew bi navê min dike. <sup>22</sup>Lê heger tu r'astî guhdarîya dengê wî bikî û h'emû gotinêd min biqedînî, hingê ezê bibime dijminê dijminêd te û miqabilê miqabilêd te. <sup>23</sup>Çimkî milyak'etê minê pêşîya teva her'e û wê te bibe cem emorîya, h'îtîya, pirîzzîya, kenanîya, h'îwîya û yebûsîya û ezê qir'a wan bînim. <sup>24</sup>Tu xwedêyêd wan neh'ebîne û xulamtîya wan neke, ç'e'v nede kirê wan lê wan k'av-k'ûn ke û h'eykelêd wan hûrdexweşî ke. <sup>25</sup>Hûn xulamtîya Xudan Xwedêyê xwe bikin, ewê dua nanê te û ava te bike û nexweşîyê ji nav te derxe. <sup>26</sup>Welatê teda jina bêber, yan ya li ber her'e wê t'une bin, ezê r'ojêd e'mirê te t'emam kim. <sup>27</sup>Ezê sawa xwe pêşîya teva bişînim û wan h'emû milletêd ku tê navr'a derbaz bî t'evîhev kim û h'emû dijminêd teyê ji ber te bir'evin. <sup>28</sup>Ezê tirs û xofê\* pêşîya teva bişînim û ewê ji ber te h'îwîya, kenanîya, h'îtîya r'aqetîne. <sup>29</sup>Nava salekêda ezê wana ji ber te r'aneqetînim, ku nebe e'rd vala bimîne û terewilêd çolê ser te zêdebin. <sup>30</sup>Ezê hêdî-hêdî ji ber te wan r'aqetînim, h'eta ku tu li hev zêde bî û wî e'rdî war bî. <sup>31</sup>Hingê ezê sînorê te ji Be'ra Sorda girtî h'eta Be'ra Navberê\* û ji ber'îyêda girtî h'eta ç'emê Firatê daynim, çimkî ezê binelîyêd wî welatî bidime destê we û tê ji ber xwe wan r'aqetînî. <sup>32</sup>T'evî

\* 23:28 Welger'andina yûnanîye kevinda «moza».

\* 23:31 Têk'sta îbranîda nivîsar e «Be'ra Filistînîyaf», ew be'sa Be'ra Navberê awa gotî Be'ra Sipî.

wan û t'evî xwedêyêd wan peymanê girênedê. <sup>33</sup>Ew welatê teda gerekê nejîn ku hindava minda we nedine gunekirinê, çimkî heger tu xulamtîya xwedêyêd wan bikî, ewê e'se ter'a bibe t'ele».

### Îsraêl peymanê distîne

**24** Xwedê gote Mûsa: «Hilk'işe berbi Xudan, tu, Harûn, Nadab, Abîhû, û h'eftê r'ûspîyêd Îsraêl û dûrva bih'ebînin. <sup>2</sup>T'enê bira Mûsa nêzîkî Xudan be, lê ewana bira nêzîk nebin, ne jî bira cime't t'evî wî hilk'işe».

<sup>3</sup>Mûsa veger'îya hat, h'emû xeber û h'emû qanûnêd Xudan gotine cime'tê. T'emamîya cime'tê bi hev'r'a cab da û got: «H'emû xeberêd ku Xudan gotîye, emê bikin!» <sup>4</sup>Mûsa h'emû xeberêd Xudan nivîsîn. Serê sibehê zû r'abû binat'ara ç'îyê gorîgeh çêkir, weke h'esabê donzdeh qebîlêd Îsraêl donzdeh h'eykel dane sekinandinê. <sup>5</sup>Û wî ji xortêd zar'êd Îsraêl şandin, wana Xudanr'a dîyarîyêd t'evayîşewatê kirin û bona dîyarîyêd<sup>f</sup> heleqetîyê canega qurban dan. <sup>6</sup>Mûsa nivê xûnê hilda kire t'eşta û nivê diñ jî r'eşande ser gorîgehê. <sup>7</sup>Û k'itêba peymanê\* hilda ber cime'tê xwend, wana got: «H'emû çi ku Xudan got emê bikin û gur'a wîda bin». <sup>8</sup>Hingê Mûsa xûn hilda r'eşande ser cime'tê û got: «Va ye xûna wê peymanê, ya ku Xudan anegorî van h'emû xebera t'evî we girêda».

<sup>9</sup>Pey van yekar'a Mûsa, Harûn, Nadab, Abîhû û h'eftê r'ûspîyêd Îsraêl hilk'işîyane jorê, <sup>10</sup>hingê wana Xwedêyê Îsraêl dît, bin nigêd wîda tişteki mîna k'elpîç'ê safîr bû û mîna e'zmên zelal bû. <sup>11</sup>Û ewî destê xwe li ser zar'êd îsraêlîyaye bijartî bilind nekir. Wana Xwedê dît, xwarin û vexwarin.

### Mûsa li serê ç'îyayê Sînayê

<sup>12</sup>Û Xudan gote Mûsa: «Hilk'işe ser ç'îyê cem min wê derê bisekine û ezê selêd kevirî t'ev qanûn û t'emîyêd ku min bona

\* 24:7 Eva p'ara pêşine ji qanûna Mûsa ku hatîye nivîsarê. Binihêr'e Derk'etin 24:4.

hînkirina wan nivîsîn bidime te». <sup>13</sup>Mûsa û berdestîyê wî Yêşû r'abûn, Mûsa ku wê hilkişîya ser ç'îyayê Xwedê, <sup>14</sup>hingê gote r'ûspîya: «Hûn vir hîvîya me bimînin, h'eta ku em vege'rine cem we. Va Harûn û Hûr cem we ne, pîrsa k'ê hebe bira her'e cem wan».

<sup>15</sup>Mûsa hilkişîya ser ç'îyê û e'wr ç'îya nixamt. <sup>16</sup>R'ûmeta Xudan peyayî ser ç'îyayê Sînayê bû û e'wr şeş r'oja ç'îya nixamt, Xudan r'oja h'efta ji nav e'wrda gazî Mûsa kir. <sup>17</sup>R'ûmeta Xudan li ber ç'e'vê zar'êd Îsraêl mîna agirê p'er'itandinê bû li ser serê ç'îyê. <sup>18</sup>Mûsa k'ete li nava e'wr û hilkişîya ç'îyê. Mûsa çil r'oj û çil şevî serê ç'îyê ma.

### H'edîyêd bona Konêf Şe'detîyê

**25** Xudan t'evî Mûsa xeberda û gotê: <sup>2</sup>«Bêje zar'êd Îsraêl ku h'edîyê minr'a bînin, h'edîya min ji destê her merivî hildin, yêd ku bi r'ezedilîyê tînin. <sup>3</sup>Û ev in ew h'edîyêd ku hûnê ji wan hildin: Zêr', zîv û sifir, <sup>4</sup>r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez, k'itanê zirav û pir'ç'a bizinê, <sup>5</sup>ç'ermêd\* beranaye sor r'engkirî, ç'ermêd ga-me'sîya\*\*, darêd darcêwîyêf, <sup>6</sup>bizirê bona r'onayê, biharetêdf bona r'ûnê r'ûnkirinê û bona bixûraf bînxweş, <sup>7</sup>kevirêd onîksf û kevirêd qîmete bona qaşkirina êfodf û r'extsîng\*. <sup>8</sup>Bira minr'a pîrozgehekê çêkin, ku ez nava wanda bimînim. <sup>9</sup>Çawa min t'erzê Konêf Şe'detîyê û h'emû nav mala wêva nîşanî te kir, xût usa gerekê çêkin.

### Sindoqaf Peymanê

<sup>10</sup>Ji dara darcêwîyê sindoqekê çêkin, dirêjayîya wê du zend û nîv, berayîya wê zend û nîv, zend û nîv jî bilindayîya wê be. <sup>11</sup>Der û hindurê wê bi zêrê xalis zêr' kî û dora lêva wê

\* 25:5 Hirîya ser p'ostê berana dibir'în, paqij dikirin û r'eng-r'engî dikirin bona derecêd xwe didane xebatê.

\*\* 25:5 Ga-me'sî cûr'ekî ji nava h'eywanêd be'rê ye.

\* 25:7 «R'extsîng» qedekekî çargoşe bû ku serekk'ahîna<sup>f</sup> didane ser sîngê xwe girêdidan. Binihêr'e 28:15-29.

t'oqekî zêr'în bavêjêyî. <sup>12</sup> Bona wê çar xelaqêd zêr'în r'okî û her çar nigava kî, wekî du xelaq alîkîva bin, du xelaq jî alîyê dinva. <sup>13</sup> Ji dara darcêwîyê destûya çêkî û wan zêr' kî. <sup>14</sup> Destûya xelaqêd k'êlekêd sindoqêr'a derbaz kî, ku bi wan sindoq bê hildanê. <sup>15</sup> Bira destû xelaqêd sindoqêda bimînin, neyêne derxistinê. <sup>16</sup> Û wê Şe'detîya ku ezê bidime te daynî hindur'ê sindoqê.

### Qalp'axê sindoqê, cîyê baxşandinê

<sup>17</sup> Qalp'axê baxşandinê ji zêr'ê xalis çêkî, dirêjayîya wê du zend û nîv be, berayîya wê jî zend û nîv. <sup>18</sup> Û ser her du serîyêd qalp'axê baxşandinê pê zêr' du xêrûbêf k'olandî çêkî. <sup>19</sup> Xêrûbekî serîkîva derxî, xêrûbekî jî serê dinva, xêrûba ji qalp'axê baxşandinê ser her du serîyava derxî. <sup>20</sup> Bira p'er'êd xêrûba berbi jor vekirî bin û bi p'er'êd xwe qalp'axê baxşandinê binixêmin. Berê wan hevduda be û dîna wan li qalp'axê baxşandinê be. <sup>21</sup> Qalp'axê baxşandinê jorda bidî ser sindoqê û Şe'detîya ku ezê bidime te daynî hindur'ê sindoqê. <sup>22</sup> Ezê wira r'astî te bêm t'evî te xeber dim, ji ser qalp'axê baxşandinê nava her du xêrûbêd ku ser Sindoqa Şe'detîyê ne, h'emû t'emîyêd bona zar'êd Îsraêl bidime te.

### T'extê nanêf Xwedêr'a dayî

<sup>23</sup> Ji dara darcêwîyê t'extekî çêkî, dirêjayîya wî du zend, berayîya wî zendek û bilindayîya wî zend û nîv be. <sup>24</sup> Wî bi zêr'ê xalis zêr' kî û dora wî t'oqekî zêr'în bavêjêyî. <sup>25</sup> Û dora wî bilindayîya çar t'ilîya kevîyê çêkî, dora kevîya wî jî t'oqekî zêr'în bavêjêyî. <sup>26</sup> Bona wî çar xelaqêd zêr'în çêkî û wan xelaqa ber her çar nîga ser her çar e'nîşkava kî. <sup>27</sup> Gerekê xelaq kevîyava bin, wekî cîyêd destûya hebin ku t'ext bê hildanê. <sup>28</sup> Destûya ji dara darcêwîyê çêkî, wan zêr' kî, bi wan gere t'ext bê hildanê. <sup>29</sup> Bona t'ext sinî û t'asa, cêr' û k'asa ji zêr'ê xalis çêkî, wekî bi wan dîyarîya<sup>f</sup> serdakirinê bê dayînê. <sup>30</sup> Û t'imê li ser t'ext nanêf Xwedêr'a dayî li ber min daynî.

### Şemdan

<sup>31</sup> Ji p'arç'ekî zêr'ê xalis şemdanêke bi k'olandinê bê çêkirin, bingeha wê, stûna wê, t'asik, gul û sêvikêd wê h'emû ji wê derk'evin. <sup>32</sup> K'êleka wêva şeş ç'iql derên, sê ç'iql alîkî şemdanêva bin û sê ç'iql jî alîyê şemdanêyî dinva bin. <sup>33</sup> Sê t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava li ser ç'iqilekî bin. Sê t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava jî ser ç'iqila din bin, her şeş ç'iqlêd ku ji şemdanê dertên aha bin. <sup>34</sup> Çar t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava stûna şemdanêva bin. <sup>35</sup> Sêvikek bin her du ç'iqlêd şemdanêye jêrinva, sêvikek bin her du ç'iqlêd navberêva, sêvikek jî bin her du ç'iqlêd jorinva be. Bona her şeş ç'iqlêd stûna şemdanê jî aha bin. <sup>36</sup> Sêvik û ç'iqlêd wê gerekê ji wê derên. H'emû ji p'arç'ekî zêr'ê xalis bi k'olandinê bê çêkirin. <sup>37</sup> H'eft ç'ira bona wê çêkî û usa daynî ku ew pêşîya xwe r'onayî kin. <sup>38</sup> Bira destik û sinîyêd wê ji zêr'ê xalis bin. <sup>39</sup> Şemdan h'emû hacetêd wêva ji telantek\* zêr'ê xalis bê çêkirinê. <sup>40</sup> Dîna xwe bidê min çi t'erz serê ç'îyê nîşanî te kir, usa jî çêkî.

### Konê Şe'detîyê

**26** Konê Şe'detîyê ji dehe tejêd k'itanê zirav-badayî û r'îsê şîn, şîrk û sorê gevez çêkî, ser wan jî bi xebata nitirandinê xêrûba derxî. <sup>2</sup> Dirêjayîya her tejî bîst û h'eyst zend be û berayîya her tejî çar zend be, çapa h'emû teja weke hev be. <sup>3</sup> Pênc tej hevva bin û pênc jî hevva. <sup>4</sup> Ji r'îsê şîn p'evgirêka bavêjî li kevîya kerê tejêd pêşin li ser lêva hevva bûnê, usa jî bavêjî lêva kevîya kerê tejêd mayînî hevva bûnê. <sup>5</sup> Pêncî p'evgirêkî bavêjî ser p'arç'ê her pênc tejê e'wlin, pêncî p'evgirêkî jî bavêjî ser lêva p'arç'ê her pênc

\* 25:39 «Telantek» qasî 34 kîlogram bû.

tejê duda, wekî h'emû p'evgirêk hevr'a xeber din. <sup>6</sup>Pêncî qemitokêd zêr'în çêkî û her du p'arç'êd pênc tejî pê wan qemitoka hevva kî, wekî Konê Şe'detîyê bibe yek.

### Sergirtina Konê Şe'detîyê

<sup>7</sup>Bona sergirtina Konê Şe'detîyê ji pir'ç'a bizinê yanzdeh teja çêkî. <sup>8</sup>Dirêjayîya her tejî sî zend be û berayîya her tejî çar zend be, usa ku çapa her yanzdeh teja jî weke hev be. <sup>9</sup>Pênc teja başqe hevva kî û şeş teja jî başqe. Tejê şeşa jî ne'tika konva ser piştêva qatkî. <sup>10</sup>Pêncî p'evgirêka bavêjî li kevîya kerê p'arç'ê pênctejêyî pêşine li ser lêva hevvabûnê, pêncî p'evgirêka jî bavêjî li kevîya kerê p'arç'ê şeştejêyî mayînî li ser lêva hevvabûnê. <sup>11</sup>Pêncî qemitokêd sifirîn çêkî û qemitoka bavêjî p'evgirêka, p'er'da hevva kî ku bibe konek. <sup>12</sup>Bermayîyê tejê ser kon, awa gotî nîvê teja zêdebûyî pišta konva dardakirî be. <sup>13</sup>Ji serk'êşa ser kone zêdemayî, zendek vî alîyîva zendek jî alîyê dinva her du k'êlekava dardakirî be, ku her du k'êlekêd Konê Şe'detîyê bêne nixamtinê. <sup>14</sup>Ji ç'ermêd beranaye sor r'engkirî sergirekê çêkî bona sergirtina kon, ji ç'ermêd ga-me'sîya jî serk'êşekê çêkî, bona k'işandina li ser wê.

<sup>15</sup>Bona Konê Şe'detîyê ji dara darcêwîyê çîtêd sekinandî çêkî. <sup>16</sup>Dirêjayîya her çîtî dehe zend û berayîya wan jî zend û nîvek be. <sup>17</sup>Serê her çîtî bira du k'ert hebin, ku hevda r'ûnên, h'emû çîtêd Konê Şe'detîyê jî usa çêkî. <sup>18</sup>Konê Şe'detîyêr'a, bona alîyê ku dik'eve başûrê bîst çîta çêkî, <sup>19</sup>ji zîv çil bingeha bona bîst çîta çêkî, du bingeha çîtê e'wlinr'a bona her du k'erta, usa jî bona yêd mayîn. <sup>20</sup>Bona alîyê din bakura Konê Şe'detîyê bîst çîta çêkî, <sup>21</sup>bona wan çil bingehêd zîvîn çêkî, du bingeh bin çîtê e'wlinr'a, du bingeh jî bin her çîtêd mayîn'r'a. <sup>22</sup>Bona pišta Konê Şe'detîyê alîyê r'oavayêva şeş çîta çêkî. <sup>23</sup>Alîyê piştêva bona e'nîşkêd Konê Şe'detîyê du çîta çêkî. <sup>24</sup>Ew alîyê jêrêva cot bin û jorva jî pê xelaqekê hevvakirî bin. Bona her du e'nîşka her duya jî usa çêkî. <sup>25</sup>Bira h'eyşt çît t'evî her şanzdeh

bingehêd xweye zîvînva bin. Du bingeh bin çîtê e'wlinda bin, dubingeh-dubingeh jî bin her çîtêd mayînda bin.

<sup>26</sup> Ji dara darcêwîyê destûya çêkî. Pênca bona çîtêd alîkî Konê Şe'detîyê, <sup>27</sup> pênca bona çîtêd alîyê dinêyî Konê Şe'detîyê û pênc destûya jî alîyê r'oavayêva bona çîtêd pişta Konê Şe'detîyê. <sup>28</sup> Destûyê navêda gerekê nava çîtar'a ji vî serî h'eta serê din derbaz be. <sup>29</sup> Çîta zêr' kî, xelaqêd wan, awa gotî cîyêd ku destûyêd têr'a derbaz bin, bi zêr' çêkî. Destûya jî zêr' kî. <sup>30</sup> Konê Şe'detîyê cûr'ê wêda bidî sekinandinê, çawa ku li ser çîyê ter'a hate nîşankirinê.

<sup>31</sup> Ji r'îsê şîn, şîrk û sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî p'er'dekê bi xebata nitirandinê xêrûba li ser çêkî, <sup>32</sup> wê bavêjî ser çar stûnêd darcêwîyêye zêr'kirî, ku çengelêd wan zêr' bin û bingehêd wan jî zîv bin. <sup>33</sup> P'er'dê bi qemitoka dardakî û Sindoqa Şe'detîyê bibî hindur' wî alîyê p'er'dê. Ew p'er'deyê wer'a navbir'îyê bide li nav Cîyê Pîroz û Cîyê Herî Pîroz. <sup>34</sup> Qalp'axê baxşandinê bidî ser Sindoqa Şe'detîyêye Cîyê Herî Pîrozda. <sup>35</sup> T'ext daynî vî alîyê p'er'dê der. Şemdanê jî alîyê başûra Konê Şe'detîyêva daynî pêşberî t'ext, t'ext ku dik'eve alîyê bakurê.

<sup>36</sup> Bona derê kon p'er'dekê ji r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî bi xebata neqîşandîtîyê çêkî. <sup>37</sup> Bona p'er'dê ji dara darcêwîyê pênc stûna çêkî û wan zêr' kî, çengelêd wan jî zêr' bin û bona wan pênc bingehêd sifir r'okî.

## Gorîgeh

**27** Ji dara darcêwîyê gorîgehê çêkî, dirêjayîya wê pênc zend, berayî pênc zend, bira gorîgeh çar goşe be, bilindayîya wê sê zend be. <sup>2</sup> Ser her çar e'nîşkêd wê stirûya derxî, usa ku stirûyêd wê ji wê bin, wê sifir kî. <sup>3</sup> T'ebaxêd bona k'ozîr'êtina wê, mer'ikêd wê, t'eştêd wê, goştgir û sinîyêd wê çêkî, h'emû hacetêd wê ji sifir çêkî. <sup>4</sup> Û bona wê ji sifir çîteke mîna t'or'a çêkî û çar xelaqêd sifir ser her çar e'nîşkêd çîtva kî. <sup>5</sup> Û wê jêrêva daynî bin kevîya gorîgehê, usa ku çît nîvê gorîgehêda be. <sup>6</sup> Bona gorîgehê destûya çêkî,

destû ji dara darcêwîyê bin û wan sifir kî. <sup>7</sup>Gere destûyêd wê li nav xelaqar'a derbaz bin, ew destû gere her du k'êlekêd gorîgehêva bin, bona hildana wê. <sup>8</sup>Wê ji t'exta çêkî û hindur' vala, çawa ku ser ç'îyê ter'a hate nîşandayînê, usa jî çêkî.

### H'ewşa Konê Şe'detîyê

<sup>9</sup>Alîyê başûrê h'ewşa Konê Şe'detîyê çêkî û p'er'dêd wê ji k'itanê zirav-badayî be, dirêjayîya alîkî sed zend be. <sup>10</sup>Bîst stûnêd wê bin t'evî bîst bingehêd ji sifir, lê çengelêd stûna û şîşêd wê ji zîv bin. <sup>11</sup>Usa jî bona h'ewşa alîyê bakurê, dirêjayîya p'er'dê bira sed zend be û bîst stûnê wê bin, t'evî bîst bingehêd ji sifir, çengelêd stûna t'evî p'evgirêka jî ji zîv bin. <sup>12</sup>Bona berayîya h'ewşê, p'er'dêd alîyê r'oavayê pêncî zend be, dehe stûnêd wan û dehe bingehêd wan bin. <sup>13</sup>Berayîya pêşîya h'ewşê ku wê bi-k'eve alîyê r'ohilatê pêncî zend be. <sup>14</sup>P'er'dêd alîkî dêrî panzdeh zend be, stûnêd wan sisê û bingehêd wan sisê bin, <sup>15</sup>p'er'dêd alîyê din panzdeh zend be, stûnêd wan sisê û bingehêd wan sisê. <sup>16</sup>Bona derê h'ewşê ji r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav-badayî, p'er'deke bîst-zendî bi xebata neqîşandîtîyê çêkî. Çar stûn û çar bingehêd wê gere hebin. <sup>17</sup>H'emû stûnêd dora h'ewşê gere bi şîşêd zîvîn hevva girêdayî bin. Çengelêd wan zîv û bingehêd wan sifir bin. <sup>18</sup>Dirêjayîya h'ewşê sed zend be, berayî pêncî zend be û bilindayîya p'er'dêd dorê pênc zend be. Ew gere ji k'itanê zirav-badayî bin, bingehêd stûna ji sifir bin. <sup>19</sup>Her hacetê bona her şixulê Konê Şe'detîyê, h'emû singêd wê û h'emû singêd h'ewşê ji sifir bin.

### R'ûnê bona r'onayê

<sup>20</sup>Tu t'emîyê bide zar'êd Îsraêl, wekî ter'a bona r'onayê r'ûnê zeyt'ûnêyî zelal k'işandî bînin, ku ç'ira her t'im bişxule. <sup>21</sup>Harûn zar'êd xweva Konê Civînêda\*, vî alîyê p'er'da ber

---

\* 27:21 Konê Civînê navekî din e bona Konê Şe'detîyê ye.

Şe'detîyê, li ber Xudan êvarê h'eta sibehê xemê şixulandinê hildine li ser xwe. Ev yek alîyê zar'êd Îsraêlda nav nisilêd wanda bibe e'rf-e'detê h'eta-h'etayê.

### K'incêd k'ahîna

**28** Tu ji nav zar'êd Îsraêlda<sup>f</sup> Harûnê birê xwe û kur'êd Harûn: Nadab, Abîhû, Êlazar û Ît'amar, bîne cem xwe, wekî minr'a k'ahîntîyê bikin. <sup>2</sup>Harûnê birê xwer'a k'incêd pîroz bidirûyî, bona qedir û r'ûmetê. <sup>3</sup>Tu bêje h'emû xweyîfiraseta, yêd ku min bi r'uhê zanebûnêva dagirtine, ku bona Harûn k'inca bidirûn, bona buhurtî-jibarebûna wî, ku minr'a k'ahîntîyê bike. <sup>4</sup>Ev in ew k'incêd ku wê bidirûn: R'extsîng, êfod, çux û kirasê neqîşandî, p'ap'ax û benpişt. Bira birê te Harûn û kur'êd wîr'a k'incêd pîroz bidirûn, ku minr'a k'ahîntîyê bikin. <sup>5</sup>Bira ew zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav hildin.

### Êfod

<sup>6</sup>Êfod ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav-badayî, bi xebata nitirandinê çêkin. <sup>7</sup>Gerekê ser her du sermilka p'evgirêk hebin ku bêne hevvakirinê. <sup>8</sup>Benpiştta li ser êfod jî mîna êfod ji wan tiştta hûnandî-nitirandî, jî zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav-badayî bê çêkirinê. <sup>9</sup>Du kevirêd onîks<sup>f</sup> hildî û navêd zar'êd Îsraêl li ser wan bik'olî binivîsî, <sup>10</sup>şeş nava li ser kevirêkî û şeş nava jî li ser kevirêkî, anegorî peyhevbûyîna wan. <sup>11</sup>Mîna hostatîya kevirêk'ol çawa ku morê dik'ole, usa jî tu navêd zar'êd Îsraêl ser her du kevirê bik'olî û wan nava qavêd zêr'înda qaş kî. <sup>12</sup>Wan her du kevirê ser sermilke êfodva kî, ku zar'êd Îsraêl'a bibine kevirêd bîranînê. Û Harûn navêd wan bona bîranînê li ber Xudan hilde ser her du milêd xwe. <sup>13</sup>Qaşêd zêr'în çêkî <sup>14</sup>û ji zêr'êd xalis du zincîrêd badayî vegirtî çêkî û wan zincîrêd vegirtî bavêjî qaşa.

### R'extsîng

<sup>15</sup> R'extsîngê h'akimtîyê nitirandî wî cûr'ê çêkirina êfodda çêkî. Wî ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî çêkî. <sup>16</sup> Bira ew du ta qatkirî çargoşe be, dirêjayîya wî bihustek û berayîya wî jî bihustek. <sup>17</sup> Û li ser wî çar cêrge kevir qaş kî. Cêrga e'wlin: Sardîyon<sup>f</sup>, topaz<sup>f</sup> û zimrûd, <sup>18</sup> cêrga duda: Karbûnkûlf, safîr û almas, <sup>19</sup> cêrga sisîya: Yaxonît, agat<sup>f</sup> û amêstîs <sup>20</sup> û cêrga çara jî: Xrîzolît, onîks û yaspîsf, evana gere nava qavêd zêr'da bêne qaşkirinê. <sup>21</sup> Ew kevir gere donzdeh h'eb bin, anegorî navêd kur'êd Îsraêl, mîna morê k'olayî ser her kevirî navekî wan bê k'olandinê bona donzdeh qebîla. <sup>22</sup> Ser r'extsîng zincîrêd badayî çêkî, ew vegirtî ji zêr'ê xalis be. <sup>23</sup> R'extsîngr'a du xelaqêd zêr'în çêkî û wan her du xelaqa ser her du niç'êd r'extsîngva kî. <sup>24</sup> Wan her du zincîrêd zêr'în, xelaqêd niç'êd r'extsîngva kî <sup>25</sup> û her du serîyêd zincîraye din her du qavêd sermilkê êfodva kî, pêşîyêva ser êfod be. <sup>26</sup> Du xelaqêd zêr'îne din çêkî wan bin r'extsîngva her du niç'êd jêrinva alîyê êfodva kî. <sup>27</sup> Du xelaqêd zêr'îne din jî çêkî, vana binê her du niç'êd sermilkêd êfodva kî. Alîyê pêşîyêva ber cîyê hevabûnêva ser benpišta êfodva kî. <sup>28</sup> Û bi qeyt'ana şîn xelaqêd r'extsîng xelaqêd êfodva kin, ku ew ser benpišta êfodva bin û r'extsîng ji êfod neqete. <sup>29</sup> Harûn navê kur'êd Îsraêle li ser r'extsîngê h'akimtîyê, t'imê bide li ser dilê xwe, gava bik'eve Cîyê Pîroz, bona bîranîna wan li ber Xudan. <sup>30</sup> Ûrîm û Tûmîm\* bike r'extsîngê h'akimtîyê. Bira ew ser dilê Harûn bin, gava ew her'e ber Xudan. Harûn her t'im h'akimtîya kur'êd Îsraêl li ber Xudan bide li ser dilê xwe.

### Çux

<sup>31</sup> Çuxê êfod xur'û bi r'engê şîn çêkî. <sup>32</sup> Navêda berstûya wî vekî ku serî têt'a derbaz be, dora wî cîyê vekirî mîna berstûya

---

\* 28:30 Ûrîm û Tûmîm tê fe'm kirinê çawa «R'onayî û K'amilî». Pê vana serekk'ahîn<sup>f</sup> li qirara Xwedê dih'esîya.

êlekzirih' hûnandî berstû kî, ku ji ber hev neçe. <sup>33</sup>Dora p'êşa çux ji r'îsê şîn, şîrk û sorê gevez h'inara çêkî, nava ji wan her yekîda jî zengilêd zêr'în hebe. <sup>34</sup>Dora p'êşa çuxva bira navbera her zengilekî zêr'în h'inarek be û zengilekî zêr'în h'inarek be. <sup>35</sup>We'dê qulixkirinê gerekê çux ser Harûn be û gava ew bik'eve Cîyê Pîroz li ber Xudan û derk'eve dengê çux bê bihîstinê ku ew nemire.

### P'ap'ax û kiras

<sup>36</sup>Bere'nîkê ji zêr'ê xalis r'o kî û bi cûr'ê mork'olandinê ser wê bik'olî: «Pîroz Xudanr'a». <sup>37</sup>Wê bavêjî ser qeyt'aneke şîn p'ap'axva kî, ku jorva ser ne'tika p'ap'axva be. <sup>38</sup>Bira ew li ser e'nîya Harûn be, wekî her kêmasîyê h'edîyêd zar'êd Îsraêle pîroz ku têne dayînê, Harûn hilde li ser xwe. Gerekê her t'im ew li ser e'nîya Harûn be, ku ew li ber Xudan bêne qebûlkirinê.

<sup>39</sup>Kiras bi k'itanê zirav bihûninî, p'ap'ax bi k'itanê zirav çêkî, benpiştê jî bi xebata neqîşandîtîyê çêkî.

### K'incêd kur'êd Harûn

<sup>40</sup>Kur'êd Harûnr'a, bona qedir û r'ûmeta wan, kirasa, benpiştê û k'oloza çêkî. <sup>41</sup>Vana li birê xwe Harûn û kur'êd wîye t'evî wî kî. Wan r'ûn kî, xizmetk'arîya wanda wan qewîn-qedîm\* kî û buhurtî-jibare kî ku minr'a k'ahîntîyê bikin. <sup>42</sup>Wanr'a bi k'itan k'incêd binî bidirûyî, wekî qalibêd xwe binixêmin, ew bira ji navk'êlkê h'eta çoka dirêj bin. <sup>43</sup>Gava Harûn û kur'êd xweva her'ine Konê Civînêf, yan nêzîkî gorîgehê bin bona qulixkirina Cîyê Pîrozda, bira wan li xwe kin, ku nebe ew neheqîyê bikin û bimirin. Bira ew wîr'a û zur'eta wîye pey wîr'a bibe e'rf-e'detê h'eta-h'etayê.

\* 28:41 Îbranîf xeber bi xeber: «Destêd wan dagirî».

Qewîn-qedîmkirina k'ahîna<sup>f</sup>

**29** Va ye çî ku tu gerekê t'evî wan bikî, ku ew buhurtî-jibare bin û minr'a bibine k'ahîn. Canegakî û du beranêd bêqusûr, <sup>2</sup> nanê bê hevîrtir'şk, k'atêd bê hevîrtir'şk pê r'ûn stirayî û loşê bê hevîrtir'şk ser r'ûnkirî hildî. Vana ji arê genimîyî xas çêkî. <sup>3</sup> Û wan bikî selekê, wan li ser selê t'evî canegê û her du berana h'edî bidî. <sup>4</sup> Harûn û kur'êd wîva jî bînî li ber derê Konê Civînê û wan pê avê bişoyî. <sup>5</sup> K'inca hildî, awa gotî kiras, çuxê êfod, êfod û r'extsîng Harûn kî, bi benpiştê êfod jî pišta wî girêdî. <sup>6</sup> P'ap'ax bidî serê wî û ser p'ap'axda jî k'ofîya pîroz daynî. <sup>7</sup> R'ûnê r'ûnkirinê hildî, ser serê wîda kî û wî r'ûn kî. <sup>8</sup> Kur'êd Harûn jî bînî kirasa li wan kî, <sup>9</sup> benpišta bidî pišta wan û k'oloza li serê wan bip'êç'î, k'ahîntî bona wan bibe e'rf-e'detê h'eta-h'etayê. Bi vî awayî Harûn û kur'êd wî xizmetk'arîya wanda qewîn-qedîm kî.

<sup>10</sup> Canegê bînî li ber Konê Civînê û Harûn kur'êd xweva bira destêd xwe daynine li ser serê canegê. <sup>11</sup> Û li ber derê Konê Civînê li ber Xudan canegê serjêkî. <sup>12</sup> Ji xûna canegê hildî û bi t'ilîya xwe stirûyêd gorîgehê xî, h'emû xûna mayîn bir'êjî binê gorîgehê. <sup>13</sup> H'emû bezê serzik, betanê cegerê, her du gur'ç'ika bezê wanva hildî û li ser gorîgehê agirşewatî kî. <sup>14</sup> Lê goştê canegê, ç'ermê wî û e'deba wî ji zomê derxî û bişewitînî. Eva dîyarîya<sup>f</sup> ji gune paqijbûnê ye.

<sup>15</sup> Ji berana yekî hildî, bira Harûn û kur'êd wî destêd xwe daynine li ser serê berên. <sup>16</sup> Wî beranî serjêkî, xûna wî hildî û li ser her çar k'êlekêd gorîgehêda bir'eşînî. <sup>17</sup> Berên hûr kî, dilh'inava û nigêd wî bişoyî û wan daynî li ser goştê hûrkirî û serê wî. <sup>18</sup> T'emamîya berên li ser gorîgehê agirşewatî kî, eva dîyarîya t'evayîşewatê ye bona Xudan. Dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan.

<sup>19</sup> Beranê din jî hildî, bira Harûn û kur'êd wî destêd xwe daynine li ser serê berên. <sup>20</sup> Berên serjêkî, ji xûna wî hildî gupika guhê Harûne r'astê û gupika guhê kur'êd wîye r'astê

xî, usa jî pêç'îya mezine destê wanî r'astê û pêç'îya mezi-  
ne nigê wanî r'astê xî. Xûna mayîn li ser her çar k'êlekêd  
gorîgehêda bir'eşînî. <sup>21</sup>Ji wê xûna ser gorîgehê û ji r'ûnê  
r'ûnkirinê hildî, bir'eşînî li ser Harûn, k'incêd wî û li ser  
kur'êd wî û k'incêd kur'êd wî. Hingê Harûn, k'incêd wî û  
kur'êd wîye t'evî wî û k'incêd kur'êd wî wê pîroz bin.

<sup>22</sup>Paşê bezê berên, dawê, bezê serzik, betanê cegerê, her  
du gur'ç'ika bezê wanva û pîla r'astê hildî, çimkî eva beranê  
qewîn-qedîmkirinê ye. <sup>23</sup>Ji sela nanê bê hevîrtir'şke li ber  
Xudan, bok'onekî, k'atekî bi r'ûn çêkirî û loşekî hildî <sup>24</sup>û  
wan daynî li ser destêd Harûn û destêd kur'êd wî û wan li  
ber Xudan çawa dîyarîya<sup>f</sup> h'ejandinê bih'ejinî. <sup>25</sup>Paşê van ji  
destêd wan bigirî, li ser gorîgehê t'evî dîyarîya t'evayîşewatê  
agirşewatî kî, bona bînwxweşîyê li ber Xudan. Eva dîyarîya  
şewatêye bona Xudan. <sup>26</sup>Wî sersîngê beranê ku bona qewîn-  
qedîmkirina Harûn bû hildî û li ber Xudan çawa dîyarîya  
h'ejandinê bih'ejinî. Evê bibe p'ara te. <sup>27</sup>Sersîngê h'ejandinê û  
pîla jorbilindkirinê ji beranê qewîn-qedîmkirinê ku hatibûn  
h'ejandinê û jorbilindkirinê, bona Harûn û kur'êd wî pîroz  
kî, <sup>28</sup>bira ev yek alîyê zar'êd Îsraêlda bona Harûn û kur'êd  
wî bibe qanûna h'eta-h'etayê. Eva dîyarîya<sup>f</sup> jorbilindkirinê  
ye û wê bibe dîyarîya jorbilindkirinê ji qurbanêd heleqetîyê  
ku zar'êd Îsraêl dîyarîya jorbilindkirinê bidine Xudan.

<sup>29</sup>Pey Harûnr'a k'incêd wîye pîroz kur'êd wîr'a bimînin,  
wekî gava ew bêne r'ûnkirinê û bêne qewîn-qedîmkirinê  
ew k'inc li wan bin. <sup>30</sup>Ji zar'êd wî, yê ku wê dewsa wî bibe  
k'ahîn û bik'eve Konê Civînê ku xizmetk'arîyê Cîyê Pîrozda  
bike, bira h'eft r'oja wan k'inca xwe ke.

<sup>31</sup>Beranê bona qewîn-qedîmkirinê hildî û cîkî pîroz goştê  
wî bik'elînî. <sup>32</sup>Harûn û kur'êd wî li ber derê Konê Civînê  
wî goştê berên û nanê selêda bixwin. <sup>33</sup>Ewana wan tišta  
bixwin, bi çi hatine gunek'ewandinê bona qewîn-qedîmî û  
buhurtî-jibarebûna wan. Kesekî din gerekê nexwe, çimkî  
pîroz in. <sup>34</sup>Lê heger ji goşt û nanê bona qewîn-qedîmkirinê

h'eta serê sibehê bimîne, ewêd bermayî bişewitînî. Gere ew neyêne xwarinê, çimkî pîroz in.

<sup>35</sup>H'emû t'emîyêd ku min çawa bona Harûn û kur'êd wî dane te usa bikî, nava h'eft r'ojda wan qewîn-qedîm kî. <sup>36</sup>R'ojê canegakî qurban bidî bona gunek'ewandinê. Bi vê yekê gorîgehê paqij kî. Serda jî wê r'ûn kî wekî pîroz be. <sup>37</sup>H'eft r'oja bona gorîgehê k'ewandinê bikî wê pîroz kî û gorîgehê bibe ya here pîroz. H'emû çi ku gorîgehê k'eve wê pîroz be.

### Qurbana her r'oj

<sup>38</sup>Va ye çi ku tu gerekê her t'im li ser gorîgehê bidî, r'ojê du berxêd yek salî. <sup>39</sup>Berxekî serê sibehê bidî, yê din jî berê êvarê. <sup>40</sup>T'evî berxê e'wlin p'areke çapê ji deha yek\* arê xasî stirayî t'evî p'areke hînê\*\* ji çara yek r'ûnê lêdayî û p'areke hînê ji çara yek şerav, çawa dîyarîya serdakirinê bidî. <sup>41</sup>Berxê duda jî berê êvarê bidî. Mîna wê dîyarîya<sup>f</sup> nanîye serê sibehê û mîna dîyarîya serdakirinê. Eva dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan. <sup>42</sup>Bira eva li nav nisilêd weda bibe dîyarîya t'evayîşewatêye her t'im li ber Xudan, ber derê Konê Civînê, wî cîyê ku ezê r'astî we bêm, t'evî te xeber dim. <sup>43</sup>Wê derê ezê r'astî zar'êd Îsraêl bêm û bi r'ûmeta minva ew cîyê pîroz be. <sup>44</sup>Ezê Konê Civînê û gorîgehê pîroz kim, usa jî Harûn û kur'êd wî pîroz kim, wekî minr'a k'ahîntîyê bikin. <sup>45</sup>Ezê li nav zar'êd Îsraêlda bimînim û bibime Xwedêyê wan. <sup>46</sup>Hingê ewê bizanibin ku ez Xudan im, Xwedêyê wan, ku min ew ji welatê Misirê derxistin, wekî li nava wanda bimînim. Ez Xudan im, Xwedêyê wan.

### Gorîgeha bixûrêf

**30** Gorîgeha bona bixûr şewitandinê ji dara darcêwîyêf çêkî. <sup>2</sup>Dirêjayîya wê zendek, berayîya wê zendek, bira ew çar goşe be, bilindayîya wê du zend be, stirûyêd wê

\* 29:40 «P'areke çapê ji deha yek» awa gotî «kîlogramek».

\*\* 29:40 «Hîn» nêzîkîya çar lîtira ye.

ji wê bin. <sup>3</sup>Jora wê, dora wê û stirûyêd wê bi zêr'ê xalis zêr' kî û dora lêva wê t'oqekî zêr'în bavêjêyî. <sup>4</sup>Du xelaqêd zêr'în bona wê çêkî. Wana bavêjî her du alîya binê t'oqva her du k'êlekava, wekî gava wê hildin cî hebin ku destûya têr'a derbaz kin. <sup>5</sup>Destûya ji dara darcêwîyê çêkî û wan zêr' kî. <sup>6</sup>Wê daynî li ber wê p'er'da ku ber Sindoqaf Şe'detîyê ye, pêşberî qalp'axê baxşandinêyî ser Şe'detîyê, wê dera ku ezê r'astî te bêm. <sup>7</sup>Û bira Harûn li ser wê bixûra bînxweş agirşewatî ke. Her serê sibehê gava ç'ira saz ke bixûrê agirşewatî ke. <sup>8</sup>Gava Harûn berê êvarê ç'ira vêxe û dayne ser şemdanê, bira bixûrê agirşewatî ke, wekî li nava nisilêd weda her t'im li ber Xudan bixûr hebe. <sup>9</sup>Li ser wê, bixûra başqe, yan dîyarîya t'evayîşewatê, yan dîyarîya nanîye din nedin, ne jî dîyarîya serdakirinê ser wêda kin. <sup>10</sup>Harûn salê carekê li ser stirûyêd gorîgehê gunek'ewandinê bike. Pê xûna qurbana bona gunek'ewandinê, salê carekê li ser wê gunek'ewandinê bike. Bira ev yek nava nisilêd weda bêne kirinê. Gorîgeh ya here pîroz e bona Xudan».

### Dîyarîyêd bona Xudan

<sup>11</sup>Xudan t'evî Mûsa xeber da û gotê: <sup>12</sup>«Gava tu zar'êd Îsraêl bijmirî û h'esabê wan zanibî, bira hingê her yek ji ber nefsa xweva heq bide Xudan, wekî bela neyê serê wan çaxê ku tu wan bijmirî. <sup>13</sup>Ev e ku gerekê ewana bidin, k'îjanê ku derbaz dibe tê jimarê, anegorî şêkilê pîrozgehê ku bîst gêr\* e, nîv şêkil zîv bira bide. Eva nîv şêkilê dîyarîya Xudan e. <sup>14</sup>Her kesê bîst salî û jor ku derbaz be bê jimarê, bira wê dîyarîyê bide Xudan. <sup>15</sup>Gava hûn ber nefsa xweva bona gunek'ewandinê dîyarîyê bidine Xudan, bira ne yê dewletî ji nîv şêkilî zêdetir bide û ne jî yê k'esîb kê m bide. <sup>16</sup>Zîvê gunek'ewandinê ji zar'êd Îsraêl hildî û bidî bona xizmetk'arîya

\* 30:13 Awa gotî «Donzdeh giram». Gêrek qasî 0,6 giram e.

Konê Civînê. Evê li ber Xudan bibe bîranîna zar'êd Îsraêl, bona gunek'ewardina nefîsêd wan.

### T'eşta ji sifir

<sup>17</sup>Xudan t'ev Mûsa xeberda û gotê: <sup>18</sup>«Usa jî ji sifir t'eşteke bona ava şuştin-veşuştinê çêkî. Bira bingeha wê jî ji sifir be, wê daynî li navbera Konê Civînê û gorîgehê, avê dagirî. <sup>19</sup>Bira Harûn û kur'êd xweva dest û p'îyêd xwe ji wê bişon. <sup>20</sup>Gava ew bik'evine Konê Civînê yan bona xizmetk'arîyê nêzîkî gorîgehê bin, awa gotî dîyarîya şewatê bidine Xudan, bira pê avê xwe bişon ku nemirin. <sup>21</sup>Bi vî awayî dest û p'îyêd xwe bira bişon wekî nemirin. Bira ev yeka bona wan bibe qanûna h'eta-h'etayê, hin bona wî, hin jî bona zur'eta wî li nav h'emû nisilêd wanda».

### R'ûnê bona r'ûnkirina pîrozîyê

<sup>22</sup>Xudan t'evî Mûsa xeber da û gotê: <sup>23</sup>«Lê tu xwer'a biharetêd here r'ind hildî, pênsid şêkil\* zimirê<sup>f</sup> nû, qasî nîvê wî, awa gotî dusid pêncî şêkil\*\* darçîna<sup>f</sup> bînxweş û dusid pêncî şêkil jî qamîşe bînxweş, <sup>24</sup>dusid pêncî şêkil kasîya\* anegorî şêkilê pîrozgehê û hînek\*\* r'ûnê zeyt'ûnê. <sup>25</sup>Ji van bi pisportî t'evdayî r'ûnekî r'ûnkirinêyî pîroz çêkî, ew bibe r'ûnê r'ûnkirinêyî pîroz. <sup>26</sup>Bi wî van tişta r'ûn kî: Konê Civînê, Sindoqa Şe'detîyê, <sup>27</sup>t'ext h'emû derdanêd wêva, şemdan hacetava, gorîgeha bixûrê, <sup>28</sup>gorîgeha t'evayîşewatê h'emû hacetêd wê, t'eşt û bingeha wê. <sup>29</sup>Wan pîroz kî, ku bibine yêd here pîroz. Çi ku wan k'eve wê pîroz be. <sup>30</sup>Harûn û kur'êd wî r'ûn kî û wan buhurtî-jibare kî, wekî minr'a k'ahîntîyê bikin. <sup>31</sup>T'evî zar'êd Îsraêl xebirdî û bêjî: «Evê li nava nisilêd weda minr'a bibe r'ûnê pîrozî bona r'ûnkirinê. <sup>32</sup>Ew gerekê li ser bedena

\* 30:23 Nêzîkî şeş kîlogram bû.

\*\* 30:23 Nêzîkî sê kîlogram bû.

\* 30:24 «Kasîya»bihareta bînxweş e.

\*\* 30:24 Awa gotî «çar lîtir» e.

her merivîda neyê r'êtinê û ne jî mîna cûr'ê wê bê t'evdayîn, ev pîroz e, bira wer'a jî pîroz be. <sup>33</sup> K'ê ku bi cûr'ê wê t'evdayne, yan jî wê li ser nek'ahînekîda ke, wê ji nava cime'ta xweda bê r'aqetandinê».

### Bixûr

<sup>34</sup> Xudan gote Mûsa: «Xwer'a biharetêd bînxweş hildî, awa gotî şîrêza darê, qaxikêd be'rê, tûzika mel'h'emê û bixûra e'rebîye xalis, bira k'aşê h'emûya yek be. <sup>35</sup> Vana bi pisportî t'evdayî bixûreke lêdayîye xalis û pîroz çêkî. <sup>36</sup> Ji vê hinekî hildî hûr-hûr bik'utî û li ber Şe'detîyê, Konê Civînêda daynî, wê dera ku ezê r'astî te bêm. Ev bixûrê bona we ya here pîroz be. <sup>37</sup> Ew bixûra ku tê anegorî t'evdayîna wê çêkî, mîna wê xwer'a çenekin, bira ew bona te pîroz be li ber Xudan. <sup>38</sup> K'ê ku bona bînhildanê anegorî wê xwer'a t'evdayne çêke, ew ji nav cime'ta xwe bê r'aqetandinê».

### K'ifşkirina hostayêd Konê Civînê

**31** Xudan t'evî Mûsa xeber da û gotê: <sup>2</sup> «Va ye min bi nav gazî Bisalêlê kur'ê Ûrîyê Hûrê ji qebîla Cihûda kir. <sup>3</sup> Min ew R'uhê Xwedêva, bi serwaxtîyê, bîlantîyê, deste'melîyê û firaseta her p'êşek'arîyêva dagirt, <sup>4</sup> wekî bi zêr', zîv û sifir tiştê bih'unirîne, <sup>5</sup> û kevira bik'ole qaş ke, dara bik'ole û her cûr'e şixulî bike. <sup>6</sup> Va ye min Oholîabê kur'ê Ahîsamaxê ji qebîla Dan çawa k'omekdar da wî û firasetî kirîye dilê xweyîfiraseta, wekî her tiştê ku min t'emî li te kirine bikin. <sup>7</sup> Konê Civînê, Sindoqa Şe'detîyê, qalp'axê baxşandinêyî ser wê û h'emû navmala kon, <sup>8</sup> usa jî t'ext derdanêd wêva, şemdana xalis h'emû hacetêd wêva û gorîgeha bixûrê, <sup>9</sup> gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê û h'emû hacetêd wê, t'eşt û bingeha wê, <sup>10</sup> k'incêd qulixkirinê, k'incêd pîroze k'ahîn Harûn'a û k'inca kur'êd wîr'a bona xizmetk'arîyê, <sup>11</sup> r'ûnê r'ûnkirinê û bixûra bînxweş bona Cîyê Pîroz, van h'emûya usa çekin çawa ku min t'emî da te».

### Şemî, r'oja r'ih'etîyê

<sup>12</sup> Xudan t'evî Mûsa xeberda û gotê: <sup>13</sup> «Tu t'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «Hûn gere e'se şemîyêd min xwey kin, çimkî eva

nîşaneke li nava min û we nisilêd weda, ku hûn bizanibin wekî ez Xudan im, yê ku we buhurtî-jibare dikim. <sup>14</sup> Awa şemîyê xwey kin, çimkî ew bona we pîroz e, k'ê ku wê bih'er'imîne gerekê bê kuştinê. Heger yek wê r'ojê şixulekî bike, bira ew meriva ji nav cime'ta xwe bê r'aqetandinê. <sup>15</sup> Bira şeş r'oja xebat bê kirinê, lê r'oja h'efta şemîya r'ih'etîyê ye, pîroz e bona Xudan. K'ê ku r'oja şemîyê şixulekî bike gerekê bê kuştinê. <sup>16</sup> Bira zar'êd Îsraêl şemîyê xweyî kin, wekî şemî li nav nisilêd wanda bê xweyîkirinê, çawa peymana h'eta-h'etayê. <sup>17</sup> Ew nîşana h'eta-h'etayê ye li nav min û zar'êd Îsraêlda, çimkî Xudan li nava şeş r'ojada e'rd û e'zman e'firandin û r'oja h'efta destê xwe ji xebatê kir û r'ih'et bû».

<sup>18</sup> Gava Xwedê li ser ç'îyayê Sînayê xeberdana xweye t'evî Mûsa ser hevda anî, du selêd Şe'detîyê dane wî. Selêd kevirîye bi t'ilîya Xwedê li ser nivîsar.

### Golika zêr'în

**32** Gava cime'tê dîna xwe dayê ku Mûsa derengî dik'eve ji ser ç'îyê nayê xarê, hingê cime't t'opî cem Harûn bû û gote wî: «R'abe mer'a xwedêya çêke, ku pêşîya me k'evin, çimkî ew Mûsayê meriv, yê ku em ji welatê Misirê derxistin, em nizanin çi hate serê wî». <sup>2</sup> Harûn gote wan: «Guharêd zêr'e ku guhêd jinêd we, kur'êd we û qîzêd weda ne, derxin û bînine cem min». <sup>3</sup> Ê t'emamîya cime'tê guharêd guhêd xweda ye zêr' derxistin û anîne cem Harûn. <sup>4</sup> Harûn ew ji destê wan hildan, qav k'oland cûr'e dayê û golikek r'o kir. Gotin: «Ev e xwedêyê te Îsraêl! Yê ku tu ji welatê Misirê derxistî». <sup>5</sup> Gava Harûn ev yek dît, ber wî gorîgehek çêkir. Harûn kire gazî û got: «Sibê cejina Xudan e». <sup>6</sup> R'oja din serê sibehê zû r'abûn dîyarîyêd t'evayîşewatê dan û dîyarîyêd heleqetîyê anîn, cime'tê r'ûnişt xwar, vexwar û r'abûn namûsa hevr'a lîstin.

### Hêrsa Xwedê

<sup>7</sup> Hingê Xudan gote Mûsa: «Peya be her'e, çimkî cime'ta teye ku te ji welatê Misirê derxist ji r'ê şih'itî. <sup>8</sup> Evana usa zû ji wê r'îyê şih'itîn, ya ku min t'emî dabû wan. Bona xwe

golikek r'o kirin, ew h'ebandin, wîr'a qurban dan û gotin: «Ev e xwedê te Îsraêl! Yê ku tu ji welatê Misirê derxistî». <sup>9</sup>Xudan gote Mûsa: «Min dîna xwe da vê cime'tê, va ye ew cime'teke serhîşk e. <sup>10</sup>Niha bihêle ku ez hêrsa xwe li ser van-da bir'êjim, qir'a van bînim. Lê ez te bikime miletekî mezin».

### Navçêtîya Mûsaye pêşin

<sup>11</sup>Lê Mûsa xwe avîte Xudan Xwedêyê xwe û got: «Ya Xudan çima hêrsa te li ser cime'ta te r'abe, ya ku te ji welatê Misirê bi qewata mezin û bi destê zor derxist? <sup>12</sup>Çima misirî bikin gilî û bêjin: «Bona xirabîyê ew derxistin, ku serê ç'îya wan bikuje û r'ûberî dinê wan nehêle? Ji alava hêrsa xwe vegeer'e û vê belayê ji ser cime'ta xwe paşda hilde. <sup>13</sup>Xulamêd xwe Birahîm, Îshaq û Îsraêl bîr bîne, k'îjanar'a te pê nefsa xwe sond xwar û gote wan: «Ezê zur'eta we qasî steyrkêd e'zman li hev zêde kim û t'emamîya vî e'rdî, bona k'îjanî min got ezê bidime zur'etêd we û ewê wanr'a bibe milk'ê h'eta-h'etayê». <sup>14</sup>Hingê Xudan gotina xwe guhast û bela ku gotibû neanî serê cime'ta xwe.

### Bîntengîya Mûsa

<sup>15</sup>Mûsa vegeer'îya û ji ç'îyê hate xarê, her du selêd Şe'detîyê jî destêd wîda bûn. Ser her du alîya jî nivîsar bûn, hin vî alîyî hin jî wî alîyî nivîsar bûn. <sup>16</sup>Sel şixulê destê Xwedê bûn û nivîsara ser jî nivîsara Xwedê bû li ser sela k'olandî. <sup>17</sup>Gava Yêşû dengê qar'e-qar'a cime'tê bihîst, gote Mûsa: «Dengê şêr' ji zomê tê». <sup>18</sup>Mûsa gotê:

«Ev ne dengê qar'e-qar'a serk'etîya ye,  
ne jî dengê qar'e-qar'a yêd dane der,  
lê ez dengê hevr'a lîstinê dibihêm».

<sup>19</sup>Gava Mûsa nêzîkî zomê bû, ç'e'v golikê û r'eqasê k'et, hêrsa wî r'abû, ew selêd destêd xweda avîtin û binat'ara ç'îyêda hûrdexweşî kirin. <sup>20</sup>Golika wane çêkirî hilda agirda h'eland, hûr-hûrî kir kire t'oz r'eşande ser avê û zar'êd Îsraêl dane vexwarinê.

<sup>21</sup>Mûsa gote Harûn: «Evê cime'tê çî te kir, ku te ev guneyê mezin anî ser wan?» <sup>22</sup>Harûn gotê: «Bira xweyê min hêrs nek'eve. Tu vê cime'tê nas dikî, ew xirabîyêr'a hazir in. <sup>23</sup>Gotine min: «Mer'a xwedêya çêke ku pêşîya me k'evin, çimkî ew Mûsayê meriv ku em ji welatê Misirê derxistin, em nizanin çî hate serê wî». <sup>24</sup>Min jî gote wan: «Zêrê k'ê heye bira derxe». Wan dane min, min jî ew avîtine li nav êgir ev golika derk'et».

<sup>25</sup>Mûsa dîna xwe dayê ku cime'tê h'ewla xwe ji dewlê avîtîye, wê li ber dijminêd xwe bibine r'obet, (çimkî Harûn îzin dabû ku wana h'ewla xwe ji dewlê avîtibûn). <sup>26</sup>Hingê Mûsa ber dergehê zomê sekinî û got: «K'ê alîyê Xudan e, bira bê cem min!» H'emû zar'êd Lêwî civîyane cem wî. <sup>27</sup>Û gote wan: «Xudan Xwedêyê Îsraêl aha dibêje: «Bira her meriv şûrê xwe girêde, zomêda ji dergeh h'eta dergeh her'in werin, her meriv birê xwe, her meriv hevalê xwe, her meriv cînarê xwe bikuje»». <sup>28</sup>Zar'êd Lêwî weke gotina Mûsa kirin, wê r'ojê ji cime'tê sê h'ezar meriv k'etin. <sup>29</sup>Mûsa got: «Îro we bona xizmetk'arîya Xudan xwe bi kuştina kur'ê xwe û birê xwe buhurtî-jibare kir. Lema îro duayê li ser weda bê».

### Navçêtîya Mûsaye duda

<sup>30</sup>R'oja dinê Mûsa gote cime'tê: «We gunekî mezin kirîye. Va ye ezê hilk'işime cem Xudan, belkî bikaribim k'ewandinê ji ber gunêd weva bidim kirinê». <sup>31</sup>Mûsa veger'îya cem Xudan û gotê: «Belê! Evê cime'tê gunekî mezin kir xwer'a xwedêkî zêr'in çêkir. <sup>32</sup>Niha ez r'eca dikim gunê wan bibaxşîne! Lê heger na, hîvî dikim navê min ji k'itêba xweye nivîsar r'esît ke». <sup>33</sup>Xudan gote Mûsa: «K'ê li ber min gune kirîye, ezê wî ji k'itêba xwe r'esît kim. <sup>34</sup>Lê niha tu her'e cime'tê bibe wî cîyê ku min ter'a got. Va ye milyak'etê minê pêşîya teva her'e, lê r'oja ceza ezê bona gunê wan, wan ceza kim». <sup>35</sup>Û Xudan cime'tê xist bona wê golika wane çêkirî, ya ku Harûn çêkir.

## Navçêtiya Mûsaya sisiya

**33** Xudan gote Mûsa: «R'abe ji vira tu û ew cime'ta ku te ji welatê Misirê derxist hevraz anî, hilde her'e wî e'rdê bona k'îjanî min Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwar û got: «Ezê wî bidime zur'eta te». <sup>2</sup> Ezê pêşîya teva milyak'etekîf bişînim û ewê kenanîya, emorîya, h'îtîya, pirîzzîya, h'îwîya û yebûsîya r'aqetîne. <sup>3</sup> Tê her'î e'rdê şîr û hingiv jê dik'işe, lê ezê xwexa t'evî te hevraz neyêm, çimkî tu miletekî serh'işkî ku nebe ez r'êva qir'a te bînim».

<sup>4</sup> Gava cime'tê ev gotina giran bihîst, şîn kirin û qet kesekî xişîrê xwe xava nekir. <sup>5</sup> Çimkî Xudan gotibû Mûsa: «Bêze zar'êd Îsraêl, hûn miletekî serh'işk in, heger ez deqekê t'evî te hevraz bêm ezê qir'a te bînim. Lê niha xişîrêd li ser xwe derxin, ku ez dîna xwe bidimê k'a ez we çawa bikim». <sup>6</sup> Zar'êd Îsraêl xişîrêd xwe hinda ç'îyayê H'orêbê ji ser xwe derxistin.

## Konê Civînê

<sup>7</sup> Mûsa Kon hilda, ji zomê der hinekî ji zomê dûr vegirt û navê wî danî Konê Civînê. Û her kesê ku gazî Xudan dikir, ji zomê derdik'et diçû Konê Civînê, ku ji zomê der bû. <sup>8</sup> Gava Mûsa derdik'et diçû berbi Kon, hingê h'emû cime't r'adibû û her yek li ber derê konê xwe disekinî û dîna xwe didane Mûsa, h'eta ku ew bik'eta Kon. <sup>9</sup> Çawa ku Mûsa dik'ete Kon, stûna e'wr peya dibû li ber derê Kon disekinî û Xudan t'evî Mûsa xeber dida. <sup>10</sup> Gava t'emamîya cime'tê stûna e'wre li ber derê Kon sekinî didît, t'emamîya cime'tê r'adibû û her yek li ber derê konê xwe dever'ûya diçû. <sup>11</sup> Xudan r'û bi r'û t'evî Mûsa xeber dida, çawa ku merivek t'evî hevalê xwe xeber dide. Mûsa vediger'îya zomê, lê xortê berdestîyê wî Yêşûyê kur'ê Nûn ji Kon dûr nedik'et.

## Duayê Mûsa

<sup>12</sup> Mûsa gote Xudan: «Belê te gote min: «Vê cime'tê derxe», lê belê te minva e'yan nekir, tê kê t'evî min bişînî, te got:

«Ez te pê navê te nas dikim û te li ber ç'e'vêd min k'erem dît». <sup>13</sup>Lê niha hîvî dikim, heger min li ber ç'e'vêd te k'erem dîtîye, r'îyêd xwe li ber min veke wekî ez te nas bikim û li ber te k'eremê bibînim, dîna xwe bidê ku ev millet cime'ta te ye». <sup>14</sup>Û Xwedê got: «Ezê t'ev te bêm û te bibime r'ih'etîyê». <sup>15</sup>Mûsa gote wî: «Heger tu neyêyî, me ji vira dernexe. <sup>16</sup>Wê çawa bê k'ifşê wekî min û cime'ta te li ber ç'e'vêd te k'erem dîtîye, heger tu t'evî me neyêyî? Bi vî awayî ez û cime'ta teyê li r'ûbarî dinê ji h'emû mileta bêne başqekirinê».

### Mûsa dixwaze r'ûmeta Xudan bibîne

<sup>17</sup>Xudan gote Mûsa: «Ezê vê yekê jî bikim ku te got, çimkî te li ber ç'e'vê min k'erem dît û ez te pê navê te nas dikim». <sup>18</sup>Mûsa got: «Hîvî dikim dîndara xwe minva e'yan ke». <sup>19</sup>Hingê Xwedê gotê: «Ezê h'emû qencîya xwe li ber teva derbaz kim û navê xwe Xudan\* li ber te bidime e'lamkirinê, ez k'îjanî bême r'e'mê, ezê bême r'e'mê û dilê min ser k'ê bişewite, wê bişewite». <sup>20</sup>Got: «Tu r'ûyê min nikarî bibînî, çimkî meriv nikare min bibîne û sax bimîne». <sup>21</sup>Û Xudan got: «Va ye cem min cîk heye, li ser wî qeyayî bisekine, <sup>22</sup>gava dîndara min derbaz be, ezê te bikime qeliştoka qeyê û bi destê xwe te binixênim, h'eta ku ez derbaz bim. <sup>23</sup>Paşê ezê destê xwe hildim û tê piştêva min bibînî, lê r'ûyê min wê teva neyê dîtîne».

### Wek'ilandina peymanê Xwedê

**34** Xudan gote Mûsa: «Du selêd kevirî xwer'a bibir'e mîna yêd pêşîyê û ezê li ser wan sela binivîsim wan xebera, yêd ku li ser selêd pêşîyê bûn, k'îjan te hûrdexweşî kirin. <sup>2</sup>Bona serê sibehê hazir bî. Serê sibehê hilk'işî ç'îyayê Sînayê û wê derê li ser ç'îyê ber min bisekinî. <sup>3</sup>T'u kes t'evî

\* 33:19 Binihêr'e şirovekirina Derk'etin 3:15-da.

te hilnek'işe û t'u kes li ser t'emamîya ç'îyê neyê k'ifşê, ne jî pez û dewar nêzîkî ç'îyê biç'êre». <sup>4</sup>Mûsa du selêd kevirî mîna yê pêşîyê bir'în. Ew serê sibehê r'abû, her du selêd kevirî dêstda hilk'işîya ser ç'îyayê Sînayê, çawa ku Xudan t'emî dabû wî. <sup>5</sup>Û Xudan pê e'wr peya bû, li wir cem wî sekinî û navê Xudan e'lam kir. <sup>6</sup>Xudan li ber wîr'a derbaz bû û e'lam kir:

«Xudan, Xudan im!

Xwedêyê r'e'm û k'eremê,

sebir-sik'anê,

bi h'ub û aminîyêda xinêyo,

<sup>7</sup>ku bona h'ezara xweyê h'uba amin e,

neheqîyê, ner'astîyê û guna dibaxşîne,

lê sûcdara bê ceza nahêle,

neheqîya bava tîne serê

kur'a û kur'ê-kur'a,

h'eta nisilê sisîya û çara».

<sup>8</sup>Mûsa bi lez dever'ûya çû e'rdê û h'eband, <sup>9</sup>û got: «Xweyê min, eva miletekî serh'işk e, lê heger min li ber ç'e'vêd te k'erem dîtîye, hîvî dikim, bira Xweyê min t'evî me bê. Neheqî û gunêd me bibaxşîne û me bike warê xwe».

<sup>10</sup>Û Xudan gotê: «Va ye ez peymanê girêdidim, li ber ç'e'vê t'emamîya cime'ta te k'eremetêd usa ezê bikim, k'u li ser r'ûbarî dinê û li nav h'emû milletada tiştêd usa ne bûne. H'emû milletêd dor-berêd te, wê kirinêd Xudan bibînîn, çimkî ezê bona te kirinêd h'eyre-xof bikim. <sup>11</sup>Bîra xweda xwey ke çi t'emîyê ez îro didim te, va ye ezê li ber te emorîya, kenanîyaf, pirîzzîya, h'îtîya, h'îwîya û yebûsîya r'aqetînim. <sup>12</sup>Miqatî xwe bî, ew welatê ku tê her'î nebe ku peymanê t'evî binelîyêd wî girêdî û ew ter'a bibe t'ele. <sup>13</sup>Lê hûn gorîgehêd wan wêran kin, h'eykelêd wan hûrdexweşî kin û Aşêrahêd\*

\* 34:13 Aşêrah navê p'ûtêd milletêd kenanîya bûn, cûr'êd wan ne e'yan in, belkî mîna stûnêd ji dar bûn yan jî xwexa dar bûn.

wan jî bibir'in. <sup>14</sup>Tu xwedêyê başqe neh'ebînî, çimkî navê Xudan K'umr'eş e, ew Xwedêkî k'umr'eş e. <sup>15</sup>Nebe ku tu t'evî binelîyêd wî welatî peymanê girêdî, gava ew pey xwedêyêd xwe her'in bêe'silîyê bikin, qurbana xwedêyêd xwer'a bidin û te t'eglîf kin, tu jî ji wê qurbana wan bixwî, <sup>16</sup>qîzêd wan kur'êd xwer'a bixwazî û gava qîzêd wan pey xwedêyêd xwe her'in bêe'silîyê bikin, wê kur'êd te jî bêe'silîyê bidine kirinê û li pey xwedêyêd xwe bidine birinê.

<sup>17</sup>Xwedêya xwer'a r'onekî.

<sup>18</sup>Cejina<sup>f</sup> Nanê Şkeva xwey kî. Wî we'dê k'ifşkirîye meha Abîbêda\*, h'eft r'oja nanê şkeva bixwî, çawa ku min t'emî daye te, çimkî tu meha Abîbêda ji Misirê derk'etî.

<sup>19</sup>Her nixurîyê ji dîya xwe dik'eve p'ara min e, usa jî her nixurîyê nêrînî li nav h'eywanêd teda, heger dewar be yan jî pez be. <sup>20</sup>Ji ber nixurîyê k'erêva berxekî bidî, lê heger berva nedî, stûyê wî bişkênî. Ji ber her nixurîyê kur'êd xweva jî bidî.

Bira qet yek destvala dernek'eve li ber min.

<sup>21</sup>Şeş r'oja bixebitî û r'oja h'efta r'ih'et bî, we'dê çandin û dirûnê jî r'ih'et bî.

<sup>22</sup>Cejina<sup>f</sup> H'eftîya\* pê berê nandirûna e'wlin û Cejina Bert'opkirina xilazîya salê xwey kî. <sup>23</sup>Salê sê cara h'emû qisimê teye nêrîn bira li ber Xudan Xwedê, Xwedêyê Îsraêl bisekinin. <sup>24</sup>Çimkî ezê li ber te mileta r'aqetînim û sînorê te berfire kim. We'dê ku tu salê sê cara li ber Xudan Xwedêyê xwe bisekinî, t'u kesê ç'e'v nevêje welatê te.

<sup>25</sup>Xûna qurbana min t'ev nanê pê hevîrtir'şk nedî û ne jî qurbana Cejina<sup>f</sup> Derbazbûnê h'eta serê sibehê bimîne.

<sup>26</sup>Berêd<sup>f</sup> deremeta pêşîne e'rdêd xweda ye here qenc bîne mala Xudan Xwedêyê xwe.

Karê li nav şîrê makêda nek'elînî».

\* 34:18 Binihêr'e şirovekirina Derk'etin 13:4.

\* 34:22 Derk'etin 23:16-da eva cejina hate navkirinê çawa Cejina<sup>f</sup> Nandirûnê.

<sup>27</sup>Xudan gote Mûsa: «Van xebera xwer'a binivîse, çimkî min anegorî van xebera peyman t'evî te û t'evî Îsraêl girêda».

<sup>28</sup>Mûsa wê derê li cem Xudan çil r'oîjê û çil şevî ma, ne nan xwar û ne jî av vexwar. Li ser wan selêd kevirî xeberêd peymanê nivîsîn, awa gotî her dehe t'emî.

### R'ûyê Mûsa diç'irûse

<sup>29</sup>Gava Mûsa her du selêd Şe'detîyê dêstda ji ç'îyayê Sînayê dihate xwarê. Mûsa nizanibû ku ji wê xebardana xweye t'evî Xudan, r'ûyê wî diç'irûsî. <sup>30</sup>Harûn û h'emû zar'êd Îsraêl ç'e'v Mûsa k'etin, va ye r'ûyê wî diç'irûse, ew tirsîyan ku nêzîkî wî bûna. <sup>31</sup>Hingê Mûsa gazî wan kir, Harûn û h'emû serwêrêd civînê vege'îyan hatine cem wî û Mûsa t'evî wan xebarda. <sup>32</sup>Pey vê yekêr'a h'emû zar'êd Îsraêl hatine nêzîk. Ewî h'emû t'emîyêd ku Xudan ser ç'îyayê Sînayê t'evî wî xeber dabû, dane wan. <sup>33</sup>Mûsa xebardana t'evî wan xilaz kir, ewî xêlî avît li ser r'ûyê xwe. <sup>34</sup>Lê çaxê Mûsa diçû li ber Xudan ku t'evî wî xeber da, ewî xêlî ji ser r'ûyê xwe hildida, h'eta ku wê derk'eta, paşê derdik'et û çî t'emî wîr'a hatibûne dayîne, zar'êd Îsraêl'r'a digot. <sup>35</sup>Zar'êd Îsraêl ç'e'v Mûsa k'etin, dîna xwe danê ku r'ûyê Mûsa diç'irûse. Mûsa xêlî davîte li ser r'ûyê xwe, h'eta ku diçû ber Xudan ku t'evî wî xeber da.

### T'emîyêd bona r'oja şemîyê

**35** Mûsa t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl civand û gote wan: «Ev in ew tiştêd ku Xudan t'amî da ku wan biqedînin: <sup>2</sup>şes r'oja xebata xwe bikin, lê r'oja h'efta wer'a bibe şemîya r'ih'etîyêye pîroz bona Xudan. Kê wê r'oje şixulekî bike wê bê kuştinê. <sup>3</sup>R'oja şemîyê h'emû cî-warêd xweda agir vênexin».

### P'êşk'êşêd bona Konê Şe'detîyê

<sup>4</sup>Mûsa t'evî t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl xeber da û got: «Ev e çî ku Xudan t'emî da û got: <sup>5</sup>«Ji nav hebûka xwe h'edîyê

bona Xudan derxin. Bira her kesê r'ezedilî Xudanr'a h'edîyê bîne: Zêr', zîv û sifir, <sup>6</sup>r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez, k'itanê zirav û pir'ç'a bizinê, <sup>7</sup>ç'ermêd beranaye sor r'engkirî, ç'ermêd game'sîya\*, darêd darcêwîyê, <sup>8</sup>bizirê bona r'onayîyê, biharetêdf bona r'ûnê r'ûnkirinê û bona bixûra bînxweş, <sup>9</sup>kevirêd onîks û kevirêd qîmete bona qaşkirina êfod û r'extsîng.

<sup>10</sup>Her xweyîfirasetêd li nav weda bira bîn û h'emû tiştêd ku Xudan t'emî dane çêkin: <sup>11</sup>Konêf Şe'detîyê, sergira ser girtina wê û serk'êşa wê, qemitokêd wê, çîtêd wê, destûyêd wê, stûnêd wê û bingehêd wê, <sup>12</sup>sindoq û destûyêd wê, qalp'axê baxşandinê û p'er'da navbir'îyê, <sup>13</sup>t'ext destûyava û h'emû derdanêd wê, nanêf Xwedêr'a dayî, <sup>14</sup>şemdana r'onayê û hacetêd wê, ç'irêd wê û r'ûnê r'onayê, <sup>15</sup>gorîgeha bixûrê û destûyêd wê, r'ûnê r'ûnkirinê, bixûra bînxweş û p'er'da ber derê Konê Şe'detîyê, <sup>16</sup>gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê û çîta wêye sifirîn, destûyêd wê û h'emû hacetêd wê, t'eşt û bingeha wê, <sup>17</sup>p'er'dêd h'ewşê, stûnêd wê bingehava û p'er'da ber derê h'ewşê, <sup>18</sup>singêd kon û singêd h'ewşê hebinêd wanva, <sup>19</sup>k'incêd qulixkirinêye bona xizmetk'arîya Cîyê Pîrozda, k'incêd pîroze k'ahîn Harûnr'a, usa jî k'incêd kur'êd wî ku k'ahîntîyê bikin».

<sup>20</sup>T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl ji cem Mûsa çû. <sup>21</sup>H'emû bi r'ezedilîya xwe û bi dil-can hatin, bona şixulêd Konê Civînê û bona t'emamîya xizmetk'arîya wî û bona k'incêd pîroz Xudanr'a h'edî anîn. <sup>22</sup>Jinê û mêrêd mer'd hatin, mengik, guhar, gustîl, xişir û her cûr'e nexşêd zêr'în anîn, her kesî hindava xweda h'edîyêd zêr'în dane Xudan. <sup>23</sup>Û cem k'ê r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez, k'itanê zirav, pir'ç'a bizinê û ç'ermêd beranaye sor r'engkirî û ç'ermêd ga-me'sîya\* hebûn anîn. <sup>24</sup>Her kesê ku zîv, sifir h'edî dida, çawa h'edî Xudanr'a anîn û cem k'ê ku darê darcêwîyê bona çêkirina h'emû tişta

\* 35:7 Binihêr'e şirovekirina 25:5.

\* 35:23 Binihêr'e şirovekirina Derk'etin 25:5.

hebûn anîn. <sup>25</sup>H'emû k'ulfetêd xweyîfiraset bi deste'melîya xwe r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav r'istin û anîn. <sup>26</sup>H'emû k'ulfetêd ku dilê wan dixwest bi deste'melîya xwe pir'ç'a bizinê r'istin. <sup>27</sup>Serwêra jî kevirêd onîks û kevirêd qîmete bona qaşkirina êfod û r'extsîng, <sup>28</sup>usa jî bizirê bona ç'irê, biharetêd bona r'ûnê r'ûnkirinê û bixûra bînxweş anîn. <sup>29</sup>Her jinê û mêmê zar'êd Îsraêl ku dilê wan dixwest, bona her tiştê ku Xudan t'emî dabû Mûsa bê çekirinê, bi r'ezedilîya xwe Xudan'a h'edî anîn.

### Hosteyêd Konê Civînê

<sup>30</sup>Mûsa gote zar'êd Îsraêl: «Dîna xwe bidinê, Xudan bi nav gazî Bisalêlê kur'ê Ūrîyê Hûr kir, ji qebîla Cihûda. <sup>31</sup>Ew R'uh'ê Xwedêva, bi serwaxtîyê, bîlantîyê, deste'melîyê û firseta her p'êşek'arîyêva dagirt, <sup>32</sup>wekî bi zêr', zîv û sifir tiştê bih'unirîne <sup>33</sup>û kevira bik'ole qaş ke, dara bik'ole û her cûr'e şixulî bi hostatîyê bike. <sup>34</sup>Dilê wîda jî danî ku hîn bike, dilê wî û dilê Oholîabê kur'ê Ahîsamaxê ji qebîla Dan. <sup>35</sup>Xwedê ew firsatîyêva dagirtin, wekî her şixulê hostatîyê, h'unurmendîtîyê, neqîşandîtîyê bi r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez li ser k'itanê zirav, şixulê nitirandinê û her cûr'e şixulî bikin.

**36** Hingê Bisalêl, Oholîab û her kesêd xweyîfirsate yê ku Xudan firsatî û bîlantî dabû wan, bona her cûr'e şixulêd pîrozgehê bizanibin û anegorî t'emîya Xudan bikin.

<sup>2</sup>Mûsa gazî Bisalêl, Oholîab û h'emûyêd xweyîfirsat kir, dilê k'îjanada Xudan firsatî danîbû, awa gotî gazî wan, dilê k'îjanî dik'işande wî k'arî, ku wê xebatê bike. <sup>3</sup>Hingê wana ew h'emû h'edî, k'îjan ku zar'êd Îsraêl bona xebata pîrozgehê anîbûn, ji cem Mûsa hildan. Ū her serê sibehê cime'tê bi r'ezedilîya xwe hê h'edîyêd xwe danîne cem wî. <sup>4</sup>H'emû xweyîfirsatêd ku h'emû xebata

pîrozgehê dikirin, her kes ji xebata xwe hat, <sup>5</sup>t'evî Mûsa xeberdan û gotinê: «Bona vî şixulî çiqas ku Xudan t'emî dabû bikin, cime't ji wê zêdetir tîne». <sup>6</sup>Mûsa t'emî da ku zomêda e'lam kin bêjin: «Ji vir şûnda ne mêr ne jin bona h'edîya pîrozgehê îdî t'u tiştî neke». Û cime'tê dest ji anînê k'işand. <sup>7</sup>Ew tiştêd anîbûn t'êra h'emû şixulê ku wê bikirana kir û ber jî ma.

Çêkirina p'er'da <sup>8</sup>H'emû xweyîfirasetêd nava xebatk'ara, ji k'itanê zirav-badayî, r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez dehe tej bi xebata nitirandinê xêrûb<sup>f</sup> ser derxistin bona Konê Şe'detîyê. <sup>9</sup>Dirêjayîya her teji bîst û h'eyşt zend bû, berayîya her teji jî çar zend bû, çapa h'emû teja weke hev bû. <sup>10</sup>Pênc tej hevva kirin û pêncê jî hevva. <sup>11</sup>Ji r'îsê şîn p'evgirêk avîtine li kevîya kerê tejêd pêşin li ser lêva hevvabûnê, usa jî avîtine lêva kevîya kerê tejêd mayînî hevvabûnê. <sup>12</sup>Pêncî p'evgirêk avîtine ser p'arç'ê her pênc tejê e'wlin, pêncî p'evgirêk jî avîtine ser lêva p'arç'ê her pênc tejê duda, usa ku h'emû p'evgirêka hevr'a xeber didan. <sup>13</sup>Pêncî qemitokêd zêr'în çêkirin û her du p'arç'êd pênc teji pê wan qemitoka hevva kirin û Konê Şe'detîyê bû yek.

<sup>14</sup>Bona ser girtina Konê Şe'detîyê ji pir'ç'a bizinê yanzdeh tej çêkirin. <sup>15</sup>Dirêjayîya her teji sî zend bû û berayîya her teji jî çar zend bû, usa ku çapa her yanzdeh teja weke hev bû. <sup>16</sup>Pênc tej başqe hevva kirin û şeş tej jî başqe. <sup>17</sup>Pêncî p'evgirêk avîtine li kevîya kerê p'arç'ê pêncetjîyî pêşine li ser lêva hevvabûnê, pêncî p'evgirêk jî avîtine li kevîya kerê p'arç'ê şeştejîyî mayîn e li ser lêva hevvabûnê. <sup>18</sup>Bona hevvakirina kon ji sifir pêncî qemitok çêkirin ku bibe yek. <sup>19</sup>Ji ç'ermêd beranaye sor r'engkirî sergirek çêkirin bona sergirtina kon, ji ç'ermêd ga-me'sîya\* jî serk'êşek çêkirin, bona k'işandina li ser wê.

\* 36:19 Binihêr'e Derk'etin 25:5.

### Çêkirina çîta

<sup>20</sup>Bona Konê Şe'detîyê ji dara darcêwîyê çîtêd sekinandî çêkirin. <sup>21</sup>Dirêjayîya her çîtî dehe zend bû, berayîya wan jî zend û nîvek bû. <sup>22</sup>Serê her çîtî du k'ert bûn, ku hevda r'ûdiniştin, h'emû çîtêd Konê Şe'detîyê jî usa çêkirin. <sup>23</sup>Konê Şe'detîyêr'a, bona alîyê ku dik'eve başûrê, bîst çît çêkirin, <sup>24</sup>ji zîv çil bingeh bona bîst çîtî çêkirin, du bingeh çîtê e'wlinr'a, bona her du k'erta, usa jî bona yêd mayîn. <sup>25</sup>Bona alîyê din bakura Konê Şe'detîyê bîst çît çêkirin, <sup>26</sup>bona wan çil bingehêd zîvîn çêkirin, du bingeh bin çîtê e'wlinr'a, du bingeh jî bin her çîtêd mayîn'r'a. <sup>27</sup>Bona pişta Konê Şe'detîyê alîyê r'oavayêva şeş çît çêkirin. <sup>28</sup>Alîyê piştêva bona e'nîşkêd Konê Şe'detîyê du çît çêkirin. <sup>29</sup>Ew alîyê jêrêva cot bûn û jorêva jî pê xelaqê hevvakirî bûn. Bona her du e'nîşka her du jî usa çêkirin. <sup>30</sup>H'eyşt çît û şanzdeh bingehêd wane zîvîn bûn, binê her çîtîda du bingeh bûn.

<sup>31</sup>Ji dara darcêwîyê destû çêkirin. Pênc bona çîtêd alîkî Konê Şe'detîyê, <sup>32</sup>pênc jî bona çîtêd alîyê dinêyî Konê Şe'detîyê û pênc destû jî alîyê r'oavayêva bona çîtêd pişta Konê Şe'detîyê. <sup>33</sup>Destûyê navê çêkirin ku nava çîtar'a ji vî serî derbazî serê din be. <sup>34</sup>Çît zêr' kirin, xelaqêd wan, awa gotî cîyêd ku destû têr'a derbaz dibin, bi zêr' çêkirin. Destû jî zêr' kirin.

### Çêkirina p'er'da navbir'iyê

<sup>35</sup>Ji r'îsê şîn, şîrk û sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî p'er'de bi xebata nitirandinê xêrûb li ser çêkirin. <sup>36</sup>Ew avîtine ser çar stûnêd darcêwîyêye zêr'kirî, ku çengelêd wan zêr' bûn, bona wan çar bingehêd zîvîn r'okirin. <sup>37</sup>Bona derê kon p'er'de ji r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî bi xebata neqîşandîtîyê çêkirin, <sup>38</sup>bona wê pênc stûn çengelêd wanva çêkirin, serêd wan û şîşêd wan zêr' kirin. Her pênc bingehêd wan jî ji sifir bûn.

**Sindoqaf Peymanê**

**37** Bisalêl ji dara darcêwîyê sindoq çêkir, dirêjayîya wê du zend û nîv, berayîya wê zend û nîv, zend û nîv jî bilindayîya wê bû. <sup>2</sup>Der û hindur'ê wê bi zêr'ê xalis zêr' kir û dora lêva wê t'oqekî zêr'în avîtê. <sup>3</sup>Bona her çar nigêd wê çar xelaqêd zêr'în r'o kirin, du xelaq alîkîva, du xelaq jî alîyê dinva. <sup>4</sup>Ji dara darcêwîyê destû çêkirin û ew zêr' kirin. <sup>5</sup>Destû xelaqêd k'êlekêd sindoqêr'a derbaz kirin, wekî sindoq bê hildanê. <sup>6</sup>Qalp'axê baxşandinê ji zêr'ê xalis çêkir, dirêjayîya wê du zend û nîv, berayîya wê jî zend û nîv bû. <sup>7</sup>Û ser her du serîyêd qalp'axê baxşandinê pê zêr' du xêrûbêd k'olandî çêkirin. <sup>8</sup>Xêrûbek serîkîva derxist, xêrûbekî jî serê dinva, xêrûb ji qalp'axê baxşandinê ser her du serîyava derxistin. <sup>9</sup>P'er'êd xêrûba berbi jor vekirî bûn û bi p'er'êd xwe qalp'axê baxşandinê dinixamtin. Berê wan hevdu bû û dîna wan qalp'axê baxşandinêda bû.

**T'extê nanê Xwedêr'a dayî**

<sup>10</sup>Ji dara darcêwîyê t'ext çêkir, dirêjayîya wê du zend, berayîya wê zendek û bilindayîya wê zend û nîv bû. <sup>11</sup>Ew bi zêr'ê xalis zêr' kir û dora wê t'oqekî zêr'în avîtê. <sup>12</sup>Û dora wê bilindayîya çar t'ilîya kevî çêkir, dora kevîya wê jî t'oqekî zêr'în avîtê. <sup>13</sup>Bona wê çar xelaqêd zêr'în r'okirin û ew xelaqana ber her çar niga, ser her çar e'nîşkava kirin, <sup>14</sup>Xelaq kevîyava bûn, wekî cîyêd destûya hebin ku t'ext bê hildanê. <sup>15</sup>Destû ji dara darcêwîyê çêkirin, ew zêr' kirin ku bi wan t'ext bê hildanê. <sup>16</sup>Derdanêd li ser t'ext sinî, t'as, k'as û cêr' pê zêr'ê xalis çêkirin, wekî bi wan dîyarîya serdakirinê bê dayînê.

**Şemdan**

<sup>17</sup>Ji p'arç'ekî zêr'ê xalis şemdan k'olandî çêkir, bingeha wê, stûna wê, t'asik, gul û sêvikêd wê h'emû ji wê derdik'etin. <sup>18</sup>K'êlekava şeş ç'iql derdik'etin, sê ç'iql alîkî şemdanêva bûn

û sê ç'iqil jî alîyê şemdanêyî dinva bûn. <sup>19</sup>Sê t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava li ser ç'iqilekî bûn. Sê t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava jî ser ç'iqilê din bûn, her şeş ç'iqilêd ku ji şemdanê derdik'etin awa bûn. <sup>20</sup>Çar t'asikêd mîna gulêd behîvê, sêvik û gulava stûna şemdanêva bûn. <sup>21</sup>Sêvikek bin her du ç'iqilêd şemdanêyê jêrinva, sêvikek bin her du ç'iqilêd ort'êva, sêvikek jî bin her du ç'iqilêd jorinva bû. Usa bona her şeş ç'iqilêd stûna şemdanê hebûn. <sup>22</sup>Sêvik û ç'iqilêd wê ji wê derdik'etin. H'emû ji p'arç'ekî zêr'ê xalis k'olandî hatibû çêkirinê. <sup>23</sup>H'eft ç'ira, destik û sinîyêd wê ji zêr'ê xalis jêr'a çêkirin. <sup>24</sup>Ew û h'emû hacetêd wê, ji telantek\* zêr'ê xalis çêkir.

### Gorîgeha bixûrê

<sup>25</sup>Gorîgeha bixûrê ji dara darcêwîyê çêkir, dirêjayîya wê zendek, berayîya wê zendek, ew çar goşe bû, bilindayîya wê du zend, stirûyêd wê jî ji wê bûn. <sup>26</sup>Jora wê, dora wê, stirûyêd wê bi zêr'ê xalis zêr' kir û dora lêva wê t'oqekî zêrîn avîtê. <sup>27</sup>Du xelaqêd zêr'în bona wê çêkir. Ew binê t'oqva avîtine her du alîya, wekî gava wê hildin cî hebin ku destûya têr'a derbaz kin. <sup>28</sup>Destû ji dara darcêwîyê çêkirin û ew zêr' kirin.

### R'ûnê r'ûnkirinê û bixûra bînxweş

<sup>29</sup>R'ûnê r'ûnkirinêyî pîroz û bixûra xalise bînxweş bi pisportî t'evdayî çêkir.

### Gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê

**38** Ji dara darcêwîyê<sup>f</sup> gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê çêkir, dirêjayîya wê pênc zend, berayîya wê pênc zend ew çar goşe bû, bilindayîya wê jî sê zend. <sup>2</sup>Ser her çar e'nîşkêd wê stirû derxistin, usa ku stirûyêd wê ji wê

\* 37:24 «Telantek» qasî 34 kîlogram bû.

bûn û ew sifir kirin. <sup>3</sup>H'emû hacetêd gorîgehê, awa gotî, t'ebaxêd wê, mer'ikêd wê, t'eştêd wê, goştgir û sinîyêd wê çêkirin. H'emû hacet ji sifir çêkirin. <sup>4</sup>Bona gorîgehê h'eta nîvê wê binê t'oqva ji sifir çêteke mîna t'or'ê çêkir. <sup>5</sup>Ser her çar e'nîşkêd çîta sifir, çar xelaq r'okirin ku destû têr'a bêne derbazkirinê. <sup>6</sup>Destû ji dara darcêwîyê çêkirin û ew sifir kirin. <sup>7</sup>Ew destû xelaqêd k'êleka gorîgehêr'a derbaz kirin, wekî bi wan bê hildanê. Gorîgeh vala pê t'exta ew çêkir.

### T'ešta sifir

<sup>8</sup>T'ešta sifir û bingeha wêye sifir ji wan neynikêd\* k'ulfetêd ku ber derê Konê Civînê xulamtî dikirin çêkir.

### H'ewşa Pîrozgehê

<sup>9</sup>H'ewş jî çêkir. Dirêjaya p'er'dêd ji k'itanê zirav-badayî ku dik'etine alîyê başûrê h'emû bi hevr'a sed zend bû. <sup>10</sup>Bîst stûnêd wan bîst bingehava ji sifir bûn. Çengelêd stûna û şîşêd wan ji zîv bûn. <sup>11</sup>Dirêjayîya p'er'dêd alîyê bakurê h'emû bi hevr'a sed zend bû, bîst stûnêd wan bîst bingehava ji sifir bûn. Çengelêd stûna û şîşêd wan ji zîv bûn. <sup>12</sup>Dirêjayîya p'er'dêd alîyê r'oavayê h'emû bi hevr'a pêncî zend bû, stûnêd wan dehe û bingehêd wan jî dehe bûn. Çengelêd stûna û şîşêd wan ji zîv bûn. <sup>13</sup>Dirêjayîya p'er'dêd alîyê r'ohilatê h'emû hevr'a pêncî zend bû. <sup>14</sup>P'er'dêd alîkî derî h'emû bi hevr'a panzdeh zend bû, stûnêd wan sisê û bingehêd wan jî sisê bûn. <sup>15</sup>Bona alîyê dinê, awa gotî p'er'dêd ber derê h'ewşê hin vî alî, hin jî alîyê dinê panzdeh zend, stûnêd wan sisê û bingehêd wan sisê bûn. <sup>16</sup>H'emû p'er'dêd dora h'ewşê ji k'itanê zirav-badayî bûn, <sup>17</sup>bingehêd stûna ji sifir bûn, lê çengelê stûna şîşêd wanva ji zîv bûn, serêd stûna zîvkirî bûn. H'emû stûnêd h'ewşê bi şîşêd zîv girêdayî bûn. <sup>18</sup>P'er'da ber derê h'ewşê, ji r'îsê şîn, şîrk,

\* 38:8 Wî çaxî neynikêd wan ji sifirê biriqî bû.

sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî bi xebata neqışandîtîyê bû. Dirêjaya wê bîst zend, berayîya p'er'dê pênc zend bû, weke p'er'dêd h'ewşê. <sup>19</sup>Çar stûnêd wêye serêd wan zîvkirî bûn, çar bingehêd wêye sifir bûn, çengelêd wê û şîşêd wê ji zîv bûn. <sup>20</sup>Singêd bona Konê Şe'detîyê û dora h'ewşê h'emû ji sifir bûn.

### H'esabêd Pîrozgehê

<sup>21</sup>Ev bûn h'esabê Konê Şe'detîyê, çawa ku Mûsa t'emî dabû, wekî lêwî bi serwêrîya Ît'amarê kur'ê k'ahîn Harûn h'esab kirin. <sup>22</sup>Bisalêlê kur'ê Êrîyê Hûr, ji qebîla Cihûda ev h'emû tişt kir, çi ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>23</sup>T'evî wî Oholîab kur'ê Ahîsamaxê ji qebîla Dan, ku hoste, h'unurmend û neqışandarê bi r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav bû. <sup>24</sup>H'emû zêr'êd ku bona şixulê çêkirina pîrozgehê hatibû xebatê, awa gotî zêr'ê ku çawa dîyarî hatibû dayînê, bîst nehe telant û h'efsid sî şêkil\* bû, anegorî şêkilê\*\* pîrozgehê. <sup>25</sup>Zîvêd h'esabkirina civînê\* sed telant û h'ezar h'efsid h'eftê pênc şêkil\*\* bû anegorî şêkilê pîrozgehê, <sup>26</sup>serê her merivê bîst salî û jor ku dihate jimarê nîv şêkil\* bû, awa gotî şesid sê h'ezar pênsid pêncî meriv. <sup>27</sup>Bona r'okirina bingeha pîrozgehê û bingeha p'er'da, sed telant\* zîv çû û bi wî sed bingeh hatine çêkirinê, telantek\*\* bona her bingehê. <sup>28</sup>Bi h'ezar h'efsid h'eftêpênc şêkil\* zîv çengel û şîşêd stûna çêkirin, serê stûna zîv kirin. <sup>29</sup>Sifirê ku

\* 38:24 «Bîst nehe telant û h'efsid sî şêkil» awa gotî 1000 kîlogram.

\*\* 38:24 «Şêkil» nêzîkî 12 giram bû.

\* 38:25 Binihêr'e Derk'etin 30:11-16.

\*\* 38:25 «Sed telant û h'ezar h'efsid h'eftê pênc şêkil» nêzîkî 3430 kîlogram bû.

\* 38:26 «Nîv şêkil» bi îbranî «bêkek awa gotî nîv şêkil anegorî şêkilê pîrozgehê».

\* 38:27 «Sed telant» qasî 3400 kîlogram bû.

\*\* 38:27 «Telantek» qasî 34 kîlogram bû.

\* 38:28 «H'ezar h'efsid h'eftêpênc şêkil» 30 kîlogram e.

çawa dîyarî hatibû dayînê, h'eftê telant û du h'ezar çarsid şêkil\* bû. <sup>30</sup>Bi wî bingehêd ber derê Konê Civînê, gorîgeha sifir çîta wêye sifir û h'emû hacetêd gorîgehê, <sup>31</sup>bingehêd dora h'ewşê, bingehêd ber derê h'ewşê, h'emû singêd Konê Şe'detîyê û h'emû singêd dora h'ewşê çêkirin.

### Êfod

**39** Bona qulixkirina Cîyê Pîrozda, k'incêd xizmetk'arîyê, ji r'îsê şîn, şîrk û sorê gevez çêkirin, usa jî bona Harûn k'incêd pîroz çêkirin, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa, <sup>2</sup>Êfod ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav-badayî çêkir. <sup>3</sup>Zêr' zirav pe'n kirin û ew mîna r'îs bir'in, wekî xebata nitirandinêda t'evî r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav bidine xebatê. <sup>4</sup>Sermilkêd hevvabûnê jêr'a çêkirin, ku ew her du serîyava dihatine hevvakirinê. <sup>5</sup>Benpişta li ser êfod jî mîna êfod hûnandî-nitirandî, ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û k'itanê zirav-badayî wêva hatibû çêkirinê, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>6</sup>Kevirêd onîks<sup>f</sup> hazir kirin, nava qavêd zêr'înda qaş kirin û li ser wan çawa mor tê k'olandinê, usa navêd zar'êd Îsraêl hatine k'olandinê. <sup>7</sup>Û ew li ser sermilkê êfodva kirin, ku zar'êd Îsraêl'r'a bibine kevirêd bîranînê, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa.

### R'extsîng

<sup>8</sup>R'extsîng nitirandî wî cûr'ê çêkirina êfodda çêkirin. Ew ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî çêkirin. <sup>9</sup>R'extsîng du ta qatkirî çargoşe bû, dirêjaya wê bihustek û beraya wê jî bihustek, du ta qatkirî. <sup>10</sup>Li ser wê çar cêrge kevir qaş kirin. Cêrge e'wlin: Sardîyon<sup>f</sup>, topaz<sup>f</sup> û zimrûd, <sup>11</sup>cêrge duda: Karbûnkûlf, safîr û almas, <sup>12</sup>cêrge sisîya: Yaxonît, agat<sup>f</sup> û amêstîs, <sup>13</sup>cêrge çara: Xrîzolît, onîks

\* 38:29 «H'eftê telant û du h'ezar çarsid şêkil» 2425 kîlogram bû.

û yaspîsf, evana qavê zêr'da qaşkirî bûn. <sup>14</sup> Ev kevir donzdeh h'eb bûn, anegorî navêd zar'êd Îsraêl, mîna morê k'olayî ser her kevirî navekî wan hatibû k'olandinê bona donzdeh qebîla. <sup>15</sup> Ser r'extsîng zincîrêd badayî çêkîrin, ew vegirtî ji zêr'ê xalis bûn. <sup>16</sup> Du qavêd zêr' û du xelaqêd zêr' çêkîrin û ew her du xelaq, ser her du serê r'extsîngva kirin. <sup>17</sup> Ew her du zincîrêd zêr', her du xelaqêd ser r'extsîngva kirin. <sup>18</sup> Ê her du serîyêd zincîraye din her du qavava kirin, paşê alîyê pêşîyêva sermilkê êfodva kirin. <sup>19</sup> Du xelaqêd zêr'îne din çêkîrin ew bin r'extsîngva her du niç'êd jêrinva alîyê êfodva kirin. <sup>20</sup> Du xelaqêd zêr'îne din jî çêkîrin, ew bin her du niç'êd sermilkêd êfodva kirin. Alîyê pêşîyêva ber cîyê pêvakiîva ser benpiştâ êfodva kirin. <sup>21</sup> Bi qeyt'ana şîn xelaqêd r'extsîng xelaqêd êfodva kirin, ku ew ser benpiştâ êfod be û r'extsîng ji êfod neqete, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa.

### Çux

<sup>22</sup> Çuxê êfod xur'û bi r'engê şîn hûnandin. <sup>23</sup> Nava wî vekirî bû mîna berstûyê êlekzirih', dora wî dirûtî bû ku ji ber hev neçe. <sup>24</sup> P'êşa çux ji r'îsê şîn, şîrk, sorê gevezî badayî h'inar r'îşî kirin. <sup>25</sup> Ji zêr'ê xalis zengil çêkîrin, ew zengil li navbera her h'inarêda, li ser p'êşa çuxva kirin. <sup>26</sup> Li ser p'êşa çuxê xizmetk'arîyê, navbera her h'inarêda zengilek hebû. Çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa.

### K'incêd Harûn û zar'êd wî

<sup>27</sup> Bona Harûn û kur'êd wî bi xebata hûnandîtîyê ji k'itanê zirav kiras çêkîrin. <sup>28</sup> Usa jî ji k'itanê zirav p'ap'ax, k'oloz çêkîrin û ji k'itanê zirav-badayî k'incêd binî çêkîrin. <sup>29</sup> Benpişt jî ji k'itanê zirav-badayî, ji r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez, bi xebata neqîşandîtîyê çêkir, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>30</sup> Bere'nîya k'ofîya pîroz ji zêr'ê xalis çêkîrin û ser wê mîna mor k'olandinê nivîsîn: «Pîroz Xudanr'a». <sup>31</sup> Ew avîtine li ser qeyt'ana şîn, wekî jorva li ser p'ap'axva bê girêdanê, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa.

### Xilazkirina xebatê

<sup>32</sup>Bi vî cûr'eyî h'emû şixulêd li ser Konê Şe'detîyê, awa gotî Konê Civînê hate sêrî. Zar'êd Îsraêl her tişt, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa, usa jî kirin. <sup>33</sup>Û Konê Şe'detîyê anîne cem Mûsa, awa gotî: Kon û h'emû navmala wê, qemitokêd wê û çîtêd wê, destûyêd wê, stûn û bingehêd wê, <sup>34</sup>sergirtina ji ç'ermêd beranaye sor r'engkirî û serk'êşa ji ç'ermêd ga-me'sî û p'er'da navbir'îyê, <sup>35</sup>Sindoqa Şe'detîyê û destûyêd wê, qalp'axê baxşandinê, <sup>36</sup>t'ext û h'emû derdanêd wê û nanê Xwedêr'a dayî, <sup>37</sup>şemdana ji zêrê xalis ç'irayêd sere cî bi cî r'êz kirî, h'emû hacetêd xweva û bizirê r'onayê, <sup>38</sup>gorîgeha zêr'în, r'ûnê r'ûnkirinê, bixûra bînxweş, p'er'da ber derê kon, <sup>39</sup>gorîgeha sifir û çîta wêye sifir, destûyêd wê û h'emû hacetêd wê, t'eşt û bingeha wê, <sup>40</sup>p'er'dêd h'ewşê, stûnêd wê, bingehêd wê, p'er'da ber derê h'ewşê, hebinêd wê û singêd wê, h'emû hacetêd xizmetk'arîyê, bona Konê Şe'detîyê, awa gotî Konê Civînê, <sup>41</sup>k'incêd qulixkirinêye bona xizmetk'arîya Cîyê Pîrozda, k'incêd pîroz k'ahîn<sup>f</sup> Harûnr'a, usa jî k'inca kur'êd wîr'a ku k'ahîntîyê bikin. <sup>42</sup>Zar'êd Îsraêl her tişt çawa Xudan t'emî dabû Mûsa, usa jî kirin. <sup>43</sup>Mûsa dîna xwe da h'emû tiştê çêkirî, ku va ye çawa ku Xudan t'emî dabû wana, usa jî kirine. Mûsa dua wan kir.

### T'emîyêd Xudan<sup>f</sup> bona Konê Şe'detîyê

**40** Xudan t'evî Mûsa xeber da û gotê: <sup>2</sup>«R'oja yekêye meha pêşin, Konê Şe'detîyê, awa gotî Konê Civînê vegirî. <sup>3</sup>Sindoqa<sup>f</sup> Şe'detîyê bibî hindur' û p'er'dê k'aşî ber kî. <sup>4</sup>T'ext bînî hindur' û her tiştê wî ser cî bi cî r'êz kî, şemdanê bînî hindur', ç'irayêd wê vêxî û daynî ser şemdanê. <sup>5</sup>Gorîgeha bixûrêyê<sup>f</sup> zêr'în daynî pêşberî Sindoqa Şe'detîyê û p'er'dê bavêjî ber derê Konê Şe'detîyê. <sup>6</sup>Gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê daynî li ber derê Konê Şe'detîyê, awa gotî Konê Civînê. <sup>7</sup>T'eştê daynî li navbera Konê Civînê û gorîgehê, avê dagirî. <sup>8</sup>Dora wê h'ewşê çêke û p'er'dê bavêje ber derê h'ewşê. <sup>9</sup>R'ûnê r'ûnkirinê hildî,

Konê Şe'detîyê û h'emû çî ku hindur'da heye r'ûn kî, wê û h'emû nav mala wê pîroz kî, wekî ew pîroz be. <sup>10</sup> Usa jî gorîgehaf dîyarîya t'evayîşewatê û h'emû hacetêd wê r'ûn kî, gorîgehê pîroz kî, wekî gorîgeh bibe ya here pîroz. <sup>11</sup> T'eştê û bingeha wê r'ûn kî û wê pîroz kî. <sup>12</sup> Harûn û kur'êd wî bînî li ber derê Konêf Civînê û wan bi avê bişoyî. <sup>13</sup> K'incêd pîroz Harûn kî, wî r'ûn kî û wî pîroz kî, ku k'ahîntîyê minr'a bike. <sup>14</sup> Kur'êd wî jî bînî û kirasa li wan kî. <sup>15</sup> Wan jî usa r'ûn kî, çawa te bavê wan r'ûn kir, ku ew minr'a k'ahîntîyê bikin. Ev r'ûnkirina wan li nav nisilêd wanda bibe bona k'ahîntîya wane h'eta-h'etayê».

### Vegirtin û pîrozkirina Konê Şe'detîyê

<sup>16</sup> Mûsa her tişt çawa ku Xudan t'emî dabû usa jî kir. <sup>17</sup> Sala duda, yekê meha pêşin, Konê Şe'detîyê hate vegirtinê. <sup>18</sup> Mûsa Konê Şe'detîyê vegirt, bingehêd wan danîn, çîtêd wan danîn, destû derbaz kirin û stûn dane sekinandinê. <sup>19</sup> Sergir avîte ser Konê Şe'detîyê û serk'êş jorda k'işande ser kon, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>20</sup> Şe'detî hilda û kire sindoqê, destû xelaqêd sindoqêr'a derbaz kirin û qalp'axê baxşandinê jorva danî li ser sindoqê. <sup>21</sup> Sindoq bire hindur'ê Konê Şe'detîyê, p'er'de k'aşî ber kir û Sindoqa Şe'detîyê veşart, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>22</sup> T'ext danî hindur'ê Konê Civînê, alîyê bakura kon vî alîyê p'er'dê der. <sup>23</sup> Ê ser wê li ber Xudan nan cî bi cî r'êz kir, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>24</sup> Şemdan danî hindur'ê Konê Civînê, pêşberî t'ext alîyê başûra kon <sup>25</sup> û li ber Xudan ç'ira vêxistin û danîne ser şemdanê, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>26</sup> Gorîgeha zêr'în danî hindur'ê Konê Civînê pêşberî p'er'dê <sup>27</sup> û li ser wê bixûra bînxweş agirşewatî kir, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>28</sup> P'er'de avîte li ber derê Konê Şe'detîyê. <sup>29</sup> Gorîgeha dîyarîya t'evayîşewatê danî li ber derê Konê Şe'detîyê, awa gotî Konê Civînê û li ser wê dîyarîya t'evayîşewatê û dîyarîya nanî da, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>30</sup> T'eşt danî li navbera Konê Civînê û gorîgehê û bona şûştin-veşûştinê av dagirt. <sup>31</sup> Mûsa, Harûn

û kur'êd wî dest û p'îyêd xwe ji wê dişûştin. <sup>32</sup>Gava ku di-  
k'etine Konê Civînê û nêzîkî gorîgehê dibûn xwe dişûştin,  
çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa. <sup>33</sup>H'ewşa dorberê Konê  
Şe'detîyê û gorîgehê dada û p'er'de avîte li ber derê h'ewşê.  
Bi vî awayî Mûsa şixul xilaz kir.

### **E'wr li ser Konê Civînê**

<sup>34</sup>E'wr Konê Civînê nixamt û r'ûmeta Xudan Konê Şe'detîyê  
dagirt. <sup>35</sup>Mûsa nikaribû bik'eta Konê Civînê, çimkî e'wr  
danîbû li ser kon û r'ûmeta Xudan Konê Şe'detîyê dagirtibû.  
<sup>36</sup>Her gava e'wr ji ser Konê Şe'detîyê r'adibû, hingê zar'êd  
Îsraêl t'emamîya r'êwîtiya xweda r'êdik'etin, <sup>37</sup>lê heger e'wr  
r'anedibû ew r'ê nedik'etin, h'eta wê r'oja ku e'wr r'abûya.  
<sup>38</sup>E'wrê Xudan r'ojê li ser Konê Şe'detîyê bû, şev jî e'wrda agir  
hebû, li ber ç'e'vê t'emamîya mala Îsraêl, nava t'emamîya  
r'êwîtiya wanda.

# Qanûna K'ahîntîyê

## Pêşgotin

Navê vê k'itêbê Bîblîya îbranîdaf ji xebera pêşine ji vê t êk'stê pêşda t ê, awa gotî «Û gazî kir...». Navkirina «Qanûna K'ahîntîyê», ji welger'andina yûnanîye kevin t ê, anegorî wê t êk'stê hatiye hildanê. Vê k'itêbêda gelek qeyde-qanûnêd r'uh'anî hene, k'îjan ku bona k'arêd k'ahînêdf Îsraêlêyef ji qebîla Lêwî ne. Qewimandina k'itêbêda dide nîşankirinê, çawa dûmayîkirina qanûna Xwedê, k'îjan ku li ser ç'îyayê Sînayê Mûsar'a hate dayînê, ya ku k'itêba Derk'etinêda destpêdîbû. Destpêbûna k'itêbê (s.1-10) bona borcê k'ahîna t ê gotinê, ku çawa ew gere qulix kin, qurbana bidin. Me'na qurbandayînêye pêşin vê yekêda bû, wekî meriv bike ku yektîya xweye t'evî Xwedêyê xwe, bide k'ifşê. R'azîbûna xwe bide Xwedê bona p'êşk'êşêd wî û pesina bide wî û usa jî bike ku hêrsa Xwedê bona gune û neheqîyêd wî r'anebe. Paşê (s.11-16) Îsraêlr'a t'emî t êne dayînê, wekî bikaribin pîroz û ne pîroz, h'elal û neh'elal ji hev derxin. E'mirê wanda ne t'enê gere qurban bihatana dayînê, yan xwe paqij xweykirana, lê usa jî borcê gelek tiştêd mayîne hindava malê, cime'tê û malhebûnêda stûyê wanda bû. Bona wan xilazîya k'itêbêda (s.17-27) nivîsar e. Qedandina van borca, gere alîk'arîya cime'ta Îsraêl bikira, ku ew layîqî Xwedê bimana, k'îjan ku ew ji nava h'emû miletêd dinê bijart û ew kire miletê xwe. Îsraêl bimbarek-pîrozîke mezin stand: H'izûrîya Xwedêyê pîroz t'evî miletê wî bû. Nîşana vê h'izûrîyê Pîrozgeh bû,

ya ku dihate cîguhastîkirinê, awa gotî Konêf Civîne bû. Merivêd ku ji miletê pîroz hatibûne gazîkirinê, ne ku t'enê gerekê qeyde-qanûn biqedandana, lê usa jî gerekê hindava hevduda r'ast bin, xemê e'rd û h'eywanêd xwe jî bik'işînin. Hinek qanûnêd wan miletêd R'ohilata Nêzîke berê mîna qanûnêd vê k'itêbêdaye nivîsar in. Lê Qanûna K'ahîntîyêda e'se neheqîyêd miqabilî Xwedê têne pêşgirtinê û bi mirinê dihatine cezakirinê û usa jî neheqîyêd hindava hebûkêda, ku bi cirma dihatine k'işandinê. Xêncî vê yekê, h'îmê van qanûna dide ce'dandinê, ku her tiştîda gerekê Xwedê xweş bîn. Bijarebûna miletê Îsraêl mecalê dide Îsraêl, wekî ew bibe t'ertzê p'ergalîyê û wî cûr'e jîyînê, k'îjan ku Xwedê ji h'emû meriva dixwaze. Ev yek hema nişkêva nîbû, ku pey-r'a Îsa Mesîh berbir'î k'itêba Qanûna K'ahîntîyê 19:18 dibe, dibêje: «...hevalê xwe weke xwe h'iz ke», çawa yek ji her du t'emîyêd serekeye t'emamîya qanûna pîroz, t'evî t'emîya, Xwedê xwe h'iz ke.

### Qanûna qurbandayîne

**1** Xudan<sup>f</sup> ji Konêf Civîne gazî Mûsa kir û gote wî: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl<sup>f</sup> xeber de û bêje wan: «Gava yekî ji we qurbanekê Xudanr'a bide, bira ew qurbana we ji gar'anê be yan ji kêrî. <sup>3</sup>Heger qurbana wîye dîyarîya<sup>f</sup> t'evayîşewatê ji gar'anê ye, bira ew yê nêr û bêqusûr bîne li ber derê Konê Civîne, ku li ber Xudan bê qebûlkinê. <sup>4</sup>Bira ew destê xwe dayne li ser serê dîyarîya t'evayîşewatê ku bê qebûlkinê, bona k'ewandina gunêd wî. <sup>5</sup>Bira ew canega li ber Xudan serjêke û kur'êd Harûnne k'ahîn<sup>f</sup> xûnê hildin bir'eşînine li ser her alîyêd gorîgeha<sup>f</sup> li ber derê Konê Civîne. <sup>6</sup>Bira dîyarîya t'evayîşewatê p'ost ke û çîtî-çîtî hûr ke. <sup>7</sup>Hingê kur'êd Harûnê k'ahîn agir daynine li ser gorîgehê û qirşa bidine li ser êgir. <sup>8</sup>Kur'êd Harûnne k'ahîn bira wan çîtîya, serî û donva bidine

li ser wan qirşêd agirê li ser gorîgehê. <sup>9</sup>Lê navdil û niga jî, bira yê dîyardar pê avê bişo û k'ahîn gişkî li ser gorîgehê bişewitîne, çawa dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan.

<sup>10</sup>Heger qurbana wîye dîyarîya t'evayîşewatê ji kêrî ye, awa gotî ji pêz yan bizina ye, bira ew yê nêr û bêqusûr bide. <sup>11</sup>Wî li ber Xudan alîyê bakura gorîgehê serjêke û kur'êd Harûnne k'ahîn xûna wî li ser her alîyêd gorîgehê bir'eşînin. <sup>12</sup>Û çîtî-çîtî hûr ke, serî û donva k'ahîn dayne li ser qirşêd agirê li ser gorîgehê. <sup>13</sup>Lê navdil û niga jî, bira yê dîyardar pê avê bişo û k'ahîn gişkî bîne li ser gorîgehê bişewitîne, çawa dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş bona Xudan.

<sup>14</sup>Heger qurbana wîye dîyarîya t'evayîşewatê bona Xudan ji teyreda ye, hingê bira qurbana xwe ji fatimoka yan jî ji cûcûkêd kewa bide. <sup>15</sup>Bira k'ahîn wê bîne ber gorîgehê, serî lê hilqetîne û başqe li ser gorîgehê bişewitîne û xûn k'êleka gorîgehêda her'e. <sup>16</sup>Û qaçar'ûşka\* wê e'debêva derxe alîyê r'ohilata gorîgehêva bavêje k'ozîdangê. <sup>17</sup>Ewê ji baskada vejene, bêyî ji hev qetandin, bira k'ahîn li ser gorîgehê, li ser darê ser êgir bişewitîne. Eva dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan.

### Dîyarîyêd<sup>f</sup> nanî

**2**Heger yek dîyarîya nanî Xudanr'a bide, dîyarîya wî bira ji arê xas be, r'ûn serda ke û bixûrêf dayne ser. <sup>2</sup>Wê bînin cem kur'êd Harûnne k'ahîn, bira k'ahîn ji wê k'ulmek t'ijî ar t'evî wî r'ûnî û h'emû bixûrêf hilde û bona bîranînê li ser gorîgehê bişewitîne, çawa dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan. <sup>3</sup>Lê p'ara dîyarîya nanîye mayî, bira Harûn û kur'êd wîr'a

---

\* 1:16 Qidûtik.

bimîne. Eva p'ara ji dîyarîyêd şewatêye Xudanr'a dayîye here pîroz e.

<sup>4</sup>Heger nanê tendûrêda lêxistî dîyarîya nanî bidî, ew gerekê ji arê xas r'ûnda stirayî bok'onêd bê hevîrtir'sşk bin, yan jî gerekê loşêd bê hevîrtir'sşk r'ûnkirî bin. <sup>5</sup>Lê heger dîyarîya te ji nanê li ser sêlê lêxistî ye, ew gerekê ji arê xas r'ûnda stirayî û bê hevîrtir'sşk be. <sup>6</sup>Wî ker-kerî kî, r'ûn serda kî. Eva dîyarîya nanî ye.

<sup>7</sup>Heger dîyarîya teye nanî t'awêda pijandî be, bira ew ji arê xas r'ûnda stirayî be. <sup>8</sup>Ji van tiştta dîyarîya nanî Xudanr'a bibî, li ber k'ahîn daynî û ew nêzîkî gorîgehê ke. <sup>9</sup>K'ahîn bira p'arekê bona bîranînê ji dîyarîya nanî hilde û li ser gorîgehê bişewitîne, eva dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan. <sup>10</sup>Lê p'ara dîyarîya nanîye mayî, bira Harûn û kur'êd wîr'a bimîne. Eva p'ara ji dîyarîyêd şewatêye Xudanr'a dayîye here pîroz e.

<sup>11</sup>T'u car nava dîyarîya nanîye ku hûn Xudanr'a bîdin, hevîrtir'sşk t'unebe. Ne hevîrtir'sşk, ne hingiv çawa dîyarîya şewatê bona Xudan nedin. <sup>12</sup>Hevîrtir'sşk û hingiv çawa dîyarîyêd berê pêşin Xudanr'a dikarin bînin, lê li ser gorîgehê gerekê neyê şewitandinê bona bînxweşîyê. <sup>13</sup>H'emû dîyarîyêd xweye nanî xwê kî û xwêya\* peymanaf Xwedêyê xwe ji nava dîyarîyêd xwe kêm nekî, t'evî h'emû h'edîyêd xwe xwê jî bidî.

<sup>14</sup>Heger dîyarîya nanîye berêd<sup>f</sup> deremeta pêşin Xudanr'a bidî, bona dîyarîya berê pêşin ji simbilêd şîne firikandîye li ser êgir qelandî bide. <sup>15</sup>R'ûn serda kî û bixûrê bidî ser. Eva dîyarîya nanî ye. <sup>16</sup>K'ahîn çawa dîyarîya şewatêye bona Xudan, wê p'areke ji dîyarîyê, awa gotî ji qeynokêd, r'ûn t'evî h'emû bixûrê çawa dîyarîya bîr anîn bişewitîne.

---

\* 2:13 Xwê bona h'emû dîyarîya lazim bû. Tişt têne xwêkirinê ku xirab nebin. Lema ew nîşana peymana h'eta-h'etayê ye.

### Dîyarîyaf heleqetîyê

**3** Heger qurbana yekî dîyarîya heleqetîyê\* ye û ew dewara nêr be yan mê be, ew gerekê h'eywana bê qusûr Xudanr'a bide. <sup>2</sup>Bira ew destê xwe dayne li ser serê qurbana xwe û wê li ber derê Konê Civînê serjêke, kur'êd Harûnne k'ahîn xûnê bir'eşînine li ser her alîyêd gorîgehê. <sup>3</sup>Û ji dîyarîya heleqetîyê, çawa dîyarîya şewatê Xudanr'a van tiştê bide: Bezê serzik, h'emû bezê navdil, <sup>4</sup>her du gur'ç'ika bezê ser û k'êlekava, betanê cegerê gur'ç'ikava t'evayî derxe. <sup>5</sup>Kur'êd Harûn vana li ser gorîgehê t'evî dîyarîya t'evayîşewatêye li ser qirşêd li ser êgir bişewitîn. Eva dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan.

<sup>6</sup>Lê heger ew ji kerê pêz qurbana dîyarîya heleqetîyê Xudanr'a bide, ew nêr yan mê be, gerekê bêqusûr be. <sup>7</sup>Heger ew berxekê xwer'a bike qurban, bira ew li ber Xudan bide. <sup>8</sup>Bira ew destê xwe dayne li ser serê qurbana xwe û wê li ber Konê Civînê serjêke û kur'êd Harûn xûnê li ser her alîyêd gorîgehê bir'eşînin. <sup>9</sup>Û ji dîyarîya heleqetîyê çawa dîyarîya şewatê Xudanr'a van tiştê bide: Bezê wê, dawa wê pêva qarç'ikêda bir'î, bezê serzik û h'emû bezê navdil, <sup>10</sup>her du gur'ç'ika bezê ser û k'êlekava, betanê cegerê gur'ç'ikava t'evayî derxe. <sup>11</sup>Û k'ahîn vana li ser gorîgehê bişewitîne, çawa dîyarîya xurê şewatêye bona Xudan.

<sup>12</sup>Lê heger qurbana wî bizin e, bira bîne li ber Xudan, <sup>13</sup>destê xwe dayne li ser serê wê û li ber Konê Civînê wê serjêke. Kur'êd Harûn xûnê li ser her alîyêd gorîgehê bir'eşînin. <sup>14</sup>Û ew ji wê qurbana xweye dîyarîya şewatê Xudanr'a van tiştê bide: Bezê serzik, h'emû bezê navdil, <sup>15</sup>her du gur'ç'ika bezê ser û k'êlekava, betanê cegerê gur'ç'ikava t'evayî derxe. <sup>16</sup>K'ahîn vana li ser gorîgehê bişewitîne, eva bibe dîyarîya

---

\* 3:1 Nava hinek welger'andinada «Dîyarîya e'dilayê».

xurê şewatêye bînxweş. H'emû bez p'ara Xudan e. <sup>17</sup>Eva nava nisilêd weda, cî-warêd weda bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê, ku t'u car ne bez bixwin, ne jî xûnê».

### **Qurbanêd bona gunêd bê h'emdê xwe kirî**

**4** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «Heger kesek bê h'emdê xwe gune bike û ji wan t'emîyêd Xudane dayî şaş be, yekî ji wan neqedîne, <sup>3</sup>yan heger serekk'ahîn\* gune bike, cime'tê xwer'a gunek'ar ke, gerekê ew bona gunê xweyî kirî, ji dêwêr canegakî bêqusûr, çawa dîyarîyaf paqijbûnê bide Xudan. <sup>4</sup>Canegê bira bîne li ber derê Konê Civînê li ber Xudan, destê xwe dayne li ser serê canegê û li ber Xudan canegê serjêke. <sup>5</sup>Serekk'ahînf bira ji xûna canegê hilde bîne Konê Civînê, <sup>6</sup>û ew k'ahîn t'ilîya xwe xûnêda ke, xûnê h'eft cara li ber Xudan bir'eşîne li ber p'er'da pîrozgehê. <sup>7</sup>Û serekk'ahîn bira ji wê xûnê li stirûyêd wê gorîgeha bixûrêye bînxweş xe, ya ku Konê Civînêda li ber Xudan e. Xûna canegêye mayî jî bir'êje jêra gorîgeha t'evayîşewatêye li ber derê Konê Civînê. <sup>8</sup>Û h'emû bezê canegê bona dîyarîya paqijbûnê jê bê derxistin: Bezê serzik, h'emû bezê navdil, <sup>9</sup>her du gur'ç'ika bezê ser û k'êlekava, betanê cegerê gur'ç'ikava t'evayî derxe, <sup>10</sup>çawa ji canegê dîyarîya heleqetîyê têne derxistinê. Serekk'ahîn vana li ser gorîgeha t'evayîşewatê bişewitîne. <sup>11</sup>Lê ç'ermê canegê, t'emamîya goşt, ser-p'î, navdil, e'debêva, <sup>12</sup>awa gotî ji canegê çi mabe, bibe ji zomê der cîkî paqij, cîyê k'ozî ku tê r'êtinê, li ser qırşa pê êgir bişewitîne. Cîyê k'ozî ku tê r'êtinê bira bê şewitandinê.

### **Qurbana bona gunê t'emamîya cime'tê**

<sup>13</sup>Lê heger t'emamîya civîna Îsraêl pêva bê h'emdê xwe şaş be û ev yek ji civînê veşartî bimîne, ji wan h'emû t'emîyêd

---

\* 4:3 Îbranîf xeber bi xeber: «K'ahînê r'ûnkirî», binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 6:22, 8:12, 16:32.

Xudane dayî yekî neqedînin û gunek'ar derên, <sup>14</sup>gava ew gunê wanî kirî derê, bira civîn ji dêwêr canegakî bona dîyarîya paqijbûnê bidin û bînin li ber Konê Civînê. <sup>15</sup>R'ûspîyêd cime'tê bira li ber Xudan destêd xwe daynine li ser serê canegê û li ber Xudan canega bê serjêkirinê. <sup>16</sup>Û serekk'ahîn ji xûna canegê hilde bîne Konê Civînê. <sup>17</sup>Ew k'ahîn t'ilîya xwe xûnêda ke li ber Xudan h'eft cara bir'eşîne li ber p'er'dê. <sup>18</sup>Û ji wê xûnê stirûyêd wê gorîgeha li ber Xudan xe, ya ku di Konê Civînêda ye û xûna mayî jî bir'êje jêra gorîgeha t'evayîşewatêye li ber derê Konê Civînê. <sup>19</sup>Û h'emû bezê wî ji wî derxe û li ser gorîgehê bişewitîne. <sup>20</sup>Vî canegayî jî usa bike, çawa ku canegayê bona dîyarîya paqijbûnê kir, serekk'ahîn bona wan bira k'ewandinê bike û li wan wê bê baxşandinê. <sup>21</sup>Paşê canegê ji zomê derxe der bişewitîne, çawa canegayê pêşin şewitand. Eva dîyarîya paqijbûnê ye bona cime'tê.

### **Dîyarîya bona gunê serwêra**

<sup>22</sup>Heger serwêrek bêh'emdê xwe gune bike û ji wan h'emû t'emîyêd Xudan Xwedêyê xwe yekî neqedîne, ew gunek'ar dertê, <sup>23</sup>gava gunê wî wîva bê e'yankirinê, hingê bona xwe bira ji bizina nêrikî bêqusûr qurban bîne. <sup>24</sup>Ew destê xwe dayne li ser serê nêrî û li ber Xudan wî cîyê ku dîyarîya t'evayîşewatê tê serjêkirinê serjêke. Eva dîyarîya paqijbûnê ye. <sup>25</sup>K'ahîn bira t'ilîya xwe xûna dîyarîya paqijbûnêda ke û li stirûyêd gorîgeha t'evayîşewatê xe û xûna mayî jî bir'êje jêra gorîgeha t'evayîşewatê. <sup>26</sup>H'emû bezê wî, mîna bezê dîyarîya heleqetîyê li ser gorîgehê bira bişewitîne. Bi vî awayî k'ahîn bona gunê wî k'ewandinê bike û wê li wî bê baxşandinê.

### **Qurbana bona gunê kesekî**

<sup>27</sup>Heger yekî ji millet bêh'emdê xwe gune bike, ji wan t'emîyêd Xudanê xwe yekî neqedîne, ew gunek'ar dertê <sup>28</sup>û gava gunê wî wîva bê e'yankirinê, bira bona gunê xweyî

kirî bizineke bêqusûr qurban bîne. <sup>29</sup>Ew destê xwe dayne li ser serê dîyarîya paqijbûnê û dîyarîya paqijbûnê wî cîyê dîyarîya t'evayîşewatê bê serjêkirinê. <sup>30</sup>K'ahîn bira t'ilîya xwe wê xûnêda ke û li stirûyêd gorîgeha t'evayîşewatê xe û xûna mayî jî bir'êje jêra gorîgehê. <sup>31</sup>H'emû bezê bizinê derxe, çawa bezê dîyarîya heleqetîyê tê derxistinê û k'ahîn wî bezî li ber Xudan li ser gorîgehê bona bînxweşîyê bişewitîne. Bi vî awayî k'ahîn bona wî k'ewandinê bike û li wî wê bê baxşandinê.

<sup>32</sup>Lê heger bexê bona dîyarîya paqijbûnê bide, bira yeke mêye bê qusûr bîne. <sup>33</sup>Destê xwe dayne li ser serê dîyarîya paqijbûnê, di wî cîyê dîyarîya t'evayîşewatê tê serjêkirinê, wê dîyarîya paqijbûnê serjêke. <sup>34</sup>K'ahîn t'ilîya xwe xûna dîyarîya paqijbûnêda ke û li stirûyêd gorîgeha t'evayîşewatê xe û xûna mayî jî bir'êje jêra gorîgehê. <sup>35</sup>H'emû bezê wê derxe, çawa bezê berxa dîyarîya heleqetîyê tê derxistinê û k'ahîn wî bezî t'evî dîyarîyêd şewatêye bona Xudan li ser gorîgehê bişewitîne. Bi vî awayî k'ahîn bona gunê wîyî kirî k'ewandinê bike û li wî wê bê baxşandinê.

### Mecalêd bona guna paqijbûn

**5** Heger yek bê gazîkirinê li ber dîwanê, ewî tişteke bihîstibe yan şe'de be û vê yekê veşêre, hingê ew wî guneyî dike stûyê xwe.

<sup>2</sup>Heger yek ji nezanîya xwe tişteki nepaqij k'eve, awa gotî cendekê r'e'wirekî, cendekê h'eywanekî yan cendekê şûlikîkî neh'elal k'eve, ew xwe dih'er'imîne û sûcdar dike. <sup>3</sup>Heger yek ji nezanîya xwe k'irêtîya mêriv k'eve, tişteki k'irêt ku mêriv dikare bih'er'imîne, gava ew bizanibe hingê ewê sûcdar be. <sup>4</sup>Heger yek ji nezanîya xwe, pê devê xwe bona qencîyê yan xirabîyê sond bixwe, (çawa meriv pê sondêd xwe tiştêd p'ûç' dibêjin), gava ew bizanibe, hingê ji van yekîda ewê sûcdar be. <sup>5</sup>Heger ji van yeka tiştekiîda sûcdar be û xwe mikur' bê, gunê xwe bide r'ûyê xwe, <sup>6</sup> bira bona

gunê xweyî kirî Xudanr'a ji kêrî berxeke mê, yan jî kareke mê bona neheqîya xwe çawa dîyarîya paqijbûnê bîne. Bira k'ahîn bona gunê wî k'ewandinê bike.

<sup>7</sup>Heger dêstda t'une, nikare ji ber neheqîya xweva pêz bîne, bira du fatimoka yan jî du cûcûkêd kewa Xudanr'a bîne, yek bona dîyarîya paqijbûnê, yek jî bona dîyarîya t'evayîşewatê. <sup>8</sup>Bira ew vana bîne li ber k'ahîn, pêşîyê dîyarîya paqijbûnê bide, serî ji stukurê hilqetîne, lê jê neqetîne. <sup>9</sup>Û ji xûna dîyarîya paqijbûnê bir'eşîne dîwarê gorîgehê, xûna mayî jî bira biniqite jêra gorîgehê. Eva dîyarîya paqijbûnê ye. <sup>10</sup>Ya din jî anegorî qîrara dîyarîya t'evayîşewatê bide û k'ahîn bona gunê wîyî kirî k'ewandinê bike û wê li wî bê baxşandinê. <sup>11</sup>Lê heger dêstda t'une, ew nikare du fatimoka yan du cûcûkêd kewa jî bîne, hingê bira yê gune kirîye bona h'edîya xwe p'areke êfayê ji deha yek\* arê xas çawa dîyarîya paqijbûnê bîne. Ne r'ûn bike ser ne jî bixûrêf, çimkî eva dîyarîya paqijbûnê ye. <sup>12</sup>Ew vî arî bîne cem k'ahîn, k'ahîn bona bîranînê bi k'ulma xwe t'ijî arê xas hilde, li ser gorîgehê t'evî dîyarîyêd şewatêye bona Xudan bişewitîne. Eva dîyarîya paqijbûnê ye. <sup>13</sup>Û k'ahîn bona gunê wîyî kirî k'ewandinê bike, çi derecêda jî çi kiribe wê li wî bê baxşandinê. Û yê mayî jî mîna dîyarîya nanî k'ahîn'r'a bimîne».

### **Qanûna dîyarîyaf ji bervadayînê**

<sup>14</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>15</sup>«Heger yek borcê xwe neqedîne û bê h'emdê xwe hindava tiştêd Xudane pîrozda\* gune bike, bira ji ber neheqîya xweva ji kêrî beranekî bêqusûr, weke wî qîmetê teyî pê şêkilêd\*\* zîvîn k'ifşkirî, anegorî şêkilêd pîrozgehê Xudanr'a dîyarîya ji bervadayînê bîne. <sup>16</sup>Bira

---

\* 5:11 Awa gotî «kîlogramek». Êfa derdanekî 10 lîtirê bû.

\* 5:15 Tê fe'mkirinê ku ew tiştêd ku gerekê Xudanr'a bihatana dayînê, awa gotî dîyarîya berêd<sup>f</sup> deremeta pêşin, dehek<sup>f</sup>, nixurî û yêd mayîne ku neyêne dayînê.

\*\* 5:15 «Şêkil» nêzîkî 12 giram bû.

cirma wê zîyana ku daye tiştêd pîroz bik'işîne, usa jî p'areke ji pênc p'ara li serda zêde ke, bide k'ahîn. Û k'ahîn bira pê wî beranê dîyarîya ji bervadayînê k'ewandinê bike û wê li wî bê baxşandinê. <sup>17</sup>Heger yek bê h'emdê xwe gune bike û ji wan t'emîyêd Xudane dayî şaş be, yekî ji wan neqedîne, ew sûcdar dibe û gune dike stûyê xwe. <sup>18</sup>Bira ew weke wî qîmetê teyî k'ifşkirî, ji kêrî beranekî bêqusûr bona dîyarîya ji bervadayînê k'ahîn'r'a bîne, k'ahîn bira bona wê neheqîya wîye bêh'emdê xwe kirî k'ewandinê bike û wê li wî bê baxşandinê. <sup>19</sup>Eva dîyarîya ji bervadayînê ye, bona neheqîya ku ewî li ber Xudan kiribû».

**6** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Heger yek borcê xwe li ber Xudan neqedîne bi vî awayî xwe gunek'ar ke, awa gotî anemetê yekî înk'ar ke, yan tiştê li wî hatibe dayînê, yan tişteke şêlandibe, yan qelpî li wî kesî kiribe, <sup>3</sup>yan tişteki undabûyî dîtibe înk'ar ke û derew sond bixwe, ji van h'emûya yekîda gune bike, k'îjan ku meriv dikin, <sup>4</sup>bona gunê kirî û sûcdarîya xwe gerekê ew tiştê şêlandî, qelpîya kirî, yan ew anemetê ku zeft biribû, yan ew tiştê undabûyî ku dîtibû, <sup>5</sup>yan her tiştî, hindava çida derew sond xwarîye, gişkî lê vege'îne. Bira çarîka pênc jî serda zêde ke bide wî k'êr'a dik'eve, li wê r'oja ku gunê xwe nas ke. <sup>6</sup>Û bira ew bona neheqîya xwe ji kêrî beranekî bêqusûr, weke wî qîmetê teyî k'ifşkirî, dîyarîya ji bervadayînê Xudan'r'a bîne cem k'ahîn. <sup>7</sup>K'ahîn bira bona wî li ber Xudan k'ewandinê bike, çi tiştîda wî neheqî kiribe wê li wî bê baxşandinê».

### Dîyarîya t'evayîşewatê

<sup>8</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>9</sup>«E'mirî li Harûn û kur'êd wî bike û bêje: «Ev e qanûna dîyarîya t'evayîşewatê. T'emamîya şevê dîyarîya t'evayîşewatê bira li ser agirê ser gorîgehê be h'eta serê sibê û agirê gorîgehê bira t'imê li ser bişxule. <sup>10</sup>K'ahîn bira çuxê xweyî k'itanî bavêje li ser xwe û hevalkirasê k'itanî jî li xwe ke, paşê wê k'ozîya şewitiye ji

dîyarîya t'evayîşewatê mayî, bira ji ser gorîgehê hilde bike k'êleka gorîgehê. <sup>11</sup> Pey vê yekê'a bira k'incê xwe biguhêze, destekî mayîn li xwe ke, k'ozîyê ji zomê derxe der bibe cîkî paqij. <sup>12</sup> Agirê li ser gorîgehê gerekê bişxule û vênesê, k'ahîn bira her sibehê qirşa bide ser, dîyarîya t'evayîşewatê û donê dîyarîyêd heleqetîyê li ser wê bişewitîne. <sup>13</sup> Agir t'imê gerekê li ser gorîgehê bişxule û vênesê.

### Dîyarîya nanî

<sup>14</sup> Ev e qanûna dîyarîya nanî ku gerekê kur'êd Harûn li ber Xudan pêşberî gorîgehê bidin. <sup>15</sup> Bira ew k'ulma xwe t'ijî arê xasî dîyarîya nanîda ke t'evî r'ûnê wê û h'emû bixûra li ser dîyarîya nanî hilde, li ser gorîgehê bona bîranînê bişewitîne. Eva dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan. <sup>16</sup> Lê herç'ê mayî bira Harûn û kur'êd wî bixwin. Ew gerekê ewî bê hevîrtir'şk li cîyê pîroz h'ewşa Konê Civînêda bixwin. <sup>17</sup> Ew gerekê pê hevîrtir'şk neyê pe'tinê, min eva ji dîyarîyêd xweye şewatê p'ar da wan. Eva ya here pîroz e, mîna dîyarîya paqijbûnê û dîyarîya bervadayînê. <sup>18</sup> Her qisimê mêrînî ji r'ik'inyata Harûn dikare jê bixwe. Ji dîyarîyêd şewatêye bona Xudan eva p'ara we be, nava r'ik'inyatêd weda bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. Her çi ku lêk'êve wê pîroz be».\*

### Dîyarîya r'oja k'ifşkirina k'ahîn

<sup>19</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>20</sup> «Ev e dîyarîya Harûn û kur'êd wî, ya ku gerekê ew li r'oja k'ifşbûna xweda bidine Xudan: Ji dehe p'ara p'areke êfayê arê xas bona dîyarîya nanîye her r'oj, nivî serê sibê û nivî jî berê êvarê bînin. <sup>21</sup> Ar nav r'ûnda stirayî be, li ser sêlê r'ind pijandî be, paşê k'êr kî û çawa dîyarîya nanî ye bînxweş bona Xudan bidî. <sup>22</sup> Ê ji kur'êd Harûn, k'îjan ku dewsa wî k'ahîn bê r'ûnkirinê, ew

---

\* 6:18 Hinek welger'andinada jî «T'enê her kesê pîroz dikare wan k'êve».

gerekê vê yekê bike, eva qeyde-qanûna Xudane h'eta-h'etayê ye. Ew t'emam gerekê bê şewitandinê. <sup>23</sup>Û her dîyarîya nanîye k'ahîn dayî, gerekê t'emam bê şewitandinê, ne ku bê xwarinê».

### Dîyarîya paqijbûnê

<sup>24</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>25</sup>«T'evî Harûn û kur'êd wî xeber de û bêje: «Ev e qanûna dîyarîya paqijbûnê: li ber Xudan k'îderê ku dîyarîya t'evayîşewatê tê serjêkirinê, wê derê jî gerekê dîyarîya paqijbûnê bê serjêkirinê. Eva ya here pîroz e. <sup>26</sup>Ew k'ahînê ku dîyarîya paqijbûnê dide ew bira wê bixwe. Ew gerekê Cîyê Pîrozda bê xwarinê, h'ewşa Konê Civînêda. <sup>27</sup>Her çi ku li goştê wê k'leve wê pîroz be\*. Lê heger xûna wê bipeke li ser k'incekê, ewê lek'ê di cîyê pîrozda bişoyî. <sup>28</sup>Û ew dîzê ku ew goşt têda k'elîyaye gerekê bê şkênandinê, lê heger derdana sifirda hatîye k'elandinê, ew gerekê bê çir'kirinê û pê avê bê şuştinê. <sup>29</sup>H'emû zar'êd k'ahînyê kur'în dikarin jê bixwin. Eva ya here pîroz e. <sup>30</sup>Lê her dîyarîya paqijbûnê, xûna wê bînine Konê Civînê Cîyê Pîrozda bona k'ewandinê bê kirinê, ew t'u car neyê xwarinê, lê li ser êgir ew bê şewitandinê».

### Dîyarîya ji bervadayînê

**7** Ev e qanûna dîyarîya bervadayînêye here pîroz. <sup>2</sup>K'î derê ku dîyarîya t'evayîşewatê tê serjêkirinê, gerekê dîyarîya bervadayînê jî wê derê bê serjêkirinê û xûna wê li ser her alîyê gorîgehê bê r'eşandinê. <sup>3</sup>Û k'ahîn h'emû bezê wê, awa gotî dawê, bezê navdil dîyarî ke, <sup>4</sup>her du gur'ç'ika bezê ser û k'êlekava, betanê cegerê gur'ç'ikava t'evayî derxe. <sup>5</sup>K'ahîn vana li ser gorîgehê bişewitîne, çawa dîyarîya şewatêye Xudan'r'a. Eva dîyarîya ji bervadayînê ye. <sup>6</sup>Her

---

\* 6:27 Hinek welger'andinada jî «T'enê her kesê pîroz dikare goştê wê k'leve».

zar'eke k'ahînayî kur'in dikare ji vê bixwe. Gerekê cîyê pîrozda bixwe, eva ya here pîroz e.

<sup>7</sup>Qanûna dîyarîya paqijbûnê û ya dîyarîya bervadayînê yek e, k'ahîne ku k'ewandinê dike bira wîr'a bimîne. <sup>8</sup>Usa jî k'ahînek ku dîyarîya yekîye t'evayîşewatê bide, ç'ermê wê dîyarîya t'evayîşewatêye ku da, bira wîr'a bimîne. <sup>9</sup>Her dîyarîya nanîye ku tendûrêda pe'tî, yan t'awêda yan li ser sêlê pijandî ku bê dayînê, ew k'ahîne dayîr'a bimîne. <sup>10</sup>Lê her dîyarîya nanîye r'ûnda stirayî yan bê r'ûn, h'emû kur'êd Harûnr'a weke hev bê p'arevekirinê.

### Dîyarîya heleqetîyê

<sup>11</sup>Ev e qanûna dîyarîya heleqetîyê, ku yek Xudanr'a bide: <sup>12</sup>Heger bona r'azîdarîyê wê bide, hingê bira t'evî dîyarîya r'azîdarîyê k'atêd r'ûnda stirayî bê hevîrtir'şk û loşêd bê hevîrtir'şke r'ûnkirî, k'atêd ji arê xasî r'ûnda stirayî bide. <sup>13</sup>Pêştirî k'ata, bira ew nanê xweyî hilatî jî dîyarî bîne, t'evî wê dîyarîya xweye heleqetîyê ku bona r'azîdarîyê dide. <sup>14</sup>Ji wan h'emû dîyarîya, yekê gerekê çawa dîyarîya berbir'îkirinê bide Xudan. Eva p'ara wî k'ahîni ye, yê ku xûna dîyarîya heleqetîyê dir'eşîne. <sup>15</sup>Û goştê dîyarîya heleqetîya r'azîdarîyê, hema wê r'oja dayîda bê xwarinê, ji wê gerekê h'eta sibehê nemîne. <sup>16</sup>Lê heger dîyarîya wî bona soz e, yan dîyarîya r'ezedilîyê ye, hingê qurban wê r'oja dayîda bê xwarinê, çi ma jî r'oja din bê xwarinê. <sup>17</sup>Lê ew goştê qurbanêyî ku ma r'oja sisîya, ser agir bê şewitandinê. <sup>18</sup>Heger yek goştê dîyarîya heleqetîyê r'oja sisîya bixwe, ew nayê qebûlkinê. Ew li ber cefê dayî nak'eve, wê bibe h'eramî, yê jê bixwe ew gune dike stûyê xwe. <sup>19</sup>Ew goştê ku tiştêkî nepaqij k'eve, gerekê neyê xwarinê, ew li ser agir gerekî bê şewitandinê. Her kesê paqij dikare goştê dîyarîyê bixwe, <sup>20</sup>lê ew kesê çaxê ne paqij e, ji goştê dîyarîya heleqetîya Xudan bixwe, ew kesa gerekê ji nava cime'ta xwe bê undakirinê. <sup>21</sup>Û ew merivê ku tiştêkî nepaqij k'eve, awa gotî nepaqijîya mêriv, yan h'eywanê nepaqij yan her tiştê

h'eram k'eve û ji goştê dîyarîya heleqetîya Xudan bixwe, ew meriva gerekê ji nava cime'ta xwe bê undakirinê».

### **Kirinêd necayîz**

<sup>22</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>23</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «T'u car bezê ga yan pêz yan bizina nexwin. <sup>24</sup>Bezê h'eywanê h'işkbûyî û bezê de'vexwarî, her tiştêd dinda dikarî bidî xebatê, lê t'u car jê nexwin. <sup>25</sup>Her kesê ku bezê dîyarîya şewatê Xudanr'a dayî bixwe, ew meriva gerekê ji nava cime'ta xwe bê undakirinê. <sup>26</sup>Û t'u xûnê her cî-warêd xweda nexwin, ne xûna teyreda ne jî h'eywana. <sup>27</sup>Lê k'ê çi xûnê bixwe, ew gerekê ji nava cime'ta xwe bê undakirinê».

### **P'ara k'ahîna ji dîyarîya heleqetîyê**

<sup>28</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>29</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «Ewê ku dîyarîya xweye heleqetîyê dide Xudan, gerekê ji wê dîyarîya heleqetîyê p'ara Xudan derxe. <sup>30</sup>Gerekê ew pê destê xwe dîyarîyêd Xudane şewatê bîne, bez sersîngva bîne, ku sersîng li ber Xudan bê h'ejandinê çawa dîyarîyaf h'ejandinê. <sup>31</sup>K'ahîn bez li ser gorîgehê bişewitîne, lê sersîng Harûn û kur'êd wîr'a bimîne. <sup>32</sup>Ji dîyarîyêd xweye heleqetîyê, gerekê pîlê r'astê bidine k'ahîn, bona dîyarîya berbir'îkirinê. <sup>33</sup>Ji kur'êd Harûn k'îjan ku xûna dîyarîya heleqetîyê û bezê wê bide, pîlê r'astê p'ara wî be. <sup>34</sup>Çimkî min ji dîyarîyêd heleqetîya zar'êd Îsraêl sersîngê dîyarîya h'ejandinê û pîlê dîyarîya berbir'îkirinê hildan û dane Harûnê k'ahîn û kur'êd wî, çawa qeyde-qanûna h'eta-h'etayê ji zar'êd Îsraêl».

<sup>35</sup>Eva p'ara Harûn û kur'êd wî ye, ji dîyarîyêd Xudane şewatê, wê r'oja k'ifşbûna wane k'ahîntîyêda bona Xudan. <sup>36</sup>Ev p'ara ku r'oja k'ifşbûna wanda Xudan e'mir li zar'êd Îsraêl kir bidine wan, eva bona nisilêd wan qeyde-qanûna h'eta-h'etayê ye.

<sup>37</sup>Ev e qanûna dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya nanî, dîyarîya paqijbûnê, dîyarîya ji bervadayînê, dîyarîya qewîn-qedîmîyê

û dîyarîya heleqetîyê, <sup>38</sup> ya ku Xudan li serê ç'îyayê Sînayê e'mir li Mûsa kir, wê r'ojê gava ber'îya Sînayêda t'emî li zar'êd Îsraêl kir, ku dîyarîyêd xwe bidine Xudan.

### Qewîn-qedîmkirina k'ahîna

**8** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup> «Harûn û kur'êd wî, k'incêd wan, r'ûnê r'ûnkirinê, canegê dîyarîya paqijbûnê, du berana û sele nanê bê hevîrtir'şk hilde <sup>3</sup> û t'emamîya civînê t'opî li ber derê Konê Civînê ke». <sup>4</sup> Mûsa usa kir, çawa ku Xudan e'mir li wî kir û civîn li ber derê Konê Civînê civîya.

<sup>5</sup> Mûsa gote civînê: «Va ye ew tiştê ku Xudan e'mir kir ku bikin». <sup>6</sup> Mûsa Harûn û kur'ava anîne nêzîk û ew pê avê şuştin. <sup>7</sup> Kiras li Harûn kir, benpişt da piştê, çux li wî kir, êfod<sup>f</sup> jor-da avîte sar, qeyt'ana êfod da ser piştê û pê qeyt'ana êfod ew şidand. <sup>8</sup> Paşê r'extsîng<sup>f</sup> avîte ser wî û Êrîm û Tûmîm\* jî kirine ber r'extsîng. <sup>9</sup> P'ap'ax da serê wî, bere'nîke zêr'în awa gotî k'ofîya pîroz avîte ne'tika p'ap'ax, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû. <sup>10</sup> Ê Mûsa r'ûnê r'ûnkirinê hilda, Konêf Şe'detîyê û her tiştêd têda r'ûn kirin û ew pîroz kirin, <sup>11</sup> h'eft cara ji wî r'ûnî r'eşande ser gorîgehê, gorîgeh û h'emû hacetêd wê, t'eşt bingeha wêva r'ûn kirin bona pîrozbûna wan. <sup>12</sup> Paşê Mûsa ew r'ûnê r'ûnkirinê hilda r'ête li ser serê Harûn û ew r'ûn kir, bona pîrozbûna wî. <sup>13</sup> Mûsa kur'êd Harûn anîn, kiras li wan kirin, benpişt dane pišta wan û k'oloz dane li serê wan, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû.

<sup>14</sup> Ê canegê dîyarîya paqijbûnê anî, Harûn û kur'êd wî destêd xwe danîne li ser serê canegê dîyarîya paqijbûnê. <sup>15</sup> Mûsa ew serjêkir, t'ilîya xwe xûnêda kir û li stirûyêd her alîyêd gorîgehê xist, gorîgeh paqij kir û xûna mayî r'ête jêra gorîgehê, ew pîroz kir bona k'ewandinê li ser wê bike. <sup>16</sup> Ê h'emû bezê navdil, betanê cegerê, her du gur'ç'ika bezê

\* 8:8 Êrîm û Tûmîm tê fe'm kirinê çawa «R'onayî û K'amilî». Pê vana serekk'ahîn<sup>f</sup> li qirara Xwedê dih'esîya.

wanva Mûsa hilda û li ser gorîgehê şewitand. <sup>17</sup>Lê tiştê ji canega mayî: Ç'ermê wî, goşt e'debêva ji zomê der li ser êgir şewitand, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa.

<sup>18</sup>Pey vê yekê'a Mûsa beranê dîyarîya t'evayîşewatê anî, Harûn û kur'êd wî destêd xwe danîne li ser serê berên. <sup>19</sup>Mûsa ew serjêkir û xûna wî r'eşande li ser her alîyêd gorîgehê. <sup>20</sup>Beran çîtî-çîtî kir, Mûsa serî, t'evî wan kerîya bezva şewitandin, <sup>21</sup>çaxê navdil û nig pê avê şûştin, Mûsa t'emamîya berên li ser gorîgehê şewitand. Ev bû dîyarîya t'evayîşewatêye bînxweş, dîyarîya şewatê bona Xudan, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû.

### **Beranê qewîn-qedîmkirinê**

<sup>22</sup>Mûsa beranê din anî, beranê qewîn-qedîmkirinê, Harûn û kur'êd wî destêd xwe danîne li ser serê berên. <sup>23</sup>Mûsa ew serjêkir, ji xûna wî hilda gupika guhê Harûne r'astê û t'ilîya mezine destê wîyî r'astê xist, usa jî pêç'îya mezine nigê wîyî r'astê. <sup>24</sup>Mûsa kur'êd Harûn jî anîn, ew xûn gupika guhê wanî r'astê û pêç'îya mezine destê wanî r'astê, usa jî pêç'îya mezine nigê wanî r'astê xist û xûna mayîn jî r'eşande li ser her alîyêd gorîgehê. <sup>25</sup>Û Mûsa bezê berên, daw, h'emû bezê navdil, betanê cegerê, her du gur'ç'ik bezva, pîlê r'astê hildan <sup>26</sup>û ji sela nanê bê hevîrtir'şke li ber Xudan jî k'atekî bê hevîrtir'şk û k'atekî r'ûnda stirayî û loşek hildan, danîne li ser bez û pîlê r'astê. <sup>27</sup>Û ev h'emû danîne li ser k'efa destêd Harûn û kur'êd wî, ew çawa dîyarîya h'ejandinê li ber Xudan h'ejandin. <sup>28</sup>Û Mûsa ev ji destêd wan girt, t'evî dîyarîya t'evayîşewatêye li ser gorîgehê şewitand. Eva dîyarîya qewîn-qedîmkirinê ye bînxweş e, dîyarîya şewatê bona Xudan. <sup>29</sup>Mûsa sersîng hilda û li ber Xudan çawa dîyarîya h'ejandinê h'ejand. Eva p'ara Mûsa k'et, ji wî berênê dîyarîya qewîn-qedîmkirinê, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû. <sup>30</sup>Paşê Mûsa ji r'ûnê r'ûnkirinê û ji xûna ser gorîgehê hilda r'eşande li ser Harûn û k'incêd wî û li ser kur'êd wî û k'incêd wan. Bi vî awayî Harûn k'incava û kur' k'incêd wanva pîroz kirin.

<sup>31</sup>Mûsa gote Harûn û kur'êd wî: «Goşt li ber derê Konê Civînê bik'elîmin û li wir pê nanê ji sela dîyarîya qewîn-qedîmkirinê bixwin, çawa li min hate e'mirkirin û gotin ku t'enê gerekê Harûn û kur'ava bixwin. <sup>32</sup>Û ew goşt û nanê bermayî li ser êgir bişewitînin. <sup>33</sup>H'eft r'oja ji derê Konê Civînê dernek'evin, h'eta ku r'ojêd qewîn-qedîmkirina we t'emam nebin, çimkî qewîn-qedîmkirina weyê h'eft r'oja bik'işîne. <sup>34</sup>Xudan e'mir kir aha bikin, çawa ku îro bona k'ewardina we hate derbazkirinê. <sup>35</sup>Awa h'eft r'oja, şev û r'oj gerekê hûn li ber derê Konê Civînê r'ûnên û nobedarîya Xudan bikin ku hûn nemirin, çimkî aha li min hatîye e'mirkirinê». <sup>36</sup>Harûn û kur'ava her tişt usa kirin, çawa ku Xudan bi destê Mûsa e'mir kiribû.

### Dîyarîyêd e'wline Harûn û kur'ava

**9** R'oja h'eyšta Mûsa gazî Harûn kur'ava û r'ûspîyêd Îsraêlf kir, <sup>2</sup>gote Harûn: «Xwer'a ji gar'anê bona dîyarîya paqijbûnê te'nekî bêqusûr hilde û beranekî bêqusûr jî bona dîyarîya t'evayîşewatê û van bîne li ber Xudan. <sup>3</sup>T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «Nêrîkî ji bizina bona dîyarîya paqijbûnê hildin, te'ne û bexê yeksalîye bêqusûr jî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>4</sup>usa jî canega û beranek jî çawa dîyarîya heleqetîyê li ber Xudan bê dayînê û dîyarîya nanîye r'ûnda stirayî, çimkî îro Xudanê weva xuya be». <sup>5</sup>Ew tiştê ku Mûsa e'mir li wan kir, hildan anîne li ber derê Konê Civînê û t'emamîya civînê hat li ber Xudan sekinî. <sup>6</sup>Mûsa got: «Va çi ku Xudan e'mir kir ku bikin wekî r'ûmeta Xudan weva xuya be». <sup>7</sup>Mûsa gote Harûn: «Nêzîkî gorîgehê be û dîyarîya xweye paqijbûnê û dîyarîya xweye t'evayîşewatê bide, bona xwe û cime'tê k'ewandinê bike, dîyarîyêd ji cime'tê bide û bona wan k'ewandinê bike, çawa ku Xudan e'mir kir».

<sup>8</sup>Hingê Harûn nêzîkî gorîgehê bû û te'nê bona dîyarîya paqijbûna xwe serjêkir. <sup>9</sup>Kur'êd Harûn xûn nêzîkî wî kirin, ewî t'ilîya xwe xûnêda kir û li stirûyêd gorîgehê xistin, xûna

mayî jî r'ête jêra gorîgehê. <sup>10</sup>Lê bez, gur'ç'ik û betanê cegera dîyarîya paqijbûnê li ser gorîgehê şewitand, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû, <sup>11</sup>goşt û ç'erm jî ji zomê der li ser êgir Harûn şewitand. <sup>12</sup>Dîyarîya t'evayîşewatê serjêkir, kur'êd Harûn xûn anîn dane wî, Harûn ew r'eşande li ser her alîyêd gorîgehê. <sup>13</sup>Dîyarîya t'evayîşewatê ker-kerî kirî serîva anîn dane wî û ewî li ser gorîgehê şewitand. <sup>14</sup>Û ewî navdil nigava şûştin û t'evî dîyarîya t'evayîşewatê li ser gorîgehê şewitandin.

<sup>15</sup>Paşê qurbana cime'tê da, ji cime'tê nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê hilda serjêkir mîna ya pêşin dîyarîya paqijbûnê da. <sup>16</sup>Dîyarîya t'evayîşewatê anî, ew anegorî qîrarê da. <sup>17</sup>Dîyarîya nanî anî, k'ulma xwe t'ijî kir û li ser gorîgehê şewitand, xêncî dîyarîya t'evayîşewatêye serê sibehê. <sup>18</sup>Û bona cime'tê canega û beranê dîyarîya heleqetîyê serjêkir, kur'êd Harûn xûn anîn dane wî, ewî r'eşande li ser her alîyêd gorîgehê. <sup>19</sup>Usa jî bezê canegê û berên, daw, bezê navdil, her du gur'ç'ik bezva û betanê cegerê anîn, <sup>20</sup>ew bez danîne li ser sersîng û Harûn bez li ser gorîgehê şewitand. <sup>21</sup>Paşê Harûn sersîng û pîlê r'astê hilda çawa dîyarîya h'ejandinê li ber Xudan h'ejand, çawa ku Mûsa e'mir kiribû.

<sup>22</sup>Harûn destêd xwe bilind kirin berbir'î cime'tê bû, dua li wan kir. Pey dîyarîya paqijbûnê, dîyarîya t'evayîşewatê û dîyarîya heleqetîyê'a peya bû. <sup>23</sup>Mûsa û Harûn k'etine Konê Civînê û ji wir derk'etin dua li cime'tê kirin. R'ûmeta Xudan t'emamîya cime'têva xuya bû. <sup>24</sup>Hingê ji Xudan agir derk'et, dîyarîya t'evayîşewatê û bezê li ser gorîgehê şewitand, cime'tê ku ev yek dît şabûna kire qar'în û dever'ûya k'etin.

### Gunê Nadab û Abîhû

**10** Kur'êd Harûn, Nadab û Abîhû her yekî agirdanga xwe hilda, agir kirinê, bixûr kirine ser û li ber Xudan şaş agir dan, ku ev ne li gora qîrara Xudan bû. <sup>2</sup>Û ji Xudan agir derk'et, wan xist û ew li ber Xudan mirin. <sup>3</sup>Wî çaxî Mûsa gote Harûn: «Ay bona çi Xudan xeberda û got:

«Ezê nava yêd nêzîkî min dibin pîroz bim  
û li ber t'emamîya cime'tê bême pesindayîne».

Harûn xwe ker' kir.

<sup>4</sup>Hingê Mûsa gazî Mîşaêl û Elsafanê kur'êd Êzîêlê apê Harûn kirin û gote wan: «Her'in birayêd xwe ji ber pîrozgehê hildin bibin ji zomê derxin». <sup>5</sup>Ew çûn, çawa ku Mûsa gotibû ewana kirasêd wanva ji zomê derxistin. <sup>6</sup>Mûsa gote Harûn û kur'êd wî Êlazar û Ît'amar: «P'or'ê serê xwe ser xweda neynin û k'incê xwe neqelêşin, wekî nemirin û xezeba Xudan neyê serê t'emamîya civînê. Lê bira birayêd we, usa jî t'emamîya mala Îsraêl li ser wan bigirîn, k'îjan ku Xudan şewitandin. <sup>7</sup>Hûn ji derê Konê Civînê dernek'evin ku nemirin, çimkî r'ûnê Xudanî r'ûnkirinê li ser we ye». Wana jî anegorî gotina Mûsa kir.

### **Qanûna bona k'ahîna hindava şerab-araqêda**

<sup>8</sup>Xudan Harûnr'a xeberda û got: <sup>9</sup>«Gava tu yan kur'êd te bik'evine Konê Civînê, şerab-araqê venexwin ku nemirin. Nava nisilêd weda ev yek qeyde-qanûna h'eta-h'etayê be, <sup>10</sup>wekî firqîya pîroz û nepîroz yan paqij û nepaqij ji hev derxin <sup>11</sup>û wan h'emû qeyde-qanûna li zar'êd Îsraêl hîn kin, k'îjanêd ku Xudan bi destê Mûsa e'mir li wan kirîye».

### **Qanûna bona xwarina k'ahîna**

<sup>12</sup>Mûsa gote Harûn û kur'êd wîye mayî, Êlazar û Ît'amar: «Ji dîyarîyêd şewatêye Xudanr'a dayî, dîyarîya nanî hildin û hinda gorîgehêf bê hevîrtir'şk bixwin. Çimkî eva ya here pîroz e. <sup>13</sup>Ewî li cîyê pîroz bixwin, eva p'ara te û p'ara kur'êd te ye, ji dîyarîyêd şewatêye Xudanr'a dayî, çimkî minr'a aha hatîye e'mir kirinê. <sup>14</sup>Sersîngê dîyarîya h'ejandinê û pîlê dîyarîya berbir'îkirinê tu cîkî li paqij t'evî kur' û qîzêd xwe bixwe. Çimkî evana ji qurbanêd dîyarîyêd heleqetîyê ne, alîyê zar'êd Îsraêlda dayî, ew p'ara te û kur'êd te ne. <sup>15</sup>Pîlê dîyarîya berbir'îkirinê û sersîngê dîyarîya h'ejandinê t'evî

bezê dîyarîya şewatê bira bînin li ber Xudan bih'ejînin, çawa dîyarîya h'ejandinê. Û bira eva bi qeyde-qanûna h'eta-h'etayê p'ara te û kur'êd te be, çawa ku Xudan e'mir kir».

<sup>16</sup> Û Mûsa nêrîyê dîyarîya paqîjbûnê ger'îya, lê ew îdî şewitandî bû, ewî hingê hêrsa xwe li kur'êd Harûne mayî Êlazar û Ît'amar r'akir û gote wan: <sup>17</sup> «We çima dîyarîya paqîjbûnê li cîyê pîrozda nexwarîye? Ne eva ya here pîroz e? Wer'a hatiye dayînê ku gunê ji ser civînê bidine hildanê û li ber Xudan k'ewandinê bona wan bikin. <sup>18</sup> Awa xûna wê nek'etîye pîrozgehê, ku we gerekê ew qurban li cîyê pîrozda bixwara, çawa min e'mir li we kiribû». <sup>19</sup> Hingê Harûn li Mûsa vege'and û gotê: «Awa îro wana dîyarîya paqîjbûna xwe û dîyarîya t'evayîşewata xwe li ber Xudan dan, ev yek ku hate serê min, heger îro min dîyarîya paqîjbûnê bixwara, gelo wê li Xudan xweş bihata?» <sup>20</sup> Mûsa ev yek bihîst û li wî xweş hat.

### H'eywanêd h'elal û ne h'elal

**11** Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û gote wan: <sup>2</sup> «T'evî zar'êd Îsraêl xeberdin û bêjine wan: «Vane ew h'emû h'eywanêd li ser e'rdê ji k'îjana hûn dikarin bixwin, <sup>3</sup> her h'eywanê dusimî û simvekirî ku dik'ayên bixwin. <sup>4</sup> Lê ji yêd dik'ayên yan yêd simvekirî, gerekê vana nexwin, deve, r'ast e dik'ayê, lê ne simvekirî ye, ew bona we ne h'elal be. <sup>5</sup> Qotik r'ast e dik'ayê lê ne simvekirî ye, ew bona we ne h'elal be. <sup>6</sup> K'êvrûşk r'ast e dik'ayê lê ne simvekirî ye, ew bona we ne h'elal be. <sup>7</sup> Beraz r'ast e simqelişî û simvekirî ye, lê ku nak'ayê ew bona we ne h'elal be. <sup>8</sup> Goştê wan nexwin, cendekêd wan nek'evin, ew bona we ne h'elal bin.

<sup>9</sup> Ji h'emû h'eywanêd nava avada, awa gotî h'emû h'eywanêd nava be'ra û ç'emada ku xweyîmil û xweyîpaç' in bixwin. <sup>10</sup> Lê ew h'emûyêd ku be'ra û ç'emada ye bê mil û bê paç'e ji her h'eywanêd avada dişûlike ew bona we h'eram bin. <sup>11</sup> Ewana bona we h'eram bin, goştê wan nexwin û ji cendekêd wan

zivêr bin. <sup>12</sup>H'emû h'eywanêd ku avêda ne bê mil û bê paç' bona we h'eram bin.

<sup>13</sup>Ji nava teyreda jî ji van zivêr bin û nexwin, ew h'eram in: Teyr, teyrê bazî, teyrê be'rê, <sup>14</sup>qûş û bawîkê her cûr'êd wanva, <sup>15</sup>her qar'qar' cûr'êd wanva, <sup>16</sup>deveqûş, bûmê şevê, me'sîgir û qerqe her cûr'êd wanva, <sup>17</sup>kundê korî biç'ûk, qazê me'sîya, kundê korî mezin, <sup>18</sup>kundê korî sipî, pêlîkan, qirqê Misirê, <sup>19</sup>leglegê, quling cûr'êd wanva, pûpû, baç'ermok.

<sup>20</sup>Her mêş-morêd xweyîp'er'e ku li ser çar niga diçin, bona we h'eram bin. <sup>21</sup>Lê van h'emû mêş-morêd xweyî p'er'e ku li ser çar niga diçin bixwin, k'îjan ku fêza çokada hêt hene bona banzdana li ser e'rdê. <sup>22</sup>Ji van hûn dikarin bixwin: Kulî her cûr'êd wanva, hespê gîhê her cûr'êd wanva, ç'ir'îk her cûr'êd wanva, sîyarê bûkê her cûr'êd wanva. <sup>23</sup>Lê mêş-morêd xweyîp'er'e mayîne çarnigî, bona we h'eram bin.

<sup>24</sup>Pê wan hûnê bih'er'imîn, her kesê ku li cendekêd wan k'êve, h'eta êvarê ne paqij be. <sup>25</sup>Her kesê ku ji wan cendekekî hilde bira k'incê xwe bişo û h'eta êvarê ne paqij be. <sup>26</sup>Her h'eywanêd simvekirî lê ne simqelişîne û nak'ayên ew bona we h'eram bin, her kesê ku li wan k'êve ne paqij be. <sup>27</sup>Her h'eywanêd çarnigîye ku li ser lepê xwe diger'in ew bona we h'eram bin, her kesê ku li cendekêd wan k'êve, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>28</sup>Her kesê ku cendekêd wan hilde, bira k'incê xwe bişo û h'eta êvarê ne paqij be. Ew bona we h'eram in.

<sup>29</sup>Ev in ew h'eywanêd ku li ser e'rdê dişûlikin, k'îjanêd ku bona we h'eram bin: Mişkê kor, mişk, me'regîsk her cûr'êd wanva, <sup>30</sup>me'regîskê lepikî, tîmsah, makeme'r, qûmqûmok, me'regîskê r'eng-r'engî. <sup>31</sup>Ev in bona we h'eram, ji wan h'emû şûlikîya, her kesê ku cendekêd wane kuştî k'êve, h'eta êvarê ne paqij be. <sup>32</sup>Kuştkî ji wan li ser çi tiştîda ku bik'êve, heger tişteki darîn be, yan k'inc be, yan ç'erm, yan t'êr', yan tişteki ku bona şixul bik'ar tînin dih'er'imîne, wan bikine avê, h'eta êvarê ne paqij be, pey vê yekêr'a paqij be. <sup>33</sup>Heger ji van r'e-wira yek bik'êve nava derdaneke axîn, çi tişt ku wêda be ew

h'eram dibe û ewê derdanê bişkênin. <sup>34</sup>Her tiştê xwarinêye ku ava ji vê derdanê bipeke wê, ewê bih'er'ime û usa jî her tiştêd vexwarinêye ku pê vê derdanê vexwin dih'er'ime. <sup>35</sup>Her tiştêd ku beret'ê van r'e'wira lêk'evin wê bih'er'imin, heger tendûr be yan bexîr be gerekê bê hilşandinê, evana h'er'imîne û bona we evana ne paqij bin. <sup>36</sup>T'enê kanî û h'ewzê avê paqij dimînin, lê yê ku cendekê wan k'eve ew dih'er'ime. <sup>37</sup>Heger beret'ê wan bik'eve li ser t'oximekî çandinê, ew paqij e. <sup>38</sup>Lê gava av k'etibe li ser t'oxim û berat'ekî ji wan r'e'wira serda bik'eve, ew bona we h'eram be.

<sup>39</sup>Lê heger h'eywanekî ku tê xwarinê h'işk be, ewê ku li cendekê wî k'eve, h'eta êvarê ne paqij be. <sup>40</sup>Ewê ku ji wî cendekî bixwe, gerekê k'incêd xwe bişo û h'eta êvarê ne paqij be, usa jî ewê ku cendek hilde gerekê k'incêd xwe bişo, h'eta êvarê ne paqij be.

<sup>41</sup>Ji her şûlikîyê ku li ser e'rdê dişûlikin zivêr bin, wan gerekê nexwin. <sup>42</sup>H'emû şûlikîyêd li ser e'rdêye ku dişûlikin, yêd li ser zik diçin, yan yêd ser çar niga, yan yêd pir'nig nexwin, çimkî ewe h'eram in. <sup>43</sup>Hûn ji şûlikîyêd li ser e'rdê zivêr bin, pê wan xwe neh'er'imînin ku r'ûyê wanda hûn neh'er'imin. <sup>44</sup>Çimkî ez Xudan Xwedêyê we me, awa nefsa xwe pîroz kin û pîroz bin, çimkî ezî pîroz im, nefsa xwe pê t'u şûlikîyê li ser e'rdê dilipite neh'er'imînin. <sup>45</sup>Çimkî ez Xudan im, ku min hûn ji e'rdê Misirê hevraz anîn, ku ez bibime Xwedêyê we. Awa pîroz bin, çimkî ezî pîroz im.

<sup>46</sup>Ev e qanûna hindava h'eywên, teyreda, h'emû h'eywanêd avêda dih'ejin û h'emû h'eywanêd ku li ser e'rdê dişûlikin, <sup>47</sup>wekî firqiyê bikine nava h'elal û neh'elal û nava h'eywanê ku tê xwarinê û h'eywanê ku nayê xwarinê».

### Qanûna paqijaya k'ulfetê pey zar'anînêr'a

**12** Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Heger k'ulfet pê bimîne kur'ekî bîne, hingê ew h'eft r'oja nepaqij be, weke wan r'ojêd ku

ew e'detê nexweşîya k'ulfetêda ye, ew nepaqij be. <sup>3</sup>Û r'oja h'eyşta kur'ik bê sinetkirinê. <sup>4</sup>K'ulfet jî gerekê sî û sê r'oja xwe xweyî ke, h'eta ji xûna xwe paqij be, t'u car tişteki pîroz nek'eve, ne jî bik'eve pîrozgehê, h'eta r'ojêd paqijbûna wê xitim bin. <sup>5</sup>Lê heger qîzekê bîne, du h'eftîya nepaqij be weke e'detê nexweşîya xwe, şêst şeş r'oja xwe xweyî ke h'eta ji xûna xwe paqij be. <sup>6</sup>Û gava ew r'ojêd paqijbûna bona kur' yan qîz anînê xitim bin, hingê bira ew berxeke yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê bîne û cûcûkeke kewê yan fatimokekê jî bona dîyarîya paqijbûnê bîne li ber derê Konê Civînê cem k'ahîn. <sup>7</sup>Û k'ahîn van bîne li ber Xudan, k'ewandinê bona wê bike û ew ji kanîya xûnê paqij be. Ev e qanûna bona k'ulfeta kur' yan qîz anînê. <sup>8</sup>Lê heger destê wêda t'une ku berxê bîne, hingê bira du fatimoka yan jî du cûcûkêd kewa bîne, yekê bona dîyarîya t'evayîşewatê, yekê jî bona dîyarîya paqijbûnê û k'ahîn bona wê k'ewandinê bike û ew paqij be».

### Qanûna k'ifşbûna nexweşîya k'otîbûn<sup>f</sup> û gur'îbûnê

**13** Xudan<sup>f</sup> Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Heger ç'ermê bedena merivekî bide li ber gilêya, yan gir'a, yan r'îşîya û li ç'ermê bedenê bibe mîna p'izika k'otî\*, hingê gerekê wî bibine cem Harûnê k'ahîn<sup>f</sup> yan k'ahînekî ji kur'êd wî. <sup>3</sup>K'ahîn bira dîna xwe bide p'izika ç'ermê bedena wî, heger r'engê pir'ç'a li ser p'izikê sipî dike û p'izika ç'ermê bedenê k'ûr xuya dike, eva p'izika k'otî ye, k'ahîn vê yekê bibîne û wî merivî nepaqij e'lam ke. <sup>4</sup>Lê heger r'îşîyê ç'ermê bedena wî sipî ye, lê ç'ermda k'ûr neçûye û pir'ç' jî sipî nebûye, hingê bira k'ahîn h'eft r'oja yê xweyîp'izik başqe ke. <sup>5</sup>Û r'oja h'efta k'ahîn bira dîna xwe bide wî, heger p'izik mîna xwe maye û li ser ç'erm bela nebûye, hingê k'ahîn bira cara dua jî wî

\* 13:2 Miletê cihû ev xebera «k'otîbûn» bona her cûr'e nexweşîya ç'erme giran didane xebatê.

başqe ke. <sup>6</sup>Û r'oja h'efta k'ahîn bira dîsa lê binihêr'e, heger p'izik k'ewya ye û li ç'erm bela nebûye, bira k'ahîn wî paqij e'lam ke, eva gir' e. Bira ew meriv k'incê xwe bişo û wê paqij be. <sup>7</sup>Lê heger bona paqijbûnê xwe nîşanî k'ahîn ke û paşê gir' li ç'erm bela be, gerekê ew dîsa xwe nîşanî k'ahîn ke. <sup>8</sup>K'ahîn dîna xwe bidê wekî gir' li ç'erm bela bûye, hingê k'ahîn dîsa wî nepaqij e'lam ke, ew p'izika k'otî ye.

<sup>9</sup>Heger li ser yekî p'izika k'otî hebe, gerekê wî bibine cem k'ahîn. <sup>10</sup>Bira k'ahîn dîna xwe bidê, heger gilêya ser ç'erm sipî ye û pir'ç'a ser jî sipî bûye, gilêda jî goştê saxlem heye, <sup>11</sup>eva k'otîbûna kevin e li ser ç'ermê bedana wî maye, bira k'ahîn wî nepaqij e'lam ke û wî başqe ke, çimkî ew nepaqij e. <sup>12</sup>Û heger k'otîbûn li ç'erm bela bûye û t'emamîya ç'ermê nexweş ji sêrî h'eta niga, awa gotî li wan cîyêd ku ç'e'vê k'ahîn dibîne k'otîbûnê hilda ye, <sup>13</sup>k'ahîn gava bibîne wekî k'otîbûnê temamîya bedena wî girtîye, hingê ew yê nexweş paqij e'lam ke, çimkî t'emamîya xweva sipî bûye, ew paqij e. <sup>14</sup>Lê gava ser bedena wî goştê saxlem k'ifş be, ew nepaqij be. <sup>15</sup>K'ahîn goştê saxlem ku bibîne wî merivî nepaqij e'lam ke. Goştê saxlem nepaqij e, ew k'otîbûn e. <sup>16</sup>Lê heger goştê saxlem dîsa bê guhar'tinê sipî be, hingê ew meriv gerekê bê cem k'ahîn. <sup>17</sup>Û k'ahîn bira dîna xwe bide wî, heger p'izika wî sipî bûye, hingê k'ahîn bira ewî xweyîp'izik paqij e'lam ke, ew paqij e.

<sup>18</sup>Heger ser ç'ermê yekî bide der û p'ak be, <sup>19</sup>peyr'a dewsa derbûnê gilêya sipî, yan r'îşîya sore-sipî bimîne, gerekê ew xwe nîşanî k'ahîn ke. <sup>20</sup>K'ahîn ku dîna xwe bidê, wekî r'îşî ç'ermda k'ûr çûye û pir'ç'a ser jî sipî bûye, k'ahîn wî nepaqij e'lam ke. Eva p'izika k'otî ye ji derbûnê bela bûye. <sup>21</sup>Lê heger k'ahîn dîna xwe bidê wekî pir'ç'a ser ne sipî ye û ç'ermda jî k'ûr neçûye lê qarîya ye, hingê k'ahîn bira wî h'eft r'oja başqe ke. <sup>22</sup>Û heger ew r'îşî li ç'erm bela be, hingê bira k'ahîn nepaqijîya wî e'lam ke, eva p'izika k'otî ye. <sup>23</sup>Lê heger r'îşî cîyê xweda bimîne û bela nebe, eva dexme ye daye der, k'ahîn bira wî paqij e'lam ke.

<sup>24</sup>Yan heger ç'ermê bedena yekî bişewite û dewsa dexma şewatê r'îşîya sore-sipî yan xur'û sipî lê bide der, <sup>25</sup>k'ahîn bira dîna xwe bidê, heger pir'ç'a li ser r'îşîyê r'engê xwe guhastîye sipî bûye û ç'ermda jî k'ûr çûye, eva îdî k'otîbûn e ji şewatê pêşda hatiye. Bira k'ahîn wî nepaqij e'lam ke, eva p'izika k'otî ye. <sup>26</sup>Lê heger k'ahîn dîna xwe bidê, wekî pir'ç'a li ser r'îşîyê sipî nebûye û ç'ermda k'ûr neçûye, lê hinekî qarîya ye, hingê k'ahîn wî h'eft r'oja başqe ke. <sup>27</sup>R'oja h'efta k'ahîn dîna xwe bidê, heger ewa li ç'erm bela bûye, hingê k'ahîn wî nepaqij e'lam ke, eva p'izika k'otî ye. <sup>28</sup>Lê heger r'îşî di cîyê xweda maye û li ç'erm bela nebûye, hinekî qarîya ye, eva gilêya şewatê ye. K'ahîn bira wî paqij e'lam ke, çimkî eva hewa şewatê ye.

<sup>29</sup>Heger p'izik li serî yan çena mêrekî yan jinekêda derê, <sup>30</sup>bira k'ahîn dîna xwe bide wê p'izikê, heger ewa ç'ermda k'ûr k'ifş dibe û pir'ç'a ser jî zirav û zer e, hingê bira k'ahîn wan nepaqij e'lam ke. Eva gewrika k'otîyê ye li sêrî yan çenê daye der. <sup>31</sup>Lê heger k'ahîn dîna xwe bide p'izika gewrikê wekî ew ç'ermda k'ûr neçûye, lê pir'ç'a r'eş jî li ser t'une, hingê k'ahîn bira ewî ku p'izika gewrikê lê derk'etîye h'eft r'oja başqe ke. <sup>32</sup>R'oja h'efta bira k'ahîn dîna xwe bide gewrikê, heger gewrik bela nebûye û pir'ç'a zer ser t'une, gewrik jî ç'ermda k'ûr neçûye, <sup>33</sup>hingê bira ew meriva pir'ç'a dora gewrikê kur' ke, lê ya li ser gewrikê kur' neke û k'ahîn cara duda evî merivî h'eft r'oja başqe ke. <sup>34</sup>R'oja h'efta k'ahîn dîna xwe bide gewrikê, heger gewrik li ç'erm bela nebûye û ç'ermda jî k'ûr neçûye, hingê k'ahîn bira paqijîya wî e'lam ke, ew jî k'incêd xwe bişo û paqij be. <sup>35</sup>Lê heger pey paqijbûnêr'a gewrik li ç'ermê wî bela be, <sup>36</sup>bira k'ahîn dîna xwe bidê, heger gewrik li ç'erm bela bûye, hingê k'ahîn bira îdî pir'ç'a zer neger'e, ew ne paqij e. <sup>37</sup>Lê belê heger gewrik mîna xwe maye û pir'ç'a r'eş lê derk'etîye, ku usa ye gewrik qenc bûye, ew paqij e, k'ahîn wî paqij e'lam ke.

<sup>38</sup>Lê heger li ser ç'ermê mêrekî yan jinekê r'îşî, awa gotî r'îşîyêd sipî lê p'eyde bin, <sup>39</sup>hingê k'ahîn bira lê binihêr'e,

heger r'îşîyêd li ser ç'ermê bedena wan sipîç'olkî ne, ew gir' e li ç'erm bela bûye, ew paqij e.

<sup>40</sup>Heger p'or'ê serê yekî biware, eva warandin e, ew paqij e. <sup>41</sup>Lê heger p'or'ê serê wî ne'tikêda biware eva k'eçelbûn e, ew paqij e. <sup>42</sup>Lê heger cîyê waryayî yan k'eçel p'izikeke p'îse sore-sipî hebe, eva p'izika k'otî ye, cîyê warîyayî yan k'eçelda daye der. <sup>43</sup>Hingê k'ahîn bira dîna xwe bidê heger p'izika cîyê warîyayî û k'eçelda hinekî sor-sipî ye û mîna wê p'izika k'otî ye li ser ç'ermê bedenê xuya dike, <sup>44</sup>eva meriva p'izika k'otî ye, nepaqij e, k'ahîn e'se nepaqijîya wî e'lam ke, p'izika p'îs li serê wî derk'etîye.

<sup>45</sup>Ewî xweyîp'izika k'otî gerekê k'incêd wî p'izinî bin, p'or'ê sêrî serda hatî û devê wî nixamtî be: «Ne paqij im! Ne paqij im!» bike gazî. <sup>46</sup>H'eta ku p'izik ser wî hebe ew nepaqij bê h'esabê. Ew ne paqij e, ew t'enê gerekê bimîne û cîyê mayîna wî ji zomê der be.

### **Qanûna bona k'efikîyê**

<sup>47</sup>Heger k'efik li ser k'incekê k'ifş be, li ser k'inca hirî yan k'inca k'itan, <sup>48</sup>p'arç'e yan tiştêkî hûnandî ji hirîyê yan k'itan çêkirî, yan li ser ç'erm, yan jî li ser tiştêkî pê ç'erm çêkirî be, <sup>49</sup>yan heger lek'e li ser k'inc yan ç'erm, yan li ser p'arç'e yan li ser tiştêkî hûnandî, yan jî li ser tiştêkî ji ç'erm k'esk yan sor lêxe, eva k'efikîbûn e, gerekê nîşanî k'ahîn kin. <sup>50</sup>K'ahîn bira dîna xwe bide lek'ê û wî tiştî k'îjan ku ji k'efikîyê lewitîye h'eft r'oja başqe ke. <sup>51</sup>Û r'oja h'efta k'ahîn bira dîna xwe bide wî tiştê lewitî, heger lek'e li wî k'incî bela bûye, heger p'arç'e be, yan tiştêkî hûnandî, yan ç'erm, yan jî tiştêkî ku bi ç'erm çêkirî be, ku usa ye eva k'efikîbûna ji hevhişdanê ye, ev nepaqij in. <sup>52</sup>Ew gerekê wî k'incî, yan p'arç'e, yan tiştêkî hûnandî ji hirîyê yan k'itan çêkirî, yan tiştêkî ku ji ç'erm çêkirî be, li ser k'îjanî eva lek'a hebe bişewitîne, çimkî eva k'efikaya ji hevhişdanê ye, gerekê ew ser agir bê şewitandinê. <sup>53</sup>Lê heger k'ahîn dîna xwe bidê

wekî k'efik li wî k'incî, yan p'arç'e yan tiştêkî hûnandî, yan li tiştêkî bi ç'erm çêkirî bela nebûye, <sup>54</sup>hingê k'ahîn bira e'mir ke, ku wî tiştê lewit'î bişon û h'eft r'oja dîsa wî başqe xwey ke. <sup>55</sup>Gava k'ahîn pey şûştina wî tiştîr'a dîna xwe bidê, heger k'efikê r'engê xwe neguhastîye û ew k'efik be-la jî nebûye, ew dîsa nepaqij e, wî tiştî ser êgir bişewitînî, eva k'efikîbûn e xwe avîtîye r'û yan jî r'ûyê vajî. <sup>56</sup>Û heger k'ahîn dîna xwe bidê, wekî pey şûştinêr'a lek'e qarîya ye, hingê k'ahîn bira wî cîyî ji wî k'incî, yan ji wî ç'ermî, yan ji wî p'arç'eyî, yan ji wî tiştê hûnandî biqelêşe. <sup>57</sup>Lê wekî ew dîsa li ser wî k'incî, yan p'arç'eyî, yan tiştêkî hûnandî, yan tiştêkî ji ç'erm çêkirî k'ifş be, eva k'efika ji hev hildanê ye, wî tiştê lek'e ser bişewitîne. <sup>58</sup>Lê heger ew k'inc, yan p'arç'e, yan tiştêkî hûnandî, yan tiştêkî ji ç'erm çêkirî pey şûştinêr'a lek'e jê her'e, bira ew dîsa bê şûştinê û wê paqij be». <sup>59</sup>Ev e qanûna bona k'efikîbûnê, ya ku li ser k'inca hirî yan k'itanî, yan p'arç'e, yan tiştêkî hûnandî, yan li ser her tiştê ji ç'erm çêkirî dertê, ku ew paqij yan nepaqij bêne e'lam kirinê.

### Qanûna paqijbûnê

**14** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Qanûna yê ji k'otîbûnêf paqijbûyî ev e: Wê r'oja paqijbûyî gerekê wî bibine cem k'ahîn. <sup>3</sup>K'ahîn ji zomê derk'eve û k'ahîn gava bibîne ku va ye yê k'otî ji k'otîbûna xwe qenc bûye, <sup>4</sup>hingê k'ahîn bira e'mir ke, bona merivê ku gere bê paqijkirinê du teyredeyêd h'elal bi saxî, dara erzê, r'îsê sorê gevez û zoxa hûsopêf bînin, <sup>5</sup>k'ahîn e'mir ke ku teyredêkî ser ava ji ç'e'vkanîyêye derdana axînda bê serjêkirinê. <sup>6</sup>Paşê ew wê teyreda dudaye sax t'evî dara erzê, r'îsê sorê gevez û zoxa hûsopê hilde. Vana t'evî teyreda sax, xûna wê teyredêda ke, ya ku li ser ava ji ç'e'vkanîyêda hate serjêkirinê. <sup>7</sup>H'eft cara bir'eşîne li ser yê ku gere ji k'otîbûnê bê paqijkirinê, wî paqij e'lam ke û teyreda sax ber'de çolê. <sup>8</sup>Ew merivê

ku paqij dibe bira k'incêd xwe bişo, pir'ç'a ser xwe hilde, avê li xwe ke û wê paqij be. Pey vê yekêr'a bik'eve zomê û h'eft r'oja nek'eve konê xwe. <sup>9</sup>R'oja h'efta dîsa h'emû p'or'ê xwe kur' ke, p'or'ê serê xwe, r'ûdana xwe, birîyêd xwe, awa gotî h'emû pir'ç'a ser xwe hilde û k'incêd xwe bişo, avê xwe ke paqij be. <sup>10</sup>Û r'oja h'eyşta du berxêd nêre bêqusûr, berxeke mêye yeksalîye bêqusûr û bona dîyarîyaf nanî ji dehe p'ara sê p'ar\* arê xas r'ûnda stirayî û logek\*\* jî r'ûn bira hilde, <sup>11</sup>k'ahînê ku paqij dike, merivê paqij dibe dîyarîyava li ber Xudan ber derê Konê Civînê bide sekinandinê. <sup>12</sup>Û k'ahîn berxekê hilde bona dîyarîyaf bervadayînê bide, wî r'ûnê\* derdanêda jî hilde, vana li ber Xudan çawa dîyarîya h'ejê bih'ejîne. <sup>13</sup>Berxê jî li wî cîyî serjêke, k'îderê dîyarîya paqijbûnê û dîyarîya t'evayîşewatê têne serjêkirinê, di cîyê pîrozda, çimkî dîyarîya paqijbûnê mîna dîyarîya bervadayînê k'ahîn'r'a dik'eve. Eva ya here pîroz e. <sup>14</sup>K'ahîn ji xûna dîyarîya bervadayînê hilde û gupika guhê wî merivîyî r'astê xe ku paqij dibe, usa jî t'ilîya mezine destê wîyî r'astê û pêç'îya mezine nigê wîyî r'astê. <sup>15</sup>Û k'ahîn ji wî r'ûnê derdanêda hilde bike li ser k'efa destê xweyî ç'epê. <sup>16</sup>Û k'ahîn t'ilîya xweye r'astê, wî r'ûnê destê xweyî ç'epêda ke û pê t'ilîya xwe ewî r'ûnî h'eft cara li ber Xudan bir'eşîne. <sup>17</sup>K'ahîn ji wî r'ûnê destê wîda mayî, gupika guhê wî merivîyî r'astê xe ku paqij dibe, usa jî t'ilîya mezine destê wîyî r'astê û pêç'îya mezine nigê wîyî r'astê, li ser xûna dîyarîya bervadayînê xe. <sup>18</sup>Paşê k'ahîn wî r'ûnê destê wîda mayî bike ser serê merivê ku paqij dibe û bona wî li ber Xudan k'ewandinê bike. <sup>19</sup>K'ahîn dîyarîya paqijbûnê bide û bona merivê ji nepaqijîya xwe ku paqij dibe k'ewandinê bike, paşê dîyarîya t'evayîşewatê

\* 14:10 Awa gotî «Sê kîlogram».

\*\* 14:10 «Log» derdaneke ji sê p'ara p'arekê lîtirê bû.

\* 14:12 Îbranî xeber bi xeber: «loge r'ûn».

serjêke. <sup>20</sup>Hingê k'ahîn dîyarîya t'evayîşewatê û dîyarîya nanî dayne li ser gorîgehê. K'ahîn bona wî k'ewandinê bike û ewê bibe paqij.

<sup>21</sup>Lê heger ew k'esîb e, destê wîda t'une haqas tişt bide, hingê bira ew bona gunek'ewandina xwe berxekê çawa dîyarîya bervadayînê bide ku bê h'ejandinê. Usa jî bona dîyarîya nanî ji dehe p'ara p'arek\* arê xasî r'ûnda stirayî û logek\*\* r'ûn, <sup>22</sup>du fatimoka, yan jî du cûcûkêd kewa, ji van k'îjan ku dik'evine dêst, yek ji van bona dîyarîya bervadayînê be, yek jî bona dîyarîya t'evayîşewatê. <sup>23</sup>Û r'o-ja h'eyşta ew bona paqijbûna xwe vana bîne cem k'ahîn, li ber derê Konê Civînê ber Xudan. <sup>24</sup>Û k'ahîn berxa dîyarîya bervadayînê û wê derdana r'ûn hilde, vana li ber Xudan çawa dîyarîya h'ejandinê bih'ejîne. <sup>25</sup>Paşê k'ahîn berxa dîyarîya bervadayînê serjêke û ji xûna berxa dîyarîya bervadayînê hilde gupika guhê wî merivîyî r'astê xe ku paqij dibe, usa jî t'ilîya mezine destê wîyî r'astê û pêç'îya mezine nigê wîyî r'astê. <sup>26</sup>K'ahîn ji wî r'ûnî bike k'efa destê xweyî ç'epê <sup>27</sup>û pê t'ilîya xweye r'astê k'ahîn ji wî r'ûnê destê xweyî ç'epêda ke, h'eft cara li ber Xudan bir'eşîne. <sup>28</sup>Û k'ahîn ji wî r'ûnê destê xweda gupika guhê wî merivîyî r'astê xe ku paqij dibe, usa jî t'ilîya mezine destê wîyî r'astê û pêç'îya mezine nigê wîyî r'astê, li ser xûna dîyarîya bervadayînê xe. <sup>29</sup>Lê ew r'ûnê destê k'ahînda mayî bira ew li ber Xudan bike li ser serê merivê ku paqij dibe û bona wî k'ewandinê bike. <sup>30</sup>Û ji fatimoka yan cûcûkêd kewa yekî, k'îjan ku bik'eve dêst, <sup>31</sup>k'îjan ku k'ete dêst, yekê bona dîyarîya paqijbûnê yekê jî bona dîyarîya t'evayîşewatê t'evî dîyarîya nanî bide. Û k'ahîn bona merivê paqij dibe k'ewandinê bike li ber Xudan». <sup>32</sup>Ev e qanûna bona nexweşêd p'izika k'otî û bona paqijbûna ewêd ku destê wanda t'une.

\* 14:21 Awa gotî «kîlogramek».

\*\* 14:21 «Log» derdaneke ji sê p'ara p'arekê lîtirê bû.

### Qenckirina k'efika malê

<sup>33</sup>Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>34</sup>«Gava hûn bi-  
k'evine wî welatê Kenanêf, k'îjanî ku ez çawa milk' didime  
we û ez pê k'efikîyê belayê bînime serê mala welatê milkê  
weda, <sup>35</sup>hingê xweyê malê gerekê her'e guhê k'ahîn pêxe û  
bêjê: «Mala xweda ez çawa bêjî k'efikîyê k'ifş dikim». <sup>36</sup>K'ahîn  
e'mir ke ku malê vala kin, hê berî ku ew bik'eve malê ku  
k'efikîyê bibîne, wekî her tiştêd malda tişteke nepaqij h'esab  
nebe. Pey vê yekêr'a k'ahîn bik'evê dîna xwe bide malê.  
<sup>37</sup>Heger ew dîna xwe bide k'efikê û bibîne, wekî k'efikê  
r'engê k'esk yan sorda xwe avîtîye dîwarêd malê k'ûrda çûne  
û ew ji r'ûyê dîwêr k'ûr k'ifş dikan, <sup>38</sup>hingê k'ahîn ji malê  
derk'eve li ber derê malê û h'eft r'oja malê k'ilît ke. <sup>39</sup>R'oja  
h'efta k'ahîn dîsa bê dîna xwe bidê, heger k'efik li dîwarêd  
wê malê bela bûye, <sup>40</sup>hingê k'ahîn e'mir ke, ku wan kevirêd  
k'efikê xwe avîtîyê derxin û bavêjine ji bajêr der cîkî ne paqij.  
<sup>41</sup>Malê hindur'va her çar alîya bide t'er'işandinê û xwelîya  
t'er'işandî jî bir'êjine ji bajêr der cîkî ne paqij. <sup>42</sup>Paşê kevirne  
din hildin daynine dewsa wan kevirê û xwelîke din hildin  
dîwêr sîwax kin.

<sup>43</sup>Lê heger pey kevirderxistinêr'a, malt'er'işandin û  
sîwaxkirinêr'a k'efik dîsa xwe bavêje malê k'ifş be, <sup>44</sup>hingê  
k'ahîn bira bê dîna xwe bidê, heger k'efik li malê bela  
bûye, eva îdî k'efika ji hev hildanê ye malda, ew ne paqij e.  
<sup>45</sup>Gerekê ew mal bê xirabkirinê, kevirêd wê, darêd wê û  
h'emû xwelîya wê ji bajêr der bê derxistin û avîtîne cîkî ne  
paqij. <sup>46</sup>Û k'îjan jî wan r'ojêd ew mal k'ilît kirî bik'eve wê  
malê, h'eta êvarê ne paqij be. <sup>47</sup>Û k'îjan wê malêda r'adizê  
gerekê k'incêd xwe bişo, usa jî yê wê malêda nan dixwe  
gerekê k'incêd xwe bişo.

<sup>48</sup>Lê gava k'ahîn bê dîna xwe bidê wekî pey malsîwaxkirinêr'a  
k'efik li malê bela nebûye, hingê k'ahîn wê malê paqij e'lam  
ke, çimkî k'efik derbaz bûye. <sup>49</sup>Û bona paqijbûna wê malê,

k'ahîn du teyreda, dara erzê, r'îsê sorê gevez û zoxa hûsopê hilde, <sup>50</sup>teyredêkî ser ava ji ç'e'vkanîyêye derdana axînda serjêke. <sup>51</sup>Dara erzê, zoxa hûsopê û r'îsê sorê gevez t'evî teyreda sax hilde, vana xûna wê teyreda serjêkirî û ava ç'e'vkanîyêda ke û h'eft cara li malê bir'eşîne. <sup>52</sup>Malê pê xûna teyreda serjêkirî, pê wê ava ç'e'vkanîyê û pê teyreda sax, t'evî dara erzê, zoxa hûsopê û r'îsê sorê gevez paqij ke. <sup>53</sup>Lê teyreda sax ji bajêr der deştêda ber'de, bona wê malê k'ewandinê bike û wê paqij be».

<sup>54</sup>Ev e qanûna her p'izika k'otî û gewrêkê, <sup>55</sup>yan k'efikîya li ser k'inca yan li malê, <sup>56</sup>usa jî ya gilê, gir' û r'îşîya. <sup>57</sup>Ev e hînkirina bona qanûna ji k'otîbûn û k'efikîyê paqijbûnê yan ne paqijbûnê.

### Qanûna nepaqijîya qalibê însên û paqijbûna wî

**15** Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeberdin û bêjine wan: «Heger bedena yekî ser gemarê vebe, ev gemarjêçûyîna wî nepaqij e. <sup>3</sup>Nepaqijîya wî dema gemarjêçûyîna wîda eva be: Gava ji bedena wî gemar jê her'e yan jî bedena wî ji gemarê bê bir'înê, eva nepaqijaya wî ye. <sup>4</sup>Ew nivîna ku gemarjêçûyî bik'evê, ew nepaqij e, li ser çi tiştî jî ku r'ûnî ew nepaqij e. <sup>5</sup>Ew kesê ku nivîna wî k'eve, gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>6</sup>Ew kesê ku li ser wî tiştî r'ûnî, li ser k'îjanî gemarjêçûyî r'ûniştibe, ew gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>7</sup>Ew kesê ku bedena gemarjêçûyî k'eve, ew gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>8</sup>Heger gemarjêçûyî t'ûyî li ser kesekî paqij ke, ew gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>9</sup>Ew zîne ku yê gemarjêçûyî li ser r'ûnî, ew nepaqij be. <sup>10</sup>Ew kesê ku tişteki bin wî k'eve, h'eta êvarê nepaqij be û ew kesê wan tiştê hilde, ew gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>11</sup>Û ew kesê ku gemarjêçûyî destneşûştî lêk'eve, ew gerekê

k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>12</sup>Ew derdana axîn, k'îjan ku gemarjêçûyî lêk'eve gerekê bê şkenandinê, lê derdana darîn gerekê pê avê bê şuştinê.

<sup>13</sup>Lê gava gemarjêçûyî ji gemarê xilaz be, ew gerekê bona paqijbûna xwe h'eft r'oja xwer'a bijmire, k'incêd xwe bişo û bedena xwe jî pê ava ç'e'vkanîyê bişo û wê bibe paqij.

<sup>14</sup>Û r'oja h'eysta ew gerekê bona xwe du fatimoka yan jî du cûcûkêd kewa hilde li ber Xudan ber derê Konê Civînê bisekine û vana bide k'ahîn. <sup>15</sup>K'ahîn ji van yekê bike dîyarîya paqijbûnê, yekê jî bike dîyarîya t'evayîşewatê û k'ahîn bona gemarjêçûyîna wî k'ewandinê bike li ber Xudan.

<sup>16</sup>Heger t'oximê mêrekî jê her'e, ew gerekê bedena xwe pêva pê avê bişo û h'eta êvarê ew nepaqij be. <sup>17</sup>Û ew t'oximê jêçûyî çî k'incî yan çî ç'ermî k'eve, ew gerekê pê avê bê şuştinê û h'eta êvarê nepaqij be. <sup>18</sup>Heger mêr serê xwe k'ulfetêr'a dayne û t'oxim jê her'e, ewana gerekê pê avê xwe bişon û h'eta êvarê ne paqij bin.

<sup>19</sup>Heger k'ulfetek piştta wê vebe û xûn jê her'e, gerekê h'eft r'oja ewa nava kirasada xwe xweyî ke û her kesê ku wê k'eve, h'eta êvarê ne paqij be. <sup>20</sup>H'emû wextê nava kirasada ewa li ser çî p'alde ew tişt ne paqij be û li ser çî tiştî jî ku r'ûnî, ew tişt ne paqij be. <sup>21</sup>Her kesê ku nivîna wê k'eve, gerekê k'incê xwe bişo, xwe jî pê avê bişo û h'eta êvarê nepaqij be. <sup>22</sup>Û ew kesê ku li wî tiştî k'eve li ser çî ewa r'ûniştî ye, gerekê k'incê xwe bişo, xwe jî pê avê bişo û h'eta êvarê nepaqij be. <sup>23</sup>Ew kesê ku tişteki nivîna wê yan jî wî tiştî k'eve li ser çî ewa r'ûdinê, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>24</sup>Heger mêr serê xwe wêr'a dayne, ew xwe dilewit'îne, h'eft r'oja ew nepaqij be û li ser çî nivînê ew p'alde ew nepaqij be.

<sup>25</sup>Heger k'ulfetek ne wextê xweda gelek r'oja xûnê bibîne, yan jî ji çapê der kirasa bibîne, ew h'emû r'ojêd nepaqijaya wê gerekê mîna wan r'ojêd piştvebûna wê bin, ewa nepaqij e. <sup>26</sup>Li ser çî nivînê ew p'alde, di nava wan r'ojêd ku ew xûnê dibîne, mîna nivîna piştvebûna wê nepaqij be û li ser çî tiştî

ku ew r'ûnê, mîna nepaqijîya piştvebûna wê nepaqij be. <sup>27</sup>Û her kesê ku li wan tiştta k'eve, wê nepaqij be, ew gerekê k'incê xwe bişo û xwe jî pê avê bişo, h'eta êvarê nepaqij be. <sup>28</sup>Lê gava ew ji gemarê bê bir'înê, hingê gerekê ewa h'eft r'oja xwer'a h'esab ke û paşê paqij bê h'esabê. <sup>29</sup>R'oja h'eyşta eva du fatimoka yan jî du cûcûkêd kewa xwer'a hilde û vana bîne cem k'ahîn li ber derê Konê Civînê. <sup>30</sup>K'ahîn yekê bike dîyarîya paqijbûnê û yekê jî bike dîyarîya t'evayîşewatê, k'ahîn k'ewandinê li ber Xudan bike bona paqijbûna ji gemara wê.

<sup>31</sup>Bi vî awayî zar'êd Îsraêl ji nepaqijaya wan xwey kin, wekî Konêf minî Şe'detîyêyî nava xweda neh'er'imînin, nava nepaqijaya xweda nemirin». <sup>32</sup>Ev e qanûna bona yê gemar jê diçe, usa jî bona nepaqijê ku t'oxim jê dertê <sup>33</sup>û nexweşa ku ser kirasa vedibe, mêr yan k'ulfeta gemar ji wan diçe û mêrê ku serê xwe t'evî k'ulfeta nepaqij datîne.

### R'oja<sup>f</sup> salêye k'ewandinê

**16** Xudan pey mirina her du kur'êd Harûnr'a, yêd ku ber Xudan sekinîn û mirin, Mûsar'a xeberda. <sup>2</sup>Xudan gote Mûsa: «Bêje birê xwe Harûn, ku her gav nek'eve cîyê pîroz pişt p'er'dê, li ber qalp'axê baxşandinêyî li ser sindoqê ku nemire. Çimkî ezê nava e'wrda li ser qalp'axê baxşandinê k'ifş bim. <sup>3</sup>Awa pê çi Harûn dikare bik'eve di cîyê pîroz: Pê canegakî bona dîyarîya<sup>f</sup> paqijbûnê û pê beranekî bona dîyarîya t'evayîşewatê. <sup>4</sup>Kirasê k'itanîyî pîroz gerekê li xwe ke û hevalkirasê k'itanî li wî be, benpiştta k'itanî bide piştta xwe û p'ap'axê k'itanî bide serê xwe. Evana k'incêd pîroz in, gerekê xwe pê avê bişo û paşê van k'inca li xwe ke. <sup>5</sup>Û ji civîna zar'êd Îsraêl jî du nêrîya hilde bona dîyarîya paqijbûnê û beranekî jî bona dîyarîya t'evayîşewatê.

<sup>6</sup>Harûn wî canegayê dîyarîya paqijbûnê bona xwe bide û k'ewandinê bona xwe û mala xwe bike. <sup>7</sup>Û du nêrîya hilde li ber Xudan li ber derê Konê Civînê bide sekinandinê. <sup>8</sup>Hingê Harûn li ser wan her du nêrîya p'eşk bavêje, p'eşkekê bona

Xudan, yekê jî bona azaberdana\* nêrî. <sup>9</sup>Û Harûn wî nêrîyê ku bi p'êşkavîtinê Xudanr'a k'et, bike dîyarîya paqijbûnê. <sup>10</sup>Lê ew nêrîyê ku p'êşk jêr'a k'et bê azakirinê, wî li ber Xudan sax bide sekinandinê ku bi wî k'ewandin bê kirinê û wî aza ber'dî ber'îyê.

<sup>11</sup>Û Harûn wî canegayê dîyarîya paqijbûnê bona xwe bide, k'ewandinê bona xwe û mala xwe bike û canegayê dîyarîya paqijbûna xwe serjêke. <sup>12</sup>Paşê ji ser wê gorîgeha li ber Xudan agirdangê t'ijî k'ûra agir ke û du k'ulm t'ijî bixûraf bînxweşe hûrlêdayî ke, bibe pişt p'er'dê. <sup>13</sup>Bixûrê li ber Xudan bike li ser wî agirî, hingê dîyê bixûrê wê li ser qalp'axê baxşandinêyî li ser devê Sindoqaf Şe'detîyê bigire, wekî ew nemire. <sup>14</sup>Û xûna wî canegayî hilde pê t'ilîya xwe alîyê r'ohilatêva bir'eşîne li ser qalp'axê baxşandinê, h'eft cara pê t'ilîya xwe xûnê bir'eşîne li ber qalp'axê baxşandinê.

<sup>15</sup>Paşê nêrîyê dîyarîya paqijbûnê ji ber gunê cime'têva serjêke û xûna wî bibe pişt p'er'dê, pê xûna wî jî usa bike, çawa pê xûna canega kir, wê bir'eşîne li ser qalp'axê baxşandinê û li ber qalp'axê baxşandinê. <sup>16</sup>Û cîyê pîroz ji nepaqijî û h'emû neheqîyêd gunêd zar'êd Îsraêl paqij ke. Aha jî gerekê ew bona Konê Civînê bike ku cem wan nava nepaqijaya wanda ye. <sup>17</sup>T'u kes gerekê Konê Civînêda t'unebe, gava ew bona k'ewandinê bik'eve cîyê pîroz h'eta ku ew derê. Bi vî awayî ew xwe mala xwe û t'emamîya civîna Îsraêl paqij ke. <sup>18</sup>Paşê derê ber gorîgeha li ber Xudan û bona wê k'ewandinê bike û ji xûna canegê û nêrî her çar alîyava stirûyêd gorîgehê xe <sup>19</sup>û xûnê pê t'ilîya xwe h'eft cara bir'eşîne li ser gorîgehê û ji nepaqijayêd zar'êd Îsraêl wê paqij ke û pîroz ke.

<sup>20</sup>Bona cîyê pîroz, Konê Civînê û gorîgehê ku k'ewandinê bike xilaz ke, peyr'a bira nêrîyê sax bîne, <sup>21</sup>Harûn bira her du destêd xwe dayne li ser serê nêrîyê sax û li ser wîda h'emû

---

\* 16:8 Vira û usa jî r'êza 10 û 26 da îbranîf xeber bi xeber nivîsar e: «azazêl» ku tê h'esabê çawa nêrî aza ber'dan yan jî hine zane dibêjin ku «Azazêl» ev navê cinekî bû ku li ber'îyêda dima.

bêolîtîyêd zar'êd Îsraêl, h'emû neheqîyêd wan, h'emû gunêd wanva bide r'ûyê xwe. Û vana bide li serê nêrî, bi destê merivekî k'ifşkirî bişîne ber'îyê. <sup>22</sup>Nêrî bira h'emû bêolîtîyêd wan li ser xwe bibe e'rdekî xikî-xwelî û ew nêrî li ber'îyê bê ber'dan.

<sup>23</sup>Û pey vê yekêr'a Harûn bik'eve Konê Civînê, wan k'incêd k'itanî k'îjan ku ewî xwekirin k'ete cîyê pîroz, ji xwe bêxe û wan li wir bihêle. <sup>24</sup>Ew bedena xwe di cîkî pîroz pê avê bişo û k'incêd xwe li xwe ke, derk'eve dîyarîya xweye t'evayîşewatê û dîyarîya t'evayîşewatêye bona cime'tê bide, bi vî awayî bona xwe û cime'tê k'ewandinê bike. <sup>25</sup>Bezê dîyarîya paqijbûnê jî li ser gorîgehê bişewitîne. <sup>26</sup>Û ewê ku nêrîyê azadîyê dibe ber'dide, gerekê k'incê xwe bişo û bedena xwe jî pê avê bişo, paşê bik'eve zomê. <sup>27</sup>Lê wî canegayê bona dîyarîya paqijbûnê û nêrîyê bona dîyarîya paqijbûnê, xûna k'îjana bona k'ewandinê k'ete cîyê pîroz, gerekê vana ji zomê derxin û ç'ermêd wan, goştê wan û e'deba wan ser agir bişewitînin. <sup>28</sup>Ewê ku wan bişewitîne, gerekê k'incêd xwe bişo û bedena xwe jî pê avê bişo, paşê bik'eve zomê.

<sup>29</sup>Bira ev yek wer'a bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê, dehê meha h'eftada ta bin xwe bişkênin û t'u şixulî nekin, ne binelîyê welêt û ne jî xerîbê ku nava weda dimîne. <sup>30</sup>Çimkî wê r'ojêf k'ahînê bona we k'ewandinê bike ku we paqij ke, wekî hûn ji h'emû gunêd xwe li ber Xudan paqij bin. <sup>31</sup>Eva bona we mîna r'ih'etîya r'ojaf şemîya be, qeyde-qanûnê h'eta-h'etayê ye, nefsa xwe ta kin xwe bişkênin. <sup>32</sup>K'ewandinê gere ew serekk'ahîn bike, k'îjan ku hatîye r'ûnkirin û qewîn-qedîmkirinê, wekî dewsa bavê xwe k'ahîntîyê bike. Ew gere k'incêd k'itanî awa gotî k'incêd pîroz li xwe ke <sup>33</sup>û k'ewandinê bike bona cîyê herî pîroz, bona Konê Civînê û gorîgehê, usa jî bona k'ahîna û t'emamîya civîna mixulqetê. <sup>34</sup>Ev yeka bona we bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê, salê carekê h'emû gunêd zar'êd Îsraêl bê k'ewandinê». Û Harûn usa kir, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû.

### Qanûna h'eywan serjêkirinê

**17** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî Harûn, kur'êd wî û h'emû zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan, ku ew e ew tiştê ku Xudan e'mir kir û got: <sup>3</sup>«heger ji mala Îsraêl kesek ga yan pêz yan bizinê zomêda serjêke, yan ji zomê der serjêke <sup>4</sup>û neyne li ber derê Konê Civînê, li ber Konê Şe'detîya Xudan, ku Xudan'r'a bike qurban, ew xûnê li ser wî merivî bê h'esabê, ewî xûn r'êtîye, ew meriva ji nava cime'ta xwe gerekê bê undakirinê. <sup>5</sup>Ev yek bona wê yekê ye, ku zar'êd Îsraêl ew qurbanêd ku li çolê serjêdikin, Xudan'r'a bînine li ber derê Konê Civînê cem k'ahîn, çawa dîyarîyêd heleqetîyê bona Xudan serjêkin. <sup>6</sup>Û k'ahîn xûnê bir'eşîne li ser gorîgeha Xudane li ber derê Konê Civînê û bez jî bona bînxweşîyê Xudan'r'a bişewitîne. <sup>7</sup>Qurbanêd xwe jî ew îdî bira cinar'a nekin qurban, ku pey wan diçin bêe'silîyê dikin. Ev yeka nava nisilêd wanda bira bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê».

<sup>8</sup>Û bêje wan: «heger yekî ji mala Îsraêl yan jî xerîbekî ku nava wanda dimîne dîyarîya t'evayîşewatê yan qurbanê bike <sup>9</sup>û neyne li ber derê Konê Civînê ku Xudan'r'a bide, ew meriva ji nava cime'ta xwe bê undakirinê.

### Xûnxwarin qedexe ye

<sup>10</sup>Heger yekî ji mala Îsraêl, yan jî xerîbekî ku nava wanda dimîne xûna h'eywanekî bixwe, ezê berê xwe bidime ew kesê xûnxwar û wî ji nava cime'ta wî unda kim. <sup>11</sup>Çimkî e'mirê her bînberî xûnêda ye û min ew da we ku hûn pê wê li ser gorîgehê k'ewandinê bona e'mirê xwe bikin, çimkî xûn bona e'mir k'ewandinê dike. <sup>12</sup>Lema min gote zar'êd Îsraêl: «Ji we t'u kes xûnê nexwe, usa jî xerîbê ku nava weda dimîne xûnê nexwe». <sup>13</sup>Heger kesekî ji zar'êd Îsraêl, yan jî xerîbekî ku nava wanda dimîne nêç'îrêda h'eywanekî yan teyredeke ku tê xwarinê bigire, gerekê bihêle xûn jê her'e û pê xwelîyê xûnê binixême. <sup>14</sup>Çimkî e'mirê her bînberî xûna

wî ye, xûna wî e'mirê wî ye. Lema min gote zar'êd Îsraêl: «Xûna t'u bînberî nexwin, çimkî xûna her bînberî e'mirê wî ye, k'ê ku bixwe wê bê undakirinê». <sup>15</sup>Û ew kesê ku mirar yan de'vexwarî bixwe, heger binelî be yan xerîb, gerekê k'incêd xwe bişo, pê avê xwe bişo û h'eta êvarê nepaqij be, paşê paqij bê h'esabê. <sup>16</sup>Lê heger ew k'incêd xwe neşo û xwe neşo, hingê ew gune dike stûyê xwe».

### Heleqetîya cî-nivînêye necayîz

**18** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêlf xeber de û bêje wan: «Ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>3</sup>Mîna wan kirêd welatê Misirê, k'îjanîda ku hûn têda diman nekin, mîna wan kirêd welatê Kenanê, k'îjanî ku ezê we bibimê, nekin û li pey e'rf-e'detêd wan neçin. <sup>4</sup>Qirarêd min biqedînin û qeyde-qanûnêd min xwey kin pê wan her'in, ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>5</sup>Qeyde-qanûn û qirarêd min xwey kin, ew merivê ku biqedîne bi wan wê bijî, ez Xudan im.

<sup>6</sup>T'u kes nêzîkî pismama xweye nêzîk nebe ku şerma wê veke, ez Xudan im. <sup>7</sup>Şerma bavê xwe yan şerma dîya xwe venekî. Ewa dîya te ye şerma wê venekî. <sup>8</sup>Şerma jinbava xwe venekî, ew şerma bavê te ye. <sup>9</sup>Şerma xûşka xwe, qîza bavê xwe, yan qîza dîya xwe, heger malda bûyî be yan der-va şerma wan venekî. <sup>10</sup>Şerma qîza kur'ê xwe, yan şerma qîza qîza xwe venekî, çimkî ew şerma te ye. <sup>11</sup>Şerma qîza jinbava xwe, ku ji bavê te bûye ew xûşka te ye, şerma wê venekî. <sup>12</sup>Şerma met'a xwe venekî, çimkî ewa ji xûna bavê te ye. <sup>13</sup>Şerma xatîya xwe venekî, çimkî ewa ji xûna dîya te ye. <sup>14</sup>Şerma apê xwe venekî û nêzîkî jina wî nebî, ew jinapa te ye. <sup>15</sup>Şerma bûka xwe venekî, ewa jina kur'ê te ye, şerma wê venekî. <sup>16</sup>Şerma jinbira xwe venekî, ew şerma birê te ye. <sup>17</sup>Şerma k'ulfetekê qîzêva venekî û qîza kur'ê wê yan qîza qîza wê nestînî ku şerma wan vekî, evana xûnek in, ev yeka k'irêtî ye. <sup>18</sup>Xûşkekê neynî li ser xûşkê saxîya wêda şerma wê vekî, bikî hêwî.

<sup>19</sup>Nêzîkî k'ulfetê nebî ku şerma wê dema nepaqijaya wêda vekî, gava li ser kirasa vedibe. <sup>20</sup>Serê xwe jina t'u kesîr'a daneynî ku t'evî wê biher'imî. <sup>21</sup>Zar'êd xwe t'u car Molox-r'a\* nekin qurban, navê Xwedêyê xwe bêhurmet nekin. Ez Xudan im. <sup>22</sup>Serê xwe qisimê mêrar'a daneynî çawa mîna qisimê jinê, ev yek k'irêtî ye. <sup>23</sup>Serê xwe t'u h'eywanêr'a daneynî ku t'evî wê biher'imî û k'ulfet t'u car xwe nede li ber h'eywên ku h'eywan lêk'leve, ev yek k'irêtî ye.

<sup>24</sup>Pê t'u tişteki ji van xwe neh'er'imînin, çimkî pê van h'emû tiştên wan mileta xwe h'er'imandine, k'îjana ku ezê ber'dimê wan ji ber we r'aqetînim. <sup>25</sup>E'rd h'er'imî, ezê bela wî bînime serê wî, e'rdê jî me'dê xwe ji binelîyêd xwe li hev xist. <sup>26</sup>Lê hûn qeyde-qanûn û qirarêd min xwey kin û ji van k'irêtîya t'u tiştî nekin, ne yê binelî, ne jî xerîbê ku nava weda dimîne. <sup>27</sup>Çimkî berî we, wan merivêd wî welatî ev h'emû h'eramî kirin û welat h'er'imî. <sup>28</sup>Nebe ku welat me'dê xwe ji we jî li hev xe, gava hûn wî biher'imînin, çawa berî we me'dê wî ji wan mileta lihev k'et. <sup>29</sup>Çimkî k'î ku ji van h'emû k'irêtîya yekî bike, xweyê van kira gerekê ji nava cime'ta xwe unda be. <sup>30</sup>Awa t'emîyêd min xwey kin, wekî wan e'detêd k'irête ku berî we hatine kirinê hûn nekin û pê wan neh'er'imin. Ez Xudan Xwedêyê we me».

### Qeyde-qanûnêd heqî û pîrozîyê

**19** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Pîroz bin, çimkî ez Xudan Xwedêyê we pîroz im. <sup>3</sup>Ji we her kes qedirê dê û bavê xwe bigire û r'ihletîya şemîyêd min xwey kin, ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>4</sup>Li p'ûta veneger'in û xwer'a xwedêyêd r'okirî çenekin, ez Xudan Xwedêyê we me.

<sup>5</sup>Gava hûn Xudanr'a dîyarîyaf heleqetîyê bidin, usa bidin ku bê qebûlkirinê. <sup>6</sup>Wê r'oja ku we dîyarî da û r'ojtira dinda gerekê ew bê

---

\* 18:21 «Molox» navê xwedêyê kenanîya bû.

xwarinê û çî jî ma r'oja sisîya ew gerekê bê şewitandinê. <sup>7</sup>Lê heger r'oja sisîya ji wê bê xwarinê ew h'eramî ye, nayê qebûlkinê. <sup>8</sup>K'î ku ji wê bixwe, ew gune dike stûyê xwe, çimkî ew tiştêd Xudane pîroz dih'er'imîne, ew kesa ji nava cime'ta xwe gerekê bê undakirinê.

<sup>9</sup>Gava hûn zevîya xwe bidirûn, devê zevîyê h'eta xilazîyê nederûyî û simbilêd ji zevîya te k'etî berev nekî. <sup>10</sup>Tirîyêd xwe ku diçinî paşin nekî, tirîyêd ji destê te k'etî hilnede, wana yê k'esîb û xerîbr'a bihêle, ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>11</sup>Dizîyê nekin, derewa nekin û hevdu nexapînin. <sup>12</sup>Pê navê min derew sond nexwin û navê Xwedê xwe bêhurmet nekin. Ez Xudan im.

<sup>13</sup>Dilê kesekî neêşînî û t'alan nekî, heqê xebata p'aleyê te h'eta sibehê li cem te nemîne. <sup>14</sup>Nifir'a li yê ker' nekî, tiştêkî nedî li ber nigê yê kor, lê ji Xwedêyê xwe bitirse. Ez Xudan im. <sup>15</sup>Dîwanêda ner'astîyê nekin, pişta belengaza negirin ne jî qedir li yê mezin bikin, r'ast li ser îşê wanda binihêr'in. <sup>16</sup>Nava cime'ta xweda buxdanbîyê nekî, nebî bayîsê serê hevalê xwe. Ez Xudan im.

<sup>17</sup>Dilê xweda nejenî birê xwe, hevalê xwe hilêyî, ku gunê wî tu nek'îşînî. <sup>18</sup>H'eyfê hilnedî û k'înê zar'êd cime'ta xwer'a nejoyî, lê hevalê xwe weke xwe h'iz bikî. Ez Xudan im.

<sup>19</sup>Qeyde-qanûnêd min xwey kin, h'eywanekî xwe t'evî h'eywanekî cûr'ekî mayîn nedî kelkirinê, zevîya xwe du cûr'e t'oxim ner'eşînî, k'inca bi du cûr'e t'êla çêkirî xwe neke.

<sup>20</sup>Heger yek serê xwe k'ulfeteke xulamoka merivekîr'a dayne ku yekîr'a nîşankirî be, ya ku hela hê nehatîye k'ir'inê yan azadî jêr'a nehatîye dayînê, gerekê her du jî bêne cezakirinê, lê mirin ji wan'a nak'eve, çimkî k'ulfet ne aza bû. <sup>21</sup>Û mêr bira dîyarîya<sup>f</sup> ji bervadayîna xwe beranekî Xudanr'a bîne li ber derê Konê Civînêf. <sup>22</sup>K'ahîn bona wî pê beranê dîyarîya ji bervadayînê li ber Xudan bona gunê wîyî kirî k'ewandinê bike û gunê wîyî kirî wê lê bê baxşandinê.

<sup>23</sup>Gava ku hûn bik'evine wî welatê Kenanê û her cûr'e darêd xweyîber daç'ikînin, berêd wan nepaqij\* h'esab kin.

---

\* 19:23 Îbranîf xeber bi xeber «ne sinetkirî» e, ku tê fe'mkirinê hê ne hazir e ku bona Xwedê çawa dîyarî bê dayînê.

Sê sala gerekê ew ber bona we nepaqij h'esab bin û ew neyêne xwarinê. <sup>24</sup>Lê sala çara h'emû berê wan dara pîroz h'esab kin û bona pesindayîna Xudan bidin. <sup>25</sup>Sala pêna hûn paşê dikarin berê wan bixwin. Bi vî awayî berê darêd wê li we zêde bin. Ez Xudan Xwedêyê we me.

<sup>26</sup>T'u tiştî xûnêva nexwin. R'e'mildarîyê yan pîresêrtîyê nekin. <sup>27</sup>P'or'ê dora serê xwe kur' neke û serê r'ûdana xwe nebir'e. <sup>28</sup>Bona mirî birîna li ser xwe çê nekin û nivîsarêd k'utayî li xwe dernexin. Ez Xudan im.

<sup>29</sup>Qîza xwe neh'er'imînî, wê bona p'ût nedî qavîyê\*, wekî welat qavîyê neke û k'irêtîyêva t'ijî nebe. <sup>30</sup>R'ih'etîya şemîyêd min xwey kin, qedirê pîrozgeha min bigirin, ez Xudan im.

<sup>31</sup>Neçine cem yêd gazî r'uh'a dikin û ji micêwirê\* cina nepirsîn, ku ji wan hûn neh'er'imin. Ez Xudan Xwedêyê we me.

<sup>32</sup>Li ber yê p'or'sipî r'abe û qedirê e'mirê mezin bigire, ji Xwedêyê xwe bitirse. Ez Xudan im.

<sup>33</sup>Heger xerîbek e'rdê weda cî-war be bimîne, tengasîyê nedine wî. <sup>34</sup>Xerîbê ku nava weda bimîne bona we bira mîna binelîyê welatê we be, weke xwe wî h'iz bikî, çimkî hûn jî welatê Misirêda xerîbîyêda bûne. Ez Xudan Xwedêyê we me.

<sup>35</sup>Dîwankirinêda neheqîyê nekin, ne çapê, ne mêzîne ne jî pîvanêda. <sup>36</sup>Bira mêzîna we r'ast be, kevirê mêzîne r'ast, koda\* we r'ast, cêr'ê\*\* we r'ast be. Ez Xudan Xwedêyê we me, yê ku hûn ji welatê Misirê derxistin. <sup>37</sup>H'emû qeyde-qanûnêd min û qirarêd min xwey kin û wan biqedînin. Ez Xudan im».

---

\* 19:29 «Qavîya p'ût» ev in yêd ku heqê qavîya xwe danîn ocaxa p'ût, bi vê kirina xwe ocaxa p'ûtada h'elal dihatine h'esabê, çimkî bi qavîya xwe k'ar didane ocaxa p'ûta. Qedirê yêd aha ocaxêd p'ûtada gelekî bilind bû.

\* 19:31 Awa gotî k'oç'ektî û r'e'mildarîya ne ji Xudan.

\* 19:36 Îbranî xeber bi xeber: «Êfa». Êfa derdanekî 10 lîtirê bû.

\*\* 19:36 Îbranî xeber bi xeber: «hîn». Hîn cêr'ekî 4 lîtirê bû.

### Belayêd p'ûtp'aristîyê

**20** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Usa jî bêje zar'êd Îsraêl: «K'î ji zar'êd Îsraêl yan jî xerîbekî nava Îsraêlda ku dimîne zar'a xwe Moloxr'a bike qurban, ew gerekê e'se bê kuştinê, cime'ta wî welatî ewî bide li ber kevira. <sup>3</sup>Ezê berê xwe bidime li wî merivî û ewî ji nava cime'ta wî bidime undakirinê, çimkî ewî ji zar'êd xwe dane Molox, wekî Pîrozgeha min biher'imîne û navê minî pîroz bêhurmet ke. <sup>4</sup>Lê gava ew meriva ji zar'êd xwe bide Molox û cime'ta wî welatî ç'e'vê xwe bigire wekî wî nekujin, <sup>5</sup>hingê ezê berê xwe bidime li wî merivî û mala wî, ewî û wan merivêd ku li pey wî diçin ku t'evî Molox bête'silîyê bikin ji nav cime'ta wan bidime undakirinê.

### R'uh'gazîkirin û micêwirê cina

<sup>6</sup>Û ewê ku xwe li yê gazî r'uh'a dike û micêwirê cina bigire ku r'îya wanda her'e bête'silîyê bike, ezê berê xwe bidime wî, ewî ji nava cime'ta wî bidime undakirinê. <sup>7</sup>Awa xwe pîroz kin û pîroz bin, çimkî ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>8</sup>Qeyde-qanûnêd min xwey kin û biqedînin, çimkî ez Xudan im pîrozkirê we. <sup>9</sup>Ewê ku nifir'a dê û bavê xwe bike, e'se ew gerekê bê kuştinê. Ewî nifir' li dê û bavê xwe kirine, xûna wî li serê wî be.

### Zinêk'arî

<sup>10</sup>Ewê ku dest bavêje k'ulfeteke mêrkirî, yan jî dest bavêje jina yekî, e'se ew gerekê bê kuştinê, yê kirî jî ya kirî jî. <sup>11</sup>Û ewê ku serê xwe jinbava xwer'a dayne, ewî şerma bavê xwe vekir, e'se ew her du jî gerekê bêne kuştinê, xûna wan li serê wan be. <sup>12</sup>Heger yek serê xwe bûka xwer'a dayne, e'se her du jî gerekê bêne kuştinê, vana k'irêtî kirîye, xûna wan li serê wan be. <sup>13</sup>Heger yek çawa t'evî k'ulfetê serê xwe mêrekîr'a dayne, her duya jî k'irêtî kirîye, e'se gerekê bêne kuştinê, xûna wan li serê wan be. <sup>14</sup>Heger yek jinekê bistîne û dê jî pêr'a, eva bêolîtî ye, ewî jî wana jî agir berdinê

bişewitînin, ku nava weda bêolîtî t'unebe. <sup>15</sup>Heger yek serê xwe h'eywên'r'a dayne, e'se ew gerekê bê kuştinê, h'eywan jî gevev kî. <sup>16</sup>Heger jinek xwe bide li ber h'eywanekî ku ew li wê k'leve, jinê jî h'eywan jî bikujî, e'se ewana gerekê bêne kuştinê, xûna wan li serê wan be.

<sup>17</sup>Heger yek xûşka xwe bistîne, awa gotî qîza bavê xwe, yan jî qîza dîya xwe, ewî ku şerma wê dîtîye, ewê jî şerma wî, ev yek k'irêtî ye, evana ji ber ç'e'vê cime'ta xwe gerekê bêne undakirinê. Ewî ku şerma xûşka xwe vekir, gerekê ew gunê xwe bik'işîne. <sup>18</sup>Heger yek dema nexweşîya k'ulfetê serê xwe wê'r'a dayne, şerma wê veke, ew wê li ser kirasa vedike, jin jî xwe li ser kirasa vedike, ev her du jî gerekê ji nava cime'ta xwe bêne undakirinê. <sup>19</sup>Şerma xatîya xwe, yan şerma met'a xwe venekî, k'ê vê yekê bike ew neferê xwe te'zî dike, gunê xwe ew gerekê bik'işînin. <sup>20</sup>Heger yek serê xwe jinapa xwer'a dayne, ewî şerma apê xwe vekir, ew gerekê gunê xwe bik'işînin û wê bêzur'et bimirin. <sup>21</sup>Heger yek jina birê xwe bistîne, eva k'irêtî ye, ew şerma birê xwe vedike, ewê bêzur'et bin.

### T'emîya pîrozbûnê

<sup>22</sup>H'emû qeyde-qanûn û qîrarêd min xwey kin û wan biqedînin, wekî ew erdê ku ez we dibim ku ser bijîn me'dê xwe li we lihev nexe. <sup>23</sup>Û pey qeyde-qanûnêd wan mileta neçin, k'îjana ezê ber'dimê wan ji we r'aqetînim, çimkî vana ev h'emû tişt kirin û ez ji wan zivêr bûm. <sup>24</sup>Û min wer'a got: «Hûnê li welatê wan war bin, ezê wî çawa milk' bidime we, welatekî ku şîr û hingiv jê dik'işe». Ez Xudan Xwedêyê we me ku min hûn ji h'emû mileta başqe kirin. <sup>25</sup>Awa firqîyê bikine nava h'eywanêd h'elal û ne h'elal û nava teyredêd ne h'elal û h'elal û xwe pê h'eywên yan teyreda, yan jî pê wan h'emû şûlikîyêd erdê neh'er'imînin, k'îjan ku min bona we çawa ne paqij başqe kirin. <sup>26</sup>Hûn bona min pîroz bin, çimkî ez Xudan pîroz im, min hûn ji nava mileta başqe kirin, ku hûn p'ara min bin.

<sup>27</sup>Mêr yan jin, heger gazî r'uh'a ke yan micêwirtîya cin bike, e'se gerekê bêne kuştinê, wan bidine ber kevira, xûna wan li serê wan be».

### Qanûna k'ahîntîyê

**21** Xudan gote Mûsa: «T'evî k'ahînêd, kur'êd Harûn xeber de û bêje wan: «Bira ji wan t'u kes mirîyê milletê xwe nek'eve û xwe neh'er'imîne, <sup>2</sup>pêştirî neferê mala xwe, awa gotî dê û bavê xwe, kur' û qîzêd xwe û birê xwe, <sup>3</sup>usa jî xûşka xweye nemêrkirîye cem xwe, ew dikare bona wan van k'eve û xwe ne paqij ke. <sup>4</sup>Ew gere xwe neh'er'imîne, awa gotî destê xwe nede cinyazê pismamtîya xweye alîyê h'al-zewacêda ku nepaqij derê. <sup>5</sup>K'ahîn bira p'or'ê serê xwe belek-belekî kur' nekin, serê r'ûdana xwe nebir'in û li ser xwe dexma çê nekin. <sup>6</sup>Gerekê bona Xwedêyê xwe pîroz bin û navê Xwedêyê xwe bêhurmet nekin, çimkî k'ahîn dîyarîyêd Xudane şewatê, nanê Xwedêyê xwe didin, lema jî ewana gerekê pîroz bin. <sup>7</sup>Ew gerekê k'ulfeta qav yan bê namûs nestînin, yan jî ya mêrber'dayî, çimkî ewana pîrozê Xwedêyê xwe ne. <sup>8</sup>Cime't k'ahîna pîroz h'esab ke, çimkî ew nanê Xwedêyê we dide, ew bona we bira pîroz be, çimkî ez pîroz im, Xudanê ku we pîroz dike. <sup>9</sup>Heger qîzeke k'ahînekî qavîyê bike bih'er'ime, ew bavê xwe dih'er'imîne, gerekê agir berdine wê bişewitînin.

<sup>10</sup>Lê serekk'ahînef nava birayêd xweda, li ser serê k'îjanîda r'ûnê r'ûnkirinê hatîye r'êtinê û qewîn-qedîmkirinê ku k'incêd pîroz li xwe ke, ew gerekê p'or'ê xwe ser xweda neyne û k'incêd xw□e neqelêşe. <sup>11</sup>Ew gerekê nêzîkî t'u mirîyî nebe, h'eta nêzîkî cinyazê dê û bavê xwe jî nebe, ku xwe neh'er'imîne. <sup>12</sup>Ew gerekê ji Pîrozgehê neqete û Pîrozgeha Xwedêyê xwe neh'er'imîne, çimkî r'ûnê Xwedêyî bona bijartinê li ser wî ye. Ez Xudan im. <sup>13</sup>Ew gerekê qîzeke bik'ir bistîne. <sup>14</sup>Jinebîyê, mêrber'dayê yan ya bênamûs yan qav nestîne. Lê ji qebîla xwe qîzeke bik'ir bistîne. <sup>15</sup>Îzina wî t'une ku ew r'ik'inyata xwe nava cime'ta xweda bih'er'imîne, çimkî ez Xudan im, yê ku wî pîroz dikim».

<sup>16</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>17</sup>«T'evî Harûn xeber de û bêjê: «Ji r'ik'inyata te heger kesek nava nisilêd xweda qusûreke wî hebe, bira nêzîk nebe ku nanê Xudanê xwe bide. <sup>18</sup>Ew kesê ku qusûra wî hebe, heger kor be, yan bikule, yan e'blû, yan bêcûr'e <sup>19</sup>yan yê nigşkestî, yan destşkestî, <sup>20</sup>yan kûzik, yan bocî, yan ç'e'vşêlû, yan gur'î, yan r'îşî, yan t'aqur'î be. <sup>21</sup>Ji r'ik'inyata Harûnê k'ahîn, qusûra k'îjanî ku hebe, t'u kes nêzîk nebe ku dîyarîyêd Xudane şewatê bide. Qusûra wî ku heye bira ew nêzîk nebe ku nanê Xudanê xwe bide. <sup>22</sup>Nanê Xwedêyê xwe ew dikare ji tiştê here pîroz û ji tiştê pîroz bixwe. <sup>23</sup>Lê t'enê nêzîkî p'er'dê nebe û gorîgehêf nek'eve, qusûra wî ku heye, ew gerekê tiştêd mine pîroz neh'er'imînin, çimkî ez Xudan im, yê ku wan pîroz dikim».

<sup>24</sup>Mûsa aha gote Harûn, kur'êd wî û h'emû zar'êd Îsraêl.

### Qeyde-qanûnêd qurbana

**22** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Bêje Harûn û kur'êd wî, ku ewana ji wan dîyarîyêd pîroze ku zar'êd Îsraêl minr'a didin, h'evza xwe bikin, ku k'ahîn navê minî pîroz nedine bêhurmetkirinê. Ez Xudan im. <sup>3</sup>Bêje wan: «Nava t'emamîya nisilêd weda, ew kesê nava r'ik'inyata weda, k'îjan ku nava nepaqijaya xweda nêzîkî wan tiştêd pîroz be, yêd ku zar'êd Îsraêl Xudanr'a dîyarî didin, ew kes gerekê li ber ç'e'vê min bê undakirinê. Ez Xudan im. <sup>4</sup>K'îjan ku ji r'ik'inyata Harûn k'otîf be, yan gemar jê her'e, ew gerekê ji tiştêd pîroz nexwe h'eta ku paqij be. Lê ewê ku tişteki k'eve, k'îjan ku ji mirî h'er'imîye, yan jî yekî ku t'oximê wî jê çûyî k'eve, <sup>5</sup>yan şûlikekî k'eve, k'îjan ku wî dih'er'imîne, yan merîkî k'eve bih'er'ime, yê ku tişteki da nava nepaqijayêda ye, <sup>6</sup>ew merivê ku van tišta k'eve h'eta êvarê ew nepaqij h'esab be û ji tiştêd pîroz jî nexwe h'eta ku xwe pê avê neşo. <sup>7</sup>Lê gava r'o her'e ava, hingê ew paqij bê h'esabê û paşê ji tiştêd pîroz bixwe, çimkî ew nanê wî ye. <sup>8</sup>Ew mirar yan de've xwarî gerekê nexwe, ku bi wan neh'er'ime. Ez Xudan im. <sup>9</sup>Bira t'emîyêd

min xwey kin wekî gune li ser xweda neynin, neh'er'imîn û nemirin. Ez Xudan im, yê ku wan pîroz dikim.

<sup>10</sup>T'u kes pêştirî k'ahîna ji tiştê pîroz gerekê nexwe, mêvanê k'ahîn û p'aleyê wî jî ji tiştê pîroz gerekê nexwin. <sup>11</sup>Lê ew kesê ku k'ahîn pê p'erê xwe k'ir'îye û yê mala wîda bûye evana dikarin nanê wî bixwin. <sup>12</sup>Lê heger qîza k'ahîn yekî ne ji mala k'ahîna standîye, ewa ji dîyarîyêd pîroz gerekê nexwe. <sup>13</sup>Lê gava qîza k'ahîn jinebî yan mêrber'dayî û bêzur'et li ser mala bavê xweda vege'îyayî be, hingê ew mîna qîztîya xwe ji nanê bavê xwe dikare bixwe. Lê belê yê ne ji mala k'ahîna gerekê nexwe. <sup>14</sup>Lê heger yek bê h'emdê xwe ji tiştêd pîroz bixwe, hingê gerekê p'areke pêncê li ser wan tiştêd pîrozda zêdeke û bide k'ahîn. <sup>15</sup>K'ahîn dîyarîyêd zar'êd Îsraêla pîroz ku Xudan'r'a didin gerekê neh'er'imînin, <sup>16</sup>nebe ku zar'êd Îsraêl tiştêd pîroz bixwin gune bikine stûyê xwe, çimkî ez Xudan im, yê ku wan pîroz dikim».

### Qurban gerekê bêqusûr be

<sup>17</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>18</sup>«T'evî Harûn, kur'êd wî û h'emû zar'êd Îsraêl xeber de û wan'r'a bêje: «Gava kesek ji mala Îsraêl yan xerîbekî nava Îsraêlda ku dimîne, ji ber sozdayînekêva yan bi r'ezedilîya xwe qurbanê Xudan'r'a bide çawa dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>19</sup>bona ku bê qebûlîkirinê ew qurban gerekê nêr û bêqusûr bin, pez-dewar yan nêrî bin. <sup>20</sup>T'u tiştê bi qusûr nekine qurban, çimkî ew nayê qebûlîkirinê.

<sup>21</sup>K'ê dewarekê yan pezekê ji ber sozdayînekêva yan bi r'ezedilîya xwe Xudan'r'a dîyarîya heleqetîyê bide, ew gerekê bêqusûr be, wekî bê qebûlîkirinê, t'u qusûr gerekê li ser wê t'unebe. <sup>22</sup>Kor, yan seqet, yan dexme, yan gilê, yan gur'î, yan k'os, yêd ha Xudan'r'a neynin, ji van nekine dîyarîya şewatê Xudan'r'a, daneynine li ser gorîgehê. <sup>23</sup>Lê dewar yan berxa ku li ser wan tiştêkî kêman yan zêde hebe, dikarî çawa p'êşkêşa r'ezedilîyê bidî, lê bona sozdayîne ew nayê qebûlîkirinê. <sup>24</sup>H'eywanê batîlêdayî, yan h'incir'andî, yan

qelişî, yan jêkirî Xudanr'a nedin, welatê xweda vê yekê nekin. <sup>25</sup> Û ji destê xerîba jî ji van h'emû h'eywana çawa xurek Xudanê xwer'a p'êşkêş nedin, çimkî wanda kêmasî û qusûr heye, evana nayêne qebûlkinê».

<sup>26</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>27</sup> «Gava golik, yan berx, yan kar bibin, h'eft r'oja bira ew li ber makê xwe bin û r'oja h'eysta û peyr'a wê bona dîyarîya şewatê Xudanr'a bêne qebûlkinê. <sup>28</sup> Ç'êlekê t'evî golika wê yan mîyê t'evî berxa wê, her duya t'evayî r'ojekêda serjê nekin. <sup>29</sup> Gava hûn dîyarîya r'azîdarîyê bidin, bi vî awayî gerekê bidin, wekî ji we bê qebûlkinê. <sup>30</sup> Wê r'ojêda ew gerekê bê xwarinê, h'eta serê sibê ji wê nehêlin. Ez Xudan im. <sup>31</sup> Û t'emîyêd min xweyî kin û wan biqedînin. Ez Xudan im. <sup>32</sup> Navê minî pîroz bêhurmet nekin, wekî ez nava zar'êd Îsraêlda pîroz bim. Ez Xudan im, yê ku we pîroz dikim. <sup>33</sup> Min hûn ji Misirê derxistin, ku bibime Xwedêyê we. Ez Xudan im».

### Cejinêd Xudan

**23** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup> «T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Ev in ew cejinêd Xudan, k'îjanêd ku hûnê h'esab kin çawa civînêd pîroz, ev in cejinêd min. <sup>3</sup> Şeş r'oja dikarin şixul bikin, lê r'oja h'efta şemîya r'ih'etîyê ye, civîna pîroz e, t'u şixulî nekin, eva şemîya r'ih'etîyê ye bona Xudan h'emû cî-warêd weda.

### Cejinaf Nanê Şkeva

<sup>4</sup> Evana ne cejinêd Xudan, k'îjana ku hûnê wextê wanda derbaz kin. <sup>5</sup> Çardehê meha yekê berê êvarê Cejinaf Xudane Derbazbûnê ye. <sup>6</sup> Û hema panzdehê wê mehê jî Cejina Xudane Nanê Şkeva ye. H'eft r'oja gerekê hûn nanê şkeva bixwin. <sup>7</sup> R'oja pêşin wer'a civîna pîroz be, t'u şixulê xebatê nekin. <sup>8</sup> H'eft r'oja dîyarîyêd şewatê Xudanr'a bidin, r'oja h'efta dîsa wer'a civîna pîroz be, t'u şixulê xebatê nekin».

### Cejina Berê Pêşin

<sup>9</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>10</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Gava hûn bik'evine wî welatî, k'îjanî ku ezê bidime we û hûn e'rdê wî bidirûn, gur'zê dirûnêyî e'wlin bînine cem k'ahîn<sup>f</sup>. <sup>11</sup>Ew gerekê wî gur'zî li ber Xudan bih'ejîne, ku ew bona we bê qebûlkinê. K'ahînê evî gur'zî r'oja pey şemîyêr'a bih'ejîne. <sup>12</sup>Û r'oja ku gur'zê xwe bih'ejînin, gerekê berxekî yeksalîyî bêqusûr jî bona dîyarîyaf<sup>f</sup> t'evayîşewatê Xudanr'a bidin. <sup>13</sup>Û usa jî t'evî berxê, ji dehe p'ara du p'arê êfayê\* arê xasî r'ûnda stirayî, çawa dîyarîya şewatêye bînxweş Xudanr'a bidin û dîyarîyaf<sup>f</sup> wêye serdakirinê jî p'areke hînê\*\* şerav be. <sup>14</sup>H'eta wê r'oja ku hûn dîyarîyêd xwe didine Xudanê xwe, nan yan qeynok, yan genimê simbilada nexwin. Ev yeka nava nisilêd we û cî-warêd weda qeyde-qanûna h'eta-h'etayê be.

### Cejina<sup>f</sup> H'eftîya

<sup>15</sup>Pey r'oja şemîyêr'a, gava we gur'zê dîyarîyaf<sup>f</sup> h'ejandinê anî, xwer'a h'eft h'eftîdêd t'am h'esab kin. <sup>16</sup>H'eta r'oja pey her h'eft h'eftîyar'a pêncî r'oji h'esab kin û dîyarîya nanîye nû Xudanr'a bînin. <sup>17</sup>Ji cî-warêd xwe bona dîyarîya h'ejandinê du nana bînin, ew gerekê ji arê xasî ji dehe p'ara du p'arêd êfayê\* hilatî û pijandî be, eva berê pêşin e bona Xudan. <sup>18</sup>T'evî wî nanî h'eft berxêd yeksalîye bêqusûr, canegakî û du berana jî çawa dîyarîya t'evayîşewatê, t'evî dîyarîyêd wane nanî û dîyarîyêd wane serdakirinê Xudanr'a bidin. Evê Xudanr'a bibe dîyarîya şewatê ye bînxweş. <sup>19</sup>Bona dîyarîya ji ber gunava ji bizina nêrîkî û bona dîyarîya heleqetîyê du berxêd yeksalî bidin. <sup>20</sup>K'ahîn t'evî nanê berê bêşin bona

---

\* 23:13 «Ji dehe p'ara du p'arê êfayê» qasî du lîtîrî ye.

\*\* 23:13 «P'areke hînê» qasî lîtîrekî ye.

\* 23:17 «Ji dehe p'ara du p'arêd êfayê» qasî du lîtîrî ye.

dîyarîya h'ejandinê du berxa li ber Xudan bide, evanayê Xudanr'a pîroz bin, bona k'ahîn bin. <sup>21</sup>Hema xût wê r'ojê e'lam kin, ku wer'a bibe r'oja civîna pîroz, t'u şixulî nekin, bira ev yeka nava cî-warêd we û nisilêd weda bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. <sup>22</sup>Gava hûn nanê welatê xwe bidirûn, dema dirûnê devê zevîyê h'eta xilazîyê nederûyî û simbilêd dirûye k'etî t'op nekî, vana yê k'esîb û yê xerîbr'a bihêlî. Ez Xudan Xwedêyê we me».

### **Cejinaf Bor'îya**

<sup>23</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>24</sup>«Zar'êd Îsraêlr'a xeber de û bêje wan: «Yekê meha h'efta wer'a bibe r'oja r'ih'etîyê, civîna pîroze bona r'oja bîranîna dengê bor'îyê. <sup>25</sup>T'u şixulî nekin, lê belê dîyarîya şewatê Xudanr'a bînin».

### **Cejinaf R'oja K'ewandinê**

<sup>26</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>27</sup>«Dehê vê meha h'efta jî r'oja k'ewandinê be, bira wer'a bibe civîna pîroz, xwe bişkênin ta bin û Xudanr'a dîyarîya şewatê bînin. <sup>28</sup>Wê r'ojêda t'u şixulî nekin, çimkî ev r'oj bona we r'oja gunek'ewandinê ye, wekî hûn gunêd xwe li ber Xudan Xwedêyê xwe bik'ewînin. <sup>29</sup>Lê ewê ku wê r'ojê xwe neşkêne ta nebe, ji nava cime'ta xwe gerekê bê r'aqetandinê. <sup>30</sup>Lê heger kesek wê r'ojêda şixulekî bike, wî kesî ezê ji nava cime'ta wî bidime undakirinê. <sup>31</sup>T'u şixulî nekin, bira ev yeka nava nisilêd we û cî-warêd weda bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. <sup>32</sup>Ev yeka bona we mîna şemîya r'ih'etîyê be, hûn gerekê êvara nehê mehê xwe bişkênin ta bin, ji wê êvarê h'eta êvara din r'ih'etîya şemîya xwe xwey kin».

### **Cejinaf H'olikçêkirinê**

<sup>33</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>34</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Panzdehê vê meha h'eftada, h'eft r'oja Cejina H'olikaye bona Xudan. <sup>35</sup>R'oja pêşin civîna pîroz be, t'u şixulî gerekê nekin. <sup>36</sup>Nava van h'eft r'ojada dîyarîya şewatê

bidine Xudan, r'oja h'eyšta wer'a civîna pîroz be û Xudanr'a dîyarîya şewatê bînin. Eva civîna e'zîz e, t'u şixulî nekin.

<sup>37</sup>Evana ne ew cejinêd Xudan, k'îjana ku gerekê hûn civînêd pîroz h'esab kin, wekî Xudanr'a dîyarîyê şewatê, dîyarîyê t'evayîşewatê, dîyarîyê nanî, qurban û dîyarîyê serdakirinê ku her yek r'ojê wanda bêne dayînê, <sup>38</sup>pêştirî şemîyêd Xudan, pêştirî h'edîyêd we, pêştirî h'emû sozdayînêd we, pêştirî wan h'emû dîyarîyêd weye r'ezedilîyê ku hûnê bidine Xudan. <sup>39</sup>Usa jî panzdehê meha h'efta, gava hûn deremetêd e'rdê t'op kin, h'eft r'oja cejina Xudan derbaz kin, r'oja e'wlin û r'oja h'eyšta r'ojêd r'ih'etîyê bin. <sup>40</sup>R'oja e'wlin xwer'a berêd darêd r'ind, ç'iqlê darêd xurma, ç'iqlê darêd belgsix û ç'iqlê darêd bîyêye devê ava hildin û h'eft r'oja li ber Xudan Xwedêyê xwe şa bin.

<sup>41</sup>Evê cejinê salêda h'eft r'oja Xudanr'a derbaz kin. Eva nava nisilêd weda qeyde-qanûna h'eta-h'etayê be. Meha h'eftada gerekê vê cejinê derbaz kin. <sup>42</sup>H'eft r'oja gerekê h'olikada bimînin, her binelîyê Îsraêlê gerekê h'olikada bimîne, <sup>43</sup>wekî nisilêd we bizanibin, gava ku min zar'êd Îsraêl ji Misirê derxistin, ew h'olikada cî-war kirin. Ez Xudan Xwedêyê we me».

<sup>44</sup>Mûsa aha cejinêd Xudan zar'êd Îsraêlva e'yan kirin.

### Xemkirina bona r'ûnê ç'irê û nanêf Xwedêr'a dayî

**24** Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>2</sup>«T'emîyê bide zar'êd Îsraêl, wekî ter'a bona r'onayê bizirê lêdayîyî paqij bînin, ku ç'ira t'imê bişxule. <sup>3</sup>Harûn gerekê Konê Civînêda, alîyê p'er'da şe'detîyê der, ç'irê saz ke, ji êvarda h'eta sibehê li ber Xudan t'imê bişxulîne. Eva nava nisilêd weda qeyde-qanûna h'eta-h'etayê be. <sup>4</sup>Ç'irê gerekê li ser şemdana zêrê xalis li ber Xudan t'imê hazir kin. <sup>5</sup>Arê xas hildî û pê wî arî donzdeh nana lêxî, her nanek gerekê du p'ar ji dehe p'arêd êfayê\* be. <sup>6</sup>Û wan du cêrge, şeş-şeş dayne li ser t'extê bi zêrê xalis zêr'kirî

\* 24:5 «Du p'ar ji dehe p'arêd êfayê» qasî du lîtirî ye.

li ber Xudan. <sup>7</sup>Û bixûra safî daynî li ser her du cêrga, ku li ser nan bona Xudan bibe bîranîn çawa dîyarîya şewatê. <sup>8</sup>Her r'ojêdf şemîyê t'imê donzdeh nana gerekê alîyê zar'êd Îsraêlda bidine li ber Xudan, çawa peymanaf h'eta-h'etayê. <sup>9</sup>Evanayê p'ara Harûn û kur'êd wî bin, gerekê ew vana di cîyê pîrozda bixwin, çimkî eva bona wan ji dîyarîyêd şewatêye Xudane here pîroz e. Eva qeyde-qanûna h'eta-h'etayê ye».

### **Bela k'ifirîya hindava Xwedêda**

<sup>10</sup>Kur'ê jineke îsraêlî ku bavê wî misirî bû, çû nava zar'êd Îsraêl, ewî zomêda t'evî yekî îsraêlî şer' kir. <sup>11</sup>Û kur'ê wê jina îsraêlî k'ifirî navê Xudan kir û nifir' kir, ew girtin anîne cem Mûsa. (Navê dîya wî Şilomît bû, ji bereka Dan qîza Dîbrî). <sup>12</sup>Ew girtî hiştin h'eta ku qirara Xudan wanva e'yan be.

<sup>13</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>14</sup>«Wî merivê ku k'ifirî ji zomê derxe û h'emûyêd ku bihîstine bira destêd xwe bidine li ser serê wî û t'emamîya cime'tê wî bidine li ber kevira bikujin. <sup>15</sup>Bêje zar'êd Îsraêl: «K'î ku nifir'a Xwedêyê xwe bike, ewê gunê xwe bik'işîne. <sup>16</sup>K'î k'ifirîya navê Xudan bike ew e'se gerekê bê kuştinê, t'emamîya cime'tê gerekê wî bide li ber kevira bikuje. Heger xerîb be yan binelî, k'îjanî k'ifirî navê Xudan kir ew gerekê bê kuştinê. <sup>17</sup>K'î ku merivekî xe bikuje, ew e'se gerekê bê kuştinê. <sup>18</sup>K'îjan ku h'eywanekî xe bikuje, ji ber wî h'eywanîva gere bide: H'eywan ji ber h'eywênva. <sup>19</sup>Heger yek zedekê li yekî din xe, ewî çawa kirîye usa ji li wî bikin: <sup>20</sup>Şkênandin ji ber şkênandinêva, ç'e'v ji be ç'e'vva, diran ji ber diranva, ewî çawa zede meriv xistibe, usa jî gerekê li wî bikin. <sup>21</sup>Yê h'eywan kuşt gerekê ji berva bê dayînê, lê yê merî kuşt gerekê bê kuştinê. <sup>22</sup>Bona xerîba jî, bona binelîya jî qanûna we gerekê yek be, çimkî ez Xudan Xwedêyê we me».

<sup>23</sup>Mûsa ev yek gote zar'êd Îsraêl û ew merivê nifir' kir ji zomê derxistine der û dane li ber kevira. Zar'êd Îsraêl usa kirin çawa ku Xudan gotibû Mûsa.

### Qanûna salaf h'efta

**25** Xudan li ser ç'îyayê Sînayê Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêlf xeber de û bêje wan: «Gava hûn bik'evine wî e'rdê ku ezê bidime we, ew e'rd gerekê şemîya Xudan xwey ke, r'ih'et be. <sup>3</sup>Şeş sala e'rdê xwe bir'eşîne û şeş sala tirîyêd xwe bibir'e û deremeta wan hilde, <sup>4</sup>lê sala h'efta bona e'rdê mîna şemîya r'ih'etîyê be, şemîya Xudan be. E'rdê xwe ner'eşînî û tirîyêd xwe nebir'î. <sup>5</sup>Wê zevîya ku e'rdê teda xwexa derk'eve nedirûyî û wan tirîyêd r'eze teda ku te nebir'îbin e'mbar nekî. Ew sal bona e'rdê sala r'ih'etîyê be. <sup>6</sup>Deremeta sala r'ih'etîyêye xwexa derk'etî bira h'emû t'enê bibe xurê we, xurê te, xulamê te, carîya te, p'aleyêd te û xerîbê ku nava teda dimîne, <sup>7</sup>usa jî h'emû deremetê e'rdê bibe xurê h'eywanê te û wan r'e'wirêd welatê teda.

### Salaf r'awastîyê

<sup>8</sup>Tu xwer'a h'eft salêdf şemîyê h'esab ke, awa gotî h'eft cara h'eft sal û wextê h'eft salêd şemîyê wê bibe çilnehe sal. <sup>9</sup>Û dehê meha h'efta bor'îyê bidî lêxistinê, ew r'oja k'ewandinê ye t'emamîya welatê xweda bor'îyê bidine lêdanê. <sup>10</sup>Sala pêncî hûn pîroz kin û li ser e'rdê bona h'emû binelîyêd ser e'rdê azadîyê e'lam kin. Eva wer'a bibe salaf r'awastîyê. Her kes bira vege'ere her'e li ser milk'ê xwe, her kes bira vege'ere her'e nava malbeta xwe. <sup>11</sup>Ev sala pêncî bira wer'a bibe sala r'awastîyê. Ne gerekê bir'aşînin ne jî çî ku xwexa derk'etîye bidirûn û tirîyê li ser k'olêd nebir'î jî e'mbar nekî. <sup>12</sup>Çimkî sala r'awastîyê ye, ew bona we pîroz be. E'rdêda deremetê xwexa derk'etî bira t'enê bibe xurê we. <sup>13</sup>Vê sala r'awastîyê her kes bira vege'ere her'e li ser milk'ê xwe. <sup>14</sup>Heger tişteki bifiroşî merivekî, yan tişteki ji merivekî bik'ir'î, hevdu nexapînin. <sup>15</sup>Tu ji merivekî pê wî qîmetê salêd mayî bik'ir'e, çiqas sal mabin h'eta sala r'awastîyê, ew jî pê h'esabê wan salêd dirûnê gerekê bifiroşe te. <sup>16</sup>Çiqasî ze'f bin ew salêd

h'etanî sala r'awastîyê, haqasî tu gerekê biha bik'ir'î, çiqasî sal hindik bin haqasî jî gerekê qîmet kêmkî, çimkî ew davêje li ser h'esabê salêd nandirûnê difiroşe te. <sup>17</sup>Hevdu nexapînin, lê ji Xwedêyê xwe bitirsîn, çimkî ez Xudan Xwedêyê we me.

<sup>18</sup>Awa qîrarêd min biqedînin, qanûnêd min xwey kin û biqedînin, hingê hûnê li ser wî e'rdî r'ih'et bijîn. <sup>19</sup>E'rdê deremeta xwe bide h'eta ku hûn t'êr bixwin û li ser jî r'ih'et bijîn. <sup>20</sup>Heger hûn bêjin: «Sala h'efta emê çi bixwin, wekî em ner'eşînin û ek'inê xwe t'op nekin?» <sup>21</sup>Sala şeşa ezê xêrberek'eta xwe li ser weda bişînim, ewê r'isqê sê sala bide we. <sup>22</sup>Sala h'eyşta hûn ku bir'eşînin, hûnê ji dayîna dirûnêd kevin bixwin h'eta sala neha. Hûnê ji wê dayîna kevin bixwin h'eta ku zevî bigihîjin. <sup>23</sup>E'rd gerekê h'eta-h'etayê neyê firotanê, çimkî e'rd e'rdê min e û hûn jî cem min xerîb û mêvan in.

<sup>24</sup>Bona t'emamiya wî e'rdê milk'ê xwe, gerekê hûn îzinê bidin ku e'rd paşda bê k'ir'inê. <sup>25</sup>Heger birayê te bik'leve destteng be û p'arekê ji milk'ê xwe bifiroşe, pismamekî wîyî nêzîk dikare bê, çi ku birê te firotibe paşda bik'ir'e. <sup>26</sup>Lê heger kesekî wî t'unebe ku bik'ir'e, lê ew xwexa rê têr'a bibîne, ku destê wîda heye ew bikaribe paşda bik'ir'e. <sup>27</sup>Hingê bira ew r'oja firotîda h'esab ke û bavêje li ser qîmetê salêd derbazbûyî, çiqas mabe li yê k'ir'î vege'rine û milk'ê xwe dîsa bibe xweyî. <sup>28</sup>Lê heger destê wîda haqas t'une be ku li wî vege'rine, hingê çi ku wî firotîye destê yê k'ir'îda bimîne h'eta sala r'awastîyê, sala r'awastîyê yê k'ir'î dûr k'leve û yê firotî dîsa bibe xweyî milk'ê xwe.

<sup>29</sup>Heger yek bajarê sûrkirîda malekê bifiroşe, pey firotanêr'a muxdarê salekêda ew dikare dîsa paşda bik'ir'e, salekêda îzina wî heye paşda hilde. <sup>30</sup>Heger h'eta xilazîya salê ew paşda nek'ir'e, hingê ew mala bajarê sûrkirîda h'eta-h'etayê kur'ê-kur'ar'a bimîne, sala r'awastîyê li wî neyê vege'randinê. <sup>31</sup>Lê malêd gundaye ku bê sûr in, ew mîna k'ewşenê çolê bin, ew paşda bêne k'ir'inê, sala r'awastîyê ew bêne vege'randinê. <sup>32</sup>Lê belê bajarêd lêwîyada, ew malêd milk'ê wane bajarada, lêwî t'imê

dikarin paşda bik'ir'in. <sup>33</sup>Heger kesekî mal ji lêwîya k'ir'îbe, ew mala milk'ê wîyî bajêrda firotî, sala r'awastîyê gerekê lê bê vege'andinê, çimkî nava zar'êd Îsraêlda malêd bajarêd lêwîyada milk'ê wan in. <sup>34</sup>Û ew k'ewşenê e'rdê dora bajarêd lêwîya gerekê neyê firotanê, çimkî ew milk'ê wanî h'eta-h'etayê ye.

<sup>35</sup>Heger îsraêlîk destteng be û cem te bik'eve nikaribe serê xwe xwey ke, alîk'arîyê bidê çawa xerîbekî yan r'êwîkî, ku li cem te bijî. <sup>36</sup>Ji wî maş yan k'arê nestînî, ji Xwedêyê xwe bitirse, ku ewê îsraêlî li cem te bijî. <sup>37</sup>P'erê xwe pê selefa nedêyî û nanê xwe jî nedêyî ku k'arê jê hildî. <sup>38</sup>Ez Xudan Xwedêyê we me, ku hûn ji welatê Misirê derxistin, wekî welatê Kenanêf bidime we û bibime Xwedêyê we.

<sup>39</sup>Gava yekî îsraêlî cem te bik'eve k'esîb be û xwe bifiroşe te, tu wî mîna xulamtîya xulamekî nedî xebatê. <sup>40</sup>Ew gerekê cem te mîna p'alekî yan xerîbekî be, h'eta sala r'awastîyê cem te bixebite. <sup>41</sup>Paşê bira ew ji cem te derê, ew neferêd xweva vege'e bigihîje malbeta xwe, dîsa her'e li ser milk'ê kal-bavêd xwe. <sup>42</sup>Çimkî ew xulamêd min in, yêd ku min ji welatê Misirê derxistin, ew gerekê usa neyêne firotanê, çawa ku xulam têne firotanê. <sup>43</sup>H'işk li ser wî h'ukum nekî, lê ji Xwedêyê xwe bitirsî. <sup>44</sup>Xulam û xulamokêd te ku hebin, ew gerekê ji miletêd dor-berêd we bin, ji wan xulam û xulamoka bik'ir'in. <sup>45</sup>Usa jî zar'êd xerîbaya ku li cem we dimînin, ji wan dikarin bik'ir'in û ji neferêd wane ku welatê weda bûne, ew bibine mal û milk'ê we. <sup>46</sup>Pey xwer'a jî wan çawa milk'ê wartîyê zar'êd xwer'a bihêlin, ku t'imê ew xulamê we bin. Lê li ser birayêd xwe, zar'êd Îsraêl, yek li ser yekî h'işk h'ukum neke. <sup>47</sup>Heger xerîbek yan r'êwîkî cem te dewletî be, lê yekî îsraêlî cem wî bik'eve k'esîb be û xwe bifiroşe wî xerîbê ku cem te dimîne, yan pismamekî wî xerîbî, <sup>48</sup>paşê pey xwe firotanê'r'a, îzina wî heye ku ew paşda bê k'ir'înê, ji biratîya wî yek dikare wî paşda bik'ir'e. <sup>49</sup>Apê wî, yan kur'ê apê wî, dikarin wî bik'ir'in, yan ji pismamtîya wî, yan ji r'ik'inyata wî dikare wî bik'ir'in, yan heger ji destê wîva tê bira xwexa xa

bik'ir'e. <sup>50</sup>T'evî yê ew k'ir'îye heq-h'esabê xwe r'ast ke, wê sala xwe firotîda h'eta sala r'awastîyê, wan p'erê ku ji ber xweva standîye bavêje li ser sala, bide wî, xwe xilaz ke. Wextê wî gerekê mîna wextê p'alekî bê h'esabê. <sup>51</sup>Heger hê gelek sal mabin, weke wan salêd mayî p'erê ji ber xweva dayî bide xwe xilaz ke. <sup>52</sup>Lê heger hindik sal mabin h'eta sala r'awastîyê, bira heq-h'esabê xwe t'evî wî bike û weke wan salêd mayî qîmet ji ber xweva bide xwe xilaz ke. <sup>53</sup>Gerekê ewê îsraêlî mîna p'alekî yeksalî girtî cem wî bê h'esabê, ew dewletîyê xerîb li ber ç'e'vê te h'işk h'ukumî li ser wî neke. <sup>54</sup>Heger bi vî awayî ew nikaribe bê k'ir'înê, sala r'awastîyê ew neferêd xweva derê xilaz be. <sup>55</sup>Çimkî zar'êd Îsraêl xulamêd min in. Ew xulamêd mine ji welatê Misirê derxistî ne. Ez Xudan Xwedêyê we me.

### Dua-dirozgê li ser guhdariyê

**26** Xwer'a p'ûta û h'eykela çê nekin, xwer'a stûna ne-dine sekinandinê, welatê xweda bi kevira tişteki dilqşibandîyê nedine çêkirinê, bona h'ebandinê, çimkî ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>2</sup>R'ih'etîya şemîyêd min xwey kin, qedirê pîrozgeha min zanibin. Ez Xudan im. <sup>3</sup>Heger hûn pê qeyde-qanûnêd min r'abin-r'ûnên û t'emîyêd min xwey kin û wan biqedînin, <sup>4</sup>ezê jî wer'a baranê we'deda bibarînim, e'rdê deremeta xwe bide û darêd deştê jî berêd xwe bidin. <sup>5</sup>Bêdera weyê bik'işîne h'etanî tirîçinînê, tirîçinînê jî bik'işîne h'etanî vedan-çandinê, hûnê nanê xwe t'êr bixwin, welatê xweda bêxof bijîn. <sup>6</sup>Ezê e'dilayê bidime welatê we, hûnê r'ih'et p'aldin, t'u kesê ze'metê nede we, r'e'wirêd xirab ezê ji welêt bidime hildanê û şûrê welatê wer'a derbaz nebe. <sup>7</sup>Hûnê berî neyarêd xwe din, ewê pê şûr li ber we bik'evin. <sup>8</sup>Ji we pêncê berî sedî de û sedê ji we berî dehe h'ezara de û neyarêd weyê li ber we pê şûr bik'evin. <sup>9</sup>Berê minê weda be, we şîn kim zêde kim û peymanaf xwe t'evî we qedîm kin. <sup>10</sup>Hûnê xurekê kevin bixwin, ji dest yê nûda hûnê yê

kevin derxine der. <sup>11</sup>Ezê konê xwe nava weda lêdim û nefsa minê ji we zivêr nebe. <sup>12</sup>Û ezê nava weda biger'im, ezê bime Xwedêyê we û hûnê jî bibine cime'ta min. <sup>13</sup>Ez Xudan Xwedêyê we me, ku min hûn ji welatê misirîya derxistin, wekî nebine xulamê wan û min qeydê nîrê we şkênandin û hûn serfînyaz birin.

### Cezayê neguhdarîyê

<sup>14</sup>Lê heger hûn gur'a min nekin û van h'emû t'emîya neqedînin <sup>15</sup>û qanûnêd min bêhurmet kin, nefsa we ji qîrarêd min zivêr be, ku hûn h'emû t'emîyêd min neqedînin û peymanî min bit'er'ibînin. <sup>16</sup>Hingê jî ezê aha serê we bikim: R'isasê bişînim ser we, h'îlê û germê, ku r'onayîya ç'e'va kê m'îkin û canîya m'êriv dih'elîne dimaşîne, hûnê badîhewa t'oxim bir'eşînin, çimkî dijminêd weyê k'eda we bixwin. <sup>17</sup>Ezê li ser weda binihêr'im û li ber ç'e'vê dijminêd we qir'a weyê bê, xêrnexwazê weyê h'ukumî li ser we bikin, bêyî peyk'etin r'evê bik'eve we. <sup>18</sup>Lê heger pey haqas tiştîr'a hûn gur'a min nekin, hingê ezê ji ber gunê weva h'eft car zêde we ceza kim. <sup>19</sup>Ezê k'ubar-babaxîya we bişkênim, e'zmanê we bikime h'esin û e'rdê we bikime sifir\*. <sup>20</sup>Qewata weyê cîkî badîhewa p'ûç' be her'e, e'rdê weyê deremeta xwe nede û darêd e'rdê jî berê xwe nedin. <sup>21</sup>Heger pey haqas tiştr'a jî hûn miqabilî min bin û nexwazin gur'a min bikin, hingê ezê anegorî gunê we, h'eft cara zêde bela li ser weda bînim. <sup>22</sup>R'e'wirêd çolê ezê bişînim li ser we, ewê we bêzur'et bihêlin, qir'a h'eywanêd we bînin, we bixwin kê m'îkin û r'îyêd weyê vala bin. <sup>23</sup>Heger pey vê yekêr'a jî hûn li ser h'işê xweda neyên û miqabilî min her'in, <sup>24</sup>hingê jî ezê miqabilî we bim, ji ber gunê weva ezê jî h'eft cara zêde bela we bidimê. <sup>25</sup>Ezê şûrê h'eyfa peymanî min hildanê li

---

\* 26:19 Ev aha tê fe'mkirinê: «Xwedê wê e'zmên dade û baranê t'une be hingê e'rdê mîna sifir h'işk be».

ser weda bişînin, heger hûn bajarêd xweda jî bicivin, ezê nexweşîya h'ala bişînime nava we û hûnê bik'evine destê dijmin. <sup>26</sup>Gava ez nan li we bikime h'izret, hingê dehe k'ulfetê tendûrekêda nanê we lêxin û pê mêzînê nanê we bidine we, hûnê bixwin û t'êr nebin. <sup>27</sup>Lê heger pey van yekar'a jî hûn gur'a min nekin û miqabilî min her'in, <sup>28</sup>hingê jî ezê bi hêrs miqabilî we bisekinim û ji ber gunê weva h'eft cara zêde we bidime ceza. <sup>29</sup>Hingê hûnê goştê kur' û qîzêd xwe bixwin. <sup>30</sup>Hêlanêd<sup>f</sup> weye jorin ezê wêran kim, p'ûtêd weye te'vê ezê xirab kim, cinyazêd we bidime li ser kerîyêd p'ûtêd weye hûrdexweşî bûyî, nefsa minê ji we zivêr be. <sup>31</sup>Bajarêd we ezê bikime xirabe û pîrozgehêd we bikime xikî-xwelî û bîna qurbanêd weye bînxweşîyê ezê hilnedim. <sup>32</sup>E'rdê we ezê bêkes bikim, dijminêd weye ku lê dimînin wê e'cêbmayî bin. <sup>33</sup>Ezê we belayî nava mileta kim, şûr li pey we bişînim, welatê weyê bêkes bimîne û bajarêd weyê vala bin. <sup>34</sup>Hingê e'rdê t'emamîya wan r'ojêd valamayîna xweda, şemîyêd r'ih'etîya xwe derbaz ke, gava hûn welatê dijminêd xweda bin, hingê e'rdê ku r'ih'et bimîne wê şemîyêd xwe derbaz ke. <sup>35</sup>T'emamîya wan r'ojêd valamayîna xweda e'rdê r'ih'et be, çimkî şemîyêd weda ew r'ih'et nebûye, gava hûn lê diman. <sup>36</sup>Herçê ji we sax mayî jî ezê welatê dijminêd wanda lertzekê bikime dilê wan û dengê belgê h'ejjayî wê wan bide r'evê, usa wê bir'evin çawa ku ji ber devê şûr û bê peyk'etî wê bik'evin. <sup>37</sup>Çawa ji ber şûr r'evî, wê bê peyk'etî li ser hevda bik'evin û qewata weyê t'unebe ku li ber dijmin bisekinin. <sup>38</sup>Nava miletada hûnê unda bin û e'rdê dijminêd weyê we bixwe. <sup>39</sup>Herçê ji we mayî jî wê ji dest bêolîtîyê xwe welatê dijminêd weda bih'elin her'in, usa jî dest bêolîtîêd kal-bavêd xwe bih'elin her'in. <sup>40</sup>Lê heger ewana bêolîtîyêd xwe û bêolîtîyêd kal-bavêd xwe bidine r'ûyê xwe, ku çi neheqî hindava minda kirine, çawa miqabilî min sekinîne, <sup>41</sup>û çima ez miqabilî wan çûm û min çima ew birine welatê dijminêd wan, heger

hingê dilê wanî kevirî bişkê û cezayê bêolîtîya xwe bi dil qebûl kin. <sup>42</sup>Hingê ezê wê peyman a ku min t'evî Aqûb girêda bîr bînim, usa jî ya t'evî Îshaq û Birahîm girêdayî bîr bînim û wî welatî jî bîr bînim. <sup>43</sup>Ew welat ku bêyî wan bimîne wê şemîyêd r'ih'etîya xwe derbaz ke, çimkî ji wan vala ma, ewana gerekê cezayê bêolîtîya xwer'a qayl bin, ku wana qirarêd min bêhurmet kirin û nefsa wan ji qeyde-qanûnêd min zivêr bû. <sup>44</sup>Lê belê çawa ku ewanayê welatê dijminêd xweda bin, ezê wan t'exsîr nekim û ji wan zivêr nabim ku wan lap unda kim, ku peyman a xweye t'evî wan bit'er'ibînim, çimkî ez Xudan im, Xwedêyê wan. <sup>45</sup>Bona wan ezê wê peyman a t'evî kal-bavêd wan bîr bînim, k'îjan ku min li ber ç'e'vê mileta ew ji welatê Misirê derxistin ku bibime Xwedêyê wan. Ez Xudan im. <sup>46</sup>Ev in ew qeyde-qanûn, qirar û hînkirinêd ku Xudan li serê ç'îyayê Sînayê pê destê Mûsa danîne navbera xwe û zar'êd Îsraêl».

### Qedandina ad-qirara

**27** Xudan<sup>f</sup> Mûsar'a xeberda û gotê: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje wan: «Heger yek bixwaze bi ad-qirar kesekî Xudan'a k'ifş ke, ew gerekê anegorî qîmetê te bê k'ifşkirinê\*». <sup>3</sup>Qîmetkirina teye bona mêrêd ji bîstsalîyê girtî h'eta şêstsalîyê, gerekê pêncî şêkil\* zîv be, anegorî şêkilê pîrozgehê. <sup>4</sup>Lê heger ew jin be, qîmetkirina te gerekê sî şêkil be. <sup>5</sup>Heger tu meriva ji pêncsalîyê h'eta bîstsalîyê qîmet kî, gerekê tu qisimê mêr bîst şêkilî qîmet kî, lê qisimê jinê dehe şêkilî. <sup>6</sup>Lê ji yekmehê h'eta pêncsalîyê, gerekê qisimê mêr pênc şêkil zîv qîmetê kî, qisimê jinê sê şêkil zîv qîmet kî. <sup>7</sup>Lê

\* <sup>27:2</sup> Anegorî k'itêba H'akimtîyê 11:29-40 û 1 P'adşatî 1:11 îzin hebû ku merivekî merivek Xudan'a k'ifş kira. Merivê ku dihate k'ifşkirinê, wî kesî çîyê pîrozda xizmetkarî dikir. Ji vê r'êzê tê k'ifşê ku merivê vî h'alîda bi zîv dihate k'ir'în, aza dibû.

\* <sup>27:3</sup> «Şêkil» nêzîkî 12 girama bû.

heger ew ji şêstsalîyê jortir bin, hingê qisimê mêr panzdeh şêkilî gerekê h'esab kî, lê qisimê jinê dehe şêkilî. <sup>8</sup> Heger ew k'esîb e û qewata wî nagihîje wê qîmetkirina te, hingê bira ew li ber k'ahîn bisekine, k'ahîn wî qîmet ke. K'ahîn weke qewata yê ad-qirarkirî qîmetê wî k'ifş ke.

<sup>9</sup> Lê heger ew ad-qirara Xudanr'a kirî ji h'eywên be û qurbandayînêr'a qebûl e, ji van çî ku Xudanr'a bê dayînê wê pîroz be. <sup>10</sup> Gerekê guhar'tin t'unebe, ne qenc xirabr'a, ne jî xirab qencr'a biguhêr'e, lê heger yek h'eywan h'eywênr'a biguhêr'e, hingê gerekê h'eywanê ad-qirarkirî û yê t'ev guhar'tî her du jî pîroz h'esab bin. <sup>11</sup> Lê heger ew h'eywanê ku Xudanr'a ad-qirar kirîye, ji h'eywanê neh'elal e, ku ji wana Xudanr'a qurban nayêne dayînê, hingê gerekê wî h'eywanî li ber k'ahîn bidine sekinandinê. <sup>12</sup> K'ahîn bira dîna xwe bide qenc û xirabîya h'eywan û qîmet k'ifş ke, k'ahîn çî qîmet da ser gerekê haqas be. <sup>13</sup> Lê heger ew kesê ad-qirar kirîye bixwaze paşda bik'ir'e, hingê bira p'areke ji pênc bike li ser qîmetê k'ifşkirî.

<sup>14</sup> Heger yek bixwaze mala xwe Xudanr'a k'ifş ke, hingê k'ahîn bira dîna xwe bide h'alê malê, qencî û xirabîyê û qîmet k'ifş ke, k'ahîn çî qîmet da ser gerekê haqas be. <sup>15</sup> Lê heger ew kesê k'ifşkirî bixwaze mala xwe paşda bik'ir'e, hingê bira p'areke ji pênc p'ara li ser qîmetê teyî k'ifşkirîda zêde ke, hingê malê wîr'a be.

<sup>16</sup> Heger yek e'rdê milkê xwe Xudanr'a k'ifş ke, hingê gerekê qîmetkirina te weke qîmetê t'oximê li ser tê r'eşandinê be, bona homêrek\* t'oximê ce pêncî şêkil zîv be. <sup>17</sup> Heger yek e'rdê xwe sala r'awastîyêda bide, bira weke qîmetkirina te bimîne. <sup>18</sup> Lê heger yek li pey sala r'awastîyêr'a e'rdê xwe bide, hingê k'ahîn gerekê bavêje li ser wan sala, k'îjan ku h'eta sala r'awastîyê mane, t'evî yê dayî h'esab

\* 27:16 «Homêrek» derdanek bû ku nêzîkî 200 lîtir tişt hildida.

ke û ji qîmetê teyî k'ifşkirî nimiztir be. <sup>19</sup>Û heger ew bixwaze e'rdê xwe paşda bik'ir'e, hingê bira p'arekê ji pênc'a p'ere bike li ser qîmetê teyî k'ifşkirî û ew e'rd wîr'a bimîne. <sup>20</sup>Lê heger ew e'rd paşda nek'ir'e, yan yekî dinr'a firotî be, ewê îdî nikaribe paşda bik'ir'e. <sup>21</sup>Ew e'rd ku sala r'awastîyê aza dibe, mîna e'rdê p'êşk'êşkirî Xudanr'a pîroz be. Ew bibe milk'ê k'ahîna. <sup>22</sup>Lê heger yek e'rdê k'ir'îyî ne milk'ê xwe Xudanr'a k'ifş ke, <sup>23</sup>hingê k'ahîn t'evî wî pê h'esabê qîmetê te h'esab bike h'eta sala r'awastîyê û wê r'oje qîmetê teyî h'esabkirî mîna çawa tiştêkî pîroz bide Xudan. <sup>24</sup>Sala r'awastîyê ew e'rd li wî tê vege'randinê, ji k'ê hatibû k'ir'înê, k'îjan ku xweyê wî milk'î bûye. <sup>25</sup>Bira h'emû qîmetkirinêd te weke k'aşê şêkilêd Pîrozgehê bin, bîst gêra şêkilek\* be.

<sup>26</sup>T'enê nixurîyê h'eywên, çawa ku yê pêşîyê bûyî p'ara Xudan e, kesek nikare k'ifş ke, heger canega be yan pez ew îdî p'ara Xudan in. <sup>27</sup>Heger ew ji h'eywanêd neh'elal e, gerekê pê wê qîmetkirina te bik'ir'e û p'areke ji pênc'a jî li serda zêde ke. Lê heger ew paşda nek'ir'e, bira weke qîmetkirina te bê firotanê.

<sup>28</sup>Lê ew p'êşkêşêd, k'îjan ku meriv ji hebûka xwe p'êşkêşî Xudan dike, heger însan be, h'eywan be yan e'rdê milk'ê wî be, ew gerekê neyêne firotanê û neyêne paşda k'ir'înê, her p'êşkêş here pîroz in, ew p'ara Xudan in. <sup>29</sup>Her însanê ku Xudanr'a hatîye p'êşkêşkirinê, ew paşda nayê k'ir'înê, ew e'se gerekê bê kuştinê. <sup>30</sup>H'emû dehekêd deremeta e'rdê, berêd dara p'ara Xudan in, evana Xudanr'a pîroz in. <sup>31</sup>Lê heger yek bixwaze ji dehekêd xwe tiştêkî paşda bik'ir'e, bira p'arêke ji pênc'a jî bike li ser qîmetê tiştê dayî û paşda bik'ir'e. <sup>32</sup>H'emû dehekêd ji dêwêr yan pêz, ji van h'emû h'eywana k'îjan bin şivdarêr'a derbaz be bê jimarê û bik'eve

---

\* 27:25 «Şêkil» nêzîkî 12 girama bû.

bin h'esabê deha, ew Xudanr'a pîroz in. <sup>33</sup>Gerekê dîna xwe nedine qenc û xirab û ji ber hevva neyêne guhar'tinê. Lê heger yek biguhêr'e, hingê ew jî û ya t'ev guhar'tî her du jî pîroz in, ew paşda nayêne k'ir'înê».

<sup>34</sup>Ev in ew t'emîyêd ku Xudan li serê ç'îyayê Sînayê, bona zar'êd Îsraêl t'emî li Mûsa kir.

# Jimar

## Pêşgotin

Evê k'itêbê navê xwe: «Jimar» ji du carêd navnivîsara cime'ta Îsraêlf standîye, k'îjan ku wextê r'êwîtîya ji Misirê e'rdê Kenanêdaf hatine navnivîsarê. Bi îbranîf navê vê k'itêbê tê welger'andinê, çawa «Li ber'îyêda». Bi van xebera têk'sta îbranîye k'itêba Jimar destpêdibe û ew dide k'ifşê k'îderê serhatîyêd wê qewimî ne. Pey wê yekêr'a gava Xudan<sup>f</sup> li serê ç'îyayê Sînayê qanûn da cime'ta Îsraêl, Mûsa h'esabê cime'ta Îsraêl nivîsî, yêd ku şêr'r'a hazir bûn (h'esabê lêwîya jî başqe), usa jî anegorî t'emîya Xudan, çend qanûn zêde kirin û cime'ta Îsraêl bona çûyîna wî e'rdê ku Xudan soz dabû, hazir kirin (s. 1-9). Lê gava ew li Qadêş-Barnêayê bûn (alîyê başûra sînorê Kenanê), cime'ta Îsraêl ji dest salixêd ce'sûsaye derew, yanê li wir e'save dijîn, tirsîyan ku her'ine Kenanê ku wî e'rdî bi e'mirê Xudan zeftî xwe kin. Bona vê yekê ew hatine cezakerinê, çil salî t'erkeserî wê ber'îyê bûn (s. 10-19). H'eta h'emû nisilê îsraêlêyî ku ne gur'a Xwedêda ne nemir. Pey mirina wî nisilîr'a, paşê cime'tê hêdî-hêdî e'rdêd dorberê Kenanê zeft kir. Bi vî awayî Îsraêlîya k'arê xwe kirin û gihîştine e'rdê Mowabêf, alîyê r'ohilata ç'emê Êrdunê (s. 20-36). T'emamîya wî zemanîda, cime'ta Îsraêl gelek cara hindava Mûsada bîna xwe teng dikirin û himberî Xwedê r'adibûn, t'imê bêşêkir û ne ser ya xwe bûne, çawa li binyat'a mêriv dik'eve. Lê gava dibû ku Xudan merivêd neguhdar ceza dikir, dîsa hindava miletê xweyî bijartîda amin dima,

bona wan xem dikir, miqabilî dijminêd Îsraêl disekinî, ew ser dijmin dixistin. H'eta wî h'alîda jî, gava serwêrê milet, Mûsa û Harûn jî gur'a Xwedê nedikirin, lê dîsa Xwedê ser ya xwe bû, wî dikir ku cime'ta Îsraêl bibe wî e'rdê ku soz dabû, bida kal-bavêd wan.

### Navnivîsara Îsraêlî

**1** Xudan<sup>f</sup> li ber'îya Sînayê Konêf Civînêda yekê meha du-da, dusalîya zar'êd Îsraêle ku ji e'rdê Misirê derk'etibûn, Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl anegorî malbetêd wan, olk'êd wan, navê her mêrî yeko-yeko bijmire. <sup>3</sup>Tu û Harûn her kesê eskerîyêr'a hazir ji bîstsalîyê jortir anegorî ordîyêd wan nava Îsraêlda bijmirin. <sup>4</sup>T'evî we gere merivek ji her qebîlê hebe. Merivê ku serwêrê olk'a xwe ye. <sup>5</sup>Ev in navêd merivêd ku wê t'evî we bisekinin: Ji R'ûbên Elîsûrê kur'ê Şidêyûr. <sup>6</sup>Ji Şimh'ûn Şilûmîyêlê kur'ê Sûrîşaday. <sup>7</sup>Ji Cihûda Nehşonê kur'ê Amînadav. <sup>8</sup>Ji Îsaxar Nî'tanêlê kur'ê Sûhar. <sup>9</sup>Ji Zebûlon Elyabê kur'ê H'êlon. <sup>10</sup>Ji qebîla zar'êd Êsiv: Ji Efrayîm Elîşamayê kur'ê E'mîhûd. Ji Minaşe Gamalyêlê kur'ê Pidahsûr. <sup>11</sup>Ji Binyamîn Abîdanê kur'ê Gîdonî. <sup>12</sup>Ji Dan Axîhezerê kur'ê E'mîşaday. <sup>13</sup>Ji Aşêr Pagîyêlê kur'ê Ok'ran. <sup>14</sup>Ji Gad Elyasafê kur'ê Dihûyêl. <sup>15</sup>Ji Neftelî Ah'îrayê kur'ê Eynan». <sup>16</sup>Ev in bijartîyêd ji civînê, serwêrêd qebîlêd bavêd wan, serwêrêd e'laletêd Îsraêl.

<sup>17</sup>Mûsa û Harûn ev merivêd bi nav k'ifşkirî hildan. <sup>18</sup>Û yekê meha dua wana t'emamîya civînê civand û ew anegorî malbetêd wan, olk'êd wan, navê yêd ji bîstsalîyê jortir yeko-yeko jimartin, <sup>19</sup>çawa ku Xudan t'emî Mûsa kir wan bijmire li ber'îya Sînayêda.

<sup>20</sup>Zar'êd R'ûbênê nixurîyê Îsraêl, zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>21</sup>h'esabê qebîla R'ûbên 46500 nefş bûn.

<sup>22</sup>Zar'êd Şimh'ûn zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>23</sup>h'esabê qebîla Şimh'ûn 59300 nefş bûn.

<sup>24</sup>Zar'êd Gad zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>25</sup>h'esabê qebîla Gad 45650 nefş bûn.

<sup>26</sup>Zar'êd Cihûda zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>27</sup>h'esabê qebîla Cihûda 74600 nefş bûn.

<sup>28</sup>Zar'êd Îsaxar zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>29</sup>h'esabê qebîla Îsaxar 54400 nefş bûn.

<sup>30</sup>Zar'êd Zebûlon zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>31</sup>h'esabê qebîla Zebûlon 57400 nefş bûn.

<sup>32</sup>Ji qebîla zar'êd Ûsiv, zar'êd Efrayîm zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>33</sup>h'esabê qebîla Efrayîm 40500 nefş bûn. <sup>34</sup>Zar'êd Minaşe zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>35</sup>h'esabê qebîla Minaşe 32200 nefş bûn.

<sup>36</sup>Zar'êd Binyamîn zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>37</sup>h'esabê qebîla Binyamîn 35400 nefş bûn.

<sup>38</sup>Zar'êd Dan zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>39</sup>h'esabê qebîla Dan 62700 nefş bûn.

<sup>40</sup>Zar'êd Aşêr zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>41</sup>h'esabê qebîla Aşêr 41500 nefş bûn.

<sup>42</sup>Zar'êd Neftelî zur'et, malbet, olk'êd xweva, h'esabê her mêrê bîstsalîyê jortir, her kesê eskerîyêr'a hazir, <sup>43</sup>h'esabê qebîla Neftelî 53400 nefş bûn.

<sup>44</sup>Ev in h'esabêd wan merivêd ku Mûsa, Harûn û her donzdeh serwêrêd ji olk'êd Îsraêl ku jimartin. <sup>45</sup>H'emû zar'êd Îsraêl

anegorî olk'êd xwe, ji bîstsalîyê jortir, h'emûyêd eskerîyêr'a hazir Îsraêlda hatine jimartinê <sup>46</sup> û t'emamîya h'esabê wan 603550 nefş bûn. <sup>47</sup> Lê lêwî qebîla bavêd xweva t'evî wan nehatine jimartinê.

### Borcê lêwîya

<sup>48</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>49</sup> «Qebîla Lêwî nejmire, wan t'evî zar'êd Îsraêl h'esab neke. <sup>50</sup> Lê tu lêwîya li ser Konêf Şe'detîyê, li ser h'emû hacetêd wê û li ser h'emû tiştêd wê k'ifş ke. Ew bira kon û h'emû hacetêd wê bibin, wêda qulix kin û zomêd xwe dora wê lêxin. <sup>51</sup> Û çaxê cîguhastina Konê Şe'detîyê, lêwî bira wê hevîdin û vegirtina Konê Şe'detîyê jî bira lêwî bikin, yekî din ku nêzîk be wê bê kuştinê. <sup>52</sup> Gava zar'êd Îsraêl zomêd xwe lêxin, her kes gere li zoma xweda û her kes li ber ala xwe be anegorî ordîyêd xwe. <sup>53</sup> Lê lêwî gere zomê dora Konê Şe'detîyê lêxin, wekî hêrsa min li ser civîna zar'êd Îsraêl r'anebe. Û lêwîyê xweyîtiya Konê Civîna Şe'detîyê bikin». <sup>54</sup> Zar'êd Îsraêl anegorî wan h'emû t'emîyêd ku Xudane dane Mûsa, usa jî kirin.

### Cîwarkirina zomê

**2** Xudan Mûsa û Harûnr'a xeber da û got: <sup>2</sup> «Zar'êd Îsraêl bira zomêd xwe her kes t'evî ala xwe, bi nîşanêd olk'êd xwe lêxe. Ew gere li dora Konê Civînê hinekî dûr zomêd xwe lêxin. <sup>3</sup> Pêşîyêva alîyê r'oavayê Cihûda gere zoma xwe t'evî ala xwe anegorî ordîyêd xwe lêxe. Serwêrê zar'êd Cihûda Nehşonê kur'ê Amînadav bû. <sup>4</sup> H'esabê ordîya wî 74600 nefş bûn.

<sup>5</sup> R'ex wîda bira qebîla Îsaxar zomêd xwe lêxe. Serwêrê zar'êd Îsaxar Nit'anêlê kur'ê Sûhar bû. <sup>6</sup> H'esabê ordîya wî 54400 nefş bûn.

<sup>7</sup> Peyr'a bira qebîla Zebûlon be. Serwêrê zar'êd Zebûlon Elyabê kur'ê H'êlon bû. <sup>8</sup> H'esabê ordîya wî 57400 nefş bûn.

<sup>9</sup> T'emamîya h'esabê zoma Cihûda anegorî ordîyêd xwe 186400 nefş bûn. Evana gere pêşîyê r'ê k'evin.

<sup>10</sup>Ala zoma R'ûbên anegorî ordîyêd xwe gere alîyê başûrê be. Serwêrê zar'êd R'ûbên Elîsûrê kur'ê Şidêyûr bû. <sup>11</sup>H'esabê ordîya wî 46500 nefş bûn.

<sup>12</sup>R'ex wîda bira qebîla Şimh'ûn zomêd xwe lêxe. Serwêrê zar'êd Şimh'ûn Şilûmîyêlê kur'ê Sûrîşaday bû. <sup>13</sup>H'esabê ordîya wî 59300 nefş bûn.

<sup>14</sup>Peyr'a bira qebîla Gad be. Serwêrê zar'êd Gad Elyasafê kur'ê R'ihûêl bû. <sup>15</sup>H'esabê ordîya wî 45650 nefş bûn.

<sup>16</sup>T'emamîya h'esabê zoma R'ûbên anegorî ordîyêd xwe 151450 nefş bûn. Ew gere yê duda r'êk'evin.

<sup>17</sup>Hingê wê Konê Civînê r'ê k'eve, zoma lêwîya bira nava zomada be. Çawa ku zomêd xwe wê lêxin usa jî r'êk'evin. Her kes cîyê xweda be anegorî alêd xwe.

<sup>18</sup>Ala zoma Efrayîm anegorî ordîyêd xwe gere alîyê r'oavayê be. Serwêrê zar'êd Efrayîm Elîşamayê kur'ê E'mîhûd bû. <sup>19</sup>H'esabê ordîya wî 40500 nefş bûn.

<sup>20</sup>R'ex wîda bira qebîla Minaşe be. Serwêrê zar'êd Minaşe Gamalyêlê kur'ê Pidahsûr bû. <sup>21</sup>H'esabê ordîya wî 32200 nefş bûn.

<sup>22</sup>Peyr'a bira qebîla Binyamîn be. Serwêrê zar'êd Binyamîn Abîdanê kur'ê Gîdonî bû. <sup>23</sup>H'esabê ordîya wî 35400 nefş bûn.

<sup>24</sup>T'emamîya h'esabê zoma Efrayîm anegorî ordîyêd xwe 108100 nefş bûn. Ew gere yê sisîya r'ê k'evin.

<sup>25</sup>Ala zoma Dan anegorî ordîyêd wan gere alîyê bakurê be. Serwêrê zar'êd Dan Axîhezerê kur'ê E'mîşaday bû. <sup>26</sup>H'esabê ordîya wî 62700 nefş bûn.

<sup>27</sup>R'ex wîda qebîla Aşêr bira zomê lêxe. Serwêrê zar'êd Aşêr Pagîyêlê kur'ê Ok'ran bû. <sup>28</sup>H'esabê ordîya wî 41500 nefş bûn.

<sup>29</sup>Peyr'a bira qebîla Neftelî be. Serwêrê zar'êd Neftelî Ah'îrayê kur'ê Eynan bû. <sup>30</sup>H'esabê ordîya wî 53400 nefş bûn.

<sup>31</sup>T'emamîya h'esabê zoma Dan 157600 nefş bûn. Ew gere xilazîyê r'ê k'evin anegorî alêd xwe.

<sup>32</sup>Ev in h'esabê zar'êd Îsraêl anegorî olk'êd xwe. T'emamîya h'esabê zoma anegorî ordîyêd xwe 603550 nefş bûn. <sup>33</sup>Lê

lêwî ne hatine jimartinê t'evî zar'êd Îsraêl, çawa ku Xudan t'emî li Mûsa kiribû.

<sup>34</sup>Zar'êd Îsraêl h'emû usa dikirin çawa ku Xudan t'emî li Mûsa kiribû. Wana zomêd xwe anegorî alêd xwe lê didan û usa jî r'ê dik'etin, her kes t'evî malbetêd xwe anegorî olk'êd xwe.

### Navnivîsara lêwîyaye pêşin

**3** Ev in zur'etêd Harûn û Mûsa, wê r'ojê gava Xudan t'evî Mûsa li ç'îyayê Sînayê xeberda. <sup>2</sup>Ev in navê kur'êd Harûn, nixurîyê wî Nadab peyr'a Abîhû, Êlazar û Ît'amar, <sup>3</sup>ew k'ahînêd<sup>f</sup> r'ûnkirî yêd ku Harûn ew k'ahîntîyêr'a qewîn-qedîm kirin. <sup>4</sup>Nadab û Abîhû li ber Xudan mirin, gava wan ber'îya Sînayêda şaş\* agir li ber Xudan dan û ew bêzur'et bûn. Êlazar û Ît'amar li ber ç'e'vê Harûnê bavê xwe k'ahîntî dikirin.

<sup>5</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>6</sup>«Qebîla Lêwî bîne û li ber Harûnê k'ahîn bide sekinandinê ku berdestîya wî bikin. <sup>7</sup>Bira ew borcê nobedarîyê bona wî û h'emû civînê li ber Konê Civînê biqedînin, xizmetk'arîya pîrozgehê bikin. <sup>8</sup>Xweyîtîya her tiştêd Konê Civînê û borcê zar'êd Îsraêl bikin awa gotî xizmetk'arîya pîrozgehê bikin. <sup>9</sup>Tu gere lêwîya bidî Harûn û kur'êd wî. Ew wîr'a hatine dayînê ji nava zar'êd Îsraêl. <sup>10</sup>Tu gere Harûn kur'ava k'ifş kî bona ku ew qulixê k'ahîntîya xwe biqedînin. Lê gava yekî din nêzîkî pîrozgehê be, gere bê kuştinê».

<sup>11</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>12</sup>«Awa min Lêwî ji nava zar'êd Îsraêl hildan, dewsa wan h'emû nixurîyêd ku bet'inê vedikin ji nava zar'êd Îsraêl. Awa lêwîyê bona min bin <sup>13</sup>çimkî her nixurî p'ara min e. Wê r'oja ku min h'emû nixurîyêd welatê Misirê xistin hingê min h'emû nixurîyêd Îsraêlda ji mêriv h'eta h'eywên xwer'a buhurtî-jibare kirin. Ewê p'ara min bin, ez Xudan im».

---

\* 3:4 Binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 10:1-2.

<sup>14</sup>Xudan dîsa t'evî Mûsa li ber'îya Sînayêda xeberda, got:  
<sup>15</sup>«Zar'êd Lêwî anegorî olk'êd wan, malbetêd wan bijmire. Her qisimê nêrînî ji yekmehê bijmire». <sup>16</sup>Mûsa anegorî xebera Xudan, çawa ku wîr'a hatibû gotinê ew jimartin.

<sup>17</sup>Ev bûn navê zar'êd Lêwî: Gêrşon, Qohat' û Mêrarî. <sup>18</sup>Ev jî navê zar'êd Gêrşon e, malbetêd wanva: Lîbnî û Şîmî. <sup>19</sup>Zar'êd Qohat' jî malbetêd wanva ev in: E'mram, Îshar, Hêbron û Ûzîêl. <sup>20</sup>Zar'êd Mêrarî malbetêd wanva ev in: Mah'lî û Mûşî. Evana malbetêd lêwîya ne anegorî olk'êd wan.

<sup>21</sup>Malbeta lîbnî û malbeta şîmî digihîjine Gêrşon. Evana malbetêd gêrşonîya ne. <sup>22</sup>H'esabê wan, awa gotî h'esabê her qisimê nêrînî ji yekmehê 7500 nefş bûn. <sup>23</sup>Malbetêd gêrşonîya bira pişt pîrozgehê, awa gotî alîyê r'oavayê, zoma xwe lêxin. <sup>24</sup>Serwêrê olk'a gêrşonîya Elyasafê kur'ê Layêl bû. <sup>25</sup>Borcê zar'êd Gêrşon li Konê Civînêda xweyîtîya Pîrozgeh, sergira ser girtinê û serkêşa wê û p'er'da ber derê Konê Civînê ye, <sup>26</sup>p'er'dêd h'ewşê û p'er'da ber derê h'ewşê ku dora pîrozgeh û gorîgehêf ye, usa jî hebinêd wê, usa jî h'emû şixulê wê ye. <sup>27</sup>Malbeta e'mramîya, malbeta Îsharîya, malbeta hêbronîya û malbeta ûzîêlîya digihîjine Qohat'. Evana malbetêd qohat'îya ne. <sup>28</sup>H'esabê her qisimê nêrînî ji yek mehê 8600 nefş bûn. Vana xweyîtîya cîyê pîroz dikir. <sup>29</sup>Malbetêd zar'êd Qohat' bira zomêd xwe alîyê başûra pîrozgehê lêxin. <sup>30</sup>Serwêrê olk'a malbetêd qohat'îya Elîsafanê kur'ê Ûzîêl bû. <sup>31</sup>Borcê xweyîtîya wan: sindoq, sîfire, şemdan, gorîgeh û hacetêd pîroz bona xebata wan, usa jî p'er'de û h'emû şixulê wê ne. <sup>32</sup>Serokê serwêrêd lêwîya Êlazarê kur'ê Harûnê k'ahîn bû. Ew serwêrê wan bû yêd ku xweyîtîya cîyê pîroz dikirin.

<sup>33</sup>Malbeta mah'lîya û malbeta mûşîya digihîjine Mêrarî. Evana malbetêd mêarîya ne. <sup>34</sup>H'esabê her qisimê nêrînî ji yekmehê 6200 nefş bûn. <sup>35</sup>Serwêrê olk'a malbetêd Mêrarî Sûrîyêlê kur'ê Abîxayîl bû. Ew bira alîyê bakura pîrozgehê zomê xwe lêxin. <sup>36</sup>Borcê xweyîtîya kur'êd Mêrarî: Çîtêd pîrozgehê, destûyê wê, stûnêd wê, bingehêd wê, h'emû

hacetêd wê û h'emû şixulê wan, <sup>37</sup>usa jî stûnêd dora h'ewşê, bingehêd wan, singêd wan û hebinêd wan e.

<sup>38</sup>Mûsa, Harûn û kur'êd wî zomêd xwe bira alîyê r'ohilata pîrozgehê, pêşberî Konê Civînê lêxin. Ew gere xweyîtiya cîyê pîroz bikin bona bêxofîya zar'êd Îsraêl. Gava yekî din nêzîk be, gere bê kuştinê. <sup>39</sup>Mûsa û Harûn anegorî xebera Xudan h'emû lêwî anegorî malbetêd wan jimartin. H'esabê h'emû qisimê nêrînî ji yekmehê 22000 nefş bûn.

### Lêwî ji ber nixurîyê Îsraêlva têne dayînê

<sup>40</sup>Xudan gote Mûsa: «H'emû nixurîyêd qisimê nêrînî zar'êd Îsraêl ji yekmehê bijmire. R'eqema navêd wan çêke. <sup>41</sup>Û lêwîya dewsa h'emû nixurîyê zar'êd Îsraêl min'r'a k'ifş ke usa jî h'eywanê lêwîya dewsa h'emû nixurîyê h'eywanê zar'êd Îsraêl. Ez Xudan im». <sup>42</sup>Mûsa h'emû nixurîyêd zar'êd Îsraêl jimartin, çawa ku Xudan t'emî li wî kiribû. <sup>43</sup>H'esabê h'emû nixurîyê qisimê nêrînî yek mehî û jor anegorî r'eqema navêd wan 22273 nefş bûn.

<sup>44</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>45</sup>«lêwîya dewsa h'emû nixurîyê zar'êd Îsraêl k'ifş ke usa jî h'eywanê lêwîya dewsa h'eywanê wan. Û lêwîyê p'ara min bin, ez Xudan im. <sup>46</sup>Û bona van 273 nixurîyêd zar'êd Îsraêl ku ji lêwîya zêdetir in, <sup>47</sup>ji ber wan her kesîva pênc şêkilî\* hilde, anegorî şêkilê pîrozgehê ku bîst gêr\* e. <sup>48</sup>Û ew p'erê ber yêd zêdeva dayî bide Harûn û kur'êd wî». <sup>49</sup>Mûsa p'erê ji bervadayî bona yê ji lêwîya zêdetir hildan, <sup>50</sup>awa gotî ewî ji nixurîyêd zar'êd Îsraêl 1365 şêkil anegorî şêkilê pîrozgehê hildan. <sup>51</sup>Mûsa ev p'erêd bervadayînê anegorî xebera Xudan, çawa ku Xudan t'emî dabû Mûsa, dane Harûn û kur'êd wî.

\* 3:47 «Şêkil» nêzîkî 12 girama bû.

\* 3:47 «Gêrek» qasî 0,6 girama bû.

**Borcê malbetêd lêwîya**

**4** Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Zar'êd Qohat' anegorî malbetêd wan û olk'êd wan ji nava zar'êd Lêwî bijmire, <sup>3</sup>awa gotî her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê k'îjan qulixkirinêr'a hazir e, ku xebata Konê Civînê bike. <sup>4</sup>Şixulê zar'êd Qohat' li Konê Civînê xweyîtîya tiştêd here pîroz e. <sup>5</sup>Wextê r'êk'etina zomê Harûn û kur'êd wî bira bèn p'er'da navbir'îyê vekin û bi wê Sindoqaf Peymanê binixêmin. <sup>6</sup>Bi serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya ew binixêmin, tejê şîn bavêjine ser û destûya têr'a derbaz kin. <sup>7</sup>Tejê şîn bavêjine ser t'extê nanêf Xwedêr'a dayî û sinîya, t'asa, k'asa, cêr'êd bona dîyarîyaf serdakirinê daynine ser. <sup>8</sup>Tejê sorî gevez bavêjine li ser wan, bi serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya wê binixêmin û destûya têr'a derbaz kin. <sup>9</sup>Bira ew tejê şîn hildin şemdan, ç'irêd wê, destikêd wê, sinîyêd wê û h'emû derdanêd bona bizirê wê ku bona şemdan didine xebatê, binixêmin. <sup>10</sup>Wê û h'emû hacetêd wê bi serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya bip'êç'in û daynine li ser çîtê. <sup>11</sup>Tejê şîn bavêjine li ser gorîgeha zêr'în û bi serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sî binixêmin û destûya têr'a derbaz kin. <sup>12</sup>H'emû hacetêd bona xebata cîyê pîroz hildin, daynine li nava tejê şîn, bi serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya binixêmin û daynine li ser çîtê. <sup>13</sup>K'ozîya gorîgehê t'emiz kin û tejê sorî gevez bavêjine li ser. <sup>14</sup>Û h'emû hacetêd wêye xebatê daynine li ser wê: Sinîya, goştgira, mer'ika û t'ešta awa gotî h'emû hacetêd gorîgehê. Serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya bavêjine li ser û destûya têr'a derbaz kin. <sup>15</sup>Gava Harûn û kur'êd wî nixamtina cîyê pîroz û her tiştêd cîyê pîroz xilaz kin, wextê r'êk'etina zomê zar'êd Qohat' wê bèn ku hildin, lê bira ew dest nedine pîrozîyê wekî nemirin. Ev e barê zar'êd Qohat' li Konê Civînê.

<sup>16</sup>Êlazarê kur'ê Harûnê k'ahîn cabdarê: Bizirê bona r'onayê, bixûraf bînxweş, dîyarîyaf nanîye her gav, r'ûnê r'ûnkirinê

ye. Cabdarê t'emamîya pîrozgehê û her tiştêd navda, usa jî Cîyê Pîroz û hacetêd wê ye».

<sup>17</sup>Xudan Mûsa û Harûn'a xeber da û got: <sup>18</sup>«Haş ji xwe hebe qebîla malbetêd qohat'îya ji nava lêwîya neyê undakirinê. <sup>19</sup>Awa hûn çî gere bona wan bikin ku ew sax bimînin û nemirin gava ew nêzîkî Cîyê Herî Pîroz bin: Harûn û kur'êd wî bira bên û her kesî li ber xebata wî û borcê wî bidine sekinandinê. <sup>20</sup>Kahatî t'u car berî nixamtina tiştêd pîroz bira nek'evinê ku bibînin, wekî nemirin».

<sup>21</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>22</sup>«Zar'êd Gêrşon jî anegorî olk'êd wan û malbetêd wan bijmire, <sup>23</sup>awa gotî her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku qulixkirinêr'a hazir e şixulê Konê Civînê bike, bijmêre. <sup>24</sup>Ev e xebata malbetêd gêrşonîya, çî gere bikin û çî hildin: <sup>25</sup>Ew gere tejê pîrozgehê, Konê Civînê û sergira wê, serk'êşa ji ç'ermê ga-me'sîya ku li ser e û p'er'da li ber derê Konê Civînê, <sup>26</sup>p'er'dêd h'ewşê, p'er'da ber derê h'ewşê ku dora pîrozgeh û gorîgehê ye, hebinêd wan û h'emû hacetêd bona xebata wan hildin. Û her şixulê ku bona van tişta lazim e bira ew bikin. <sup>27</sup>H'emû xebata zar'êd gêrşonîya, awa gotî her çî ku ew hildin û her çî ku ew bikin, ew gerekê bi gotina Harûn û kur'êd wî bê kirinê. Her tiştêd hildanê bikine bin se'vîtîya wan. <sup>28</sup>Ev e xebata malbetêd zar'êd gêrşonîya Konê Civînêda. Ew gere vê yekê bi serwêrîya Ît'amarê kur'ê Harûnê k'ahîn bikin.

<sup>29</sup>Zar'êd Mêrarî anegorî malbetêd wan û olk'êd wan bijmêre, <sup>30</sup>awa gotî her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku qulixkirinêr'a hazir e, şixulê Konê Civînê bike, bijmêre. <sup>31</sup>Ev e barê wan ku ew gere hildin anegorî t'emamîya şixulê wanî Konê Civînêda, awa gotî çîtêd pîrozgehê, destûyêd wê, stûnêd wê, bingehêd wê, <sup>32</sup>stûnêd dora h'ewşê, bingehêd wan, singêd wan û hebinêd wan û h'emû hacetêd wan bona t'emamîya xebata van tişta. Hûn navê hacetê ku ew gere hildin bikine r'eqem bijmirin. <sup>33</sup>Ev e h'emû şixulêd malbetêd zar'êd Mêrarî Konê Civînêda, bi serwêrîya Ît'amarê kur'ê Harûnê k'ahîn».

<sup>34</sup>Mûsa, Harûn û serwêrêd civînê zar'êd qohat'îya anegorî malbetêd wan û olk'êd wan jimartin, <sup>35</sup>her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku qulixkirinêr'a hazir e şixulê Konê Civînê bike, <sup>36</sup>h'esabê wan anegorî malbetêd wan 2750 nefş bûn. <sup>37</sup>Ev e h'esabê malbetêd Kahatîya h'emûyêd ku Konê Civînêda dixebitîn, k'îjan ku Mûsa û Harûn jimirîn, çawa ku Xudan pê Mûsa t'emî kiribû.

<sup>38</sup>H'esabê zar'êd Gêrşon anegorî malbetêd wan û olk'êd wan, <sup>39</sup>her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku qulixkirinêr'a hazir bû şixulê Konê Civînê bikira, <sup>40</sup>h'esabê wan anegorî malbetêd wan, olk'êd wan 2630 nefş bûn. <sup>41</sup>Ev e h'esabê malbetêd zar'êd Gêrşon h'emûyêd ku Konê Civînêda dixebitîn, k'îjan ku Mûsa û Harûn anegorî t'emîya Xudan ew jimartin.

<sup>42</sup>H'esabê malbetêd zar'êd Mêrarî anegorî malbetêd wan û olk'êd wan, <sup>43</sup>her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku qulixkirinêr'a hazir bû şixulê Konê Civînê bikira, <sup>44</sup>h'esabê wan anegorî malbetêd wan 3200 nefş bûn. <sup>45</sup>Ev e h'esabê malbetêd Mêrarî k'îjan ku Mûsa û Harûn anegorî t'emîya Xudan ew jimartin.

<sup>46</sup>T'emamîya lêwîya anegorî malbetêd wan û olk'êd wan ku Mûsa, Harûn û serwêrêd Îsraêl ew jimartin, <sup>47</sup>her kesê ji sîsalîyê h'eta pêncîsalîyê ku hazir bû şixul û hildana Konê Civînê bikira, <sup>48</sup>h'esabê wan 8580 nefş bûn. <sup>49</sup>Evana weke gotina Xudan, her kes bi destê Mûsa anegorî qulixê xwe û barhildanê aha hatine jimarê, çawa ku Xudan t'emî li Mûsa kiribû.

### Paqijkirina zomê

**5** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«E'mirî zar'êd Îsraêl ke ku h'emûyêd k'otîf, h'emûyêd gemar jê diçe û h'emûyêd nepaqij ku dest dane cinyaz ji nava zomê derxin. <sup>3</sup>Çawa mêr usa jî jin ji zomê derxine der wekî ew zomêd xwe, nava k'îjana ez hêwirîme neh'er'imînin». <sup>4</sup>Zar'êd Îsraêl xût usa kirin ew ji nava zomê derxistine der. Çawa ku Xudan gotibû Mûsa zar'êd Îsraêl xût usa kirin.

### Ji ber gunava dayîn

<sup>5</sup>Xudan t'evî Mûsa xeberda û got: <sup>6</sup>«Bêje zar'êd Îsraêl, heger mêt yan jinek, li ber Xudan bêe'silîyê bike, awa gotî gunekî hindava yekî dinda bike û ew meriv gunê xwe fe'm bike, <sup>7</sup>bira ew gunê xweyî kirî bide r'ûyê xwe, bira ew ji ber gunê xweva t'am bide û bira çarîka pêncâ jî serda zêdeke û bide wî li ber k'ê gune kirîye. <sup>8</sup>Lê heger pismamê wî merivî t'une be\* ku ji ber guneva bidine wî, hingê dayîna ji ber guneva, digihîje Xudan bona k'ahîn, serda jî beranê gunek'ewandinê, bi k'îjanî gunek'ewandin wê bona wî bê kirinê. <sup>9</sup>Û h'emû h'edîyêd ji h'emû tiştêd pîroze zar'êd Îsraêl ku ewê bînine li cem k'ahîn, bira p'ara wî be. <sup>10</sup>Tiştêd pîroze her kesî p'ara k'ahîn in, k'ê çî ku bide wî ew p'ara wî ye».

### Mêrê k'umr'eş

<sup>11</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>12</sup>«Zar'êd Îsraêl'r'a xeber de û bêje wan: «Her mêtê ku jina wî ji r'îya xwe derê û hindava mêtê xweda şîrh'elal nîbe, <sup>13</sup>mêrek serê xwe wêr'a dayne û eva yeka ji mêtê wê veşartî bimîne, lê ew dizîva h'er'imîye, şe'de jî miqabilî wê t'uneye, ew nehatîye girtinê. <sup>14</sup>Heger r'uh'ê k'umr'eşîyê bê li ser mêtê wê û ew k'umr'eşîyê jina xwe bike, jin jî h'er'imî ye, yan jî heger r'uh'ê k'umr'eşîyê bê li ser wî û ew k'umr'eşîyê jina xwe bike lê jin ne h'er'imîye, <sup>15</sup>bira mêt jina xwe bîne li cem k'ahîn. Bira bona wê qurbanê bide awa gotî p'arek ji deha êfa\* arê cehe, lê bira r'ûn ner'êje li

---

\* 5:8 Yanê gava yek ber yekî gune dike gere ji ber gunê xweva li wî vege'îne. Lê heger ew meriv bimire hingê gere bidine pismamê wîyî nêzîk. Lê heger pismamê wî t'unebe ew digihîje Xudan bona k'ahîn. Lê xêncî vê yekê yê gunek'ar gere beranekî jî bona gunek'ewandinê bide. Bona vê qanûnê binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 6:2-7.

\* 5:15 «Êfa» derdanê 10 litirê bû.

ser wê û ne jî bixûrê, çimkî ev dîyarîya nanîye k'umr'eşîyê ye, dîyarîya nanîye bîranînê ye bona e'yankirina neheqîyê. <sup>16</sup>K'ahîn bira wê bibe û li ber Xudan bide sekinandinê. <sup>17</sup>K'ahîn bira ava pîroz bike derdana axîn, axa e'rdê Konê Şe'detîyê hilde û bike nava wê avê. <sup>18</sup>Peyr'a k'ahîn bira jinê li ber Xudan bide sekinandinê û laç'ika serê wê veke\*, dîyarîya nanîye bîranînê bide destê wê awa gotî dîyarîya nanîye k'umr'eşîyê. Lê destê k'ahînda jî gere ava te'le nifir' kirinê hebe. <sup>19</sup>K'ahîn gere wê bide sondê û bêje jinê: «Heger t'u mêrî serê xwe ter'a danenîye xêncî mêrê te yan heger tu r'îya xwe dernek'etîyî, neh'er'imîyî, tu azayî ji vê ava te'le nifir' kirinê, <sup>20</sup>lê heger tu ji bin qolê mêrê xwe derk'etîyî, h'er'imîyî û mêrekî din xêncî mêrê te serê xwe ter'a danîye...» <sup>21</sup>(Hingê bira k'ahîn jinê bi sonda nifir'ê bide sondê û bêje jinê) «...bira Xudan te bike nifir' û sond li nava milletê teda, bi dayîna Xudan bet'inê te p'ûç' be û zikê te jî biwerime. <sup>22</sup>Bira eva ava hane nifir' kirinê bik'eve zikê te wekî zikê te biwerime û bet'inê te jî p'ûç' be». Bira jin jî bêje: «Amînî, amîn». <sup>23</sup>K'ahîn bira van nifir'a li ser k'axazê binivîse û li ava te'lda bişo r'esît ke\*. <sup>24</sup>Û ava te'le nifir' kirinê bide jinê ku vexwe, ava nifir' kirinê wê bik'eve zikê wê û wê te'layê pêşda bîne. <sup>25</sup>Paşê k'ahîn bira ji destê jinê dîyarîya nanîye k'umr'eşîyê hilde, wê dîyarîya nanî li ber Xudan bihejîne û wê dayne li ser gorîgehê. <sup>26</sup>K'ahînê k'ulmekê ji wê dîyarîya nanîye bîranînê hilde û li ser gorîgehê agirşewatî ke û paşê ewê avê li jinê bide vexwarinê. <sup>27</sup>K'engê ew jinê bi wê avê bide vexwarinê heger ew h'er'imîbe, mêrê xwer'a şîrh'elal nîbûye ew ava nifir' kirinê zikê wêda wê te'layê pêşda

\* 5:18 Îbranîf aha jî tê fe'mkirinê «P'or'ê serê wê ber'de».

\* 5:23 Wî we'deyî bi cûr'e h'ubir dinivîsîn ku nava avê dih'elîya. Lê li vir ha tê fe'mkirinê, wekî ew xeberêd nifir' e li ser k'axazê nivîsar nava avêda dih'elîyan û ew bona jinê dibûne nifir'. Yanê ewê ava nifir'kirî vedixwar.

bîne û zîkê wê wê biwerime, bet'inê wê p'ûç' be û ew jinê li nava mîletê xweda bibe nîfir' lêbûyî. <sup>28</sup>Lê heger ew jina ne h'er'imîye, h'elal e, ewê aza be wê bikaribe zar'a bîne».

<sup>29</sup>Eva hînkirina bona k'umr'eşîyê ye, gava jin bin qolê mêrê xwe derê û bih'er'ime, <sup>30</sup>yan jî heger r'uh'ê k'umr'eşîyê bê li ser mêr û ew k'umr'eşîyê li jina xwe bike û jina xwe bibe li ber Xudan, hingê k'ahînê h'emû anegorî vê hînkirinê bike.

<sup>31</sup>Mêrê bêstûc be ji guna, lê jinê bona gunê xwe sûcdar be.

### Qanûna bona nezîrîyê

**6** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Zar'êd Îsraêlr'a xeber de û bêje wan: «Heger mêr yan jin bona nezîrîyê dixwaze ad-qîrar ke, ku ew bibe nezîrê Xudan, <sup>3</sup>Gerekê ew xwe ji şerav û araqê dûr bigire, sirka şeravê û sirka araqê venexwe, t'u car ji tiştê tirîya çêkirî venexwe û ne tirîyê gihîştî bixwe û ne jî k'işmîşa. <sup>4</sup>H'emû r'ojêd nezîrîya xweda, ew gerekê her tiştê ji tirîya çêkirî nexwe, ji dendikada girtî h'eta qalika. <sup>5</sup>H'emû r'ojêd ad-qîrarêye nezîrîya xweda, gerekê dûzan serê wî nek'ewe, h'eta t'emambûna r'ojêd ku ewî xwe Xudanr'a nezîr kirîye ew bira pîroz be, p'or'ê serê xwe bira bihêle dirêj bin. <sup>6</sup>H'emû r'ojêd ku wî xwe Xudanr'a nezîr kirîye ew bira nêzîkî t'u cinyazî nebe, <sup>7</sup>ne cinyazê bavê xwe, ne dîya xwe, ne birê xwe ne jî xûşka xwe. H'eta bona mirina wan jî ew bira paqijîya xwe neh'er'imîne, çimkî nezîrîya bona Xwedêyê wî li ser serê wî ye. <sup>8</sup>H'emû r'ojêd wîye nezîrîyê bira ew Xudanr'a pîroz be.

<sup>9</sup>Lê heger yek nişkêva li ber wî bimire û ew serê xweyî nezîrîyê bih'er'imîne, hingê ew gere p'or'ê xwe r'oja xweye paqijbûnê kur' ke. R'oja h'efta bira ew p'or'ê xwe kur' ke <sup>10</sup>û li r'oja h'eysta bira du fatimoka yan jî du cûcûkêd kewa bîne li ber derê Konê Civînê li cem k'ahîn. <sup>11</sup>K'ahînê yekî bide çawa dîyarîya gunek'ewandinê yê dinê jî çawa dîyarîyaf t'evayîşewatê û wî ji guneyê wîyî bona destdayîna yê mirî bik'ewîne. Li wê r'ojê serê wî pîroz bike. <sup>12</sup>Û dîsa r'ojê xweye

nezîrîyê Xudan'a k'ifş ke, berxekî yeksalî Xudan'a bide çawa dîyarîya ji ber neheqîyêva. R'ojêd wîye berî vê yekê unda dibin, çimkî nezîrîya wî h'er'imîye.

<sup>13</sup>Ev e qanûna bona nezîrîyê: Çaxê r'ojêd nezîrîya wî t'emam bin, bira wî bînine li ber derê Konê Civînê. <sup>14</sup>Ewê dîyarîya xwe berxekî yeksalîyî bê qusûr Xudan'a t'evayîşewat ke û berxeke mêye yek salîye bê qusûr bona paqîjbûnê dîyarîf ke, usa jî beranekî bê qusûr bona dîyarîya<sup>f</sup> heleqetîyê bide, <sup>15</sup>sele nanê bê hevîrtir'şk, awa gotî k'atêd ji arê xas r'ûnda stirayî û loşêd bê hevîrtir'şke ser r'ûnkirî, t'evî dîyarîya wane nanî û dîyarîya wane vexwarinê bide. <sup>16</sup>K'ahîn bira van dayne li ber Xudan û dîyarîya wîye paqîjbûnê û t'evayîşewatê bide. <sup>17</sup>Lê beran t'evî sela nanê bê hevîrtir'şk çawa dîyarîya heleqetîyê bide Xudan, usa jî k'ahîn bira dîyarîya wîye nanî û vexwarinê bide. <sup>18</sup>Hingê yê nezîr li ber derê Konê Civînê p'or'ê xweyî nezîrîyê kur' ke. P'or'ê serê xweyî nezîrîyê hilde û dayne li ser agirê binê dîyarîya heleqetîyê. <sup>19</sup>K'ahîn jî bira pîla beranê k'elandî, k'atekî bê hevîrtir'şk, loşekî bê hevîrtir'şk ji selê hilde û bide destêd nezîr, pey kur'kirina p'or'ê nezîrîya wîr'a. <sup>20</sup>K'ahîn gere wan çawa dîyarîya<sup>f</sup> h'ejandinê li ber Xudan bih'ejîne, eva yeka pîroz e û p'ara k'ahîn e t'evî sîngê dîyarîyê û pîlê dîyarîyê. Peyr'a nezîr dikare şeravê vexwe. <sup>21</sup>Ev e qanûna bona nezîrîyê. Lê heger ew ad-qîrar dike ku li ser qanûna nezîr'a h'edîkê zêde bide Xudan, çî ku ji destê wîva tê, ew gere xût usa bike, çawa ku ad-qîrar kir be».

### Bimbarekîya k'ahîn

<sup>22</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>23</sup>«Harûn û kur'êd wîr'a xeber de, bêje: «Aha zar'êd Îsraêl bimbarek kin, bêjine wan:

<sup>24</sup> Bira Xudan te bimbarek ke

û xweyî ke!

<sup>25</sup> Bira ç'e'vê Xudan li ser te be

û r'e'mê li te bike!

<sup>26</sup> Bira Xudan berê xwe bide te

û xêr û xweşîyê bide tel!

<sup>27</sup> Bi vî awayî navê minê zar'êd Îsraêlva bê girêdin û ezê wan bimbarek kim».

### Dîyarîyêd serwêrêd qebîla

**7** Gava Mûsa pîrozgeh da sekinandinê xilaz kir, ew û her tiştêd wê r'ûn kirin û pîroz kir, hingê gorîgeh û h'emû hacetêd wê jî r'ûn kirin û pîroz kir. <sup>2</sup> Serwêrêd Îsraêl, serwêrêd olk'êd wan, awa gotî serwêrêd qebîlêd wan, yêd ku serwêrîya navnivîsarê dikirin, dîyarî anîn. <sup>3</sup> Dîyarîyêd xwe anîne li ber Xudan: Şeş e'rebê girtî, donzdeh ga, her e'rebek du serwêr bûn û herekîr'a gak, vana ev anîne li ber Pîrozgehê. <sup>4</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>5</sup> «Ji wan hilde, ewê bona xizmetk'arîya Konê Civînê bêne xebatê. Wan bide lêwîya, her kesîr'a anegorî xebata wî». <sup>6</sup> Mûsa e'rebe û ga hildan û ew dane lêwîya. <sup>7</sup> Du e'rebe û çar ga dane zar'êd Gêrşon, anegorî xebata wan. <sup>8</sup> Çar e'rebe h'eyşt ga dane zar'êd Mêrarî, anegorî xebata wane bi serwêrîya Ît'amarê kur'ê Harûnê k'ahîn. <sup>9</sup> Lê neda kur'ê Qohat' çimkî xebata Cîyê Pîroz li ser wan bû, wana ew gere li ser milê xwe bibirana.

<sup>10</sup> Serwêra dîyarîya pîrozkirina\* gorîgehê r'oja r'ûn kirinê anîn. Serwêra dîyarîyêd xwe anîne li ber gorîgehê. <sup>11</sup> Xudan gote Mûsa: «R'ojê serwêrek bira dîyarîya xwe bîne, bona pîrozkirina gorîgehê».

<sup>12</sup> R'oja pêşin Nehşonê kur'ê Amînadav ji qebîla Cihûda dîyarîya xwe anî. <sup>13</sup> Dîyarîya wî ev bû: t'eşteke zîvîne 130 şêkilê\*, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>14</sup> kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>15</sup> canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>16</sup> nêrîkî

\* 7:10 Bi gotineke din: «Buhurtî-jibarekirina».

\* 7:13 «Şêkil» nêzîkî 12 girama bû.

bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>17</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Nehşonê kur'ê Amînadav bû.

<sup>18</sup>R'oja duda Nit'anêlê kur'ê Sûhar serwêrê Îsaxar dîyarîya xwe anî. <sup>19</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>20</sup>kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>21</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>22</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>23</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Nit'anêlê kur'ê Sûhar bû.

<sup>24</sup>R'oja sisîya Elyabê kur'ê H'êlon serwêrê zar'êd Zebûlon anî. <sup>25</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>26</sup>kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>27</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>28</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>29</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Elyabê kur'ê H'êlon bû.

<sup>30</sup>R'oja çara Elîsûrê kur'ê Şidêyûr serwêrê zar'êd R'ûbên anî. <sup>31</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>32</sup>kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>33</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>34</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>35</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Elîsûrê kur'ê Şidêyûr bû.

<sup>36</sup>R'oja pêncê Şilûmîyêlê kur'ê Sûrîşadayê serwêrê zar'êd Şimh'un anî. <sup>37</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>38</sup>kevç'îkî

zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>39</sup> canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>40</sup> nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>41</sup> du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Şilûmîyêlê kur'ê Sûrîşaday bû.

<sup>42</sup> R'oja şeşa Elyasafê kur'ê Dihûyêlê serwêrê zar'êd Gad anî. <sup>43</sup> Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>44</sup> kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>45</sup> canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>46</sup> nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>47</sup> du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Elyasafê kur'ê Dihûyêlê bû.

<sup>48</sup> R'oja h'efta Elîşamayê kur'ê E'mîhûdê serwêrê zar'êd Efrayîm anî. <sup>49</sup> Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>50</sup> kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>51</sup> canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>52</sup> nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>53</sup> du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Elîşamayê kur'ê E'mîhûdê bû.

<sup>54</sup> R'oja h'eysta Gamalyêlê kur'ê Pidahsûrê serwêrê zar'êd Minaşe anî. <sup>55</sup> Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>56</sup> kevç'îkî zêr'înî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>57</sup> canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>58</sup> nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>59</sup> du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Gamalyêlê kur'ê Pidahsûrê bû.

<sup>60</sup> R'oja neha Abîdanê kur'ê Gîdonîyê serwêrê zar'êd Binyamîn anî. <sup>61</sup> Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî

r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>62</sup>kevç'îkî zêr'inî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>63</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>64</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>65</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Abîdanê kur'ê Gîdonî bû.

<sup>66</sup>R'oja deha Axîhezerê kur'ê E'mîşadayê serwêrê zar'êd Dan anî. <sup>67</sup>Dîyarîya wî jî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xwesî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>68</sup>kevç'îkî zêr'inî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>69</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>70</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>71</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Axîhezerê kur'ê E'mîşaday bû.

<sup>72</sup>R'oja yanzdeha Pagîyêlê kur'ê Ok'ranê serwêrê zar'êd Aşêr anî. <sup>73</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>74</sup>kevç'îkî zêr'inî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>75</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>76</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>77</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Pagîyêlê kur'ê Ok'ran bû.

<sup>78</sup>R'oja donzdeha Ah'îrayê kur'ê Eynanê serwêrê zar'êd Neftelî anî. <sup>79</sup>Dîyarîya wî ev bû: T'eşteke zîvîne 130 şêkilê, t'aseke zîvîne 70 şêkilê, anegorî şêkilê pîrozgehê, her du jî bi arê xasî r'ûnda stirayî dagirtî bona dîyarîya nanî, <sup>80</sup>kevç'îkî zêr'inî 10 şêkilê bixûrêva dagirtî, <sup>81</sup>canegak, beranek, berxekî yeksalî bona dîyarîya t'evayîşewatê, <sup>82</sup>nêrîk bona dîyarîya paqijbûnê, <sup>83</sup>du ga, pênc beran, pênc nêrî û pênc berxêd yeksalî bona dîyarîya heleqetîyê. Eva dîyarîya Ah'îrayê kur'ê Eynan bû.

<sup>84</sup>Ev e dîyarîya ku serwêrêd Îsraêl bona pîrozkirina gorîgehê, r'oja r'ûnkirina wê anîn: Donzdeh t'eştêd zîvîn, donzdeh t'asêd zîvîn, donzdeh kevç'îyêd zêr'in. <sup>85</sup>Her t'eşteke zîvîn 130 şêkil bû, her t'asek 70 şêkil bû, h'emû bi hev'r'a 2400

şêkil bû, anegorî şêkilê pîrozgehê. <sup>86</sup>Donzdeh kevç'îyêd zêr'în bixûrêva dagirtî, her kevç'îk 10 şêkil bû, anegorî şêkilê pîrozgehê, h'emû bi hevr'a 120 şêkil bû. <sup>87</sup>H'emû h'eywanê bona dîyarîya t'evayîşewatê ev bûn: Donzdeh canega, donzdeh beran, donzdeh berxêd yeksalî t'evî dîyarîya wane nanî. Û donzdeh nêrî bona dîyarîya paqijbûnê. <sup>88</sup>T'emamîya h'eywanê bona dîyarîya heleqetîyê ev bûn: Bîstçar ga, şêst beran, şêst nêrî û şêst berxêd yeksalî. Eva dîyarîya pîrozkirina gorîgehê bû, pey r'ûnkirina wêr'a.

<sup>89</sup>Gava Mûsa dik'ete Konê Civînê bona ku t'evî Xudan xeber da, ewî dengê ku wîr'a xeber dida, ji ser qalp'axê baxşandinêyî li ser Sindoqaf Şe'detîyêye nava her du xêrûbadaf dibihîst. Û Xudan t'evî wî xeber dida.

### Ç'irayêd şemdanê

**8** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Harûnr'a xeber de û bêje wî: «Gava tu ç'ira saz kî, her h'eft ç'ira gere pêşîya şemdanê r'onayî kin». <sup>3</sup>Harûn xût usa jî kir, ewî ç'irayêd şemdanê pêşîya wê saz kirin, çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû. <sup>4</sup>Şemdan ha hatibû çêkirinê: Ji bingeha wê h'eta kulîrkêd wê ew ji zêr'ê k'olandî bû. Anegorî cûr'ê ku Xudan nîşanî Mûsa kiribû xût usa ewî şemdan çêkir».

### Paqijkirina lêwîya

<sup>5</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>6</sup>«lêwîya ji nava zar'êd Îsraêl başqe ke û wan paqij ke. <sup>7</sup>Bona paqijbûna wan aha bike: Ava paqijkirinê bir'eşîne li ser wan, bira ew bi dûzên h'emû pir'ç'a li ser xwe hildin, k'incêd xwe bişon û ewê paqij bin. <sup>8</sup>Bira ew canegakî t'evî dîyarîya wîye nanî ji arê xasî r'ûnda stirayî hildin û canegê duda jî bona dîyarîya paqijbûnê tu hilde. <sup>9</sup>Peyr'a lêwîya bîne li ber Konê Civînê û t'emamîya civata zar'êd Îsraêl bicivîne. <sup>10</sup>lêwîya bîne li ber Xudan û zar'êd Îsraêl bira destêd xwe daynine li ser lêwîya. <sup>11</sup>Harûn lêwîya ji nava zar'êd Îsraêl li ber Xudan

çawa dîyarîya h'ejandinê bide, ku ew bibine xizmetk'arê xebata Xudan. <sup>12</sup>Lêwî jî bira destêd xwe daynine li ser serê canega û bona k'ewardina lêwîya yekê çawa dîyarîya paqijbûnê bide, yê din jî çawa dîyarîya t'evayîşewatê Xudanr'a. <sup>13</sup>lêwîya li ber Harûn û kur'êd wî bide sekinandinê û çawa dîyarîya h'ejandinê bide Xudan. <sup>14</sup>Bi vî awayî lêwîya ji nava zar'êd Îsraêl başqe ke. lêwîyê p'ara min bin. <sup>15</sup>Pey vê yekêr'a lêwîyê bên Konê Civînêda bixebitin, gava tu wan paqij kî û çawa dîyarîya h'ejandinê bidî. <sup>16</sup>Ew t'am ji nava zar'êd Îsraêl min'r'a hatine dayînê, ji ber h'emû nixurîyêd ku bet'inê vedikin awa gotî h'emû nixurîyêd ji zar'êd Îsraêl min ew xwer'a hildan. <sup>17</sup>Çimkî h'emû nixurîêd Îsraêl, ji mêriv girtî h'eta h'eywên p'ara min in. Li wê r'oja ku min h'emû nixurîyêd e'rdê Misirê qir' kirin, min hingê ew xwer'a k'ifş kirin. <sup>18</sup>Min lêwî ji ber h'emû nixurîyêd zar'êd Îsraêlva hildan. <sup>19</sup>Û min lêwî ji nava zar'êd Îsraêl dane Harûn û kur'êd wî, ew wan'r'a hatine dayînê bona ku dewsa zar'êd Îsraêl xizmetk'arîya Konê Civînê bikin, bona k'ewardina gunê zar'êd Îsraêl, wekî bela li nava zar'êd Îsraêl t'une be wextê ku zar'êd Îsraêl nêzîkî pîrozîyê bin».

<sup>20</sup>Mûsa, Harûn û t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl bona lêwîya usa jî kirin. Anegorî h'emû e'mirêd ku Xudan bona lêwîya li Mûsa kiribûn, zar'êd Îsraêl usa jî kirin. <sup>21</sup>lêwîya xwe paqij kirin, k'incêd xwe şuştin û Harûn ew çawa dîyarîya h'ejandinê li ber Xudan dane sekinandinê. Bona paqijbûna wan Harûn k'ewardin kir. <sup>22</sup>Pey vê yekêr'a lêwî hatin xizmetk'arîya xwe ber Harûn û kur'êd wî li Konê Civînêda bikin. Çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû bona lêwîya, usa jî kirin.

<sup>23</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>24</sup>«Eva ji Lêwîya dik'eve: Ew gerekê ji bîstpêncsalîyê jortir bên bixebitin, xizmetk'arîya Konê Civînê bikin. <sup>25</sup>Û pêncîsalîya xweda bira ew xizmetk'arîyê bihêlin û îdî nexebitin. <sup>26</sup>Ew dikarin Konê Civînêda bi nobedarîyê berdestîya birayêd xwe bikin, lê xizmetk'arîyê nekin. Aha bike bona borcê stûyê lêwîya».

**Cejinaf Derbazbûnê li ber'îya Sînayêda**

**9** Meha yekêye sala duda pey derk'etina ji e'rdê Misirê, Xudan li ber'îya Sînayêda Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Bira zar'êd Îsraêl Cejinaf Derbazbûnê we'dê wêda bikin. <sup>3</sup>Li berê êvarê r'oja çardehê vê mehê we'dê wêda, anegorî h'emû qeyde-qanûn û qirarêd wê, bikin». <sup>4</sup>Mûsa zar'êd Îsraêl'a xeberda ku Cejina Derbazbûnê bikin. <sup>5</sup>Wana Cejina Derbazbûnê li berê êvarê r'oja çardehê meha yekê li ber'îya Sînayêda kirin. Anegorî h'emû çi ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû, zar'êd Îsraêl usa jî kirin.

<sup>6</sup>Hebûn merî ku dest dabûne cinyaz û nepaqij bûn û nikaribûn Cejina Derbazbûnê wê r'ojê bikirana. Ew wê r'ojê nêzîkî Mûsa û Harûn bûn <sup>7</sup>û wan meriva gotine Mûsa: «Eme ne paqij in çimkî me dest daye cinyaz, çima em gere xwe ji wê yekê bigirin ku dîyarîya Xudan we'dê wêda t'evî zar'êd Îsraêl nedin?» <sup>8</sup>Mûsa gote wan: «Hela bisekinin, ez bizanibim k'a Xudanê bona we çi e'mir ke».

<sup>9</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>10</sup>«T'evî zar'êd Îsraêl xeber de û bêje: «Heger yek ji we yan ji zur'eta we r'îya dûrda be yan nepaqij be çimkî dest daye cinyaz, ew jî bira Cejina Derbazbûnê Xudanr'a bike, <sup>11</sup>lê bira berê êvarê r'oja çardehê meha duda wê bike. Bira bi nanê şkeva û p'incar'a te'l Cejina Derbazbûnê bixwe, <sup>12</sup>ji wê h'eta sibehê nehêle, ne jî hestûyêd wê bişkêne. Bira anegorî h'emû qeyde-qanûnêd Cejina Derbazbûnê bike. <sup>13</sup>Heger meriv paqij be û li r'êwîtyê nîbe lê Cejina Derbazbûnê neke ew nefsa gere ji nava milletê xwe bê bir'înê, çimkî dîyarîya Xudan we'dê wêda ne daye, ew merivê gerekê gunê xwe bik'işîne. <sup>14</sup>Heger nava weda xerîbek bijî û ew bixwaze Cejina Derbazbûnê Xudanr'a bike, bira anegorî qeyde-qanûnê Cejina Derbazbûnê û qirara wê bike. Qeyde-qanûn bona we, bona xerîb û bona binalîyê wî e'rdî gere yek be».

### E'wr li ser Pîrozgehê

<sup>15</sup>Li r'oja sekinandina Pîrozgehê e'wr Pîrozgeh awa gotî Konê Civînê nixamtibû û êvarda h'eta sibehê ew mîna agir li ser Pîrozgehê bû. <sup>16</sup>Her gav usa bû: R'ojê e'wr ew dinixamt, şevê jî ew mîna agir bû. <sup>17</sup>Her car gava e'wr ji ser kon r'adibû hingê zar'êd Îsraêl r'ê dik'etin û li wî cîyê ku e'wr datîni li wir zar'êd Îsraêl zomêd xwe lê didan. <sup>18</sup>Bi gotina Xudan zar'êd Îsraêl r'ê dik'etin û bi gotina Xudan zomêd xwe lê didan, h'emû r'ojêd ku e'wr danîya li ser Pîrozgehê ew li wir diman. <sup>19</sup>Gava e'wr dirêj li ser Pîrozgehê bima zar'êd Îsraêl guh didane nîşana Xudan û r'ê nedik'etin. <sup>20</sup>Dibû wekî e'wr çend r'oja li ser Pîrozgehê dima. Bi gotina Xudan wana zomêd xwe lê didan û bi gotina Xudan ew r'ê dik'etin. <sup>21</sup>Dibû wekî e'wr ji êvarê h'eta sibehê dima û sibehê ku e'wr bilind dibû ew r'ê dik'etin. R'oj bûya yan şev, gava e'wr bilind bûya ew jî r'ê dik'etin. <sup>22</sup>Heger du r'oja, yan mehekê, yan salekê e'wr li ser Pîrozgehê bima, zar'êd Îsraêl jî li wir diman û r'ê nedik'etin. Lê k'engê e'wr r'abûya, ew hingê r'ê dik'etin. <sup>23</sup>Bi gotina Xudan zomêd xwe lê didan û bi gotina Xudan r'ê dik'etin. Gotina Xudane bi destê Mûsa xweyî dikirin.

### Du bor'îyêd zîvîn

**10** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Xwer'a du bor'îyêd zîvîne k'olandî çêke, ewê ter'a bibin bona gazîkirina civînê û bona r'êk'etina zoma. <sup>3</sup>Gava dirêj wan her du bor'îya xin t'emamîya civînê wê bicive li cem te li ber derê Konê Civînê. <sup>4</sup>Lê gava ji wan yekê xin, serwêr, awa gotî serekêd e'laletêd Îsraêl wê bicivine li cem te. <sup>5</sup>Lê heger hûn kin lêxin hingê zomêd alîyê r'ohilatê lêdayî r'ê k'evin. <sup>6</sup>Lê gava cara duda kin lêxin hingê zomêd alîyê başûrê r'ê k'evin. Ev lêdana kin bona r'ê k'etina wan e. <sup>7</sup>Bona civandina civînê dirêj lêdin, ne kin. <sup>8</sup>Zar'êd Harûne k'ahîn wê bor'îya xin, evê wer'a bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê li nava zur'etêd

weda. <sup>9</sup>Gava hûn li nava e'rdê xweda her'ine şêr' miqabilî dijminê ku wer'a dijminatîyê dike, hingê kin bor'îya xin, hûnê li ber Xudan Xwedêyê xwe bêne bîranînê û ji dijminêd xwe bêne xilazkirinê. <sup>10</sup>Usa jî r'oja şabûna xweda, cejinêd xweye k'ifşkirîda û destpêbûna mehêd xweda bor'îya xin, wextê t'evayîşewatêd xwe û dîyarîyêd xweye heleqetîyê jî. Evê wer'a bibe çawa bîranîn li ber Xwedêyê we. Ez Xudan Xwedêyê we me».

### R'êk'etina ji Sînayê

<sup>11</sup>Bîstê meha dudaye sala duda e'wr ji ser Pîrozgeha Şe'detîyê bilind bû <sup>12</sup>hingê zar'êd Îsraêl ji ber'îya Sînayê r'êk'etin çûn û li ber'îya Paranê e'wr danî. <sup>13</sup>Ev cara pêşîyê bû ku ew li gora gotina Xudan bi destê Mûsa r'êk'etin, <sup>14</sup>û ala zoma zar'êd Cihûda anegorî ordîyêd xwe pêşîyê çû. Serwêrê ordîya wî Nehşonê kur'ê Amînadav bû. <sup>15</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Îsaxar Nit'anêlê kur'ê Sûhar bû. <sup>16</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Zebûlon Elyabê kur'ê H'êlon bû. <sup>17</sup>Lê gava Pîrozgeh dihate hevdanê hingê zar'êd Gêrşon û zar'êd Mêrarî diçûn û Pîrozgeh dibirin.

<sup>18</sup>Peyr'a ala zoma R'ûbên anegorî ordîyêd xwe diçû û Elîsûrê kur'ê Şidêyûr serwêrê ordîya wî bû. <sup>19</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Şimh'ûn Şilûmîyêlê kur'ê Sûrîşaday bû. <sup>20</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Gad Elyasafê kur'ê Dihûyêl bû. <sup>21</sup>Peyr'a Kahatî diçûn, yêd ku tiştêd pîroz dibirin. Pîrozgeh gere berî hatina wan bihata vegirtinê.

<sup>22</sup>Peyr'a ala zoma zar'êd Efrayîm anegorî ordîyêd xwe diçû û Elîşamayê kur'ê E'mîhûd serwêrê ordîya wî bû. <sup>23</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Minaşe Gamalyêlê kur'ê Pidahsûr bû. <sup>24</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Binyamîn Abîdanê kur'ê Gîdonî bû.

<sup>25</sup>Peyr'a çawa piştgirê h'emû zoma, ala zoma zar'êd Dan anegorî ordîyêd xwe diçû û Axîhezerê kur'ê E'mîşaday serwêrê ordîya wî bû. <sup>26</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd Aşêr Pagîyêlê kur'ê Ok'ran bû. <sup>27</sup>Serwêrê ordîya qebîla zar'êd

Neftelî Ah'îrayê kur'ê Eynan bû. <sup>28</sup> Ev in qeydêd çûyîna zar'êd Îsraêl anegorî ordîyêd wan. Ew bi vî awayî diçûn.

<sup>29</sup> Hingê Mûsa gote H'ovavê kur'ê R'ihûêlê midyanîyî xezûrê xwe: «Em diçine li wî cîyê ku Xudan got: «Ezê wî bidime we. T'evî me were emê qencîyê bona te bikin, çimkî Xudan qencî soz daye Îsraêl». <sup>30</sup> Lê ewî caba Mûsa da: «Ez nayê, lê ezê ve-ger'im her'ime li e'rdê xwe û nava merîyêd xwe». <sup>31</sup> Mûsa got: «Ji k'erema xwe me nehêle, çimkî tu zanî ku ber'îyêda em k'îderê zomêd xwe lêdin, tê bibî r'êberê me. <sup>32</sup> Awa heger tu t'evî me bêyî, ew qencîya ku Xudanê bona me bike, emê jî bona te bikin».

<sup>33</sup> Usa ew jî ç'îyayê Xudan r'îya sê r'oja çûn. Sindoqa Peymana Xudan jî pêşîya wanva r'îya sê r'oja diçû, wekî cîyê r'ih'etbûnê wan'r'a r'aç'e'v ke. <sup>34</sup> E'wrê Xudan r'ojê li ser wan bû çaxê ew jî zomê r'êdik'etin.

<sup>35</sup> Ê dema birina sindoqê, Mûsa digot: «R'abe Xudan! Ê bira dijminêd te bela bin, yêd dijenine te bira ji ber te bir'evin». <sup>36</sup> Lê çaxê sekinandinê ewî digot: «Xudan li h'ezar-h'ezarêd Îsraêl vege'le!»

### Bîntengîya T'abêrayêda

**11** Ê bû wekî cime'tê tengasîyêda hindava Xwedêda bîna xwe teng kir. Xudan bihîst, hêrsa wî r'abû û agirê Xudan nava wanda alav pêk'et û pêşa zomê h'ûfî xwe kir. <sup>2</sup> Hingê cime'tê hewara xwe Mûsa anî. Mûsa bi dua xwe avîte Xudan û agir vêsîya. <sup>3</sup> Navê wî cîyî Mûsa danîn T'ave'-ra\*, çimkî agirê Xudan li nava wanda alav pêk'et.

### Bîntengîya Qîbrot-Hat'awayêda

<sup>4</sup> Miletêd başqeye bê p'ergal nava wanda dilhaviyî kirin. Zar'êd Îsraêl jî dîsa girîyan û gotin: «K'ê wê goşt bide me em bixwin? <sup>5</sup> Tê bîra me ew me'sîyêd Misirêda ku me bê

---

\* 11:3 «T'ave'ra» ji k'okxebera xebera îbranî tê ku tê fe'mkirinê «Şewitandin».

heq dixwarin. Usa jî xiyar, zeveş, pîvazok, pîvaz û sîr. <sup>6</sup>Lê niha nefsa me ç'ila bûye, t'u tişt t'une, t'enê manaye li ber ç'e'vêd me».

<sup>7</sup>(Mana\* jî mîna ji k'oma t'oximê mêxikê bû, r'engê wê jî mîna bidolaxêf bû. <sup>8</sup>Cime't diger'îya, t'op dikirin û bi destar' dihêran, yan jî conîda dik'utan, beroşda dik'elandin û ji wê k'ate çêdikirin. Te'ma wê mîna te'ma k'atê r'ûn bû. <sup>9</sup>Û gava şev qir'avîyê li nava zomê dadanî, manayê jî serda datînî).

<sup>10</sup>Mûsa bihîst wekî cime't neferêd xweva, her kes li ber derê konê xwe, digirî. Hingê hêrsa Xudan gelekî r'abû, kirina van li ser Mûsa jî giran r'ûnişt. <sup>11</sup>Mûsa gote Xudan: «Te çima e'vdê xwe avîte nava oxirmêd giran? Çima min k'erem li ber ç'e'vêd te ne dît? Te çima nîrê h'emû vî miletî avîte stûyê min? <sup>12</sup>Dibe ez vî miletîda pê mame, yan ew ji min dinê k'etine, wekî tu minr'a dibêjî: «Wan h'emêza xweda bibe», çawa destdergûş zar'a şîrxur dibe, h'eta wî e'rdê ku te bavêd wanr'a sond xwarîye? <sup>13</sup>Ezê goşt ji ku bînim wekî bidime t'emamîya vî miletî? Çimkî ew li ber min digirîn, dibêjin: «Goşt bide me em bixwin!» <sup>14</sup>Ez nikarim t'enê t'emamîya vî miletî bibim, çimkî giran e bona min! <sup>15</sup>Wekî tu usa tînî serê min, diha r'ind e min bikuje, heger min li ber ç'e'vêd te k'erem dîtîye. Ezê belengazîya xwe nebînim!»

### H'eftê r'ûspî

<sup>16</sup>Xudan gote Mûsa: «Ji nava r'ûspîyêd Îsraêl minr'a h'eftê merivî bibijêre, yêd ku tu zanî ewe r'ûspî û serwêrêd milet in. Wana bîne li Konê Civînê û bira ew li wir t'evî te bisekinin. <sup>17</sup>Ezê jî peya bim, li wir t'evî te xeber dim û ji R'uhê ku li ser te ye hildim û daynime li ser wan. Wekî ew jî t'evî te nîrê vî miletî hildibin û tu t'enê hilnedî. <sup>18</sup>Miletr'a jî bêje: «Xwe paqij kin bona sibê û hûnê goşt bixwin, çimkî hûn li

\* 11:7 Binihêr'e Derk'etin 16:14-15, 31.

ber Xudan girîyan, we got: «K'ê wê goşt bide em bixwin? Çimkî li Misirê mer'a qenc bû». Xudanê goşt bide we hûnê bixwin. <sup>19</sup>Ne r'ojekê hûnê goşt bixwin, ne du r'oja, ne pênc r'oja, ne dehe r'oja, ne jî bîst r'ojî, <sup>20</sup>lê xût mehekê, h'eta ew fincîkê wer'a neyê û me'dê we li hev nek'eve, çimkî we Xudan t'exsîr kir, yêd ku nava weda ye, li ber wî girîyan, got: «Çima em ji Misirê derk'etin?»»

<sup>21</sup>Lê Mûsa got: «Miletê ku ez navda me, 600000 mêr in, tu dibêjî: «Goşt ezê bidime wan û ewê mehekê bixwin». <sup>22</sup>Heger pez-dewar bê serjêkirinê bona wan, gelo wê t'êra wan bike? Yan h'emû me'sîyêd be'rê bêne girtinê bona wan, gelo wê t'êra wan bike?»

<sup>23</sup>Xudan gote Mûsa: «Çima ji destê Xudan nayê? Niha tê bibînî, xebera ku min gote te, wê bê sêrî yan na». <sup>24</sup>Mûsa derk'et û xeberêd Xudan gote millet. H'eftê merî ji r'ûspîyêd millet civandin û ew li dora Kon dane sekinandinê. <sup>25</sup>Û Xudan li e'wrda peya bû û t'evî Mûsa xeberda, ji R'uh'ê li ser wî hilda û danî li ser h'eftê mêrêd r'ûspî. Gava r'uh' danî li ser wan, wana p'êxembertîf kir, lê dûmayî nekirin. <sup>26</sup>Û li nava zomê du merî mabûn, navê yekî Eldad bû, navê yê din Mêydad bû. R'uh' danî li ser wan jî, çimkî ew ji wan bûn yêd ku hatibûne nivîsarê, lê dernek'etibûne ber Kon. Wana zomêda p'êxembertî dikir. <sup>27</sup>Xortek bezî, e'lamî Mûsa kir, got: «Eldad û Mêydad zomêda p'êxembertîyê dikin!» <sup>28</sup>Hingê Yêşûyê kur'ê Nûn, ku ji cahiltîya xweda berdestîyê Mûsa bû, got: «Xweyê min, Mûsa, wan hilê!» <sup>29</sup>Mûsa gote wî: «Ew tu dewsa min h'evsûdîyê dikî? Xwezî t'emamîya milletê Xudan p'êxember bûna, ku Xudan R'uh'ê xwe danîya li ser wan». <sup>30</sup>Mûsa û h'emû r'ûspîyêd Îsraêl vege'rîyane zomê.

### Qar'îtkf

<sup>31</sup>Hingê bi qirara Xudan ba r'abû û qar'îtkf ji alîyê be'rê ajotin anîne zomê, weke r'îya r'ojekê li dora zomê û du zend ji e'rdê bilindtir difir'în. <sup>32</sup>Milet r'abû û t'emamîya wê r'ojê,

t'emamîya wê şevê û t'emamîya r'ojtira din qar'îtk didane hev. Yê lapî hindik dehe homêr\* t'op kirin û wana ew li dora zomê r'axistin\*\*. <sup>33</sup> Goşt hê ber diranê wanda bû, hê ne cûtibûn, gava hêrsa Xudan li millet r'abû û Xudan bi belake gelekî mezin li millet xist. <sup>34</sup> Ê navê wî cîyî danîn Qîbrot-Hat'awa\*, çimkî li wir merivêd dilhaviyî defin kirin. <sup>35</sup> Ji Qîbrot-Hat'awayê millet r'ê k'et çû H'asêrotê û ew li H'asêrotê man.

### Meryem û Harûn h'evsûdî Mûsa kirin

**12** Meryem û Harûn miqabilî Mûsa xeber dan, bona jina k'ûşîye\* standî (çimkî ewî jina k'ûşî standibû). <sup>2</sup> Wana got: «Dibe Xudan t'enê bi devê Mûsa xeber da? Ne bi devê me jî xeber da?» Ê Xudan ew yek bihîst. <sup>3</sup> (Mûsa merivekî gelekî şkestî bû, ji h'emû merivêd li ser r'ûyê e'rdê gelektir).

<sup>4</sup> Nişkêva Xudan Mûsa, Harûn û Meryemê'a xeber da: «Hûn her sisê derêne li Konê Civînê» û her sisê jî derk'etin. <sup>5</sup> Xudan li stûna e'wrda peya bû li ber derê Kon sekinî, gazî Harûn û Meryemê kir û ew her du jî derk'etin. <sup>6</sup> Xudan got:

«Niha guh bidine xeberêd min.

Heger nava weda p'êxember hebe jî,  
ez, Xudan dîtinokêda wîva e'yan dibim  
û xewnêda wîr'a xeber didim,

<sup>7</sup> Lê t'evî Mûsayê e'vdê xwe, usa nînim,  
ew li nava t'emamîya mala minda yekî amin e.

<sup>8</sup> T'evî wî ez r'û bi r'û xeber didim,

\* 11:32 «Homêr» derdanek bû ku nêzikî 200 lîtir tişt hildida.

\*\* 11:32 Zar'êd Îsraêl qar'îtkêd girtî r'adixistin ku h'işkin, wekî zû xirab nebin. Em zanin ku misirîya usa dikirin. Wana goşt xwê dikirin û dadanîne li ber te'vê ku ziha be, bona ku dirêj bihata xweyîkirinê.

\* 11:34 Bi zimanê îbranî «Mezelê dilhaviyîyê».

\* 12:1 «K'ûşî» ew têrmînek e, ku bona merivêd ji r'ohilata Afrîkayê dihate xebatê.

aşkere, ne bi mesela  
û ew dilqê Xudan dibîne.

Hûn çawa netirsîyan

ku miqabilî e'vdê min Mûsa xeberdin?»

<sup>9</sup>Hingê hêrsa Xudan li wan r'abû û hişt çû. <sup>10</sup>Gava e'wr ji ser Kon çû, awa Meryem mîna berfa sipî bi k'otîbûnêf hate lêdanê. Harûn dîna xwe da Meryemê, va ye ew k'otî bûye. <sup>11</sup>Harûn gote Mûsa: «Xweyê min, hîvî dikim! Mer'a gune h'esab neke, gunê ku me bêfe'mîya xwe kir. <sup>12</sup>K'erema xwe, bira Meryem nebe mîna wî mirîyê, ku çaxê ji bet'ina dîya xwe dik'eve, nivê qalib îdî p'ûç'bûyî ye». <sup>13</sup>Mûsa li ber Xudan girîya, got: «Ya Xudan, k'erema xwe, ez t'ewaqe dikim, wê qenc ke!»

<sup>14</sup>Xudan gote Mûsa: «Heger bavê wê t'ûyî r'ûyê wê bikira, gelo hingê ew h'eft r'oja gere şermîyêda nebûya? Bira ew h'eft r'oja ji zomê der bê xweyîkirinê, peyr'a ewê bê qebûlîkirinê». <sup>15</sup>Û Meryem h'eft r'oja ji zomê der hate xweyîkirinê, milet r'ê nedik'et h'eta ku Meryem hate qebûlîkirinê. <sup>16</sup>Paşê milet ji H'asêrotê r'ê k'et, hate ber'îya Paranê û zomêd xwe lêdan.

### Ce'sûsîya Kenanêf

**13** Xudan Mûsar'a xeberda got: <sup>2</sup>«Xwer'a meriva bişîne ku ce'sûsîya e'rdê Kenanêf bikin, k'îjanî ku ez didime zar'êd Îsraêl. Ji her qebîleke bavêd wan merivekî bişîne, awa gotî ji serwêrê nava wanda». <sup>3</sup>Hingê Mûsa ew anegorî gotina Xudan ji ber'îya Paranê şandin. Ew h'emû meriv serwêrê zar'êd Îsraêl bûn. <sup>4</sup>Ev in navêd wan: Ji qebîla R'ûbên Şamûayê kur'ê Zak'ûr bû.

<sup>5</sup>Ji qebîla Şimh'ûn Şafatê kur'ê H'orî bû.

<sup>6</sup>Ji qebîla Cihûda K'alêbê kur'ê Yifûneh bû.

<sup>7</sup>Ji qebîla Îsaxar Îgalê kur'ê Ûsiv bû.

<sup>8</sup>Ji qebîla Efrayîm Hoşeyayê kur'ê Nûn bû.

<sup>9</sup>Ji qebîla Binyamîn Paltîyê kur'ê R'afû bû.

<sup>10</sup>Ji qebîla Zebûlon Gaddîyêlê kur'ê Sodî bû.

<sup>11</sup> Ji qebîla Minaşe (qebîleke ji Ûsiv) Gaddîyê kur'ê Sûsî bû.

<sup>12</sup> Ji qebîla Dan E'mîyêlê kur'ê Gimallî bû.

<sup>13</sup> Ji qebîla Aşêr Sit'ûrê kur'ê Mixayîl bû.

<sup>14</sup> Ji qebîla Neftelî Nah'byê kur'ê Vofsî bû.

<sup>15</sup> Ji qebîla Gad Geyûêlê kur'ê Maxî bû.

<sup>16</sup> Ev in navêd wan merivêd ku Mûsa şandin ce'sûsîya e'rdê bikin. Mûsa navê Hoşêyayê kur'ê Nûn danî Yêşû\*.

<sup>17</sup> Mûsa ew şandin ku ce'sûsîya e'rdê Kenanê bikin û gotê wan: «R'abin her'ine Necefêf û h'eta e'rdê ç'îya-banîya hilk'işin.

<sup>18</sup> Binihêr'in e'rd çawa ye. Merivêd li wî e'rdî dijîn qewat in yan sist in, p'ir' in yan hindik in? <sup>19</sup> E'rdê ku ew lê ne çawa ye, qenc e yan xirab e? Bajarêd ew lê dijîn vekirî ne yan sûrkirî ne? <sup>20</sup> E'rd çawa ye, xweyî deremet e yan bê ber e, bax hene yan t'unene? Serxwe bin û ji berê wî e'rdî bînin».

(Ev we'dê tirîyêd pêşin bû.) <sup>21</sup> Û ew r'abûn ce'sûsîya wî e'rdî kirin, ji ber'îya Sînê\* girtî h'eta R'ih'ovê li Libo-Hamatê.

<sup>22</sup> Ew r'abûn hilk'işîyane Necefê û gihîştine Hêbronê û li wir Axîman, Şêşay û T'almay, zar'êd enaqîyaf diman. (Hêbron h'eft sala berî Zoyana misirîya hatibû çêkirinê).

<sup>23</sup> Ew gihîştine newala Eşk'olê û li wir wana gûşîkî tirîyê ç'iqlva çinîn darek navr'a kirin û du merîya ew hildan, usa jî çend h'inar û hêjîr hildan. <sup>24</sup> Navê wî cîyî danîn newala Eşk'ol\*, bona gûşîyê li wir zar'êd Îsraêl çinîn. <sup>25</sup> Pey çil r'ojîr'a ew ji ce'sûsîya wî e'rdî vege'îyan.

<sup>26</sup> Ew hatin û çûne li cem Mûsa, Harûn û te'mamîya civîna zar'êd Îsraêl li ber'îya Paran, Qadêşê. Wan û te'mamîya civînêr'a xeber anîn û berêd wî e'rdî nîşanî wan kirin. <sup>27</sup> Mûsar'a salix kirin û gotin: «Em çûne wî e'rdê ku te em şandinê, bi r'astî

\* 13:16 «Hoşêya» tê t'ercimekirinê: «ew xilaz dike». Lê «Yêşû» tê t'ercimekirinê: «Xudan xilaz dike».

\* 13:21 Ber'îya Sînê sînorê başûra Kenanê bû û Libo-Hamat sînorê bakura Kenanê bû.

\* 13:24 Bi zimanê îbranîf «Gûşî».

şîr û hingiv jê dik'işe, evana jî berê wî ne. <sup>28</sup>Lê milletê li wî e'rdî dijî, qewat e, bajar jî bi sûrêd gelekî mezin in, usa jî me zar'êd enaqîya li wir dîtin. <sup>29</sup>Amalêkîf li Necefê dijîn, h'îtî, yebûsî û emorîf li ser ç'îya-banîya dijîn, kenanîf jî devê be'rê û k'êleka Êrdunê dijîn». <sup>30</sup>Lê K'alêb cime't li ber Mûsa da ker'kirinê û got: «R'abin em hevraz her'in û wî bikine milk'ê xwe, çimkî emê e'se wî zeftî xwe kin». <sup>31</sup>Lê merivêd ku t'evî wî hevraz çûbûn digotin: «Em nikarin hevraz her'in miqabilî wan, çimkî ew ji me qewattir in». <sup>32</sup>Wana cab-sawêd xirab bela dikirin nava zar'êd Îsraêl bona e'rdê ce'sûsî kirî, digotin: «E'rdê ku eme çûbûnê wekî ce'sûsîya wê bikin, ew e'rd binelîyêd xwe h'ûfî xwe dike û h'emû merivêd ku me li ser wê dîtin merivne bejin-bilind in. <sup>33</sup>Li wir me e'save dîtin (zar'êd enaqîya p'areke ji e'sava bûn) û em li ber ç'e'vêd xwe mîna kulîya bûn usa jî li ber ç'e'vêd wan bûn».

### Serhildan û cezayê cime'tê

**14** T'emamîya civînê dengê xwe hilda û wê şevê millet girîya. <sup>2</sup>T'emamîya zar'êd Îsraêl miqabilî Mûsa û Harûn bîna xwe teng kir, t'emamîya civînê gote wan: «Xwezî em e'rdê Misirêda bimirana yan xwezî em li vê ber'îyêda bimirana! <sup>3</sup>Gelo çima Xudan me dibe li wî e'rdî? Wekî em bi şûr bêne qir'ê? Jin û zar'êd me t'alan her'in. Gelo mer'a ne qenc e em vege'rine Misirê?» <sup>4</sup>Gotine hevdu: «Werin em serwêrekî k'ifş kin û vege'rine Misirê». <sup>5</sup>Hingê Mûsa û Harûn li ber t'emamîya civîna zar'êd îsraêlêye civîyayî dever'ûya çûne e'rdê. <sup>6</sup>Yêşûyê kur'ê Nûn û K'alêbê kur'ê Yifûneh ji wan yêd ku ce'sûsîya wî e'rdî kiribûn k'incêd xwe qelaştin <sup>7</sup>û gotine t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl: «E'rdê ku em navr'a derbazbûn bona ce'sûsîyê, ew e'rdekî p'ir' xweş e. <sup>8</sup>Heger Xudan h'iz ke, ewê me bibe wir û wî e'rdî bide me, k'îjan ku şîr û hingiv jê dik'işe. <sup>9</sup>T'enê miqabilî Xudan r'anebin û ji merivêd wî e'rdî netirsîn, çimkî ewê bibine xurê me. Sîya ser wan ji ser wan hate hildanê. Xudan t'evî me ye, ji wan netirsîn». <sup>10</sup>Lê

t'emamîya civînê got: «Wan bidine li ber kevira!» Hingê r'ûmeta Xudan li Konêf Civînêda t'emamîya zar'êd Îsraêlva xuya bû. <sup>11</sup>Xudan gote Mûsa: «H'eta k'engê ev miletê min t'exsîr ke? H'eta k'engê ewê bawerîya xwe min neyne, heqa jî nîşan min li nava wîda kirin? <sup>12</sup>Ezê bi nexweşîya h'al wan xim û milk' ji wan bistînim û te bikime miletekî ji wan mezintir û qewattir». <sup>13</sup>Mûsa gote Xudan: «Misirî, ji nava k'îjanada te ev milet bi qewata xwe derxist wê bibihên <sup>14</sup>û wê bêjine binelîyêd wî e'rdî. Ewêd ku bihîstine wekî tu ya Xudan, li nava vî miletîyî, ku r'û bi r'û tu ya Xudan, xuya bûyî. E'wrê te li ser wan e û r'oje li stûnê e'wrda pêşîya wanva diçî, şev jî bi stûna agir. <sup>15</sup>Heger tu vî miletî çawa merivekî qir' kî, hingê ew miletêd ku bona te bihîstine wê bêjin: <sup>16</sup>«Xudan nikaribû ev mileta bibira li e'rdê ku bi sond soz dabû wan, lema ew li ber'îyêda qir' kir». <sup>17</sup>De bira niha qewata Xweyê min mezin be, çawa ku te got: <sup>18</sup>«Xudan sebir-sik'an e û xweyê h'uba amin e, neheqîyê û ner'astîyê dibaxşîne. Lê sûcdara bê ceza nahêle, neheqîya bava tîne serê zar'a, h'eta nisilê sisîya û çara». <sup>19</sup>Ji k'erema xwe neheqîya vî miletî anegorî h'uba xweye amine p'ir' bibaxşîne, çawa ku te ji Misirê h'eta niha baxşandîye vî miletî». <sup>20</sup>Xudan got: «Min anegorî gotina te baxşand. <sup>21</sup>Ez saxîya xwe kim, çawa bi r'ûmeta Xudan wê t'emamîya e'rdê t'ijî be. <sup>22</sup>H'emû merivêd ku r'ûmet û nîşanêd min dîtin, k'îjan ku min Misirê û ber'îyêda kirin û wan dehe cara ez cêr'ibandim û guh nedane dengê min, <sup>23</sup>ew e'rdê ku min bi sond soz dabû bavêd wan, ew nabînin. H'emûyêd ku ez t'exsîr kirim wî e'rdî nabînin, <sup>24</sup>pêştirî K'alêbê e'vdê min, çimkî r'uh'ekî din nav wîda bû û t'am gur'a min kir, ezê wî bibime wî e'rdê ku ew çûyê û zur'eta wî wê lê war be. <sup>25</sup>Amalêkîf û kenanî newalada\* dijîn. Hûn sibê r'abin r'êk'evin r'îya Be'ra Sorr'a her'ine ber'îyê».

\* 14:25 Hine zane difikirin ku belkî ev newala Êrdinê ye.

<sup>26</sup>Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>27</sup>«H'eta k'engê ev civîna hane xirab wê hindava minda bîna xwe teng ke? Bîntengîya zar'êd Îsraêl ku hindava minda bîna xwe teng dikin, min bihîst. <sup>28</sup>Bêje wan: «Ez saxîya xwe kim, Xudan dibêje, min bihîst çi we got, xût usa ezê bînime serê we. <sup>29</sup>Li vê ber'îyêda cinyazê weyê bimînin. Yê wan h'emûyêd jimartîye weke h'esabê we, ji bîstsalîyê jortir, k'îjana ku hindava minda bîna xwe teng kirine. <sup>30</sup>Evana wê nak'evine li e'rdê ku min sond xwar wekî we lê war kim. Pêştirî K'alêbê kur'ê Yifûneh û Yêşûyê kur'ê Nûn. <sup>31</sup>Xişîmêd weye bona k'îjana we digot ku ewê t'alan her'in, ezê wan bibime wir û ewê wî e'rdî te'm kin, k'îjan ku we t'exsîr kir. <sup>32</sup>Lê cinyazêd we wê li vê ber'îyêda bimînin. <sup>33</sup>Zar'êd we jî wê çil salî t'erkeserî ber'îyê bin û wê biçerçirin r'ûyê bête'silîya weda, h'eta cinyazêd we ber'îyêda bir'izin. <sup>34</sup>We çil r'oîjî ce'sûsîya wî e'rdî kir, lê hûnê cezayê bona guneyêd xwe çil salî bistînin. Salekê ji ber r'ojekêva. Wekî hûn bizanîbin miqabilî min çûyîn çîye. <sup>35</sup>Min Xudan got, xût usa jî ezê bînime serê t'emamîya vê civîna hane xirab ya ku r'abûye miqabilî min. Li vê ber'îyêda qir'a wanê bê û li wir wê bimirin»». <sup>36</sup>Ew merivêd ku Mûsa şandibûn wekî ce'sûsîya wî e'rdî bikin, gava vege'riyan, t'emamîya civînê r'akirine miqabilî Mûsa, cab-sawê xirab bona wî e'rdî bela dikirin, <sup>37</sup>h'emû ew merivêd ku cab-sawê xirab bona wî e'rdî bela dikirin bi bela hatine kuştinê li ber Xudan. <sup>38</sup>Ji wan merivêd ku çûbûn ce'sûsîya wî e'rdî bikin t'enê Yêşûyê kur'ê Nûn û K'alêbê kur'ê Yifûneh sax man. <sup>39</sup>Gava Mûsa ev xeber gîhandine t'emamîya zar'êd Îsraêlr'a, millet şîneke giran kir. <sup>40</sup>Sibehê zû ew r'abûn ku hilk'işîne ser ç'îya-banîya, digotin: «Em hazir in hilk'işîne li wî cîyê ku Xudan gotibû, çimkî me gune kir». <sup>41</sup>Mûsa got: «Hûn çima gur'a Xudan nakin? Yeke ew yek bêfeyde ye. <sup>42</sup>Hilnek'işin ku hûn ji dijminêd xwe neyêne qir'ê, çimkî Xudan t'evî we nîne. <sup>43</sup>Amalêkî û kenanî li wir pêşîya we ne, hûnê bi şûr bik'evin, çimkî we pişta xwe da Xudan û Xudanê t'evî we

nîbe». <sup>44</sup>Wana xwe h'işir kir, hilk'işîyane serê ç'îya-banîya, lê Sindoqaf Peymana Xudan û Mûsa ji zomê dernek'etin. <sup>45</sup>Hingê amalêkî û kenanî binelîyêd wan ç'îya-banîya berjêr bûn û qir'a wan anîn, h'eta H'ormayê ew hûrdexweşî kirin.

### Qanûna dîyarîya

**15** Xudan Mûsar'a xeberda got: <sup>2</sup>«Zar'êd Îsraêlr'a xeber de û bêje wan: «Gava hûn her'ine wî erdê cî-warêd xwe, k'îjanî ku ez bidime we <sup>3</sup>û hûn Xudanr'a dîyarîyêd şewatê bidin, heger ew ya t'evayîşewatê be, yan qurbaneke ji pêz-dêwêr be bona ad-qîrar qedandinê, yan dîyarîyêd r'ezedilîyê be, yan jî ya cejinêd weda be, wekî Xudanr'a dîyarîya bînxweş bidin, aha bikin:

<sup>4</sup>Dîyardar ku dîyarîya xwe tîne, bira Xudanr'a dîyarîyaf nanî bide, awa gotî p'areke çapêye ji deha yek\* arê xas, t'evî p'areke hînêye ji çara yek\*\* r'ûnda stirayî. <sup>5</sup>Û bona her berxa dîyarîya t'evayîşewatê, yan jî qurbana p'areke hînêye ji çara yek şerav, çawa dîyarîyaf serdakirinê bide.

<sup>6</sup>Lê t'evî beran, p'areke çapêye ji deha dudu arê xasî stirayî, p'areke hînêye ji sisîya yek jî r'ûnda stirayî, çawa dîyarîya nanî bide, <sup>7</sup>usa jî p'areke hînêye ji sisîya yek şerav bona dîyarîya serdakirinê, çawa dîyarîya bînxweş Xudanr'a bide.

<sup>8</sup>Gava tu canega çawa dîyarîya t'evayîşewatê, yan qurbana bona qedandina ad-qîrarê, yan dîyarîyaf heleqetîyê Xudanr'a bidî, <sup>9</sup>hingê t'evî canega p'areke çapêye ji deha sisê arê xas t'evî nîv hîn r'ûnda stirayî, çawa dîyarîya nanî bide. <sup>10</sup>Usa jî nîv hîn şerav bona dîyarîya serdakirinê bide. Eva dîyarîya şewatêye bînxweş e bona Xudan.

<sup>11</sup>Bi vî awayî bira t'evî her boxeyî, her beranî, her berxî û her karê nêrîn aha bê dayînê, <sup>12</sup>çi ku bê dayînê, bi vî awayî t'evî her dîyarîyê anegorî h'esabê wan bide. <sup>13</sup>Her binelîyê

\* 15:4 «P'areke çapêye ji deha yek» qazî kîlogramek bû.

\*\* 15:4 «P'areke hînêye ji çara yek» qazî lîtirek bû.

welat bira usa bike çaxê dîyarîya şewatê, çawa dîyarîya bînxweş, bide Xudan. <sup>14</sup>Heger li nava weda xerîbek bijî yan yek ku li nava zur'etêd weda t'evî we ye û dîyarîya şewatê çawa dîyarîya bînxweş Xudanr'a bide bira usa bide çawa ku hûn didin. <sup>15</sup>Civînêr'a qeyde-qanûnek be, bona we û bona xerîbê ku li nava weda dijî. Qeyde-qanûna h'eta-h'etayê be zur'etêd wer'a, çawa hûn bin, usa jî xerîbê li ber Xudan be. <sup>16</sup>Qanûnek û dîwanek be bona we û bona xerîbê nav weda dijî».

<sup>17</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>18</sup>«Zar'êd Îsraêlr'a xeber de û bêje wan: «Gava hûn bik'evine wî e'rdê ku ez we dibimê <sup>19</sup>û hûn ji nanê wî e'rdî bixwin, Xudanr'a p'areke dîyarîyê başqe kin. <sup>20</sup>Ji hevîrê xweyî pêşin hûn gere k'atekî çawa dîyarîya bêderê dîyarî kin. <sup>21</sup>Ji hevîrê xweyî pêşin li nava zur'etêd xweda hûn gere dîyarîyê bidine Xudan.

### Gunê bêh'emdê xwe kirî

<sup>22</sup>Lê gava hûn bişih'itin û h'emû van e'mirêd bona k'îjana Xudan gote Mûsa neqedînin, <sup>23</sup>awa gotî h'emû çi ku Xudan Xwedêyê we bi destê Mûsa li we e'mir kir, ji wê r'oja ku Xudan e'mirî we kir û peyr'a jî li zur'etêd we, <sup>24</sup>heger ew yek bê h'emdê xwe hatîye kirinê û civînêva veşartî maye, hingê h'emû civîn bira canegakî çawa dîyarîya t'evayîşewatêye bînxweş bide Xudan, t'evî dîyarîya wêye nanî û serdakirinê anegorî qanûnê û nêrîkî jî çawa dîyarîya paqîjbûnê. <sup>25</sup>Hingê k'ahînf bira bona h'emû civîna zar'êd Îsraêl k'ewandinê bike û wê li wan bê baxşandinê. Çimkî wana şaşî kir, lê wana qurbana xwe çawa dîyarîya şewatê Xudanr'a û dîyarîya xweye paqîjbûnê li ber Xudan bona şaşîyê dan. <sup>26</sup>Li h'emû civîna zar'êd Îsraêl û li xerîbê nava wanda wê bê baxşandinê, çimkî t'emamîya civînê bêh'emdê xwe şaşî kirîye.

<sup>27</sup>Lê heger kesek bêh'emdê xwe gune bike bira ew bizineke yek salî bona paqîjbûnê dîyarî ke. <sup>28</sup>K'ahînê jî bona kesê

bêh'emdê xwe gunê kirî k'ewandinê bike, çimkî bê h'emdê xwe li ber Xudan gunê kirîye. Ewê bona wî k'ewandinê bike û li wî wê bê baxşandinê. <sup>29</sup>Bira qanûneke te hebe bona binelîyê ji zar'êd Îsraêl û bona xerîbê li nava wanda yê ku bê h'emdê xwe gunê bike. <sup>30</sup>Lê heger ew kes binelî be, yan xerîb be, ku bi qesta tiştêkî bike ew bi vê yekê k'ifirîya Xudan dike, ew kes bira ji nava milletê xweda bê undakirinê. <sup>31</sup>Çimkî ewî xebera Xudan t'exsîr kir û e'mirê wî t'er'iband, ew kes bira bê undakirinê, gunê wî stûyê wî be».

### Cezakirina yê qirş t'op dikir

<sup>32</sup>Carekê gava zar'êd Îsraêl ber'îyêda bûn, wana merivek dît ku r'ojaf şemîyê qirş t'op dikir. <sup>33</sup>Yêd ku wextê qirş t'opkirinê ew dîtîn, girtin anîne li cem Mûsa, Harûn û t'emamîya civînê <sup>34</sup>û ew hiştine bin nobedarîyê, çimkî hê nehatibû safî kirinê, ku çi bînine serê wî. <sup>35</sup>Paşê Xudan gote Mûsa: «Ew meriv bira bê kuştinê, t'emamîya civînê bira wî ji zomê der bide li ber kevira». <sup>36</sup>T'emamîya civînê ew ji zomê derxiste der û ew dane ber kevira kuştin, çawa ku Xudan e'mirî Mûsa kir.

### R'îşîyê p'êşêd k'inca

<sup>37</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>38</sup>«Zar'êd Îsraêl'r'a xeber de û bêje wan ku ew li nava zur'etêd xweda p'êşê k'incêd xwe r'îşî kin û qeyt'ana şîn p'êşêva kin. <sup>39</sup>Ewê wer'a bibine r'îşî û gava ku hûn wê bibînin hûnê h'emû e'mirêd Xudan bîr bînin û wan biqedînin. Hûnê pey xwestina dilê xwe û ç'e'vêd xwe neçin, bi k'îjanî ku hûn bête'silîyê dikin, <sup>40</sup>bona ku hûn bîr bînin û biqedînin h'emû e'mirêd min û Xwedêyê xwer'a pîroz bin. <sup>41</sup>Ez Xudan Xwedêyê we me, ku hûn ji welatê Misirê derxistin, wekî bibime Xwedêyê we. Ez Xudan Xwedêyê we me».

Serhildana Qorax, Dat'an û Abîram

**16** Qoraxê kur'ê Îsharê kur'ê Qohat'ê ji zur'eta Lêwî, xwer'a Dat'an û Abîramê kur'êd Elyab û Onê kur'ê Peletê ji zur'eta R'ûbên hildan <sup>2</sup> û t'evî dusid pêncî merivêd ji zar'êd Îsraêl serwêrêd civînê, bijartîyêd civînê û merivêd nav û deng miqabilî Mûsa r'abûn. <sup>3</sup> Li ser Mûsa û Harûn k'om bûn û gotine wan: «Bes e îdî wer'a! T'emamîya civînê, h'emû jî pîroz in û Xudan li nava wanda ye. Lê çima hûn xwe li ser civîna Xudanr'a digirin?» <sup>4</sup> Mûsa bihîst û dever'û k'et. <sup>5</sup> Mûsa Qorax û t'emamîya civîna wîr'a xeberda û got: «Sibê Xudan wê e'yan ke, k'î p'ara wî ye û k'î pîroz e, ewê nêzîkî xwe ke. K'îjanî ku ew bibijêre, wî jî wê nêzîkî xwe ke. <sup>6</sup> Niha vê yekê bikin: Qorax û t'emamîya civîna wî xwer'a agirdanga hildin, <sup>7</sup> sibê agir wanda daynin û bixûrêf li serda kin daynine li ber Xudan. Ew merivê ku Xudan bibijêre ew e pîroz. Bes e wer'a îdî, zar'êd Lêwî!» <sup>8</sup> Mûsa gote Qorax: «Niha bibihên zar'êd Lêwî, <sup>9</sup> Gelo ev yek wer'a hindik e, ku Xwedêyê Îsraêl hûn ji civîna Îsraêl başqe kirin û hûn nêzîkî xwe kirin, bona xebata Pîrozgeha Xudan bikin û li ber civînê bisekinin, xizmetk'arîya wan bikin? <sup>10</sup> Tu û h'emû birayêd teye kur'êd Lêwî t'evî te nêzîkî xwe kirin, lê hûn niha de'wa k'ahîntîyê jî dikin? <sup>11</sup> Lema tu û h'emû civîna xweva miqabilî Xudan civîyan ne, Harûn k'î ye, wekî hûn bîna xwe li wî teng dikin?» <sup>12</sup> Ê Mûsa şand ku gazî Dat'an û Abîramê zar'êd Elyab kin. Lê wana got: «Em nayên! <sup>13</sup> Gelo bes nîne, te em ji welatê ku şîr û hingiv jê dik'işîya derxistin, ku me ber'îyêda qîr' kî, serda jî hê dixwazî serwêrîya me bikî? <sup>14</sup> Te em ne birine li e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe, ne jî em kirine xweyê warê k'ewşen û baxê tirîya. Tu dixwazî ç'e'vêd van meriva derxî? Em nayên!» <sup>15</sup> Hingê hêrsa Mûsa r'abû û gote Xudan: «Dîna xwe nede dîyarîya wan! Min qet k'erek jî ji wan hilneda ye û xirabî ji li wan t'u kesî nekirîye». <sup>16</sup> Mûsa gote Qorax: «Tu û t'emamîya civîna xweva sibê li ber Xudan bisekinin, tu,

ew û Harûn. <sup>17</sup>Her kes bira agirdanga xwe hilde, bixûrê dayne li ser û bîne li ber Xudan. Her kes agirdanga xwe, awa gotî dusid pêncî agirdangî, usa jî tu û Harûn her kes bi agirdanga xwe». <sup>18</sup>Wana her kesî agirdanga xwe hildan agir wanda danîn, bixûr ser wanda kirin û li ber derê Konê Civînê t'evî Mûsa û Harûn sekinîn. <sup>19</sup>Û Qorax li ber derê Konê Civînê, miqabilî wan t'emamîya civînê t'op kir. Hingê r'ûmeta Xudan t'emamîya civînêva xuya bû.

<sup>20</sup>Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>21</sup>«Ji nava vê civînê xwe xewle kin, ku ez nişkêva k'ewa wan bînim». <sup>22</sup>Lê ewana dever'û k'etin û gotin: «Ya Xwedê, Xwedêyê r'uhê her bedenê! Merivekî gune kir hêrsa xwe h'emû civînê r'adikî?»

<sup>23</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>24</sup>«Vê civînêr'a xeber de û bêjê: «Ji dora konê Qorax, Dat'an û Abîram dûr k'evin»». <sup>25</sup>Mûsa r'abû çû cem Dat'an û Abîram, r'ûspîyêd Îsraêl jî pey wî çûn. <sup>26</sup>Ewî civînêr'a xeberda got: «Ji konêd van merivêd hane neheq dûr k'evin û dest nedine t'u tiştêd wan, wekî r'ûyê guneyêd wanda neyêne r'aqetandinê». <sup>27</sup>Ew jî dora konê Qorax, Dat'an û Abîram dûr k'etin. Dat'an û Abîram jî derk'etin û li ber derê konêd xwe t'evî jinêd xwe, zar'êd xwe û biç'ûkêd xwe sekinîn. <sup>28</sup>Mûsa got: «Bi vê yekê hûnê bizanibin ku Xudan ez şandime h'emû van kirina bikim, ku ez xwe serê xwe nakim. <sup>29</sup>Heger evana bi mirina ku h'emû meriv dimirin bimirin û feleka wan mîna feleka h'emû meriva be, wekî usa ne Xudan ez ne şandime. <sup>30</sup>Lê heger Xudan tişteki nebûyî bîne serê wan: E'rd devê xwe veke wan û h'emû tiştêd wan h'ûfî xwe ke û ew saxe-sax bik'evine Dîyarê Mirîya. Hingê hûnê bizanibin wekî van merivana Xudan t'exsîr kirin». <sup>31</sup>Gava Mûsa ev h'emû xeber ser hevda anîn, e'rdê bin wanda qelişî. <sup>32</sup>E'rdê devê xwe vekir û ew, malêd wan, h'emû merivêd Qorax û h'emû hebûka wan h'ûfî xwe kir. <sup>33</sup>Ew û h'emû tiştêd wan saxe-sax k'etine Dîyarê Mirîya, e'rdê ew nixamt û ew jî nava civînê hatine hildanê. <sup>34</sup>T'emamîya Îsraêle dor-berê wan jî dengê wan r'evî, got:

«Nebe ku e'rd me jî h'ûfî xwe ke!»<sup>35</sup> Usa jî agir ji Xudan derket û ew dusid pêncî merivêd ku bixûr anîbûn şewitand.

<sup>36</sup> Hingê Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>37</sup> «Bêje Êlazarê kurê Harûnê k'ahîn bira agirdanga ji nava êgir hilde û k'ozîyê jî birêje, çimkî ew hatine pîrozkirinê. <sup>38</sup> Agirdangêd van kesêd ku r'ûyê gunê xweda mirin, bira bikine belgêd pe'nkirî bona kiraskirina gorîgehê, çimkî wana ew nêzîkî Xudan kiribû û ew pîroz bibûn. Ewê bibine nîşan bona zar'êd Îsraêl». <sup>39</sup> Êlazarê k'ahîn ew agirdangêd sifire ku wan merivêd şewitî dabûn, hildan û ew pe'n kirin bona kiraskirina gorîgehê, <sup>40</sup> çawa bîranîn zar'êd Îsraêl'r'a, bona ewê xerîb, yê ku ne ji r'ik'inyata Harûn e nêzîk nebe ku bixûrê li ber Xudan vêxe. Wekî usa neyê serê wî çawa ku hate serê Qorax û civîna wî, çawa ku Xudan bi destê Mûsa gotibû wî.

### Serhildan û ceza Îsraêl

<sup>41</sup> R'ojtira dinê t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl bîna xwe li Mûsa û Harûn teng kirin, gotin: «We cime'ta Xudan kuşt». <sup>42</sup> Û gava civîn miqabilî wan civîya Mûsa û Harûn berê xwe dane Konê Civînê, va ye e'wr ew nixamtîye û r'ûmeta Xudan xuya bûye. <sup>43</sup> Mûsa û Harûn hatine li ber Konê Civînê, <sup>44</sup> Hingê Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>45</sup> «Ji nava vê civînê derên û ezê nişkêva k'ewa wan bînim». Ew dever'û k'etin. <sup>46</sup> Mûsa gote Harûn: «Agirdangê hilde, agirê li ser gorîgehê bide ser, bixûrê serda ke û zû her'e nava civînê û bona wan k'ewandinê bike. Çimkî hêrsa Xudan r'abû, xezebê destpêkir!» <sup>47</sup> Anegorî xebera Mûsa, Harûn agirdang hilda û r'evî nava civînê, va ye xezebê nava miletîda îdî destpêkirîye. Ewî bixûr kire ser û bona milet k'ewandin kir. <sup>48</sup> Harûn li nava mirîya û zêndîya sekinî û xezeb seqir'î. <sup>49</sup> Ji dest xezebê 14700 merî mirin, xêncî ewêd ku r'ûyê Qoraxda mirin. <sup>50</sup> Pey wê yekêr'a ku xezeb seqir'î, Harûn vege'rîya li cem Mûsa li ber derê Konê Civînê.

### Şivdara Harûn

**17** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«T'evî zar'êd Îsraêlf xeber de û ji her qebîleke wan, şivdarekê ji her serwêrekî qebîlêd wan hilde, awa gotî donzdeh şivdara. Navê her kesî li ser şivdara wî binivîse. <sup>3</sup>Navê Harûn li ser şivdara Lêwî binivîse, çimkî gerekê bona her baveşîrekî qebîleke wan şivdarek be. <sup>4</sup>Û wan dayne pêşberî Sindoqaf Şe'detîyê li Konê Civînêda, k'îderê ez weva xuya dibim. <sup>5</sup>Wê bibe ew merivê ku ezê bibijêrim, şivdara wî wê gul de. Bi vî awayî ezê wê bîntengîya zar'êd Îsraêl ber xwe bidime bir'inê, bi k'îjanê ew bîna xwe li we teng dikin». <sup>6</sup>Mûsa t'evî zar'êd Îsraêl xeberda û h'emû serwêrêd wan şivdar dane wî, şivdarek ji her serwêrî anegorî qebîlêd wan, awa gotî donzdeh şivdar. Şivdara Harûn jî nava şivdarêd wanda bû. <sup>7</sup>Mûsa şivdar danîne li ber Xudan li Konê Civînêda. <sup>8</sup>R'ojtira dinê gava Mûsa hate Konêf Şe'detîyê, va ye şivdara Harûne ji mala Lêwî gul daye. Ç'e'v bişkiftî ne, gul daye û behîv daye. <sup>9</sup>Mûsa h'emû şivdar ji ber Xudan derxistine li ber h'emû zar'êd Îsraêl. Wana nihêr'in û her kesî şivdara xwe hilda. <sup>10</sup>Xudan gote Mûsa: «Dîsa şivdara Harûn dayne li ber Sindoqa Şe'detîyê bona xweyîkirinê, çawa nîşan bona zar'êd r'aberîk'ar, bi vî awayî bîntengîya wanê li ber min biseqir'e û ewê nemirin». <sup>11</sup>Çawa ku Xudan e'mir kir Mûsa usa jî kir. <sup>12</sup>Zar'êd Îsraêl Mûsar'a xeberdan û gotin: «Va ye em dimirin! Qir'a me tê! Em h'emû unda dibin! <sup>13</sup>Her kesê ku nêzîkî Pîrozgeha Xudan be wê bimire. Gelo qir'a me h'emûya wê neyê?»

### Borcê k'ahîn û lêwî

**18** Xudan<sup>f</sup> gote Harûn: «Tu, kur'êd xwe û malbeta xweva, hûnê cabdarê neheqîya hindava Pîrozgehêda bin. Tu û kur'êd xweva, hûnê cabdarê neheqîya hindava k'ahîntîya xweda bin. <sup>2</sup>Usa jî birayêd xwe ye ji qebîla Lêwî, awa gotî

bereka bavê xwe nêzîkî xwe ke. Bira ew ber destê te bin û ter'a qulix kin. Tu û kur'êd xweva gerekê hûnê li ber Konê Şe'detîyê bin. <sup>3</sup>Bira ew nobedarîya te bikin û nobedarîya t'emamîya Kon bikin, ev borcê wan e. Lê nêzîkî hacetêd cîyê pîroz û gorîgehê nebin ku ne ew bimirin ne jî hûn. <sup>4</sup>Bira ew t'evî te bin û nobedarîya Konê Civînê bikin, nava h'emû şixulê Konda. Yekî din bira nêzîkî we nebe. <sup>5</sup>Bira nobedarîya cîyê pîroz û gorîgehê bikin. Û wê îdî xezeb neyê serê zar'êd Îsraêl. <sup>6</sup>Va ye min birayêd we lêwî ji nava zar'êd Îsraêl hildan, ew bona we çawa p'êşk'êş Xudanr'a hatine dayîne ku şixulê Konê Civînê bikin. <sup>7</sup>Lê tu û kur'êd xweva hûn gere k'ahîntîya xwe xweyî kin, nava h'emû şixulê gorîgehêda û usa jî qulixê pişt p'er'dêda. Ez şixulê k'ahîntîyê p'êşk'êşî we dikim, lê gava yekî din nêzîk be wê bê kuştîne».

### P'ara k'ahîna

<sup>8</sup>Xudan gote Harûn: «Va ye ez te k'ifş dikim, ku xweyîtiya dîyarîyêd minr'a dayî bikî. Ji h'emû tiştêd pîroze zar'êd Îsraêl ez p'arê didime te û kur'êd te çawa qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. <sup>9</sup>Evê bibe p'ara te ji tiştêd here pîroz, ji dîyarîyêd agir: H'emû gorîyêd wan awa gotî her dîyarîya wane nanî, her dîyarîya wane paqîjbûnê, her dîyarîyaf wane bervadayîne, çi ku ewê daynine li ber min. Ewê bona te û kur'êd te yêd here pîroz bin. <sup>10</sup>Wê cîyê pîrozda\* bixwin. Her qîsimê nêrîn dikare wê bixwe. Bira ew bona te pîroz be. <sup>11</sup>Ev jî p'ara te ye ji dîyarîyêd wan: H'emû dîyarîyêdf h'ejandinêye zar'êd Îsraêl, ez wan didime te, kur'êd te û qîzêd teye t'evî te, çawa qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. Her kesê paqîjî mala teda bira ji wê bixwe. <sup>12</sup>H'emû r'ûnê nûyî herî qenc, h'emû şerava nûye here qenc û genimê pêşîyêyî ku ew didine Xudan ez wan didime te. <sup>13</sup>Berêdf deremeta

\* 18:10 Gelek zane dibêjin ku ev cî h'ewşa Konê Civînê ye. Binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 6:16.

pêşine her tiştî ku e'rdê wanda ne k'îjana ewê Xudanr'a bînin, bira p'ara te be. Her kesê paqijî mala teda dikare wê bixwe. <sup>14</sup>Her tiştê Xudanr'a k'ifşkirî li Îsraêlda bira p'ara te be. <sup>15</sup>Her nixurîyê her bînberî ku bet'inê vedike, ji mêriv û ji h'eywên k'îjan ku wê Xudanr'a bidin, bira p'ara te be. Lê tu gere ji ber nixurîyê mêrivva û ji ber nixurîyê h'eywanê ne h'elalva qîmet bistînî. <sup>16</sup>Yek mehîyêda ji ber wêva bistînî, heqê wê jî ev e: pênc şêkilêd sifire pîrozgehê. Şêkilek bîst gêr e\*. <sup>17</sup>Lê ji ber nixurîyê boxva yan nixurîyê pêzva yan nixurîyê bizinêva nestîne, ew pîroz in. Xûna wan bir'eşîne gorîgehê û bezê wan jî çawa dîyarîya şewatêye bînxweş bona Xudan bidî. <sup>18</sup>Lê goştê wan bira p'ara te be. Çawa sersîngê h'ejandinê usa jî pîla r'astê bira p'ara te bin. <sup>19</sup>Her dîyarîyêd pîroz ku zar'êd Îsraêl dîyarî Xudan dîkin, ez didime te, kur'êd te û qîzêd teye t'evî te, çawa qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. Eva peymanaf xwê ye\* h'eta-h'etayê li ber Xudan, bona te û bona zur'eta te t'evî te». <sup>20</sup>Xudan gote Harûn: «E'rdê zar'êd Îsraêlda tu war nabî û p'ara teyê nava wanda t'une be. Ez im p'ara te û warê te nava wanda.

### P'ara lêwîya

<sup>21</sup>Va ye, ez her deheka<sup>f</sup> Îsraêl, çawa war didime zar'êd Lêwî, ji ber şixulê wanî Konê Civînêva. <sup>22</sup>Bona ku zar'êd Îsraêl nêzîkî Konê Civînê nebin ku wanr'a gune neyê h'esabê û ew nemirin. <sup>23</sup>Bira lêwî xwexa şixulê Konê Civînê bikin û xwexa jî cabdarê şaşîyê xwe bin. Eva qeyde-qanûna h'eta-h'etayê ye bona zur'etêd we. Lê li nava zar'êd Îsraêl warê wan wê t'unebe, <sup>24</sup>çimkî ez dehekê ku zar'êd Îsraêl dîyarî Xudan dîkin, çawa war didime lêwîya. Lema min gote wan: «Li nava zar'êd Îsraêl warê wan wê t'une be».

\* 18:16 «Gêrek» qasî 0,6 giram bû.

\* 18:19 Xwê bona h'emû dîyarîya lazim bû. Tişt têne xwêkirinê ku xirab nebin. Lema ew nîşana peymanê h'eta-h'etayê ye.

<sup>25</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>26</sup>«lêwîyar'a xeber de û bêje wan: «Gava hûn ji zar'êd Îsraêl dehekê bistînin, k'îjan ku min ji wan çawa war da we, hingê ji wê Xudanr'a dîyarî bidin, awa gotî dehêka ji wê dehêkê. <sup>27</sup>Ev dîyarîya we wer'a wê bê h'esabê çawa nan ji bêderê û çawa şerav ji h'ewz. <sup>28</sup>Hûn jî usa dîyarî Xudan kin, ji h'emû dehekêd xwe, yêd ku hûnê ji zar'êd Îsraêl bistînin. Û ji wê dîyarîya Xudan bidine Harûnê k'ahîn. <sup>29</sup>Ji h'emû p'êşk'êşêd xwe hûn gere h'emû tiştêd here qenc başqe kin û çawa dîyarîya pîroz bidine Xudan». <sup>30</sup>Bêje wan: «Pey başqekirina p'ara here qencr'a, çi ku bimîne wê lêwîyar'a bê h'esabê çawa ber ji bêderê û şerav ji h'ewzê». <sup>31</sup>Ew heqê we ye, ji ber şixulê weva li Konê Civînêda. Hûn û malêd we dikarin wê li her cîyî bixwin, <sup>32</sup>wer'a gune wê neyê h'esabê, çimkî hûn ya here qenc ji wê didin. Bi vî awayî tiştêd pîroze zar'êd Îsraêl neh'er'imînin wekî hûn nemirin».

### Ç'êleka sor

**19** Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>2</sup>«Ev e qeyde-qanûna wê hînkirina ku Xudan e'mir kir, got: bêje zar'êd Îsraêl bira nogineke sore bê qusûre bê lek'e ku ne k'etîye binê nîr bînine li cem te. <sup>3</sup>Wê bidine Êlazarê k'ahîn, bira nogin ji zomê bê derxistinê û li ber ç'e'vêd wî bê serjêkirinê. <sup>4</sup>Paşê bira Êlazarê k'ahîn bi t'ilîya xwe ji xûna wê hilde û h'eft cara xûna wê bir'eşîne li alîyê derê Konê Civînê. <sup>5</sup>Nogin li ber ç'e'vêd wî gere bê şewitandinê. Ç'ermê wê, goştê wê, xûna wê û e'deba wê bira bê şewitandinê. <sup>6</sup>Û bira k'ahîn hilde dara erzê, zoxa hûsopêf û r'îsê sorê gevez û bavêje li nava agirê noginê. <sup>7</sup>Paşê k'ahîn bira k'incêd xwe bişo û avê xwe ke, hingê ew dikare bik'eve zomê. Lê k'ahîn h'eta êvarê ne paqij e. <sup>8</sup>Yê nogin şewitandî jî bira k'incêd xwe bi avê bişo û avê xwe ke. Lê ew h'eta êvarê ne paqij e. <sup>9</sup>Û merivekî paqij bira k'ozîya noginê t'op ke û ji zomê der li cîkî paqij dayne. Civîna zar'êd Îsraêl gere wê xweyî ke bona ava paqijbûnê. Eva h'edîya paqijbûna ji guna ye. <sup>10</sup>Usa

jî yê k'ozîya noginê t'opkirî bira k'incêd xwe bişo, lê ew h'eta êvarê ne paqij e. Bira eva bona zar'êd Îsraêl û xerîbê li nava weda bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê.

### Ava paqijbûnê

<sup>11</sup>K'ê dest bide cinyazê mêriv ewê h'eft r'oja ne paqij be. <sup>12</sup>Ew gere bi ava paqijbûnê li r'oja sisîya û r'oja h'efta xwe paqij ke û wê paqij be. Lê heger ew li r'oja sisîya û r'oja h'efta xwe paqij neke ew paqij nabe. <sup>13</sup>Her kesê ku yê mirî k'eve awa gotî cinyazê mêriv k'eve û xwe paqij neke ew Pîrozgeha Xudan dih'er'imîne. Ew kesa gere ji nava Îsraêlda bê undakirinê çimkî ava paqijbûnê ne hate r'eşandinê li ser wî, ew dimîne ne paqij, nepaqijîya wî hê li ser wî ye.

<sup>14</sup>Ev e qanûn: Gava merivek li konda bimore her kesê ku bik'eve kon û her kesê ku îdî konda ye h'eft r'oja wê ne paqij be, <sup>15</sup>her derdana vekirî ku qalp'ax r'ind ne ser e, ew ne paqij e. <sup>16</sup>Her kesê ku li deştê li merivekî bi şûr kuştî k'eve yan li yekî bi e'mirê xwe mirî yan li hestûyêd mêriv yan li mezêl k'eve h'eft r'oja wê ne paqij be. <sup>17</sup>Û bona yêd ne paqij bira ji k'ozîya nogina bona paqijbûnêye şewitandî hildin, bikine derdanê û ava zelal serda kin. <sup>18</sup>Merivê paqij bira zoxa hûsopê hilde, wê avêda ke û bir'eşîne ser kon, h'emû hûr-mûr, h'emû merivêd ku li wir bûne û yê ku li hestû, yê kuştî, yê mirî û mezêl k'etîye. <sup>19</sup>Merivê paqij bira r'oja sisîya û r'oja h'efta bir'eşîne ser yê ne paqij û li r'oja h'efta wî paqij ke. Ewê k'incêd xwe bişo, avê xwe ke û êvarê wê paqij be. <sup>20</sup>Lê heger yek ne paqij be û xwe paqij neke ew kesa bira ji nava civînê bê undakirinê. Çimkî ew Pîrozgeha Xudan dih'er'imîne, ava paqijbûnê ne hate r'eşandinê li ser wî ew ne paqij e. <sup>21</sup>Bira eva bona wan bibe qeyde-qanûna h'eta-h'etayê. Usa jî yê ava paqijbûnê r'eşandî bira k'incêd xwe bişo û yê ku ava paqijbûnê k'eve wê h'eta êvarê ne paqij be. <sup>22</sup>Yê ne paqij çî jî k'eve wê ne paqij be, kesê ku wî tiştî k'eve h'eta êvarê wê ne paqij be».

**Gunê Mûsa û Harûn**

**20** Meha yekê t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl hate ber'îya Sînê û li Qadêşê millet cî-war bû. Wir Meryem mir û li wir jî hate definkirinê. <sup>2</sup> Av t'une bû bona civînê û ew miqabilî Mûsa û Harûn civîyan. <sup>3</sup> Millet bîna xwe li Mûsa teng dikir û digot: «Xwezî em jî hingê bimirana gava birayêd me li ber Xudan mirin! <sup>4</sup> Çima we civîna Xudan anî li vê ber'îyê? Wekî em û h'eywanê me qir' bin? <sup>5</sup> Çima we em ji Misirê derxistin, wekî me bînine li vî cîyê hanî xirab? Ne cîyê çandinê ye, ne cîyê darêd hêjîra, ne baxêd tirîya, ne h'inara, h'eta av jî vir t'une em vexwin!» <sup>6</sup> Mûsa û Harûn dûrî cime'tê k'etin, çûne li ber derê Konê Civînê, dever'û k'etin û r'ûmeta Xudan wanva xuya bû. <sup>7</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>8</sup> «Şivdarê hilde, tu Harûnê birê xweva civînê bicivînin, li ber ç'e'vêd wan qeyêr'a xeberdin ku ew ji xwe avê bide. Û tê bona wan avê ji qeyayê derxî ku civîn û h'eywanêd wan bidî vexwarinê». <sup>9</sup> Mûsa şivdara ku li ber Xudan bû hilda, çawa ku Xudan e'mirî li wî kir. <sup>10</sup> Hingê Mûsa û Harûn civîn civandine li ber qeyayê û Mûsa gote wan: «Bibihên gelî r'aberîk'ara, dibe ku em ji vî qeyayî wer'a avê derxin?» <sup>11</sup> Mûsa destê xwe bilind kir û bi şivdara xwe du cara qeyê xist û bêh'esab av derk'et, civînê û h'eywanê wan vexwarin. <sup>12</sup> Xudan gote Mûsa û Harûn: «Çimkî we bawarîya xwe li min ne anî û pîrozîya min zar'êd Îsraêlva e'yan ne kir, lema hûn vê civînê nabine li e'rdê ku min da wan». <sup>13</sup> Eva avêd Mêrîbahê\* bûn k'îderê zar'êd Îsraêl Xudanr'a k'etine de'wê û Xudan pîrozîya xwe wanva e'yan kir.

**Edom<sup>f</sup> nahêle ku Îsraêl derbaz be**

<sup>14</sup> Ji Qadêşê Mûsa qasid şandine li cem p'adşê Edomê û got: «Aha dibêje birê\* te Îsraêl: «Tu haş ji h'emû çetinayêd ku r'astî

\* 20:13 Bi zimanê îbranî «De'w».

\* 20:14 Milletê Edom ji Esawê birê Aqûbê kur'ê Îshaq pêşda hatibûn.

me hatin heyî, <sup>15</sup>ku kal-bavêd me berjêrî Misirê bûn û em li Misirê we'dekî dirêj man. misirîya xirabî li me û kal-bavêd me dikirin. <sup>16</sup>Me hewara xwe li Xudan daxist, Xudan dengê me bihîst, qasid\* şand û em ji Misirê derxistin. Va ye em li Qadêşê ne, bajarê li ser sînorê te. <sup>17</sup>Ji k'erema xwe bihêle em e'rdê teva derbaz bin, em li deştê ter'a û baxê ter'a derbaz nabin, ne jî emê avê ji bîrêd te vexwin. Emê r'îya p'adşêva\* her'in, ne vege'rine r'ast ne jî ç'ep, h'eta sînorê te derbaz nebin». <sup>18</sup>Lê Edom gote wî: «Tu e'rdê minva derbaz nabî yan na ezê bi şûr derk'evime miqabilî te». <sup>19</sup>Zar'êd Îsraêl gotine wî: «Emê r'îya serekeva derbaz bin, heger em yan h'eywanê me ava te vexwin emê heqê te bidine te, t'enê îzinê bide em p'îya derbaz bin, haqas tişt». <sup>20</sup>Lê ewî got: «Tu derbaz nabî». Edom bi ordîya giran û bi destê zor derk'ete miqabilî Îsraêl. <sup>21</sup>Usa Edom îzin ne da ku Îsraêl sînorê wîva derbaz be. Îsraêl dûrî wî k'et.

### Mirina Harûn

<sup>22</sup>T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl ji Qadêşê r'ê k'et hate li ç'îyayê Hor. <sup>23</sup>Li ç'îyayê Hor li ser sînorê t'opraxê Edom Xudan Mûsa û Harûnr'a xeberda û got: <sup>24</sup>«Bira Harûn her'e bigihîje cime'ta xwe. Ew naçe li e'rdê ku min da zar'êd Îsraêl, çimkî we li ber avêd Mêrîbahê gotinêd min înk'ar kirin. <sup>25</sup>Harûn û Êlazarê kur'ê wî hilde û wan hilk'işîne li ç'îyayê Horê. <sup>26</sup>K'incêd Harûn jê bêxe û wan Êlazarê kur'ê wî ke. Bira Harûn li wir bimire û her'e bigihîje cime'ta xwe». <sup>27</sup>Mûsa anegorî e'mirê Xudan kir û ew li ber ç'e'vêd t'emamîya civînê hilk'işîyane li ç'îyayê Horê. <sup>28</sup>Mûsa k'incêd Harûn jê êxistin û li Êlazarê kur'ê wî kirin. Li wir serê ç'îyê

\* 20:16 Xebera îbranî «Qasid» usa jî tê t'ercimekirinê çawa «Milyak'etf».

\* 20:17 «R'îya p'adşê» ew r'êk ji r'îyêd sereke bû. Ku li Şamê destpêdikir û diçû başûrê h'eta Necefêf. Ev r'ê usa jî bona t'ucaretîyê dihatine xebatê.

Harûn mir. Mûsa û Êlazar jî ji ç'îyê hatine xarê. <sup>29</sup>T'emamîya civînê fe'm kir wekî Harûn mirîye û sî r'o'jî t'emamîya mala Îsraêl şîna wî kir.

### Alt'kirina p'adşê E'rad

**21** P'adşê E'radê kenanî ku li Necefê dima, bihîst wekî Îsraêl r'îya At'arîmda tê, t'evî Îsraêl kire şer' û ji wan hêsîr birin. <sup>2</sup>Hingê Îsraêl li ber Xudan ad-qirar kir û got: «Heger tu vî miletî bidî destê min, ezê bajarêd wan wêran kim, wî t'am dîyarî Xudan bikim». <sup>3</sup>Xudan dengê Îsraêl bihîst û kenanî dane destêd wan. Ew û bajarêd wan wêran kirin, ew t'am dîyarî Xudan kirin. Navê wî cîyî danîn H'orma\*.

### Me'rê sifirîn

<sup>4</sup>Ew ji ç'îyayê Horê r'êk'etin r'îya Be'ra Sorva çûn wekî dora e'rdê Edomva her'in. Sebira cime'tê r'êva t'êrê nekir. <sup>5</sup>Cime'tê miqabilî Xwedê û Mûsa xeberda û got: «Çima we em ji Misirê hevraz derxistin ku ber'îyêda bimirin? Çimkî ne nan heye, ne av heye û ev xwarina hane p'ûç' jî, ku me'dê me jê li hev dik'eve». <sup>6</sup>Xudan me'rêd je'rdadayî şandine li ser milet û wana milet xist. Gelek merî jî Îsraêl mirin. <sup>7</sup>Hingê milet hate li cem Mûsa û got: «Me gune kir ku miqabilî Xudan û te xeberda, r'eca ji Xudan bike ku me'ra dûrî me xe». Ê Mûsa bona cime'tê r'eca kir. <sup>8</sup>Xudan gote Mûsa: «Xwer'a me'rekî çêke û darva dardake, her kesê me'r lêdayî li wî binihêr'e wê sax bimîne». <sup>9</sup>Mûsa me'rekî sifir çêkir, ew darva darda kir. Gava me'r merivekî dixist ewî li me'rê sifir dinihêr'î û sax dima.

<sup>10</sup>Zar'êd Îsraêl r'ê k'etin û li Ovot'ê zomêd xwe lêdan. <sup>11</sup>Ji Ovot'ê jî r'ê k'etin û li Îyê-Hahabarîmê li ber'îya pêşberî Mowabêf alîyê r'ohilatê zomêd xwe lêdan. <sup>12</sup>Ji wir r'ê k'etin

---

\* 21:3 Bi zimanê îbranî «Wêrankirin».

û li newala Zeredê zomêd xwe lêdan. <sup>13</sup>Ji wir jî r'ê k'etin û ber'îyêda wî berî Arnonê ku ji sînore emoriya der tê, zomêd xwe lêdan. Çimkî Arnon sînore nava Mowab û emoriya ye.

<sup>14</sup>Lema li k'itêba Şer'êd Xudanda\* tê gotinê:

«Vahêv û nixalêd Arnon li Sûfayê ne,

<sup>15</sup>usa jî p'êberjêrêd nixala

ku dik'işine jêr h'eta E'rê

û li sînore Mowabê hildipesêre».

<sup>16</sup>Û ji wir çûne Bêrê. Eva ew bîr bû bona k'îjanî Xudan gote Mûsa: «Cime'tê t'opî li ser hev ke û ezê avê bidime wan».

<sup>17</sup>Wê hingê Îsraêl eva stirana stira:

«Bîr bide der! Wêr'a bistirên!

<sup>18</sup>Bîra ku wek'îla ew vedane,

e'silzadeyêd mileta ew k'olane

bi şiv û şivdarêd xwe!»

Ji ber'îyê ew çûne Mat'anayê. <sup>19</sup>Ji Mat'anayê jî çûne Nah'alîyêlê, ji Nah'alîyêlê çûne Bamot'ê. <sup>20</sup>Û ji Bamot'ê çûne newala deşta Mowabda li serê Pîsgayê, ku li ber'îyê dinihêr'e.

### Şer'ê miqabilî Sîxon û Og

<sup>21</sup>Wê hingê Îsraêl qasid şandine li cem Sîxonê p'adşê emoriyaf, got: <sup>22</sup>«Îzina te hebe em e'rdê ter'a derbaz bin, em venager'ine deşt û baxa, em avê jî ji bîra venaxwin, emê r'îya p'adşêva\* her'in h'eta sînore ter'a derbaz bin». <sup>23</sup>Lê Sîxon ne hişt ku Îsraêl sînore wîr'a derbaz be. Sîxon h'emû cime'ta xwe t'op kir û derk'ete miqabilî Îsraêl li ber'îyê, hate Yahasê û t'evî Îsraêl kire şer'. <sup>24</sup>Îsraêl ew da ber devê şûr, e'rdê wî ji Arnon h'eta Yaboqê, h'eta zar'êd Amon zeft kir.

---

\* 21:14 Eva k'itêbeke kevine ku hatîye undakirinê. Ji navê wê em dikarin tê derxin ku ewa k'itêba bona serk'etina Xudan e li ser dijminêd xwe.

\* 21:22 Binihêr'e şirovekirina Jimar 20:17.

Çimkî sînorê zar'êd Amon qewatkirî bû. <sup>25</sup>Îsraêl h'emû ev bajar hildan û Îsraêl li h'emû bajarêd emorîyada cî-war bû usa jî H'eşbonê û h'emû dor-berê wêda. <sup>26</sup>Çimkî H'eşbon bajarê Sîxonê p'adşê emorîya bû. Ewî t'evî p'adşê Mowabêyî pêşîyê kiribû şer' û t'emamîya e'rdê wî h'eta Arnonê ji destê wî standibû. <sup>27</sup>Lema yê mesela salix dikin, dibêjin:

«Werine H'eşbonê, bira ew ava be  
û qedîm be bajarê Sîxonê!

<sup>28</sup> Çimkî agir ji H'eşbonê derk'et,  
alav ji bajarê Sîxonê.  
H'ûfî xwe kir E'ra Mowabê,  
wek'îlêd Arnonêye hêlanêd<sup>f</sup> jorin.

<sup>29</sup> Wey li te Mowab!  
Tu unda bûyî cime'ta K'imoş\*,  
kur'êd xwe dane r'evê,  
qîzêd xwe jî dane hêsîrîyê  
li Sîxonê p'adşê emorîya.

<sup>30</sup> Me ew e'rdê xist,  
ji H'eşbonê h'eta Dîbonê.  
Me ew h'eta Nofahê  
ku nêzîkî Mêdebayê ye wêran kirin».

<sup>31</sup> Bi vî awayî Îsraêl li e'rdê emorîyada cî-war bû. <sup>32</sup> Wê hingê Mûsa şand ku ce'sûsîya Yazêrê bikin, Îsraêl dor-berêd wê zeft kir û berî emorîyêd ku li wir diman da <sup>33</sup> û vege'riyan li rîya Başanêda hevraz çûn. Hingê Ogê p'adşê Başanê û t'emamîya miletê wî li Êdreyê derk'ete şêr' miqabilî wan. <sup>34</sup> Xudan gote Mûsa: «Netirse ji wî, çimkî ewî, t'emamîya cime'ta wî û e'rdê wî ez didime destê te. Tê usa bînî serê wî çawa ku te anî serê Sîxonê p'adşê emorîya ku li H'eşbonê dima». <sup>35</sup> Û Îsraêl ew, kur'êd wî û t'emamîya cime'ta wî qir' kirin, qet yek sax ne hiştin û e'rdê wî zeft kirin.

\* 21:29 «K'imoş» navê xudanê mowabîya<sup>f</sup> bû.

**Bilam**

**22** Zar'êd Îsraêl r'êk'etin û li deştêd Mowabda alîyê r'ohilata Êrdunê, pêşberî Erîhayê zomêd xwe lêdan.

<sup>2</sup>Wê hingê Balaqê kur'ê Sîpor ev h'emû çî ku Îsraêl anî ser emoriya dît. <sup>3</sup>Mowab gelekî ji Îsraêl tirsîya, çimkî ew bê h'esab bû. R'ûyê zar'êd Îsraêlda Mowab xofê da bû. <sup>4</sup>Û Mowab gote r'ûspîyêd Midyanê: «Ev cime'ta han her çî ku dora me heyê wê bixwe, çawa ku dewar gîhayê çolê leber dike». Balaqê kur'ê Sîpor jî wê hingê p'adşê Mowabê bû. <sup>5</sup>Ewî qasid şandine li cem Bilamê kur'ê Beûr li Pit'orê, ku devê ç'emê Firatê ye, e'rdê Binê-E'moda gazî wî kir, got: «Va ye, miletek ji Misirê derk'etîye, r'ûyê e'rdê îdî nixamtîye û ew pêşberî min cî-war bûye. <sup>6</sup>Awa ji k'erema xwe were bona xatirê min nifir'a li wî miletî bike, çimkî ew ji min qewattir e, belkî ezê hingê bika-ribim zora wî bibim û ber'dimê ji e'rdê xwe derxim. Çimkî ez zanim duayê te duaye, nifir'a te jî nifir'e». <sup>7</sup>R'ûspîyêd Mowabê û r'ûspîyêd Midyanê bi p'êşk'êşêd bona sêrbazîyê destêd wanda çûn. Hatine li cem Bilam û xeberêd Balaq wî'r'a gilî kirin. <sup>8</sup>Ewî gote wan: «Îşev li vir bimînin, ezê caba we bidim çawa ku Xudan minr'a bêje». Wek'îlêd Mowabê cem Bilam man. <sup>9</sup>Xwedê hate cem Bilam, got: «Ev merivêd hane cem te, kî ne?» <sup>10</sup>Bilam gote Xwedê: «Balaqê kur'ê Sîpor p'adşê Mowabê ev xeber minr'a şandine: <sup>11</sup>«Va ye miletek ji Misirê derk'etîye û r'ûyê e'rdê nixamtîye. Awa were bona min nifir'a li wî bike, belkî ezê bikaribim miqabilî wî bikime şer' û berî wî dim»». <sup>12</sup>Xwedê gote Bilam: «T'evî wan neçe, nifir'a li wî miletî neke, çimkî ew mileta buhurtî ye». <sup>13</sup>Bilam sibehê r'abû û gote wek'îlêd Balaq: «Her'ine welatê xwe, çimkî Xudan îzina min ne da ku t'evî we bêm». <sup>14</sup>Wek'îlêd Mowabê r'abûn hatine li cem Balaq û gotin: «Bilam qayl nebû t'evî me bê». <sup>15</sup>Balaq dîsa ji wan gelectir û ji wan qedirtir wek'îl şandin. <sup>16</sup>Ew hatine li cem Bilam û gotinê: «Balaqê kur'ê Sîpor ha got: «Ji k'erema xwe, t'exsîr neke, were, <sup>17</sup>ezê qedir-hurmeteke mezin bona

te bikim û çî ku bêjî ezê bikim, t'enê were bona min nifir'a li vî miletî bike. <sup>18</sup> Bilam caba berdestiyêd Balaq da û got: «Dixwazî Balaq mala xwe t'ijî zêr' û zîv bide min ez nikarim ser gotina Xudan Xwedêyê xwer'a derbaz bim ku tiştêkî biç'ûk yan mezin bikim. <sup>19</sup> Lê hûn jî îşev li vir bimînin û ezê bizanibim k'a Xudan wê îdî çî bêje min». <sup>20</sup> Xwedê şev hate li cem Bilam û gotê: «Heger ev merivana hatine gazî te dikin, r'abe t'evî wan her'e, lê t'enê çî ku ezê ter'a bêjim wê bike». <sup>21</sup> Bilam sibehê r'abû t'êr'a k'era xwe girêda û t'evî wek'îlêd Mowab çû. <sup>22</sup> Gava Bilam diçû hêrsa Xudan r'abû û milyak'etêf Xudan li ser r'ê çawa p'êxem sekinî. Bilam jî k'era xwe dajot, her du xulamêd wî jî t'evî wî bûn. <sup>23</sup> K'er milyak'etê Xudan dît, ku li ser r'ê sekinî şûrê wî jî te'zî dêstda, hingê k'er ji r'ê dager'îya û k'ete deştê. Bilam k'erê dixist ku derxe ser r'ê, <sup>24</sup> milyak'etê Xudan li şiver'îya nava baxêd tirîyada sekinîbû, vî alî dîwar bû, wî alî dîwar bû. <sup>25</sup> K'erê ku milyak'etê Xudan dît, xwe dîwêrva guhaşt û nigê Bilam jî dîwêrva hate guhaştinê, ewî dîsa lê xist. <sup>26</sup> Milyak'etê Xudan jî pêşda çû û cîkî usa teng sekinî ku r'ê t'une bû ne r'ast vege'înine ne jî ç'ep. <sup>27</sup> Gava k'erê milyak'etê Xudan dît bin Bilamda mer'ixî, hêrsa Bilam jê r'abû û ewî k'er da li ber şîva. <sup>28</sup> Hingê Xudan zarê k'erê vekir û ewê gote Bilam: «Min çî li te kirîye wekî eva sê car e tu min dixî?» <sup>29</sup> Bilam gote k'erê: «Çimkî te ez kirime pêk'enî, heger destê minda şûr hebûya minê hema niha jî tu bikuştayî». <sup>30</sup> K'erê gote Bilam: «Ez ew k'era te nînim ku tu t'emamîya e'mirê xweda h'eta r'oja îro lê sîyar dibî? Qet bûye wekî ez ha bînime serê te?» Ewî got: «Na». <sup>31</sup> Hingê Xudan ç'e'vêd Bilam vekir û ewî milyak'etê Xudan li ser r'ê, şûrê te'zî destê wîda sekinî dît, ta bû û dever'ûya çû. <sup>32</sup> Milyak'etê Xudan gote wî: «Bona çî eva sê car e ku tu k'era xwe dixî? Va ye ez ber te bûme p'êxem, çimkî r'îya te li ber min ne r'ast e. <sup>33</sup> K'erê ez dîtîm û sê cara ji r'îya xwe dager'îya. Heger ewa ji r'ê daneger'îya, min niha e'se tu kuştibûyî û ewa sax hiştibû». <sup>34</sup> Bilam gote milyak'etê Xudan: «Min gune kir, çimkî min nizanibû ku tu yî li ser r'ê pêşberî

min sekinî. Awa, heger ev yek li ber te xweş nayê, ezê paşda vege'rim». <sup>35</sup>Milyak'etê Xudan gote Bilam: «T'evî van meriva her'e lê t'enê çi ku ezê bêjime te wê bêje». Bilam t'evî wek'îlêd Balaq çû. <sup>36</sup>Gava Balaq bihîst wekî Bilam tê, derk'ete pêşîya wî li Îr-Mowabê, ew li ser lêva sînorê Arnonê ye. <sup>37</sup>Balaq gote Bilam: «Ne min şandine pey te gazî te kir, tu çima ne dihatî cem min? Dibe ez nikaribim bin qencîya te derêm?» <sup>38</sup>Bilam gote Balaq: «Va ye ez hatime li cem te, lê ez nikarim xwe serê xwe xeber dim. Çi ku Xudan dayne li ser zarê min wê jî ezê bêjim». <sup>39</sup>Bilam t'evî Balaq çûne Qîryat-Hûsotê. <sup>40</sup>Balaq pez û dewar kirine qurban, Bilam û wek'îlêd t'evî wîr'a şandin. <sup>41</sup>Û sibehê Balaq Bilam hilda û ew hilk'işîyane li ser Bamot'-Bae'l û ji wir Bilam p'areke cime'ta Îsraêl dît.

### P'êxemberîya<sup>f</sup> Bilame e'wlin

**23** Bilam gote Balaq: «Minr'a li vir h'eft gorîgeha<sup>f</sup> çêke, h'eft canega û h'eft berana li vir minr'a hazir ke». <sup>2</sup>Balaq anegorî gotina Bilam kir. Balaq û Bilam li ser her gorîgehê canegak û beranek dan. <sup>3</sup>Bilam gote Balaq: «Tu ber t'evayîşewatê xwe be, ezê her'im, belkî Xudan minva xuya be û çi ku ew minva e'yan ke ezê ter'a bêjim kim». Û ew çû serê t'apekî xikî-xwelî. <sup>4</sup>Xwedê Bilamva xuya bû û Bilam gote wî: «Min h'eft gorîgeh çêkirine, canegak û beranek li ser her gorîgehê daye». <sup>5</sup>Xudan xeber danî li ser zarê Bilam gotê: «Veger'e li cem Balaq ha bêjê». <sup>6</sup>Ew vege'îya li cem Balaq, va ye, ew t'evî h'emû wek'îlêd Mowabê li ber t'evayîşewatê xwe sekinîye. <sup>7</sup>Bilam mesela xwe pêşda anî û got:

«Balaq ez ji Aramê anîm,  
p'adşê Mowabê ez ji ç'îyayêd r'ohilatê:  
«Were minr'a nifir'a li Aqûb bike,  
were li Îsraêl hilê!»

<sup>8</sup>Ezê çawa nifir'a lê bikim,  
wekî Xwedê nifir' lê nekir?  
Ezê çawa lê hilêm,

wekî Xudan lê hilnehat?

<sup>9</sup> Çimkî ez ji ser serê qeyêva dibînim,  
ji ser girava ez wî dinihêr'im,  
va ye, miletek başqe dijî,  
û minetê t'u miletî nagire.

<sup>10</sup> K'ê dikare t'oza Aqûb h'esab ke,  
yan axa Îsraêl bijmire?  
Xwezî nefsa min bi mirina r'asta bimore,  
xwezî axirîya min mîna ya wan be!»

<sup>11</sup> Balaq gote Bilam: «Te çi anî serê min? Min tu derxistî  
li vir ku nifir'a li dijminêd min bikî, lê tu bimbarek dikî!»

<sup>12</sup> Bilam caba wî da û got: «Çi ku Xudan datîne li ser zarê  
min ez gere t'enê wê bêjim!»

### **P'êxembertîya Bilame duda**

<sup>13</sup> Balaq gote wî: «Ji k'erema xwe t'evî min were cîkî din, tê wî  
ji wir bibînî. Tê t'enê p'areke wî bibînî lê t'emamîya wî tê nebînî,  
ji wir tê min'r'a nifir'a lê bikî». <sup>14</sup> Û Balaq ew bire li deşta Sofîmê  
li ser serê Pîsgayê û heft gorîgeh çêkirin. Canegak û beranek li  
ser her gorîgehê da. <sup>15</sup> Ewî gote Balaq: «Li vir ber t'evayîşewatê  
xwe bisekine ezê jî li wir r'astî Xudan bêm». <sup>16</sup> Xudan Bilamva  
xuya bû û xeber danî li ser zarê wî gotê: «Veger'e li cem Balaq  
ha bêjê». <sup>17</sup> Bilam hate li cem Balaq, va ye, ew t'evî wek'îlêd Mo-  
wab li ber t'evayîşewatê xwe sekinîye. Balaq gote wî: «Xudan  
çi got?» <sup>18</sup> Bilam mesela xwe pêşda anî û got:

«R'abe Balaq û bibihê,  
guh bide min kur'ê Sîpor!

<sup>19</sup> Xwedê ne însan e ku derewa bike,  
ne jî benî Adem e ku p'oşman be.  
Ewî got wê neke?

Xeber da wê neyne sêrî?

<sup>20</sup> Va ye, min e'mir stand ku bimbarek kim.  
Xwedê bimbarek kir ez nikarim biguhêzim.

<sup>21</sup> Neheqî li nava Aqûbda ne dîtîye,

- xem li nava Îsraêlda k'ifş nekirîye.  
 Xudan Xwedêyê wî t'evî wî ye,  
 şabûna bona p'adşê nava wî ye.  
<sup>22</sup> Xwedê ew ji Misirê derxistin.  
 Qewata wan mîna qewata gayê beyanî ye.  
<sup>23</sup> Sêrbazî li nava Aqûbda t'uneye,  
 k'oç'ektî li nava Îsraêlda t'uneye.  
 Niha wê bêjine Aqûb û Îsraêl:  
 «Ku Xwedê çi kir».  
<sup>24</sup> Awa millet çawa makeşêr r'adibe  
 û çawa şêr banzdide,  
 p'al nade h'eta t'alên nexwe  
 û xûna yêd kuştî venexwe.

<sup>25</sup> Balaq gote Bilam: «Ne nifir'a li wî bike, ne jî wî bimbarek ke!» <sup>26</sup> Bilam caba Balaq da û got: «Min eva yeka ne gote te: wekî çi ku Xudan bêje min ezê wê bikim?»

<sup>27</sup> Balaq gote Bilam: «Ji k'erema xwe were ezê te bibime cîkî din, belkî ewê li Xwedê xweş bê û tê ji wir bona min nifir'a li Îsraêl bikî. <sup>28</sup> û Balaq Bilam bire li ser serê P'ihorê, ji k'îderê ber'î dihate k'ifşê. <sup>29</sup> Bilam gote Balaq: «Min'r'a li vir h'eft gorîgeha çêke, h'eft canega û h'eft berana li vir min'r'a hazir ke». <sup>30</sup> Balaq anegorî xebera Bilam kir, canegak û beranek li ser her gorîgehê da.

### P'êxembertîya Bilame sisîya

**24** Bilam dît wekî li Xudan xweş tê Îsraêl bimbarek ke, mîna berê neçû ku sêrbazîyê bike, lê berê xwe da ber'îyê. <sup>2</sup> Bilam serê bilind kir û Îsraêl bi qebîlêd xwe cî-warbûyî dît, hingê R'uh'ê Xwedê hate li ser wî. <sup>3</sup> Ewî mesela xwe pêşda anî û got:

«Awa xebera Bilamê kur'ê Beûr,  
 xebera mêrê ku zelal dibîne.

<sup>4</sup> Xebera yê ku gotinêd Xwedê dibihê,  
 yê ku dîtinokêd Yê Herî Zor dibîne,

- ç'e'vêd wî têne vekirinê û ew ta dibe.  
5 Çawa bedew in konêd te Aqûb!  
Cî-warêd te Îsraêl!
- 6 Çawa newal ew fire dibin,  
çawa baxçê ber devê ç'êm,  
çawa ûdêd\* ku Xudan daç'ikandîye  
çawa erzêd devê avê.
- 7 Av ji e'lbêd wî diher'ike,  
t'oximê wî r'ind avadayî ye.  
P'adşê wî wê Agag\* derbazzir be,  
p'adşatîya wî wê bilind be.
- 8 Xwedê ew ji Misirê derxist.  
Qewata wî mîna qewata gayê beyanî ye.  
Ewê mîletêd dijminêd wî daqurtîne  
û hestûyêd wan wê hûrdexweşî ke,  
bi tîrêd xwe wê lêxe.
- 9 Ew telîya, mîna şêr velezîya,  
çawa makeşêrê kes nikare ewî r'ake.  
K'ê te bimbarek ke, wê bimbarek be,  
k'ê nîfir'a li te bike, wê nîfir'ê li wî be.
- 10 Hingê hêrsa Balaq li Bilam r'abû, ewî destêd xwe hev xistin  
û Balaq gote Bilam: «Min gazî te kir ku nîfir'a li dijminêd min  
bikî, lê dewşê eva sê car e te ew bimbarek kirin. <sup>11</sup>Niha bi-  
r'eve her'e cîyê xwe! Min got ezê qedir-hurmeta mezin bona  
te bikim, lê va ye Xudan ew yek ji destê kir». <sup>12</sup>Bilam gote  
Balaq: «Ne min qasidêd ter'a jî xeberda û got, k'îjan ku te  
şandibûne li cem min: <sup>13</sup>«Dixwazî Balaq mala xwe t'ijî zêr' û  
zîv bide min, ez nikarim ser gotina Xudan'r'a derbaz bim, ku  
tiştêkî qenc yan xirab bi xwestina xwe bikim. Çi ku Xudan  
bêje, ezê wê bêjim». <sup>14</sup>Niha ez diçime li cem mîletê xwe, were  
ezê ter'a bêjim, ku r'ojê bîn ev mîlet wê çi bîne sêrê mîletê te».

---

\* 24:6 «Ûd» şînayîk e, ku ji ava wê r'ûnekî bînxweş tê çêkirinê.

\* 24:7 Bînihêr'e 1P'adşatî 15:8.

**P'êxembertîya Bilame çara**

- <sup>15</sup> Ewî mesela xwe pêşda anî û got:  
«Awa xebera Bilamê kur'ê Beûr,  
xebera mêrê ku zelal dibîne.
- <sup>16</sup> Xebera yê ku gotinêd Xudan dibihê,  
yê ku haş ji zanebûna Yê Herî Jorin heye,  
yê ku dîtînokêd Yê Herî Zor dibîne,  
ç'e'vêd wî têne vekirinê û ew ta dibe.
- <sup>17</sup> Ez wî dibînim, lê ne niha,  
li wî dinihêr'im, lê ne nêzîk.  
Steyrkê ji Aqûb derk'eve,  
şiva p'adşatîyê wê ji Îsraêl pêşda bê,  
wê cênîka Mowab hûrdexweşî ke,  
h'emû zar'êd Şêt' qir' ke.
- <sup>18</sup> Edomê bibe war,  
Sêhîrê bibe warê dijminêd xwe,  
Îsraêl jî wê ser k'eve.
- <sup>19</sup> Ji Aqûb h'akimê derk'eve  
û yêd ji bajêr mayî wê qir' ke».
- <sup>20</sup> Bilam Amalêk dît, mesela xwe pêşda anî û got:  
«Miletê lapî pêş Amalêk bû,  
lê axirîya wî qir'bûn e».
- <sup>21</sup> Qênî dît, mesela xwe pêşda anî û got:  
«Cî-warê te qedîm e,  
hêlîna te li ser qeyayê hatîye danînê.
- <sup>22</sup> Qayînîyê bê qir'kirinê,  
gava Aşûr te hêsîr bibe».
- <sup>23</sup> Bilam mesela xwe pêşda anî û got:  
«K'ê wê sax bimîne gava Xwedê vê yekê bike?
- <sup>24</sup> Gemîyê ji K'ît bèn,  
wê Aşûr û Eber bizêrînin,

lê ew xwexa jî wê bê undakirinê».

<sup>25</sup>Bilam r'abû û vege'îya çû cîyê xwe, Balaq jî r'îya xweda çû.

### Bêe'silîya Îsraêl t'evî Bae'l-P'ihor

**25** Îsraêl li Şittîmê dima ku millet destpêkir t'evî qîzêd Mowab<sup>f</sup> bêe'silî kir. <sup>2</sup>Wana millet t'eglîfî qurbanêd h'eykelêd xwe kirin, millet xwar û li ber h'eykelêd wan ta bû. <sup>3</sup>Îsraêl Bae'l-P'ihorva\* hate girêdanê. Hingê hêrsa Xudan li Îsraêl r'abû. <sup>4</sup>Xudan gote Mûsa: «H'emû serwêrêd millet hilde û wan ber te'vê li ber Xudan daliqîne. Hingê alava hêrsa Xudan wê li Îsraêl dayne. <sup>5</sup>Mûsa gote h'akimêd Îsraêl: «Her kes ji we, wan merivêd xwe bikujin, k'îjan ku Bae'l-P'ihorva hatine girêdanê». <sup>6</sup>Va ye yekî ji zar'êd Îsraêl, li ber ç'e'vê Mûsa û t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl, gava ew li ber derê Konê Civînê digirîyan, hat jineke midyanî anî mala xwe. <sup>7</sup>Pînhasê kur'ê Êlazarê kur'ê Harûnê k'ahîn ev yek ku dît, ji nava civînê r'abû, r'imek girte destê xwe, <sup>8</sup>ew pey li wî îsraêlî çû k'ete konê wî û r'im zikê her duyar'a kir, zikê îsraêlî jî jinê jî. Hingê bela li nava Îsraêlda seqir'î. <sup>9</sup>Ji dest belayê 24000 merî mirin.

<sup>10</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>11</sup>«Pînhasê kur'ê Êlazarê kur'ê Harûnê k'ahîn hêrsa min ji zar'êd Îsraêl vege'and, çimkî ewî bi xîreta min nav wanda xîret kir û min zar'êd Îsraêl ji k'umr'eşîya xwe qir' nekir. <sup>12</sup>Lema bêjî wî: «Va ye ez peymanaf xwe ye e'dilayê t'evî wî girêdidim, <sup>13</sup>ewê bona wî û bona zur'eta wî pey wîr'a bibe peymana k'ahîntîya h'eta-h'etayê. Çimkî ewî bona Xwedêyê xwe kire xîret û bona zar'êd Îsraêl k'ewandin kir».

<sup>14</sup>Navê îsraêlîyê kuştî, yê ku t'evî jina midyanî hatibû kuştinê Zîmrî bû, kur'ê Salûyê serwêrê olk'a şimh'ûnîya.

---

\* 25:3 Bi zimanê îbranî «xudanê P'ihor». P'ihor bajarekî Mowabê bû û «Bae'l-P'ihor» navê h'eykelekî Mowab bû.

<sup>15</sup>Navê jina midyanîye kuştî jî K'ozbî bû, qîza Sûrê serwêrê qebîla olk'eke midyanî.

<sup>16</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>17</sup>«T'evî midyanîya dijminatîyê bajon û qir'a wan bînin. <sup>18</sup>Çimkî wana bi mixenetîyê dijminatî wer'a ajotin û hûn xapandin, nava wê qewimandina P'ihor û xûşka wan K'ozbîya qîza serwêrê midyanîda, ya ku r'ûyê P'ihorda r'oja belayê hate kuştinê».

### Navjimara dudaye zar'êd Îsraêl

**26** Pey belêr'a Xudan gote Mûsa û Êlazarê kur'ê Harûnê k'ahîn: <sup>2</sup>«T'emamîya civîna zar'êd Îsraêl her kesê ku eskerîyêr'a hazir e, ji bîstsalîyê jortir e, anegorî olk'êd wan yeko-yeko bijmirin». <sup>3</sup>Mûsa t'evî Êlazarê k'ahîn li deştêd Mowabda, nêzîkî Êrdunê, pêşberî Erîhayê wanr'a xeber da û got: <sup>4</sup>«Ji bîstsalîyê jortir bijmirin», çawa ku Xudan t'emî li Mûsa kir. Zar'êd Îsraêle ku ji e'rdê Misirê derk'etin, ev in: <sup>5</sup>R'ûbên nixurîyê Îsraêl bû. Ev in zar'êd R'ûbên: Ji Henox malbeta henoxî. Ji Pallû malbeta pallûyî. <sup>6</sup>Ji Hesrûn malbeta hesrûnî. Ji K'armî malbeta k'armî. <sup>7</sup>Eva malbetêd r'ûbênîya ne û h'esabê wan jî 43730 nefş bûn. <sup>8</sup>Kur'ê Pallû: Elyab bû. <sup>9</sup>Ev in kur'êd Elyab: Nimûyêl, Dat'an û Abîram. Eva ew Dat'an û Abîramê bijartîyêd civînê bûn, yêd ku r'abûne miqabilî Mûsa û Harûn li nava civîna Qorax da, gava ku ew r'abûne miqabilî Xudan. <sup>10</sup>Hingê e'rdê devê xwe vekir û ew t'evî Qorax h'ûffî xwe kirin. Ev civîna unda bû, gava êgir ew dusid pêncî merî h'ûffî xwe kirin û ew bûne nişan. <sup>11</sup>Lê zar'êd Qorax nemirin.

<sup>12</sup>Ev in zar'êd Şimh'ûn malbetêd xweva: Ji Nimûyêl malbeta nimûyêlî. Ji Yamîn malbeta yamînî. Ji Yaxîn malbeta yaxînî. <sup>13</sup>Ji Zerah malbeta zerahî. Ji Şawûl malbeta şawûlî. <sup>14</sup>Eva malbetêd şimh'ûnî ne: 22200 nefş.

<sup>15</sup>Ev in zar'êd Gad malbetêd xweva: Ji Sipon malbeta siponî. Ji Haggî malbeta haggî. Ji Şûnî malbeta şûnî. <sup>16</sup>Ji Oznî malbeta oznî. Ji E'rî malbeta e'rî. <sup>17</sup>Ji Arod malbeta

arodî. Ji Arêlî malbeta arêlî. <sup>18</sup>Eva malbetêd zar'êd Gad in û h'esabê wan jî 40500 nefş bûn.

<sup>19</sup>Zar'êd Cihûda: Er û Onan bûn. Lê Er û Onan li e'rdê Kenanêdaf mirin. <sup>20</sup>Ev in zar'êd Cihûda malbetêd xweva: Ji Şêlah malbeta şêlanî. Ji Pêrês malbeta pêrêsî. Ji Zerah malbeta zerahî. <sup>21</sup>Ev in zar'êd Pêrês: Ji Hesrûn malbeta hesrûnî. Ji Hamûl malbeta hamûlî. <sup>22</sup>Eva malbetêd Cihûda ne û h'esabê wan jî 76500 nefş bûn.

<sup>23</sup>Ev in zar'êd Îsaxar malbetêd wanva. Ji T'ola malbeta t'olayî. Ji Pûa malbeta pûnî. <sup>24</sup>Ji Yaşûv malbeta yaşûvî. Ji Şîmron malbeta şîmronî. <sup>25</sup>Eva malbetêd Îsaxar in û h'esabê wan jî 64300 nefş bûn.

<sup>26</sup>Ev in zar'êd Zebûlon malbetêd xweva. Ji Serêd malbeta serdî. Ji Êlon malbeta êlonî. Ji Yalyêl malbeta yalyêlî. <sup>27</sup>Eva malbetêd zebûlonî in û h'esabê wan jî 60500 nefş bûn.

<sup>28</sup>Ev in zar'êd Êsiv malbetêd xweva. Minaşe û Efrayîm. <sup>29</sup>Ev in zar'êd Minaşe: Ji Maxîr malbeta maxîrî. Ji Maxîr Gîle'd bû. Ji Gîle'd malbeta gîle'dî. <sup>30</sup>Ev in zar'êd Gîle'd: Ji Îyezer malbeta îyezerî. Ji Xêleq malbeta xêleqî. <sup>31</sup>Ji Asrîyêl malbeta asrîyêlî. Ji Şexem malbeta şexemî. <sup>32</sup>Ji Şîmîda malbeta şîmîdayî. Ji H'êfer malbeta h'êferî. <sup>33</sup>Lê kur'êd Silofh'adê H'êfer t'une bûn, t'enê qîzêd wî hebûn. Ev in navêd qîzêd Silofh'ad: Mah'la, Noha, H'ogla, Mîlk'a û T'îrsa. <sup>34</sup>Eva malbetêd Minaşe ne û h'esabêd wan jî 52700 nefş bûn.

<sup>35</sup>Ev in zar'êd Efrayîm malbetêd xweva: Ji Şût'elah' malbeta şût'elah'î. Ji Bek'ir malbeta bek'rî. Ji T'ah'an malbeta t'ah'anî. <sup>36</sup>Ev in zar'êd Şût'elah'. Ji E'ran malbeta e'ranî. <sup>37</sup>Eva malbetêd zar'êd Efrayîm in û h'esabê wan jî 32500 nefş bûn. Eva zar'êd Êsiv in malbetêd wanva.

<sup>38</sup>Ev in zar'êd Binyamîn malbetêd wanva: Ji Bela malbeta belî. Ji Aşbêl malbeta aşbêlî. Ji Ah'îram malbeta ah'îramî. <sup>39</sup>Ji Şîfûfam malbeta şîfûfamî. Ji H'ûfam malbeta h'ûfamî. <sup>40</sup>Ev in zar'êd Bela: Ard û Ne'man. Ji Ard malbeta ardî. Ji

Ne'man malbeta ne'manî. <sup>41</sup> Eva zar'êd Binyamîn in malbetêd xweva. H'esabê wan jî 45500 nefş bûn.

<sup>42</sup> Ev in zar'êd Dan malbetêd xweva: Ji Şûh'am malbeta şûh'amî. Eva malbeta Dan e anegorî malbetêd xwe. <sup>43</sup> H'esabê t'emamîya malbeta şûh'amî 64400 nefş bûn.

<sup>44</sup> Ev in zar'êd Aşêr malbetêd xweva: Ji Îmna malbeta îmnayî. Ji Îşwî malbeta îşwîyî. Ji Birîha malbeta birîhayî. <sup>45</sup> Ev in zar'êd Birîha: Ji H'eber malbeta h'eberî. Ji Malk'îyêl malbeta malk'îyêlî. <sup>46</sup> Navê qîza Aşêr jî Serax bû. <sup>47</sup> Eva malbetêd zar'êd Aşêr in. H'esabê wan jî 53400 nefş bûn.

<sup>48</sup> Ev in zar'êd Neftelî malbetêd xweva: Ji Yasyêl malbeta yasyêlî. Ji Gûnî malbeta gûnî. <sup>49</sup> Ji Yêser malbeta yêsrî. Ji Şîllêm malbeta şîllêmî. <sup>50</sup> Eva malbetêd Neftelî ne anegorî malbetêd xwe. H'esabê wan jî 45400 nefş bûn.

<sup>51</sup> H'esabê zar'êd Îsraêl 601730 nefş bûn.

<sup>52</sup> Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>53</sup> «Bira e'rd anegorî h'esabê navê wan çawa war bê p'arevekirinê. <sup>54</sup> K'oma mezinr'a war ze'fî bidê, k'oma biç'ûkr'a war hindikî bidê. Her kesîr'a anegorî h'esabê wan bira war bê dayîne. <sup>55</sup> T'enê bi p'eşk avîtinê bira e'rd bê p'arevekirinê. Anegorî navêd qebîlêd kal-bavêd wan ew bira war bistînin. <sup>56</sup> Bi p'eşk avîtinê bira war bê p'arevekirinê çawa yê mezinr'a usa jî yê biç'ûkr'a».

<sup>57</sup> Ev in lêwîyêd anegorî malbetêd xwe jimartî: Ji Gêrşon malbeta gêrşonî. Ji Qohat' malbeta qohat'î. Ji Mêrarî malbeta mêrarî. <sup>58</sup> Eva malbetêd lêwî ne: Malbeta lîbnî, malbeta hêbronî, malbeta mah'lî, malbeta mûşî, malbeta qoraxî. Qohat'r'a E'mram bû. <sup>59</sup> Lê navê jina E'mram Yok'ebed bû, qîza Lêwî ya ku Lêwîr'a li Misirê bibû. Ewê E'mramr'a Harûn, Mûsa û Meryema xûşka wan anîn. <sup>60</sup> Harûnr'a Nadab, Abîhû, Êlazar û Ît'amar bûn. <sup>61</sup> Lê Nadab û Abîhû mirin, gava wan şaş\* agir li ber Xudan dan. <sup>62</sup> H'esabê lêwî, h'emû qîsimê

\* 26:61 Binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 10:1-2.

nêrînî ji yekmehê jortir 23000 nefes bûn. Ew t'evî zar'êd Îsraêl ne hatine jimarê, çimkî nava zar'êd Îsraêl wanr'a war ne hate dayînê.

<sup>63</sup>Ev in zar'êd Îsraêlê ku Mûsa t'evî Êlazarê k'ahîn li deştêd Mowabêda, nêzîkî Êrdunê, pêşberî Erîhayê jimartin. <sup>64</sup>Lê li nava vanda qet merivek ji zar'êd Îsraêl t'une bû, ku Mûsa û Harûnê k'ahîn ber'îya Sînayêda ew jimartibûna. <sup>65</sup>Çimkî Xudan bona wan got: «Ewê e'se li ber'îyêda bimirin». Û tu kes ji wan ne ma, pêştirî K'alêbê kur'ê Yifûneh û Yêşûyê kur'ê Nûn.

### Qîzêd Silofh'ad

**27** Qîzêd Silofh'adê H'êferê kur'ê Gîle'dê Maxîrê kur'ê Minaşeyê ji malbeta Minaşeyê kur'ê Ûsiv hatin. Ev bûn navêd wan: Mah'la, Noha, H'ogla, Mîlk'a û T'îrsa. <sup>2</sup>Evana li ber Mûsa, Êlazarê k'ahîn, serwêra û temamiya civînê li ber derê Konê Civînê sekinîn û gotin: <sup>3</sup>«Bavê me ber'îyêda mir, lê ew ne nava wê k'omêda bû, k'îjan ku miqabilî Xudan civîya bûn, awa gotî civîna Qorax. Lê bona gunê xwe mir û kur'êd wî t'unebûn. <sup>4</sup>Çima navê bavê me ji nava malbeta wî gere bê hildanê, wekî kur'êd wî t'unene? Ji nava birayêd bavê me, milk' bide me». <sup>5</sup>Mûsa şixulê wan danî li ber Xudan.

<sup>6</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>7</sup>«Qîzêd Silofh'ad r'ast dibêjin. Milk' bide wan ji nava birayêd bavê wanda ku war bin, awa gotî warê bavê wan derbazî ser wan ke. <sup>8</sup>Û zar'êd Îsraêl'r'a xeber de, bêje: «Gava yek bimire û kur'ê wî t'une be, hingê warê wî bira derbazî qîza wî be. <sup>9</sup>Lê heger qîz jî t'une, hingê warê wî bidine birayêd wî. <sup>10</sup>Lê heger bira jî t'unene, hingê warê wî bidine apêd wî. <sup>11</sup>Lê heger ap jî t'unene, hingê warê wî bidine pismamê wîyî nêzîk ji malbeta wî ku ew lê war be. Bira ev bona zar'êd Îsraêl bibe qeyde-qanûna heqîyê, çawa ku Xudan e'mirî Mûsa kir».

### Yêşû cîyê Mûsa digire

<sup>12</sup>Xudan gote Mûsa: «Hilk'işe li ser vî ç'îyayê hanî ji ç'îya-banîyêd Abarîm û dîna xwe bide wî e'rdê ku ezê bidime zar'êd Îsraêl. <sup>13</sup>Û gava wî bibînî, hingê tê jî her'î bigihîjî cime'ta xwe, mîna Harûnê birê xwe. <sup>14</sup>Çimkî we ber'îya Sînêda guhdarîya min nekir, dema qalme-qalma civînê, ser avê we pîrozîya min li ber ç'e'vêd wan ne da k'ifşê». (Eva avêd Mêrîbahê ne li Qadêşê ber'îya Sînda).

<sup>15</sup>Mûsa Xudan'ra xeberda û got: <sup>16</sup>«Bira Xudan Xwedêyê r'uhê her bedenî li ser vê civînê'r'a merivekî k'ifş ke, <sup>17</sup>wekî r'êberîyê wan bike û ç'e'vê wî ser k'etin û derk'etina wan be, ku civîna Xudan nebe mîna pezê bê şivan». <sup>18</sup>Xudan gote Mûsa: «Xwer'a Yêşûyê kur'ê Nûn, merivê ku R'uhê min têda ye, hilde. Destê xwe dayne li ser wî, <sup>19</sup>wî li ber Êlazarê k'ahîn û li ber t'emamîya civînê bide sekinandin û li ber ç'e'vêd wan wî k'ifş ke. <sup>20</sup>Ji serwêrîya xwe bide wî ku t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl guh bide wî. <sup>21</sup>Ew gere li ber Êlazarê k'ahîn bisekine. Êlazarê bona wî qirara Ûrîm\* li ber Xudan bipirse. Anegorî wê qirarê ew gere derk'evin û anegorî wê ew gere bîn, ew û t'emamîya zar'êd Îsraêl awa gotî t'emamîya civînê». <sup>22</sup>Û Çawa ku Xudan e'mir li Mûsa kiribû, ewî usa jî kir. Ewî Yêşû hilda û ew li ber Êlazarê k'ahîn û t'emamîya civînê da sekinandinê. <sup>23</sup>Mûsa destêd xwe danîne li ser wî û ew k'ifş kir, çawa ku Xudan pê Mûsa gotibû.

### Dîyarîyaf t'evayîşewatêye her r'oj

**28** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«E'mirî zar'êd Îsraêl ke û bêje wan: «Haş ji xwe hebin ku qurbana min, nanê minî bona dîyarîya mine şewatêye bînxweş, we'deda bidin». <sup>3</sup>Û bêje wan: «Va ye dîyarîya şewatê ku hûn

\* <sup>27:21</sup> Ûrîm tê fe'm kirinê çawa «R'onayî». Pê vê serekk'ahîn<sup>f</sup> li qirara Xwedê dih'esîya. Binihêr'e Derk'etin 28:30.

gere Xudanr'a bidin: du berxêd yek salîye bê qusûr her r'oj, bona dîyarîya t'evayîşewatê her t'im bidin. <sup>4</sup>Berxekî sibehê bidin û berxê duda jî berê êvarê bidin <sup>5</sup>û çawa dîyarîya nanî p'areke ji deha p'arê êfayê\* arê xas, t'evî p'areke ji çar p'arê hînê\*\* r'ûnê lêdayîda, stirayî bide. <sup>6</sup>Eva dîyarîya t'evayîşewatêye her t'im e, mîna ya ku li ç'îyayê Sînayê Xudanr'a çawa dîyarîya şewatêye bînxweş hatibû dayînê. <sup>7</sup>Ev e dîyarîyaf serdakirina wê: P'areke ji çar p'arê hînê şerav bona her berxî li cîyê pîroz çawa dîyarîya serdakirinê bira Xudanr'a bê r'êtinê. <sup>8</sup>Berxa duda t'evî dîyarîya nanî û t'evî dîyarîya serdakirinê mîna ya sibehê li berê êvarê bidin. Wê çawa dîyarîya şewatêye bînxweş Xudanr'a bidin.

### Dîyarîya t'evayîşewatêye r'ojaf şemîyê

<sup>9</sup>Li r'oja şemîyê du berxêd yek salîye bê qusûr t'evî p'areke çapêye\* ji deha dudu arê xasî r'ûnda stirayî çawa dîyarîya nanî û dîyarîya wêye serdakirinê bidin. <sup>10</sup>Eva dîyarîya t'evayîşewatêye her şemî ye, li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a.

### Dîyarîya t'evayîşewatêye her meh

<sup>11</sup>Serê her mehêd xwe Xudanr'a çawa dîyarîya t'evayîşewatê: Du canega, beranekî, h'eft berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>12</sup>P'areke çapêye ji deha sisê arê xasî r'ûnda stirayî bona her canegakî, çawa dîyarîya nanî û p'areke çapêye ji deha dudu arê xasî r'ûnda stirayî bona berên çawa dîyarîya nanî bidin. <sup>13</sup>P'areke çapêye ji deha yek arê xasî r'ûnda stirayî bona her berxî çawa dîyarîya nanî bidin. Eva dîyarîya t'evayîşewatêye bînxweşe, dîyarîya şewatê ye Xudanr'a.

\* 28:5 «Êfayê» derdanekî 10 lîtirê bû.

\*\* 28:5 «Hînek» nêzîkî çar lîtira ye.

\* 28:9 «Çap» derdaneke 10 lîtirê bû.

<sup>14</sup>Eva dîyarîya serdakirina wê ye: Nîv hîn şerav bona canegê, p'areke hînê ji sisîya yek bona berên û p'areke hînê ji çara yek bona berxê bidin. Eva dîyarîya t'evayîşewatêye mehê ye bona her mehê salê. <sup>15</sup>Nêrîkî bona dîyarîya paqijbûnê Xudanr'a bidin, li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a.

### Cejina<sup>f</sup> Derbazbûnê

<sup>16</sup>Çardehê meha yekê r'oja Cejina Derbazbûnê ye bona Xudan. <sup>17</sup>Û panzdehê wê mehê jî cejin e. H'eft r'oja hûn gere nanê şkeva bixwin. <sup>18</sup>R'oja e'wlin civata pîroz e, t'u şixulî nekin. <sup>19</sup>Dîyarîya şewatê, dîyarîya t'evayîşewatê Xudanr'a bidin, awa gotî, du canega, beranekî û h'eft berxêd yeksalî. Ew gere bê qusûr bin. <sup>20</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî ji arê xasî r'ûnda t'evdayî. P'areke çapêye ji deha sisê bona canega û p'areke çapêye ji deha dudu bona berên, <sup>21</sup>p'areke çapêye ji deha yek bona wan her h'eft berxî bidin. <sup>22</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê bona afûkirina xwe bidin. <sup>23</sup>Vê gere li ser dîyarîya t'evayîşewatêye sibehêr'a, awa gotî dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a bidin. <sup>24</sup>Her r'oj ji wan h'eft r'oja ha bikin. Ev nanê dîyarîya şewatêyî bînxweş e Xudanr'a. Wê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin. <sup>25</sup>Û r'oja h'efta dîsa wer'a civata pîroz be. T'u şixulî nekin.

### Cejina<sup>f</sup> H'eftîya

<sup>26</sup>Li r'oja deremetêd pêşin jî gava hûn dîyarîya nanê e'wlin Xudanr'a wextê Cejina H'eftîya bînin, bira wer'a dîsa civata pîroz be, t'u şixulî nekin. <sup>27</sup>Hûn gere dîyarîya t'evayîşewatê çawa dîyarîya bînxweş Xudanr'a bidin, awa gotî: Du canega, beranekî û h'eft berxêd yek salî. <sup>28</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanîye ji arê xasî r'ûnda stirayî: P'areke çapêye ji deha sisê bona her canegayî, p'areke çapêye ji deha dudu jî bona berên, <sup>29</sup>p'areke çapêye ji deha yek jî

bona her h'eft berxa bidin. <sup>30</sup>Nêrîkî jî bona k'ewardina xwe bidin. <sup>31</sup>Vê û dîyarîya wêye serdakirinê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye nanîr'a bidin. Ew gere bê qusûr bin.

### Dîyarîya Cejinaf Bor'îya

**29** Yekê meha h'efta bona we bira civîna pîroz be, t'u şixulî nekin. Bira ew r'oja bor'î lêdanê be. <sup>2</sup>Canegakî, beranekî û h'eft berxêd yeksalîye bê qusûr Xudanr'a dîyarîya t'evayîşewatêye bînxweş bidin. <sup>3</sup>Usa jî dîyarîya wanef nanî ji arê xasî r'ûnda stirayî. P'areke çapêye\* ji deha sisê bona canega, p'areke çapêye ji deha dudu bona berên, <sup>4</sup>P'areke çapêye ji deha yek jî bona her berxê ji her h'eft berxa bidin. <sup>5</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîyaf paqîjbûnê bona afûbûna xwe bidin. <sup>6</sup>Vana li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her mehêr'a û dîyarîya wêye nanîr'a, dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wane serdakirinêr'a anegorî qanûnê bidin. Eva dîyarîya şewatêye bînxweş e Xudanr'a.

### Dîyarîya dehê meha h'efta

<sup>7</sup>Dehê meha h'efta jî bona we bira civîna pîroz be, nefsa xwe bişkênin û t'u şixulî nekin. <sup>8</sup>Canegakî, beranekî û h'eft berxêd yeksalîye bê qusûr Xudanr'a dîyarîya t'evayîşewatêye bînxweş bidin. <sup>9</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî ji arê xasî r'ûnda t'evdayî. P'areke çapêye ji deha sisê bona canega, p'areke çapêye ji deha dudu bona berên. <sup>10</sup>P'areke çapêye ji deha yek jî bona her berxê ji wan her h'eft berxa bidin. <sup>11</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqîjbûnê li ser dîyarîya paqîjbûnêye k'ewardinêr'a\*, dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a û dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wane serdakirinêr'a bidin.

\* 29:3 «Çap» derdaneke 10 lîtirê bû.

\* 29:11 Binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 16.

### Cejinaf H'olikçêkirinê

<sup>12</sup>Panzdehê meha h'efta jî bona we bira civîna pîroz be, t'u şixulî nekin û h'eft r'oja Xudanr'a cejinê bikin. <sup>13</sup>Dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş Xudanr'a bidin: Sêzdeh canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>14</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî ji arê xasî r'ûnda stirayî: Wan sêzdeh canegar'a her yekêr'a p'areke çapêye ji deha sisê, wan her du beranar'a her yekêr'a p'areke çapêye ji deha dudu, <sup>15</sup>wan çardeh berxar'a her yekêr'a p'areke çapêye ji deha yek bidin. <sup>16</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>17</sup>Li r'oja duda: Donzdeh canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>18</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>19</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wane serdakirinêr'a bidin.

<sup>20</sup>Li r'oja sisîya: Yanzdeh canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>21</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>22</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>23</sup>Li r'oja çara: Dehe canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>24</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>25</sup>Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>26</sup>Li r'oja pêncê: Nehe canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>27</sup>Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û

berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>28</sup> Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>29</sup> Li r'oja şeşa: H'eyşt canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>30</sup> Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>31</sup> Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>32</sup> Li r'oja h'efta: H'eft canega, du berana û çardeh berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>33</sup> Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canega, berana û berxa anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>34</sup> Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

### R'oja h'eyšta

<sup>35</sup> R'oja h'eyšta bira bona we civîna pîroz be, tu şixulî nekin. <sup>36</sup> Dîyarîya t'evayîşewatê, dîyarîya şewatêye bînxweş Xudanr'a bidin: Canegakî, beranekî û h'eft berxêd yeksalîye bê qusûr bidin. <sup>37</sup> Û usa jî dîyarîya wane nanî, dîyarîya wane serdakirinê bona canegê, beran û berxê anegorî h'esabê wan û qanûnê bidin. <sup>38</sup> Usa jî nêrîkî çawa dîyarîya paqijbûnê li ser dîyarîya t'evayîşewatêye her t'imr'a, dîyarîya wêye nanîr'a û dîyarîya wêye serdakirinêr'a bidin.

<sup>39</sup> Van bona Xudan cejinêd xweda çawa dîyarîyêd xweye t'evayîşewatê, dîyarîyêd xweye nanî, dîyarîyêd xweye serdakirinê û dîyarîyêd xweye heleqetîyê li ser sozêd xwer'a û dîyarîyêd xweye r'ezedilîyêr'a bidin». <sup>40</sup> Mûsa h'emû çî ku Xudan e'mirî li wî kiribû, gote zar'êd Îsraêl.

### Ad-qirar

**30** Mûsa serwêrêd qebîlêd zar'êd Îsraêlr'a xeberda û got: «Ev e xebera ku Xudan e'mir kir: <sup>2</sup>«Gava mêrek li ber Xudan ad-qirar bike yan sond bixwe ku borcekî hilde li ser xwe, ew gere îdî xebera xwe net'er'îbîne, lê her tişt çî ku ji devê wî derk'etîye, gerekê bîne sêrî.

<sup>3</sup>Lê gava jinek li mala bavê xwe, cahiltîya xweda li ber Xudan ad-qirar ke ku borcekî hilde li ser xwe <sup>4</sup>û bavê wê jî bona ad-qirar û borcê wêyî hildayî li ser xwe bibihê, dengê xwe neke, hingê h'emû ad-qirarêd wê û h'emû borcê hildayîye li ser xwe, dimînin. <sup>5</sup>Lê heger bavê wê li wê r'oja ku bibihê îzina wê nede, hingê h'emû ad-qirarêd wê û borcêd wêye li ser, r'esît dibin. Xudan wê bibaxşîne wê, çimkî bavê wê îzin ne daye wê.

<sup>6</sup>Lê heger ew mêr ke û ad-qirarêd wê û xeberêd devê wêye bê h'emdê xwe gotî, li ser wê ne, <sup>7</sup>li wê r'oja ku mêrê wê bibihê û dengê xwe neke, hingê ad-qirarêd wê û borcê wêye hildayî li ser xwe, dimînin. <sup>8</sup>Lê heger mêrê wê bibihê û xût wê r'oje îzina wê nede, hingê ew r'esît dike ad-qirarê li ser wê û xeberêd devê wêye bê h'emdê xwe gotî. Xudan wê bibaxşîne wê.

<sup>9</sup>Lê ad-qirarê jinebîyê yan mêrberdayê, her borcê ku wê hilda ye li ser xwe, li ser wê bimîne.

<sup>10</sup>Lê heger jinek li mala mêrê xweda ad-qirar kirîye yan borc bi sond hilda ye li ser xwe, <sup>11</sup>mêrê wê bibihê, dengê xwe neke û îzina wê bide, hingê h'emû ad-qirarêd wê û h'emû borcêd wê li ser wê bimînin. <sup>12</sup>Lê gava mêrê wê li r'oja ku bibihê, wan r'esît ke, hingê h'emû tişt çî ku ji devê wê derk'etîye, awa gotî ad-qirarêd wê û borcêd wêye li ser wê, h'ukumê wan t'une. Mêrê wê ew r'esît kirin û Xudan wê bibaxşîne wê.

<sup>13</sup>Mêr dikare mak ke yan jî r'esît ke wan h'emû ad-qirar û borcêd sondxwarîye ku bona nefsa xwe şkênandinê kirîye.

<sup>14</sup>Lê heger mêrê wê, wê r'ojê dengê xwe neke, bi wê yekê ew h'emû ad-qîrarêd wê û h'emû borcêd li ser wê mak dike. Çimkî li r'oja ku wî bihîstîye dengê xwe nekirîye. <sup>15</sup>Lê heger ew paşî bihîstina xwe r'esît ke, hingê ewê dewsa wê sûcdar be».

<sup>16</sup>Ev in qeyde-qanûnêd ku Xudan e'mirî li Mûsa kirin, bona mêr û jina wî, bona bav û qîza wî, cahiltîya wêda li mala bavê xweda.

### Şer'ê miqabilî Midyanîya

**31** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«H'eyfa zar'êd Îsraêl ji midyanîya hilde, paşê her'e bigihîje cime'ta xwe». <sup>3</sup>Mûsa gote milet: «Mêra ji nava xwe bona şêr' hazir kin ku ew miqabilî midyanîya şer' bikin, h'eyfa Xudan ji Midyanîya hildin. <sup>4</sup>H'ezar mêrî ji her qebîlêd Îsraêl bişînine şêr'». <sup>5</sup>Donzdeh h'ezar mêr ji ordîyêd Îsraêl hatine hazirkirinê bona şêr', ji her qebîlê h'ezarek. <sup>6</sup>Mûsa ji her qebîlê h'ezarek şandine şêr'. T'evî wan Pînhasê kur'ê Êlazarê k'ahîn jî şand, ku tiştêd pîroz û bor'îyêd hewarê dêstda bûn. <sup>7</sup>Ew miqabilî Midyanê çûne şêr', çawa ku Xudan e'mirî li Mûsa kir û h'emû mêr kuştin. <sup>8</sup>Û li ser wanr'a pênc p'adşêd Midyanê kuştin: Êwî, R'eqem, Sûr, Hûr û R'eba. Wana usa jî Bilamê kur'ê Beûr bi şûr kuşt. <sup>9</sup>Zar'êd Îsraêl jin û zar'ê midyanîya hêsîr hildan. H'emû h'eywanêd wan, pez-dewarêd wan û h'emû hebûka wan t'alan birin. <sup>10</sup>Û h'emû bajarêd wane li cî-warêd wan, h'emû zomêd ordîyêd wan şewitandin, <sup>11</sup>lê h'emû t'alan û h'emû çi ku zeft kiribûn, ji mêriv h'eta h'eywên xwer'a birin. <sup>12</sup>Wana hêsîrêd hildayî û t'alan anîne zomê cem Mûsa, Êlazarê k'ahîn û t'emamîya civîna zar'êd Îsraêl, li deştêd Mowabê, nêzîkî Ûrdunê, pêşberî Erîhayê.

<sup>13</sup>Hingê Mûsa, Êlazarê k'ahîn û h'emû serwêrêd civînê ji zomê der derk'etine pêşîya wan. <sup>14</sup>Mûsa hêrsa xwe li sereskera, serh'ezara û sersedêd ku ji şêr' vege'îya bûn r'akir. <sup>15</sup>Mûsa gote wan: «We h'emû jin sax hiştine? <sup>16</sup>Ne

wana bi xebera Bilam kirin ku zar'êd Îsraêl li ber Xudan bête'silîyê bikin, r'ûyê P'ihorda\* bela hate serê civîna Xudan. <sup>17</sup>Niha, h'emû zar'êd qisimê nêrîn û h'emû jinêd ku serê xwe mêrar'a danîne bikujin, <sup>18</sup>lê h'emû qîzêd cahile ku serê xwe mêrar'a danenîne, bona xwe sax bihêlin. <sup>19</sup>Lê hûn h'eft r'oja ji zomê der bimînin. Her kesê ku merî kuştîye, her kesê ku cinyaz k'etîye, li r'oja sisîya û r'oja h'efta xwe paqij kin, hûn û hêsîrêd we. <sup>20</sup>H'emû k'inc, h'emû tiştêd ç'ermîn, h'emû tiştêd ji pir'ç'a bizinê çêkirî û h'emû tiştêd darîn paqij kin».

<sup>21</sup>Êlazarê k'ahîn gote eskerêd ku çûbûne şêr': «Ev e qeyde-qanûna wê hînkirina ku Xudan e'mir li Mûsa kir: <sup>22</sup>T'enê zêr', zîv, sifir, h'esin, qila û lihêm, <sup>23</sup>her tişt çi ku agirda naşewite gerekê li nava agirr'a derbazkin û ewê paqij be, lê dîsa gere bi ava paqijbûnê jî bê paqijkirinê. Çi jî ku agirda dişewite, gere li nava avêr'a derbaz kin. <sup>24</sup>Û li r'oja h'efta k'incêd xwe bişon, hingê hûnê paqij bin, peyr'a hûn dikarin bik'evine zomê».

<sup>25</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>26</sup>«Tu t'evî Êlazarê k'ahîn û serwêrêd malbetêd civînê, yêd hêsîr hildayî ji mêriv h'eta h'eywên bijmire. <sup>27</sup>Û t'alên li nava eskerêd ku çûbûne şêr' û t'emamîya civînê p'areveke. <sup>28</sup>Ji p'ara eskerêd ku çûbûne şêr' Xudan'a xerc hilde: Ji pênsid hêsîrî yek, usa jî ji pêz-dêwêr û ji k'era. <sup>29</sup>Ji p'ara wan hilde û bide Êlazarê k'ahîn çawa dîyarî Xudan'a. <sup>30</sup>Lê ji p'ara zar'êd Îsraêl, ji pêncî hêsîrî yekê, usa jî ji pêz-dêwêr, ji k'era ji h'emû h'eywanî hilde û wan bide lêwîyê ku xweyîtîya P'aristgeha Xudan dikan».

<sup>31</sup>Mûsa û Êlazarê k'ahîn usa jî kirin, çawa ku Xudan e'mirî Mûsa kiribû. <sup>32</sup>T'emamîya h'esabê t'alan, awa gotî çi ku esker zeft kiribû, ev bû: <sup>33</sup>72000 dewar, <sup>34</sup>61000 k'er, <sup>35</sup>32000 jî qîzêd ku serê xwe mêrr'a danenîbûn.

\* 31:16 Binihêr'e Jimar 25:1-3.

<sup>36</sup>Nîvê wê, awa gotî p'ara yêd ku çûbûne şêr', ev bû: 337500 pez, <sup>37</sup>û ji vê 675 çawa xerc dane Xudan. <sup>38</sup>36000 dewar û ji wan 72 çawa xerc dane Xudan. <sup>39</sup>30500 k'er û ji wan 61 çawa xerc dane Xudan. <sup>40</sup>16000 merî û ji wan 32 çawa xerc dane Xudan. <sup>41</sup>Mûsa ev xercê dîyarîya Xudan dane Êlazarê k'ahîn, çawa ku Xudan e'mirî li Mûsa kiribû.

<sup>42</sup>Nîvê wê p'ara zar'êd Îsraêl, k'îjan ku Mûsa ji p'ara yêd çûbûne şêr' derxistibû, <sup>43</sup>haqas bû p'ara civînê: 337000 pez, <sup>44</sup>36000 dewar, <sup>45</sup>30500 k'er, <sup>46</sup>16000 merî bûn. <sup>47</sup>Mûsa ji p'ara zar'êd Îsraêl, awa gotî yek ji pêncîyî, ji mêriv û ji h'eywên hilda û da lêwîyê ku xweyîtiya P'aristgeha Xudan dikin. Çawa ku Xudan e'mirî li Mûsa kir.

<sup>48</sup>Sereskerê ser serh'ezara û serseda nêzîkî Mûsa bûn <sup>49</sup>û gotine Mûsa: «E'vdêd te eskerêd ku em serwêrîyê li wan dikin, me ew jimirîn û awa t'u kes ji wan unda nebûye. <sup>50</sup>Va ye em bona k'ewardina nefsa xwe li ber Xudan vê dîyarîyê Xudanr'a didin, k'ê çi tiştêd zêr'în dît: Bazinê ser mil, bazin, gustîl, guhar û xişir be». <sup>51</sup>Mûsa û Êlazarê k'ahîn ev zêr', h'emû tiştêd neqîşandî ji wan hildan. <sup>52</sup>H'emû zêrê ku serh'ezara û serseda dîyarî Xudan kirin, 16750 şêkil\* bû. <sup>53</sup>Eskera her kesî t'alanê xwe hilda bû. <sup>54</sup>Mûsa û Êlazarê k'ahîn zêr' ji serh'ezara û serseda hildan û anîne li Konêf Civînê, çawa bîranîn bona zar'êd Îsraêl li ber Xudan.

### Warbûna li e'rdê Gîle'dê

**32** H'eywanêd zar'êd R'ûbên û zar'êd Gad gelek bûn. Wana e'rdê Yazêr û e'rdê Gîle'dê dît va ye ew e'rdekî r'ind bû bona h'eywên. <sup>2</sup>Hingê zar'êd R'ûbên û zar'êd Gad hatin li cem Mûsa, Êlazarê k'ahîn<sup>f</sup> û serwêrêd civînê û gotin: <sup>3</sup>«E'rdê E't'erotê, Dîbonê, Yazêrê, Nîmrayê, H'eşbonê, Elalêyê, Sivamê, Neboyê û Bihonê <sup>4</sup>ku Xudan bona civîna

\* 31:52 «Şêkil» nêzîkî 12 girama bû.

Îsraêl zeft kir, ew e'rdekî r'ind e bona h'eywên û h'eywanêd e'vdêd te hene». <sup>5</sup>Wana dîsa got: «Heger me li ber ç'e'vêd te k'erem dît, bira ev e'rdê hanê e'vdêd ter'a çawa milk' bê dayînê. Me li Êrdunêr'a derbaz neke».

<sup>6</sup>Mûsa gote zar'êd R'ûbên û zar'êd Gad: «Birayêd we her'ine şêr', hûnê jî li vir bimînin? <sup>7</sup>Çima hûn dilê zar'êd Îsraêl sist dikin ku derbaz nebine li e'rdê ku Xudan da wan? <sup>8</sup>Bavêd we usa kirin, gava min ew ji Qadêş-Barnêayê şandine ce'sûsîya vî e'rdî bikin. <sup>9</sup>Ew gihîştine newala Eşk'olê, ew e'rd dîtin û dilêd zar'êd Îsraêl sist kirin ku derbaz nebine li e'rdê ku Xudan dide wan. <sup>10</sup>Û wê r'ojê hêrsa Xudan r'abû, wî sond xwar û got: <sup>11</sup>«T'u kesê ji wan, yêd ku ji Misirê derketine, ji bîstsalîyê jortir, wî e'rdê ku min sond xwar ku bidime Birahîm, Îshaq û Aqûb nabînin. Çimkî wana t'am gur'a min nekir. <sup>12</sup>Xêncî K'alêbê kur'ê Yifûnehêyê qinîzî û Yêşûyê kur'ê Nûn, çimkî wana t'am gur'a Xudan kir. <sup>13</sup>Hingê hêrsa Xudan li Îsraêl r'abû û Xudan ew çil salî ber'îyêda ger'andin, h'eta qir'a t'emamîya wî nisilê ku xirabî li ber ç'e'vê Xudan kir ne hat. <sup>14</sup>Va ye, hûn, nisilê gunek'ar, dewsa bavêd xwe r'abûne ku hêrsa Xudan hê ze'f li ser Îsraêl r'akin! <sup>15</sup>Heger hûn ji r'îya Xudan dager'in, hingê ewê Îsraêl dîsa li ber'îyêda bihêle û hûnê t'emamîya vî miletî unda kin».

<sup>16</sup>Ew nêzîkî Mûsa bûn û gotinê: «Emê li vir axila bona h'eywanêd xwe û bajara bona zar'êd xwe çêkin, <sup>17</sup>emê xwexa jî ç'ekêd xwe girêdin, hazir bin ku pêşîya zar'êd Îsraêlva her'in, h'eta em wan nebine li cîyêd wan. Zar'êd me jî bira li bajarêd sûrkirîda bimînin, bona bêxofîyê ji binelîyêd vî e'rdî. <sup>18</sup>Em venager'ine malêd xwe, h'eta zar'êd Îsraêl her kes li milk'ê xwe war nebe. <sup>19</sup>Em t'evî wan li wî alî Êrdunê û wêda cî war nabin, çimkî warê me li vî alî Êrdunê, alîyê r'ohilatê ye».

<sup>20</sup>Mûsa gote wan: «Heger hûn vê yekê bikin, bi ç'ek pêşîya Xudanva her'ine şêr', <sup>21</sup>her kes ji we ç'ek girêdayî li ber Xudan Êrdunêr'a derbaz be, h'eta Xudan ji ber xwe dijminêd xwe

r'aneqetîne <sup>22</sup>û e'rd bi xwestina Xudan bê zeftkirinê, paşî hingê paşda veqer'in. Hûnê hingê li ber Xudan û Îsraêl bê sûc bin û ev e'rdê li ber Xudan bibe warê we. <sup>23</sup>Lê heger hûn usa nekin hûn li ber Xudan gune dikin. Bizanibin hûnê bona vî gunê xwe bêne cezakirinê. <sup>24</sup>Bajara bona zar'êd xwe û axila bona pezêd xwe çêkin, lê çi jî ku ji devê we derk'etîye bikin».

<sup>25</sup>Zar'êd Gad û zar'êd R'ûbên Mûsar'a xeberdan û gotin: «E'vdêd te wê usa bikin çawa ku xweyê me e'mir dike. <sup>26</sup>Jin-zar'êd me, pez-dewarêd me û h'emû h'eywanêd me wê li wir bimînin, awa gotî li bajarêd Gîle'dda, <sup>27</sup>lê e'vdêd te, h'emûyêd şêr'r'a hazir, wê li ber Xudan bona şêr' derbaz bin, çawa ku xweyê me dibêje».

<sup>28</sup>Mûsa bona wan e'mirî Êlazarê k'ahîn, Yêşûyê kur'ê Nûn û serwêrêd malbetêd qebîlêd zar'êd Îsraêl kir <sup>29</sup>û Mûsa gote wan: «Heger zar'êd Gad û zar'êd R'ûbên t'evî we Êrdunêr'a derbaz bin, h'emû li ber Xudan şêr'r'a hazir bin û ew e'rd destêd weda be, hingê e'rdê Gîle'd çawa milk' bidine wan. <sup>30</sup>Lê heger ew t'evî we ç'ekêd xwe girêdayî derbaz nebin, hingê ewê milk' t'evî we li e'rdê Kenanêda bistînin». <sup>31</sup>Zar'êd Gad û zar'êd R'ûbên veqer'andin û gotin: «Çawa ku Xudan gote e'vdêd te emê usa jî bikin. <sup>32</sup>Emê li ber Xudan ç'ek girêdayî derbaz bine li e'rdê Kenanê, t'enê bira warê milk'ê me vî alîyê Êrdunê be».

<sup>33</sup>Mûsa p'adşatîya Sîxonê p'adşê emorîyaf, p'adşatîya Ogê p'adşê Başanê, e'rd, bajarêd wê sînorê wanva awa gotî h'emû e'rd bajarava dane zar'êd Gad, zar'êd R'ûbên û nivê qebîla Minaşeyê kur'ê Êsiv. <sup>34</sup>Zar'êd Gad Dîbon, E't'erot, E'rohêr, <sup>35</sup>E't'rot-Şofan, Yazêr, Yogboha, <sup>36</sup>Bêt'-Nîmra, Bêt'-Haran, bajarêd sûrkirî çêkirin, usa jî axilêd pêz. <sup>37</sup>Zar'êd R'ûbên H'eşbon, Elalê, Qîryatayîm <sup>38</sup>usa jî Nebo û Bae'l-Mihon, navêd k'îjana hatibûne guhastinê û Sîvma çêkirin. Navêd nû danîne li ser bajarêd ku çêkiribûn. <sup>39</sup>Zar'êd Maxîrê kur'ê Minaşe jî çûne Gîle'dê, ew zeft kirin û berî emorîyê ku li wir

diman, dan. <sup>40</sup>Hingê Mûsa Gîle'd da Maxîrê kur'ê Minaşe û ew li wir cî-war bû. <sup>41</sup>Yaîrê kur'ê Minaşe jî çû gundêd wê zeft kirin û navêd wan danî H'avot Yaîr\*. <sup>42</sup>Novah' çû Qinat gundêd wêva zeft kir û navê xwe, Novah', danî ser.

### R'êwîtîya Îsraêl ji Misirê li Mowabf

**33** Ev in firarîyêd zar'êd Îsraêle ku ordîyêd xweva ji welatê Misirê, bi serwêrîya Mûsa û Harûn derk'etin. <sup>2</sup>Mûsa her cîyêd r'êk'etina firarîyêd wan anegorî xebera Xudan nivîsî. Ev in r'êwîtîyêd wane anegorî cîyêd r'êk'etina wan.

<sup>3</sup>Panzdehê meha yekê, r'oja Cejîna Derbazbûnêye da, ew ji R'amsês r'êk'etin. Zar'êd Îsraêl bi mêrk'îmî li ber ç'e'vêd t'emamîya misirîya derk'etin. <sup>4</sup>Misirîya jî hingê h'emû nixurîyêd ku Xudan qir' kiribû, ç'e'l dikirin. Xudan dîwana xwedêyêd wan kir. <sup>5</sup>Hingê zar'êd Îsraêl ji R'amsêsê r'êk'etin û li Sûkotê zomêd xwe lêdan. <sup>6</sup>Ji Sûkotê r'êk'etin û li Êt'amê ku xilazîya ber'îyê ye, zomêd xwe lêdan. <sup>7</sup>Ji Êt'amê r'êk'etin û vege'îyane li Pî-Hahîrot'ê ku pêşberî Bae'l-Siponê ye û pêşberî Mîgdolê zomêd xwe lêdan. <sup>8</sup>Ji Pî-Hahîrot'ê r'êk'etin, li nava be'rêr'a derbazî ber'îyê bûn. Sê r'oja ber'îya Êt'amr'a çûn û li Marahê zomêd xwe lêdan. <sup>9</sup>Ji Marahê r'êk'etin, hatine Êlîmê. Li Êlîmê donzdeh kanî û h'eftê darêd xurma hebûn, wana li wir zomêd xwe lêdan. <sup>10</sup>Ji Êlîmê r'êk'etin û devê Be'ra Sor zomêd xwe lêdan. <sup>11</sup>Ji Be'ra Sor r'êk'etin û li ber'îya Sînêda zomêd xwe lêdan. <sup>12</sup>Ji ber'îya Sînê r'êk'etin û li Dofqayê zomêd xwe lêdan. <sup>13</sup>Ji Dofqayê r'êk'etin û li Alûşê zomêd xwe lêdan. <sup>14</sup>Ji Alûşê r'êk'etin û li R'ifîdîmê zomêd xwe lêdan. Li wir av t'une bû ku cime'tê vexwara. <sup>15</sup>Ji R'ifîdîmê r'êk'etin û li ber'îya Sînayêda zomêd xwe lêdan. <sup>16</sup>Ji ber'îya Sînayê r'êk'etin û li Qîbrot-Hat'awayê zomêd xwe lêdan. <sup>17</sup>Ji Qîbrot-Hat'awayê r'êk'etin û li H'asêrotê zomêd

\* 32:41 Bi zimanê îbranî «Wargehêd Yaîr».

xwe lêdan. <sup>18</sup> Ji H'asêrotê r'êk'etin û li R'etmayê zomêd xwe lêdan. <sup>19</sup> Ji R'etmayê r'êk'etin û li R'immon-Peresê zomêd xwe lêdan. <sup>20</sup> Ji R'immon-Peresê r'êk'etin û li Lîvnayê zomêd xwe lêdan. <sup>21</sup> Ji Lîvnayê r'êk'etin û li R'îssayê zomêd xwe lêdan. <sup>22</sup> Ji R'îssayê r'êk'etin û li Qihêlat'ayê zomêd xwe lêdan. <sup>23</sup> Ji Qihêlat'ayê r'êk'etin û li ç'îyayê Şefer zomêd xwe lêdan. <sup>24</sup> Ji ç'îyayê Şefer r'êk'etin û li H'aradayê zomêd xwe lêdan. <sup>25</sup> Ji H'aradayê r'êk'etin û li Maqhêlotê zomêd xwe lêdan. <sup>26</sup> Ji Maqhêlotê r'êk'etin û li T'ah'atê zomêd xwe lêdan. <sup>27</sup> Ji T'ah'atê r'êk'etin û li Têrahê zomêd xwe lêdan. <sup>28</sup> Ji Têrahê r'êk'etin û li Mît'qayê zomêd xwe lêdan. <sup>29</sup> Ji Mît'qayê r'êk'etin û li Haşmonayê zomêd xwe lêdan. <sup>30</sup> Ji Haşmonayê r'êk'etin û li Mosêrotê zomêd xwe lêdan. <sup>31</sup> Ji Mosêrotê r'êk'etin û li Binê-Yahakanê zomêd xwe lêdan. <sup>32</sup> Ji Binê-Yahakanê r'êk'etin û li H'or-Hagîdgadê zomêd xwe lêdan. <sup>33</sup> Ji H'or-Hagîdgadê r'êk'etin û li Yotbat'ayê zomêd xwe lêdan. <sup>34</sup> Ji Yotbat'ayê r'êk'etin û li E'vronayê zomêd xwe lêdan. <sup>35</sup> Ji E'vronayê r'êk'etin û li Esyon-Geberê zomêd xwe lêdan. <sup>36</sup> Ji Esyon-Geberê r'êk'etin û li ber'îya Sînda, awa gotî Qadêşda zomêd xwe lêdan. <sup>37</sup> Ji Qadêşê r'êk'etin û li ç'îyayê Horê, xilazîya e'rdê Edomêf, zomêd xwe lêdan.

<sup>38</sup> Çil salê zar'êd Îsraêl bûn ku ji e'rdê Misirê derk'etibûn, yekê meha pênca, Harûnê k'ahîn anegorî xebera Xudan hilk'işîya li ser ç'îyayê Horê û li wir mir. <sup>39</sup> Harûn sed bîst sê salî bû gava li ser ç'îyayê Horê mir.

<sup>40</sup> P'adşê E'radêyî kenanî ku li Necefêf, e'rdê kenanîyadaf dima, bona hatina zar'êd Îsraêl bihîst\*. <sup>41</sup> Zar'êd Îsraêl jî ji ç'îyayê Hor r'êk'etin û li Salmonayê zomêd xwe lêdan. <sup>42</sup> Ji Salmonayê r'êk'etin û li Pûnonê zomêd xwe lêdan. <sup>43</sup> Ji Pûnonê r'êk'etin û li Ovot'ê zomêd xwe lêdan. <sup>44</sup> Ji Ovot'ê r'êk'etin û li Îyê-Hahabarîmê li ser sînore Mowab zomêd xwe lêdan.

\* 33:40 Binihêr'e Jimar 21:1-3.

<sup>45</sup> Ji Îyîmê\* r'êk'etin û li Dîbon-Gadê zomêd xwe lêdan. <sup>46</sup> Ji Dîbon-Gadê r'êk'etin û li E'lmon-Dîvlat'aymayê zomêd xwe lêdan. <sup>47</sup> Ji E'lmon-Dîvlat'aymayê r'êk'etin û li ser ç'îyayêd Abarîm, pêşberî Nebo zomêd xwe lêdan. <sup>48</sup> Ji ç'îyayêd Abarîm r'êk'etin û li deştêd Mowabêda, nêzîkî Êrdunê, pêşberî Erîhayê zomêd xwe lêdan. <sup>49</sup> Ê li ber Êrdunê, ji Bêt'-Haşîmot'ê h'eta Abêl-Haşîtîmê li deştêd Mowabda zomêd xwe lêdan.

### Warbûna li e'rdê Kenanê

<sup>50</sup> Li deştêd Mowabêda, ber Êrdunê, pêşberî Erîhayê Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>51</sup> «Zar'êd Îsraêl'r'a xeber de û bêje wan: «Gava hûn Êrdunê'r'a derbazî e'rdê Kenanê bin, <sup>52</sup> hingê ji ber xwe berî h'emû binelîyêd wî e'rdî din û h'emû şikilêd h'eykelêd wan û h'emû h'eykelêd wanî r'okirî hûrdexweşî kin, h'emû hêlanêd<sup>f</sup> wane jorin wêran kin. <sup>53</sup> Wî e'rdî xwer'a bikine milk', li wir bijîn, çimkî ez wî e'rdî didime we ku lê war bin. <sup>54</sup> Bi p'eşk avîtinê hûnê ji wî e'rdî, anegorî malbetêd xwe, p'ar bistînin. Malbeta mezin wê ze'f bistîne, ya biç'ûk wê hindik bistîne, k'êr'a k'îderê bik'eve ewê jî bibe p'ara wî. Anegorî qebîlêd bavêd xwe xwer'a war hildin. <sup>55</sup> Lê heger hûn ji ber xwe berî binelîyêd wî e'rdî nedin, hingê ewêd ku hûn sax bihêlin wê bibine mîna stirûyêd ç'e'vêd weda û mîna dirêşa li tenîšta weda. Ê ewê we li ser e'rdê ku hûnê bijîn, bizêrînin. <sup>56</sup> Hingê ezê usa bînime serê we, çawa ku min dixwest banîya serê wan»».

### Sînorêd e'rdê sozdayî

**34** Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup> «E'mir li zar'êd Îsraêl ke û bêje wan: «Ev e e'rdê Kenanê ku sînorêd xweva wê p'ara we k'eve. Gava hûn bik'evine e'rdê Kenanê, <sup>3</sup> p'ara weye başûrê wê ji ber'îya Sînê r'ex Edomêva her'e.

\* 33:45 Awa gotî «Îyê-Hahabarîm».

Alîyê r'ohilata sînorê weyî başûrê wê ji xilazîya Be'ra Mirî\* destpêke. <sup>4</sup>Û sînor wê ji başûrê dager'e hevrazê Ekrabîmê, Sînêr'a derbaz be û wê li başûra Qadêş-Barnêayêva derk'eve û bigihîje H'asar-Addarê û wê derbazî Esmonê be. <sup>5</sup>Sînor wê ji Esmonê dager'e h'eta sêlafa Misirê û bigihîje be'rê\*.

<sup>6</sup>Sînorê r'oavayê wê Be'ra Navberê\* be. Ewê bibe sînorê weyî r'oavayê. <sup>7</sup>Evê jî bibe sînorê weyî bakurê: Ji Be'ra Navberê h'eta ç'îyayê Hor k'ifş kin. <sup>8</sup>Ji ç'îyayê Hor h'eta Libo-Hamatê k'ifş kin û ji wir sînorê bigihîje Sidadê. <sup>9</sup>Sînor wê h'eta Zifronê her'e û li H'asar-Eynanê xilaz be. Ewê bibe sînorê weyî bakurê.

<sup>10</sup>Sînorê xweyî r'ohilatê ji H'asar-Eynanê h'eta Şifamê k'ifş kin, <sup>11</sup>ji Şifamê wê berjêr her'e h'eta Rîbilahê ku alîyê r'ohilata E'yînê ye, paşê wê berjêr her'e û bigihîje devê Be'ra Xinnêrê\*<sup>\*</sup>, alîyê r'ohilatêva, <sup>12</sup>paşê sînorê berjêr her'e Êrdunê û Be'ra Mirîda\* xilaz be. Evê bibe sînorê dora e'rdê we».

<sup>13</sup>Mûsa e'mirî zar'êd Îsraêl kir û got: «Ev e, ew e'rdê ku hûnê bi peşkavîtinê war bin, k'îjan ku Xudan e'mir kir wekî nehe û niv qebîlar'a bê dayînê. <sup>14</sup>Çimkî qebîla zar'êd R'ûbên malbetêd xweva û qebîla zar'êd Gad malbetêd xweva û usa jî nivê qebîla Minaşe, warê xwe standine. <sup>15</sup>Ew her du qebîl û niv wî alî Êrdunê, pêşberî Erîhayê, alîyê r'ohilatê, warê xwe standin».

<sup>16</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>17</sup>«Ev in navê mêrêd ku wê e'rd bona we p'arevekin: Êlazarê k'ahîn û Yêşûyê kurê Nûn. <sup>18</sup>Usa jî ji her qebîlê serwêrekî bona e'rd p'arevekirinê bibijêrin. <sup>19</sup>Ev in navêd wan mêra: Bona qebîla Cihûda, K'alêbê

\* 34:3 Bi zimanê îbranîf «Be'ra Xwê» ye.

\* 34:5 Awa gotî «Be'ra Navberê».

\* 34:6 Bi zimanê îbranî «Be'ra Mezin» e.

\* 34:11 Peyman Nûda navê wê «Gola Celîlê» ye.

\* 34:12 Bi zimanê îbranî «Be'ra Xwê» ye.

kur'ê Yifûneh be. <sup>20</sup>Bona qebîla zar'êd Şimh'ûn, Samûêlê kur'ê E'mîhûd be. <sup>21</sup>Bona qebîla Binyamîn, Elîdadê kur'ê K'îslon be. <sup>22</sup>Bona qebîla zar'êd Dan, Bûqîyê kur'ê Yoglî serwêr be. <sup>23</sup>Bona zar'êd Ūsiv, li qebîla zar'êd Minaşe, H'anîyêlê kur'ê Êpod serwêr be. <sup>24</sup>Bona qebîla zar'êd Efrayîm, Qimûêlê kur'ê Şîftan serwêr be. <sup>25</sup>Bona qebîla zar'êd Zebûlon, Elîsafanê kur'ê Parnax serwêr be. <sup>26</sup>Bona qebîla zar'êd Îsaxar, Paltîyêlê kur'ê E'zan serwêr be. <sup>27</sup>Bona qebîla zar'êd Aşêr, Axîhûdê kur'ê Şilomî serwêr be. <sup>28</sup>Bona qebîla zar'êd Neftelî, Pidahêlê kur'ê E'mîhûd serwêr be». <sup>29</sup>Ev in ewêd ku Xudan e'mir kir wekî zar'êd Îsraêl'a e'rdê Kenanê p'arevekin.

### Bajarêd bona lêwîya

**35** Xudan<sup>f</sup> li deştêd Mowabêda, nêzîkî Ūrdunê, pêşberî Erîhayê, Mûsar'a xeberda û got: <sup>2</sup>«E'mirî zar'êd Îsraêl ke ku ew ji milkê warê xwe, bajara bidine lêwîya ku ew wanda bijîn. Usa jî e'rdê dora wan bajara bidine lêwîya. <sup>3</sup>Bajarada ewê bijîn, e'rdê dora wan jî wê bona pez-dewarêd wan, hebûka wan û h'emû h'eywanêd wan be. <sup>4</sup>Ew e'rdêd bajarayî ku hûnê bidine lêwîya gere her çar alîyava h'ezar zend be, ji sûra bajêr der. <sup>5</sup>Ji bajêr der\* alîyê r'ohilatêva du h'ezar zendî, alîyê başûrêva du h'ezar zendî, alîyê r'oavayêva du h'ezar zendî û alîyê bakurva du h'ezar zendî çap kin, bajarê bik'eve navê. Evê bona wan bibine e'rdêd bajara. <sup>6</sup>Ji bajarêd ku hûnê bidine lêwîya, şeş bajara bikine bajarêd sit'arbûnê, bona ku mêrkuj bir'eve li wir. Xêncî van bajara çil du bajara jî bidine lêwîya. <sup>7</sup>T'emam t'evî hev hûn gere çil h'eyşt bajara t'evî e'rdê wan bidine lêwîya. <sup>8</sup>Hûnê van bajara ji warê zar'êd Îsraêl hildin. Her kesê ji bajarêd xwe anegorî warê xwe, wê bide lêwîya. Yêd k'ê ze'f in, ze'fî hildin, yêd k'ê hindik in, hindikî hildin».

\* 35:5 «Ji bajêr der», aha jî dikarin fe'm bikin «xêncî bajêr».

**Bajarêd sit'arbûnê**

<sup>9</sup>Xudan Mûsar'a xeberda û got: <sup>10</sup>«Zar'êd Îsraêlr'a xeber de û bêje wan: «Gava hûn Êrdunêr'a derbazî e'rdê Kenanê bin, <sup>11</sup>xwer'a bajara başqe kin, ewê bona we bibine bajarêd sit'arbûnê, ku ew merivê ku yekî bê h'emdê xwe bikuje bir'eve wir. <sup>12</sup>Ev bajarê bona we bibine sit'ar ji yê ku h'eyfa xûnê wê hilde, bi vî awayî mêrkujê berî dîwana civînê neyê kuştinê. <sup>13</sup>Ji wan bajarêd ku hûnê bidin, şeş bajar bira bona sit'arê bin. <sup>14</sup>Sê bajara li alîyê r'ohilata Êrdunê bidin û sê bajara jî li e'rdê Kenanêda bidin. Ewê bibine bajarê sit'arbûnê. <sup>15</sup>Ev her şeş bajar bona zar'êd Îsraêl, bona xerîba û bona wan yêd ku nava weda dijîn wê lê sit'ar bin. Her kesê ku bê h'emdê xwe yekî bikuje wê bir'eve li wir.

<sup>16</sup>Gava yek bi h'esinekî yekî din xwe bikuje, ew mêrkuj e, ew mêrkuj gere bê kuştinê. <sup>17</sup>Gava yek pê kevirê destê xwedayî derba kuştinê yekî xe bikuje, ew mêrkuj e, gerekê bê kuştinê. <sup>18</sup>Yan gava yek pê darê destê xwedayî derba kuştinê yekî xe bikuje, ew mêrkuj e, gerekê bê kuştinê. <sup>19</sup>Yê ku h'eyfa xûnê wê hilde, xwexa gere mêrkuj bikuje. Gava r'astî wî bê xwexa gere wî bikuje. <sup>20</sup>Heger yek ji neyartîyê yekî de'f de, yan tişteki qesta bavêje wî û ew bimire, <sup>21</sup>yan heger yek bi destê xwe yekî din xe bikuje, çimkî ew dijminê wî bûye, yê lêxistî gere bê kuştinê, ew mêrkuj e. Yê ku h'eyfa xûnê wê hilde gava r'astî wî bê, gere wî bikuje.

<sup>22</sup>Lê heger yek nişkêva yekî din de'f de, yan bê h'emdê xwe tişteki bavêje wî, lê ew dijminê hev nîbûne, <sup>23</sup>yan ew kevirê derba kuştinê bavêje wî, ew bimire, lê wî ew nedîtibe, dijminê wî jî nîbûye û xirabîya wî nexwestîye, <sup>24</sup>hingê bira civîn dîwana mêrkuj û yê ku h'eyfa xûnê wê hilde bi van qanûna bike. <sup>25</sup>Civîn bira mêrkuj ji destê yê ku h'eyfa xûnê wê hilde xilaz ke û civîn gere wî vege'îne bajarê wîyî sit'arbûnê, ku ew r'evî bûyê. Bira ew li wir h'eta mirina serekk'ahînêf ku bi r'ûnê pîroz hatîye r'ûnkirinê, bimîne. <sup>26</sup>Lê heger mêrkuj ji

wî sînôrê bajarê xweyî lê sit'arbûnê derk'ewe, <sup>27</sup>yê ku h'eyfa xûnê wê hilde, wî ji sînôrê bajarê wîyî sit'arbûnê der bibîne û bikuje, yê ku h'eyfa xûnê wê hilde, ne neheqe. <sup>28</sup>Çimkî ew h'eta mirina serekk'ahîn gere li bajarê xweyî sit'arbûnêda bimîne. Li pey mirina serekk'ahîn'r'a mêrkuj dikare vegeer'e e'rdê warê xwe. <sup>29</sup>Bira ev bona we bibe qeyde-qanûna heqîyê li nava nisilêd weda, li h'emû cî-warêd weda.

<sup>30</sup>Gava yek merîkî bikuje, mêrkuj gere anegorî xebera şe'da bê kuştinê. Lê şe'dek hindik e ku merî bê kuştinê. <sup>31</sup>Ji ber e'mirê mêrkujva, yê ku gere bê kuştinê heq nestînin. Çimkî ew gere bê kuştinê. <sup>32</sup>Ne jî ji merivê ku r'evîye bajarê xweyî sit'arbûnê heq bistînin, ku ew berî mirina serekk'ahîn vegeer'e e'rdê xweda bijî. <sup>33</sup>E'rdê ku hûn li ser dijîn, neh'er'imînin, çimkî xûn e'rdê dih'er'imîne. E'rd nikare ji xûna li ser r'êtî bê afûkirinê, xêncî bi xûna yê ku xûn r'êtîye. <sup>34</sup>E'rdê ku hûn li ser dijîn neh'er'imînin, nava k'îjanîda ku ez dimînim. Çimkî ez, Xudan li nava zar'êd Îsraêlda dijîm».

### Qanûna bona qîzêd xweyîmilk'

**36** Serwêrêd olk'êd malbeta zar'êd Gîle'dê Maxîrê kurê Minaşe ji malbeta zar'êd Ûsiv, hatine li ber Mûsa û serwêrêd olk'êd zar'êd Îsraêlf, xeberdan <sup>2</sup>û gotin: «Xudan xweyê mer'a e'mir kir ku e'rd çawa milk', bi peşk avîtinê, bide zar'êd Îsraêl. Xudan usa jî e'mirî xweyê me kir ku milkê Silofh'adê birê me bide qîzêd wî. <sup>3</sup>Lê heger ew t'evî yekî ji qebîleke dine zar'êd Îsraêl mêr kin, hingê milk'ê wan wê ji milk'ê kal-bavêd me bê standinê û li milk'ê wê qebîlêr'a bê dayîne k'îjanêda ewê mêr kin. Bi vî awayî milk'ê meyî bi peşk standî wê kême be. <sup>4</sup>Û salaf r'awastîyêye\* zar'êd Îsraêl, milk'ê wan wê bigihîje milk'ê qebîla k'îjanêda ku ewê mêrkin. Bi vî awayî ji qebîla kal-bavêd me milk'ê wan wê bê standinê».

\* <sup>36:4</sup> Binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 25:10.

<sup>5</sup> Mûsa anegorî xebera Xudan e'mirî zar'êd Îsraêl kir û got: «Qebîla zar'êd Ûsiv r'ast dibêje. <sup>6</sup> Awa Xudan çi e'mir kir bona qîzêd Silofh'ad û got: «Ew dikarin wan mêra bistînin, k'îjana ku ew begem dikin, lê t'enê ji qebîla malbeta bavê xwe. <sup>7</sup> Bona ku milk'ê zar'êd Îsraêl ji qebîlekê derbazî qebîleke din nebe. Çimkî her kesê ji zar'êd Îsraêl gerekê milk'ê qebîla kal-bavêd xweva bê girêdanê. <sup>8</sup> Her qîza xweyîmilk' li nava qebîlêd zar'êd Îsraêlda gerekê t'evî yekî ji malbeta qebîla bavê xwe mêr ke, bona ku zar'êd Îsraêl her kes milk'ê kal-bavêd xwe war be. <sup>9</sup> Milk'ê qebîlekê derbazî qebîleke din nebe, çimkî her qebîla zar'êd Îsraêl gere milk'ê xweva girêdayî be».

<sup>10</sup> Çawa ku Xudan e'mirî Mûsa kir, qîzêd Silofh'ad usa jî kirin. <sup>11</sup> Mah'la, T'îrsa, H'ogla, Mîlk'a û Noha qîzêd Silofh'ad kur'apêd xwe standin. <sup>12</sup> Wana mêrêd ji malbetêd zar'êd Minaşeyê kur'ê Ûsiv standin. Bi vî awayî milk'ê wan li nava qebîla malbeta bavê wanda ma.

<sup>13</sup> Ev in ew qanûn û dîwan ku Xudan bi destê Mûsa li deştêd Mowabêda, nêzîkî Ûrdunê, pêşberî Erîhayê e'mirî zar'êd Îsraêl kir.

# Qanûna Ducarî

## Pêşgotin

Her pênc k'itêbêd Mûsa bi k'itêba «Qanûna Ducarî» xilaz dibe. Awazê lêtêratûra vê k'itêbê, şîretêd xilazîyê ne, alîyê Mûsayê qanûndarê cihûyeyî mezinda ne. Ev peymanaf e'rdê Mowabêdaf cime'ta Îsraêlr'af hate wek'ilandinê, r'êda berî k'e-tina e'rdê Kenanêf. Evê k'itêbê dikarin belayî li ser sê p'arêd t'emîyêd Mûsa kin, (p'ara pêşin s. 1-4, p'ara duda: s. 5-29, p'ara sisîya: s. 30-31 û xilazîyê s. 32-34). Usa jî alîyê lêtêratûrêda, çêbûna k'itêbê mîna çêbûna peymana welata ye, ya ku nava p'adşa û wezîr-wek'îlêd wîda têne girêdanê. Navê vê k'itêbê dide k'ifşê, ku nava wêda gelek qanûnêd ji wan k'itêbêd berî wêda têne wek'ilandinê: (Derk'etin, Qanûna K'ahîntîyê, Jimar). Serda jî vanva girêdayî çend p'arêd qanûnaye nû jî têne xuyakirinê. Ev ne t'enê wek'ilandina xeber bi xeber e, ji wan qanûn û t'emîyêd ku hene, lê nûyejîyînbûna peymana Xwedê ye, bona her nisilê îsraêlîya. Çimkî wê hingêda, gava li ber ç'îyayê Sînayê Peymana pêşin hatibû girêdanê, weke çil salî derbaz bibû. Lê belê gelek qanûn hê pêşda dinihêr'in, çimkî gava Îsraêl li welatê Kenanêda cî-war be bijî, hingê wê bona wî hê qanûneke bi hûr gilî kêr bê, anegorî wî h'alê têda. P'areke vê k'itêbêye berbiç'e'v, r'eqemeke dirêje dua û nifir'a ye, k'ilîta şirovekirina t'arîxa Îsraêlêye we'dê wê bê. Nava danasînîyêd xweda bona Îsraêl û Cihûda p'êxemberêd Xwedê, îlayî Yêremîya, gele cara vediger'ine li ser van dua û nifir'a. K'ifşî heye eva k'itêba (yan p'ir'anîya p'arê) xût

ew k'itêb e, k'îjan ku wextê nû kirina P'aristgeha Xudan<sup>f</sup>, qur'na 7-da berî bûyîna Îsa hate dîtinê. Gava Yoşîya p'adşa bihîst, ew xwestin û nifir'êd Xwedêye ku cime'tê zûva bîr kiribûn, ya ku li merivêd ne amin hiltên, tirsîya û dest pê kir p'adşatîya xwe alîyê p'ergalîyê û h'ebandinêda paqij kir. Qanûna Ducarî li nava Peymana Nûda ji h'emû k'itêba ze'ftir tê wek'ilandinê. Me'na t'emamîya qanûna cihûya û ew gotina kilasîkîye Xwedêh'ebandinê ev e: Qanûna Ducarî 6:4-5, yanê, t'enê li ber Xudan Xwedê ta be û li ser dinê wî ji her tiştî zêdetir h'iz bike. Îsa Mesîh got, wekî ev e t'emîya here sereke Peymana Kevinda, usa jî t'emîya h'izkirina hindava hevalê xweda.

### Gotinêd Mûsa ye e'wlin

#### Xudan<sup>f</sup> t'emî dide ji ç'îyayê Sînayê r'êk'evin

**1** Ev in ew xeberêd ku Mûsa alîyê r'ohilata Êrdunê, ber'îya E'rabayêda, pêşberî Sûfê, nava Paranê û T'ofelê, Labanê, H'asêrotê, Dî-Zahabêda gotibû t'emamîya Îsraêl<sup>f</sup>. <sup>2</sup>Ji H'orêbê\* h'eta Qadêş-Barnêayê li ç'îyayê Sêhîrêr'a r'îya yanzdeh r'oîjî bû. <sup>3</sup>Yekê meha yanzdehaye sala çilî, Mûsa her tiştê ku Xudan li wî e'mir kiribû bona zar'êd Îsraêl gote wan. <sup>4</sup>Pey wê yekêr'a ku Sîxon p'adşê emorîya<sup>f</sup> ku H'eşbonê dima, usa jî Ogê p'adşê Başanê ku E'sterotê û Êdreyê dima hatine lêdanê. <sup>5</sup>Alîyê r'ohilata Êrdunê, e'rdê Mowabêda<sup>f</sup>, Mûsa dest bi şirovekirina vê qanûnê kir got:

<sup>6</sup>«Xudan Xwedêyê me, li H'orêbê mer'a xeber da got: «Bes e hûn li vî ç'îyayî bimînin, <sup>7</sup>r'abin r'êkevin her'ine li ç'îyayêd emorîya û h'emû dor-berêd wane deşta E'rabayêda,

---

\* 1:2 H'orêb navekî dinêyî Sînayê ye.

li ç'îya-banîya, Necefêf, devê be'ra, e'rdê kenanîyêf û Lubnanê, h'eta Firatê ç'emê mezin. <sup>8</sup>Binihêr'e! Ez vî e'rdî didime ber we, her'in wî e'rdî bikine milk'ê xwe. Çimkî Xudan kal-bavêd we, Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwar ku wî e'rdî bide wan û pey wanr'a jî zur'eta wan».

### Mûsa h'akima k'ifş dike

<sup>9</sup>Wê hingê min, Mûsa, gote we: «Ez t'enê qewat nakim bi-k'evime bin barê we. <sup>10</sup>Xudan Xwedêyê we hûn li hev zêde kirine, îro hûn bê h'esab in mîna steyrkêd e'zmên. <sup>11</sup>Bira Xudan Xwedêyê kal-bavêd we, we h'ezar carî ji vî h'esabê we zêdetir bike û we bimbarek bike çawa ku wî gotibû we! <sup>12</sup>Lê ez t'enê çawa dikarim barêd we, nîrêd we û şer'-de'wêd we hilgirim? <sup>13</sup>Hûn xwer'a ji qebîlêd xwe merivne serwaxt, aqil û cêr'ibandî bibijêrin û ezê wan bikime serwêrêd we. <sup>14</sup>We caba min da û got: «Te tiştêkî qenc got ku em bikin. <sup>15</sup>Min serwêrêd qebîlêd we, merivne serwaxt û cêr'ibandî hildan, ew li ser we çawa serh'ezar, sersed, serpêncî, serdehe û berpîrsîyar nava qebîlêd weda k'ifş kirin. <sup>16</sup>Wê hingê min li h'akimêd we e'mir kir û gote wan: «Guh bidine birayêd xwe û r'ast h'akimtîyê bikin çawa nava îsraêlîya, usa jî nava îsraêlîkî û xerîbekî. <sup>17</sup>Dîwanêda firqîyê nekin, çawa guh didine yê mezin usa jî guh bidine yê biç'ûk. Ji meriva netirsin çimkî dîwan şixulê Xwedê ye, lê her tiştê ku wer'a ze'met be bînine cem min ezê guh bidimê». <sup>18</sup>Wê hingê min bona her tiştî li we e'mir kir ku hûn gere çî bikin.

### Şandina ce'sûsa

<sup>19</sup>Çawa ku Xudan Xwedêyê me li me e'mir kir usa em ji H'orêbê r'êk'etin, nava wê qûmistana mezin û xofr'a derbaz bûn, k'îjan ku we dît li ser r'îya berbi ç'îyayêd emorîya. Usa em hatine Qadêş-Barnêayê. <sup>20</sup>Min gote we: «Hûn gihîştine ç'îyayêd emorîya, k'îjan ku Xudan Xwedêyê me dide me. <sup>21</sup>Binihêr'e Xudan Xwedêyê te ev e'rd danî ber te, hevraz

her'e wê xwer'a bike milk', çawa ku Xudan Xwedêyê kal-bavêd te gotibû te, netirse ne jî vek'işe.

<sup>22</sup>Lê hûn t'emam hatine cem min û we got: «Were em berî xwe merîya bişînin, wekî ew mer'a ce'sûsiya wî e'rdî bikin û xeberekê bona r'ê bînin k'îjanêda emê hevraz her'in, usa jî bona bajarêd ku emê her'inê». <sup>23</sup>Ew xeber li min xweş hat, min jî ji we donzdeh merî bijartin ji her qebîlê merivek. <sup>24</sup>Ew çûn hilk'işîyane ser ç'îya û gihîştine newala Eşk'olê û ew r'aç'e'v kirin. <sup>25</sup>Berêd wî e'rdî girtine destêd xwe û t'evî xwe berjêr anîne cem me, xeber mer'a anîn û gotin: «Ew e'rdê ku Xudan Xwedêyê me dide me xweş e».

<sup>26</sup>Lê we nexwest ku hevraz her'in, hûn miqabilî t'emîyêd Xudan Xwedêyê xwe sekinîn. <sup>27</sup>We konêd xweda bîna xwe teng kir û got: «Xwedê jenande me, em ji e'rdê Misirê derxistin, wekî me bi destê emorîya qir' ke. <sup>28</sup>Emê k'uda hevraz her'in? Birayêd me tirs kirine dilê me, gotin: «Ew millet ji me mestir û bilindtir e, bajare mezin in û h'eta e'zmên ew sûrki'î ne, me zar'êd enaqîf jî li wir dîtin». <sup>29</sup>Min gote we: «Nebizdîn û netirsîn ji wan: <sup>30</sup>Xudan Xwedêyê we ku pêşîya weva diçe, ewê xwexa alîyê we şer' bike, çawa ku wî bona we Misirêda ber ç'e'vêd we kir. <sup>31</sup>Ber'îyêda jî te dît, ku çawa meriv zar'êd xwe hildigire, usa jî Xudan Xwedêyê te, t'emamîya vê r'êda tu hilgirtî, k'îjanîda ku hûn diçûn, h'eta hûn gihîştine li vî cîyê». <sup>32</sup>Pey vê yekê'a jî we dîsa bawerîya xwe Xudan Xwedêyê xwe ne anî, <sup>33</sup>yê ku r'êda pêşîya weva diçû ku cîyê zomelêxistina we k'ifş ke. Şev agirda, r'oj jî e'wrda r'ê nîşanî we dikir, k'îjanêda ku hûn diçûn.

### Xudan cime'ta Îsraêl ceza dike

<sup>34</sup>Xudan dengê xebardana we bihîst, hêrs k'et, sond xwar û got: <sup>35</sup>«T'u kes ji van meriva, ji vî nisilê xirab, wî e'rdê qenc wê nebîne, bona k'îjanî min sond xwar ku bidime kal-bavêd we. <sup>36</sup>T'enê K'alêbê kur'ê Yifûneh wê wî e'rdî bibîne, ezê wî e'rdê ku ew nav ger'îya bidime wî û zar'êd wî, çimkî ew t'am

gur'a Xudanda ma». <sup>37</sup>Xudan bona we ser min jî hêrsa xwe r'akir û got: «Tu jî nak'evî wir. <sup>38</sup>Berdestîyê te Yêşûyê kur'ê Nûn wê bik'evê wir, wî bişidîne, çimkî ewê Îsraêl bibe ku wî e'rdî xwer'a bikine milk'. <sup>39</sup>Xişîmêd weye bona k'îjana we digot ku ewê t'alan her'in û zar'êd weye ku hê qencî-xirabîyê ji hev dernaxin ewê bik'evine wir. Ezê wî e'rdî bidime wan ewê xwer'a bikine milk'. <sup>40</sup>Hûn vege'rin, bi r'îya Be'ra Sor her'ine ber'îyê».

<sup>41</sup>Lê we caba min da got: «Me ber Xudan gunê kir, emê hevraz her'in bikine şer', çawa ku Xudan Xwedêyê me li me e'mir kir. Hingê her kes ji we ç'ek girêda, we t'irê ku hêsaye hilk'işîne serê ç'îya». <sup>42</sup>Lê Xudan gote min: «Bêje wan: «Hilnek'işîn û nekine şer' ku hûn ji dijminêd xwe neyêne qir'ê, çimkî ez t'evî we nînim»». <sup>43</sup>Min gote we, lê we guh neda min û miqabilî t'emîya Xudan sekinîn. We serh'işkî kir hilk'işîyane serê ç'îya. <sup>44</sup>Binalîyêd wan ç'îya emorî miqabilî we r'abûn, ser Sêhîrê mîna moza dane pey we h'eta H'ormayê we xistin. <sup>45</sup>Hûn vege'riyan û ber Xudan girîyan, lê Xudan guh neda we dengê we ne bihîst.

### We'dê ber'îyêda

<sup>46</sup>Wê hingê we'dekî gelekî dirêj hûn li Kadêşê man.

**2** Em vege'riyan çûne ber'îyê bi r'îya Be'ra Sor, çawa ku Xudan gotibû min. Em gelek r'oja dora ç'îyayê Sêhîrê dizivir'in. <sup>2</sup>Xudan gote min: <sup>3</sup>«Bes e hûn dora vî ç'îyayî bizivir'in, vege'rine alîyê bakurê. <sup>4</sup>Li millet e'mir ke û bêje: «Tê sînorê birayêd xwe, zar'êd Esaw'r'a ku li Sêhîrê dimînin derbaz bî. Ewê ji we bitirsîn, lê hûn h'ewza xwe ji wan bikin. <sup>5</sup>Xwe li wan nexin, çimkî ez ji e'rdê wan qet weke nîgekî jî nadime we, çimkî min ç'îyayêd Sêhîrê çawa milk' da Esaw. <sup>6</sup>Xurek û avê p'eretî ji wan bik'ir'in bixwin, vexwin. <sup>7</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê te h'emû şixulêd destêd te bimbarek kir. Ew haş r'êwîtiya te heye li vê ber'îya mezinda. Eva çil sal e ku Xudan Xwedêyê te t'evî

teye û kêmasîya t'u tiştî te nedît». <sup>8</sup> Bi vî awayî em ser birayêd xwe zar'êd Esawr'a ku li Sêhîrê diman derbaz bûn, em ji r'îya E'rabayê, Êlat û Esyon-Geberê dûr derbaz bûn.

Em vege'îyan û r'îya ber'îya Mowabêda çûn, <sup>9</sup> Xudan gote min: «Xwe mowabîya<sup>f</sup> nexê û t'evî wan neke şer', çimkî ji e'rdê wan nadime te, min E'r çawa milk' da zar'êd Lût\*». <sup>10</sup> (Pêşîyê êmî li wir diman, miletekî qewat, bêh'esab û bejin bilind mîna enaqîya. <sup>11</sup> Çawa enaqî, usa jî êmî r'ifayî\* dihatine h'esabê lê mowabîya wanr'a êmî digotin. <sup>12</sup> Pêşîyê li Sêhîrê h'orî diman, lê zar'êd Esaw berî wan dan, ew qir' kirin û cî milk'ê wan ji wan standin, çawa ku Îsraêl serê wî e'rdî kir, k'îjan ku Xudan çawa milk' da wan.) <sup>13</sup> «Niha r'abin sêlafa Zeredêr'a derbaz bin!» Û em sêlafa Zeredêr'a derbaz bûn. <sup>14</sup> We'dê ku em ji Qadêş-Barnêayê r'êk'etin h'eta derbazbûna sêlafa Zeredêr'a sî û h'eyşt sal k'işand. H'eta ku t'emamîya nisilê şer'k'arêd nava zomêda mirin, çawa ku Xudan wanr'a sond xwaribû\*. <sup>15</sup> Xudan jî destê xwe li ser wan bilind kiribû, wekî ji nava zomê qir'a wan bîne, h'eta ew t'emam mirin.

<sup>16</sup> Gava t'emamîya merivêd şer'k'ar ji nava millet mirin, <sup>17</sup> Xudan gote min: <sup>18</sup> «Îro tu E'rêr'a sînore Mowab derbaz dibî <sup>19</sup> û nêzîkî zar'êd Amon dibî, xwe wan nexê û t'evî wan neke şer', çimkî ji e'rdê zar'êd Amon milk' nadime te, min ew çawa milk' da zar'êd Lût\*». <sup>20</sup> (Ev jî e'rdê r'ifayîya tê h'esabê, pêşîyê r'ifayî li wir mane, lê amonîya<sup>f</sup> li wanr'a zamzûmî dibêjin. <sup>21</sup> Ew miletekî mezin, bêh'esab û bilind bû mîna enaqîya. Xudan ew ber ç'e'vê amonîya qir' kirin, amonîya berî wan dan û ew dewsa wan cî war bûn, <sup>22</sup> çawa ku Xudan bona zar'êd Esaw kir, yêd ku li Sêhîrê dijîn. Xudan h'orî ber ç'e'vêd wan qir' kirin, zar'êd Esaw berî wan dan û milk'ê wan

\* 2:9 Binihêr'e Destpêbûn 19:36-37.

\* 2:11 «R'ifayî» jî e'save bûn.

\* 2:14 Binihêr'e Qanûna Ducarî 1:34-35.

\* 2:19 Binihêr'e Destpêbûn 19:36-37.

zefî xwe kirin h'eta îro. <sup>23</sup>Usa jî t'evî e'wwîyê ku gundêd nêzîkî Gazzayê diman qewimî bû. K'apt'orîyê\* ku ji K'apt'orê derk'etibûn ew qir' kiribûn û cî warê wan ji wan standibûn.)  
<sup>24</sup>«R'abin r'ê k'evin û sêlafa Arnonêr'a derbaz bin. Binihêr'in! Ez Sîxonê emorî p'adşê H'eşbonê û e'rdê wî didime destê te, t'evî wan bike şer' û destpêke e'rdê wan xwer'a bikine milk'.  
<sup>25</sup>Îroda ezê destpêkim tirs û xofa te bikime li ser miletêd bin p'er'ê e'zmên. Yêd ku wê bona te bibihên li ber te wê bilerizin û bibizdin.

<sup>26</sup>Min ji ber'îya Qidêmotê bi xeberêd e'dilayê qasid şandine cem Sîxonê p'adşê H'eşbonê ku bêjin: <sup>27</sup>«Bihêle ku ez welatê teva derbaz bim, ezê t'enê r'îya serekeda her'im, ç'ep û r'ast daneger'im. <sup>28</sup>Xurek û avê p'eretî bifiroşe min ezê bixwim, vexwim. T'enê bihêle ez derbaz bim, <sup>29</sup>çawa zar'êd Esaw ku ser Sêhîrê dijîn û mowabîyê ku E'rê dijîn bona min kirin. H'eta ku ez Êrdunêr'a derbaz nebime wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê me dide me». <sup>30</sup>Lê Sîxonê p'adşê H'eşbonê qayl nebû ku em welatê wîr'a derbaz bin, çimkî Xudan Xwedêyê te ew serh'işk kir û dilê wî kire kevir, wekî wî bide destê te, mîna r'oja îroyîn.

<sup>31</sup>Hingê Xudan gote min: «Binihêr'e! Ez destpêdikim Sîxon û welatê wî didime destê te, destpêke zeft ke û e'rdê wî xwer'a bike milk'. <sup>32</sup>Sîxon û h'emû cime'ta wî li Yahasê miqabilî me derk'ete şêr', <sup>33</sup>lê Xudan Xwedêyê me ew da destê me, me ew, kur'êd wî û h'emû cime'ta wî qir' kirin. <sup>34</sup>Hingê me h'emû bajarêd wî zeft kir, ew û bajarêd wî wêran kirin, ew t'am dîyarî Xudan kirin, mêr, jin û zar' qet yek sax ne hişt. <sup>35</sup>T'enê me h'eywan xwer'a hilda û t'alanê ji bajarêd ku me zeft kiribûn. <sup>36</sup>Ji E'rohêra devê sêlafa Arnonê û ji bajarê deştê, h'eta Gîle'dê bajar t'unebû ku me qewattir bûya. Xudan Xwedêyê me h'emû dane destê me. <sup>37</sup>T'enê tu nêzîkî welatê

\* 2:23 «K'apt'orî» filistinîf bûn ku ji Kirêtayê hatibûn.

zar'êd Amon ne bûyî, usa jî t'emamîya alîyê sêlafa Yaboqê t'evî bajarêd serê ç'îya û t'emamîya wan cîyêd ku Xudan Xwedêyê me îzin ne da me.

### Îsraêl Og alt' dîke

**3** Em vege'îyan û r'îya Başanêda hevraz çûn. Ogê p'adşê Başanê t'emamîya miletê xweva Êdreyêda derk'ete miqabilî me şêr'. <sup>2</sup>Xudan gote min: «Ji wî netirse, çimkî ez ewî t'evî h'emû miletê wî, e'rdê wî didime destê te. Tê usa bînî serê wî, çawa ku te anî serê Sîxonê p'adşê emorîya ku H'eşbonê dima». <sup>3</sup>Xudan Xwedêyê me, Ogê p'adşê Başanê û h'emû miletê wî dane destê me. Me usa wî xist ku t'u kes ji wan sax ne ma. <sup>4</sup>Wê hingê me h'emû bajarêd wan zeft kirin, bajar nemabû ku me hilnedabûya, awa gotî şêst bajar, t'emamîya qeza Argovê, p'adşatîya Ogê Başanê. <sup>5</sup>H'emû ev bajar bi sûrêd bilind, cot dergeha û zer'zava qewatkirî bûn, xêncî gelek gundêd bê sûr. <sup>6</sup>Me ew wêran kirin, ew t'am dîyarî Xudan kirin, çawa ku me anî serê Sîxon p'adşê H'eşbonê, her bajar t'evî jin, mêra û zar'a wêran kirin. <sup>7</sup>Lê h'emû h'eywan û t'alan ji wan bajara me xwer'a hildan.

<sup>8</sup>Wî çaxî me e'rdê alîyê r'ohilata Ûrdunê ji sêlafa Arnonê h'eta ç'îyayê Hermonê ji destê du p'adşêd emorîya stand. <sup>9</sup>(saydanî Hermonê'a Sîryon dibêjin, emorî jî Senîr dibêjin.) <sup>10</sup>H'emû bajarêd deşta ç'îyê û t'emamîya Gîle'd, t'emamîya Başanê h'eta Salk'ayê û Êdreyê, bajarêd p'adşatîya Og li Başanê me hilda. <sup>11</sup>(Çimkî ji r'ifayîya t'enê Ogê p'adşê Başanê mabû. Va ye darbesta wîye h'esinî niha R'abbayêda cem zar'êd amonîya ye, dirêjaya wê nehe zend e, beraya wê çar zend e, zendê gihîştîya.)

### Milk'ê R'ûbên, Gad û Minaşe

<sup>12</sup>Wê hingê me ew e'rd xwer'a kire milk'. E'rohêr nêzîkî sêlafa Arnonê û nivê ç'îyayêd Gîle'dê t'evî bajarêd wî min da r'ûbênîya û gadîya. <sup>13</sup>Çi ku ji Gîle'dê mabû û t'emamîya

Başana p'adşatîya Og min da nîvê qebîla Minaşe. (T'emamîya qeza Argovê li t'emamîya Başanêda dihate navkirinê çawa e'rdê r'ifayîya. <sup>14</sup>Yaîrê kur'ê Minaşe t'emamîya qeza Argovê h'eta sînorê gişûrîya û mahaxatîya hilda. Ewî Başan bi navê xwe H'avot Yaîr\* nav kir ku h'eta îro ew nava li ser e). <sup>15</sup>Gîle'd min da Maxîr\*. <sup>16</sup>Ji Gîle'd h'eta sêlafa Arnonê min da r'ûbênîya û gadîya. Sînorê wan ev in: Ji nava sêlafa Arnonê h'eta sêlafa Yaboqê ku sînorê kur'êd Amon e, <sup>17</sup>û usa jî deşta E'raba, sînorê Êrdunêva ji Xinnêrêtê h'eta Be'ra E'rabayê awa gotî Be'ra Mirî\*, alîyê r'ohilatê ber p'ala Aşdod Pîsgayê.

<sup>18</sup>Wê hingê min li we e'mir kir, got: «Xudan Xwedêyê we ev e'rd da we ku hûn wî xwer'a bikine milk'. Awa hûn h'emûyêd şer'k'ar, çekê xwe girêdin pêşîya birayêd xwe zar'êd Îsraêl her'in. <sup>19</sup>T'enê jin-zar'êd we, h'eywanêd we (ez zanim ku h'eywanêd we gelek in) bira wan bajarada ku min dane we bimînin, <sup>20</sup>h'eta ku Xudan r'ih'etîyê nede birayêd we, mîna we. Gava ew e'rdê ku Xudan Xwedêyê we dide wan alîyê r'oavaya Êrdunê xwer'a bikine milk', hingê bira her kes ji we vege'le li ser milkê xwe, k'îjan ku min dane we». <sup>21</sup>Wê hingê min li Yêşû e'mir kir û got: «Ç'e'vêd te her tişt dîtîn, çi ku Xudan Xwedêyê we anî serê wan her du p'adşa. Xudan wê usa jî bîne serê wan h'emû p'adşatîya nava k'îjanar'a tê derbaz bî. <sup>22</sup>Ji wan netirsîn, çimkî Xudan Xwedêyê we xwexa şer' dike bona we».

### Xudan îzin neda Mûsa bik'eve Kenanêf

<sup>23</sup>Wê demê min r'eca ji Xudan kir û got: <sup>24</sup>«Xudan, Xweyê min! Te destpêkir mezinayîya xwe û destê xweyî qewat nîşanî xulamê xwe kir. K'îye ew xwedêyê e'zmanada û ser e'rdê, ku mîna şixul û kirêd zore ku tu dikî, bike? <sup>25</sup>R'eca dikim bihêle

\* 3:14 Bi zimanê îbranîf «Wargehêd Yaîr».

\* 3:15 «Maxîr» navê olk'eke ji qebîla Minaşe ye.

\* 3:17 Îbranî «Be'ra Xwê» ye.

ez derbaz bim, wî e'rdê qencî alîyê r'oavaya Êrdunê, wan ç'îyayêd qenc û Lubnanê bibînim». <sup>26</sup>Lê Xudan bona we ser min hêrs k'et û dengê min ne bihîst. Xudan gote min: «Bes e! Vir şûnda bona wê yekê îdî minr'a nebêje! <sup>27</sup>Hilk'işe serê Pîsgayê, serê xwe bilind ke bakur û başûr, r'ohilat û r'oava pê ç'e'vêd xwe bibîne, çimkî tê ji Êrdunê derbaz nebî. <sup>28</sup>Li Yêşû e'mir ke, dil bide li ber wî û bişidîne, çimkî ewê pêşîya vî miletîva her'e û wî e'rdî k'îjanî tê bibîni wanr'a bike milk'. <sup>29</sup>Û em li newala pêşberî Bêt'-P'ihorê man.

### Mûsa gazî qedandina qanûna Xwedê dike

**4** Îsraêl, bibihê niha qeyde-qanûn û qirarêd ku ez we hîn dikim wekî wan biqedînin. Bi vî awayî hûnê bijîn û her'ine wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê kal-bavêd we wê bide we ku wî xwer'a bikine milk'. <sup>2</sup>Ez çî li we e'mir dikim, ji wê ne zêde kin, ne jî kêma kin, lê qanûnêd Xudan Xwedêyê we ku ez li we e'mir dikim xweyî kin. <sup>3</sup>Ç'e'vêd we dîtin ku Xudan çî kir Bae'l-P'ihorêda\*. H'emû merivêd ku pey Bae'l-P'ihor çûn Xudan Xwedêyê te ew ji nava te unda kirin, <sup>4</sup>lê we ku xwe Xudan Xwedêyê xwe girtîye t'emam jî h'eta niha sax in.

<sup>5</sup>Binihêr'e min hûn hînî qeyde-qanûn û qirara kirin, çawa ku Xudan Xwedêyê min li min e'mir kiribû, wekî hûn li wî e'rdîda jî bik'ar bînin, k'îjanî hûnê bik'evinê xwer'a bikine milk'. <sup>6</sup>Xweyî kin û biqedînin, çimkî ev e bîlantî û serwaxtîya weye li ber ç'e'vê mileta. Ewê ku van h'emû qeyde-qanûna bibihên wê bêjin: «R'astî ev cime'ta bîlan û serwaxt e, miletekî mezin e». <sup>7</sup>Çimkî k'îjan miletê mezin e ku xwedêyê wan aha nêzîk e, çawa Xudan Xwedêyê me, wextê her gazîya me? <sup>8</sup>Yan qeyde-qanûnêd, qirarêd k'îjan miletê mezin r'ast in, mîna t'emamîya van hînkirina k'îjan ku ez îro datînim li ber we?

---

\* <sup>4:3</sup> Binihêr'e Jîmar 25:1-9. P'ihor navê ç'îyakî bû, li wê derê p'ûtê Bae'l'r'a qulix dikirin. Lema jî meriv navê wî ç'îyayî û wî p'ûtî danî Bae'l-P'ihor.

<sup>9</sup>T'enê haş ji xwe hebe, miqatî nefsa xwe be wekî tu wan tişta bîr nekî, k'îjan ku te bi ç'e'vêd xwe dîtin. Ew t'emamîya r'ojêd e'mirê teda ji dilê te derneyên, wan bigihîne zar'êd xwe û zar'ê zar'êd xwe. <sup>10</sup>Bîr bîne ew r'oja ku tu li H'orêbê ber Xudan Xwedêyê xwe sekinîbûyî, çaxê Xudan gote min: «Cime'tê bicivîne cem min. Ezê xeberêd xwe wanr'a bêjim, wekî ew hîn bin ji min bitirsin h'emû r'ojêd ku ew li ser dinê bijîn, usa jî zar'êd xwe hîn kin». <sup>11</sup>Û hûn nêzîk bûn binat'ara ç'îyê sekinîn, ç'îya jî agir pê k'etibû û alav digihîşte k'ûraya e'zmên, te'rîstanî, e'wrayî û şever'eş bû. <sup>12</sup>Xudan ji nava agirda t'evî we xeberda. We dengê gotina wî bihîst, lê dilqê wî ne dît, t'enê deng dibihîst. <sup>13</sup>Xwedê peymanaf xwe, awa gotî her dehe t'emî weva e'yan kirin. Ew li ser du selêd kevirî nivîsîn û t'emî da we ku wan xwey kin. <sup>14</sup>Wê hingê Xudan li min e'mir kir ku ez we hînî wan qeyde-qanûn û qirara kim, bona ku li wî welatîda jî biqedînin k'îjanî ku hûnê derbaz bin xwer'a bikine milk'.

<sup>15</sup>We t'u dilq nedît wê r'oja ku Xudan li H'orêbê ji nava êgirda wer'a xeberda. Haş ji xwe hebin <sup>16</sup>ku hûn neşih'itin û xwer'a p'ûta t'u cûr'eyî, dilqê mêr yan jinêda çenekin. <sup>17</sup>Ne jî dilqê t'u h'eywanê li ser e'rdê, ne dilqê t'u teyredê xweyîbaske bin p'er'ê e'zmênda ku difir'e, <sup>18</sup>ne dilqê t'u şûlikîyê li ser e'rdê, ne jî dilqê t'u me'sîyê avêye binê e'rdêda çêkî. <sup>19</sup>Nebe ku tu serê xwe bilindkî jor li e'zmên, te'vê, hîvê, steyrka û t'emamîya nexşêd e'zmên binihêr'î û bêyî xapandinê, li ber wan ta bî û wanr'a xulamtîyê bikî, çimkî Xudan Xwedêyê te ew bona t'emamîya miletêd bin p'er'ê e'zmênda k'ifş kirine. <sup>20</sup>Lê çi dimîne bona we, Xudan hûn ji nava fir'na h'esinî, awa gotî ji Misirê derxistin, wekî hûn bibine miletê p'ara wî, mîna r'oja îroyîn.

<sup>21</sup>Xudan bona kirêd we hêrsa xwe li min r'akir û sond xwar, wekî ez ji Êrdunê derbaz nabim, nak'evime e'rdê qencî ku Xudan Xwedêyê te çawa war dide te. <sup>22</sup>Ezê li vî e'rdî bimirim, ji Êrdunê derbaz nabim, lê hûnê derbaz bin

û li wî e'rdê qenc xwer'a bikine milk'. <sup>23</sup> Haş ji xwe hebin, wekî hûn peyman ku Xudan Xwedêyê we t'evî we girêda, bîr nekin. Xwer'a p'ûta dilqê t'u tiştîda çênekin, çi ku Xudan Xwedêyê te îzin ne da te. <sup>24</sup> Çimkî Xudan Xwedêyê te agirê p'er'itandinê ye, ew Xwedêkî k'umr'eş e.

<sup>25</sup> Gava ter'a zar' bibin û zar'êd zar'a bibin, dirêj li ser wî e'rdî bijîn, p'eyr'a hûn bişih'itin xwer'a p'ûta dilqê tiştêkîda çêkin û xirabîyê li ber Xudan Xwedêyê xwe bikin, hûnê hêrsa wî r'akin, <sup>26</sup> ez îro gazî e'rd û e'zmên dikim çawa şe'de miqabilî we, hûnê zûtirekê betavebin li ser e'rdê ku hûnê Êrdunêr'a derbaz bin her'in xwer'a bikine milk'. Hûnê li ser wê dirêj nemînin lê hûnê bêne r'aqetandinê. <sup>27</sup> Ê Xudan wê we li nava miletada bela-belayî ke, t'enê hinekê ji we nava miletêd ku Xudanê we bibe bimînin. <sup>28</sup> Wê derê hûnê wan xwedêyar'a qulix kin, k'îjan ku bi dara, kevira bi destêd meriva çêkirî ne. Yêd ku ne dibînin, ne dibihên, ne dixwin û ne jî bîne hildidin. <sup>29</sup> Lê gava tu li wir demana Xudan Xwedêyê xweda bî, heger bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe wî biger'î, tê wî bibînî. <sup>30</sup> Çaxê tu tengasîyada bî û r'ojêd axirîyêda ev h'emû tiştana bêne serê te, tê vege'î li cem Xudan Xwedêyê xwe û tê gur'a wî bikî. <sup>31</sup> Çimkî Xudan Xwedêyê te, Xwedêyê r'e'me e, ew te nahêle, te unda nake û peyman t'evî kal-bavêd te girêdayî bîr nake, bona k'îjanî Xwedê wan'r'a sond xwarîye.

<sup>32</sup> K'a bona wan we'dêd berî xwe bipirse, ji wê r'ojêda ku Xwedê însan li ser e'rdê xuliqandîye, bin p'er'ê e'zmênda mîna evê kirina mezin qet qewimîye, yan hatîye bihîstinê? <sup>33</sup> Qet miletêkî dengê Xwedê ji nav agirda ku xeber dide bihîstîye, çawa ku te bihîst û sax mayî? <sup>34</sup> Yan xwedêkî kirîye ku bê û xwer'a miletê ji nava miletê din hilde, bi cêr'ibandina, nîşana, k'eremeta, şêr', bi destê zor û zenda dirêjkirî, bi xofa mezin, mîna h'emû tiştê ku Xudan Xwedêyê we bona we Misirêda li ber ç'e'vê te kir? <sup>35</sup> Ter'a hatibû dayînê ku tu bibînî, wekî tu bizanibî ku Xudan, Xwedê ye û pêştirî wî

xwedê t'une. <sup>36</sup>Ewî ji e'zmên da ku tu dengê wî bibihêyî, wekî te şîret ke, li ser e'rdê jî agirê xweyî mezin nîşanê te kir, te xeberêd wî ji nava êgirda bihîstin. <sup>37</sup>Çimkî ewî kal-bavêd te h'iz kirin û zur'eta wan paşî wan bijart, ewî xwexa tu ji Misirê bi qewata xweye mezin derxistî. <sup>38</sup>Wekî berî mileta de ji ber ç'e'vê te ku ji te mestir û qewattir in, te derbaz ke û e'rdêd wan çawa milk' bide te, mîna r'oja îroyîn. <sup>39</sup>Îro nas ke û dilê xweda xwey ke: Ku Xudan e Xwedê, jor li e'zmên, jêr li ser e'rdê yekî din t'uneye. <sup>40</sup>Qeyde-qanûn û e'mirêd wî xwey ke, k'îjana ku ez îro e'mirî li te dikim, wekî bona te qenc be, pey ter'a jî bona kur'êd te, usa jî e'mirê te dirêj be li ser e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te h'eta-h'etayê».

### Bajarêd r'evê

<sup>41</sup>Hingê Mûsa sê bajar wî alî Êrdunê alîyê r'ohilatê başqe kirin, <sup>42</sup>wekî mêrkujê ku yekî bê h'emdê xwe bikuje bir'eve li wir. Heger dijminatî nava wanda qet t'unebûye, bira ew bir'eve ji van her sê bajara yekî ku sax bimîne\*: <sup>43</sup>Besera ber'îyêda li deşta ç'îyê bona r'ûbênîya be, Ramot'a Gîle'dêda bona gadîya û Golana Başanêda bona minaşîya be.

<sup>44</sup>Ev e hînkirina ku Mûsa gote zar'êd Îsraêl. <sup>45</sup>Ev in ew şe'detî, qeyde-qanûn û qîrarêd ku Mûsa gote zar'êd Îsraêl pey ji Misirê derk'etina wanr'a, <sup>46</sup>alîyê r'ohilata Êrdunê newala pêşberî Bêt'-P'ihorê e'rdê Sîxonê p'adşê emorîyada ku H'eşbonê dima, k'îjan ku Mûsa û zar'êd îsraêlîya bindest kirin, pey ji Misirê derk'etina wanr'a. <sup>47</sup>Û wana e'rdê wî û e'rdê Ogê p'adşê Başanê, du p'adşêd emorîya wî alî Êrdunê alîyê r'ohilatê zeft kirin: <sup>48</sup>Ji E'rohêra devê sêlafa Arnonê h'eta ç'îyayê Sîryonê, awa gotî Hermonê, <sup>49</sup>t'evî t'emamîya E'rabayê wî alî Êrdunê alîyê r'ohilatê, h'eta Be'ra E'rabayê\* berp'ala Pîsgayê.

\* 4:42 Binihêr'e 19:1-13-da.

\* 4:49 Awa gotî «Be'ra Mirî».

## Gotina Mûsaye duda

### Wek'ilandina dehe t'emîya

**5** Mûsa gazî t'emamîya Îsraêl kir û gote wan: «Bibihê Îsraêl, qeyde-qanûn û qirarêd ku ez îro wer'a dibêjim. Hûn jî wan hîn bin û bikin ku wan biqedînin. <sup>2</sup>Xudan Xwedêyê me li ber H'orêbê\* peyman t'evî me girêda. <sup>3</sup>Xudan t'evî kalbavêd me eva peymana girênedada, lê xût t'evî me h'emûya, yêd ku îro sax-silamet li vir in. <sup>4</sup>Xudan li serê ç'îyê ji nava êgirda r'û bi r'û t'evî we xeberda. <sup>5</sup>Ez jî wî çaxî navbera we û Xudanda sekinîbûm, wekî xebera Xudan wer'a bêjim, çimkî hûn ji agir ditirsîyan û hilnedik'işîyane serê ç'îyê, hingê Xudan got:

<sup>6</sup>«Ez Xudan Xwedêyê te me, yê ku tu ji welatê Misirê, ji mala xulamtîyê derxistî. <sup>7</sup>Pêştirî min xwedêyê teye mayîn t'une bin.

<sup>8</sup>T'u p'ûtî mîna dilqê tiştekiîda xwer'a çê nekî, ne jor li e'zmên, ne jêr li ser e'rdê, ne jî nava avêd bin e'rdêda. <sup>9</sup>Ber wana ta nebî û xulamtîya wan nekî, çimkî ez Xudan Xwedêyê te Xwedêkî k'umr'eş im, ku bona neheqîyêd bava tînime serê zar'a h'eta nisilê sisîya û çara yêd ku dijenine min, <sup>10</sup>lê ewêd ku min h'iz dîkin û e'mirêd min diqedînin, ezê h'eta h'ezar nisilî bi h'uba amin t'evî wan bim.

<sup>11</sup>Navê Xudan Xwedêyê xwe badîhewa nedî ser zarê xwe, çimkî Xudan wê yê ku navê wî badîhewa dide ser zarê xwe bê ceza nehêle.

<sup>12</sup>R'ojaf şemîyê xwey ke û pîroz ke, çawa ku Xudan Xwedêyê te li te e'mir kir. <sup>13</sup>Şeş r'oja bixebite û h'emû şixulê xwe bike, <sup>14</sup>lê r'oja h'efta, şemîya r'ih'etîya bona Xudan Xwedêyê te ye, t'u şixulî nekî, ne tu, ne kur'ê te, ne qîza te, ne xulamê

---

\* 5:2 H'orêb navekî dinêyî Sînayê ye.

te, ne carîya te, ne gayê te, ne k'era te, ne h'eywanekî te, ne jî xerîbê nava teda, wekî xulam û carîya te mîna te r'i-h'et be. <sup>15</sup>Bîr bîne wekî tu xulam bûyî li e'rdê Misirêda û Xudan Xwedêyê te, tu ji wir derxistî, bi destê zor û zenda dirêjkirî, lema jî Xudan Xwedêyê te li te e'mir kir ku şemîya r'ih'etîyê xwey kî.

<sup>16</sup>Qedirê dê û bavê xwe bigirî, çawa ku Xudan Xwedêyê te li te e'mir kir, wekî e'mirê te dirêj be, wekî ter'a qenc be li ser e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te.

<sup>17</sup>Nekujî.

<sup>18</sup>Zinîyê nekî.

<sup>19</sup>Nedizî.

<sup>20</sup>Miqabilî t'u kesî şe'detîya derew nedî.

<sup>21</sup>Dilhavijîya k'ulfeta t'u kesî nekî. Ne dilhavijîya mala t'u kesî, ne e'rdê wî, ne xulamê wî, ne carîya wî, ne gayê wî, ne k'era wî, usa jî t'u tiştê t'u kesî.

<sup>22</sup>Ev xeberana Xudan h'emû civata wer'a, serê ç'îyê ji nava agirda, e'wr û te'rîstanîyêda, bi dengê bilind got û îdî zêde nekir. Ew li ser du selêd kevîrî nivîsîn û dane min. <sup>23</sup>Çaxê we deng ji nava te'rîstanîyê bihîst, ç'îya jî bi agir dişewitî, hingê hûn, h'emû serwêrêd qebîlêd we û r'ûspîyêd we nêzîkî min bûn, <sup>24</sup>û gotin: «Awa Xudan Xwedêyê me r'ûmeta xwe, mezinayîya xwe nîşanî me kir û me dengê wî ji nava agirda bihîst. Îro me dît, wekî Xwedê t'evî însên xeber dide û insan sax dimîne. <sup>25</sup>Niha çima em bimirin? Ev agirê hanî mezin wê me h'ûfî xwe ke, wekî em dîsa dengê Xudan Xwedêyê xwe bibihên, emê bimirin. <sup>26</sup>Çimkî k'îjanî xûn-goşt dengê Xwedêyê zêndî ku ji nava êgir xeberda mîna me bihîstîye û sax maye? <sup>27</sup>Tu her'e nêzîk be û bibihê h'emû çî ku Xudan Xwedêyê me wê bêje û tu t'emamî mer'a bêje. Çî ku Xudan Xwedêyê me wê bêje te, emê jî bibihên û biqedînin».

<sup>28</sup>Gava we t'evî min xeber dida, Xudan dengê we bihîst û Xudan gote min: «Min ew xeberêd ku evî miletî gote te

bihîst. H'emû çî ku wan got qenc e. <sup>29</sup>Xwezî nêt-fikirêd wan her gav ev be, ji min bitirsin û h'emû e'mirêd min biqedînin, wekî wan û zar'êd wanr'a h'eta-h'etayê qenc be! <sup>30</sup>Her'e bêje wan: «Veger'ine konêd xwe». <sup>31</sup>Lê tu li vir t'evî min bimîne, ezê h'emû e'mir, qeyde-qanûn û qirara bêjime te, tu jî cime'tê hînî van kî, wekî ew wan biqedînin li ser e'rdê ku ez didime wan xwer'a bikine milk'. <sup>32</sup>Bice'dînin usa bikin, çawa ku Xudan Xwedêyê we li we e'mir kir, ne ç'ep dager'in, ne jî r'ast. <sup>33</sup>T'enê wê r'êyêda her'in k'îjan ku Xudan Xwedêyê we li we e'mir kir, wekî hûn sax û silamet bin û r'ojêd we li ser e'rdê ku hûnê lê war bin, dirêj bin.

### T'emîya here mezin

**6** Ev in ew e'mir, qeyde-qanûn û qirarêd ku Xudan Xwedêyê we e'mirî li min kirin ku we hîn kim, wekî wî welatîda k'îjanî ku hûn diçinê lê war bin biqedînin. <sup>2</sup>Heger tu h'emû r'ojêd e'mirê xweda ji Xudan Xwedêyê xwe bitirsî, h'emû qeyde-qanûn û e'mirêd ku ez li te e'mir dikim, tu, kur'ê te û kur'ê kur'ê te biqedînin, hingê e'mirê teyê dirêj be. <sup>3</sup>Bibihê Îsraêl û bike ku biqedînî, wekî ter'a qenc be û hûn gelekî li hev zêde bin, li ser e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe, çawa ku Xudan Xwedêyê kal-bavêd te gotibû te.

<sup>4</sup>Bibihê Îsraêl! Xudan Xwedêyê me Xudanek e\*. <sup>5</sup>Xudan Xwedêyê xwe h'iz bike, bi t'emamîya dilê xwe, bi t'emamîya canîya xwe û bi t'emamîya qewata xwe. <sup>6</sup>Van xeberêd ku ez îro li we e'mir dikim bira dilêd weda bin. <sup>7</sup>Zar'êd xwe qenc hînî van ke. Bona van xeber de, gava mala xweda r'ûniştî bî, yan r'êda bî, yan p'aldayî bî yan r'adibî. <sup>8</sup>Û wan çawa nîşan li ser destê xwe girêde, usa jî bira ew li ser e'nîya te li navbera ç'e'vêd te bin, <sup>9</sup>wan li ser r'exderîyêd mala xwe û dergehêd bajarê xwe binivîse.

---

\* 6:4 Aha jî tê fe'mkirinê: «Xudan Xwedêyê me, t'enê ew e Xudan».

### **Xemkirina bona neguhdarîyê**

<sup>10</sup>Çaxê Xudan Xwedêyê te, te bibe wî e'rdî, k'îjan ku Xudan kal-bavêd te Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwar, ku bajarêd qenc û mezinva bide te, k'îjan ku te çênekirine, <sup>11</sup>malêd her tiştîva t'ijî, ku te t'ijî ne kirine, bîrêd vedayî, ku te venedane, baxê tirîya û zeyt'ûnê, ku te daneç'ikandine, tê bixwî û t'êr bî. <sup>12</sup>Haş ji xwe hebe, wekî tu Xudanê ku tu ji welatê Misirê, ji mala xulamtîyê derxistî bîr nekî. <sup>13</sup>Xudan Xwedêyê xwe bitirse, wîr'a xulamtîyê bike, bi navê wî sond bixwe. <sup>14</sup>Pey xwedêyêd başqeye milletêd dora xwe neçin, <sup>15</sup>çimkî Xudan Xwedêyê ku nava teda ye, Xwedêyê k'umr'eş e. Nebe ku hêrsa Xudan Xwedêyê te li ser te r'abe û ew te ji ser r'ûyê e'rdê unda ke.

<sup>16</sup>Xudan Xwedêyê xwe necêr'ibînin, çawa ku we li Massahê\* ew cêr'iband. <sup>17</sup>E'mirêd Xudan Xwedêyê xwe, şe'detîyêd wî û qeyde-qanûnêd wî, ku ewî li te e'mir kirin, qenc xweyî kin. <sup>18</sup>Li ber ç'e'vê Xudan r'astîyê û qencîyê bike, wekî ter'a qenc be û tu her'î li wî e'rdê qenc war bî, bona k'îjanî Xudan kal-bavêd ter'a sond xwar <sup>19</sup>ku h'emû dijminêd te wê ji ber te bêne r'aqetandinê, çawa ku Xudan got.

<sup>20</sup>Gava zar'êd te sibê ji te bipirsin, bêjin: «Me'na van şe'detî, qeyde-qanûn û qirara ku Xudan Xwedêyê me t'emî li we kirine, çi ne?» <sup>21</sup>Hingê bêje zar'êd xwe: «Em Misirêda xulamê Firewin bûn, lê Xudan em bi destê zor ji Misirê derxistin. <sup>22</sup>Xudan li Misirê, li ber ç'e'vêd me nîşan û k'eremetêd mezine qolayî anîne serê Firewin û t'emamîya mala wî. <sup>23</sup>Lê Xwedê em ji wir derxistin ku me bibe wî e'rdî, bona k'îjanî ku wî kal-bavêd mer'a sond xwar ku bide me. <sup>24</sup>Hingê Xudan li me e'mir kir ku h'emû van qeyde-qanûna xwey kin, ji Xudan Xwedêyê xwe bitirsin, wekî t'emamîya r'o'jêd meda mer'a

---

\* 6:16 Binihêr'e Derk'etin 17:1-7.

qenc be, me sax bihêle mîna r'oja îroyîn. <sup>25</sup>Mer'a r'astî wê bê h'esabê, wekî em van h'emû e'mira li ber Xudan Xwedêyê xwe bikin ku biqedînin, çawa ku wî li me e'mir kir».

### R'aqetandina mileta

**7** Gava Xudan Xwedêyê te te bibe wî e'rdê ku tu diçûyî lê war bî, ewê gelek millet ji ber te r'aqetîne: H'îtîya, gîrgaşîya, emorîya, kenanîya, pirîzzîya, h'îwîya, yebûsîya, h'eft milletêd ji te gelektir û zortir. <sup>2</sup>K'engê Xudan Xwedêyê te wan bide destê te, tu wan xî, hingê t'am qir'a wan bîne nifir'ê Xudan bîne sêrî, t'evî wan peymanê girênedê û h'eyfa te li wan neyê. <sup>3</sup>Pismamtîyê wanr'a neke, qîzêd xwe nedine kur'êd wan û ne jî qîzêd wan kur'êd xwer'a bixwazin, <sup>4</sup>çimkî ewê kur'êd te ji min bixalifînin û wê p'ûtêd başqer'a qulix kin, hingê hêrsa Xudan wê li ser we r'abe, ewê te zûtirekê unda ke. <sup>5</sup>Lê aha serê wan bikin: gorîgehêd<sup>f</sup> wan wêran kin, h'eykelêd wan hûrdexweşî kin, Aşêrahêd\* wan bibir'in û p'ûtêd wan bişewitînin. <sup>6</sup>Çimkî tu Xudan Xwedêyê xwer'a miletekî buhurtî-jibare yî. Xudan Xwedêyê te tu bijartî, wekî ji nav h'emû milletêd li ser t'opa dinê, tu bibî millet wîyî milk'ê wî.

<sup>7</sup>Xudan hûn ne bona p'ir'anîya weye ji h'emû mileta begem kirin û bijartin, çimkî hûn ji h'emû mileta hindiktir in. <sup>8</sup>Lê çimkî Xudan hûn h'iz kirin û usa jî bona qedandina sondê xwe, k'îjan ku wî kal-bavêd wer'a sond xwar, hûn bi destê zor derxistin û tu ji mala xulamtîyê, ji destê Firewin p'adşê Misirê azakirî. <sup>9</sup>Bizanibe ku Xudan Xwedêyê te, ew e Xwedê, Xwedêyê amin, ku peyman û h'uba xweye amin h'eta h'ezar nisilî xwey dike, bona wan, yêd ku wî h'iz dîkin û e'mirêd wî diqedînin. <sup>10</sup>Lê xût wan ku dijenine wî weke e'melêd wan wê wan unda ke, ew derengî nayêxe wê zûtirekî weke

---

\* 7:5 Aşêrah navê p'ûtêd milletêd kenanîya bûn, cûr'êd wan ne e'yan in, belkî mîna stûnêd ji dar bûn yan jî xwexa dar bûn.

e'melêd wan xût bide wan. <sup>11</sup>Tu van e'mir, qeyde-qanûn û qirara xwey ke, k'îjana ku ez îro li te e'mir dikim ku biqedînî.

### **Xudan wê te bimbarek ke heger tu guhdar bî**

<sup>12</sup>Heger hûn van qirara bibihên, xwey kin û biqedînî, hingê Xudan Xwedêyê te wê bona te peyman û aminîya xwe xwey ke, bona k'îjana ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar. <sup>13</sup>Ewê te h'iz bike, wê dua li te bike, te li hev zêde ke. Wê dua berê zikê te û berê e'rdê te, genim û şerava te, bizirê te, zayîna pez-dewarêd te bike, li ser e'rdê ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar bide te. <sup>14</sup>Ji h'emû mileta zêdetir duayê li te be, ne nava teda ne jî nava h'eywanêd teda bêber wê t'une bin. <sup>15</sup>Xudan wê her nexweşîyê dûrî te xe, t'u êşeke xirabe Misirê k'îjan ku tu zanî, wê neyne serê te. Lê wan wê bîne li serê wan h'emûyêd ku dijenine te. <sup>16</sup>Tê h'emû miletêd ku Xudan Xwedê dide destê te, undakî, bira h'eyfa te li wan neyê, xwedêyêd wan'r'a qulix nekî, çimkî ew yek bona te t'ele ye.

<sup>17</sup>Belkî tu dilê xweda bêjî: «Ev miletana ji min gelectir in, çawa ez dikarim berî wan dim?» <sup>18</sup>Ji wan netirse. Çi ku Xudan Xwedêyê te anî serê Firewin û t'emamîya Misirê, <sup>19</sup>ew cêr'ibandîne mezîna ku te bi ç'e'vêd xwe dîtin, nîşan, k'eremet, destê qewat û zenda dirêjkirî, bi k'îjana Xudan Xwedêyê te tu derxistî r'ind bîr bîne. Usa jî Xudan Xwedêyê te wê bîne serê wan mileta ji k'îjana ku tu ditirsî. <sup>20</sup>Xudan Xwedêyê te wê tirs û xofê\* jî bişîne ser wan, h'eta ku yêd mayî û yêd xwe ji te veşartî nemirin. <sup>21</sup>Ji wan nebizde, çimkî Xudan Xwedêyê te ku nava teda ye, Xudanê mezîna û xof e. <sup>22</sup>Û Xudan Xwedêyê te hêdî-hêdî wê van mileta ji ber te r'aqetîne. Tu nikarî wana carekêr'a unda kî, wekî terewilêd çolê li ser te zêde nebin. <sup>23</sup>Xudan Xwedêyê te wê wan bide destê te, wê t'evîhevbûneke mezîna bike nava wan, h'eta ku

---

\* 7:20 Welger'andina yûnanîye kevinda «Moza».

qir'a wan bê. <sup>24</sup>P'adşêd wan wê bide destê te, tê navê wan ji bin p'er'ê e'zmênda unda kî, t'u kesê li ber te teyax neke, h'eta ku tu wan qir' nekî. <sup>25</sup>P'ûtêd xwedêyêd wan bişewitînin, dilhavijîya zêr' û zîvê ser wan neke û wan xwer'a hilnedî, wekî bi vê yekê nek'evî t'elê, çimkî ew li ber Xudan Xwedêyê te k'irêtî ye. <sup>26</sup>Ne jî k'irêtîyê bibî mala xwe ku mîna wê nifir' li te be û qir'a te bê. Ji wê zivêr be, bira ew bona te k'irêtî be, çimkî ew gere bê undakirinê ku nifir'ê Xudan bê sêrî.

### Warbûna e'rdê qenc

**8** H'emû e'mirêd ku ez îro li we dikim, bikin ku wan biqedînin, wekî hûn sax-silamet bin, li hev zêde bin her'in wî e'rdî war bin, bona k'îjanî Xudan kal-bavêd wer'a sond xwar. <sup>2</sup>Bîr bîne t'emamîya r'îya ber'îyêda, k'îjanîda Xudan Xwedêyê te eva çil sale ku te dibe, bona ku te ta ke, bicêr'ibîne, wekî bizanibe çi dilê teda heye, k'a tê e'mirêd wî biqedînî yan na. <sup>3</sup>Ewî tu ta kirî, bir'çî hiştî û mana\* tu dayî xwarinê, k'îjan ne te zanibû çîye ne jî kal-bavêd te. Wekî teva e'yan ke ku însan t'enê bi nênanajî, lê bi her tiştê ku ji devê Xudan derdik'eve dijî. <sup>4</sup>Eva çil sal e ne k'incê li ser te maşîyan, ne jî nigê te werimîn. <sup>5</sup>Dilê teva bira e'yan be, wekî çawa ku meriv zar'ê xwe hiltê, usa jî Xudan Xwedêyê te li te hiltê. <sup>6</sup>E'mirêd Xudan Xwedêyê xwe biqedînî, r'îyêd wîda her'î û ji wî bitirsî. <sup>7</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê te, te dibe e'rdê qenc, e'rdê ku cewêd ava, kanîya û avêd bine'rd li ç'îya û newala dertên, <sup>8</sup>e'rdê t'îjî genim, cehe, baxê tirîya, hêjîra, h'inara, e'rdê bizirê zeyt'ûnê û hingiv. <sup>9</sup>E'rdê ku tê nanê xwe bê minet bixwî, li wir kêmasîya t'u tiştî tê nebînî, kevirêd wî e'rdî t'îjî h'esin in, ji ç'îya tê sifir derxî. <sup>10</sup>Tê bixwî û t'êr bî, Xudan Xwedêyê xwe tê bimbarek kî, bona e'rdê qenc, k'îjan ku wî da te.

\* 8:3 Binihêr'e Derk'etin 16 û Jimar 11:7-9.

### Xudan bîr neke

<sup>11</sup>Haş ji xwe hebe tu Xudan Xwedêyê xwe bîr nekî. E'mir, qirar û qeyde-qanûnêd wî, ku ez îro li te e'mir dikim net'er'ibînî. <sup>12</sup>Heger na, gava tu t'êr bixwî, malêd bedew çêkî û wanda bijîyî, <sup>13</sup>pez û dewarêd te zêde bin, zêr' û zîvê te zêde bin, her tiştîda xinê bî, <sup>14</sup>hingê dilê teyê babax be tê Xudan Xwedêyê xwe ku tu ji welatê Misirê, ji mala xulamtîyê derxistî bîr bikî. <sup>15</sup>Xudan tu ber'îya mezin û xofr'a derbaz kirî, k'îderê me'rê je'rdadayî û dûpişk in. Ji e'rdê h'işkî bê av, ji qeyayê qewîn ter'a av derxist. <sup>16</sup>Ber'îyêda bi manayê tu t'êr kirî, k'îjan ku kal-bavêd te nizanibûn ew çîye. Ku te ta ke û bicêr'ibîne wekî xilazîyê ter'a qencîyê bike. <sup>17</sup>Dilê xweda nebêjî: «Qewata min û zorayîya destêd min eva hebûka minr'a qazinc kirine». <sup>18</sup>Lê Xudan Xwedêyê xwe bîr bîne, çimkî ew qewatê dide te ku hebûkê qazinc kî, wekî peymana xweye ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar biqedîne, mîna r'oja îroyîn. <sup>19</sup>Heger tu Xudan Xwedêyê xwe bîr bikî û pey xwedêyêd başqe her'î, wanr'a qulix kî û ber wan ta bî, ez îro e'lamî we dikim ku e'se wê qir'a we bê. <sup>20</sup>Çawa ew milletêd ku Xudan ber we qir' dike usa jî hûnê bêne qir'kirinê, wekî gur'a Xudan Xwedêyê xwe nekin.

### Xudanê alîyê Îsraêl bike

**9** Bibihê Îsraêl! Îro tu Êrdunêr'a derbaz dibî ku her'î û milletêd te mestir, te qewattir, bajarêd mezine h'eta e'zmên sûrkirî war bî. <sup>2</sup>Miletê mezin û bilind, zar'êd enaqîyaf, te ew nas dikirin û bona wan te bihîstibû, ku tê gotin: «K'ê wê ber zar'êd Enaqîya teyax ke?» <sup>3</sup>Lê tu îro bizanibe ku Xudan Xwedêyê te çawa agirê p'er'itandinê pêşîya teva diçe. Ewê wan unda ke, li ber te ta ke, tê berî wan dî û zûtirekî wan qir' kî, çawa ku Xudan gotibû te. <sup>4</sup>Gava ku Xudan Xwedêyê te wan dîrî te xe, dilê xweda nebêjî: «Bona r'astîya min

Xudan ez anîme vî welatî lê war bim». Lê bona neheqîya van mileta Xudan berî wan dide. <sup>5</sup>Ne bona heqîya te, ne jî r'astîya dilê te tu diçî welatê wan war bî. Lê Xudan Xwedêyê te bona neheqîya van mileta berî wan dide ji ber te û bona sozê xwe ku kal-bavêd te: Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwaribû, bîne sêrî. <sup>6</sup>Bizanibe! Xudan Xwedêyê te ne bona r'astîya te vî welatê qenc dide te ku lê war bî, çimkî tu miletekî serh'işk î.

### Zar'êd Îsraêl golika zêr'in r'odikin

<sup>7</sup>Bike bîra xwe û bîr neke ku te ber'îyêda çiqasî hêrsa Xudan Xwedêyê xwe r'akirîye. Ji wê r'oja ku tu ji welatê Misirê derketî h'eta hatina weye li vî cîyî hûn miqabilî Xudan bûn. <sup>8</sup>Ber ç'îyayê H'orêbê\* we Xudan hêrs xist. Hêrsa Xudan li we r'abû usa ku wî xwest we qir' ke. <sup>9</sup>Ez hilk'işîyame serê ç'îyê, wekî selêd kevirî, selêd peymanî Xudan t'evî we girêda hildim. Hingê ez li serê ç'îyê çil r'ojî û çil şevî bê nan û bê av mam. <sup>10</sup>Xudan ew her du selêd kevirîye ku bi t'ilîya Xwedê hatibûne nivîsarê dane min. H'emû xeberêd ku Xudan li serê ç'îyê ji nava êgirda r'oja civatê gotibû we, li ser wan bûn. <sup>11</sup>Bi vî awayî xilazîya van çil r'oj û çil şevî Xudan ew her du selêd kevirîye peymanê dane min. <sup>12</sup>Hingê Xudan gote min: «R'abe zû ji vir peya be, çimkî cime'ta te, k'îjan ku te ji Misirê derxist, ji r'ê şih'itî. Ew zû ji wê r'îya ku min li wan e'mir kir xalifîn, wana xwer'a p'ût r'okir». <sup>13</sup>Hingê Xudan minr'a xeber da û got: «Min dît eva mileta, va ye ew miletekî serh'işk e. <sup>14</sup>Bihêle ezê qir'a wan bînim, navê wan bin p'er'ê e'zmênda r'esît kim. Lê ji te miletekî wan qewattir û mestir pêşda bînim».

<sup>15</sup>Hingê agir ç'îyê k'etibû, ez vege'îyam her du selêd peymanêye kevirî destêd minda ji ç'îyê hatime xarê. <sup>16</sup>Min

\* <sup>9:8</sup> H'orêb navekî dinêyî Sînayê ye.

dît va ye we ber Xudan Xwedêyê xwe gune kirîye, xwer'a p'ûtekî golikê r'okirîye. Hûn zû ji wê r'îya ku Xudan li we e'mir kir xalifîn. <sup>17</sup>Min jî her du sel hildan, bi her du destêd xwe ew avîtin û li ber ç'e'vêd we hûrdexweşî kirin.

### Mûsa bona zar'êd Îsraêl dua dike

<sup>18</sup>Min dîsa mîna berê xwe avîte li ber Xudan, çil r'oj û çil şevî, min ne nan xwar ne jî av vexwar, bona h'emû gunêd we, bi k'îjana we xirabî li ber Xudan kir, hêrsa wî r'akir. <sup>19</sup>Ez ji hêrs û xezeba Xudan tirsîyam, çimkî hêrsa wî li ser we r'abû û wî xwest we qir' ke. Lê vê carê jî Xudan dengê min bihîst. <sup>20</sup>Û Xudan li ser Harûn gelekî hêrs k'et, xwest k'oka wî bîne, lê min hingê bona Harûn jî dua kir. <sup>21</sup>Min gunê we, ew golika we çêkirî hilda û agirda h'eland. Peyr'a min ew şkenand û hûr-hûrî kir kire t'oz. Min ew t'oz r'eşande sêlafa ku ji ç'îyê dik'îşîya.

<sup>22</sup>Li T'ave'rayê, Massahê û li Qîbrot-Hat'awayê jî we hêrsa Xudan r'akir\*.

<sup>23</sup>Hingê Xudan hûn ji Qadêş-Barnêayê\* şandin û got: «Hevraz her'in û e'rdê ku ez didime we lê war bin». Lê hûn miqabilî gotina Xudan Xwedêyê xwe çûn û we bawerîya xwe wî ne anî û gur'a wî nekir. <sup>24</sup>Ji wê r'ojêda ku min hûn nas kirine, hûn miqabilî Xudan in.

<sup>25</sup>Ez nava wî çil r'oj û çil şevîda dever'ûya k'etibûme li ber Xudan. Dever'ûya li ber Xudan k'etibûm çimkî Xudan dixwest qir'a we banîya. <sup>26</sup>Min r'eca ji Xudan dikir û digot: «Xudan Xweyê min! Miletê xwe, awa gotî warê xwe qir' neke, k'îjan te bi mezinayîya xwe xilaz kir û ji Misirê bi destê zor derxist. <sup>27</sup>Bîr bîne xulamêd xwe Birahîm, Îshaq û Aqûb, dîna

---

\* <sup>9:22</sup> Bona T'ave'rayê binihêr'e Jimar 11:1-3. Bona Massahê binihêr'e Derk'etin 17:1-7. Bona Qîbrot-Hat'awayê binihêr'e Jimar 11:31-34.

\* <sup>9:23</sup> Binihêr'e Qanûna Ducarî 1:19-28.

xwe nede serh'işkî, neheqî û gunê vî miletî, <sup>28</sup>wekî nebe ew welatê ku te em ji nava wî derxistin, bêje: «Xudan nikaribû ew bibirana wî e'rdê ku wî soz dabû wan, lê ew ber ç'e'vê wî r'eş bûn, lema ew derxistin ku ber'îyêda bikuje». <sup>29</sup>Lê ew miletê te ye, warê te, k'îjan ku te bi qewata xweye mezin û bi zenda xweye dirêjkirî derxist».

### Mûsa du selêd kevirîye nû distîne

**10** Wê hingê Xudan gote min: «Xwer'a du selêd kevirî mîna yê berê bit'er'işîne û hilk'işe serê ç'îyê cem min, usa jî sindoqeke darîn çêke. <sup>2</sup>Û ezê li ser sela, wan xeberêd ku li ser selêd pêşîyêye ku te şkenandin binivîsim û wan bike hindur'ê sindoqê. <sup>3</sup>Hingê min sindoq ji dara darcêwîyêf çêkir, du selêd kevirî mîna yê berê t'er'işandin û ew her du sel destêd minda hilk'işîyame serê ç'îyê. <sup>4</sup>Ew dehe t'emîyêd ku Xudan li serê ç'îyê ji nava êgirda r'oja civatê gote we, ewî ew li ser sela nivîsîn, çawa ku berê nivîsîbû. Xudan ew dane min <sup>5</sup>û ez vege'îyam ji ç'îyê hatime xarê. Sel kirine hindur'ê sindoqa mine çêkirî, ew li wir man çawa ku Xudan li min e'mir kir.

### Mirina Harûn û borcê lêwîya

<sup>6</sup>(Hingê zar'êd Îsraêl ji Bêrot'-Binê-Yahakanê çûne Mosêrayê. Li wir Harûn mir û wir hate definkirinê, dewsa wî Êlazarê kur'ê wî bû k'ahîn. <sup>7</sup>Ji vir çûne Gûdgodahê, ji Gûdgodahê çûne Yotbat'ayê e'rdê nixalêd ava.

<sup>8</sup>Wî çaxî Xudan qebîla Lêwî başqe kir ku Sindoqa<sup>f</sup> Peymana Xudan bibin, li ber Xudan bisekinin, wî'r'a qulix kin û bi navê wî bimbarek kin, h'eta r'oja îroîn. <sup>9</sup>Lema p'ar û milk'ê Lêwî t'evî birayêd wî t'une. Xudan xwexa ye milk'ê wî, çawa ku Xudan Xwedêyê te gotibû wî\*.)

---

\* <sup>10:9</sup> Binihêr'e Jimar 18:20-24.

### **Xudan caba dua Mûsa dide**

<sup>10</sup>Ez jî mîna berê çil r'oj û çil şevî li serê ç'îyê bûm. Vê carê jî Xudan dengê min bihîst û Xudan nexwest qir'a te bîne. <sup>11</sup>Û Xudan gote min: «R'abe r'êk'eve pêşîya milletva her'e, bira ew her'in e'rdê ku min kal-bavêd wanr'a sond xwar bidime wan, xwer'a bikine milk'».

### **Pesin û qedir bidine Xudan**

<sup>12</sup>Xudan Xwedêyê te niha çi ji te dixwaze Îsraêl? Ew t'enê dixwaze ku tu ji Xudan Xwedêyê xwe bitirsî, h'emû r'îyêd wîda her'î, wî h'iz bikî û wîr'a qulix kî, bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe, <sup>13</sup>e'mir û qeyde-qanûnêd Xudan xweyî kî, k'îjan ku ez niha bona qencîya te li te e'mir dikim. <sup>14</sup>E'zman û e'zmanê e'zmana, e'rd û h'emû çi li ser e yê Xudan Xwedêyê te ye, <sup>15</sup>lê Xudan t'enê kal-bavêd te begem kirin, ew h'iz kirin, pey wanr'a jî zur'etêd wan bi-jartin awa gotî hûn, ji nava h'emû mileta, mîna r'oja îroyîn. <sup>16</sup>Niha gur'a Xudan bikin\* û vir şûnda ser h'işk nîbin. <sup>17</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê we, ew Xwedêyê xwedêya ye, Xweyê xweya ye, Xwedêyê mezin, qewat û saw e. Firqîyê nake û r'uşetê jî hilnade. <sup>18</sup>Ew heqîyê li sêwî û jinebîya dike, yê xerîb h'iz dike û wan nan û k'inc dike. <sup>19</sup>Usa jî hûn xerîba h'iz bikin, çimkî hûn xwexa jî xerîb bûn welatê Misirêda. <sup>20</sup>Ji Xudan Xwedêyê xwe bitirse, xulamtîyê wîr'a bike, xwe wî bigire û bi navê wî sond bixwe. <sup>21</sup>Pesina bide wî, ew e Xwedêyê te, k'îjanî bona te ew kirêd mezin û h'eyre-h'ujmek'ar kirin, k'îjan ku te bi ç'e'vêd xwe dîtin. <sup>22</sup>Bi h'eftê nefsî kal-bavêd te berjêrî Misirê bûn, lê niha Xudan Xwedêyê te, tu mîna steyrkêd e'zmên bê h'esab kirî.

---

\* <sup>10:16</sup> Îbranî<sup>f</sup> xeber bi xeber «Dilê xwe sinet kin». Sinetkirin nîşana sondê nava Xwedê û Îsraêl e. Fikira vê r'êzê ew e ku cime't gere ji wan r'îyêd xweye xirab vege'ere.

### Kirinêd Xudane zor

**11** Xudan Xwedêyê xwe h'iz bike, fermanêd wî, qeyde-qanûnêd wî, qîrarêd wî û e'mirêd wî her r'oj biqedîne. <sup>2</sup>Hûn îro şîretêd Xudan Xwedêyê xwe zanin, lê ne zar'êd we. Çîmkî ew nezanin û ne jî dîtine mezinayîya wî, destê wîyî qewat û zenda dirêjkirî, <sup>3</sup>nîşanêd wî, kirêd wî, k'îjan ku wî nava misirîyada anî li serê Firewin p'adşê Misirê û li serê t'emamîya welatê wî. <sup>4</sup>Usa jî çî ku Xudan anî li serê eskerêd Misirê, hesp û e'rebêd wan, gava wana dabûne pey we, çawa Xudan ava Be'ra Sor ser wanda vege'and û ew qir' kirin h'eta-h'etayê. <sup>5</sup>Ewî ber'îyêda çî kir bona we, h'eta hatina weye vî cîyî. <sup>6</sup>Çî anî serê Dat'an û Abîram, kur'êd Elyabê kur'ê R'ûbên, çawa e'rdê devê xwe vekir ew neferava, çadirava û h'emû heyîna wanva, ji nava Îsraêl h'ûfî xwe kir\*. <sup>7</sup>Lê belê ç'e'vêd we h'emû kirinêd zore ku Xudan kirin dîtin.

### Xudanê dua e'rdê sozdayî bike

<sup>8</sup>H'emû e'mirêd ku ez îro li we e'mir dikim xweyî kin, wekî hûn qewat bin derbaz bin û her'in wî e'rdî xwer'a bikine milk'. <sup>9</sup>Wekî e'mirê we dirêj be li ser wî e'rdî, bona k'îjanî Xudan kal-bavêd wer'a sond xwar ku bide wan û zur'eta wan, e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe. <sup>10</sup>Çîmkî e'rdê ku tu diçî xwer'a bikî milk', ew ne mîna welatê Misirê ye, ji k'îjanî tu derk'etî, k'îderê ku te t'oxim dir'eşand û bi cefa\* av dida, mîna baxçe. <sup>11</sup>Lê e'rdê ku hûn derbaz dibinê xwer'a biki-ne milk', ew e'rdê ç'îya û newala ye ku ji barana e'zmên tê avdanê. <sup>12</sup>E'rdê ku Xudan Xwedêyê te bona wê xem dike,

---

\* 11:6 Binihêr'e Jimar 16.

\* 11:10 Îbranî xeber bi xeber «Bi nigê xwe». Me'na van xebera t'am ne e'yan e, belkî meriva nigê xwe li ser xwelîyêva dik'işandin û ew dibû mîna cawê ku av wêr'a bik'işîya, yan bi nigê xwe r'îya avê ku li nava wê cewêda dik'işîya diguhastin.

ç'e'vêd Xudan Xwedêyê te her gav li ser e, ji destpêbûna salê h'eta k'utabûna salê.

<sup>13</sup>Heger hûn r'ind guh bidine e'mirêd min, k'îjan ku ez îro li we e'mir dikim, usa jî Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikin û bi t'emamîya dilê xwe, bi t'emamîya nefsa xwe wîr'a qulix kin, <sup>14</sup>hingê ezê barana payîzê û baharê wextda bidime e'rdê we ku tu genimê xwe, meya xwe û bizirê xwe hildî. <sup>15</sup>Ezê li çol-bestêd te, bona h'eywanêd te gîhê şîn kim. Xwarina te jî wê t'ijî be, tê bixwî û t'êr bî. <sup>16</sup>Haş ji xwe hebin, wekî dilê we neyê xapandinê û hûn neşih'itin, ber xwedêyê başqe ta nebin wanr'a qulix nekin, <sup>17</sup>ku hêrsa Xudan li we r'anebe, ew e'zmên dade, baran t'unebe û e'rd berê xwe nede, hingê hûnê zûtirekê unda bin li ser vî e'rdê qenc ku Xudan dide we.

<sup>18</sup>Lê van xeberêd min nava xwe û dilê xweda xweyî kin, wan çawa nîşan li ser destê xwe girêdin û usa jî bira ew li ser e'nîya we li navbera ç'e'vêd weda bin. <sup>19</sup>Zar'êd xwe hînî wan kin. Van xebera wanr'a gilî kî gava mala xweda r'ûniştî yî yan r'êda yî, gava p'alididî û gava r'adibî, <sup>20</sup>wan li ser rexderîyêd mala xwe û dergehêd bajarê xwe binivîse, <sup>21</sup>wekî li ser wî e'rdî k'îjan ku Xudan kal-bavêd wer'a sond xwar ku bide wan, r'ojêd e'mirê we û r'ojêd e'mirê zar'êd we usa dirêj bin çawa r'ojêd e'zmên li ser dinê.

<sup>22</sup>Heger hûn van h'emû e'mira qenc xweyî kin, k'îjan ku ez li we e'mir dikim ku biqedînin, Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikin, h'emû r'îyêd wîda her'in û xwe li wî bigirin, <sup>23</sup>hingê Xudanê ji ber we berî li van h'emû mileta de û hûnê miletêd ji xwe mestir û qewattir bikin bindest. <sup>24</sup>Her cîyê ku pe'nîya nigê we lêk'eve, wê bibe ya we. Ji ber'îyê h'eta Lubnanê, ji ç'emê Firatê h'eta Be'ra Navberê\* wê bibe sînorê we. <sup>25</sup>T'u kesê li ber we teyax neke, Xudan Xwedêyê we wê tirs û xofa

---

\* 11:24 Têk'sta îbranîda nivîsar e «Be'ra K'utasîyê», ew be'sa Be'ra Navberê dike awa gotî Be'ra Sipî.

we bike li ser h'emû welatê ku hûnê nigêd xwe bavêjinê, çawa ku wî gotibû we.

<sup>26</sup>Ez îro dua û nifirê datîname li ber we, bibijêrin: <sup>27</sup>Dua ev e, heger hûn guh bidine e'mirêd Xudan Xwedêyê xwe, k'îjan ku ez îro li we e'mir dikim, <sup>28</sup>lê nifir' ev e, heger hûn guh nedine e'mirêd Xudan Xwedêyê xwe, ji vê r'îyê bişih'itin, k'îjan ku ez îro li we e'mir dikim û li pey xwedêyêd başqe ku hûn nas nakin her'in.

<sup>29</sup>Û gava Xudan Xwedêyê te, te bibe wî e'rdî, k'îjanî ku tu diçî xwer'a bikî milk', li ser ç'îyayê Girîzîmê tê dua e'lam kî û li ser ç'îyayê Eybal tê nifir' e'lam kî. <sup>30</sup>Ev ç'îya alîyê r'oavaya Êrdunê, pey r'îya r'oavayê, li e'rdê kenanîyada<sup>f</sup> ne yêd ku E'rabada pêşberî Gîlgalê nêzîkî me'za\* Moreh dimînin. <sup>31</sup>Hûn Êrdunêr'a derbaz dibin, wekî her'in û wî e'rdî xwer'a bikine milk', k'îjan ku Xudan Xwedêyê we dide we. Hingê hûnê xwer'a bikine milk', li wir bijîn, <sup>32</sup>bikin ku wan h'emû qeyde-qanûn û qirarêd ku ez îro datîname li ber we biqedînin.

### Cîyê qulix kirinê

**12** Ev in qeyde-qanûn û qirarêd ku hûn gerekê bikin ku biqedînin, li ser wî e'rdî k'îjan ku Xudan Xwedêyê kal-bavêd te wê çawa milk' bide te, h'emû r'ojêd ku hûn li ser dinê bijîn. <sup>2</sup>Ew h'emû cîyêd wan mileta ku hûn diçinê xwer'a bikine milk', k'îderê ew xwedêyêd xwer'a qulix dikin: Ser ç'îya-banîya, ser gira û bin her dareke bi ç'iqil û belgada six t'emamî wêran kin. <sup>3</sup>Gorîgehêd wan wêran kin, h'eykelêd wan hûrdexweşî kin, Aşêrahêd\* wan bişewitînin, p'ûtêd wan bibir'in û navêd wan li wî cîyî r'esît kin. <sup>4</sup>Hûn mîna wan Xudan Xwedêyê xwer'a qulix nekin. <sup>5</sup>Lê wî cîyî ku Xudan Xwedêyê we wê bibijêre, ji nava h'emû qebîlêd

\* 11:30 Dara xirnûfê.

\* 12:3 Binihêr'e şirovekirina Qanûna Ducarî 7:5.

weda ku li wir navê xwe lê dayne, xwe li wî cîyî bigirin û her'ine wir, <sup>6</sup>dîyarîyêd<sup>f</sup> xweye t'evayîşewatê, qurbanêd xwe, dehekêd<sup>f</sup> xwe, dîyarîyêd destê xwe, sozêd xwe, dîyarîyêd xweye r'ezedilîyê, nixurîyêd pez û dewarêd xwe bibine li wir. <sup>7</sup>Li wir ber Xudan Xwedêyê xwe hûn neferêd xweva bixwin û şa bin, bona her kirina destêd xwe ku Xudan Xwedêyêd te tu bimbarek kirî.

<sup>8</sup>Hûn gere van tiştê nekin, çawa ku dilê we dixwaze, çi ku ji me her kes îro li vir dike, <sup>9</sup>çimkî hûn hê nek'etine cîyê r'ih'etîyê û warê ku Xudan Xwedêyê te dide te. <sup>10</sup>Gava hûn Êrdunêr'a derbaz bine wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê we di-de we, xwer'a bikine milk', ewê r'ih'etîyê bide we ji h'emû dijminêd dora we, hingê hûnê bê qezî bijîn. <sup>11</sup>Wî cîyê ku Xudan Xwedêyê we wê bibijêre ku navê xwe lê dayne, her tiştî bibine wir, çawa ku ez t'emî li we dikim, awa gotî: Dîyarîyêd xweye t'evayîşewatê, qurbanêd xwe, dehekêd xwe, dîyarîyêd destê xwe û h'emû h'edîyêd xweye sozdayîye jibare, k'îjana ku hûnê Xudan'r'a soz bidin. <sup>12</sup>Û li ber Xudan Xwedêyê xwe şa bin, hûn û kur'êd we, qîzêd we, xulamêd we, carîyêd we, usa jî lêwîyê bajarêd weda, çimkî p'ar û warê wî t'evî we t'une.

<sup>13</sup>Haş ji xwe hebe dîyarîyêd xweye t'evayîşewatê her cîyê ku te xweş tê nekî, <sup>14</sup>lê t'enê wî cîyî ku Xudanê ji nava qebîleke te bibijêre, li wir dîyarîyêd xweye t'evayîşewatê û her tiştî çi ku ez li te e'mir dikim bike.

<sup>15</sup>Lê tu dikarî li her bajarê xweda, weke wê bimbarekîya Xudan Xwedêyê xwe h'eywên serjêkî û goşt bixwî, çawa ku dilê te xweş tê. Paqij û ne paqij dikarin ji wî bixwin, mîna kara xezalê û bizina k'ûvî. <sup>16</sup>T'enê xûnê nexwin, wê mîna avê bir'êjine li ser e'rdê. <sup>17</sup>Îzina te t'une ku tu bajarêd xweda deheka genimê xwe, meya xwe, bizirê xwe, ne jî nixurîyêd pez-dewarêd xwe, h'emû dîyarîyêd xweye sozdayî, dîyarîyêd xweye r'ezedilîyê û dîyarîyêd destêd xwe bixwî. <sup>18</sup>Lê tu gere van li ber Xudan Xwedêyê xwe li wî cîyî ku Xudan Xwedêyê

te wê bibijêre bixwî. Bi vî awayî, bona her kirina destêd te, tu t'evî kur'ê xwe, qîza xwe, xulamê xwe, carîya xwe û lêwîyê bajarêd xweda li ber Xudan Xwedêyê xwe şa bin. <sup>19</sup>Haş ji xwe hebe wekî t'emamîya r'ojêd xweda li ser e'rdê xwe bona lêwî tu xem bikî.

<sup>20</sup>Gava Xudan Xwedêyê te sînore te berfire ke, çawa ku wî gote te û dilê te goşt bixwaze û bêjî: «Ezê goşt bixwim» hingê çiqasî dixwazî goşt bixwe. <sup>21</sup>Lê heger ew cîyê ku Xudan Xwedêyê te bibijêre bona ku navê xwe lê dayne, gelek dûrî te be, hingê ji pez û dewarêd xwe, k'îjan ku Xudan dane te, çawa ku min li te e'mir kir serjêke û bajarêd xweda çiqas ku dilê te dixwaze bixwe. <sup>22</sup>T'enê wê çawa kara xezalê û bizina k'ûvî dixwin usa bixwe, paqij û ne paqij dikarin wê bixwin. <sup>23</sup>Lê nebî-nebî ku tu xûnê bixwî, çimkî xûn e'mir e, e'mir t'evî goşt nexwî. <sup>24</sup>Wê nexwe, mîna avê bir'êje li ser e'rdê. <sup>25</sup>Wê nexwe wekî ter'a û pey ter'a jî zar'êd ter'a qenc be, heger tu heqîyê li ber ç'e'vê Xudan bikî. <sup>26</sup>T'enê dayînêd xweye pîroz yan sozdayî hilde were li wî cîyî ku Xudanê bibijêre. <sup>27</sup>Dîyarîyêd xweye t'evayîşewatê, awa gotî goşt û xûnê, li ser gorîgeha Xudan Xwedêyê xwe bide. Xûna qurbanêd xweye din gere bir'êjî li ser gorîgeha Xudan Xwedêyê xwe û goşt bixwî. <sup>28</sup>R'ind guh bide h'emû van xeberêd ku ez li te e'mir dikim, wekî ter'a, pey ter'a jî zar'êd ter'a qenc be h'eta-h'etayê, heger heqîyê û r'astîyê li ber ç'e'vê Xudan Xwedêyê xwe bikî.

### P'ûtar'a qulix neke

<sup>29</sup>Xudan Xwedêyê te wan miletêd pêşîya te ku tu diçî berî wan dî wê qir' ke. Gava te berî wan da û e'rdê wan xwer'a kire milk', <sup>30</sup>haş ji xwe hebe ku tu p'êgeha wanda nek'evî t'elê, gava ew li ber te bêne qir'kirinê, xwedêyêd wan neger'î, bêjî: «Ev miletana çawa xwedêyêd xwer'a qulix dikin? Ezê jî usa bikim». <sup>31</sup>Tu Xudan Xwedêyê xwer'a usa neke. Çimkî wana xwedêyêd xwer'a h'emû cûr'e k'irêtî

dikirin yêd ku li ber Xudan r'eş in. Ew h'eta kur' û qîzêd xwe jî li ser agir xwedêyêd xwer'a dişewitînin. <sup>32</sup>H'emû çî ku ez li we e'mir dikim bikin ku biqedînin. Ne li serda zêde kin ne jî kê m kin.

### Gur'a k'îjan p'êxemberîf bikin

**13** Heger ji nava teda p'êxember, yan yê xewna şirovedike derê û nîşan, yan k'eremetekê eşeret ke <sup>2</sup>û ew nîşan yan k'eremeta ku wî gotibû te bê sêrî, lê ew bêje: «Em li pey xwedêyêd başqe ku tu nas nakî her'in û em wanr'a qulix kin», <sup>3</sup>tu gur'a wî p'êxemberî yan yê xewna şirovedike neke. Çimkî Xudan Xwedêyê we, we dicêr'ibîne, wekî bizanibe hûn Xudan Xwedêyê xwe h'iz dikin bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya canîya xwe, yan na. <sup>4</sup>Pey Xudan Xwedêyê xwe her'in, ji wî bitirsîn, e'mirêd wî xweyî kin, guh bidine wî, wîr'a qulix kin û xwe li wî bigirin. <sup>5</sup>Lê ew p'êxember yan yê xewna şirovedike gere bê kuştinê. Çimkî ew we miqabilî wî Xudan Xwedêyê we r'adike, k'îjanî ku hûn ji welatê Misirê derxistin û ji wê mala xulamtîyê xilaz kirin, ew dike ku we ji wê r'êyê bixalifîne, k'îjan ku Xudan Xwedêyê we li we e'mir kiribû têda her'in. Bi vî awayî xirabîyê ji nava xweda r'awva derxe.

<sup>6</sup>Heger birê te, kur'ê dîya te, kur'ê te, qîza te, k'ulfeta p'aşila teda, yan destebirakê te, te r'azî ke dizîva bêje: «Werin em her'in xwedêyêd başqer'a qulix kin», ku ne te nas kirine ne jî kal-bavêd te, <sup>7</sup>xwedêyêd miletêd dora xwer'a, heger nêzîkî te bin, yan dûrî te, ji serîkî e'rdê h'eta serê din, <sup>8</sup>wîr'a qayl nebî û gur'a wî nekî. Bira h'eyfa te li wî neyê û dilê te lê neşewite, ne jî wî veşêrî. <sup>9</sup>Lê e'se wî bikujî, pêşîyê bira destê te li ser wî kuştinêr'a bilind be, paşê destê t'emamîya cime'tê. <sup>10</sup>Bide ber kevira bikuje, çimkî ewî kirîye ku te ji Xudan Xwedêyê te, k'îjanî tu ji Misirê ji mala xulamtîyê derxistî, bixalifîne. <sup>11</sup>Hingê t'emamîya Îsraêlê bona wê yekê wê bibihê û bitirse, îdî xirabîya usa nav teda nakin.

<sup>12</sup>Heger tu bibihêyî wekî li nava bajarêd te yekîda ku Xudan Xwedêyê te dide te tu têda bijîyî, <sup>13</sup>merivêd bêt'ewşe ji nava teta derk'etine û binelîyêd bajarê xwe xalifandine, gotine: «Werin em her'in xwedêyêd başqer'a qulix kin» (ku we ew nas nekirine), <sup>14</sup>tu biger'e, e'nene ke û r'ind pê bi-h'ese. Heger ew usa ne, r'ast e ew k'irêtî li nava teta bûye, <sup>15</sup>hingê binelîyêd wî bajarî e'se bide ber devê şûr bikuje, bajar û h'emû çî ku wîda ye, usa jî h'eywanêd wî, bide ber devê şûr qir' ke, ku nifir'ê Xudan bê sêrî. <sup>16</sup>T'emamîya t'alên t'op ke nava meydanê. Bajar t'alênva Xudan Xwedêyê xwer'a agirşewat ke. Bira ew h'eta-h'etayê wêran bimîne û t'u car neyê avakirinê. <sup>17</sup>Bira destê te t'u tiştê nifir'lêbûyî nek'eve, çî ku gere bê undakirinê, wekî alava hêrsa Xudan dayne û r'e'mê li te bike. K'eremê li te bike, te li hev zêde ke, çawa ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar, <sup>18</sup>heger tu gur'a Xudan Xwedêyê xwe bikî, h'emû e'mirêd wî ku ez îro li te e'mir dikim xwey kî û heqîyê li ber ç'e'vê Xudan Xwedêyê xwe bikî.

### H'eywanê h'elal û ne h'elal

**14** Hûn zar'êd Xudan Xwedêyê xwe ne, bona mirîya xwe neh'er'işînin û p'or'ê nav ç'e'vêd xwe kur' nekin. <sup>2</sup>Çimkî tu Xudan Xwedêyê xwer'a miletekî buhurtî-jibare yî. Xudan tu ji h'emû miletêd li ser t'opa dinê bijartî wekî tu bibî miletê wîyî milk'ê wî.

<sup>3</sup>T'u tiştê h'eram nexwe. <sup>4</sup>Awa h'eywanêd ku hûn dikarin bixwin: Ga, pez, bizin, <sup>5</sup>gak'ûvî, xezal, karxezal, bizina k'ûvî, bizinê qeya, qant'ebizin, peza k'ûvî. <sup>6</sup>Her h'eywanê ku dik'ayê, dusimî û simvekirî ye, dikarin bixwin. <sup>7</sup>Lê t'enê nava evêd ku dik'ayên yan dusimî û simvekirî ne, van nexwin: Deve, k'êvrûşk, qotik, çimkî r'aste ew dik'ayên lê simvekirî nînin, ew bona we ne h'elal in. <sup>8</sup>Beraz jî, r'aste dusimî ye lê nak'ayê, ew ne h'elal e bona we, goştê wan nexwin ne jî cendekê wan k'evin.

<sup>9</sup>Ji h'emû h'eywanêd avêda, yêd ku milêd wan û paç'êd wan hene dikarin bixwin. <sup>10</sup>Lê h'emûyêd ku milêd wan û paç'êd wan t'unene nexwin, ew bona we ne h'elal in.

<sup>11</sup>Her teyreda h'elal dikarin bixwin. <sup>12</sup>Lê van hûn gere nexwin: Teyr, teyrê bazî û teyrê be'rê, <sup>13</sup>qûş, qereqûş û bawîk cûr'êd wanva, <sup>14</sup>her qar'qar'î cûr'êd wanva, <sup>15</sup>deveqûş, bûmê şevê, me'sîgir û qerqe cûr'êd wanva, <sup>16</sup>kundê korî biç'ûk, kundê korî mezin û kundê korî sipî, <sup>17</sup>pêlîkan, qirqê Misirê, qazê me'sîya, <sup>18</sup>legleg, quling cûr'êd wanva, pûpû, baç'ermok. <sup>19</sup>Her mêş-morêd xweyîp'er' ne h'elal in bona we, ew bira neyêne xwarinê. <sup>20</sup>Her teyreda h'elal dikarin bixwin.

<sup>21</sup>T'u h'eywana h'işkbûyî nexwin. Wê dikarî bidî xerîbê bajarêd xweda, bira ew bixwe, yan jî bifiroşe r'êwîya, çimkî tu miletekî buhurtî-jibare yî Xudan Xwedêyê xwer'a.

Karê li nav şîrê makêda nek'elînî.

### Qanûna dehekê

<sup>22</sup>Haş ji xwe hebe çî ku tu bi h'emû t'oximê xwe her sal ji erdê distînî, dehekê başqe kî. <sup>23</sup>Û ber Xudan Xwedêyê xwe, li wî cîyî ku ewê bibijêre wekî li wir navê xwe lê dayne, deheka genimê xwe, meya û bizirê xwe, nixurîyê pez û dewarê xwe bixwe. Bi vî awayî her r'oj tê hîn bî ji Xudan Xwedêyê xwe bitirsî. <sup>24</sup>Heger r'îya wî cîyî gelekî dûr be û Xudan Xwedêyê te jî tu bimbarek kirî û tu nikaribî vê dehekê bibî li wî cîyî ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre wekî navê xwe lê dayne, <sup>25</sup>hingê tu dikarî wê p'erar'a biguhêr'î. P'era bigire destê xwe û her'e cîyê ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre. <sup>26</sup>Bi van p'era tu dikarî her tiştê dilê te bixwaze bik'ir'î: pez, dewar, şerav, ava ceh û her tiştî çî ku tu bixwazî. Li wir ber Xudan Xwedêyê xwe tu neferêd xweva bixwe û şa be. <sup>27</sup>lêwîyê bajarêd xweda bîr neke, çimkî p'ar û warê wî t'evî te t'une.

<sup>28</sup>K'utasîya sala sisîya deheka her tiştêd wê salê bîne û dayne li nava bajarêd xwe. <sup>29</sup>Hingê lêwî ku p'ar û warê wî

t'evî te t'une, usa jî xerîb, sêwî, jinebî ku li nava bajarêd teda ne, wê bê n, bixwin û t'êr bin, wekî Xudan Xwedêyê te dua li te bike, nava her şixulêd destêd teda ye ku tê bikî.

### Baxşandina deyn li her h'eft salîyê

**15** K'utasîya her h'eft sala deyndarêd xwe bibaxşîne. <sup>2</sup>Baxşandin ev e: Ku kesekî xweyê deyn ku deyn dide hevalemî, gerekê bibaxşîne wî û ji hevalê xwe, ji birê xwe paşda nexwaze, çimkî baxşandin bona xatirê Xudan e. <sup>3</sup>Ji xerîba dikarî bixwazî, lê çî ku ser birê te ye, destê xwe jê bik'işîne, <sup>4</sup>li nava teda k'esîb gere t'unebe, çimkî Xudan wê e'se dua li te bike li ser wî e'rdî, ku Xudan Xwedêyê te çawa milk' dide te ku qazinc kî. <sup>5</sup>T'enê tu r'ind guhdarîya dengê Xudan Xwedêyê xwe bike û t'am vî e'mirê ku ez îro li te e'mir dikim, bike ku biqedînî. <sup>6</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê te wê dua li te bike, çawa ku wî gote te. Tê deyn bidî gelek mileta lê tê xwexa deyndar nîbî. Tê serwêrtîyê li gelek mileta bikî, lê ewê serwêrtîyê li te nekin.

<sup>7</sup>Lê heger li nava teda, li nava bajarêd welatê teda ku Xudan Xwedêyê te dide te, yek ji Îsraêlf destteng be, dilê xwe neke kevir û hindava birayê xweyî desttengda destgirtî nîbe. <sup>8</sup>Hindava wîda destvekirî be, ew h'ewcê çî be weke h'ewcedarîya wî bi mer'danî deyn bide wî. <sup>9</sup>Haş ji xwe hebe, ku dilê ter'a fikireke xirab derbaz nebe û bêjî: «Sala h'eftaye baxşandinê nêzîk e» û ç'e'vê xirab li birê xweyî destteng binihêr'î û deyn nedî wî. Ewê hindava teda hewara xwe Xudan bîne û tê gunek'ar derêyî. <sup>10</sup>Tu bi mer'danî bide wî, pey dayînêr'a jî bira li te çetin neyê. Çimkî bona wê yekê Xudan Xwedêyê te wê her şixulîda, tu dest bidî çî wê dua li te bike. <sup>11</sup>Çimkî desttengê welatê teda kê m nîbin, lema ez li te e'mir dikim û dibêjim: «Tu e'rdê xweda hindava birê xweyî k'esîb û desttengda destvekirî be».

<sup>12</sup>Heger birê te yan xûşka teye îbranî ter'a bê firotanê çawa xulam, bira ew şeş sala ter'a xulamîyê bike, lê sala h'efta

wî aza ber'de. <sup>13</sup>Gava tu wî aza ber'dî, destvala ber'nedî. <sup>14</sup>Bi mer'danî ji pezêd xwe, ji bêdera xwe û ji h'ewzê xweyî şeravê bide wî. Çawa ku Xudan Xwedêyê te tu bimbarek kirî usa bide wî. <sup>15</sup>Û bîr bîne wekî tu jî xulam bûyî welatê Misirêda, lê Xudan Xwedêyê te tu azakirî, lema ez îro vî e'mirî didime te. <sup>16</sup>Lê heger xulamê te bêje te: «Ez ji cem te naçim», çimkî ew te û mala te h'iz dike, wî xweş tê li cem te bimîne. <sup>17</sup>Hingê wî bispêre dêrî û bi dirêşê guhê wî qul ke, hingê ewê bibe xulamê teyî h'eta-h'etayê. Bi vî cûr'eyî jî t'evî carîya xwe bike.

<sup>18</sup>Bira ter'a k'eder neyê wekî tu wî aza ber'didî, çimkî ewî şeş sala ter'a xulamtî kirîye, heger dewsa wî p'ale bûya teyê dubare xerc kira. Xudan Xwedêyê te wê te li nava h'emû tiştîda çî ku tu bikî bimbarek ke.

### Qanûna bona nixurîyêd pêz-dêwêr

<sup>19</sup>H'emû nixurîyê nêrîn ji pez û dewarê xwe Xudan Xwedêyê xwer'a nedirf ke. Bi gayê xweyî nixurî nexebite û nixurîyê pezê xwe nebir'e. <sup>20</sup>Li ber Xudan Xwedêyê xwe li wî cîyê ku Xudan wê bibijêre, her sal tu û neferêd xweva wan li wir bixwin. <sup>21</sup>Lê heger ew bi qusûr e, seqet e yan kor e, yan bi qusûreke giran e, wê Xudan Xwedêyê xwer'a neke qurban. <sup>22</sup>Bajarêd xweda dikarî wê bixwî. Paqij û ne paqij dikarin wê bixin, mîna kara xezalê û bizina k'ûvî. <sup>23</sup>T'enê xûnê ne-xwe, wê mîna avê bir'êje li ser e'rdê.

### Cejinaf Derbazbûnê

**16** Meha Abîbê\* xweyî ke û Cejina Derbazbûnê Xudanf Xwedêyê xwer'a bike, çimkî meha Abîbêda Xudan Xwedêyê te şev tu ji Misirê derxistî. <sup>2</sup>Ji pez û dewarê xwe Xudan Xwedêyê xwer'a Cejina Derbazbûnê serjêke, li wî

\* <sup>16:1</sup> Abîb navê wêyî pêşin bû lê niha Nîsan e. Ev mehe salne'ma hîvê destpêdike ji nîvê meha Adarê h'eta nîvê meha Nîsanê.

cîyê ku Xudanê bibijêre wekî navê xwe lê dayne. <sup>3</sup>T'evî wê t'u tiştê hevîrtir'şkkirî nexwe, h'eft r'oja t'evî wê nanê şkeva bixwe, awa gotî nanê zelûlîyê, çimkî tu leze-lez ji Misirê derk'etî. Wekî h'emû r'ojêd e'mirê xweda, r'oja xweye ji welatê Misirê derk'etinê bîr bînî. <sup>4</sup>Li nava t'emamîya sînorê teda h'eft r'oja gerekê hevîrtir'şk t'unebe û goştê qurbana êvara r'oja yekê bira nemîne h'eta sibehê. <sup>5</sup>Tu nikarî qurbana Derbazbûnê t'u bajarîda ku Xudan Xwedêyê te dide te serjêkî. <sup>6</sup>Lê t'enê li wî cîyî ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre wekî navê xwe lê dayne, êvarê, çaxê r'o diçe ava, qurbana Derbazbûnê serjêke, xût wî wextî gava tu ji Misirê derk'etîyî. <sup>7</sup>Li wî cîyî ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre, bipêje û bixwe. Sibehê vege'e her'e konê xwe. <sup>8</sup>Şeş r'oja nanê şkeva bixwe, r'oja h'efta civîna Xudan Xwedêyê te ye, t'u xebatê neke.

### Cejina<sup>f</sup> H'eftîya

<sup>9</sup>H'eft h'eftîya xwer'a bijmire. Ji wî wextê ku tu dest pê bikî bi de'sê genim bidirûyî, h'eft h'eftîya bijmire. <sup>10</sup>Hingê Cejina H'eftîya Xudan Xwedêyê xwer'a bike, dîyarîke r'ezedilîyê anegorî wê yekê bi çî Xudan Xwedêyê te wê te bimbarek ke bide. <sup>11</sup>Li ber Xudan Xwedêyê xwe li wî cîyê ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre, wekî navê xwe lê dayne, şa be t'evî kur'ê xwe, qîza xwe, xulamê xwe, carîya xwe, lêwîyê bajarêd xweda, xerîb, sêwî û jinebîya ku nava teda ne. <sup>12</sup>Bîr bîne ku tu Misirêda xulam bûyî, van qeyde-qanûna xwey ke û biqedîne.

### Cejina<sup>f</sup> H'olikçêkirinê

<sup>13</sup>Gava ji bêdera xwe û ji h'ewzê xwe şeravê hildî, hingê Cejina H'olikçêkirinê h'eft r'oja bike. <sup>14</sup>Cejina xweda tu, kur'ê xwe, qîza xwe, xulamê xwe, carîya xweva, lêwî, xerîb, sêwî û jinebîya ku bajarêd teda ne şa be. <sup>15</sup>H'eft r'oja cejinê Xudan Xwedêyê xwer'a bike, li wî cîyê ku Xudan Xwedêyê bibijêre.

Çimkî Xudan Xwedêyê te wê dua li te, h'emû deremetêd te, her kirinêd destêd te bike û tê t'enê şa bî.

<sup>16</sup>Salê sê cara bira h'emû qisimê teyî nêrîn li ber Xudan Xwedêyê te li wî cîyê ku Xudanê bibijêre, bisekinin: Cejina Nanê Şkevada, Cejina H'eftîyada û Cejina H'olikçêkirinêda. Lê bira dest vala li ber Xudan nesekinin. <sup>17</sup>Çiqas ku destê her kesîva tê bira bîne, anegorî bimbarekkirina ku Xudan Xwedêyê te bona te kirîye.

### K'ifşkirina serwêr û h'akima

<sup>18</sup>Li nava h'emû bajarêd ku Xudan Xwedêyê te dide te anegorî qebîlêd te, h'akima û serwêra k'ifş ke, wekî bi dîwana r'ast dîwana millet bikin. <sup>19</sup>Heqîyê net'er'ibîne, firqîyê daneyne û r'uşetê hilnede, çimkî r'uşet ç'e'vê bîlana kor dike û gotinêd r'asta derew derdixe. <sup>20</sup>R'astîyê, t'enê pey r'astîyê her'e, wekî tu sax-silamet bî û ew e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te xwer'a bikî milk'.

### P'ûtar'a qulix neke

<sup>21</sup>Li ber gorîgehaf Xudan Xwedêyê xwe ku tê xwer'a çêkî, t'u cûr'e darêd Aşêrahê\* xwer'a daneç'ikînî. <sup>22</sup>Û xwer'a h'eykel nede sekinandin, ew li ber Xudan Xwedêyê te r'eş e.

### T'er'ibandina sond

**17** Ga yan berxa bi qusûr yan jî bi her cûr'e kêmasî, Xudan Xwedêyê xwer'a qurban nede, çimkî ew bona Xudan Xwedêyê te k'irêtî ye.

<sup>2</sup>Heger li nava teda, li nava bajarêd te yekîda, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te dide te, mêrek yan jinek xirabîyê li ber ç'e'vê Xudan Xwedêyê te bike, peymanaf wî bit'er'ibîne, <sup>3</sup>r'a-be her'e xwedêyêd başqer'a qulix ke, li ber te'vê, yan hîvê,

---

\* <sup>16:21</sup> Binihêr'e şirovekirina Qanûna Ducarî 7:5.

yan h'emû nexşêd e'zmên ta be ku Xwedê e'mir nekirîye, <sup>4</sup>gava te pê bih'esînin yan tu bibihêyî, baş e'nene ke. Heger ew usa ye, r'ast e ew k'irêtî li nava Îsraêlda bûye, <sup>5</sup>hingê wî mêrî yan wê jinê, k'îjanî ku ew xirabî kirîye, derxe li ber dergehêd xwe û bide li ber kevira, wekî ew bimire, heger mêr be yan jin be. <sup>6</sup>Bi gotinêd du-sê şe'da yê hêjayî mirinê bê kuştinê. Bi gotina şe'dekî neyê kuştinê. <sup>7</sup>Pêşîyê destê şe'da gere li ser wî bilind bin bikujin, paşê destê t'emamîya cime'tê. Bi vî awayî xirabîyê li nava xweda r'awva derxe.

### Safîkirina dîwanêd çetin

<sup>8</sup>Gava pirsêd cûr'e-cûr'e qet'ilkirinê, yan hevr'ik'îyê, yan zîyankirinê nava bajarêd teda şer'-de'w pêşda bên û bona te ze'met be ku safî kî, hingê r'abe her'e li wî cîyê ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre. <sup>9</sup>Her'e li cem lêwîyêd k'ahînîf û h'akimê wan r'oja bipirse, ewê dîwana r'ast ter'a bêjin. <sup>10</sup>Anegorî gotina wane ji wî cîyê ku Xudanê bibijêre bike, bike ku biqedînê h'emû çî ku ew nîşanî te bikin. <sup>11</sup>Bi wê hînkirina ku ew te hîn kin û bi qirara ku ew ter'a bêjin bike. Ji wê xebera ku ewê bêjine te ne ç'ep dager'e ne jî r'ast. <sup>12</sup>Lê merivê ku k'ubar be, gur'a k'ahînê ku li wir Xudan Xwedêyê ter'a qulix dike, yan gur'a h'akim neke bira ew meriv bê kuştinê. Bi vî awayî xirabîyê r'awva ji nava Îsraêl derxe. <sup>13</sup>T'emamîya millet wê bibihê, bitirse û wir şûnda wê k'ubar nîbe.

### Hînkirinêd bona p'adşa

<sup>14</sup>Gava tu her'î wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te xwer'a bikî milk' û li wir bijîyî, tê bêjî: «Ezê mîna h'emû milletêd dora xwe p'adşa li ser xwe k'ifş kim». <sup>15</sup>P'adşê ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre wî li ser xwe k'ifş ke, ji nava milletê xwe, wî li ser xwe k'ifş ke. Tu nikarî xerîbekî, ku ne ji biratîya te ye, li ser xwe p'adşa k'ifş kî. <sup>16</sup>T'enê bira ew xwer'a hespa zêde

neke û millet veneger'îne Misirê bona zêdekirina hespa. Çimkî Xudan gote we: 'T'u car îdî vê r'êyêda veneger'in'. <sup>17</sup>Ne bira k'ulfet zêde ke, wekî dilê wî nexalife û ne jî bira zêr' û zîv xwer'a gelekî zêde ke. <sup>18</sup>Gava ew r'ûnê li ser t'extê p'adşatîya xwe, bira ew xwer'a ji k'itêba van qanûna, k'îjan ku li cem lêwîyêd k'ahîna ye, k'itêbekê xwer'a ji ber wê binivîse. <sup>19</sup>Bira ew li cem wî be û bira wê bixûne t'emamîya r'ojêd e'mirê xweda, wekî ew hîn be bitirse ji Xudan Xwedêyê xwe ku h'emû van xeberêd qanûnê, van qeyde-qanûna xweyî ke û biqedîne. <sup>20</sup>Wekî dilê wî li ser birayêd wîr'a k'ubar nebe û ew ji vî e'mirî ne ç'ep dager'e ne jî r'ast. Bi vî awayî ew û kur'êd wî wê dirêj p'adşatîya xwe li nava Îsraêl bikin.

### K'ahîn û Lêwî

**18** Bira p'ar û war bona lêwîyê k'ahîn û t'emamîya qebîla Lêwî t'evî Îsraêl t'une be. Bira ew ji gorîşewatêd Xudanr'a dayî bixwin ku milk'ê wan e. <sup>2</sup>Warê wî li nava birayêd wî t'unebe. Xudan e warê wî, çawa ku Xudan gotibû wî.

<sup>3</sup>Û awa çî ku gere millet bide k'ahîna: Ji gorîyêd ku têne dayîne ga yan pez, gere pîlekê, çengîya û h'ûr bide k'ahîn. <sup>4</sup>Berêd<sup>f</sup> dere-meta pêşin ji genimê xwe, ji meya û bizirê xwe û bir'îna pêşin e pezêd xwe bide wî. <sup>5</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê te ew ji nava h'emû qebîlêd te bijart, wekî ew kur'êd xweva her t'im li ber Xudan nava qulixkirinêda bin. <sup>6</sup>Heger lêwîk ji bajarekî nava t'emamîya Îsraêl k'îderê ew dimîne bi r'ezedilîya xwe cîguhastî be li wî cîyê ku Xudan bibijêre <sup>7</sup>û navê Xudan Xwedêyê xwer'a qulix ke, çawa ku t'emam birayêd wîye lêwî, ku li wir li ber Xudan sekinîne. <sup>8</sup>Ew gerekê xurekê xwe weke lêwîyêd mayîn bistîne, wê neyê h'esabê ku ewî hebûka xwe firotîye û dêstda heye.

### Miqabilî k'oç'ektîyê bisekinîn

<sup>9</sup>Gava tu bik'evî e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te, hînî k'irêtîkirina wan mileta nebe. <sup>10</sup>Bira nava teda yê usa t'une be, yê ku kur' yan qîza xwe nava êgirr'a derbaz

dike\*, ne k'oç'ek, ne sêrbaz, ne r'e'mildar, ne jî pîresêr, <sup>11</sup> ne nifir'kir, ne yê ku gazî r'uh'a dike, ne xweyîh'unir, ne jî yê ku gazî mirîya dike. <sup>12</sup>Çimkî li ber ç'e'vê Xudan yê ku vê yekê dike k'irêt e û bona van k'irêtîya Xudan Xwedêyê te ji ber te berî wan mileta dide. <sup>13</sup>Lê tu ber Xudan Xwedêyê xwe k'amil be. <sup>14</sup>Çimkî ev miletêd ku tu berî wan didî, ew gur'a sêrbaz û k'oç'eka dikin lê Xudan Xwedêyê te ev yek ne daye te.

### **P'êxemberêf r'ast û ne r'ast**

<sup>15</sup>Xudan Xwedêyê te wê ji nava te û birayêd te p'êxemberekî mîna min bona te derxe. Gur'a wî bikin. <sup>16</sup>Awa çi ku te li ber H'orêbê r'oja civatê ji Xudan Xwedêyê xwe xwest û got: «Bira îdî dengê Xudan Xwedêyê xwe nebihêm û ev agirê mezîna nebînim wekî ez nemirim». <sup>17</sup>Xudan gote min: «Qenc e çi ku wan got. <sup>18</sup>Ezê ji nava miletê wan p'êxemberekî mîna te wan'r'a derxim, ezê xeberêd xwe daynime ser zarê wî û ezê çi li wî e'mir kim ewê wan'r'a bêje. <sup>19</sup>Û ew merivê ku gur'a xeberêd min neke, awa gotî wan xeberêd ku p'êxemberê bi navê min bêje, ezê ji wî merivî bixwazim. <sup>20</sup>Lê ew p'êxemberê ku turuş ke bi navê min tiştêkî bêje ku min li wî e'mir nekirîye wekî bêje, yan ewê ku bi navê xudanêd başqe xeber de, ew p'êxember gere bimire». <sup>21</sup>Û heger tu dilê xweda bêjî: «Çawa emê tê derxin ku ev xebera ne ji Xudan e?» <sup>22</sup>Heger p'êxember bi navê Xudan xeber de, lê ew xeber neyê sêrî, wekî usa ye ew xeber ne ji Xudan e. P'êxember ew yek ji dest k'ubarîyê gotîye, ji wî netirse.

### **Bajarêd bona sit'arbûnê**

**19** Gava Xudan Xwedêyê te qir'a wan mileta bîne, e'rdê k'îjana Xudan Xwedêyê te dide te xwer'a bikî milk' û bajar, malêd wanda cî-war bî, <sup>2</sup>hingê ji nava wî e'rdê

---

\* 18:10 «Nava êgirr'a derbaz dike» awa gotî «nekine gorî».

ku Xudan Xwedêyê te dide te xwer'a bikî milk', xwer'a sê bajara başqe kî. <sup>3</sup>R'îya wan çêke. T'emamîya e'rdê xwe, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te milk' dide te, belayî li ser sê p'ara ke. Bi vî awayî her mêrkuj dikare bir'eve li van bajara yekî.

<sup>4</sup>Awa k'îjan mêrkuj dikare bir'eve li wir û sax bimîne: Yê k'u merivekî bê h'emdê xwe bikuje, ku ne duhu ne jî pêr dijminê hev nîbûne. <sup>5</sup>Gava merivek t'evî yekî din her'e mêşe dara bibir'e û gava balt'e bilind ke dar bibir'e, balt'e ji destû derk'eve hevalê wî k'eve ew bimire, ev meriv bira bir'eve li wan bajara yekî û wê sax bimîne. <sup>6</sup>Heger r'ê gelek dirêj be, yê h'eyfa xûnê hilde wê bi hêrsa dilê xwe pey mêrkuj k'eve wî bigire û bikuje, lê ew ne hêjayî mirinê bû, çimkî ne duhu ne jî pêr ew dijminê hev nîbûne, <sup>7</sup>lema ez li te e'mir dikim, dibêjim: «Sê bajara xwer'a başqe ke».

<sup>8</sup>Gava Xudan Xwedêyê te sînorê te berfire ke, çawa ku wî kal-bavêd ter'a sond xwar û t'emamîya e'rdê ku soz da, bide kal-bavêd te bide te, <sup>9</sup>heger van h'emû e'mira baş xweyî kî, çawa ku ez îro li te e'mir dikim, Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikî û h'emû r'ojêd e'mirê xweda r'îyêd wîda her'î, sê bajarêd din jî li ser van her sê bajara zêde kî. <sup>10</sup>Bi vî awayî bira xûna yê bê sûc li nava e'rdê teda, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te milk' dide te, neyê r'êtinê û xûna wî li ser te nebe.

<sup>11</sup>Lê heger yek yekî dinr'a dijminatîyê bike, xwe li wî bitelîne, r'abe lê xe bikuje û bir'eve li van bajara yekî, <sup>12</sup>r'ûspîyêd bajarê wî bira bişînin û wî ji wir bînin, bidine destê yê ku h'eyfa xûnê wê hilde, wekî ew bê kuştinê. <sup>13</sup>Bira h'eyfa te li wî neyê, yê ku xûna bê sûc Îsraêlêda r'êtiye, ewî bide hildanê. Bi vî awayî wê ter'a qenc be.

### **Sînorê nava cînara**

<sup>14</sup>Sînorê nava milk'ê xwe û cînarê xwe, k'îjan ku kal-bavêd te danîne li wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te xwer'a bikî milk', cî neleqînî.

### Bona şe'da

<sup>15</sup>Şe'dek t'enê nikare miqabilî merivekî ku her cûr'e xirabî yan gune kirîye bisekine. Bi devê du yan sê şe'da her tişt bira bê îzbatkirinê. <sup>16</sup>Heger şe'dekî ner'ast miqabilî yekî din derê û bi mixenetîyê şikîyatê wî bike, <sup>17</sup>ev her du merî ku hevr'a k'etine de'wê, bira li ber Xudan, li ber k'ahîn û h'akimêd wan r'oja, bisekinin. <sup>18</sup>H'akim bira baş e'nene kin, heger derewîya şe'de bê girtinê, ewî derew miqabilî birê xwe şe'detî daye, <sup>19</sup>hingê çi ku wî birê xwer'a dixwest, bînine serê wî. Bi vî awayî xirabîyê ji nava xweda r'awwa derxe. <sup>20</sup>Yêd mayîn wê bibihên û bitirsin, îdî wê xirabîya usa li nava teda nekin. <sup>21</sup>Bira h'eyfa te e'mir ji ber e'mirva, ç'e'v ji ber ç'e'vva, diran ji ber diranva, dest ji ber destva, nig ji ber nigva neyê.

### Qanûnê bona şêr'

**20** Gava tu derêyî şêr' miqabilî dijminêd xwe, hesp, e'reba û milletê ji xwe gelectir bibînî, ji wan netirse, çimkî Xudan Xwedêyê te yê ku tu ji welatê Misirê hevraz derxistî t'evî te ye. <sup>2</sup>Gava ku hûn dest bi şêr' bikin bira k'ahîn bê cime'têr'a xeber de û <sup>3</sup>bêje wan: «Bibihê Îsraêl! Îro hûnê miqabilî dijminêd xwe r'abine şêr', li ber wan bira dilê we sist nebe, netirsin, nebizdin û li ber wan nelerizin. <sup>4</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê we t'evî we tê ku alîyê we miqabilî dijminêd we şer' ke û we xilaz ke». <sup>5</sup>Serwêr jî bira cime'têr'a xeber din û bêjin: «Heye merî ku mala nû çêkirîye û hê nek'işîyayê? Bira her'e vegeer'e mala xwe, wekî ew şêr'da nemire û yekî din bik'işe mala wî. <sup>6</sup>Û heye merî ku baxê tirîya daç'ikandîye, lê hê jê hilnedaye? Bira vegeer'e her'e mala xwe, wekî ew şêr'da nemire û yekî din ji baxê wî hilnede. <sup>7</sup>Yan heye merî ku nîşankirî ye, lê hê dergîstî ye? Bira vegeer'e her'e mala xwe, wekî ew şêr'da nemire û yekî din dergîstîya wî nestîne». <sup>8</sup>Bira serwêr dîsa t'evî cime'tê

xeberdin û bêjin: «Heye merîyê tirsonek û dil sist, bira ve-  
ger'e her'e mala xwe, wekî ew dilê birayêd xwe mîna dilê  
xwe sist neke». <sup>9</sup>Gava serwêr xeberdana t'evî cime'tê xilaz  
kin, hingê bira sereskera li ser cime'tê k'ifş kin.

<sup>10</sup>K'engê tu nêzîkî bajarekî bî ku wî zeft kî, e'dilayê dayne  
ber wî. <sup>11</sup>Heger ew caba e'dilaya te bide û derî li ber te veke,  
hingê bira h'emû cime'ta wî bajarîda bibe xercdar û xulamê  
te. <sup>12</sup>Lê heger ew e'dilayîyê nexwaze û miqabilî te şer' ke,  
dora wî bigire <sup>13</sup>û k'engê Xudan Xwedêyê te wî bide destê  
te hingê h'emû mêra bide ber devê şûr. <sup>14</sup>T'enê jin û zar'a,  
h'eywên, h'emû çi ku bajêrda hebe, h'emû t'alanê wî hilde  
xwer'a. T'alanê dijminêd xwe, k'îjan ku Xudan Xwedêyê  
te da destê te bide xebatê. <sup>15</sup>Aha bîne serê h'emû bajarêd  
gelekî dûrî xwe, k'îjan ku ne ji bajarêd van mileta ne. <sup>16</sup>Li  
bajarêd van miletada, yêd ku Xudan Xwedêyê te war dide te,  
t'u bînberî sax nehêlî. <sup>17</sup>Lê k'oka wan bîne ku nifir'ê Xudan  
bê sêrî: H'îtîya, emorîya, kenanîyaf, pirîzzîya, h'îwîya û  
yebûsîya, çawa ku Xudan Xwedêyê te li te e'mir kir. <sup>18</sup>Wekî  
ew we hînî kirina wan h'emû k'irêtîya nekin, k'îjan ku wan  
xwedêyêd xwer'a dikir, ku nebe hûn li ber Xudan Xwedêyê  
xwe guna bikin.

<sup>19</sup>Heger tu we'dekî dirêj li dora bajarekî bigirî, ku şer' kî  
û zeft kî, darêd wî nebir'î, balt'e li wan nexî çimkî tê ji wan  
bixwî, awa wan nebir'î. Dara çolê t'u meriv e, ku ew ji te  
bir'eve bik'eve bajarê, ku te dorê girtîye? <sup>20</sup>Lê ji wan darêd  
ku tu zanî wekî ew berê xwarinê nadin, wan dikarî bişkênî,  
bibir'î. Ê çi ku bona dorgirtina bajarê ku tu miqabilî şer'  
dikî lazim e çê ke, h'eta ku tu ser wan k'evî.

### Safîkirina mêrkujîya ne e'yan

**21** Heger li nava wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide  
te xwer'a bikî milk', li çolê cinyazê merîkî bê dîtinê  
û nee'yan be k'ê ew kuştîye, <sup>2</sup>bira r'ûspîyêd te û h'akimêd  
te derên û ji cinyaz h'eta bajarêd dora wî çap kin. <sup>3</sup>Bira

r'ûspîyêd bajarê lapî nêzîkî cinyaz, nogineke bi k'îjanê hê xebat nekirine û k'îjan ku hê nek'etîye binê nîr. <sup>4</sup>R'ûspîyêd wî bajarî gere wê noginê berjêr bibine newaleka ku ç'em dik'işe û e'rd wê jî ne hatîye r'akirinê ne jî çandinê, wê newalêda bira stukura noginê bişkênin. <sup>5</sup>K'ahînef zar'êd Lêwî wê bêne nêzîk, çimkî Xudan Xwedêyê te ew bijartin ku wîr'a qulix kin û bi navê Xudan bimbarek bikin, bi xebera wan gere her şer'-de'w û hevr'ik'î bêne safîkirinê. <sup>6</sup>H'emû r'ûspîyêd bajarê lapî nêzîkî cinyaz bira destêd xwe li ser nogina newalêda stukur şkenandîda bişon <sup>7</sup>û e'lam kin, bêjin: «Destêd me ev xûn ner'etîye û ç'e'vêd me nedîtine. <sup>8</sup>Xudan, bibaxşîne miletê xwe Îsraêl, k'îjan ku te xilaz kir, heqê xûna bê sûc neyne li ser miletê xwe Îsraêl». Bira ev xûn li wan bê baxşandinê. <sup>9</sup>Bi vî awayî tê li ber ç'e'vê Xudan r'astîyê bikî gava xûna bê sûc ji nava xweda bişoyî.

### Cûr'e-cûr'e qanûnêd li ser guna

<sup>10</sup>Gava miqabilî dijminêd xwe derêyî şêr' û Xudan Xwedêyê te wan bide destê te, tu wan hêsîr hildî, <sup>11</sup>heger li nava hêsîra jineke bedew bibînî, wê begem kî û xwer'a bixwazî, <sup>12</sup>wê bîne mala xwe. Bira ew p'or'ê xwe kur' ke, neynikêd xwe bibir'e <sup>13</sup>û k'incêd xweye hêsîrîyê bêxe, mala teda r'ûnê û t'am mehekê bona dê û bavê xwe bigirî, peyr'a tu serê xwe pêr'a dayne, hûnê bibine jin û mêt. <sup>14</sup>Lê heger peyr'a tu wê nexwazî, wê ber'de, k'uda dixwaze bira her'e. Wê nefiroşe, ne jî çawa carî h'esab ke, çimkî te ew bêhurmet kir.

<sup>15</sup>Heger du jinêd yekî hebin ew yekê h'iz bike lê ya din h'iz neke, ew wîr'a kur'a bînin, ya h'izkirî jî ya neh'izkirî jî, lê kur'ê nixurî ya neh'izkirî bîne, <sup>16</sup>wextê hebûka xwe kur'êd xwer'a p'areveke, ew nikare cîyê pêşin bide kur'ê ya h'izkirî li dewsa nixurîyê xwe ku ji ya neh'izkirî ye. <sup>17</sup>Lê ew gerekê kur'ê ya neh'izkirî nixurî h'esab ke û dubare ji h'emû hebûka xwe bide wî, çimkî ew e destpêbûna qewata wî, nixurtî wîr'a dik'eve.

<sup>18</sup>Heger kur'ê yekî serh'işk yan neêlim be, gur'a dê û bavê xwe neke, ewana li wî hilatibin lê ewî guh nedabe wan, <sup>19</sup>bira dê û bavê wî hildin wî bibine li cem r'ûspîyêd, hinda dergehêd bajarê\* wî. <sup>20</sup>Bêjine r'ûspîyêd bajarê wî: «Ev kur'ê me serh'işk û neêlim e, ew gur'a me nake, p'ir'xur û serxweş e». <sup>21</sup>Hingê bira h'emû binelîyêd bajarê wî, wî bidine ber kevira, bikujin. Bi vî awayî xirabîyê ji nava xweda r'awwa derxe, h'emû Îsraêl wê bibihê û bitirse.

<sup>22</sup>Heger yek neheqîke hêjayî mirinê bike û ew bê kuştinê, darva tu wî darda kî, <sup>23</sup>nehêle wekî cinyazê wî şevê li ser darê bimîne, lê wî hema wê r'ojê jî defin ke. Çimkî nifi-r'a Xudan ser yê darva dardakirî ye. E'rdê xwe ku Xudan Xwedêyê te dide te çawa war neh'er'imîne.

### Dûmayîkirina cûr'êd qanûna li ser guna

**22** Gava tu ga yan peza birayê xweyî îsraêlî ku unda bûne bibînî, tu gere pişta xwe nedî wan, lê tu e'se wan li birayê xwe vege'înî. <sup>2</sup>Lê heger birê te dûrî te dimîne, yan tu wî nas nakî, wan bibe mala xwe û bira ew li cem te bin, h'eta ku birê te pirsê wan neke, hingê tu li wî vege'îne. <sup>3</sup>Usa jî hindava k'era wî, k'inca wî, her tiştîda ku birê te unda dike û tu dibînî bike, nebe ku tu usa bidî k'îfşê ku te ew nedîtine.

<sup>4</sup>Tu gere pişta xwe nedî k'er yan gayê birayê xwe, gava ku tu bibînî ew li ser r'ê k'etine, lê alî wî bike wan r'ake ser p'îya.

<sup>5</sup>Bira k'incê mêra li k'ulfetê t'unebe û mêr jî k'incê k'ulfet xwe neke, her kesê ku vê yekê dike e li ber Xudan Xwedêyê te k'irêt e.

<sup>6</sup>Gava r'êda hêlûna teyredêkî li ser darekê, yan li ser e'rdê t'evî cûcûka, yan hêka û mak li ser cûcûka, yan hêka r'astî te bê, makê t'evî cûcûka hilnedî. <sup>7</sup>Tu gere makê ber'dî lê cûcûka dikarî hildî xwer'a, wekî ter'a qenc be û r'ojêd te dirêj bin.

---

\* 21:19 Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretîyê, dîwanê û qirara bû.

<sup>8</sup>Gava tu mala nû çêkî, ser banî dora wê sûreke nimiz çêke, wekî tu xûnê neynî li ser mala xwe, gava yek ji ser ban bik'eve.

<sup>9</sup>Baxê xweyî tirîyada t'oximêd mayîn ner'eşînî, yan na ew berê t'oximê te çandî û tirî wê pîroz\* bin û îzina te wê t'unebe wan bidî xebatê.

<sup>10</sup>Pê ga û k'erê bi hevr'a cotk'arîyê nekî.

<sup>11</sup>K'inca bi cûr'e-cûr'e t'êlê r'îs û k'itanî bi hevr'a hûnandî xwe nekî.

<sup>12</sup>Li ser her çar kevîyêd p'otê xwe bi k'îjanî tu xwe dinixêmî r'îşîya çêkî.

### **Qanûna bona namûsa qîzê**

<sup>13</sup>Heger yek jinekê bistîne, serê xwe pêr'a dayne û paşê ew li ber ç'e'vê wî r'eş be, <sup>14</sup>şer' bavêjê, navê xirab li pey wê xe û bêje: «Min ev jin xwer'a xwest, serê xwe jêr'a danî lê min namûsa wê nedît». <sup>15</sup>Hingê bira dê û bavê keç'ikê nîşana namûsa keç'ikê hildin bibine li ber r'ûspîyêd bajêre li ber dergeha <sup>16</sup>û bavê keç'ikê bêje r'ûspîya: «Min qîza xwe da vî merivî lê ewî jenande wê, <sup>17</sup>va ye ew şer'a dike û dibêje: «Min namûs li cem qîza te nedît», lê va ye nîşana namûsa qîza min». Û nivîna wê nîşanî r'ûspîyêd bajêr kin. <sup>18</sup>Hingê bira r'ûspîyêd wî bajarî ewî merivî bigirin û ceza kin. <sup>19</sup>Sed zîvî ji wî bistînin û bidine bavê keç'ikê, bona wekî wî navê xirab li pey qîza îsraêlî xist. Ew keç'ik jî bira bibe jina wî, ew nikare wê ber'de li nava h'emû r'o'jêd xweda.

<sup>20</sup>Lê heger çi ku hatîye gotinê r'ast e, namûsa keç'ikê t'unebûye, <sup>21</sup>hingê bira keç'ikê bibine li ber derê mala bavê wê û merivêd bajêr wê bidine li ber kevira bikujin. Çimkî

---

\* 22:9 Yanê Xwedê îzin neda ku cime'ta wî nava baxê xweyî tirîyada tiştêkî din jî biçîne, çawa ku misirîya dikirin. Lê gava ew tişt bikirana hingê ew dibû p'ara Xwedê, gere Xwedêr'a bihata dayînê, lema dibêje: «...Îzina te wê t'unebe wan bidî xebatê».

ewê r'obetî kir li nava Îsraêlda, qavî kirîye mala bavê xweda. Bi vî awayî tê xirabîyê li nava xweda r'awva derxî.

<sup>22</sup>Heger mêrek t'evî jina mêrkirî serê xwe dayne û ev yek e'yan be, bira her du jî bêne kuştinê: Hin mêrê ku serê xwe pêr'a danî û hin jî ew jin. Bi vî awayî tê xirabîyê li nava Îsraêl r'awva derxî.

<sup>23</sup>Gava qîzek mêrekîr'a bê nîşankirinê û yek bajêrda r'astî wê bê û serê xwe pêr'a dayne, <sup>24</sup>hingê her duya jî derxine li ber dergehê wî bajarî û wan bidine li ber kevira bikujin. Qîz çimkî bajêrda bûye lê nekirîye hewar-gazî, mêr jî çimkî dergîstîya yekî din r'ûr'eş kirîye. Bi vî awayî tê xirabîyê li nava xweda r'awva derxî. <sup>25</sup>Lê heger çolê merivek r'astî qîza nîşankirî bê, wê bigire û serê xwe wêr'a dayne, bira t'enê ew merivê ku t'evî wê serê xwe danîye bimire. <sup>26</sup>Lê dest nede qîzê, gunê hêjayî mirinê li ser qîzê t'uneye. Ev mîna wê yekê ye gava yek bigihîje li ser yekî din û bikuje. <sup>27</sup>Çimkî ew çolê r'astî wê hatîye, qîza nîşankirî kirîye hewar-gazî lê t'u kes li wir t'unebûye ku wê xilaz ke.

<sup>28</sup>Gava yek r'astî qîzeke ne mêrkirî bê, wê bigire serê xwe wêr'a dayne û ev yek e'yan be, <sup>29</sup>hingê bira mêrê ku serê xwe wêr'a danîye, pêncî zîvî bide bavê qîzê û bira ew bibe jina wî, çimkî ewî ew r'ûr'eş kir. Ew îdî nikare wê ber'de li nava h'emû r'ojêd xweda.

<sup>30</sup>Bira t'u kes jinbava xwe nestîne, awa gotî cî nivîna bavê xwe bêhurmet neke.

### **Qanûna bona wan k'ê dikare yan nikare bik'eve nava civîna Xudan**

**23** Ewê ku batîyêd wî p'erç'iqandî bin, yan qamîşê wî bir'î be, bira nek'eve nava civîna Xudan.

<sup>2</sup>Zar'a ji qavîyê bûyî nikare bik'eve civîna Xudan, ne jî zur'eta wîye deha dikare bik'eve nava civîna Xudan.

<sup>3</sup>Amonîf û mowabîf nikare bik'eve nava civîna Xudan, ne jî zur'eta wane deha dikare bik'eve nava civîna Xudan.

<sup>4</sup>Çimkî wan hûn bi nan û avê qebûl nekirin li ser r'îya ku hûn ji Misirê derk'etin û wan Bilamê kur'ê Beûr ji Pit'ora Aram-Naharaimê\* miqabilî te k'irê kirin, wekî nifir'a li te bike\*\*. <sup>5</sup>Lê Xudan Xwedêyê te nexwest guh bide Bilam, Xudan Xwedêyê te bona te nifir' guhaste dua, çimkî Xudan Xwedêyê te te h'iz dike. <sup>6</sup>T'emamîya r'ojêd e'mirê xweda, e'dilayê û çerxa r'ast wanr'a nexwaze.

<sup>7</sup>Ji edomîf zivêr nebe, çimkî ew birayê te ye. Ji misirî zivêr nebe, çimkî tu xerîb bûyî welatê wîda. <sup>8</sup>Zar'êd wane zur'eta sisîya dikarin bik'evine nava civîne Xudan.

### **Qanûnêd bona paqijîya zomêd ordîya**

<sup>9</sup>Gava tu ordîyêva derk'evî miqabilî dijminêd xwe, h'evza xwe ji her xirabîyê bike. <sup>10</sup>Heger cem te merivek xewnxapî be, ne paqij be, bira ew ji zomê derk'eve der û nek'eve nava zomê. <sup>11</sup>Bira berê êvarê ew xwe bi avê bişo û çaxê ku r'o diçe ava hingê ew dikare veqer'e zomê.

<sup>12</sup>Gere ji zomê der cîyê te hebe, wekî bikaribî li wir derêyî der. <sup>13</sup>Xêncî ç'ekêd te gerekê bêrika te jî hebe û gava ji zomê derêyî der, bi wê ç'e'lekê vede û e'deba xwe ç'e'l ke. <sup>14</sup>Çimkî Xudan Xwedêyê te li nav zoma teda diger'e, wekî te aza ke û dijminêd te bide destê te, bira zoma te pîroz be, ku nebe Xudan nava teda tiştêkî şermî bibîne û dûrî te k'eve.

### **Qanûna bona xulamêd ku ji xweyê xweyî welatder bir'evin**

<sup>15</sup>Gava xulamek\* ji xweyê xwe bir'eve û hewara xwe te bîne, wî nede destê xweyê wî. <sup>16</sup>Bira ew li cem te, nava

---

\* 23:4 P'areke Mesopotamyayê.

\*\* 23:4 Binihêr'e Jimar ji 22:4-24:25.

\* 23:15 Ev qanûn dixebite li ser xulamêd ku ji xweyê xweyî welatder bir'evin û bêne Îsraêlê. Bona qanûna xulamêd îsraêlî ji k'erema xwe li Qanûna Ducarî 15:12-18 binihêr'e.

teda bijî, li wî cîyê ku ew li nava bajarêd te yekîda bibijêre, k'îderê ew bixwaze. Ze'metê nede wî.

### **Qanûna li ser qavîyê**

<sup>17</sup>Bira li nava qîz û kur'êd Îsraêlda xwefroş\* t'une bin. <sup>18</sup>Bona t'u ad-qîrarê, qazınca ya qav, yan yê kûç'iksan, nebî mala Xudan Xwedêyê xwe, çimkî her du jî k'irêtî ne li ber Xudan Xwedêyê te.

### **Qanûna bona deyn û selefa**

<sup>19</sup>Bi selefa ne p'ere, ne nan, ne jî tiştêd mayîn çî ku bi selef tê dayînê nede birayê xweyî îsraêlî. <sup>20</sup>Bi selef dikarî bidî yê xerîb, lê bi selef nede birayê xwe, wekî Xudan Xwedêyê te te bimbarek ke li nava h'emû kirina destêd te li ser e'rdê ku tu diçî ku xwer'a bikî milk'.

### **Qanûna bona ad-qîrar**

<sup>21</sup>Heger tu Xudan Xwedêyê xwer'a ad-qîrar kî, derengî neyêxî ku biqedînî, çimkî Xudan Xwedêyê te wê ji te e'se bixwaze û guneyê li ser te be. <sup>22</sup>Lê heger te ad-qîrar ne kirîye, hingê guneyê li ser te t'unebe. <sup>23</sup>Çî ku ji devê te derk'etîye bike. Çî ku te Xudan Xwedêyê xwer'a ad-qîrar kirîye, çawa dîyarîya r'ezedilîyê ku bi zarê xwe gotîye biqedîne.

### **Îzina bona xwarina ji baxêd xelqê**

<sup>24</sup>Gava bik'evî nava baxê yekî din, tirîya çiqasî ku dilê te dixwaze t'êr dikarî bixwî, lê nekî derdana xwe.

<sup>25</sup>Gava tu nava zevîya yekî dinr'a her'î, tu dikarî simbila bi destê xwe biçînî, lê de'sê zevîya wî nexî.

---

\* 23:17 «Xwefroş» maşoqa p'ût e, awa gotî çî ku qazinc dikir danî dîyarî ocaxa p'ût dikir, bi wê kirina xwe ocaxa p'ûtada h'elal di-hate h'esabê, çimkî bi qavîya xwe k'ar dida ocaxa p'ûta.

### **Qanûna bona zewacê**

**24** Gava yek jinekê xwer'a bixwaze bizewice, peyr'a ser wê kêmasîkê bibîne û ewa li wî xweş neyê, bira k'axaza jinber'danê jêr'a binivîse bide destê wê û wê ji mala xwe derxe. <sup>2</sup>Heger jin jî ji mala wî derk'eve her'e û mêrekî din bistîne, <sup>3</sup>li wî mêrî jî xweş neyê, ew jî k'axaza jinber'danê jêr'a binivîse bide destê wê û wê ji mala xwe derxe, yanê jî ew mêrê duda k'îjanî ew xwer'a xwest bimire, <sup>4</sup>hingê mêrê wêyî pêşîyê, yê ku ew ber'dabû, nikare dîsa wê bistîne ku ew bibe jina wî, pey r'obetbûna wêr'a, çimkî eva yeka k'irêtî ye li ber Xudan. Neh'er'imîne e'rdê ku Xudan Xwedêyê te war dide te.

### **Qanûna bona eskerîyê**

<sup>5</sup>Yê nû zewicî bira neçe eskerîyê û bira t'u borc neyê danînê li ser wî, bira ew salekê bona mala xwe aza be û bira jina xweye xwestî şa ke.

### **Qanûna bona k'efîlf**

<sup>6</sup>Bira t'u kes ne destar' ne jî kevirê wêyî binî k'efîlf hilnede, çimkî yê ku vê yekê dike ew nefsekê k'efîlf hildide.

### **Qanûna miqabilî meriv dizînê**

<sup>7</sup>Gava e'yan be wekî merivek ji birayêd xwe yekî îsraêlf bidize, wî bike xulam û bifiroşe, bira ew diz bê kuştinê. Bi vî awayî xirabîyê ji nava xweda r'awva derxe.

### **Qanûna k'otîbûnêf**

<sup>8</sup>Miqatî xwe be bona k'otîbûnêf, çî ku k'ahînêd lêwî li we e'mir kin, qenc xwey kin û biqedînin, çawa ku min li wan e'mir kirîye qenc xwey kin. <sup>9</sup>Bîr bîne Xudan Xwedêyê te r'êva çî anî serê Meryemê gava ku hûn ji Misirê derk'etin\*.

---

\* 24:9 Binihêr'e Jimar 12:10-15.

### **Qanûnêd mayîne bona deyn dayînê**

<sup>10</sup>Gava tu tiştêkî deynî didî yekî din, nek'eve mala wî wekî k'efîl ji wî bistînî. <sup>11</sup>Lê derê malê bisekine û ewê ku tu deynî didêyî bira ew xwexa k'efîl derxe derê malê. <sup>12</sup>Heger ew merivekî k'esîb e, k'efîlê wî awa gotî p'otê\* wî hilnede r'anezê. <sup>13</sup>Gava r'o diçe ava, tu e'se k'efîlê wî li wî vege'înî, wekî ew bi p'otê xwe p'alde r'azê. Hingê wê dua li te bike û ev yekê ter'a r'astî bê h'esabê li ber Xudan Xwedêyê te.

### **Heqê yê k'irêkirî**

<sup>14</sup>Heger tu k'esîb-k'ûsîbê ji birayêd xwe, yan xerîbê li nava e'rd û bajarê xweda k'irê kî, wî neêşînî. <sup>15</sup>Her r'oj berî r'oçûyînê heqê wî bidî, çimkî ew k'esîb e û nefsa wî heqqa girêdayî ye, nebe wekî ew hewara xwe Xudan bîne bona te û gune li ser te be.

### **Cabdarîya guna**

<sup>16</sup>Bav gere dewsa zar'a neyêne kuştinê, ne jî zar' dewsa bavê bêne kuştinê, her kes bona guneyê xwe gere bi kuştinê.

### **Merivêd bê kes**

<sup>17</sup>Heqîya xerîb yan sêwî net'er'ibîne û k'inca jinebîyê k'efîl hilnede. <sup>18</sup>Bîr bîne wekî tu xulam bûyî Misirêda, Xudan Xwedêyê te tu ji wir aza kirî, bona vê yekê ez li te e'mir dikim ku tu usa bikî.

<sup>19</sup>Gava tu zevîya xwe bidirûyî û gur'zekê li e'rdê xweda bîr bikî, paşda veneger'î ku wê hildî, bira ew bona xerîb, sêwî û jinebîyê be, wekî Xudan Xwedêyê te, nava her xebata destêd teda te bimbarek ke. <sup>20</sup>Gava tu darêd xweyê zeyt'ûnê

---

\* 24:12 Wî çaxî hebûka merivêd k'esîb t'enê p'ot bû, wana çawa k'efîl dikaribû t'enê p'otê xwe bidana. Lê p'ot lazim bû ku şev bavîtana li ser xwe.

dawşînî, cara duda dawneşînî, bira ew bona xerîb, sêwî û jinebîyê be. <sup>21</sup>Gava tu tirîyê baxê xwe berev kî, peyr'a çî ku maye berev neke, bira ew bona xerîb, sêwî û jinebîyê be. <sup>22</sup>Bîr bîne wekî tu li welatê Misirêda xulam bûyî, bona vê yekê ez li te e'mir dikim ku tu usa bikî.

### Ceza

**25** Heger nava merivada şer'-de'w çêbe û ew li ber dîwanê bisekinin, bira h'akim dîwana wan bikin: Yê heq bê sûc bikin û yê neheq jî sûcdar bikin. <sup>2</sup>Heger yê neheq layîqî k'utanê ye, bira h'akim e'mir ke, ku wî velezînin û li ber ç'e'vêd h'akim anegorî neheqîya wî bik'utin. <sup>3</sup>Ji çil derbî zêdetir h'akim nede wî, çimkî gava tu vê zêdetir lêdî, tu birayê xwe li ber ç'e'vê cime'tê bêhurmet dikî.

### Qanûna bona ga

<sup>4</sup>Devê gayê bêderêda dixebite girênedê.

### Borcê t'îyîtiyê

<sup>5</sup>Heger bira t'evayî bijîn, yek ji wan bimire lê kur'ê wî t'unebe, bira jina yê mirî merivê xerîbr'a, awa gotî ji malbetê der neyê dayîne, t'îyê wê gere her'e cem wê û wê xwer'a bistîne û bi vî awayî borcê t'îyîtiyê biqedîne. <sup>6</sup>Nixurîyê ku ewê bîne wê kur'ê birê mirî bê h'esabê, wekî navê wî li nava Îsraêlda neyê hildanê. <sup>7</sup>Lê heger ev meriv nexwaze bûka xwe bistîne, hingê bira bûka wî derk'eve li ber dergeh\* cem r'ûspîya û bêje: «T'îyê min naxwaze k'oka birayê xwe li nava Îsraêlda şîn ke, ew naxwaze borcê t'îyîtiyê biqedîne». <sup>8</sup>Hingê r'ûspîyêd bajêr bira gazî wî kin û wî'r'a xeber din. Lê heger ew ya xwe bike û bêje: «Ez naxwazim wê bistînim» <sup>9</sup>hingê bira bûka wî nêzîkî wî be û li ber ç'e'vê r'ûspîya sola wî ji

---

\* 25:7 Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretîyê, dîwanê û qirara bû.

nigê wî bêxe, t'ûyî r'ûyê wî ke û bêje: «Ha tînine serê wî merivî, yê ku mala birê xwe ava nake». <sup>10</sup>Bira nava Îsraêlda mala wîr'a bêjin: «Mala yê bê sol».

### Ji hev veqetandina şêr'da

<sup>11</sup>Heger mêr hevr'a bikine şer' û jina yekî ji wan nêzîk be wekî mêrê xwe destê yê din derxe, destê xwe bavêjê û batîyê yê din bigire, <sup>12</sup>hingê destê wê bibir'e, bira h'eyfa te li wê neyê.

### Kevirê mêzînê û derdanê çapkirinê

<sup>13</sup>Bira k'îsikê teda du cûr'e kevirê mêzînê, awa gotî sivik û giran t'une bin. <sup>14</sup>Bira mala teda du cûr'e derdanê çapkirinê, awa gotî biç'ûk û mezin t'une bin. <sup>15</sup>Kevirê teyî mêzînê û derdanê teyî çapkirinê gere t'am û r'ast bin, wekî e'mirê te dirêj be li ser e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te. <sup>16</sup>Çimkî kirina yê vê yekê, yan yê ku ner'astîyê dike, k'irêtîye li ber Xudan Xwedêyê te.

### Navê Amalêk r'esît kî

<sup>17</sup>Bîr bîne Amalêk r'êva çi anî serê te, gava ku hûn ji Misirê derdik'etin. <sup>18</sup>Ew ji Xwedê netirsîya û piştêva h'icûmî li ser te kir, çaxê tu westîyayî û qudûmk'etî bûyî û yêd sistbûyî qir' kirin. <sup>19</sup>Awa gava Xudan Xwedêyê te, te ji her dijminêd dora teye li ser wî e'rdî r'ih'et bihêle, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te çawa milk' dide te, ku qazinc kî, navê Amalêk bin p'erê e'zmênda r'esît kî. Bîr nekî!

### Berêd deremeta pêşin

**26** Westê tu bik'evî wî e'rdê ku Xudan Xwedêyê te çawa milk' dide te lê war bî û wir bimînî, <sup>2</sup>hingê hilde ji her berê deremeta e'wline e'rdê, çi ku tê bistînî ji e'rdê xweyî ku Xudan Xwedêyê te dide te, bike sepetê û her'e li wî cîyê ku Xudan Xwedêyê te wê bibijêre, wekî navê xwe lê dayne. <sup>3</sup>Her'e li cem k'ahînê ku wan r'oja k'ahîntîyê dike,

bêje wî: «Ez îro li ber Xudan Xwedêyê te îqrar dikim, wekî ez k'etime wî e'rdî k'îjan ku Xudan kal-bavêd mer'a sond xwar ku wî bide me». <sup>4</sup>Hingê k'ahîn wê sepetê ji destêd te bigire û dayne li ber gorîgeha Xudan Xwedêyê te. <sup>5</sup>Tu li ber Xudan Xwedêyê xwe bike dengî û bêje: «Bavê min aramîyekî firarî bû, berjêr çû Misirê û t'evî çend meriva li wir ma. Lê li wir miletekî mezin, qewat û bêh'esab ji wî pêşda hat. <sup>6</sup>Lê misirîya xirabî li me dikirin, em dizêrandin û xebata giran didane kirinê. <sup>7</sup>Me hewara xwe Xudan Xwedêyê kal-bavêd xwe anî û Xudan dengê me bihîst, li ser zelûliya me, h'alê me û zordariya meda nihêr'î. <sup>8</sup>Xudan em ji Misirê bi destê zor, bi zenda dirêjkirî, bi sawa giran, bi nîşana û k'eremeta derxistin <sup>9</sup>em anîne li vî cîyî, ev e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe da me. <sup>10</sup>Va ye îro ez berêd deremeta pêşine ji e'rdê ku te Xudan da min tînim!» Wê dayne li ber Xudan Xwedêyê xwe û ta be li ber Xudan Xwedêyê xwe. <sup>11</sup>Bona h'emû xweşîya ku Xudan Xwedêyê te da te û mala te, t'evî lêwî û xerîbê li nava teda şa be.

### Deheka<sup>f</sup> sala sisîya

<sup>12</sup>Gava sala sisîya, awa gotî sala deheka başqekirina her deheka berêd xwe xilaz kî, bidî lêwî, xerîb, sêwî û jinebîyê ku ew li bajarêd teda bixwin û t'êr bin, <sup>13</sup>hingê li ber Xudan Xwedêyê xwe bêje: «Min p'ara buhurtî-jibare ji mal derxist û min ew daye lêwî, xerîb, sêwî û jinebîyê, anegorî h'emû e'mirêd te, yêd ku te li min e'mir kirin. Min e'mirêd te net'er'ibandine û ne jî bîr kirine. <sup>14</sup>Min ew paqijîya xweda hilda, r'ojêd şînêda ji wê nexwar û ne jî ji wê nanê mirîya da. Min guh dida dengê Xudan Xwedêyê xwe, min h'emû usa kir çawa ku te li min e'mir kir. <sup>15</sup>Binihêr'e ji xana xweye pîroz, ji e'zmên û miletê xwe Îsraêl bimbarek ke, usa jî e'rdê ku te da me, e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe, çawa ku te kal-bavêd mer'a sond xwar».

### Milet wî yî milk'ê Xudan

<sup>16</sup>Vê r'ojê Xudan Xwedêyê te, li te e'mir dike ku biqedînê h'emû van qeyde-qanûn û qirara. Wan bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe xwey kî û biqedînê. <sup>17</sup>Te îro îqrar kir ku Xudan, Xwedêyê te ye û tê r'îyêd wîda her'î, qeyde-qanûnêd wî, e'mirêd wî, qirarêd wî xwey kî û guh bidî dengê wî. <sup>18</sup>Xudan îro îqrar kir ku tu wîr'a bibî miletê wîyî milk'ê wî, çawa ku wî gotibû te, tu jî gere h'emû e'mirêd wî xwey kî. <sup>19</sup>Wekî ew te li ser h'emû miletar'a bilind bigire, k'îjan ku ewî xuliqandine, bona pesinê, navbilindkirinê û r'ûmetê, wekî tu bibî miletekî pîroz li Xudan Xwedêyê xwer'a, çawa ku wî got».

### Xeberêd qanûnêye li ser kevir

**27** Mûsa t'evî r'ûspîyêd Îsraêl li milet e'mir kir û got: «H'emû e'mirêd ku ez îro li we e'mir dikim xwey kin. <sup>2</sup>Wê r'oja gava hûn Êrdunêr'a derbaz bine e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te, hingê xwer'a kevirêd mezin bide sekinandinê û bi k'îlsê zêp ke. <sup>3</sup>Li ser wan h'emû xeberêd vê qanûnê, wextê derbazbûna xwe binivîse, awa gotî wextê tu her'î e'rdê ku Xudan Xwedêyê te dide te. E'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe, çawa ku Xudan Xwedêyê kal-bavêd te gotibû te. <sup>4</sup>Wextê hûn Êrdunêr'a derbaz bin, van kevira daynine li ser ç'îyayê Eybalê û bi k'îlsê wan zêp kin, bona k'îjana ez îro li we e'mir dikim. <sup>5</sup>Li wir gorîgehê Xudan Xwedêyê xwer'a çêke. Gorîgeha kevirî, hacetê h'esin li kevirê wê nek'eve. <sup>6</sup>Bi kevirêd saxlem gorîgehê Xudan Xwedêyê xwer'a çêke û li ser wê dîyarîyêd t'evayîşewatê Xudan Xwedêyê xwer'a bide, <sup>7</sup>dîyarîyêd heleqetîyê serjêke, li wir ber Xudan Xwedêyê xwe bixwe û şa be. <sup>8</sup>Û li ser wan kevira h'emû xeberêd vê qanûnê zelal-safî binivîse».

<sup>9</sup>Hingê Mûsa û k'ahînêd lêwî t'emamîya Îsraêl'r'a gotin: «Ker' be û bibihê, Îsraêl! Îro tu bûyî miletê Xudan Xwedêyê

xwe. <sup>10</sup>Guh bide dengê Xudan Xwedêyê xwe, e'mirêd wî û qeyde-qanûnêd wî biqedîne, k'îjan ku ez îro li te e'mir dikim».

### Nifir'

<sup>11</sup>Wê r'ojê Mûsa e'mir dane cime'tê û got: <sup>12</sup>«Gava hûn Êrdunêr'a derbaz bin, qebîla Şimh'ûn, Lêwî, Cihûda, Îsaxar, Ûsiv û Binyamîn gere li ser ç'îyayê Girîzîmê bisekinin ku dua li millet bikin. <sup>13</sup>Lê qebîla R'ûbên, Gad, Aşêr, Zebûlon, Dan û Neftelî gere li ser ç'îyayê Eybal bisekinin, bona nifir' kirinê. <sup>14</sup>Û lêwîyê bi dengê bilind bikine gazî bêjine h'emû îsraêlîya:

<sup>15</sup>«Nifir' li wî be, k'ê p'ûtekî çêke, yan r'o ke û wî dayne cîkî xewle, her çêkirina haye bi destê hoste, k'irêtî ye li ber Xudan». Bira millet vege'rîne û bêje: «Amîn».

<sup>16</sup>«Nifir' li wî be, k'ê dê û bavê xwe bê hurmet ke». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>17</sup>«Nifir' li wî be, k'ê sînorê cînarê xwe cî biguhêze». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>18</sup>«Nifir' li wî be, k'ê yekî kor ji r'ê bişih'itîne». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>19</sup>«Nifir' li wî be, k'ê heqîya xerîb, sêwî û jinebîyê bit'er'ibîne». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>20</sup>«Nifir' li wî be, k'ê serê xwe jinbava xwer'a dayne, çimkî ew cî nivîna bavê xwe bêhurmet dike». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>21</sup>«Nifir' li wî be, k'ê serê xwe h'eywanekêr'a dayne». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>22</sup>«Nifir' li wî be, k'ê serê xwe xûşka xwer'a, qîza bavê xwe yan qîza dîya xwer'a dayne». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>23</sup>«Nifir' li wî be, k'ê serê xwe xwesîya xwer'a dayne». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>24</sup>«Nifir' li wî be, k'ê dizîva yekî din bikuje». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>25</sup>«Nifir' li wî be, k'ê r'uşetê hilde ku xûna yê amî-t'am bir'êje». H'emû millet bêje: «Amîn».

<sup>26</sup>«Nîfir' li wî be k'ê xeberêd vê qanûnê xwey neke neqedîne». H'emû millet bêje: «Amîn».

### Dua li wî be k'ê guh bide

**28** Heger tu r'ind guh bidî dengê Xudan Xwedêyê xwe bona ku xwey kî û biqedînî h'emû e'mirêd wîye ku ez îro li te e'mir dikim, Xudan Xwedêyê te wê te ji h'emû milletêd dinê bilindtir ke. <sup>2</sup>Ev h'emû duayê li te bin û bona te wê bêne sêrî, heger tu guh bidî dengê Xudan Xwedêyê xwe.

<sup>3</sup>Duayê li te be bajêrda û duayê li te be deştêda.

<sup>4</sup>Duayê li berê zikê te, berê e'rdê te, berê h'eywanê te, zayîna pez û dewarêd te be.

<sup>5</sup>Duayê li sela teye nên û t'eşta teye hevîr be.

<sup>6</sup>Duayê li k'etin-derk'etina te be\*.

<sup>7</sup>Xudan li ber te wê dijminêd te xe, yêd ku miqabilî te r'a-bin. R'êkêda ewê derêne miqabilî te lê h'eft r'îyada wê ji te bir'evin. <sup>8</sup>Xudan wê dua bişîne li ser te, li e'mbarêd te û li her kirina destêd te. Wê dua li te bike li wî e'rdîda, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te dide te. <sup>9</sup>Heger tu e'mirêd Xudan Xwedêyê xwe xwey kî û r'îyêd wîda her'î, Xudan wê te bike milletê xweyî pîroz, çawa ku wî ter'a sond xwar. <sup>10</sup>H'emû milletêd dinê wê bibînin ku navê Xwedê li ser te ye û wê ji te bitirsin. <sup>11</sup>Xudan wê te xêr-berek'etêva, bi berê zikê te û bi berê h'eywanê te, bi berê e'rdê te xinê ke, li ser wî e'rêdê ku Xudan kal-bavêd ter'a sond xwar ku bide te. <sup>12</sup>Xudan wê bona te xizna xweye qenc, awa gotî e'zmên veke, wekî baranê we'deda bibarîne li ser e'rdê te, ku dua li her kirina destê te bike. Tê deyn bidî gelek mileta lê xwexa tê deyn nekî. <sup>13</sup>Xudan wê te dayne li sêrî ne ku xilazîyê, tê t'enê li jorê bî ne ku jêrê, heger tu guh bidî e'mirêd Xudan Xwedêyê xwe, k'îjan ku ez îro li te e'mir dikim ku xwey kî û biqedînî

---

\* 28:6 «K'etin-derk'etina te» yanê her tişt çî ku tu dikî.

<sup>14</sup> û ji h'emû xeberêd ku ez îro li we e'mir dikim, ç'ep yan r'ast danegerî ku pey xwedêyêd başqe her'î, wan'a qulix kî.

### Nifir' li wî be k'ê guh nede

<sup>15</sup> Lê heger tu guh nedî dengê Xudan Xwedêyê xwe û h'emû e'mirêd wî, qeyde-qanûnêd wî ku ez îro li te e'mir dikim xwey nekî û neqedînî, hingê ev h'emû nifir' wê li te bin û bona tê wê bêne sêrî.

<sup>16</sup> Nifir' wê li te be bajêrda û nifir' wê li te be deştêda.

<sup>17</sup> Nifir'ê li sela teye nê nê û t'ešta te ye hevîr be.

<sup>18</sup> Nifir'ê li berê zikê te, berê e'rdê te, zayîna pez û dewarêd te be.

<sup>19</sup> Nifir'ê li k'etin-derk'etina te\* be.

<sup>20</sup> Li nava her kirina destê te çî ku tu bikî, Xudan wê nifir', t'evîhevbûn û hilatinê bişîne li ser te, h'eta qir'a te neyê û zûtirekê unda nebî bona kirêd xwey xirab, ku te ez hiştim.

<sup>21</sup> Xudan wê nexweşîya h'ala teva bizeliqîne, h'eta ku qir'a te bîne li ser wî e'rdê ku tu diçî xwer'a bikî milk'. <sup>22</sup> Xudan wê bi h'îlê, germê, şewatê, t'ayê, qurlixê, bi bayê germ û bi xurê r'aw te xe, ewê pey te k'evin h'eta ku qir'a te bînin. <sup>23</sup> E'zmanê li ser serê te bibe sifir, e'rdê jî bin teda bibe h'esin\*.

<sup>24</sup> Xudan wê dewsa baranê t'oz û axê bide li e'rdê te, evanayê ji e'zmên li ser teda bibarin h'eta qir'a te neyê.

<sup>25</sup> Xudan wê te bide li destê dijminêd te, r'êkêda tê derêyî miqabilî wan lê h'eft r'îyada tê ji wan bir'evî û h'îlê h'emû p'adşatîyêd li ser dinê wê ji te her'e. <sup>26</sup> Cinyazê te wê bibe xurê h'emû teyredêd e'zmên û r'e'wirêd e'rdê, kesê t'unebe ku berî wan de.

<sup>27</sup> Xudan wê bi p'izikêd p'îse Misirê, k'otîbûnêf, birînêd k'ûr û bi xur te xe, ji k'îjana tê nikaribî qenc bî. <sup>28</sup> Xudan wê bi

---

\* 28:19 «K'etin-derk'etina te» yanê her tişt çî ku tu dikî.

\* 28:23 Ev aha tê fe'mkirinê: «Xwedê wê e'zmên dade û baranê t'une be hingê e'rdê mîna h'esin h'işk be».

h'işundakirinê, korbûnê û dillerzekê te xe. <sup>29</sup>R'o nava r'ojê tê xwe bip'elînî, çawa ku kor te'rîstanîyêda dip'elîne. R'îyêd xweda tê xêrê nebînî, h'emû r'ojêd xweda tê bêyî zêrandin û t'alankirinê û kesekê t'unebe ku te xilaz ke. <sup>30</sup>Dergîstîya xwer'a tê nîşankirî bî, lê yekî dinê wê serê xwe pêr'a dayne, tê xanî çêkî lê têda r'ûnenêyî, baxê tirîya tê daç'ikînî lê ji wê neçinî. <sup>31</sup>Gayê te wê li ber ç'e'vê te bê serjêkirinê, lê tê jê nexwî, k'erê te wê ji te bistînin û ew paşda venager'e li cem te, pezêd te wê dijminêd ter'a bêne dayîne, yek wê t'unebe ku te xilaz ke. <sup>32</sup>Kur'-qîzêd teyê miletê başqer'a bêne dayîne, ç'e'vêd teyê r'oj bi r'oj ji ç'e'vnihêr'îya wan biqer'imin û tê t'u tiştî nikaribî bikî. <sup>33</sup>Berê e'rdê te û h'emû xebata te miletê ku te ew nas nedikir wê bixwe. Tê her gav bêyî zêrandin û h'incir'andinê. <sup>34</sup>Tê biçeliqî ji wê yekê çî ku tê bi ç'e'vêd xwe bibînî. <sup>35</sup>Xudan wê bi p'izikêd p'îs hêt û çokêd te xe, ji k'îjana tê nikaribî qenc bî, ewê ji bin p'îyêd te h'eta t'epa serê te bela bin. <sup>36</sup>Xudan wê te û p'adşayê ku tê li ser xwe k'ifş kî, bibe li nav miletê ku ne te ne jî kal-bavêd te ew nas kirine. Li wir tê xwedêyêd başqeye dar û kevirr'a qulix kî. <sup>37</sup>Tê bibî mocala h'îletîyê, met'elok û pêk'enîyê li nava h'emû wan miletêd ku Xudan wê te bibe.

<sup>38</sup>Tê gelek t'oxim derxî zevîya xwe, lê hindikî jê hildî, çimkî kulîyê bixwin. <sup>39</sup>Baxê tirîya tê daç'ikînî, wan bêcer kî, lê r'ez tê t'op nekî, ne jî tê şeravê vexwî, çimkî kurmê bixwin. <sup>40</sup>Li nava t'emamîya sînorê t'eda darê zeyt'ûnê wê hebin, lê tê bi bizir pê neyêyî r'ûnkinê, çimkî zeyt'ûnêd te wê biwerin. <sup>41</sup>Kur' û qîza tê bînî, lê ewê p'ara te nîbin, çimkî ewê hêsîr her'in. <sup>42</sup>Hespê gîhê wê h'emû darêd te û berêd e'rdê te bibin xweyî. <sup>43</sup>Xerîbê li nava t'eda wê gelekî ji te bilindtir be, li ser te k'eve, lê tê gelekî nimiz bik'evî. <sup>44</sup>Ewê deyn bide te, lê tê deyn nedî wî, ewê sêrî be tê xilazîyê bî.

<sup>45</sup>Ev h'emû nifir' wê bêne li serê te, wê pey te k'evin û xwe ter'a bigihînin h'eta qir'a te neyê, çimkî te dengê Xudan Xwedêyê xwe ne bihîst û te e'mirêd wî, qeyde-qanûnêd wî

ku wî li te e'mir kirin, xwey nekirin. <sup>46</sup>Ewê li ser te û li ser zur'eta te bibine nîşan û îzbatîya h'eta-h'etayê.

<sup>47</sup>Bona ku te Xudan Xwedêyê xwer'a bi şabûnê û dilê eşq t'êr-t'ijîbûnêda qulix nekir, <sup>48</sup>bona vê yekê tê t'î, bir'çî, te'zî û h'ewcedarîya her tiştîda xulamtîya wan dijminêd xwe bikî, k'îjana Xudanê bişîne li ser te. Ewê nîrê h'esinî bide li ser stûyê te, h'eta ku qir'a te bîne. <sup>49</sup>Xudan wê miletekî dûr ji serê dinê r'ake li ser te, zimanê k'îjanî tê fe'm nekî. Ewê çawa teyrê sîmir' bifir'e li ser te, <sup>50</sup>miletekî bêîsaf ku wê qedirê mezina negire û r'e'mê li biç'ûka neke. <sup>51</sup>Û ewê berê h'eywanêd te, berê e'rdê te bixwe, h'eta ku tu wêran nebî. Ewê ne gênim ter'a bihêle, ne meyê, ne bizir, ne jî zayîna pez û dewarêd te, h'eta ku qir'a te neyne. <sup>52</sup>Wê dora h'emû bajarêd te bigire, h'eta ku sûrêd li nava t'emamîya welatê teye bilinde qewat, ku te gumana xwe danîye li ser wan, hilneşîne. Ewê dora h'emû bajarêd teye t'emamîya welatê teda, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te dane te bigire. <sup>53</sup>Gava dijminê te dora bajarê te bigire li nava wê tengasîyêda ku ewê bîne serê te, tê berê zikê xwe, awa gotî goştê kur' û qîza xwe ku Xudan Xwedêyê te dane te bixwî. <sup>54</sup>Mêrê gelekî nazik û milûkî li nava teda wê bi ç'e'vêd xirab li birê xwe, k'ulfeta xweye h'izkirî û li zar'êd xweye mayîn binihêr'e, <sup>55</sup>ewê goştê zar'êd xwe bixwe û nede t'u kesî ji wan. Çimkî t'enê ev mabû li nava tengasîyê ku dijminê te wê bîne li serê te, gava dora h'emû bajarêd te bigire. <sup>56</sup>K'ulfeta nazik û milûke li nava teda, k'îjanê ji dest nazikîyê û milûkîyê pe'nîya nigê xwe danenîye e'rdê, wê bi ç'e'vê xirab mêrê xweyî h'izkirî, kur' û qîza xwe binihêr'e, <sup>57</sup>usa jî hevalç'ûka xweye ku ji nav nig dertê û zar'êd xweye ku wê bîne. Çimkî ewê wan dizîva bixwe, ji h'ewcedarîya kêmasîya her tiştî, ji dest wê tengasîya ku dijminêd teyê li nava bajarêd teda bînine serê te.

<sup>58</sup>Heger h'emû xeberêd vê qanûnê ku vê k'itêbêda nivîsar in xwey nekî neqedînî û ji vî navê Xudan Xwedêyê xweyî

qedir û saw netirsî, <sup>59</sup>hingê Xudan wê bi belayêd ji h'iş-aqila dûr, belayêd qayîme ku xilazbûna wanê t'une be, nexweşîyêd xirabe ku p'akbûna wanê t'une be, te û zur'eta te xe. <sup>60</sup>Ji wan h'emû êş-êşûkêd Misirê, ji k'îjana tu ditirsîyayî wê vege'îne li ser te, ewê teva bizeliqin. <sup>61</sup>Usa jî her nexweşî û her bela ku vê k'itêba qanûnêda ne nivîsar in, Xudan wê wan bîne li serê te, h'eta qir'a te neyê. <sup>62</sup>Hûn weke steyrkêd e'zmên bêh'esab bûn, lê hûnê gelekî hindik bin, çimkî te gur'a Xudan Xwedêyê xwe nekir. <sup>63</sup>Çawa ku Xudan şa dibû gava wer'a qencî dikir û hûn li hev zêde dikirin, usa jî Xudan wê bi qir'kirin û wêrankirina we şa be. Hûnê ji wî e'rdê ku diçinê xwer'a bikine milk' bêne r'aqetandinê. <sup>64</sup>Xudan wê te li nava h'emû miletada ji serîkî dinê h'eta serê din bela ke. Li wir tê xwedêyêd başqeye dar û kevirr'a, k'îjanar'a ku ne te ne jî kal-bavêd te ew nas kirine qulix kî. <sup>65</sup>Lê li nava wan miletada jî tê r'ih'et nebî, cîkî hêsabûnê wê bona nigêd te t'une be. Xudan wê xema, ç'e'v me'rimbûnê\* û diltengîyê bide te. <sup>66</sup>E'mirê te wê li ser mûkî be, tê şev û r'oj xofêda bî û t'u car serederî ji e'mirê xwe derne xî. <sup>67</sup>Ji dest wê tirsî dilê te û dîtina ç'e'vêd te sibehê zû tê bêjî: «Xwezî r'o biçûya ava», êvarê jî bêjî: «Xwezî sibeh r'on bûya». <sup>68</sup>Xudanê wê r'êyêda te bi gemîya vege'îne Misirê, bona k'îjanê min gote te: «Tê îdî wê nebînî». Li wir hûnê xwe çawa xulam û carî bifiroşîne dijminêd xwe, lê yê bik'ir'e jî wê t'une be».

### Gotina Mûsaye sisîya

**29** Ev in xeberêd peymanê ku Xudan li e'rdê Mowabêdaf li Mûsa e'mir kir t'evî zar'êd Îsraêl girêde, xêncî peymana ku wî li H'orêbê\* t'evî wan girêda. <sup>2</sup>Mûsa gazî t'emamîya Îsraêlê kir û gote wan: «H'emû çi ku Xudan li welatê Misirêda li ber ç'e'vêd we anî serê Firewin û h'emû

\* 28:65 Îbranîf aha jî tê fe'mkirinê: «Bêç'arî».

\* 29:1 H'orêb navekî dinêyî Sînayê ye.

xulamêd wî, usa jî serê t'emamîya e'rdê wî, we dît, <sup>3</sup>awa gotî ew cêr'ibandin, nîşan û k'eremetêd mezine ku ç'e'vêd te dîtin. <sup>4</sup>Lê Xudan h'eta r'oja îro dilê fe'mkirinê, ç'e'vêd dîtinê û guhêd bihîstinê neda we. <sup>5</sup>Xudan çil salî ber'îyêda r'êberîya we kir: K'incêd li ser we kevin nebûn, solêd nigê weda jî nemaşîyan, <sup>6</sup>we ne nan xwar ne şerav ne jî ava cehê vexwar, ku hûn bizanibin ez Xudan Xwedêyê we me. <sup>7</sup>Hûn hatine vî cîyî û Sîxonê p'adşê H'eşbonê, Ogê p'adşê Başanê derk'etine miqabilî me şêr' û me ew alt' kirin. <sup>8</sup>Me e'rdê wan zeft kir û çawa milk' da r'ûbênîya, gadîya û nivê qebîla Mînaşe. <sup>9</sup>De xeberêd vê peymanê xweyî kin û wan biqedînin, wekî nava her tiştîda çi ku hûn bikin wer'a li hev bê.

<sup>10</sup>Hûn t'emam îro li ber Xudan Xwedêyê xwe sekinîne: Serwêrêd we, qebîlêd we, r'ûspîyêd we, sereskerêd we, her mêrê Îsraêl, <sup>11</sup>zarêd we, k'ulfetêd we û xerîbê li nava zomê teda, ji darbir'ê te h'eta avk'êşê te, <sup>12</sup>bona ku tu bik'evî peyman û ad-qîrarê t'evî Xudan Xwedêyê xwe, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te îro t'evî te girêdide. <sup>13</sup>Wekî îro te xwer'a bike millet, ew jî ter'a bibe Xwedê, çawa ku wî gote te û çawa ku wî kal-bavêd te Birahîm, Îshaq û Aqûbr'a sond xwar. <sup>14</sup>Ne t'enê t'evî we Xudan vê peyman û ad-qîrarê girêdide, <sup>15</sup>lê t'evî wan jî yêd ku îro li vir t'evî me li ber Xudan Xwedêyê me sekinîne û t'evî wan jî, yêd ku îro li vir t'evî me nînin. <sup>16</sup>Hûn zanin welatê Misirêda me çawa dijît û çawa em jî ji nava miletr'a derbaz bûn, <sup>17</sup>we r'obetîyêd wan û p'ûtêd wane dar, kevir, zîv û zêr' nava wan dîtin. <sup>18</sup>Nebe ku nava weda hebe mêr yan jin, mal yan qebîl dilê k'îjanî îro dûrî Xudan Xwedêyê me k'eve, wekî her'e xwedêyêd wan miletar'a qulix ke. Awa gotî nava weda vî cûr'eyî r'awê ku je'rê û zirîç'kê dide der t'unebe. <sup>19</sup>Gava yek guh bide xeberêd vê ad-qîrarê û xweda guman be, bêje: «Wekî li gora serh'işkîya xwe jî ez her'im ezê dîsa sax-silamet bim». Bi vî cûr'eyî, yê t'êr wê t'evî yê bir'çî unda be. <sup>20</sup>Xudan wê t'u car nebaxşîne

wî, çimkî hingê hêrs û k'în-boxa Xudan wê r'abe li ser wî merivî, h'emû nifir'ê vê k'itêbêda nivîsî wê li wî bin û Xudan wê navê wî ji bin p'er'ê e'zmênda r'esît ke. <sup>21</sup>Xudan wê wî ji h'emû qebilêd Îsraêl bona bela başqe ke, anegorî h'emû nifir'êd vê peymanê ku vê k'itêba qanûnêda nivîsar in. <sup>22</sup>Û nisilê peyr'a, awa gotî zar'êd we ku wê pey wer'a bibin, usa jî xerîbê ku wê ji welatê dûr bê, wê wêranbûn û nexweşîyêd vî e'rdî bi k'îjana Xudan lêxist bibînin, bêjin: <sup>23</sup>«T'emamîya e'rd bi k'irk'ûtî û xwê şewitîye, ne tê çandinê ne jî şîn dibe, li ser wê t'u şînayî şîn nabe, mîna undakirina Sodom, Gomora, Adma û Siboyîmê, k'îjan ku Xudan bi hêrs û k'în-boxa xwe wêran kir». <sup>24</sup>H'emû millet wê bêjin: «Çima Xudan ha anî serê vî e'rdî? Me'na vê hêrsa mezin çîye?» <sup>25</sup>Û wê bêjin: «Bona ku wan peymana Xudan Xwedêyê kal-bavêd xwe hiştin, k'îjan ku wî t'evî wan girêda, gava ew ji e'rdê Misirê derxistin. <sup>26</sup>Ew çûn û xwedêyêd başqer'a qulix kirin, ber wan ta bûn, xwedêyêd ku ne wan nas dikir ne jî Xudan wanr'a k'ifş kir. <sup>27</sup>Bi vî awayî hêrsa Xudan li ser wî e'rdî r'abû ku h'emû nifir'êd vê k'itêbêda nivîsî bîne li serê wî. <sup>28</sup>Xudan bi hêrs, k'în-box û xezeba mezin ew ji welatê wan r'awva derxist, ew avîtine welatê başqe, mîna r'oja îroyîn».

<sup>29</sup>Tiştêd veşartî, yêd Xudan Xwedêyê me ne, lê yêd e'yan bona me û zar'êd me ne h'eta-h'etayê, wekî h'emû xeberêd vê qanûnê biqedînin.

### Kirina bona paşda veger'andin û bimbarekîyê

**30** Gava her tişt, dua û nifir'êd ku min danîbûne li ber te, bêne serê te, hingê li ser wan, nava h'emû miletada, k'îjan ku Xudan Xwedêyê te tu nava wan da belakirî, dîsa bifikire, <sup>2</sup>heger tu ber bi Xudan Xwedêyê xwe veger'î, tu û zar'êd xweva bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe, guh bidî dengê wî, her tişt çawa ku ez îro li te e'mir dikim, <sup>3</sup>hingê Xudan Xwedêyê te wê çerxa te r'ast ke û r'e'mê li te bike, wê dîsa te ji nava h'emû mileta, nava

k'îjana Xudan Xwedêyê te tu bela kirî, wê te t'opî ser hev ke. <sup>4</sup>Wekî tu h'eta ber p'erê e'zman jî ajotî bî, ji wir jî Xudan Xwedêyê te wê te t'opî ser hev ke, te hilde <sup>5</sup>û Xudan Xwedêyê te wê te bibe e'rdê ku kal-bavêd te war bibûn û wê xwer'a bikî milk'. Wê çerxa te r'ast ke û te ji kal-bavêd te ze'ftir li hev zêde ke. <sup>6</sup>Xudan Xwedêyê te wê dilê te û dilê zur'eta te biguhêze\*, wekî bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikî bona xatirê e'mirê xwe. <sup>7</sup>Xudan Xwedêyê te wê h'emû van nifir'a vege'rine li ser dijmin û neyarêd te, yêd ku pey te k'etibûn. <sup>8</sup>Tê jî dîsa guh bidî dengê Xudan û h'emû e'mirêd ku ez îro li te e'mir dikim biqedînî. <sup>9</sup>Xudan Xwedêyê te wê te her tiştîda xinê ke: Bi her şixulê destêd te, berê zikê te, berê h'eywanê te û berê e'rdê te. Çimkî Xudan dîsa wê şa be ku qencîyê ter'a bike, çawa ku ew kal-bavêd ter'a şa dibû, <sup>10</sup>gava tu guh bidî dengê Xudan Xwedêyê xwe, e'mir û qeyde-qanûnêd wîye vê k'itêba qanûnêda nivîsî xwey kî, bi t'emamîya dilê xwe û bi t'emamîya nefsa xwe vege'ri berbi Xudan Xwedêyê xwe.

<sup>11</sup>Çimkî ev e'mirê ku ez îro li te e'mir dikim, ne dûrî te ye ne jî ew çetin e. <sup>12</sup>Ew ne li e'zmana ye, wekî bê gotinê: «K'ê wê bona me r'abe e'zmên, wê mer'a bîne û em wê bibihên, hingê meyê ew biqedanda?» <sup>13</sup>Ne jî ew wî alîyê be'rê ye, wekî bê gotinê: «K'ê wê bona me her'e wî alîyê be'rê, wê mer'a bîne û em wê bibihên, hingê meyê ew biqedanda?» <sup>14</sup>Lê ew xeber li cem teye, li ser zarê te û dilê teda ye, ku wê xweyî kî.

<sup>15</sup>Binihêr'e, ez îro e'mir û mirinê, xêr-xweşî û xirabîyê datînim li ber te. <sup>16</sup>Ez îro li te e'mir dikim ku Xudan Xwedêyê xwe h'iz bikî, r'îyêd wîda her'î, e'mirêd wî, qeyde-qanûnêd wî û qirarêd wî xweyî kî. Wekî tu bijîyî û li hev zêde bî û

---

\* <sup>30:6</sup> Îbranî xeber bi xeber «Dilê te û dilê zur'eta te sinet ke». Sinetkirin nîşana sondê nava Xwedê û Îsraêl e. Fikira vê r'êzê ev e ku «Xudan wê bike ku cime'ta wî gur'a wî bike».

Xudan Xwedêyê te wê te bimbarek ke li ser e'rdê ku tu diçûyî xwer'a bikî milk'. <sup>17</sup>Lê heger dilê te paşda vege'ê û guh nedî, ji r'ê bêyî şih'itandinê, li ber xwedêyêd başqe ta bî wanr'a qulix kî, <sup>18</sup>ez îro e'lamî we dikim ku hûnê e'seyî unda bin, hûnê dirêj li ser wî e'rdî nejin, bona k'îjanî tu Êrdunêr'a derbaz dibî ku bik'evî wir û xwer'a bikî milk'. <sup>19</sup>Ez îro gazî e'rd û e'zmên dikim çawa şe'dêd miqabilî te, ez e'mir û mirinê datînimê ber te, dua û nifir'ê. De e'mir bibijêre wekî tu zur'eta xweva bijîyî, <sup>20</sup>Xudan Xwedêyê xwe h'iz bike, gur'a wî bike û nêzîkî wî be. Çimkî ew e'mirê te ye û dirêjaya r'ojêd mayîna te ye li ser e'rdê ku Xudan kal-bavêd te: Birahîmr'a, Îshaqr'a û Aqûbr'a sond xwar bide wan».

### Kirinêd Mûsaye xilazîyê

#### Yêşû cîyê Mûsa digire

**31** Mûsa çû û ev xeberana t'emamîya Îsraêlêva e'yan kirin <sup>2</sup>û gote wan: «Ez îdî sedbîst salî me, nikarim her'im û bêm, Xwedê jî gote min: «Tu ç'emê Êrdunêr'a derbaz nabî». <sup>3</sup>Xudan Xwedêyê te wê xwexa pêşîya teva her'e, ewê van mileta ji ber te unda ke û tê cîyê wan xwer'a bikî milk'. Yêşûyê pêşîya teva her'e, çawa ku Xudan gotibû. <sup>4</sup>Xudanê usa bîna serê wan, çawa ku anî serê p'adşêd emorîya<sup>f</sup>, Sîxon û Og, usa jî e'rdêd wan, qir'a k'îjana ewî anî. <sup>5</sup>Xudanê wan bide destêd we û hûn anegorî wan h'emû e'mirêd ku min li we e'mir kirin bînine serê wan. <sup>6</sup>Qewat û e'gît bin, ji wan netirsîn û nebizdin, çimkî Xudan Xwedêyê te xwexa t'evî te tê, ew dûrî te nak'evê û te ber'nade».

<sup>7</sup>Mûsa gazî Yêşû kir û li ber ç'e'vê t'emamîya Îsraêlê gote wî: «Qewat û e'gît be, çimkî tê t'evî vî miletî bik'evî e'rdê ku Xudan kal-bavêd wanr'a sond xwar bide wan û tê wî e'rdî wanr'a bikî milk'. <sup>8</sup>Lê Xudan xwexa pêşîya teva diçe û wê t'evî te be, ewê dûrî te nak'evê û te ber'nede, ber xwe nek'evê û netirse».

### Xandina Qanûnê

<sup>9</sup>Mûsa ev qanûn nivîsî û da k'ahînêd<sup>f</sup> zar'êd Lêwî, yêd ku Sindoqaf Peymana Xudan dibirin û h'emû r'ûspîyêd Îsraêl. <sup>10</sup>Mûsa li wan e'mir kir û got: «Her k'utasiya sala h'efta li sala baxşandinê, li Cejina<sup>f</sup> H'olikçêkirinêda, <sup>11</sup>k'engê t'emamiya Îsraêl bê û li ber Xudan Xwedêyê te bisekine, li wî cîyê ku ew bibijêre, t'emamiya Îsraêl'r'a vê qanûnê bi dengê bilind bixûne. <sup>12</sup>Cime'tê, jîna, mêra, zar'a û xerîbêd nava bajarêd xweda, t'opî ser hev ke, ku ew bibihên û hîn bin ji Xudan Xwedêyê we bitirsin û h'emû xeberêd vê qanûnê bikin ku biqedînin. <sup>13</sup>Zar'êd wan yêd ku hê nizanin, wê bibihên û hîn bin ji Xudan Xwedêyê we bitirsin, li nava h'emû r'ojêd e'mirê we li ser e'rdê ku hûn Êrdunêr'a derbaz dibin xwer'a bikine milk'».

### Îsraêl wê Xwedê bihêle

<sup>14</sup>Xudan gote Mûsa: «Awa r'ojêd teye mirinê nêzîk in, gazî Yêşû ke û li Konê<sup>f</sup> Civînêda bisekinin, ezê e'mira bidime wî». Mûsa û Yêşû çûn û li Konê Civînêda sekinîn. <sup>15</sup>Xudan li stûna e'wrda konda wanva xuya bû û stûna e'wr li ber derê kon sekinî.

<sup>16</sup>Û Xudan gote Mûsa: «Awa tu diçî bigihîjî kal-bavêd xwe. Ev miletê r'abe li wî cîyê ku diçînê bêe'silîyê bike, awa gotî pey wan xwedêyêd başqeye wî e'rdî her'e. Ewê min bihêle û peymanaf ku min t'evî wan girêda bit'er'ibîne. <sup>17</sup>Wê r'ojê hêrsa minê li ser wî r'abe, ezê wan bihêlim û r'ûyê xwe ji wan veşêrim. K'oka wanê bê û gelek tengasî û zelûlî r'astî wan bê. Wan r'oja ewê bêje: «Gelo ev bela ku hatine serê min ne bona wê yekê ye ku Xudanê min t'evî min nîne?» <sup>18</sup>Lê ezê wê r'ojê r'ûyê xwe hê veşêrim bona her xirabîya ku wî kir, gava berê xwe da xwedêyêd başqe. <sup>19</sup>Niha xwer'a vê stiranê binivîsin û zar'êd Îsraêl hînî wê ke, wê bike ser zar-zimanê wan, wekî eva stirana minr'a bibe şe'dê

miqabilî zar'êd Îsraêl. <sup>20</sup>Wextê ez wî bibime e'rdê ku şîr û hingiv jê dik'işe, çawa ku min kal-bavêd wanr'a sond xwar, ewê bixwe, t'êr be, k'ok be û wê berê xwe bide xwedêyêd başqe, ewê wanr'a qulix ke, min t'exsîr ke û peymana min bit'er'ibîne <sup>21</sup>wê bibe gava gelek tengasî û zelûlî bibîne, ev stirana wê bibe şe'dê miqabilî wî, çimkî eva ji bîra zur'eta wî wê derneyê. Ez îdî îro zanim t'ivdîra wan çîye, hê berî wê yekê ku min ew birine e'rdê ku min soz da». <sup>22</sup>Mûsa hema wê r'ojê ev stiran nivîsî û zar'êd Îsraêl hînî wê kirin. <sup>23</sup>Xwedê li Yêşûyê kur'ê Nûn e'mir kir û got: «Qewat û e'gît be, çimkî tuyê zar'êd Îsraêl bibî e'rdê ku min wanr'a sond xwar û ezê t'evî te bim».

<sup>24</sup>Gava Mûsa h'emû xeberêd vê qanûnê k'itêbêda nivîsî û xilaz kirin, <sup>25</sup>Mûsa li lêwîyêd ku Sindoqa Peymana Xudan dibirin e'mir kir û got: <sup>26</sup>«Vê k'itêba qanûnê hildin û day-nine k'êlekeke Sindoqa Peymana Xudan Xwedêyê xwe û bira ew li wir bibe şe'dê miqabilî te. <sup>27</sup>Çimkî ez serhildan û serh'işkîya te zanim, h'eta r'oja îro ku ez nava weda dijîm hûn li ber Xudan serh'işk bûne, hê çiqas zêde pey mirina minr'a. <sup>28</sup>H'emû r'ûspîyêd qebilêd xwe û serwêrêd xwe bicivînine li cem min, ezê wanr'a van xebera bêjim û gazî e'rd û e'zmên bikim çawa şe'dê miqabilî wan. <sup>29</sup>Çimkî ez zanim ku pey mirina minr'a hûnê e'se bih'er'imin û bişih'itin ji wê r'îya ku min li we e'mir kir û peyr'a wê bela bêne pêşîya we, bona xirabîya ku hûnê li ber ç'e'vê Xudan bikin, bi kirêd destêd xwe hêrsa wî r'akin».

<sup>30</sup>Mûsa xeberêd vê stiranê li ber t'emamîya civîna Îsraêl h'eta xilazîyê got:

### Stirana Mûsa

**32** «Guh bidine min e'zmanno ezê xeber dim,  
bira e'rd gotina zarê min bibihê.

<sup>2</sup> Bira şîreta min mîna baranê bibare,

- mîna qir'avîyê gotina min wê dayne,  
çawa barana hûr li ser şînayîyê  
û çawa barana gur' li ser gîhê.
- <sup>3</sup> Çimkî ezê navê Xudan<sup>f</sup> bikim dengî.  
Pesina bidine Xudanê me!
- <sup>4</sup> Ew Qeya ye, kirina wî k'amil e,  
çimkî h'emû r'îyêd wî heqî ne.  
Xudan amin e, neheqî cem wî t'uneye,  
ew heq e û li ser heqîyê ye.
- <sup>5</sup> Lê we miqabilî wî gune kir,  
hûn ji dest qusûrêd xwe îdî ne zar'ê wî ne,  
nisilê neheq û xalifî.
- <sup>6</sup> Ev e ku hûn li Xudan vediger'înine,  
miletê bê fe'mî bê h'iş?  
Ew nîne bavê te ku tu qazinc kirî?  
Ewî jî tu çêkirî û t'estîq kirî!
- <sup>7</sup> Bîr bîne r'ojêd berê,  
bifikire li ser salêd h'emû r'ik'inyata.  
Bipirse ji bavê xwe û ewê ter'a gilî ke,  
ji kalêd xwe û ewê ter'a bêjin.
- <sup>8</sup> Gava Yê Herî Jorin milk' da mileta  
û zar'êd însên cude kir,  
ewî sînorêd mileta danîn,  
anegorî r'eqemêd zar'êd Xwedê\*.
- <sup>9</sup> Lê p'ara Xudan cime'ta wî ye,  
Aqûb milk'ê warê wî ye.
- <sup>10</sup> Ewî ew li ber'îyêda dît,  
li çol û besta guje-guj,  
ewî destê xwe dabû li ber wî û ew xweyî fikir,  
mîna r'onayîya ç'e'vêd xwe miqatî wî bû.

---

\* 32:8 «Zar'êd Xwedê» p'ir'anîya cara tê fe'mkirinê çawa «Heyînêd Xwedêye e'zmanî» yan «Milyak'et<sup>f</sup>». Hinek têk'stêd îbranîda nivîsar e «Zar'êd Îsraêl» û hinekada jî «Zar'êd Xwedê».

- 11 Çawa teyrê sîmir' xweyâtîyê hêlûna xwe dike,  
li ser cûcûkêd xwer'a difir'e,  
p'er'ê xwe vedike wan hildide  
li ser baskêd xwe dibe.
- 12 Xudan t'enê r'êberîya wî dikir,  
xwedêkî başqe t'evî Xudan t'unebû.
- 13 Xudan ew danî li ser bilindcîyêd e'rdê,  
ewî berê zevîya dixwarin.  
Xudan ew bi hingiv ji qeyayê  
bi bizir ji qeya h'işk,
- 14 bi r'ûnê dêwêr û şîrê pêz da mêjandin.  
Donê berxa, berana,  
gayêd Başanê, bizina,  
genimê lapî r'ind da wî.  
Te xûna tirîya, şerav vexwar.
- 15 Yêşûrûn\* bez girt û da çifta.  
Te bez girt, k'ok bûyî û ji hev derk'etî.  
Xwedêyê tu çêkirî hişt  
û Qeyayê xilazbûna xwe t'exsîr kir.
- 16 Bi xwedêyêd başqe hêlan dane k'umr'eşîya Xudan  
û bi k'irêtîya hêrsa wî r'akirin.
- 17 Qurban dikirin cinar'a ne ku Xwedêr'a,  
xwedêyêd ku nas nedikirin,  
yêd nû pêşda hatî,  
ji k'îjana ku kal-bavêd te xof nedikirin.
- 18 Te Qeyayê tu welidandî hişt,  
te Xwedêyê tu pêşda anîyî bîr kir.
- 19 Xudan dît û t'exsîr kir  
bona ku qîz û kur'êd Xudan ew hêrs xistin.
- 20 Û got: «Ezê r'ûyê xwe ji wan veşêrim,  
xilazîya wan binihêr'im,

---

\* 32:15 «Yêşûrûn» ew navekî dinê ye bona milletê Îsraêl.

- çimkî ew nisilekî xalifî ye,  
zar'êd bê amin in.
- <sup>21</sup> Wana bi ne xwedêya hêlan dane k'umr'eşîya min,  
bi tiştêd xweye p'ûç' hêrsa min r'akirin.  
Ezê jî bi ne mileta hêlana bidime wan,  
bi miletekî bê fe'm ezê hêrsa k'umr'eşîya wan  
r'akim.
- <sup>22</sup> Çimkî alava hêrsa min pê k'et,  
ewê h'eta k'ûrayîya Dîyarê Mirîya bişewitîne,  
dinyayê û berêd wê wê h'ûfî xwe ke  
û alav-agir wê h'îmê ç'îya k'eve
- <sup>23</sup> Ezê bela li ser wan qûç' kim,  
tîrêd xwe li ser wan r'et kim.
- <sup>24</sup> Bir'çîbûnê wan bimaşîne, t'ayê wan bixwe  
û usa jî nexweşîya h'ale xirab.  
Qîlê r'e'wira ezê bişînime li ser wan  
û usa jî je'ra şûlikîyêd axêda.
- <sup>25</sup> Derva şûrê wan bibir'e  
hindur'da jî xof,  
qîz û kur'a  
şîrxur û kalê extyar.
- <sup>26</sup> Min got: «Ezê qir'a wan bînim,  
ji nava merivada bîranîna wan r'esît kim»,
- <sup>27</sup> Lê ez ji qerfê dijmin tirsîyam,  
ku dijmin nefikirin  
û nebêjin: «Destêd me ew alt' kirin,  
ne ku Xudan ev h'emû tişt kir».
- <sup>28</sup> Çimkî Îsraêl miletekî çelqayî ye,  
fe'mê wî t'uneye.
- <sup>29</sup> Heger ew serwaxt bûna ev yek wê tê derxistana,  
wanê fe'm bikira çî wê bê serê wana.
- <sup>30</sup> Dijminek wê çawa bida pey h'ezara  
û duduyê berî dehe h'ezarî din,  
heger Qeyayê Îsraêl ew nefirota,

- heger Xudan ew neda destêd dijminêd wan.
- <sup>31</sup> Çimkî qeyayê wan ne mîna Qeyayê me ye,  
dijminêd me xwexa wê yekê fe'm dikin.
- <sup>32</sup> Çimkî dara wane tirîyê ji ya Sodomê ye,  
ji baxçê Gomorayê ye.  
Tirîyêd wan tirîyê je'rdadayî ne  
gûşîyêd wan te'l in.
- <sup>33</sup> Şerava wan je'ra me'ra ye,  
je'ra zulme tîreme'ra ye.
- <sup>34</sup> T'ivdîra min li cem min veşartî,  
xizna minda morkirî nîne?
- <sup>35</sup> H'eyfhildan ya min e, ezê hilînim,  
gava nigê wan bilik'ume,  
çimkî r'oja wan e qeda nêzîk e  
û zûtirekê wê li ser wanda bigire.
- <sup>36</sup> Xudan wê heqîyê li cime'ta xwe bike,  
û r'e'mê li xulamêd xwe bike,  
gava ew bibîne ku destê wan sist bûye,  
ne girtî mane ne jî aza mane.
- <sup>37</sup> Xudanê bêje: «K'anêne xwedêyêd wan,  
qeyayê ku wan gumana xwe dabû ser?»
- <sup>38</sup> Yêd ku bezê qurbanêd wan dixwarin,  
şerava dîyarîyêd wan vedixwarin?  
Bira ew r'abin û alî wan bikin,  
bira bona we bibine mert'al».
- <sup>39</sup> De niha binihêr'in wekî ez, EZ IM\*,  
t'une xwedê pêştirî Min.  
Ez dikujim, ez jî sax dikim,  
min lêda ezê jî qenc kim,  
t'u kes ji destê min xilaz nake.
- <sup>40</sup> Awa ez destê xwe ber bi e'zmên bilind dikim

---

\* 32:39 Binihêr'e Derk'etin 3:13-15 û şirovekirina r'êza 15-a.

- û dibêjim: «Çawa ku ez h'eta-h'etayê heme  
41 usa jî gava ez şûrê xweyî biriqî tûj kim  
destê minê dest bi dîwanê bike,  
hingê ezê h'eyfê ji dijminêd xwe hildim,  
û yêd dijenine min weke e'melêd wan bidime wan.  
42 Ezê tîrêd xwe bi xûnê serxweş kim  
û şûrê min wê goşt bixwe,  
bi xûna kuştîya û girtîya,  
bi serêd serwêrêd dijmin».\*  
43 E'zmanno şa bin t'evî wî!  
H'emû milyak'etf ber Xudan ta bin.\*  
Çimkî ewê h'eyfa xûna xulamêd xwe hilde,  
ewê h'eyfê ji dijminêd xwe hilde,  
ewê bona e'rdê xwe û miletê xwe gunek'ewandinê  
bike».

44 Mûsa t'evî Yêşûyê kur'ê Nûn hat û h'emû xeberêd  
vê stiranê bi dengê bilind gote cime'tê. 45 Gava Mûsa  
h'emû ev xeberêd ku gote t'emamîya Îsraêl ser hevda  
anîn, 46 ewî gote wan: «Ez îro h'emû van xebera e'lamî  
we dikim, wan bikine dilê xwe. Li zar'êd xwe e'mir  
bikin wekî h'emû xeberêd vê qanûnê r'ind xwey kin  
biqedînin. 47 Çimkî ev ne xebera badîhewa ye bona we,  
lê ew e'mirê we ye. Bi wê xeberê e'mirê weyê dirêj be  
li ser wî e'rdî ku hûn Êrdunêr'a derbaz dibinê xwer'a  
bikine milk'».

48 Xût wê r'oje Xudan Mûsar'a xeber da û got: 49 «Hilk'işe  
li ser bilindcîyêd Abarîmê li ser ç'îyayê Nebo k'îjan  
ku welatê Mowabda ye, pêşberî Erîhayê. Ê dîna xwe

---

\* 32:42 «Bi serêd serwêrêd dijmin» îbranî xeber bi xeber nivîsar e  
«serê dijminê p'or' dirêj». Wî we'deyî mêrê ku xebata wî eskerî  
bû, çaxê şêr' wan p'or'ê xwe ne dibir'î.

\* 32:43 Welger'andina yûnanîye kevinda ev jî heyê «Gelî mileta,  
şa bin t'evî cime'ta wî!»

bide welatê Kenanêf, k'îjanî ku ez didime zar'êd Îsraêl lê war bin. <sup>50</sup>Û li ser wî ç'îyayê ku tê hilk'işî bimi-re, her'e t'evî kal-bavêd xwe be, çawa Harûnê birê te li ser ç'îyayê Hor mir û çû t'evî kal-bavêd xwe bû. <sup>51</sup>Çimkî we her duya li nava zar'êd Îsraêl li ber avêd Mêribah-Qadêşê\*, ber'îya Sînda guhdarîya min nekir û nava zar'êd Îsraêlda pîrozîya min neda k'ifşê. <sup>52</sup>Tê ewî e'rdî ber xwe bibînî lê nak'evî wir, ew e'rdê ku ez didime zar'êd Îsraêl».

### Mûsa dua Îsraêl dike

**33** Ev e ew dua bi k'îjanî Mûsayê merivê Xwedê berî mirina xwe dua li zar'êd Îsraêl kir. <sup>2</sup>Û got:

«Xudan ji Sînayê hat,  
ji Sêhîrê wanva şewq da,  
ji ç'îyayê Paran wanva xuya bû  
ew t'evî bêh'esab pîroza hat,  
ji destê wîyî r'astê agirê qanûnê bona wan alav da.\*

<sup>3</sup> R'astî Xwedê mileta h'iz dike,  
h'emû pîrozêd wî destêd teda ne,  
wan xwe avîtime li p'îyêd te  
û wê guh bidine gotinêd te.

<sup>4</sup> Mûsa qanûn li me e'mir kir,  
war bona cime'ta Aqûb.

<sup>5</sup> Xudan bû p'adşê Yêşûrûnê\*  
gava serwêrêd cime'tê  
t'evî qebîlêd Îsraêl civîya bûn.

<sup>6</sup> Bira bijî R'ûbên û nemire,  
lê bira h'esabê wî kê m be».

---

\* 32:51 Binihêr'e Jimar 20:11-13.

\* 33:2 Fe'mîna vê r'êzê îbranîda ne safî ye.

\* 33:5 «Yêşûrûn» ew navekî dinê ye bona milletê Îsraêl.

<sup>7</sup>Ev jî bona Cihûda got:

«Bibihê Xudan dengê Cihûda  
û wî bîne li cem cime'ta wî,  
bira bi destêd xwe şer'ê xwe bike  
tu jî bibî alîk'arê wî ji dijminêd wî».

<sup>8</sup>Bona Lêwî got:

«Ûrîm û Tûmîmê\* te  
li cem merivê teyî xwedêxof be,  
yê ku te li Massahê cêr'iband,  
t'evî k'îjanî ber avêd Mêrîbahê k'etî h'ucetê.

<sup>9</sup>Yê ku bona dê û bavê xwe dibêje:

«Min xemk'êşîya wan nekîr»,  
birayêd xwe qebûl nekîr  
û zar'êd xwe nas ne kir\*,  
çimkî ew gotina te diqedînin  
û peymanana te xweyî dîkin.

<sup>10</sup>Ew Aqûb hînî qirarêd te dîkin,

Îsraêl jî hînkirina te,  
bixûrê<sup>f</sup> datînin li ber te,  
qurbanê t'evayîşewatê jî li ser gorîgehaf te.

<sup>11</sup>Dua li qewata wî bike Xudan,

kirêd destê wî qebûl ke.  
Piştî dijminêd wî qat ke  
usa ku yêd dijenine wî r'anebin».

<sup>12</sup>Bona Binyamîn got:

«H'izkirîyê Xwedê wê bê qezî bijî,  
Yê Herî-Zor t'emamîya r'ojê xweyîtîya wî dike.  
Ew li nava girêd wî dijî».

---

\* 33:8 Ûrîm û Tûmîm tê fe'm kirinê çawa «R'onayî û K'amilî». Pê vana serekk'ahîn<sup>f</sup> li qirara Xwedê dih'esîya.

\* 33:9 Binihêr'e Derk'etin 32:35-39.

<sup>13</sup>Bona Ûsiv got:

«Duayê Xudan li e'rdê wî be,  
bi qir'avîya qence ji e'zmên,  
bi ava bêbinîyayêye jêr her'ikî,

<sup>14</sup>bi dayîna berêd qence ji te'vê,  
bi dayîna deremetêd qence ji meha.

<sup>15</sup>Ji tiştêd bijartîye ç'îyayêd kevin  
û tiştêd qence girêd h'eta-h'etayê.

<sup>16</sup>Bi dayîna qence e'rdê t'ijî,  
bi k'erema yê ku nava k'ola stirûyê bû\*.  
Bira ew bêne serê Ûsiv,  
li ser e'nîya bijartîyê li nava birada.

<sup>17</sup>Mezinayîya wî mîna nixurîyê box,  
stirûyêd wî mîna stirûyêd gayê beyanî,  
yek dehe h'ezarêd Efrayîm e,  
yek jî h'ezarêd Minaşe ye,  
bi wan ewê mileta hevr'a h'eta serê dinê bide'fîne».

<sup>18</sup>Bona Zebûlon got:

«Şa be Zebûlon, derk'etina xwer'a,  
Îsaxar jî li nava çadirêd xwe da.

<sup>19</sup>Ewê mileta gazî li ser ç'îyê bikin,  
li wir ewê gorîyêd r'ast bidin.  
Çimkî ji dewlemendîya be'ra ewê bixwin  
û xiznêd li nava qûmêda veşartî».

<sup>20</sup>Bona Gad got:

«Bimbarek e yê ku sînorê Gad fire dike,  
Gadê çawa şêr r'ih'et be,  
mil û t'epa sêrî didir'îne.

<sup>21</sup>Ewî tiştê herî qenc xwer'a bijart,

---

\* 33:16 Binihêr'e Derk'etin 3:2-3.

çimkî wîr'a p'ara serwêr hate k'ifşkirinê,  
ew t'evî serwêrêd millet hat  
r'astîya Xudan û dîwanêd wî  
t'evî Îsraêl bik'ar anî».

<sup>22</sup> Bona Dan got:

«Dan cewrikê şêra ye  
ku ji Başanê banzdide».

<sup>23</sup> Bona Neftelî got:

«Neftelî xêrxwezîyêva dagirtî ye,  
bimbarekîya Xudanva t'ijî ye,  
r'ohilat\* û başûrê war be».

<sup>24</sup> Bona Aşêr got:

«Ji nava kur'ada Aşêr herî bimbarek e,  
bira h'izkirîyê birayêd xwe be  
û niğê xwe r'ûnda ke.

<sup>25</sup> Zer'zêd derîyêd te h'esin û sifir in,  
û qewata te weke r'ojêd te be».

<sup>26</sup> «Mîna Xwedê Yêşûrûn t'uneye,  
bona alîk'arîya te li e'zmên sîyar dibe  
nava nûr-r'ûmeta xwe li ser e'wr.

<sup>27</sup> Xwedêyê h'eta-h'etayê kela ye,  
milêd wîye h'eta-h'etayê alîk'ar in,  
ewî dijminêd te ji ber te r'aqetandin,  
got: «Qir' ke!»

<sup>28</sup> Îsraêl bêqezî, başqe dijî,  
kanîya Aqûb wê e'rdê genim û şeravêda be,  
ji e'zmanêd wî qir'avî tê xarê.

---

\* 33:23 «R'ohilat» li vir usa jî tê fe'mkirinê çawa «Gol».

29 Xwezî li te Îsraêl!  
 K'ê ye mîna te?  
 Miletê bi destê Xudan xilazbûyî,  
 mert'al, alîk'ar  
 û şûrê nûr-r'ûmeta te ew e,  
 dijminêd te wê li ber te ta bin,  
 tuyê p'êyî li sergirkê milêd wan bikî».

### Mirina Mûsa û serwêriya Yêşû

**34** Mûsa ji deştêd Mowabê hevraz çû ç'îyayê Nebo, li ser serê Pîsgayê ku pêşberî Erîhayê ye. Xudan h'emû e'rdê Gîle'dê h'eta Dan, 2 t'emamîya Neftelîyê, e'rdê Efrayîm û Minaşe, t'emamîya e'rdê Cihûda h'eta Be'ra Navberê\*, 3 Neceff, deşta newala Erîhayê, bajarê darêd xurma h'eta Soharê nîşanî wî da. 4 Xudan gote Mûsa: «Ev e e'rdê bona k'îjanî min Birahîmr'a, Îshaqr'a û Aqûbr'a sond xwar got: «Ezê wî bidime zur'eta te». Min hişt wekî tu bi ç'e'vêd xwe bibînî, lê tu derbazî wir nabî». 5 Li wir e'rdê Mowabda, Mûsayê xulamê Xwedê mir, anegorî xebera Xudan. 6 Xudan li newala e'rdê Mowabda pêşberî Bêt'-P'ihorê ew defin kir û t'u kes h'eta r'oja îro cîyê definkirina wî nizane. 7 E'mirê Mûsa sedbîst salî bû gava ew mir, ne îşiqa ç'e'vê wî sist bû, ne jî sih'et-qewata wî. 8 Zar'êd Îsraêlî sî r'ojî li deşta Mowabda şîna Mûsa kirin. R'ojêd girî û şîna Mûsa xilaz bûn. 9 Yêşûyê kurê Nûn bi r'uhê serwaxtîyêva hate dagirtinê, çimkî Mûsa destêd xwe danîbû li ser wî, zar'êd Îsraêl gur'a wî dikirin û usa dikirin çawa ku Xudan li Mûsa e'mir kiribû. 10 Îdî p'êxemberekî<sup>f</sup> mîna Mûsa li nava Îsraêlda t'unekû, yê ku Xudan r'û bi r'û nas dikir, 11 bi h'emû nîşan û k'eremeta, yêd ku Xudan ew şand ku li e'rdê

\* 34:2 Têk'sta îbranîda nivîsar e «Be'ra K'utasîyê», ew be'sa Be'ra Navberê dike awa gotî Be'ra Sipî.

Misirêda li ser Firewin, usa jî li ser h'emû xulamêd wî û t'emamîya welatê wî bike <sup>12</sup>û Mûsa bi t'emamîya gewata destê xwe her kirinêd saw li ber ç'e'vêd t'emamîya Îsraêl kir.

# Ferhengok

**agat** – kevirêd qîmete r'eng-r'engî ne, p'ir'anîya wan sipî û k'umeyît' in.

**amalêkî** – miletek bû ku berî zeftkirina Îsraêl li Kenanêda dima. Evana gele cara neyartîya Îsraêl dikirin (binihêr'e Derk'etin 17:8-16; Qanûna Ducarî 25:17-19).

**amîn** – ji zimanê îbranî ye, ku me'na wê ev e: «R'ast e», «Belê», «Bira usa be», «R'ast bê xêlif», «Qayl im». Ew hingê tê gotinê gava yek gotinekê dibêje yan dua dike, yekî din gotina wî dixwaze mak ke, qaylbûna xwe bi gotina «amîn» nîşan dike.

**amîtîst** – kevirêkî qîmet bû, p'ir'anîya wan sorî gevez û sût bûn.

**amonî** – anegorî Destpêbûn 19:38, zur'eta Lûte ji qîza wîye biç'ûk bû. Ew t'evî Filistînîya neyartîya Îsraêl dikirin. Ew alîyê R'ohilata Êrdinê diman, navê p'ayt'extê xwe danîn Amman. H'eta niha jî navê p'ayt'extê Êrdinê Amman e.

**aramî** – aramî binelîyêd Aramê bûn. We'dê bave'şîrêd Îsraêl alîyê bakur- r'ohilata ç'emê Êrdinêr'a digotin Aram, awa gotî Sûrya û usa jî bak'ura Mesopotamyayê, ku tê gotin Paddan-Aram (Destpêbûn 25:20; 28:5).

**berê deremeta pêşin** – wextê Peymana Kevinda çi pêşîyê ber k'êlendîyê bik'eta, yan heger berê r'ezê pêşin bûya, yan nixurîyê h'eywanêd malê, yan jî nixurîyê nêrînî her maleke Îsraêlê çawa «berê deremeta pêşin» dihate h'esabê û Xwedêr'a dihate dayînê. Eva nîşanek bû ku h'emû jî p'ara Xwedê ne (Derk'etin 13:14-15; 34:26; Qanûna K'ahîntîyê 23:17; Jimar 18:12).

**bidolax** – r'ûnê darêyî zer e û gelekî bînxweş e. Bi wî ava zim-zimkirinê çêdikirin (Destpêbûn 2:12; Jimar 11:7).

**bizina k'ûvî** – cur'ekî bizinaye ku ç'ola demîne, h'elal tê h'esabê (binihêr'e Qanûna Ducarî 12:15; 14:5).

**bixûr** – şîrêza darê ye. Ew ji dara tê hildanê û h'işkkinê. Gava tê şewitandinê, bîneke gelekî xweş jê tê. Dema Peymana Kevinda p'aristgehêda ser gorîgeha bixûrê ew Xwedêr'a dihate şewitandinê (Derk'etin 30).

Cûr'ekî dareke bixûrê E'rebistanêda jî hebû, ku gelekî qîmet bû.

**biharet** – pûng, darçîn, mêxik û yêd mayîne bînxweş.


**gorîgeh** – t'extê ku li ser qurban, gorî, h'edî û xêr dihatine dayînê yan serjêkirinê (Destpêbûn 12:7; 22:9). Pêşîyê ew pê kevira dihate çêkirinê. Hêna Mûsada Xwedê t'emî da ku gorîgehê bona Konê Şe'detîyê ji dara darcêwîyê çêkin



*Bizina k'ûvî*



*Gorîgeh*



*Bixûr*

- û sifir bik'işînine ser. (Derk'etin 27:1-8; 38:1-7). Qurban t'enê li ser gorîgeha Konê Şe'detîyê dihatine serjêkirinê û paşê, gava p'aristgeh hate çêkirinê, t'enê li ser gorîgeha p'aristgehê dihatine serjêkirinê. T'extekî din jî hebû, ji wî biç'ûktir û zêr'kirî. K'ahîn li ser vî t'extî bixûr dişewitand, jêr'a digotin gorîgeha bixûrê (Derk'etin 30:1-10; 37:25-28).
- dara darcêwîyê** – dareke h'işk û teyax e.
- darçîn** – biharateke ji qalikê darê ye. Bîna wê gelek e û hêna berê gelekî biha bû. Meriva eva t'evî bizirê zeyt'ûnê dikir, wekî bîna bizir xweş be. Carna meriva li xwe dixistin û carna jî bona definkirinê dihate bik'aranînê (E'yantî 18:13). Ew bona çêkirina r'ûne r'ûnkirinêyî pîroz dihata bik'aranînê (Derk'etin 30:23).
- dehek** – li gora qanûna Mûsa zur'eta Lêwî, ku şixulê p'aristgehê dikirin, li ser navê Xwedê deheka hebûkê, hasil û dayîna berê e'rdê ji cime'ta Îsraêlê xwer'a distandin. Lêwîya deheka ku ji cime'ta Îsraêlê distandin, ji wê deheka standî, dehek didane Xwedê (Qanûna K'ahîntîyê 27:30-32, Jimar 18:26-28).
- dîyarîya bervadayînê** – dîyarîya ku ji ber wan guneyêd ku li ber Xwedê yan meriva kirî dihate dayînê. K'ahîn li ser vê yekêda dinihêr'î û qîmetê zîyanê bîst selef zêde k'ifş dikir û hingê li zîyank'êşa dihate vege'andinê, serda jî yê gunek'ar dîyarî dida (Qanûna K'ahîntîyê 5:14-6:7; 7:1-10).
- dîyarîya jorbilindkirinê** – tişte ku dîyarî dihate dayînê, carana p'ara k'ahîn dihate jorbilindkirinê, çawa nîşana ku bona Xwedê dihate başqe kirinê (Derk'etin 29:27-28).
- dîyarîya nanî** – dîyarîya arê xas (Qanûna K'ahîntîyê 2:1-3) yan nan (Qanûna K'ahîntîyê 2:4-10), yan jî firîkêd genim (Qanûna K'ahîntîyê 2:14-16). K'ahîn p'areke van dîyarîya xwer'a hildida û p'ara din jî li ser gorîgehê dişewitand.
- dîyarîya paqijbûnê** – dîyarî ku yê gunek'ar ji ber guneyê xweva bona paqijbûnê dida. Goştê vê h'eywanê pîroz dihate h'esabê û t'enê îzina k'ahîna hebû bixwarana (Qanûna K'ahîntîyê 4:1-5:13; 6:24-30).

**dîyarîya serdakirina** – eva dîyarîya ji tiştêd r'on e, awa gotî ji r'ûn, şeravê yan avê bûn. Evana li ser dîyarîya heleqetîyê yan dîyarîya t'evayîşewatêda dihatine kirinê (Jimar 28:14-15).

**dîyarîya t'evayîşewatê** – ev cûr'ê dîyarîyê t'emamîya h'eywan pêva li ser gorîgehê dihate şewitandinê. Lê hinek dîyarîyêd mayîn p'arek wan dihatê şewitandin (Qanûna K'ahîntîyê 1:3-17; 6:8-13).

**dîyarîya h'ejandinê** – ev dîyarî p'ir'anîya cara bi sersîngê dîyarîya heleqetîyê, ku p'ara k'ahîn bû dihatê dayînê. K'ahîn t'evî dîyarîdar ev sersîng dih'ejand, vî alî-wî alî dibir danî, lema tê gotin dîyarîya h'ejandinê (Qanûna K'ahîntî 14:21-24; Jimar 6:20).

**dîyarîya heleqetîyê** – dîyarîya heleqetîyê ku li nava Xwedê û merivada dihatê dayînê. T'enê p'areke vî h'eywanî li ser gorîgehê dihatê şewitandinê, herç'ê mayîn jî k'ahîn û dîyarîdar dixwarin (Qanûna K'ahîntîyê 3:1-17; 7:11-21, 28-36).

**êfod** – eva êlekekî bi du p'ara ser milva hevvakirî bû ku ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî hatibû çêkirinê. Serekk'ahîn ew li xwe dikir. R'extsîng jî pêva dikirin (Derk'etin 28:6-14).

**Edom, edomî** – Edom navekî Esawê birê Aqûb bû (Destpêbûn 25:30; 36:8).




*Serekk'ahîn,  
êfod û r'extsîngva*



*Zimir*

- Ji Edom edomî pêşda hatin, ewana dijminê Îsraêl bûn. Welatê Edom ç'îya banîyêd xikî-xwelîye bê kêr bûn.
- emorî** – miletekî mezin bû ku berî zeftkirina Îsraêl li Kenanêda dima. Hingê carana bi navê wan t'emamîya miletêd kenanê dihatine navkirinê (Destpêbûn 15:16; Qanûna Ducarî 3:8-11).
- enaqî** – miletek bû ku berî Îsraêl li Filistînê dima. Ewana gelekî bilind bûn û e'save dihatine gotinê (Jimar 13:22,33). Evana li ç'îya banîyêd Hêbronê diman.
- zimir** – r'ûnekî bînxeş e, ji dara tê standinê û qîmetê wî biha bû. Hingê zimir bona êşê didane nexweşa (Marqos 15:23), usa jî li ser cinyazê mirîyada dikirin, wekî bona definkirinê hazir kin (Destpêbûn 50:2; Yûh'enna 19:39).
- îbranî** – navekî kevin e û cime'ta Îsraêlê pê vî navî hate navkirinê, Birahîm yê pêşin bû ku bi vî navî hate navkirinê (Destpêbûn 14:13). Îbranî usa jî ziman e. Cime'ta Îsraêl bi zimanê îbranî xeber didan. Peymana Kevin bi vî zimanî nivîsar e.
- Îsraêl** – 1. Navê meriv e. Çaxê Xwedê Aqûbê bavê miletê Îsraêlê bimbarek kir, navê wî kire Îsraêl (Destpêbûn

- 32:27-28; 35:10). Çend nav zur'eta Îsraêlr'a tê gotinê: «Cime'ta Îsraêl», «Zar'êd Îsraêl» û «Îbranî». 2. Navê welat jî tê gotinê: «Îsraêl». Berê jêr'a digotin: «Kenan» (Destpêbûn 12:5; K'arêd Şandîya 7:11; 13:19). Navekî din jî jêr'a dibêjin: «Welatê Filistînê». Pey mirina Silêman p'adşar'a welat bû du p'ara. P'ara bakurêr'a gotin Îsraêl, p'ara başûrêr'a gotin Cihûda (1P'adşatî 12:16-17).
- yaspîs** – kevirêd qîmete r'eng r'engî ne. Yaspîsa ku K'it'êba Pîrozda nivîsar e k'esk yan r'engekî vekirî bû (Derk'etin 28:20).
- karbûnkûl** – kevirêkî qîmetî şîn û şînî-k'esk (Derk'etin 28:18).
- k'ahîn** – ji zur'eta Harûnê birê Mûsa bûn. K'ahîna ew gorîyêd (qurbanêd) ku miletê Îsraêlê danîn serjêdikiran. Ew bona miletê Îsraêlê ber Xwedê disekinîn û dua dikirin, navçetî dikirin û xwestina Xwedê cime'têr'a didane e'yankirinê. Serekk'ahîn salê carekê dik'ete cîyê herî pîroz û bona gunehê cime'tê gunehk'ewandin dikir (Qanûna K'ahîntîyê 6:8-10:20; Îbranî 6:20-8:6; Derk'etin 30:10). Melk'î-Sadiq jî Destpêbûnêda k'ahîne dihate h'esabê (Destpêbûn 14:18-20).
- Kenan** – navê wî welatî ye, k'îjan ku Xwedê li gora sozê xwe da miletê Îsraêlê, wekî bibe welatê wan. Ev navê «Kenan» hê berî li wir mayîna miletê Îsraêlê hebû. Paşê «Îsraêl» yan jî «Filistîn» hate gotinê (Destpêbûn 10:19; 12:5; K'arêd Şandîya 7:11; 13:19).
- kenanî** – miletek bû ku li Kenanê dima, zur'eta kur'ê Ham, kur'ê Nuh bû (Destpêbûn 10:6; Jimar 13:29).
- k'efîl** – (girew, k'efalet) p'ere yan tiştêk ji ber tiştava dihate dayînê, h'atta r'oja pirs safîkirine (Destpêbûn 38:17- 20).
- Konê Şe'detîyê (Konê Civînê)** – gava cime'ta Îsraêlê ji Misirê derk'et, Xwedê serê ç'îyayê Sînayê Mûsar'a got, çawa gerekê Konê Şe'detîyê bê çêkirinê (Derk'etin 25). Gava çêkirin, r'ûmeta Xwedê ew cî t'îjî kir û Xwedê bi r'ûmeta xwe şe'detî da û da xuyakirinê ku ew t'evî wan e (Derk'etin 38:21). Konê Şe'detîyê û Konê Civînê (Derk'etin




*Konê Şe'detîyê (Konê Civînê)*

27:21) yek bûn. Cime'ta Îsraêlê li wir dicivîyan. Silêman jî Orşelîmêda p'aristgeh dewsa wêda çêkir. Konê Şe'detîyêda (û usa jî p'aristgehêda) tiştêd pîroz jî hebûn, mesele: Sindoqa Peymana Xudan (Qanûna Ducarî 10:8), awa gotî Sindoqa Şe'detîyê (Jimar 4:5).

**k'otî (k'otîbûn)** – nexweşîk e ç'erm e cûr'e-cûr'e ye ku bela dibe. Li gora Qanûna K'ahîntîyê ji serê 13-a h'eta 14-a zemanê berê her cûr'e nexweşîya ser ç'erm ji k'otîbûnêva girtî h'eta çend cûr'e p'izika, usa jî tiştêd k'efikî h'eram dihatine h'esabê. Cime'tê berî nexweşêd aha didan ji gund û bajara derdixistine der, lê heger yek qenc bûya, gerekê xwe nîşanî k'ahîn bikira û h'edî bida, wekî destûr bidanê ku ew bik'eta nava cime'tê.

**k'irk'ût** – (k'ewk'urt') kevirêkî nerm û zer e ku bi alaveke r'engê vekirî bi şewq dişewite û bîna wê jî qewat e (Destpêbûn 19:24; Qanûna Ducarî 29:23).

**Mowab, mowabî** – anegorî Destpêbûn 11:37, zur'eta Lût ji qîza wîye mezin bû. Mowabî alîyê r'ohilata Êrdunê di-man (Jimar 21:13).



*Sifra nan*

**milyak'et** – zimanê îbranî û yûnanîda fe'mîna wê «qasid» e, çimkî evana qasidêd Xwedê ne. Evana heyînêd r'uh'anî ne, ku h'izûra Xwedêda dimînin. Nayêne dîtinê h'eta xwexa xwe e'yan nekin. Milyak'et qirara Xwedê e'lam dikin yan jî tînine sêrî (Destpêbûn 19:1,12-15). Ewana ji alîyê Xwedêda k'ifşkirî ne, ku meriva xweyî kin û guh bidine wan (K'arêd Şandîya 12:6-11; 27:23; Îbranî 1:14). Carna Xwedê milyak'eta dişîne cem meriva, wekî tişteki wan'a bêje. Milyak'etê serwêrê h'emû milyak'eta Mixayîl e (Cihûda 9). Car-cara xebera «milyak'etê Xudan» tê fe'mkirinê ku çawa Xudan xwexa hazir e (Derk'etin 3:2-6).

**nanê Xwedêr'a dayî** – (nanê h'izûrê, nanê pêşberîyê) nanê pîroz hêna Mûsada Konê Şe'detîyêda (Konê Civînêda), usa jî peyr'a p'aristgehêda hebû. Ev nan li ser sifra zêr'în «li pêşberî Xudan» dihate r'êzkirinê. Her r'ojeke şemîyê k'ahîna donzdeh nanê bê hevîrtir'şk dipe'tin, li ser sifra zêr'în dadanîn û yêd ku h'eftîya dinda dewsê danîn, k'ahîna yê pêşîyê cîyê pîrozda dixwarin. Pêştirî k'ahîna

îzina t'u kesî t'unebû ev nan bixwarana. Ev nan nîşaneke Peymana Xudan bû, ku ew t'evî cime'ta Îsraêlê bû (Qanûna K'ahîntîyê 24:5-9).

**nedir** – (gorî, qurban) li gora Qanûna Mûsa (Derk'etin 13) însan û h'eywanêd nixurîye nêr, ew nedirêd (gorîyêd) Xwedê bûn. H'eywan dihatine serjêkirinê û ji ber însêna dihatine dayînê. Me'na wê ev e, ku her nixurî p'ara Xwedê bû, pîroz, buhurtî û t'aybetî, awa gotî Xwedê'a cudekirî bû (Derk'etin 13:2; Lûqa 2:23).

**Necef** – berîya alîyê başûra Îsraêlê bû (Destpêbûn 12:9).

**onîks** – kevirêd qîmet e, gava tê bir'înê hundur'da xet yan telaşêd r'eng-r'engî k'ifş dibin (Derk'etin 28:9).


**peyman** – (ahda, ad û qîrar) nav du merivada, nav du k'omada, yan jî nav Xwedê û merivada tê girêdanê. Peymanek nava Xwedê û Nuhda hebû (Destpêbûn 9:8-17), nava Xwedê û Birahîmda (Destpêbûn 15), nava Xwedê û Dawidda (2 P'adşatî 7; Zebûr 89:1-37). Li serê ç'îyayê Sînayê Xwedê peymanek t'evî cime'ta Îsraêlê girêda. Li gora vê peymanê Xwedê soz da wekî xwexa Xudanê cime'ta Îsraêlê be û wan xwey ke, lê gerekê Îsraêl jî Qanûna Xwedê biqedîne, ya ku wî bi destê Mûsa da. Lê Îsraêlê gelek cara peyman, awa gotî Qanûna Mûsa dit'er'iband. K'itêbêd cihûyaye pîrozr'a, yêd ku berî Îsa hebûn, wanar'a dibêjin «Peymana Kevin».

**p'êxember** – (nebî, qasidê Xwedê, qûlê Xwedê, gotinbêjê Xwedê) ew însan bûn. Xwedê wanr'a xeber dida, ku ew gotina wî bigihînine meriva (Qanûna Ducarî 18:15-22).

**r'extsîng** – berîke cargoşeye li ser sîng bû. Ew çawa êfod hate cêkirinê, ji zêr', r'îsê şîn, şîrk, sorê gevez û ji k'itanê zirav-badayî (Derk'etin 28:15-16). Gava serekk'ahîn dik'ete cîyê pîroz li ber Xudan, ew li ser sîngê serekk'ahîn êfodva girêdayî bû (Derk'etin 28:29). Li ser r'extsîng dунzdeh kevirêd qîmet çar cêrgeh cîkirî bûn, ku dунzdeh qebîlêd

Îsraêl didane k'ifşê. Hindurê rextsîngda Ûrîm û Tûmîm hebûn (Derk'etin 28:30).

**r'oja şemîyê** – bona cime'ta Îsraêl r'ojeke e'zîz (t'aybetî) û pîroz e (Derk'etin 16:23; 20:8, 11; 31:14-15). Bi îbranî Şabat e. Bi zaravekî kurmancî «sebt» e ku ji şabatê hatîye. Bona cihûya, şabat navê r'oja h'efta ye û ya xilazîya h'eftîyê ye. Înîyê êvarê, gava r'oj diçe ava, şabat destpêdike û h'eta 24 sih'eta dik'işîne. Li gora qanûna Mûsa (Destpêbûn 2:2-3; Derk'etin 20:8-11; 35:2) r'oja şabatêda k'ar û



*R'extsîng û p'ap'ax*

xebat ne cayîz bû bikirana, ev r'oj r'oja r'ih'etîyê û h'ebandinê ye (Destpêbûn 1; Qanûna K'ahîntîyê 23:1-3).

**sala r'awastîyê** – her pêncî sal, sala r'awastîyê bû (Qanûna K'ahîntîyê 25:8-55). Wê salê her xulam dihatine azakirinê û her merivê ku e'rdê xwe firotibû li wî dihate vege'andinê, deyn-dû dihatine baxşandinê.

**sala h'efta** – her h'eft sal, şemîya sala bû (Derk'etin 23:11; Qanûna K'ahîntîyê 25:1-7), ew sala r'ih'etîyê bû bona e'rdê. Ewê salê cime'tê e'rd bêcer ne dikirin û çî ku e'rdê xweserêxwe dida t'op dikirin.

**sardîyon** – kevirekî qîmete sorîgevezî zelal bû.

**serekk'ahîn** – binihêr'e: k'ahîn.

**Sindoqa Peymanê yan Sindoqa Şe'detîyê** – qut'îke pîroz bû, ew û çî ku têda bûn, nîşanêd peymana Xwedê t'evî miletê îsraêlê bûn. Çaxê Xwedê serê ç'îyê t'evî Mûsa p'êxember xeber da, hingê dehe t'emî li ser du selêd kevirî nivîsîn



*Sindoqa Peymanê*

dane wî. Ew peyman Xwedê bi destê Mûsa da girêdanê, bi wan selêd nivîsar. Ew sel, şivdara Harûn, derdanê manayê çawa nîşana Peymana Xwedê li wê sindoqêda bûn û li cem miletê îsraêlêdihatine xweykirinê. Ew sindoq ji darcêwîyê çêkirî û zêr'kirî bû. Gava miletê îsraêlê r'êda diçû, ev sindoq xwer'a dibirin. Gava diçûne cîkî, ev sindoq Cîyê Herî Pîrozda Konê Şe'detîyêda dima (Derk'etin 25:10-21; Îbranî 9:4).

**filistîn** – miletê filistînê hat başûr-r'oavaya devê be'ra Navberêye. Filistînê zeftî xwe kir û van her pênc bajarada: Gaza, Aşqêlon, Aşdod, Gat' û Ek'ronêda çî-war bûn. Filistînî û îsraêlîya gelek cara hevr'a şer' dikirin, çimkî filistînîya dixwastin r'ohilat zeftî xwe kirana, îsraêlîya jî dixwastin r'oava zeftî xwe kirana. Filistînî neyarêd îsraêlîyaye here pêş bûn, h'eta ku Dawid ev pirs safî kir, xilazîya wan anî (Destpêbûn 21:34; 1 P'adşatîya 8:1; 1Dîrok. 18:1).

**xêrûb** – r'uh'berêd xweyîbask in, ev cûr'ekî milyak'etêd Xwedê ne û h'eykelêd wan ser qalp'axê Sindoqa Peymanê bi baskava çêkirî mîna milyak'eta bûn, ku r'ûmet û dîndara (h'izûrîya) Xwedê berçe'v dikirin (Destpêbûn 3:24; Derk'etin 25:17-22; 37:6-9).

**Xudan** – bi zimanê îbranî xebra «Xudan» YHWH nivîsar e û tê xwendinê çawa «Yahweh». Ev navekî e'sesî ye ku alîyê Xudand Mûsava hate e'yankirinê. (Derk'etin. 3:14...). Navê «Yahwêh» miletê cihû bona mezinayîya Xwedê ne didane li ser zarê xwe. Gava ewana K'it'êba Pîroz dixûnin dewsa navê «Yahwêh» dibêjin «Adonay» ku tê fe'mkirinê «Xweyê min».

**hêlanêd jorin** – cîyêd h'ebandina miletê Kenanîya bû (Qaûna K'ahîntîyê 26.30, Jimar 33.52). Xudan e'mirî miletê Îsraêl kir ku van cîya wêran kin. Ew p'adşê ku ev cî wêran nekira dihate h'esabê çawa yekî qanûn t'er'ibandî (2P'adşatî 16:4).


**hûsop** – dareke biç'ûk e, çawa lûfik bona e'detê dîn dihate bik'aranînê. K'ahîna xûna qurbanêda dikirin û dir'eşandine ser meriva, wekî ew meriv li ber Xwedê pîroz bin (Derk'etin 12:22; Qanûna K'ahîntîyê 14:4; Jimar 19:6, 18).

**topaz** – kevirêkî qîmtî qîç'ik e.

**şemdan** – ç'ira heft ç'e'vî bû, ku P'aristgeheda dişxulî (binihêr'e Derk'etin 25:31-39).

**Cejina Bor'îya** – eva cejina 1-ê meha h'efta dihate kirinê (Qanûna K'ahîntîyê 23:24-25; Jimar 29:1). Ew r'oja r'ih'etîyê û dîyarîdayî-nê bû.

**Cejina Derbazbûnê** – ev cejina nava cime'ta Îsraêlda çardehê meha Nîsanêda tê kirinê (li gora salne'ma îbranî çardehê Nîsanê niha 1-ê Aprêlê ye). Evê cejinê bona bîranîna wê yekê dikin, ku Xwedê çawa cime'ta Îsraêl ji bindestîya Misirîya derxist (Derk'etin 12:3-14). Hingê Milyak'etê Mirinê h'emû nixurîyêd misirîya, hin însan û hin jî h'eywan kuştin, lê ji ser malêd cime'ta Îsraêl'a «derbaz bû» û dest neda ji wan



*Hûsop*



*Şemdan*



*Bor'î*



*Qar'îtk*

t'u kesî, nekuşt (Derk'etin 12:23-27). Bona vê yekê vê cejinêr'a digotin Cejina Derbazbûnê.

**Cejina Nanê Şkeva** – ev cejin li pey Cejina Derbazbûnêr'a tê û ji panzdeh h'eta bîst duduyê meha Nîsanê tê kirinê (li gora salne'ma îroyîn ji 2-a h'eta 9-ê Aprêlê tê kirinê). Eva cejina bona bîranîna xilazkirina miletê Îsraêl tê kirinê, gava miletê Îsraêl ji bindestîya Misirîya derk'et û çû wî welatê ku Xwedê dabû wan. Evê cejinêda h'eft r'oja nanê şkeva (bê hevîrtir'şk) tê xwarinê (Derk'etin 12:15-20; 13:3-10).

**Cejina R'oja K'ewandinê** – bona cime'ta Îsraêlê r'oja here e'zîz û pîroz bû (Yom Kîppûr bi îbranî). Salê carekê p'aristgehêda Serekk'ahîn ji ber guneyêd xwe û cime'têva bona paqîjbûna p'aristgeh û gorîgehê xûna h'eywana p'êşk'êş dikir û dik'ete Cîyê Herî Pîroz (Derk'etin 30:10; Qanûna K'ahîntîyê 16:1-34; 23:27; Îbranî 9:6-7).

**Cejina H'eftîya** – (Cejina Nandirûnê – Derk'etin 23:16) Xwedê t'emî da cime'ta Îsraêl, ku r'oja paşine pey destpêbûna Cejina Derbazbûnêr'a h'eft h'eftîya h'esab kin û r'oja pêncî cejinekê jî bikin. Vê cejinêda çî ku ji deremetêd wan (dexilêd wan) pêşîyê dik'ete ber k'êlendîyê, danîn p'êşk'êşî Xwedê dikirin (Qanûna K'ahîntîyê 23:15-21; Jimar 28:26-31). Peymana Nûda vê cejinêr'a digotin R'oja Pêncîye h'esab, awa gotî



*Qotik*



*Qirqê Misirê*

Pêntêkost. Çimkî bi zimanê yûnanî fe'mîna Pêntêkost «pêncî» ye (K'arêd Şandîya 2:1-41).

**Cejina H'olikçêkirinê** – her sal payîzê ji 15-a h'eta 21-ê meha Tişrîyê ye (awa gotî yekê Oktyabirê). Cihû diçûn ser r'ezêd xwe, h'olik çêdikirin û wanda h'eftêkê diman. Cihûya ev yek dikir, wekî bîr banîna, ku çawa Mûsa p'êxember miletê Îsraêl ji Misirê derxist û ew h'olikada man (Qanûna K'ahîntîyê 23:33-36, 39-43; Qanûna Ducarî 16:13-15).

**qar'îtk** – ç'ivîkeke biç'ûk e ku dirêj nafir'e. Xurê wan t'oxim û mêş-mor in. Evana hêlûnêd xwe li ser e'rdê çêdikin (Derk'etin 16:13; Jimar 11:31-32).

**qotik** – h'eywaneke piç'ûk e, ku ç'olê nava k'evirada dimîne. Ew ne h'elal bû (binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 11:5; Qanûna Ducarî 14:7).

**qirqê Misirê** – cur'ekî teyrê ne h'elal bû (binihêr'e Qanûna K'ahîntîyê 11:18; Qanûna Ducarî 14:17).

**Pênc K'itêbêd Mûsa**  
**bi zimanê k'urdîya zaravê kurmancî**

*Пятикнижие Моисеево*  
*на курманджи-курдском языке*  
*(латиница)*

*Pentateuch*  
*in Kurmanji-Kurdish*  
*(Latin)*

Институт перевода Библии  
Лицензия № 01271 от 22.03.2000  
101000 Россия, Москва, Главпочтамт, а/я 360  
[www.ibt.org.ru](http://www.ibt.org.ru); [ibt\\_inform@ibt.org.ru](mailto:ibt_inform@ibt.org.ru)

Подписано в печать 01.11.2010  
Формат 84×108 <sup>1</sup>/<sub>32</sub>. Печать офсетная. Усл. печ. л. 22,68  
Тираж 1000 экз. Заказ №

Отпечатано в ОАО "ИПК "Ульяновский Дом печати"  
432980, г. Ульяновск, ул. Гончарова, 14